



T.C.

Zanîngeha Dîcleyê Enstîtuya Zanistên Cîvakî

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

FERHENG A EDEBÎYATA KURDÎ YA KLASÎK

Amadekar

Erdoğan ALPARSLAN

Şêwirmend

Dr. Öğr. Üyesi Faruk KAZAN

Diyarbakır-2021

T.C.
Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı
Yüksek Lisans Tezi

KLASİK KÜRT EDEBİYATI SÖZLÜĞÜ

Hazırlayan
Erdoğan ALPARSLAN

Danışman
Dr. Öğr. Üyesi Faruk KAZAN

Diyarbakır-2021

TAAHHÜTNAME

SOSYAL BİLİMLERİ ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Dicle Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Ferhenga Edebîyata Kurd A Klasîk” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

.../.../2021

Erdoğan ALPARSLAN

PÊŞGOTIN

Kurdî nemaze kurmancî ji ber zextên salan pêşketina xwe di nivî da hîştîye. Lê di wan salên dawî da astengîyên pêşîya zimanê kurdî hêdî hêdî hatin rakirin. Ev jî ji bo pêşketina kurdî nemaze ji bo kurmancî derfeteke mezin e. Di Tirkîyeyê da rakirina qedexeyên li dijî kurdî û di zanîngehan da vekirina beşên kurdî li Tirkîyeyê da ji bo kurdî derfeteke bêhempa derxistiye meydana. Piştî van hewldanan gelek xebatên akademîk bi zimanê kurdî hatin kirin. Me jî xwest ku di vê deryaya bêbinî û bêserî da dilopek keda me jî hebe. Heta niha di kurdî da gelek ferheng hatine çêkirin. Ferhengên têgehî, tenduristî, çandinî, felsefî û ferhengên kurdî yên birêkûpêk û du zimanê û sê zimanê hatine çêkirin lê ferhengeke bi kurdî-kurdî ya edebîyata klasîk heta niha nehatiye çêkirin û xebateke wisa nebûye mijara tezeke akademîk. Ev xebat dixwaze di vî warî da kêmasîyekî telafî bike. Dixwazim ev nêrîta bi *Nûbihara Biçûkan* ve dest pê kiriye wek tradîsyonekî dewam bike. Bila nîfşên nû ji çêja klasîkan bêpar nebînin. Bi saya vê ferhengê nîfşên nûyê bi hêsanî klasîkên edebîyata me fam bikin û peywendîyên xwe ji rabirdûya xwe ve qut nekin. Netewe li ser binyata rabirdûyê ve tê avakirin. Heger peywendîya nîfşên nû rabirdûya wan qut bibe vê gavê neteweyê têk here. Em kurd neteweyeke derengmayî ne û me sazkirina xwe hêj pêk neanîye ji ber vê edebîyata me ji bo sazkirina neteweyê roleke mezin dilîze. Em ê jî ji bo vê hewldanê helqeyekî bavêjin vê zîncîra bi dengan hatiye ristîn da. Di serî da spasîya xwe ji şêwirmendê xwe birêz Dr. Faruk Kazan ra dikim di vê pêvajoya zor û zehmet da ji me ra bi pêşnîyazên xwe yê hêja rê nîşanî me da wî. Dîsa serokê beşê birêz Doç. Dr. Osman Aslanoğlu ra jî spas dikim ji bo alîkarî û pêşnîyazên wî. Ev fikra ferhengê hevala min a masterê Zeynep Şemdinoglu da min li vir spasîya xwe pêşkeşî wê dikim. Ji bo alîkarîyên wan spasîya xwe ji hevalên xwe yên masterê Semra Güçlü, İnan Eroğlu û Yusuf Dere ra pêşkeş dikim.

KURTE

Ferheng çî ye û çawa derketiye meydana ji destpêkê heya îro ev pirs tê kirin. Di vê xebatê da em bi awayekî kurt li ser van pirsan sekinîn. Bi nêrîneke dîrokî me li edebîyata Rojhilatî da nivîsandina ferhengên menzûm li gor demên wan rave kir. Piştra jî me behsa ferhengên kurdî yên menzûm kir. Piştra jî me di dîwanên klasîk da peyvên erebî, farisî, tirkî û peyvên di kurdî îro da kêma kara tespît kir û xal bi xal wateyên wan bi kurdîya kurmançî nivîsand. Ji bo çêkirina vê tezê pêşî pirtûkên klasîk yek bi yek hatine jenandin piştra jî peyvên bîyanî û kurdî yên êdî ne kara yan jî kêma kara hatine tespît kirin û piştra jî wateyên wan peyvan di ferhengên kurdî û yên bîyanî da hatine dîtin û qeyd kirin. Edebîyata klasîk bi piranî bi helbestî ye, ji ber vê me xebata xwe bi piranî li ser dîwanên klasîk domand. Me di destpêkê da behsa armanc û çarçova tezê kiriye. Piştra jî em li ser rêbaz û çavkanîyên tezê sekinîn. Di bin xala sêyem da jî me bersiva ferheng çî ye û di edebîyata neteweyên misilman da kengî ferheng hatine nivîsandin û di kurdî da heta niha çend ferhengên mezmûn hatine nivîsin, me bi kurtasî bersivên van pirsan da. Ji ber belavbûna û pîrbûna çavkanîyan ji bo amadekirina ferhengeke wiha da arîşeyên mezin derdidexe meydana. Ji bo çareserkirina astengîyan me girîngî da kronolojîye. Beşa duyem da jî me bi tîpên Latinî tîp bi rêzeke alfabetîk rêz kir. Hin peyv xwedî çend wateyan bûn me ev jî xal bi xal nîşandan. Hin peyv di kurmançî û soranî û farisî da bi wateyên cuda kara bûn ji ber vê me rayekên hin peyvan bi sembola van zimanan nîşanda. Ji bo famkirina peyvan me rayeka hin peyvên erebî jî dîyar kirin. Di encamê da jî me bi kurtasî behsa serpêhatîya xebata xwe kiriye. Armanc û hevîyên xwe yên ji bo vê tezê dîyar kiriye. Ev ferheng ji bo têgihîştina klasîkên kurdî hatiye amadekirin ev nêrîta ji Ehmedê Xanî dest pê kiriye îro bi vê ferhengê ve ev tradîsyonê dewam bike.

Peyvên Sereke

Ferheng, Ferhengsazî, Ferhengên menzûm, Ferhenga Edebîyata Klasîk Edebîyata Klasîk, Kurdî, Erebi, Farisî.

ABSTRACT

What is the dictionary and how did it come about, these questions are constantly asked from the beginning to the present. In this study, we will briefly focus on these questions. From a historical point of view, we explained the writing of verse dictionaries in Eastern literature according to their times. Then we gave information about Kurdish dictionaries. Then, we identified the words that are rarely used or not used in Arabic, Persian, Turkish and today's Kurdish in classical divans, and found their meanings in Kurmanji Kurdish and wrote them item by item. In order to be able to do this thesis, firstly, classical books were scanned one by one, then foreign and Kurdish words that are no longer used or rarely used were determined, and then the meanings of these words in Kurdish and foreign dictionaries were found and recorded. Classical literature is mostly poetic, so our work has mostly continued on classical poetry. First, we talked about the purpose and framework of the thesis. Then we focused on the methods and sources of the thesis. In the third stage, we stated what dictionary means and when verse dictionaries were written in the literature of Muslim nations and how many Kurdish verse dictionaries have been made in Kurdish so far. We briefly answered these questions. Due to the diversity and abundance of resources, the preparation of such a dictionary was carried out with great difficulty. We masterfully overcame this challenge. In the second part, we arranged the dictionary items in an alphabetical order according to the Latin letters. Some words had several meanings, and we have shown this item by item. Since some words in Kurmanji and Sorani languages and some words in Persian use different meanings, we have shown the roots of some words in these languages. We have also indicated the origins of some Arabic words for a full understanding of some words. In the conclusion part, we briefly explained the purpose of writing the work and our experiences while preparing the work. The aims and objectives of this o are stated. This dictionary has been prepared to understand the Kurdish classics. This tradition, which started with Ehmedê Xanî, will continue today with this dictionary.

Keywords

Dictionary, Lexicography, Menzum Dictionaries, Dictionary of Classical Literature, Classical Literature, Kurdish, Arabic, Persian.



ÖZET

Sözlük nedir ve nasıl ortaya çıkmıştır, başlangıcından günümüze kadar bu sorular sürekli sorulur. Bu çalışmamızda kısaca bu sorulara odaklanacağız. Tarihsel bir bakış açısıyla Doğu literatüründe menzum sözlüklerinin zamanlarına göre yazılmasını anlattık. Sonra Kürtçe manzum sözlükler hakkında bilgi verdik. Daha sonra klasik divanlardaki Arapça, Farsça, Türkçe ve günümüz Kürtçesinde az kullanılan ya da kullanılmayan kelimeleri tespit edip Kurmancî Kürtçesiyle anlamlarını bulup madde madde yazdık. Bu tezi yapabilmek için önce klasik kitaplar birer birer taranmış, daha sonra artık kullanılmayan veya az kullanılan yabancı ve Kürtçe kelimeler tespit edilmiş ve daha sonra bu kelimelerin Kürtçe ve yabancı sözlüklerdeki anlamları bulunarak kayıt altına alınmıştır. Klasik edebiyat çoğunlukla şiirseldir, bu nedenle çalışmalarımız çoğunlukla klasik şiir üzerine devam etti. Önce tezin amacından ve çerçevesinden bahsettik. Ardından tezin yöntem ve kaynaklarına odaklandık. Üçüncü aşamada sözlüğün ne demek olduğunu ve Müslüman milletlerin edebiyatlarında manzum sözlüklerin ne zaman yazıldığı ve bugüne kadar kaç Kürtçe manzum sözlük yapıldığını belirttik. Bu soruları kısaca cevapladık. Kaynakların çeşitli olması ve fazla olması odaklanmamızı zorlaştırmıştır. Bu zorluğu aşmak içinde kronolojiye öncelik verilmiştir. İkinci bölümde sözlük maddeleri Latin harflerine göre alfabetik bir sıra ile düzenlenmiştir. Bazı kelimelerin birkaç anlamı vardı, bunlar da madde madde gösterilmiştir. Kurmanci ve Sorani dilindeki bazı kelimeler ile Farsçadaki bazı kelimeler farklı anlamlarda kullandığından bazı kelimelerin köklerini bu dillerdeki haliyle gösterilmiştir. Bazı kelimelerin tam olarak anlaşılması için bazı Arapça kelimelerin kökenlerini de belirttik.

Anahtar Kelimeler

Sözlük, Sözlükbilimi, Manzum Sözlükler, Klasik Edebîyat Sözlüğü, Klasik Edebiyat, Kürtçe, Arapça, Farsça.

NAVEROK

Hejmara Rûpelê

PÊŞGOTIN	I
KURTE.....	II
ABSTRACT	III
ÖZET.....	V
NAVEROK	VI
KURTKIRINA PEYVAN.....	VII
DESTPÊK	1
BEŞA YEKEM	4
FERHENG ÇI YE Ê DÎROKA FERHENGÊN MENZÛM.....	4
1.1. ARMANC Ê ÇARÇOVE.....	4
1.2. REBAZ Ê ÇAVKANÎ.....	5
1.3. EDEBÎYATA KLASÎK.....	7
1.3.1. Edebîyata Kurdî Ya Klasîk.....	7
1.3.2. Edebîyata Klasîk û Ferhengsaî 9	
1.3.3. Menzûme	12
1.3.3.1. Mesnewî	13
1.4. FERHENG Ê DÎROKA FERHENGSAZÎYÊ	14
1.4.1. Ferheng Çi Ye?.....	14
1.4.2. Dîroka Ferhengsaîyê.....	15
1.4.2.1 Ferhengên Menzûm û Dîroka Wan	17
1.4.2.2. Dîroka Ferhengên Kurdî.....	18
1.5. TERMÎNOLOJÎYA FERHENGSAZÎYÊ.....	20
1.6. ARMANCÊN FERHENGSAZÎYÊ	20
BEŞA DUYEM	22
FERHENG	22
ENCAM.....	379
ÇAVKANÎ.....	381
TEZÎN TÛRKÇE ÖZETÎ.....	385

KURTKIRINA PEYVAN

B.B.E	Bekir Begê Erzî
B.T.U	Baba Tahirê Uryanî
E	Erebî
E.H	Elîyê Herîrî
E.X	Ehmedê Xanî
F	Farisî
F.R.H	Feqe Reşîdê Hekarî
F.T	Feqîyê Teyran
H.B	Harisê Bidlîsî
h.b	Heman berhem.
H.F.H	Hecî Fetilahê Hezroyî
Hj	Hejmar
hwd	Her wekî din
k	Kurdî
k.l	Kurdî-Lorî
k.s	Kurdî-Soranî
m	Mirin
M	Mîna
MC	Macin
MH	Mehwî
M.B	Melayê Bateyî
M.C	Melayê Cizîrî
M.E	Mele Evdilmecîd
M.E.C	Mîr 'Emadeddînê Cizîrî
M.E.F	Mele Elîyê Findikî
M.E.M.N	Mele Ehmed Mehmûd Namî
M.E.Q	Mele Ehmedê Qoxî
M.E.X	Mele Ehmedê Xasî
M.M.L	Mele Mihemedê Licî.
M.G	Mensûrê Girgaşî
M.H.Q	Mele Hesenê Qerenazî
M.M.E.H	Mele Mihemed Emîn Heyderî
M.M.L	Mele Ahmedê Qoxî
M.M.M	Mele Mûsayê Mizî
M.N.T	Mele Necmedînê Tengezarî
M.X.S	Mele Xelîlê Sêrtî
M.Y.Y	Mele Yasîn Yusrî
P.B.H	Pertew Begê Hekarî
r	Rûpel
s	Soranî
S	Sadiq
S.H	Selîmîyê Hîzanî
SP	Sîyahpoş
Ş.E.A	Şêx Evdirehmanê Axtepeî
Ş.E.S	Şêx Evdilqadirê Sanî
Ş.M.C	Şêx Mihemed Can

Ş.M.E	Şêx Mihemed Eskerî
Ş.N.B	Şêx Nûredînê Birîfkanî
Ş.Ş.E	Şêx Şemsedînê Exlatî
t	Tirkî
X.U	Xelîfe Usiv
W	Wedaî
Wer	Werger



DESTPÊK

Keresteya edebîyatê ziman e. Ziman jî unsureke neteweyî ye ku bi çand, civak û erdnîgarîyê ra bi peyvendîyên xurt ve girêdayîye. Ji ber ku bikaranîna keresteyê hunerên ciwankarî, kêr zêde navneteweyî ne lê edebîyat ji ber bikaranîna zimên nîşaneyê neteweyî ye. Ji ber vê pêşketina edebîyatê bi faktorên dîrokî, hunerî û çandî ve girêdayîye. Dema em di nav demê da dîroka pêşketina civaka xwe binêrin em ê bibînin ku pêşketina civak û edebîyatê bi hev re paralel diçe. Ev paralelî îro bi pêşketina teknolojiyê û amûrên ragihandinê ve zêdetir bûye.

Heya sedsala Xan tu metnên edebîyata kurdî ya nivîskî tune ne. Li gor daneyên di destê me de em dikarin bibêjin yekem edebiyata kurdî ya nivîskî kurdîya lorî ye. Ev herhem di navbera sedsala X û XIyan de ji aliyê Baba Tahir Hemedanî û bi zaravaya lorî hatiye nivîsin. Ev jî Dubeytîyên Baba Tahir in. Edebiyata lorî di herêma Loristan û Hewremanê re daye. Hemû barê vê edebîyatê li ser piştê Baba Tahir e. Ev edebiyat xwe spartîye mezhebê yarsanîyê. Ji ber vê Baba Tahir mezînekî yarsanîyê tê qebûl kirin. Berîya Baba Tahir Hemedanî metnên edebîyata kurdî yê nivîskî hebin jî heya niha negihîştine destê me. Berîya vê dîrokê metnên klasîk di destê me da tunebin jî lê gelek cureyên edebîyata zarekî hebûn. Di nav gel da gelek cureyên edebîyata zarekî wek destan, heyranok, lawîj, çîrokên gelêrî, xeberoşk, stran û kilam hebûn. Hezkî bi nivîskî hezkî bi zarekî be hemû gotin û berhemên wan jî jîyan û ramanên neteweyî ve di nav deme da hatine kemilîn û bûne xwedî laş.

Di dema mîrektîyan da jî bo xwendinê medrese hebûn di wan medreseyan da perwerdehiya dînî û îlmî bi zimanê kurdî dihat dayîn. Berîya wê zarokan kurda pêşîya dibistanên li cem malbatên xwe navên Xweda, pexemberan, dostên Xweda û şêx û meşayîqan û şert û mercên îslam û îmanê duayen nimêjê hîn dibûn. Piştê jî li cem mela û feqîyan Elifba dihat hînkirin. Di medreseyan da li gor rêzbandîyekê ev pirtûk dihatin xwendin: Qur'ana pîroz, Mewlûda Mela Huseynê Bateyîpiştra jî Nûbihara Ehmedê Xanî, Nehc-ul Enama Mele Xelîlê Sertî û qeîdeyên şerîatê dihat

xwendin. Piranîya pirtûkên di medreseyan da dihate xwendin kurdî bûn, xêncî wan jî hin pirtûkên bi farisî û erebî jî hebûn. Berîya Ehmedê Xanî di medreseyên Kurdistanê da serdestîya erebî hebû. Ehmedê Xanî bi ferhenga xwe ya menzûm Nûbihara Biçûkan û Eqîdeyên îmanê serdestîya erebî şikand û di medreseyanda serdestîya kurdî demezirî. Bi Ferhengekî qedera kurdî di medreseyan da hate guherandin. Ev jî nîşaneyê hêza ferhangan e.

Di vê ferhengê da 12071 peyvên di klasîkan da cih girtine xal bi xal hatine ravekirin û piranîya wan jî bi mînakên malikan ve hatine nîşandin. Di ferhengê da ne tene peyvên kurmançî hene me cih daye peyvên soranî lorî jî, dîsa di mînakên malikan da jî dîwanên kurmançî, soranî, lorî û zazakî me helbest mînak dane. Me herî pir ji Mem û Zîna Ehmedê piştra jî Dîwana Melayê Cizîrî peyv girtin. Piştî li gor rêzê jî wan dîwana peyv girtin.

1. Mem û Zîn
2. Dîwana Meleyê Cizîrî
3. Dîwana Ehmedê Xanî
4. Iqdê Durfama Şêx Mihemed Eskerî
5. Hemû berhemên Meleyê Bateyî û Mewlîda wî.
6. Hemû berhemên Feqîyê Teyran
7. Dîwana Mehwî
8. Yûsuf û Zuleyxaya Selîmîyê Hîzanî
9. Dîwana Weda'î
10. Dîwana Seyîd Elîyê Findikî
11. Dîwana Perto Begê Hekkarî
12. Ferhenga Elî Ekber Kurdistanî
13. Nehcul Enama Mele Xelîlê Sêrtî
14. Mîrsad'ul-Etfala Şêx Mihemed Kerbelayî
15. Dîwana Şêx Şemsedînê Exlatî
16. Sirul Mehşera Feqe Reşîdê Koçer
17. Xezel û Helbestên Sîyahpûş
18. Dîwana Şêx Evdirehmanê Axtepi
19. Dubeytîya Baba Tahirê Uryan

20. Tesrîfa Teremaxî

Ji bo neteweyên wekî me yê derengsaz edebîyat amraza herî girîng e. Ji ber ku me li jor jî gotibû keresteya edebîyatê ziman e, netewe jî li ser bingeha zimên tê avakirin. Edebîyata me ya nivîskî bi metnên klasîk dest pê dike. Edebîyata me ya klasîk jî ber dîne îslamê û çanda Îranê di bin bandora zimanê erebî û farisî da maye. Ji ber vê gelek peyvên erebî û farisî di klasîkên kurdî da cih girtine. Ji ber vê nîşên serdema me zimanên klasîkan fam nakin. Klasîk bingeha edebîyata me ne, di rewşeke wiha da peyvendiye navbera rabirdû û dahatûyê qut dibin ev jî aloziyeke mezin derdixe holê. Di serdema klasîk da kesên karen wan edebîyat û perwerdehî bûn hem jî bo hînkirina zimên hem jî ji bo parastina peyvên zimên ferhengên menzûm çêkiribûn. Di medreseyan Kurdistanê da jî bo hînkirina zimanê Qur'anê ferhengên kurdî erebî hatine çêkirin. Yekem ferhenga menzûm ya di kurdî da hatiye çêkirin ji aliyê Ehmedê Xanî ve bi kurdî-erebî hatiye amadekirin. Ev jî 'Nûbihara Biçûkan' e. Bi vê berhemê dîroka ferhengسازیya kurdî dest pê dike û îro jî bi awayekî rêkûpêk didome. Dema me ev xebat amade dikir hêj ferhengeke kurdî ya edebîyata klasîk tunebû. Ji bo kesên vê serdemê ji dewlemendiya zimanên klasîkan bêpar nebinin me dest xebateke wisa kir. Bawerim ku ev xebatê di vî warê da kemasîyekî telafi bike.

BEŞA YEKEM

FERHENG ÇI YE Û DÎROKA FERHENGÊN MENZÛM

1.1. ARMANC Û ÇARÇOVE

Edebîyat di avakirina çanda neteweyî da roleke mezin dilîze. Netewesaz bi rêya edebîyatê bi amraza zimên dixwazin neteweyekî ava bikin. Ji ber vê metnên edebîyatê ji bo netewesazan wek pirtûkên pîroz bi qîmet in. Gregory Jusdanis di sazkirina neteweyê da rola edebîyatê wiha tîne ziman “Modernbûn, divêtiya avabûna çandeke neteweyî tîne da ku ev çand bikeve şûna nasnameyên nijadî-olî yên pergala tebeqebûyî pêk tîne. Berevajê qanûnên teqez ên împaratorîyê û edetên dêrê yên bi zorê, çanda neteweyî takekesan bi xûyên cemaetê, serpêhatîyan, çîrokan û helbet bi rêya ziman digihîne hev. Endamên bi vê peşnûmaya dewletê bi hevra hatine girêdan, bi vî awayî mirata hevpar, merivatî û çarenûsên xwe dijîn. Kanona edebîyatê wek yekûnekê bi metnên çîroka neteweyê vedibêje pêk hatî ji bo meriv xwe wek welatîyên neteweyê yekbûyî bibînin serpêhatîya piştgirîyê hêsan dike. Lê kanon bi tenê temsîla nasnameya neteweyî nasekine, di heman demê da nîrxên neteweperwerîyê diniçilîne gel û tev li hilberîna vê nasnameyê jî dibe. Kanon dîroka neteweyê -di zimanê zikmakî da- tomar dike; berdewamîyeke kronolojîk saz dike ku ji bo endamên civatê ji kêşeyên nihayeke nedîyar bûye sedem ra serî derkevin dibe alîkar. Di nîzama demkî ya modernîteyê da, Ew kanona ku olaneke ûtopîk ya rabirdûyê, bêrîya cihekî nake bêrîya demekî dike. Di demeke ku nasname diqewimin û têkiliyên civakî ji hev vediqetin, canon li bereketa demên kevnar dinihêre û hêviyên ji nû ve vejîn yên çandî pêşkêşî merivan dike.”¹

Sazkarên neteweyan bi rêya edebîyatê netewe saz kirine. Ji bo vê jî ziman amraza herî kara ye. Ziman ji bo pêşnûmaya avakirina neteweyê amraza herî girîng e. Bi rêya edebîyatê netewesaz bi tayên hestî endamên neteweyê bi hevra girêdide.

¹ Jusdanis, G., Gecikmiş Modernlik ve Esatetik Kültür, Milli Edebiyatın İcat Edilişi, İstanbul, Metis Yayınları, 1998, r. 80.

Ruhê ziman û neteweyê yek in. Yiannis Psikharis ziman û neteweyê yek dibine. “Ziman û netewe yek in. Meriv hezkî ji bo welatê xwe şer bike hezkî ji bo zimanê xwe yê neteweyî têkoşîna dide yek e.”² Ji bo peyvên ziman bigihîjin nifşên nû rola ferhengan pir girîng e.

Di zanîngehan da xwendekarên beşên edebîyata kurdî ji ber peyvên erebî û farisî li famkirina berhemên klasik da rastî zehmetîyan tên. Dîsa kesên klasîkan dixwînin ji ber van sedeman gelek caran metnên klasik fam nakin, ev jî nifşên teze ji klasîkan dûr dixe. Ji bo famkirina klasîkan û alozozîyên ji ber ravekirina klasîkan ji holê rakin ev xebat hatiye amadekirin. Bingeha vê xebatê berhemên klasik in. Armanca me ev e ku em dixwazin merivên me zimanê xwe yê kevn nas bikin û hêza zimanê xwe bizanibin. Zimanê kurdî kevintirîn zimanê herêmê û kokzînde û kevnar e. Ev ziman hewldana hezar salan e. Ji bo ev dewlemendî û hêza wî zimanî bigihîje nifşên teze û bila ev nifş ji vê gencînîyê mehrûm nebînin ev xebat hatiye amadekirin.

Mijara teza me jî Ferhenga edebîyata klasîk e. Ev tez derheqê peyvên erebî, farisî, tirkî û kurdî yên di edebîyata klasîk da kara ne ye. Mebesta me ev e ku peyvên di edebîyata klasîk da hatine bikaranîn wateyê wan ê îro eşkere bikin. Em ê bi kurtasî di derheqê edebîyata klasîk da hin agahîyan bidin. Armanca me ev e ku bi kurtasî pênasîya edebîyata klasîk bikin û di derheqê ferhengnasîyê da hin agahîyan bidin û piştra jî dest bi ferhengê bikin.

1.2. REBAZ Î ÇAVKANÎ

Di edebîyata kurdî da heya niha di hêla Bakur da ferhengeke edebîyata klasîk ya bi kurdî-kurdî nehatiye çêkirin. Armanca me ev e ku ev ferheng di vî warî da kêmasîyekî telafî bike. Em ê destpêkê da li ser edebîyat klasîk û ferhengsazîyê bisekinin. Di edebîyatên neteweyên misilmanan da ferheng amade kirin kengî dest pê kiriye û di edebîyata kurdî da kengê dest pê kiriye em ê rave bikin. Piştra em ê xal bi xal peyvan amaje û rave bikin. Em ê di hin cîhan da rehên peyvan jî dîyar bikin. Di vê xebatê me tenê peyvên berhemên kurmancî nîşan nedaye, peyvên zaravayên lorî û soranî jî hatine rave kirin. Di dawîyê da em ê cih bidin encam û çavkanîyan.

² Jusdanis, h.b, r. 76.

Çavkanî bi piranî dîwanên helbestvanan û ferhêng û pirtûkên rêzimanî ne. Me ev çavkanî xistine du beş çavkanîyên sereke û nesereke . Çavkanîyên sereke jî ev in:

Me di vê tezê da Mem û Zîn, Dîwana Ehmedê Xanî û Nûbihara Ehmedê Xanî, Dîwana Weda'î, Dîwana Melayê Cizîrî, Iqdê Durfama Şêx Mihemed Eskerî, Dîwana Seyîd Elîyê Findikî, Dîwana Perto Begê Hekkarî, Ferhenga Elî Ekber Kurdistanî, Dîwana Mehîwî, Yûsuf û Zuleyxaya Selîmîyê Hîzanî, Nehcul Enama Mele Xelîlê Sêrtî, hemû berhemên Feqîyê Teyran, Mewlîda Mela Huseynê Bateyî û helbestên wî, Mîrsad'ul-Etfala Şêx Mihemed Kerbelayî, Dîwana Şêx Şemseddînê Exlatî, Sirul Mehşera Feqe Reşîdê Koçer, Xezel û Helbestên Sîyahpûş, Dîwana Şêx Evdirehmanê Axtepi, Dîwana Baba Tahirê Uryan û Tesrîfa Teremaxî yek û yek hatine lajandin.

Çavkanîyên ne sereke jî ev in:

Piştira jî me wek çavkanîyên duyem serî li Ferhenga Zana Farqînî, Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat'a Ferit Develioğlu, Rêbera Rastnivîsînê (Komxebata Kurmancîyê), Ansiklopedik Divân Şiiri Sözlüğü ya İskender Pala, Eski Türk Edebiyatında Mazmunlar ve İzahıya Ahmet Talat Onay, Hezar û Yek Peyva Qendîl Şeyxbizînî, Rastnivîsa Kurdî (Kurmancî) ya Halîl Altûğ, Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk û Teşeyên Nezmê Di Edebîyata Kurdî ya Klasîk Da ya Abdurahman Adak, Manzum Sözlüklerin Modern Sözlükçülüğe Uygulanabilirliği ya Yusuf Akçay, Baxçê Zimên a M. Emin Bozarslan, Ferhenga D. Îzolî ya Kurdî -Tirkî, Tirkî-Kurdî, Ferhenga Kurdistanî ya Elî Ekber Kurdistanî, Tarih Boyunca Farsça-Türkçe Sözlükler'a Yusuf Öz, Sami, Şemseddîn, Kamûs-ı Türkî ya Şemseddin Sami, Ferhenga Hemîdî ya Yusuf Ziya Paşa da, Nimûne ji Gencîneya Çanda Qedexkirî ya Zeynelabidîn Zinar û Şaîrên Klasîk ên Kurd a Abdulreqîb Yûsuf.

Ev xebat bi notên salan û xebateke du salên birêkûpêk û bi dîsîplinekî ve hatiye amadekirin. Me agahîyên berhevkerbûn bi giştî nirxand. Ji bo mîsogerîya wateya peyvan gelek çavkanî hatine lajandin û kolandin. Piştira jî bi awayekî alfabetîk xal bi xal hatine ravekirin û rêzkerin. Piştira jî ji gelek dîwanên klasîk lajand ji piranîya peyvan di nav malikan da nîşan da.

1.3. EDEBÎYATA KLASÎK

Edebîyata di bin tesîra îslamê zimanên erebî û farisî da maye ra edebîyata klasîk tê gotin. “Ji edebîyata nivîskî ya ku di serdama îslamî da di bin bandora dînê îslamê, zimanên Erebi, farisî û çanda Îranê da li gorî hinek rêbazan hatiya meydana ra ‘Edebîyata Klasîk’ tê gotin.”³ Edebîyata bi hatina îslamê ra bi saya ereban û di bin tesîra dînê îslamê hatiye çekirin ra edebîyata klasîk edebîyata kevn an jî -ji ber ku berhemên nivîskaran di pirtûkên bi navê dîwan da dihatin komkirin - edebîyata dîwanê dihate gotin. Ev edebîyat di nav estetîka şaristanîya îslamê da ajdaye û heta sedsala XXan hebûna xwe domandî ye.

Ciwankarî û estetîka edebîyata klasîk zimanekî aîde xwe û taybet, mecaz û mazmûnên xwe unsurên mîtolojîk ên aîde xwe îmaj û pîvanên xwe yên estetîk parast û di erdnîgarîyeke berfireh da zimanekî edebî afirand ji bo neteweyên musliman. Bi destpêka îslamê heya çaryeka sedsala bîstan hebûna xwe parast piştra jî cihê ji edebîyata modern ra hîşt û îro jî ji bo edebîyata modern bûye çavkanîyeke bêhempa.

1.3.1. Edebîyata Kurdî Ya Klasîk

Neteweyên bê edebîyat nikarin pêşbikevin bibin xwedî zimanekî tekûz û bihêz. Ji ber vê kes nikare ji civakeke bê edebîyat neteweyekî ava bike. Neteweyên bê edebîyat dişibe erdê bê giya. Edebîyata me ya klasîk jî bi bandora dînê îslamê pêşketîye û di nav demê da jî berhemên bêhempa afirandîye. Edebîyata kurdî ya klasîk jî di bin bandora dînê îslamê û zimanê erebî, farisî û teşeyan wan û çanda Îranî pêk hatiye. Edebîyata kurdî ya klasîk edebîyateke nivîskî ye ji ber vê çavkanîyên wê berhemên nivîskî ne. Ji alîyê xurtbûn û berhemdarîyê edebîyata kurdî ya klasîk ji edebîyatên ereb, faris û tirkên kêmtir û lawaztir nîne. Edebîyata me ya klasîk ji destpêka îslame heya sedsala bîstan hêz û rindbûna zimanê me radixe ber çavan. Edebîyata me pişta xwe tenê nedaye mîtolojîya îslamê û Îranê alîyekî ve pişta xwe daye mîtolojî û çanda kurdan jî. Mem û Zîn çîrokeke kurdî ye û berhemeke edebîyata me ya zarekî ye herî berbelav û xurt e. Ji ber vê Mesnewîya Mem û Zîn di nav neteweya kurd bûye destaneke neteweyî. Klasîk ruhê edebîyatên neteweyan e û havêna modernîzmê ye. Edebîyata me ya nivîskî li ser sutûnên edebîyata klasîk

³ Adak, A., Destpêka Edebîyata Klasîk ya Kurdî, İstanbul, Weşanên Nûbihar, 2014, r.30.

rabûye û hatiye vê rojê. Li hemberî zext û zordariya li ser zimanê me bi klasîkên me yên bêhempa zimanê me xwe parastiyaye û heya îro zînde maye. Zimanê me bi saya klasîkên me têk neçûye û hêz û dewlemendiya xwe parastiyaye.

Edebîyata me ya klasîk di nav çend sedsalan da hatiye damezrandin. Ji bo naskirina edebîyateke wisa demdirêj pêwîst e çanda wê bê naskirin. Ew çand bandora xwe daye li ser berhemên wê heyamê û li gor xwe spehîyeke bêhempa ava kiriye.

Herwiha îfadeya “di bin bandora dînê îslamê, unsurên erebî û farisî û çanda Îranê da” jî çavkanîyên edebîyata kurdî ya klasîk tîne zimên. Di metnên edebî yên klasîk da ev her çar unsur teqez cih digirin.⁴ Em dikarin di bin baskên van çar unsurana çavkanîyên edebîyata kurdî ya klasîk wiha kategorîze bikin.

1. Unsurên Îslamî
2. Unsurên Dînî
3. Xweda û Qur’ana Pîroz
4. Cenabê Pêxember û Hedîsên wî
5. Eqaîd û Kelam
6. Fiqih
7. Kesayetên Dînî û Tarîxî
8. Unsurên Teaewifî
9. Unsurên Erebi
10. Unsurên Farisî
11. Unsurên Çanda Îranê/Asyayê.⁵

Edebîyata me ya klasîk piştî xwe daye van unsuran û çavkanîyên. Ev têgeh û unsur çavkanîyên edebîyata me ya klasîk yên hizrî ne.

Gava ku mirov peyva klasîk dibihê, zortir edebîyata kevin xwe di serê mirovî da cî dike. Lê ne tenê ji bo kevinbûnê ew nav lê kirine, belkî ji ber wê hindê navê wê bûye klasîk, ku li pileya xwe da bilind e, xudanê rê û rêbaz û qaide û destûrên taybetî ye û nabe ku ji wan rê û rêbaz û destûrên ku jê ra hatine dananê derkeve. Hegereka dî ya vê navlêkirinê jî ew e, ku ev cure edebîyata di kilas wate di polên xwendinê da

⁴ Adak, h.b, r.32.

⁵ Adak, A. H.b, r. 36-42.

weke nimûneyên here bilind ê fêrbûn û fêrkirinê hatine û dihêne xwendinê. Edebîyata klasîk li bara ruxsarî da dibe du celebê: Klasîka vehûnandî, yan helbest, klasîka piroze yan pexşan. Helbesta klasîk di nav xwe da li bara teşeyê da li ser çendîn navan parve dibe. Ji wan em dikarin van navana bihejmêrin:

1. Qesîde.

2. ‘Xezel.

3. Mesnewî.

4. Ruba’î/Çarîn.

5. Dubeytî.

6. Ferd.

7. Qetiê.

8. Mustezad.

9. Terkîbê Bend.

10. Tercî’ê Bend.

11. Musemet.

12. Tezmîn û... Ji bilî van teşeyana ku di edebîyata gelên rojhelata navîn da hevparin, di Kurdî da sêxiştî û ‘xezlemesnewî jî hene. Jêdera sereke ya sêxiştîyan folkora Kurdên Xorasanê ye. ‘Xezelmesnewî jî taybetî zaraveyê Goranî ye, ku helbestên evîndarîyê yên Mewlewîyê Tawegozî nimûneya here bilind ya vê teşeyê ye.⁶

1.3.2. Edebîyata Klasîk û Ferhengsazî

Têgeha ferhengnasiyê di ferhenga Tirkî de wiha tê terîf kirin, karê nivîsîn û amadekirina ferhengê, nivîskariya ferhengan. Zanista fergengê jî bi heman awayî tê

⁶ Jahany, P., Berawirkirina Beyta Mem û Zînê ya Kurmancî (Varyanta Oskar Mann) Mem û Zîna Mîrza ya Hewramî, Bingöl, Teza Doktorayê, 2020, r. 16.

terîf kirin (TDK, 2009). “Ferhengnasî di ferhengên Kurdî de wiha tê terîf kirin; Bêjeyên zimanekî, digel hemwateyên bêjeyan ya xwe an jî zimanekî din bi awayekî nişan kirin. Lê dewlemendiya zimanekî tenê peyvan û wateyên wan ên cuda nayê hesibandin. Ferheng bîra gelen e, ji dîroka bîr û bawerî û kesayetîya gelan in. Çimkî di her gotinan de rewşa gelan xweya dike.”⁷ Di zimanên Rojavayî da ji bo zanista ferhangan peyva lexsîkografiyê tê bikaranîn em ê jî dewsa vê peyva ferhengsazîyê dê bi kar bînin.

Di edebîyata klasîk da gelek cureyên edebî hene ji van yek jî ferhengên menzûm in. Lewra ji alîyê kêş û teşeyê ve girêdayî rêbaza edebîyata klasîk in. Herwiha ji ber ku bi piranî ji bo zarokan tîn nivîsîn.⁸ Ferhengên menzûm ji bo dersên medreseyan wek çavkanî hatine dîtin û perçeyeke van dersan hatine qebûl kirin. “Amadekirina wan wek karekî hunerî dihat dîtin. Ew ji alîyê qewareyê ve piçûk, ji alîyê bikaranînê ve pratîk û ji alîyê jiberkirinê ve hêsan in.”⁹ Ji bo famkirina Qu’ranê hînbûna erebî pir girîng û pêwîst bû. Ji bo hînkirina erebî jî ferheng amrazeke kara bûn. Ji bo vê di Rojhilatê da ferhengên pêşî bi zimanê erebî bûn. Ji ber ku zimanê farisî jî zimanê edebîyatê bû piştî erebî jî ferhengên farisî hatine çêkirin. “Yekem ji nimûneyên ferhengên menzûmên du zimanî ku tê zanîn *Dusturu’l Lugaya* Edîb Natanazzî (m.1106) ye ku bi erebî-farisî hatiye amade kirin. Herwiha di nivê sedsala XII. da Nivîskarê Îranî, Reşîduddîn Wetwatî (m.1182) jî xebate bi vî rengî amade kiriye. Di edebîyata Îslamî da *Nîsabu’s-Sibyan* a Ebû Nesr Ferehanî (m.1221) yek ji girîngtirîn ferhengên menzûm a erebî-farisî ye. Vê berhemê tesîreke mezin li ser berhemên heman cureyê kiriye. Li erdnîgarîya Anatolya, yekem nimûneyên ferhengên menzûm bi erebî-farisî bûn. Nimûneya pêşî ya ku tê zanîn *Zuhret’ul-Edeb* a Şukrullah e ku di sala 1242an da hatiye nivîsin. Wek yekem nimûneya erebî-tirkî ya di vî warî da *Lugat-i Ferîşteoglu* ya Ebdulletîf bîn Melek tê qebûlkirin. Wî ev berhema xwe di sala 1392an da nivîsandîye. Di hînkirina ziman a klasîk da çavkanîyên herî mezin ji ferhengên menzûm pêk dihat, berhemên “hecmê wan piçûk feydeya wan zêde û jiberkirina wan hêsan” hatine wesifkirin.”¹⁰

⁷ Işık, Ü., Kürtçe Sözlükler Üzerine Bir Çalışma, Yüksek Lisans Tezi, Muş, 2017, r. 5.

⁸ Doskî, T. İ. (2009) “Hevpeyvîna Kovara Nûbiharê, hevpeyvîner: Ayhan Gewerî, j.107, r.69.

⁹ Pertew, R., Ferhenga Kerbelayî “Mîrsad’ul-Etfal, İstanbul, Weşanên Nûbihar, 2012, r. 11.

¹⁰ Öz, Y., “Tuhfe-i Şâhîdî Şerhleri”, Selçuk Üniversitesi Fen-Edebiyat Fakültesi, Konya, 1999, s. 5.

Ev ferhengên menzûm bi piranî di dibistanên zarokan da ji bo hînkirina zimanekî din dihatin bikaranîn. Ev ferheng bi helbestkî bûn ji ber vê jiberkirina wan hêsan bû. “Ji bo perwerdehîya jiberkî, rêya herî hêsan ferhengên menzûm bûn, dikare bê gotin encameke hizrî ya vê pergalê ye. Ev ferhengên menzûm ên di hundirê honandineke wateyî da hatiye dayîn, hem wateya peyva nû dide hînkirin hem jî bikaranîna pratîk a vê peyvê dide. Bi vî awayî bikaranîna peyvan a di jîyana rojane da hêsan dibe û zindîbûna zimên tê parastin. Di hînkirina zimanên bîyanî da hêsanîkirina bilêvkirin û ji bo girîngîya nîrxên çandî were fêmkirin roleke wan a girîng heye.”¹¹

Di warê farisî-tirkî da yekem nimûneya vî cureyî di sala 1400an da bi navê *Tuhfe-î Husamî* ji alîyê Husam bîn Hesên ve hatiye nivîsin. Di nav ferhengên menzûm ên farisî-tirkî da berhema ku herî tê naskirin *Tuhfe-î Vehbî* ya Sunbulzade Vehbî (m.1809-10) ye. Ev berhem di navbera salên 1798-1909an da 58 caran hatiye çapkirin. Ev yek jî girîngîya berhemên vê cureyê nîşanî me dide.”¹²

Di edebîyata kurdî da yekem ferhenga menzûm *Nûbehara Biçûkan* a Ehmedê Xanî ye. Di sala 1683an da bi erebî-kurdî hatiye çêkirin. Piştî vê şagirtê Ehmedê Xanî Îsmalê Bazîdî bi navê *Gulzar* ferhengeke bi sê zimanî nivîsiye. Ev ferheng bi zamanên erebî-farisî- kurdî hatiye nivîsin. Şêx Marûfê Nodeyî di sala 1790an da bi navê *Luxatnameyî Ehmedî* ferhengeke du zimanî erebî-kurdî ye bi zaravayê soranî hatiye nivîsin. Di 1870an da Elî Ekber Kurdistanî bi navê *Ferhenga Kurdistanî* ferhengeke kurdî-farisî çêkiriye. Ferhenga Kurdistanî, yekem ferhengeke ku kurdek li ser bingeheke zanistî û pexşanî ferhengeke zimanên din çêkiriye. Dîsa Şêx Mihemed Kerbelayî ji bo zarokan ferhengek amade kiriye. Navê vê ferhengê *Mîrsad’ul-Eftal* (Şahrahê Kûdekan) e, di sala 1912an da bi sê zimanan kurdî-farisî-tirkî hatiye nivîsandin. Yekem ferhenga birêkûpêk a derbarê zimanê kurdî hatiye çêkirin, ferhenga rahîbê Îtalyanî Maurizio Garzonî ye. Garzonî ev ferheng di sala 1787an bi navê *Grammatica e vocabolario della lingua Kurda* (Gramer û Ferhenga Zimanê Kurdî). Piştî van ferhengan gelek ferhengên kurdî yên bi rêbazên zanistî û modern hatine çêkirin. Lê dema me ev tez amadedikir tu ferhengên kurdî yên

¹¹ Akçay, Y., “Manzum Sözlüklerin Modern Sözlükçülüğe Uygulanabilirliği”, Turkish Studies, Volume 4/4, 2009, S. 35-42(30-46).

¹² Pertew, R., Ferhenga Kerbelayî “Mîrsad’ul-Eftal, İstanbul, Weşanên Nûbihar, 2012, r. 11-12.

edebîyata klasîk bi kurdî-kurdî tunebûn. Hevî dikim ev xebatê di vî warî da kêmasîyekê telafî bike.

Herwekî tê zanîn gelek berhemên edebîyata nivîskî di bin tesîra dînê îslamê û zimanê erebî, çanda Îranê û zimanê farisî da hatine nivîsin. Ev wek edebîyata klasîk tê binavkirin. Di edebîyata klasîk da li gor mijaran wek mesnewî, siyer, mewlûd, meqtel gelek cureyên nezmê hene. Ferhengên menzûm jî cureyek ji edebîyata ji edebîyata klasîk in.¹³ Lewra ji aliyê kêş û teşeyê ve girêdayî rêbaza edebîyata klasîk in. Herwiha ji ber ku bi piranî ji bo zarokan tên nivîsin.¹⁴

Di zimanên rojhilatî da tradîsyona ferhengnivîsîya menzum gelek kevn û berbelav e. Lewra di pergola perwerdeyê ya medreseyan da ji bo zarokên ku nû dest bi xwendinê kirine telqîn û ezber wek rêbazên sereke yê hîndekarîyê ne. Bi taybetî ji bo hînkirina zimanê erebî ku zimanê Qur'anê ye, ev rêbaz gelek girîng in.¹⁵

1.3.3. Menzûme

Metnên menzûm ên ku di dîwanan da cih nagirin û bi awayekî serbixwe hatine nivîsin wek menzûme tên binavkirin. Dikare bê gotin di edebîyata klasîk da kurt be yan dirêj be, teşeya wê ya nezmê mesnewî be, yan tiştêkî din be ferq nake hemû metnên edebî yê ku derveyî dîwan, dîwançe dimînin dikevin wê kategorîya menzûmeyê. Ji aliyê teşeyên nezmê ve menzûme li ser du kategorîyan dikare bê dabeşkirin. Yê ku bi teşeya mesnewîyê hatine nivîsin û yê ku bi teşeyên din hatine nivîsin. Di menzûmeyan da herî zêde teşeya mesnewîyê hatiye bikaranîn.¹⁶ Heger ji van herdu teşeyan mînak bidin; Mem û Zîna Ehmedê Xanî menzûmeya mesnewî ye, Nûbihara Bîçûkan jî menzûmeya ne teşeya mesnewî ye yanî ferhenga menzûm e. Mijarên menzûmeyan lîrik nînin, bi piranî dînî, dîrokî, exlaqî û dîdaktîk in. Dîwan lîrik in, menzûme jî dîdaktîk in. Di nav menzûmeyan da mesnewî û ferhengên menzûm cihekî girîng digirin. Em ê li jêr bi kurtasî cih bidin mesnewîyê û bi taybetî li ser ferheng, ferheng sazî û ferhengên menzûm bisekinin.

¹³ Levend, A. S., Divan Edebiyatı, İstanbul, Enderun Kitabevi, 1984, r. 636.

¹⁴ Doskî, T. Î. "Hevpeyvîna Kovara Nûbiharê", hevpeyvîner: Ayhan Gewerî, 2009, hj.107, r.69.

¹⁵ Pertew, R., h.b, r .11.

¹⁶ Adak, A., Teşeyên Nezmê Di Edebîyata Kurdî ya Klasîk Da, İstanbul, Weşannên Nûbihar, 2019, r. 93-94.

1.3.3.1. Mesnewî

Mesnewî bi wateya ferhengî dudo dudo ye û peyveke bi binyada xwe erebî ye lê di erebî da nayê bikaranîn. Di edebîyatê şeklên nezmê yên di heman kêşê da û her malik di nav xwe da cihê cihê biserwa ra mesnewî tê gotin. Bi du malikan dest pê dike heya 20-30 malikan mesnewîyên kurt jî hatine nivîsîn bi hezar malikan çîrokên dirêj û pirtûk jî hatine nivîsîn ¹⁷ Ji wan berhemên ku ji alîyê ruxsarî ve bi terzê mesnewîyê hatine nivîsandin û bi tena serê xwe ketine nav du bergan, yan jî weke berhemeke serbixwe hatine hesibandin ra “mesnewî” tê gotin.¹⁸

Di mesnewîyan da malik hem cihê cihê jî biserwa ne hem jî her malik di nava xwe da wateya xwe temam dikan û pêwîst e ji malikên din derbas nebe. Di nava malikan da tenê bala xwe didin yekîtîya mijarê. Mesnewî bi piranî lîrik in û mijarên wan evîndarî ye. Ji pênc mesnewîya ra jî xemse tê gotin. Xwedîyê yekem xemseyê helbestvanê faris Nîzamî ye. Ji xemseya ra ‘pênc genc’ jî tê gotin. Mesnewî malê edebîyata farisan e, ji wir derbasî edebîyatên, kurd, ereb û tirkên bûye. Di edebîyata kurdî da çend mînakên mesnewîyê ev in: Mem û Zîna Ehmedê Xanî, Yûsif û Zuleyxaya Selîmîyê Hîzanî û Leyla û Mecnûna Xanay Qubadî ne.

Bi giştî em dikarin pişkên mesnewîyê yên giring weha bidin rêzê:

1. Besmele.
2. Tehmîd.
3. Tewhîd.
4. Munacat.
5. Ne’t.
6. Medhîye.
7. Mê’racîye/ Şefa’et.

¹⁷ İpekten, H., Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz, İstanbul, Dergah Yayınları, 1994, r. 49.

¹⁸ Adak, A., Destpêka Edebîyata Klasîk ya Kurdî, İstanbul, Weşanên Nûbihar, 2014, r. 453.

8. Sebebê Teilîfê kitabe.

9. Saqîname.

10. Mu'xenîname.

11. Çîroka mijarê.

12. Ixtitamîye

1.4. FERHENG Û DÎROKA FERHENGSAZÎYÊ

1.4.1. Ferheng Çi Ye?

Ferheng ev e; berhema ku rêjeya maldarîya zimanekî li ber destê mirovan radixîne. Ev e keleha ku peyvên li ber mirin û windabûnê ne, herwiha peyvên ku zimanzan dikarin li ser bixebitin û termên nû ji wan çêkin, diparêze. Zimanzan dikarin bi vekolîna di ferhengan da zanistên formolojîya zimanekî, semantîk fonologî û fonetîkên zimanekî bi pêş da bibin. Ferheng dikare peyvên jîbîrbûyî careke din vejîne û bi gîyan bike. Ferheng û ferhengsaazî, di mêjûyê neteweyan da nîşana zindîbûna her neteweyekîye.¹⁹

Nîşana îstiqrar û rûniştina civakê ye jî, û berî her tiştî medenîyet e. Ji bo vê yekê jî, ji ber ku kesê ferhengekê dinivîsîne, xwedan hişekî di axa şaristanîyê da şîn hatiye, loma jî yekem yekem ferhenga derbarê zimanê kurdî û bi rêkûpêk ne kurdan nivîsîye, belê kesekî îtalî bû ku navê wî Maurizio Garzonî (1734-1804) bû ku yekem berhema Ewropî li ser zimanê kurdî nivîsîye. Wî di sala 1787an da kitêba xwe ya navdar *Grammatica e vocabolario della lingua Kurda* (Gramer û ferhenga zimanê kurdî) li Romayê hatiye çapkirin. Heta dawîya sedsala nozdeh û destpêka sedsala bîstan jî ferhengên li ser bingehên zanistî û bi qaîdeyên akademîk yên derbarê zimanê kurdî da bi destê Ewropîyan hatibûn amadekirin. Xwedîyê ferhenga kurdî-erebî ya navdar el Hediyye el Hemîdiyye ku li Stenbolê di sala 1892an da çap kiribû, ew jî ne kurd bû. Yusif Dîyadîn Paşa.

¹⁹ Dost, J., Ferhenga Kurdistanî (Elî Ekber Kurdistanî), İstanbul, Weşanên Nûbihar, 2010, r. 5.

Nayê zanîn ku ferhenga ewil li ku derê û bi kîjan armancê hatiye nivîsîn. Lê belê ji ser nivîsên tabletên kilî ve meriv dikare bibêje ku tarîxa ferhengê digihîje Akadan û Medan (B.Z. 2600) ku bi hezaran sal berê niha bûne. Lewra tê zanîn ku Babîlî û Akadî, ji bo fêmkirina zimanê sumerî, peyvên hemwate di forma ferhengê de li ser tabletên kilî nivîsîne. Ev kitabe, di heman demê de nimûneya ewil ya ferhengên du zimanî ye. Heta salên 1990î wisa dihat texmîn kirin ku ev kitabe ferhengên ewil in. Lê belê piştê vekolînên salên 1990î hate îddia kirin ku însan di pêşiya fêrbûna zimankekî din de fêrbûna zimanê xwe û parastina zimanê xwe hewce dibîne. Ji ser vê fikrê ve hat îddia kirin ku ihtimal heye însan di pêşiya ferhengên du zimanî de ferhengên yek zimanî nivîsîbin. Ji ser vê feraziyeyê ve vekolîneran bawer kirin ku ferhengên weil ne ferhengên du zimanî ne, divê ku ew yek zimanî bin. Bi vê texmînê ve tarîxa ferhengan heta heyama Misra Antîk çû.²⁰

Ji bo zindîkirina neteweyan ferheng roleke mezin dilîze. Heger ziman avahîyek be ferheng jî bingeha wî avahîyê ye. ‘Di edebîyata klasîk a îslamî da hin menzûme bi cureyê ferhengê da hatine nivîsin ku ew cureyê serbixwe ya berhemên edebî tîne qebûlîkin. Di edebîyata kurdî ya klasîk da jî komê berhemên menzûm ku dikevin cureyê ferhengê menzûm hatine nivîsîn. Ferqa van ferhengan ji ferhengên asayî ew e ku menzûm in, ne pexşan in. Ferqeke din jî ew e peyv ne xal bi xal bi şêwazeke edebî û di nav bi kêş û serwayê da tîne ravekirin. Ferhengên menzûm ku di edebîyata kurdî ya klasîk da hatine nivîsîn bi piranî du zimanî ne, tenê ferhenga Îsmailê Bazidî Gulzar –erebî-kurdî-farisî- û Mîrsad’ul-Eftala Şêx Mihemed Kerbelayî sê -farisî-kurdî- tirkî- zimanî bû. Di van ferhengan da armanca ferhengnûsan ew e ku xwendekarên kurd bi vegotîneke kurdî fêrî zimanê duyem bikin ku ew jî erebî, farisî û tirkî ne.²¹

1.4.2.Diroka Ferhengsazîyê

Ferhenga yekem berîya zayînê di salên 3000î da ji aliyên Asûr/Akadîyan ve li ser tabletên kilî bi Sumerî-Akadî hatiye amadekirin. Piştî wan Çîn û Yewnanî

²⁰ Baskın, S., "Türkiye ve Dünyada Sözlük Bilimi: Tanımı, Kapsamı ve Diğer Bilimlerle ilişkisi/ Lexicography in turkey and throughout the world: the definition and the scope of lexicography and its relationship with other sciences". International Journal of Language Academy, 2014, r. 446.

²¹ Adak, A., Teşeyên Nezmê Di Edebîyata Kurdî ya Klasîk Da, İstanbul, Weşannên Nûbihar, 2019, r. 95.

ferheng çêkirine. Ferhenga nêzî ferhengên modern jî ji alîyê Arîstophanes ve bi navê ‘Lexicon’ hatiye çêkirin. Bi erebî jî yekem car jib o famkirina hin peyvên xerîb ên di Qur’anê da werin famkirin ji alîyê Ata b. Ebû Rebah ve bi navê Garîbu-l-Qur’an hatiye çêkirin. Xêncî van berhemên wek Garîbu-l-Hadîs û en-Newadir wek xebatên ferhengî hatine pejirandin. Ji ber firehbûn û belavbûna dîne îslamê kesên ne ereb dema erebe hîn dibin û diaxivin çewt diaxivin. Ji bo pêşîya vê bê girtin xebatên ferhengan ên bipergalî hatine çêkirin. Yekem berhema bi vê pergalê hatiye çêkirin Kîtabu-l Ayn’a Xelîl b. Ehmed e. (m.791).

Ferhengên bi erebî hatine amadekirin bi van cureyan hatine amadekirin; li gor jêderk, alfabe, mijar û qaliban li ser çar bingehan hatine çêkirin. Ev pergal piştê jî bi xwe ra bûne ekol û berhemên bi jêderkê ve hatine amadekirin, deng û pergalên taklîb bûne ferhengên herî navdar. Ekola duyem jî, li gor rêzmendîya allfabeyê hatine saz kirîne. Pirtûka Şeybanî ya bi navê Kîtabu-l Cîm tenê li ser du tîpên rayeka peyvê ve hatiye rêzîkirin û yekem mînaka vî cureyî ye. Ya herî navdar jî ji tîpa serî heya ya dawî bi rêzeke alfabetîk ve hatiye amadekirin, Mucmelu-l-Luxa ya Îbn Faris e. Li gor tîpa peyvê ya dawî hatiye çêkirin û ji ber vê wek “pergala serwayê” hatiye nasîn jî ‘Tacu’l Luxa û Sihahu’l-Arabbiyye ya Cewherî (m. 1009) ye. Berhema li gor tespîtîkirina rayekên peyva bi pergala alfabetîk hatî amadekirin jî Cemheretu’l Luxaya Îbn Dureyd (933) e. Bi erebî ferhengên tegêhî yê li gor mijarên xwe bi berhema Ebû Ubeyd Qasim b. Selman (m.838) el Ğarîbu’l-Musannef dest pê dike. Yekem ferhenga peyvan li gor qalibên morfolojîk disinifîne Dîwanu’l-Edeba Îshaq b. Îbrahîm el-Farabî (m.961) ye. Ferhengên di nivê sedsala Xan ya duyem da tên xuya ferhengên erebî, suryankî, farisî û tirkî ve hatine sînorkirin û di destpêka sedsala XVIIan da pêşketine.²²

Yekem ferhenga tirkî yak u em dizanin Dîwanul Lugatîl Tirk e. Piştê jî serdema ferhengên menzûm dest pê dîkin. Di ware edebîyata Osmanîyan da yekem ferhengên menzûm jib o perwerdehîya zarokan hatiye çêkirin. Di edebîyata kurdî ya klasîk da jî yekem ferheng jib o perwerdehîya zarokan hatiye amade kirin. Bi xwe

²² İsmail Durmuş, “Sözlük”, DİA, C: 37, r. 398-401; Ahmet Topaloğlu, Mustafa S. Kaçalın, “Sözlük”, DİA, C: 37, r. 402-414.

nivîskarê yekem ferheenga kurdî Ehmedê Xanî di destpêka berhema xwe da vê armancê tîne ziman.

Ne jib o sahib rewacan

Belkî ji bo biçûkê Kurmancan²³

Ji van malikan jî xuya ye armanca yekem ferhengên menzûm perwerdehiya zarokan e.

1.4.2.1 Ferhengên Menzûm û Dîroka Wan

Ferhengên menzûm ên bi navên Tuhfe²⁴, nezm, menzûm²⁵ an jî luxat tê zanîn, Bi teşeya nezmê ya mesnewî, ferhengên hînkirina zimanekî bîyanî bi xwe ra kirine armanc û wateya peyvên zimanekî li zimanekî din bi awayekî menzûm didin ra ferhengên menzûm tê gotin. Em dikarin bibêjin ferhengên menzûm bi awayekî menzûm fêkirina zimanekî bîyanî hem hêsan dike hem jî pêşwext dike. Ev ferheng bi rêya jiberkirinê peyvên Qur'anê, rêziman, peyv, çand, nirx, edebîyat û erûz bi hêsanî hînê zarokan dike û ev jî armanca wan a sereke ye.

Bi gelemperî ferhengên menzûm bi heman teşeyê û şeklê tên nivîsîn. Bi teşeya mesnewîyê ve tên nivîsîn û besmele, hemdele, salvele û bi destpêka sebeb-î telîfê pêk tên. Piştra beşa ferhengê tê û dawîya berhemê da jî hatime (encam) heye. Beşên ferhengên menzûm bi gelemperî serenava 'Qita' digre. Navên ferhengên menzûm bi piranî erebî ne hin caran jî farisî ne. Lê navên ferhengên menzûm ên kurdî bi piranî bi kurdî ne.

Ya tê zanîn yekem ferhenga menzum ji alîyê helbestvanê Îranî Reşîduddîn Vatvat ve hatiye nezm kirin.²⁶ Mînaka yekem û qismî ya ferhenga menzûm a du zimanî bi navên Dustûru'l-Luxa û Kîtabu'l-Xalas a ji alîyê Edîb Natanazzî (m. 1106) ve hatiye nivîsandin. Ji bo hînkirina erebî jib o kesên farisî axivan û ji hesanî were

²³ Ehmedê Xanî, Nûbar, Wergera ji tîpên erebî Z. Kaya, Weşanên Roja Nû, Stockholm, 1986, r. 7.

²⁴ Güler, D. A., "Anadolu Sahasında Müstakil Bir Tür Olarak Manzum Sözlükler (Tuhfeler)", Divan Edebiyatı Araştırmaları Dergisi, hj: 23, İstanbul, 2019, r.79(62-83).

²⁵ Akçay, Y., "Osmanlı Dönemi Sözlükçülüğü Ve Karahisarî'nin Şâmilü'l-Luga İsimli Sözlüğü Üzerine Bir İnceleme", Doktora Tezi, İstanbul, 2010, r. 46

²⁶ Akçay, h.b., r. 45.

jiberkirin bi helbestkî û bi piranî agahîyên rêzimanî pêk hatiye.²⁷ Yekem ferhenga menzûm a bi du zimanî ji aliyê Ebû Nasr Mesud b. Ebu Bekr el-Farahî bi navê Nîsabu's-Sibyan bi erebî-farisî hatiye çekirin. Yekem ferhenga du zimanî û zimanekî wê bi tirkî Tuhfe-i Husama Husam b. Hesen e.²⁸ Di nav ferhengên bi tirkî û farisî ya herî navdar û pir nusxe Tuhfe-I Şahidî ya Îbrahîm Dedeyê Muğlali ye.²⁹ Ferhenga girîng a din jî Tuhfe-I Vehbî ya Sunbulzade Vehbî ye. Yekem ferhenga menzûm a bi erebî-tirkî hatiye nivîsîn Lugat-i Ferîşteogluya Abdullatîf b. Melek (1392) e.³⁰ Di kurdî da yekem ferhenga menzûm ya Ehmedê Xanî ya bi du zimanî kurdî-erebî Nûbihara Biçûkan e. Armanca vê berhemê ev e ku; dixwaze bi zimanê dayikê erebî hînê şagirtên di medreseyan da ders dibinin bike.

1.4.2.2. Dîroka Ferhengên Kurdî

Têkiliya dîroka nivîsandin û çapkirina ferhengên kurdî bi dîroka fêrbûna zimanê kurdî ra heye; her wisa têkiliya wê bi tarîxa komkirin û çapkirina nimûneyên folklorî û lîteratûra wan re jî heye. Li ser komkirina bêjeyan nimûneya herî pêşî an jî dîroka ferhengnasiyan Kurdan xebata herî 'ewil Ewliya Çelebî (1611-1682) wextê ku di sala 1655an li herêmên ku Kurd dijîn derketiye gerê lîsteya bêjeyên Kurdî çekiriye tê zanîn. Peyra Ehmedê Xanî (1651-1707) di sala 1683an de bi navê Nûbehara Biçûkan ferhengek amade kiriye. Li ser ferhengan di lîteratûra Ewropeyê de xebata ewil a derheqê zimanê Kurdî gramatîka û ferhengoka Garzonî tê zanîn. Zimannasê bi 'esle xwe polonî M. Auguste Jaba (1801-1894) ferhengek bi Kurdî-Fransî amade kiriye. Di sala 1879an de li bajarê Petersburgê Alman Ferdîmand Justî li ser vê ferhengê xebitî û çapkirî. Der barê ferhengan de xebata herî mezin bi destê nivîskar û zanayên Kurd li Iraq-Îran û li yekitiya sovyetê hatiye kirin. Li herêma Iraqê Gîwî Mukriyanî (1920-1986) ferhengeke gelek giranbaha û bi qîmet amade kiriye. Pişt re li herêma Rusyayê bi taybetî Qanatê Kurdo, Farîzov, Bakoev, Maksimê Xemo,

²⁷ Öz, Y., "Tarih Boyunca Farsça-Türkçe Sözlükler", Doktora Tezi, Ankara, 1996, r. 53.

²⁸ Arslan, A., "Tuhfe-i Hüsâmî (İnceleme, Çeviri Yazılı Metin, Dizin)", 2016, r. 7.

²⁹ Kılıç, "Bosnevî Mehmed Necîb Sübha-i Sıbyân Şerhi Hedîyyetu'l-İhvan", 2007, r. 10.

³⁰ Muhtar, C., "İki Kur'an Sözlüğü Lugat-ı Ferîşteoğlu ve Lugat-ı Kânûn-ı İlâhî", Marmara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Vakfı Yayınları, İstanbul 1993, r. 30

P.Lêrx, M. U. Khamoian û hwd. Ev xebatên ku hatine kirin ji bo dîroka ferhengnasiya Kurdan re bûne binyad.³¹

Yekem ferhenga kurdî ya menzûm *Nûbihara Biçûkan* a Ehmedê Xanî ye. Ev ferheng bi kurdî-erebî ye. Ji bo di medreseyan da hînkirina erebî û zimanê Qur'anê bi zimanê kurdî hatiye nivîsandin. Di edebîyata kurdî da ferhenga menzûm a duyem jî *Gulzar* 'a şagirtê Ehmedê Xanî Îsmâîlê Bazidî (1655-1710) ye. Bi sê zimanan kurdî-erebî-farisî hatiye amadekirin. Lê mixabin nusxeya vê berhemê di desten me da tune ye. Ferhenga Şêx Mer'uf Nodeyî (1753-1837) di sala 1790î da nivîsî bû *Luxetnameyî Ehmedî* jî ferhenga menzûm a sêyem e. Ev ferheng bi kurdîya soranî bi kurdî-erebî hatiye nivîsandin. Mîrsadu'l-Etfal (Şahrahê Kûdekan) jî di sala 1912an da ji alîyê Şêx Mihemed Kerbelayî ve bi kurdî-farisî hatiye amadekirin. Di vê ferhengê da 1155 pêyvên kurdî wateyên wan ên bi farisî hatiye nişandan. Ferhenga *Luxetnameyî Ehmedî* bi navê Kitêbî Ehmedê Luxetî Kurdî û Tatî (erebî) di sala 1926an da ji alîyê Seyîd Huseyn Huznî el-Huseyn Mukrîyanî ve hatiye çapkirin. Heya 1936an çend caran hatiye çapkirin. Bi 1350 peyvên pêk tê hê jî di Başûrê Kurdistanê da di hin cihan da wek pirtûka derse tê xwendin.³² Dîsa di sala 2014an da Dilbikulê Cizîrî (Abdulkadir Bingöl) bi navê Nûbihara Mezinan bi zaravayê kurmançî ferhengeke menzûm çêkirîye. Ev ferheng ji Nûbihara Biçûkan a Ehmedê Xanî ra wek nazîre hatiye nivîsandin. Ev ferheng bi kurdî- tirkî bi awayekî menzûm hatiye nivîsandin. Di ferhengê da 13.104 peyvên kurdî û 8268 peyvên tirkî hene û ji 3337 malikan pêk tê.³³ Dîsa bi navê Duruştayî Mirwarî li Îranê ji alîyê Mamoste Evdîlkerîm Muderrîs ve di sala 1970î da hatiye çapkirin. Ev jî bi kurdî-erebî hatiye nivîsîn û wateya 3618 peyvên erebî i kurdî hatiye dayîn. Nûbihara Mizgefta Sîrîyê (Nûbihara Nûciwanan) ji alîyê Evdulsettar Rêkanî ve bi kurdî-erebî bi awayekî menzûm di sala 2014an da hatiye amadekirin. Ji 1330 peyvî pêk tê. Nûbihara Qur'anê ji alîyê Mela Mehmûdê Tîruwayî ve 1000 peyvên diwar ên di Qur'anê da derbas dibin wateyên wan ên bi

³¹ Işık, Ü., Xebatek li ser ferhengên Kurdî, Teza Masterê, Muş, 2017, r. 8-9.

³² Pertew, R., "Mîrsadu'l-Etfal (Şahrahê Kûdekan) Ferhenga Menzûm A Kurdî-Farisî (Vekolîn-Tekst)", Yüksek Lisans Tezi, Mardin, 2012, s. 8-11; Seyfettin Aykaç, "Mela Mehmûdê Tîruwayî û Ferhenga Wî Ya Menzûm (Metn û Lêkolîn)", Yüksek Lisans Tezi, Bingöl, 2016, s. 6-8;

³³ Aykaç, S., "Mela Mehmûdê Tîruwayî û Ferhenga Wî Ya Menzûm (Metn û Lêkolîn)", Yüksek Lisans Tezi, Bingöl, 2016, r. 9

kurdî bi awayekî menzûm nîşan dide.³⁴ Xeynî wan ferhengên menzûm çend ferhengên kurdî yê din jî hene em ê bi kurtasî wan jî bidin nasîn.

1.5. TERMÎNOLOJÎYA FERHENGSAZÎYÊ

Ferhengsazî zanistike ji ber vê hin pîvanên vê û termînolojîyeke vê heye. Termînolojî ve e ku şarezayîya wê li ser têgehan e. Di termînolojîya ferhengan da têgeh xal bi xal tene ravekirin û diyarkirin. Li gor pergaleke rêkûpêk tê dizayn kirin.

Di warê ferhengsazîyê da termînolojiyekî ji terminolojiya gramerê cudatir heye. Ji van têgehan çend heb ev in: tipoloji, klasifikasyon, parametre, madde, pêname, daxuyanî, mînak, kurt kirin, berawird kirin, çavkanî, armanc, rehend, bîwar(boyit) hwd.³⁵

Di ferhengsazîya her zimanê da zimanekî taybet ya ferhengê tê çêkirin. Formulên ku pê xalên ferhengê tene nivîsîn vê zimanê taybet çê dike. Li gel formulên rave, nîşe, kurt kirin û îşaret jî di vê zimanê taybet da cih digre.³⁶

1.6. ARMANCÊN FERHENGSAZÎYÊ

Armanca ferhengê ev e ku wateya peyvan û xalên wê bi waayekî zelal û xweser rave bike. Di çêkirina ferhengan da hişmendîyeke neteweyî heye. Sedema wê tevgerê hem nasîna zimanê xwe hem jî hînbûna zimanekî din û muqayesekirina zimanê xwe û zimanekî din heye. Ferhengsazî jî di nav taybetîyên xwe da zanistike ji ber vê hin pîvan û qaîdeyên wê zanistê jî hene. Em dikarin armancên û pîvanên ferhengsazîyê wiha kategorîze bikin.:

- Armanca ferhengsazîyê ya bingeîn ji bo ku hebûna peyvan ya di ziman de di ferhengê de bê terîf kirin rê û rêbazên zanistî amadekirin e. Her wiha, armanceka wî jî ji bo hînbûnên curbicur amadekirina ferhengan e.
- Yek ji mijarên sereke jî derxistina tipolojiya ferhengan e. Rêbazên ferhengsazîya pratîk jî (dijîtalkirin, faydekarî, rêbazên elektronîk, armancên ferhengan yê civakî û hwd) di pêşxistina tipolojiyê de xwedî bandor in.

³⁴ Aykaç, h.b., r. 9.

³⁵ Işık, Ü., Xebatek li ser ferhengên Kurdî, Teza Masterê, Muş, 2017, r. 11.

³⁶ Usta, H. İ., "Sözlükçülük ve Sözlük Araştırmaları" Modern Türklük Dergisi, 2010, cilt7. hj: 2, r. 97.

Derxistina tipolojiya ferhengan ji bo ku rêbazên ferhengsazîyê yên giştî derkeve holê lazim e.

- Teoriya ferhengsazîyê, ji wê rêya ku bi ferheng nivîsînê ra gav davêje, ber bi rêya dîsîplînekî teorîk ve diçe. Tê xuya ku ev dîsîplîn bi giştî ji sê aliyan ve pêş ketiye: Bi armanca perwerdekirinê, pîrzimanî, zanistî-teknîk.³⁷

Armancên ferhengsazkirinê yên herî girîng qeytkirina peyvên zimanê zikmakî, hînkirina zimanekî bîyanî û çekirin û parastina peyvên zanistî û teknîkî ne. Dîsa ji hînkirin û pêşketina zimanê zikmakî ferheng amrazeke kara ye. Di Xwendingehan da jib o hînkirina zimanên zikmakî li bal rêzimanê ferheng amraza herî girîng e.

³⁷ Usta, H.Î, h.b., r. 97.

BEŞA DUYEM

FERHENG

A

'**Abid**: Perestkar.

Alim hemî şibhê enbîyane

'**Abid** hemî pêkve ewlîyane. (E.X)

'**Abidane**: Bi şêweyê Xwedaperestan.

Peresdaranî.

Zindan li wî bûye çilexane

Rûniştî di wêve abîdane. (E.X)

'**Ac**: Spîtîya ji rengê diranê filê.

Ey dîlbera gerden ji 'ac

Wey nazika mislê zucac (F.T)

'**Acil**: Cîhana berdest, dinya.

Kewneyn-i çi 'acil û çi 'acil

Xemxwarî ne bit, ku têne hasil (E.X)

'**Aciz**: Bêçare.

Ev kalam der vî zemanî mûciz in

Cumle însan ez şebîheş 'aciz in

(Ş.M.C)

'**Adat**: Dab û rêçûn.

Mistewcibê weqtê dîn milaqaq

Bermûcib û miqtezayê adat (E.X)

'**Adil**: Dadwer.

Belku dîlber ji rûyê 'adilî yû

merhemetê Rehmekê kit bi feqiran û

bipirsit gilehê (M.C)

'**Ala û tox**: Nîşan, rutbe, ala.

Tox û 'ala ku xuya bûn ji 'Ecem

'Ereban tîpi şikestin çep û rast (M.C)

'**Alem**: Cîhan. hemî kâinat.

Ey Seyyîdê 'alem bikeperwayê esîra

Ey tacê serê şahan û sultan û emîra

(M.B)

'**Alema Ceberût**: Alema esma û

sifatên Îlahî. Nav û nîşanên Xweda.

Însan bi min nasût e gewher di nêv

sedefê Ji 'alema ceberut e şems hatiye

şerefe Tenezzul ji lahût e mehbûb e

cam di kefe (M.C)

'**Alema dil**: Hebûna Giyanî.

Sewaşek rêhte dîsa 'alema dil

Bi cadûwê du çeşmê fitne engîz (M.C)

'**Alem efrûz**: Cîhan ronîker. Ronîkera

cîhanê.

Naçari diket nifûz-i her rûz

Elbette dibîte 'alem efrûz (E.X)

'**Alema Gil**: Cîhana heriyê, hebûna

maddî.

Xaîb ku dibû ji 'alema gil

Xalib ku dibû li 'alema dil (E.X)

'**Alema xeyb**: Cîhana nedîyar

Tezwîc-i kirin di 'alema xeyb

Te'bîb-i kirin bi emrê lareyb (E.X)

'**Alemî ekber:** 'Alema herî mezin,
kâinat.

'**Alemî esxer:** Cîhana herî piçûk,
însan.

'**Aliyat:** Pîroz, bi qîmet, uxrevî.

Zatê tecella bû li zat, bê îsm û asar û
sifat Sirra hurûfên 'alîyat, xef bû di
sitr û perde da (E.X)

'**Alîsim:** Navbilind, navpîroz.

Ew nusxeya 'alî îsim

Lewhek divê jê ra cisim (M.C)

'**Amê nasan:** Her kesî.

'**Alim:** Zana
Ummulfedail 'alimi, ummurrezaîl
cahilî, Ummulqura ummulbîlad Ke'be
nebi peyxember e (E.X)

'**Alimulxeyb:** Cîhana nediyar.

Ew nurê bi emrê 'Alimûlxeyb,

Bû menşe'yê feyzê 'Alema Xeyb
(E.X)

'**Alî:** Bala, hêja qedirbiha, bilind.

'**Alî himem:** Serbilind.

Her çendî li ba we navî Mem bû
Lê padîşehk 'Elî hîmem bû (E.X)

'**Alîkerem:** Zêde bi dan û bexşîn.

Ger dê hebûya me jî xwedanek

Alîkeremek, letîfedanek, (E.X)

'**Alî meqam:** Payebilind, rêzdar.

'**Alimê xeybê:** Zanayê bi xeybê,
mebest Xweda ye.

'**Alî û Samî:** Bilind.

'**Alîtir:** Bilindtir.

'**Am:** Sal.

'**Am:** e. Giştî, kesên ji rêzê.

Lazim o tertîbê mewlûdî تمام,

Ma ser o vacin, bizanê xas û 'am
(M.E.X)

'**Amel:** Kir û kar, xebat.

'**Amelê salih:** Kir û karên bi kêr û
bêrên ferdî û civakî.

'**Amiyan:** e. Ewaman, gelan.

'**Amî:** Kesên ji rêzê.

'**Aqid:** Girêdayî.

'**Aqîbet:** Dûmahî, dawî.

Kesê çu rahetê zehmet kire noş

Heçî zehmet vexwarî aqîbet noş
(Ş.M.E)

'**Aqîbetilemr:** Aqûbet, dawîya tişteki.

'**Ar:** Xirab, şerm, eyb.

Mi zanî meyla yaran kir di ev car

Wuha go: Çêke çîrokê, bike 'ar
(Ş.M.E)

'**Arif:** e. Xwenas û Xwedênas, zanayê
jêhatî û têgihiştî.

Serçeşmeya feyzê çi ye?

Hatî lîsanê 'arifan (F.T)

'**Arifê ehle bîsaret:** Zanayê ku
têdigihe, heqîqetên kûr dibine.

'**Arifê me'naşunas:** Zanayê jêhatî.

'**Ariyê:** e. Daxwaz.

'**Ariz:** 1.Peydabûyî. 2.Dêm. Ew cihê
dêmê ye ku bisk bi ser da tîn xwarê.

Layê rûyî.bûyera ku nû rûdayî.

Şem'û 'ariz bêtepêş û dil bibîn heta
seher

Dê bibînî sebrekê aramekê samanekê
(P.B.H)

‘**Arizê cananeyê xû:** Dêmê yara xwe.

‘**Arî:** e. Tazî, rût.

‘**Arîfe:** e. Roja berî cejna Qurbanê..

‘**Asî:** e. Serhilder, îsyankar, gunehkar.
Îsmê te ye mektûbe digel îsmê
Xwedayî

Çend muznib û 'asî bi wî navî xefirî ne
(M.C)

‘**Aşiqane:** Mîna evîndaran.

Tumûmê cism û can tê 'aşîqane

Bisûzîne li rahê sadîqane (Ş.M.E)

‘**Aşiqgudaz:** Yak û aşîqan dişewitîne,
mehf dike, aşîqkuj.

Dil bi kî dim ez ji wan, her yek bi
xencan dil dibin

Dilruba yin, canfiza yin, dilber in, aşîq
gudaz (M.C)

‘**Atir:** e. Bêhnxeş.

‘**Atil:** Bêkar.

‘**Azîm:** e. Ew kesê ku dixwaze tiştekî
bike.

Ab: f. Av.

Dilê yarê me ne bû nermî, bi sed ab û
girî.

Ji dilê dilberî ma û berê mermer meke
behs (M.C)

Aba: e. Pîrjimarîya bav e. Pîrjimarîya
ebê ye. Bav û ocax. Bav û kalan.

Abad: Ava, avakirî

Abegîne: Cam, peyal.

Qet munkune av û abegîne,

Ev renga ne ket qebûlê kîne? (E.X)

Abê çeşm: Ava çavan, hêstir.

Derê meyxaneya 'îşqê, seher arif
ziyaret kir

Bi abi çeşm û xwûna dil wudû best û
teharet kir. (M.C)

Abê engûr: Ava tirîyan.

Saqî şewişîn bi abê engûr

Mitrib herişîn bi seytê Sentûr (E.X)

Abê girî: Ava girî, rondik, hêstir.

Abê gul: Gulav.

Sehna rezê bû hewayê bilbil

Şadab-i di kir bi abê gul, gul (E.X)

Abê heyat: Ava jînê.

Abê kewser: Ava kewserê.

Lêv in gelo ya qûtê can, yaqûte ya
qûtê rewan

Ya qutîya durca diran, yan hewza ava
kewser e (E.X)

Abê rewan: Ava ku diherike, gotina
xweşik.

Abi rewan min dîye şî'ra "Mela"

Yunkîrû lil maî lî sû-îl mizaç (M.C)

Abê zemzem: Ava zemzemê.

Abê zendeganî: Ava jîyanê.

Nageh bi rijit ji asîmanî

Serçeşmeyê abê zendeganî (E.X)

Abider: Avdar, têr av, Stewîyayî.

Abi heywan: Ava heyatê, ava jîyanê

Abîdane: Peresdaranî

Abîdar: *f.* 1.Avdar, biav 2.Taze, rohn, birqok, tûj.

Abrû: *k.s.* Heya.

Abrû rêj: *k.s.* Heyabir. Bê heyay.

Ab û gil: Av û ax.

Agir di ab û gil dikit

Qelban ji qelban hil dikit (M.C)

Ac: *f.* Diranê fil.

Acil: 1.Pêşende. 2.Nuha.

Acil: Cîhana derengmayî, axiret.

Adab: Edeb, terbiye.

Ber du birhên te ji îxlas û yeqîn

Me dibir secde bi adabi dua (M.X.S)

Adem: 1.Meriv. 2.Adem Pêxember.

Barî ji “we 'ellem” ku xebardari kirim
Îro tu bizan, Adem ê esma yim ez
(M.X.S)

Ademê esma: Adem pêxember.

Ademî: Ji nîjada Adem, meriv, beşer.

Afaq: Aso, ufûq, asûwan.

Ji sistê şî'rê mewzûnet di afaq

Diket ateş di canê cumle muştâq
(Ş.M.E)

Aferîd: Afirand, çêkir.

Afet: *e.* Musîbet, bela.

Çiqasa afetê dunya û 'uqba

Dibin peyda û tèn coşê wekî ba
(Ş.M.E)

Afirandin: Çêkirin, dahînan

Afitab- Afitab: *f.* Roj, xurşîd, tav.

Fil cumle ji merkeza turabê

Ew zerre gîhane afitabê. (E.X)

Afitaba ref'etê: Ronîya rojê ya dema nîvro.

Afitabê ruxsar: Rûyê wek rojê

Tehqîq-i bi afitabê ruxsar.

Tesdîq-i bi mahîtabê dîdar.

Afitabê şer'ê: Roja şerî'etê: Roja qanûn û bend û mercên îslamê.

Agah: Haydar.

Şubhetê çengê dinalim, hêj ji dest daxa qedîm

Herweki meş'el disojim, dost nizam agah heye? (M.C)

Ah: Axîn û nalîn.

Aha mi: Ax û ofên min.

Ahen: *f.* 1.Hesin. 2.Sert, hişk. 3.Dilhişk.

Ahenmelek: Deng firîşte.

Ahen û seng: Hesin û kevir.

Nêrgiza mest û şêrîn û gul û nesrîn e ji reng

Şeker û lu'luyê mensûr û bi dl ahen û seng (M.C)

Aheste: Hêdî

Aheste kelamekî dibêjit

Di'grîtin û histiran dirêjit (E.X)

Ahim: Ah û nalînên min.

Ahin: Asin, hesin.

Ahînîn: *k.s.* Hesinî.

Aho: Hezal, ask, mambiz.

Ahû: *f.* Xezal, ask

Ahûsifet: Weke xezalê.

Canê xwe me kir daneyê dava ku vedayi Ahûsîfet ew pê hisîya rahî xeta girt (M.C)

Ahûşe: Wekî xezalê ye.

Aj: Çav, filîz.

Al: f. Sor.

Alace: Qumaşê nederûtî, perçe.

Alal: Laleya sor.

Ew rûn e yan gulbergê al, alal e, yan dêma bi xal

Qendîlê Nûra Zulcelal, mir'at e yana mezher e (E.X)

Alaleyê kûhsaran: Laleya li ser çîyan.

Alan: Pêçandî.

'Enberên xemrî yû sosin-alan

Sohr û zer-şitî yû çiçek-alan (M.C)

Alat: Amûr, alav.

Alem: e. Dinya, gerdûn, cîhan

Alema kubra: Gerdûn, kâinat.

Hem bedr û hem zuhra ye dêm

J'wê alema kubra ye dêm (M.C)

Alemefrûz: Rohnîkîroxê gerdûnê.

Aletê îsbatê: "Îlla ellah" (ji bilî Xwedê).

Tu j'nusxey tewhîd mexûn ayetê nefyê

Bê aletê isbatê, ku "Îlla" yim ez (M.C)

Alî: e. Bilind, mezin.

Alîmul-xeyb: Zanayê bi tiştên nepenî

Ew nûr-i bi emrê Alîmul-xeyb

Bû menşê feyzê alema xeyb (E.X)

Alî penah: Alî cenab.

Alî sîfet: Payebilind

Allawne: k.s. Di nav strîyan da mayîn.

Allude: k.s. Tevlihev.

Alode: Pîs, nepaqîj, tamdayî.

Aloz: Tevlihev

Alude: Xumrî. Şilo.

Alûde: Gerav, ne zelal, lewitî.

Jê têtê dil her dem siroş

Lew ev şerab alûde da (M.C)

Am: Giştî.

Amal: e. Pîrjimariya hêvîyê ye.

Aman: Firaq

Aman: k.s. Rica, tika, gazî, hawar.

Amanc: Armanc.

Herdu terefan qebîlê Kurmanc

Bo tîrê qeza kirine amanc (E.X)

Amel: Xebat, kar, kirin.

Nisfîyye me pêlekî amel kir

Tesfîyyeê cewherê dixel kir

Ameşo ser nagirê: k.s. Nikare biçe û bê.

Amê: Dinya.

Amir: Fermanîdar. Birêvebir.

Amirzîgar: Xwedayê ku efû dike.

Xefûr, Xeffar. Bexşîwan.

Xerqê deryayê günah in, teşneyê lutfê heq in

Rehmeta amirzîgar û şefqeyê xeffari bes (M.C)

Amî: e. Ewam.

Amîz: Tevlihev, têkel.

An: k.s. Hinek.

An: f. Wî, ew

An: e. Kat, dem, wext.

Anca: Li wir, di wê qonaxê da, wê demê.

Anê: k.s. Demek, wextek.

Angor, ligor, angore: Nîsbet, bi angorî wî.

Anguşt numay: Navdarê xuya.

Aqar: k.s. Tixûb, sînor.

Ar: Şorek Bêar. Şerm.

Ara: Neqîşand, xemilad.

Aram: huzir, bênfirehî, sekantî.

Ji xalan û xetan dil bûye pare

Ne aram û sebir çibkim, çi çare?
(Ş.M.E)

Aramî: Rehetî.

Arasîte: Xemilandî.

Arasîte bû erûsexane

Dîwar û der û urûşê xane (E.X)

Araste: Xemilî

Arastebûn: Ciwanbûn, xemilandin

Aram û şekîb: Sebr.

Arayîş: Ciwankirin û xemilandin

Arayîşa bîrûn: Ciwankirina bi ser ve
û ya xuya.

Ar: Ard.

Ardlîn: Ardê hûrik yê li dora destarê
aş dimîne.

Arezû: k.s. Xwestek.

Ku hingî arezû lê bûye serkeş

Di destan de nema hîle, di ser heş
(Ş.M.E)

Argûn: Şomîne.

Arif: Naskir.

Ariz: Rexê demî cihê bisk bi ser da tê.

Arizê ti gulgûn: Alîyên rû yê bisk bi
ser da tên, ên gulgulî.

Arizî: Nû çêbûyî.

Arizû: Hêvî.

Arî: Rût.

Arî: ‘Esîl, ‘esîlzade. Arîyanî, Hindû-
ewrûpayî.

Arzûmend: Bihêvî, muştâq,
daxwazker.

Asa: Mîna, weke.

Asan: Hêsan, rihet.

Asar: Pirjimariya eserê ye, berhem,
şop.

Asef: Wezîrê Silêman pêxember.

Asefê berxiya: Di çîroka Silêman
pêxember û Belqîsê da, ew kese ku di
kintirîn demê da textê Belqîs ji
Yemenê anî qesra Silêman pêxember
li Filistînê.

Sed Asefê Berxîya wekî ba

Hemmalî fikir bi erşê, dilşa (E.X)

Asif: Wezîrê Silêman pêxember ku
textê Belqîsê di demeke pir kin da anî.

Asih: As, dara asê ku bi dohn e.

Zanim ji 'îşqê dojhê î

Behrek ji narê asih î (M.C)

Asik: k.s. Xezal .

Asitan: Dergah.

Hem di nîva asîtana Mustefa şadar
bikî

Da ku Mîna subhê Qitmîrî bibîte xakê
der (M)

Asitan nuşîn: Derîdar, yê ku li ber
dêrî dimîne.

Asî: Gunehkar.

Abid bi rîyayekî helakin

Asî bi duayekî di pakin (E.X)

Asîmanî: Ji rengê asîman, heşîn.

Ku lê têt ew qebaya asîmanî

Letîfa şeng û nazik wek belazîz (M.C)

Asîtan: *f.* Dergah, derîzan. Hevş.

Asîyab: Aş.

Eflak-i mîsalê asîyab in

Hemware bi çerx û înkîlab in (E.X)

Ask: Xezal, mambiz

Ast: *k.* Paye, sewîye

Astan: Hewş, derazing, Şêmûk, ber
derî.

Asûde: Hêsan, rehet.

Dibin asûde bê xem nê li hoş in

Bi saya pîrê rindan badenoş in (Ş.M.E)

Asyab: Aşê avê.

Aş: 1 Aş. 2 Aşt û dost.

Aşam: *k.s.* Ew kesê ku tişteki
vedixwe.

Aşifte: Perîşan

Aşifte hal: *k.s.* Kesekî ku halê wî têt
çûye.

Aşikara: Eşker, diyar.

Gava ewî dîn kir aşikara

Dawûdî-yû Sibî-yû Nesara (E.X)

Aşikar: Eşkere, diyar.

Aşîna: *k.s.* Nasî, dost.

Aşîyan: Hêlîn

Aşîyan girt: Hêlîna xwe danî.

Aşîna: Naskirox, naşi, dost.

Da sinbil û sorgul aşîna bin

Reyhan û binefşe ta bi ta bin (E.X)

Aşîyan: Hêlîn

Wî bê dil her li wê mekan girt

Wî bilbil bo xwe aşîyan girt (E.X)

Aşîyanê firqet: Hêlîna dûrbûna dost.

Aşna: Heval, dost

Aşnayî: Nasîn.

Aşufte: Sergerdan, aloz, perîşan.

Aşufte da: Vekir, liba kir.

Medhûş û mestê wê meyê

Şaş û kulah aşufte da

Aşufte dil: Dil şeyda, hêbetî dil.

Ateş: *f.* Agir.

Ew derd-i we bûne behrê ateş

Ew ateşê xem we bûye serkeş (E.X)

Ateşbar: *f.* Agirbar.

Ku şewqa şî'rê ateşbar û goftar

Ji dûr anîme bin darê dilefkar (Ş.M.E)

Ateşe seyyal: Agirê ku diherike,
volkan.

Qedehek bade bi destê xwe li qelbê me
birêj!

Aşîqê suxîte bî, ateşê seyyali çi hez?
(M.C)

Ateşê suzende: Agirê sojek.

Ateşê Tûrê: Agirê ku Mûsa Pêxember
li çîyayê Tûrî Sîna dît.

Ji berqa ateşê Tûrê
 Çi şewqek daye perwanê ! (M.C)
Ateşgeda: *f.* Perestgeha zerdeştîyan
Ateşgudaz: Agirhêlîn
Ateşgede: Peresgeha agirperestan.
 Pûtxane bi agirê dişuştin
 Ateşgede cimlekî vekuştin (E.X)
Ateşîn: Agirîn.
Ateş kirin: Şewitandin, Sotandin.
Ateş sozek: Agirê sojek.
Ateş sûzan: Agir sojan.
Ateş û nîran: Agir.
Ateşxane: *f.* Agirxane, cihê agir dadanê.
Ateşxû: *k.s.* Kesê cirmexweş.
Ateşzede: *f.* Şewitî.
Ateşzen: Agir helkir, heste
Atil: Teral, Tenbel.
 Em xafil û atil û gunehkar
 Mayîne di qeydê nefse emmar (E.X)
Atî: Bide.
Attar: Çerçî.
Ava dehen: Girêz û şilîya dev.
 Aşê dev û çeqçeqa zimanan
 Ava dehen û berê didanan (E.X)
Ava zulûmatê: Ava jîyanê ku li welatê tarîyê ye, kes nagihîyê.
Avê çavê bilbil: Hêsrên bilbilan, hêsrên evîndaran.
 Yarebbî! Bi avê çavê bilbil,
 Yareb! Bi xunavê navê sorgul (E.X)
Awake: Derbeder û bêrê.

Bêhûde çira diki tu feryed?
 Aware diçî dîyarê Bexdad? (E.X)
Awaz: Deng.
 Gulbangê nalenalan awazê ehlê halan
 Dagirtî gund û bajar deşt û çiyayê xalî (H.F.H)
Awer: Bê guman, bawerî, rast û dirustî.
 Çu an pir mekrê heyval î hunerwer
 Temaşa kir bi çeşmê sihrê awer (Ş.M.E)
Awêne: *k.s.* Neynik, mirêk.
Awîng: *k.s.* Xunav, şebnem, avî, avîng.
Awîrû: *k.s.* Avir, îşaret.
Awî gewara: *k.s.* Ew ava ku bi hêsanî tê vexwarin.
Awîz: Hilavêtin. hilperikandin.
 Mela! canê te çawan pehlewani kir
 Li tayê xemrîyan zulfa dil awîz (M.C)
Awî zîndegî: *k.s.* Ava jîyanê.
Awreng: Zanîn û çand.
Awuş: Hembêz. Hembêzkerin.
Axaz: Destpêk. Destpêkirina karekî.
 Axaz-i eger çi rengheyat e
 Encamê heyatê wî memat e (E.X)
Axel: Axûr, cihê ku pez lê mexel tê
Axik: Ax, xak, xwelî.
Axil: Axur, hevş.
Axir: Paş, dawî.
 Fil cumle: çi ewwel û çi axir
 Elqisse: çi mu'min û çi kafî (E.X)

Axiret: Cîhana duyem.

Axiret xirîdar: Kiryarê axiretê. Yê ku axiret standiye.

Ev cennet û eş qumaşê dîdar,

Ey miflisê axiret xerîdar! (E.X)

Axişte xûn: Ter bi xwînî.

Axirzeman: Dawîya demê.

Axiruzzeman: Dawîya demê ku nêzîkî roja qiyametê ye.

Axo: k.s. Gelo, aya.

Axşîx: f. Çar element e.

Axuş: Hembêzkirin.

Axuşte: k.s. Tevî hev, têkel.

Axuft: **Axuftin:** Vebûna birînê piştî qeşmûşgirtinê.

Axûş: f. Hembez, himêz.

Ez û yar ger şevêkê herdu hem axûş bibin Leylet-ul qedr e me ew şev bi Beratê nadim (M.C)

Aya: Gelo.

Ku aya dê çewa bit ev perîşan

Wuha min hişt û çûm ew dil bi êşa (Ş.M.E)

Ayat: 1.Ayetên Qur'anê. 2.Nîşan, îşaret.

Betal kir dîneha mucmel

Bi ayatê bi Qur'anê (M.B)

Ayati Sidqîn: Nîşanên rastîyê.

Ayet:1. Nîşan, şop, elamet. 2. Beşên Qur'anê

Ayeta cemale: Ayeta "Xwedê ronahîya erd û asîman e." (Sûreta

Nûr: 24/35) Rûyê nişana xweşîkî û bedewîyê.

Elif û du lam û hê din me di ayeta cemalê Ji ceger me kir tesellî û ji sîne dest feşandin (M.C)

Ayeta husnê: Nîşana xweşîktîyê û spehîtîyê.

Ayeta kubra: Nîşana mezin ku yekîtîya Xwedê nîşan dide, rû.

Ayetulkursî: Ayeta 255. Di sûretê Beqere da ku qala hinek wesfên Xwedê dike.

Ayetê Furqanî: Ayetên Qu'ranê.

Ayetê husnê: Nîşanên bedewîyê.

Ayetî 'izz: e. Ayeta dawî ya sûreta Îsra.

Ayetê nefyê: Gotina "la îlahe" (Tu xweda tune ye.)

Tu j'nusxey tewhîd mexûn ayetê nefye Bê aletê îsbatê, ku "Îlla" yim ez (M.C)

Ayetî 'efa: e. Sûreta Tewbe ayeta 43yan.

Ayetulleh: Nîşan û berhema Xweda.

Ayey: Nîşan, elamet.

Ayine: Neynik; eyne.

Ev şehê alîcenab, bo salika ayîne bû

Puştiban û keştiban û qiblegah û Ke'be bû (M.E)

Ayîn: 1.Rêûresm, şahî, merasîm. 2.Qedeha bi cam.

Şahid tuyî ez zahidê mehbûbperest im ez

Bê şahidi min nalem şeyxê me ev ayîn
da (E.X)

Ayîn: 1.Wêne. 2.Aheng. 3.Şêwe, awa,
terz.

Ayîne: Neynika ku Îskenderê Mezin
pê ji dûr ve dijaminên xwe didîtin.

Ayîne, ji wan weye ku ave

Ew eksê, ji wan weye ku tave (E.X)

Ayîne ara: Ya/ê godîkê ciwan dike.
Dixemlîne.

Ayîncam: Qedeha camî, qedeha
weke neynikê, safî û zelal.

Ayînesîfet: Weke neynikê,
neyniksîfet.

Perda beşeri dê biçit ayînesîfet kin

Madem tu nekîlê nezerê şubhêxurab e
(M.)

Ayîneya xeybê: Neynika ku xeybê
nîşan dike.

Di dest de camî wek Cem bit

Ji reng ayîneya xeybê (M.C)

Ayîneyê Cem: Peyala Cemşîd li gor
efsaneyan tê da cihan didît.

Wan dîtî di baxêda serayek

Ayîneyê Cem cihannumayek (E.X)

Ayîneyê ruh: Neynika ruh.

Ayn û oyîn: k.s. Hîle û pîle.

Aza: Xurt û pêlwan.

Aza ke misknê xwe jî

Derman de mêlaka me jî (Ş.E.S)

Azadegî: f. Serbestî.

Azan: f. Ez an jî wî, ji wî.

Azana: Wêrekî, bi cesaret.

Azar: Derd, êş, eziyet.

Ahi ji derdê dil dîkit

Herçi ku dî azari çerx (M.C)

Azayî: k.s.Bi wêrekî, bi cesaret.

Azer: 1.Bavê Hz. Biraîm e. 2.Agir.

Ne Azer ma ne Nemrût ma

Di axê mane xusar e (F.T)

Azerde, azerden: Renc.

Ya qenc ewe her bi vê cemalê

Azerde nekim qe zilf û xalê (E.X)

Azeristan: Agiristan.

Azma: Helsengîne, biciribîne.

Azmûn: Îmtîhan

Azordeye: Xemgîn û êşaye.

Azurde: Perîşan. Tahdeyî.

Azurdehal: Dertkêşî, eziyetkêşî.

Azurdenî: Azirandin û êşandin.

Azûrde: k.s. Têkçûyîn.

B

Ba: Digel.

Ba: k.s. Bila.

Ba: f. Bi.

Bab: e.1. Derî, dergeh 2.Bav.

Dixwim sondê bi bab Adem

Bi Incîlê kefendadem (F.T)

Babeser: Bi dîtin, dîtox. Xwedan
dîtin.

Hindî ku ji pêşve baxeber bû

Ew çende ji piştve babeser bû (E.X)

Babet: Mijar.

Îlahî pir dikim zarî libabet

Di heqqê me bike lutf û 'înayet
(Ş.M.E)

Babê Taîban: e. Derîyê tobekaran.

Babê Xeyber: e. Derîyê Kela
Xeyberê.

Babikum: Derîyê we.

Bac: Bac, vergî, xerac.

Cuhtê Hebeşan bi terfet-ûl 'eyn

Anî qederek ji Espehan bac (M.C)

Baç: Baçerê.

Bad: f. Ba.

Bad: Bibe.

Badam: Behîv.

Sipîdarê ku tê de sîmê endam

Çinar û bîdê mişk û cewz û badam
(Ş.M.E)

Bade: f. Mey, şerab

Xaneya bade û mey tê

Muxnîyû hem çeng û ney tê (F.T)

Bademê Siyah: Behîvên reş. Mebest
çavên reş in.

Badenoş: Meyxwir.

Lew şubê daire sergerdan im

Badenoşê qedeşê hurman im (M.C)

Badê Saba: Bayê sibehê, bayê seherê,
nesîmî.

Badihewa: Ji qesta û bê armanc.

'Enqa ne şigara kes e, davan tu biçîn
ver Dava ku li 'enqa tu vedî badihewa
girt (M.C)

Badirê le hîç: k.s. Badayîna tişteki
nebûyî.

Badîger: Yên din.

Bafîtûh: Dilveker.

Bagir: Demsal, mewsîm.

Min dil ji fehmê qasir e

J'wi sûretî çar bagir e (M.C)

Bah: Eşkere.

Ba heqîqet: Berçav, objektîf.

Bahû: Zend û bask.

Bais: 1. Sebeb. 2. Xizan, perişan.

Ew herdune baisê fesadê

Ew bûne sebeb ji bo înadê (E.X)

Ba'îsê def'a bela: Sedemê nemana
beleyan.

Bak: Tirs.

Ji uşşaq û sîgah û ne rûzê bak

Xetimke tu jê meclisa etrînak (Ş.E.A)

Bakim çiye: k.s. Mineta min tune ye.

Bakîre: Dûşîze, xama, keçîn.

Bakûre: 1. Ezep. 2. Nûber, ber û,
fêkîyê nû, nûrûste. Turfanda.

Bal: 1. Bejn, qam, çeng, bask, per.
2. Bazû. 3. Dil, bîr

Bi cunbuş hate cezbe ew bi rewneq
Weşandin bal û perrê kurt î eble
(Ş.M.E)

Bala: 1. Bilind, jor. 2. Bejn.

Her dem peyapey sifre kir

Bala bi bala rutbe da (M.C)

Balate: k.s. Bejna te.

Balateb': Xûypak, elîcenab.

Bala xêz: Bala rakir.

Balgeh: Mûtteka, yastix, balîv.

Balî: *e.* Rizî, rizîyayî, petiyayî

Balîde: *k.s.* Balinde, teyr.

Balîn: Balgeh, balîv, balgî, balîf.

Bal ve: Bi alî ve.

Bamişt: Lehî, lêmişt

Ban: Navê dareke dirêj. Bî, darbend

Ban: Haf, serban.

Banê gerdûn: Jora çerxa felekê.

Dê min 'elema kelimê mewzûn

'Alî bikira li banê gerdûn (E.X)

Binmît: Xuya bike.

Banû: Xatûn.

Ew ahûwê seydegahê wehşet

Ew banûwê barîgah û ulfet (EX)

Ba noşî kat: *k.s.* Noşî can be.

Baq: Deste

Baqe çilke: *k.s.* Şaxên piçûk û nazik
ên darê.

Baqî: Mayî, yê ku namire. Nemir,
ebedî.

Ku da ji nû ve vejî

Baqî bit di heyatê (M.C)

Baqî digerin: Herheyî dibin.

Baqî gerîyan: Zindî bûn.

Wan rê ku birin bi canibê zat

Baqî gerîyan bi zatê zerrat (E.X)

Baqîti: Man, hebûna bi Xwedê.

Baqîyat: *e.* Jêmayî.

Bar: 1.Mêwe, ber. 2.Bar.

Baran ne ji feyzê bit mededkar

Ew dane di bîte nexlê bê bar (E.X)

Bare: *k.s.* Car, defa.

Baregah: *f.* Cih, menzîl, mekan, war.

Barek: Bereket.

Barekellah: Pîroz. Pîroz be.

Va di aşmey hewtî îsmâil zebîh,
'Barekellahû lekî heml-el melîh!'
(M.E.X)

Barê: Ka hela, da em binêrin.

Barid: Sar.

Barigah- Barigeh: Bargeh, mîrnîşîn.

Bargeh, cihê ku padişah lê dimînin.

Barî: *e.* Xweda, yê ku diafirîne.

Dikim hêvî û sed zarî

Li dergahê te ya Barî (M.E.F)

Barîgeh: 1.Eywan. 2.Felek, dunya.

Bê xeyme û barîgah û eywan

Ewran ve di da li ser wî seywan (E.X)

Barî ha: Hunermendê wê.

Barîk: *f.* Zirav.

Barşikî: *f.* Barîna baranê.

Based: *f.* Dibe.

Ba sefa: Bi sefa, bi zelal.

Basil: Ciwamêr.

Basir: Dîtox, kesê dibîne.

Qeyser bi qusûrîya xwe qasir

Hazir gerîya bi eynê basir (E.X)

Basiten: Vezelandî.

Dergehê lutfâ te xanim ma li
mahrûman vebî?

Înne kelben basiten dehren zira'en bil
wesid (M.C)

Baskî: Alî.

Baskî şay tê, henkî çilkî kewtî war;

Se hezar û vîst hezar û zêde çar.
(M.E.X)

Batil: Pûç û vala.

Da îşq-i bi ket kemalê hasil

Hubba we ne ket wîsal-i batil (E.X)

Batin: Hundir û hinav.

Hêja li min bû kerb û kîn

Zahirxezeb batin kenîn (E.X)

Batinî: Bi alî hundir ve.

Batî: Teyrê baz.

Bavê: Biavêje.

Bawefa: Dilsoz, wefadar, biwefa.

Xem lew me di vên, ku bawefane

Na bên eve tehlî-yû cefane (E.X)

Bawes: k.s. Hembêz.

Qendê dirêj in guft û ken

Biskan di lêkir bawesîn (E.X)

Baxban: Baxvan, baxçevan, baxevan.

Baxeber: k.s. Xeberdar, agahdar.
Hayadar.

Baxeber bin: k.s. Biaxivin, xeberdin,
bipeyvîn.

Baxel: k.s. Paxil. Singê mirovî, ji
gerdenê heta nivê singê.

Baxê ridwan: Bihuşt.

Mabûd-i ji bo me hor û xîlman

Tezyin kirine di baxê Ridwan (E.X)

Baxwê: Xwedê, xwedan.

Baxiban: Baxvan.

Baxî: Yaxî, serkêş.

Qeîbê wî digel wî bûye baxî (1)³⁸

Kêşan û keşan gîhande baxî (E.X)

Baxî fedek: Baxeke li nêzîkî Xeyberê
bûye.

Baxî hîret: k.s. Ew baxê ku her kes tê
da sersem dibe. Mebest dinya ye.

Baxoy: Xweda, yezdan

Baxter: Rojava.

Baxuda: f. Li cem Xweda.

Baxwoy: Xweda, Yezdan, Rab.

Bayezîd: Bayezîdê Bestamî. Di
tesewifê da kesayetekî girîng e.

Bayê serser: Bayê sar.

Pêhta ji dilê me dayî ser ser

Hukmê diketin li bayê Serser (E.X)

Bayê şemal: Bayê bakur.

Netrik û şetri û îlan dane ber bayê
şemal Laubalî çardeh xal î, çardesala kê
yî tu? (M.B)

Bayî': Firotox, firoşkar.

Sîretmelekin, suwerperîn e

Ne bayî'în ew, ne mişterîn e (E.X)

Baz: 1. Teyrê baz, şahîn. 2. Bazin.

Di nalin kewkeb û baz in

Hezar rengi di îlhamê (M.C)

Baz: f. Dîsa, dubare, tekrar.

Bazil: Dayox, belavkiro, belavker.

Ey maîlê xejrê bê mikafat!

Wey bazilê meqsed û miradat! (E.X)

³⁸ Di risteya yekem da bi wateya serkêşîyê di
ristaya duyem da jî bi wateya 'bax'ê hatiye
bikaranîn.

Bazî: Lîstin, lîstek, teyrê bazî, teyrê lîstikê.

Kêşane derê bi reqs û bazî

Rexşê erebî, semendê tazî (E.X)

Bazî dîkin: Difirin.

Hin suflewî bazî dîkin

Hin meylê evrazî dîkin (M.C)

Bazîxe: Di çîroka Hîzanî da lehengeka evîndar e.

Bazû: Çeng, mil. Bask, pazû.

Cisman ji hev nabin fesil

Bazû ji bazû şeq ne da (M.C)

Be asanî mezane: k.s. Bi hêsanî hesab neke. Pir hêsan nîne.

Be ba da: k.s. Xist ber ba.

Bebr: Ajeleke kovî ye, piling.

Bebrê cengî: Pilingê şervan.

Belekbelengî: Belek belekî.

Becê ma: k.s. Li pê man, li paş man û neçûn.

Becê nayê: k.s. Bi cî nabe, pêk nayê.

Beççe: f. Zarok.

Bed: Xerab, kirêt, nebaş. Pîs, zîşt.

Eşqerê bed fê'lî, çi hê kir 'ecêb!

Barekellah xweş bezî espê qul e. (M.C)

Be'd: e. Paşî.

Mîn be'dî, xeman ji qelbê ra ke

Teşbîhê bi zilfê ber vi ba ke (E.X)

Be dadayî: k.s. Bê usûlî, usûla xerab.

Bedayî': Tiştên xweşik.

Bedayî': Ji nebûnê hatiye afirandin.

Zahir kirin ev qeder sanayî'

Peyda kirin ev qeder bedayî' (E.X)

Bedbext: Nepak, pîs.

Ji bedbextî şehîd kirine perîşan

Dehenxişk û cîgernar û perîşan (Ş.M.E)

Bedçare: k.s. Çarexerab.

Bedçihre: Rûkirêt.

Beddidîn: Peyda bûn. Belav bûn, ji hev qetîyan.

Eşya li pey hev wellidîn

Yek yek ji weslê beddidîn

Be'de: Hindik.

B'edehum: e. Piştî wan. Di pey wan ra.

Be'dek sifatan hîsse da: Ji hev cihê bûn, tecelî kirin û eşkere bûn.

Bedel: Şûngir, li şûna.

Hin, neqdê wucûda xwe dîkin bê bedel îfna Her yek bi wucûda xwe wucûda te dixwazin (E.X)

Bedel kirin: Guherîn.

Amac-i ku bû mehellê peykan

Durdane bedel kirin bi mircan (E.X)

Bedenşefaf: Ya ku laşe wê ter û nazik û zelal e.

Bed'emel: Karpîs, gunehkar, kiryar xirab. Xirabkar, emelreş.

Wî bed'emelê wekî kîlaban

Barî bike peyrewê sehaban (E.X)

Be der dekewê: k.s. Dîyar dibe.

Bedesil: Esilxerab. Nijadxirab.

Bedewan: Hespan.

Bedewî: Gundî, koçer, konnişîn.

Bedexşan: Welateke ku bi le'l û durên xwe navdar e. Navê cihêkî navdar e li Efxanistanê.

Ji le'lên diyarê e min mey vexwara
Bi dil dê bi bexşî bedexşan, Buxara (E.X)

Bedexter: Bedstêrk, bêyom. Reşbext.
Mîr go: Qe didim, eya bedexter!
Tacdîn û Memê, bi textê Qeyser? (E.X)

Bedfi'al: Xwedî kiryarên ne baş.
Karpîs.

Bedfi'l: Pîskar, karpîs, karxirab.
Bedçehre ji rengê dêwê kabûs
Bedfi'l û sitîzekar û salûs (E.X)

Bedgo: k.s. Ew kesê ku axaftina wî nebaş e.

Bedhal: Perîşan û riswa.
Bîmarê bi derde 'îşqê bedhal.
Nageh fikirîn ku çûne haval (E.X)

Be dihan: f. Bi dev.

Bedil: Şeref, rûmet.

Be dilme: Bi dilê min e.

Bedî: e. Taze, delal, spehî. Delalê xerîb.

Bedî': Bêminak, bêwêne, bênimûne, ne wek tu tiştê din.

Ev karîgeha ezîm û dewwar
Ev barîgeha bedî'û seyyar (E.X)

Bedîd: f. Eşkere, dîyar, kifşe.

Bedîd: Deşt, rastgeh.

Bedî'ê xet: Xeta pir spehî, pir xweşik.

Bedîhî: Eşkere.

Zînê wehe gote wî bedîhî:

Qum ya ceseden nefextu fîhî! (E.X)

Bedî'îlcemal: e. Rû delal, xweş sîma, bedew.

Be dîmen le cû deka: k.s. Di dîmen da wek cihûya xuya dike.

Bedîr: e. Hîva çardehşevî

Bedî'ul îştirak: Bi ciwanî hevbeş in.
Xweşik bi hevra ne.

Vêkra di bedî'ul-îştîrakin
Têkda di serîul-înfîkakin (E.X)

Bed kirdar: k.s. Karên xerab.
Xirabkar

Bedmestî: k.s. Xirabî.

Bednam: Xirabkar, merivê xirab.
Navpîs.

Rûreş ke bi navê xett-û xalan
Bednam-i bike bi Bê û Da'an (E.X)

Bedqelbî: dilxirabî

Bedr: Hîva çardehşevî, hîva tije.
Di bedra dil nezer kir reşmê 'alî
Mûşe'se' bû bi 'şqa yarê halî (Ş.E.)

Bedra kemal: Hîva çardehşevî.
Vêra mi dî bedra kemal

Lêbûn niqab çewkan û dal (M.C)

Bedra tali': Hîva çardeşevî ku derdikeve.

Bedra tamam: Hîva çardehşevî, hîva gilover, yanî dilbera rûyê wê mîna hîvê.

Min dîn li dor bedra tamam

Herfên di mektûb dal û lam

Bedra yasemînê: Hîva bejn yasemîn.

Bed reftar: k.s. Bed kirdar, bed xerab.

Bedrê munîr: Hîva ronî.

Min li ser bedrê mûnir, mektûb dîye neqşê sewad

Ser bi yek anî du nûnan, xettê reyhanî du sad (M.C)

Bedreng: Kirêt.

Ey xameyê serteraşê bedreng!

Bes nameyê xweşqumaşê xweşreng, (E.X)

Bedrûd: Rûzişt, rûxirab, rûpîs.

Însafe bikî tu canê bedrûd?

Derwazeyê ten bi gêrî mesdûd? (E.X)

Bedsigal-Bedsekal: Hizirpîs, niyetxirab.

Bedxwah û bexîl û bedsekalan

Bed'esl û sefîh û bedfîalan (E.X)

Bedsirişt: Xwîyxirab.

Bed tewrim: k.s.Exlaq pîs.

Bedtir: Xirabtir.

Bedû: Bedew, hesp.

Be dûya: k.s. Li dû wî.

Bedxû: k.s. Sincnebaş, xûyxerab, rewîştîpîs.

Bedxwah û bexîl: f. Kesên pîs û nerast. Nebaş û zikreş. Xêrnexwaz, kesê xerab.fesad, dilpîs.

Bedxwah û bexîl û bedsekalan

Bed'esl û sefîh û bedfîalan (E.X)

Bedxwû: Xûyxerab, cîrnexweş

Be'emden: Bi qest, bi mebest.

Befa: Safî.

Be fenaçûnî cesed: k.s. Rizîyabûna laşî.

Be fîdat: k.s Fedayê te, qurbana te.

Begmegizirî: Lîstika beg û gizîr ku zarok tê da kabekê tînin û rûyekî kabê wezîr e yan mîr, rûyek jî gizîr e. Rûyekî kîrêt û qulqulî ye.

Beh: Biha, qîmet

Behaîm: Dewaran. Heywan. Ajelên bê zar û bê ziman.

Da mirşidê bê terîqê haîm

Sergeşte nebit wekî behaîm (E.X)

Behane: Pasaw, mahane.

Hindek ji fesaneyêd-i Bohtan

Hmdek di behane, hin di bûhtan (E.X)

Behaneco: k.s. Bihaerzan, kesê biha nake.

Dûrî mebîne to le kerîmî behaneco

Herçî ke Kurd e pakî bibexşê be bulwefa (MW)

Behce: Husn û şahî, jêhatin.

Be heq: k.s. Ji bo xatirê.

Behê: Bihayê, nîrxê.

Behîtin: Behitand.

Behlûl: 1. Pirken, yê ku pir dikene.
2. Spehî.

Behr: Par.

Bê behrene ew ji îşqebazî

Farix ji heqîqî-yû mecazî (E.X)

Behr: Xatir.

Behra edem: e. Deryaya tunebûnê.

Me bi sehayê wîsala xwe derîn tu ji
Xwedê ra

Wer ne, weqt e ku bibin xerqeyê behra
'edemê (M.C)

Behra muhlikatan: Deryayê kiryarên
ku yekî dibin talûkeyê. Gunehkarî.

Behre: Pişk û par.

Behrec: Betal.

Behre husin: Deryaya ciwanîyê.

Rabû xemilî ji payê ta ferq

Bû behrê husin di gewheran xerq
(E.X)

Behremend: Xwedî par.

Hmdek di heram û hin helal in

Her qîsse ji hîsse behremend in (E.X)

Behrewer: Xwedî par, bimifa,
hevpişk.

Dijmin ku ji îşqê behrewer bin

Bes, dost-i ne dê di mi'teber bin? (E.X)

Behreyn: Her du derya, Her du
deryayên ilmê zahir û ilmê batin.

Bi xewwasî bi sehharî

Te dur anîn ji behreynê (M.C)

Behrê atêş: Deryaya agir.

Ew derd-i we bûne behrê atêş

Ew atêşê xem we bûye serkeş (E.X)

Behrê maî: Deryaya avî. Ava ku di
malzarokê da zarok di nav da ye. Ava
amniyosî.

Geh xûtê dixut di behrê maî

Rengîn dibitin demek dîmaî (E.X)

Behrê Tacîk: Deryaya farisan, mebest
artêşa Sefewîyan e.

Behrî muhît: e. Okyanûs, umman.

Behrî sawa: Navê goleke li Filîstînê
ye.

Behter: Bêtir, pirtir.

Behr û berr û şerq û xerbê 'alemê:

Derya û deşt û rojhilat û rojavayê
gerdûnê.

Be'id: e. Dûr, dûrî.

Fîraqê têk hirqet e

Be'id e ji xeyalê (M.C)

Be'îr: e. Hêştir.

Bejna elîf: Bejna narîn mîna tîpa elîfê.

Bejn û Buhtan: Welatê kurmancan.

Gulê baxê iremê Buhtan im

Şebçiraxê şebê Kurdistan im (M.C)

Be kem megre sirûşk: k.s. Hêstiran
kêm û bê biha nebîne.

Be kes neywitwe 'ilmî kîmya qet:

Gihiştina min wekî 'ilmê kîmyayê ye,
kes vê 'ilmê hînê kesekî din nake.
Yanî tu ebed nagihê min.

Bekke: Bajarê Mekkê.

Biskan bi werîne ser hîlalan

Sewda ke di Bekkeyê Bîlalan (E.X)

Bekr: Ebû Bekir, xelîfeyê yekem û hevrêyê pêxember, bavê Hz. Eyşeyê ye.

Bekr, ‘Umer, ‘Eli û ‘Usman: Çar xelîfeyên pêşîn yên îslamê ne.

Bo-Bekr û Umer herdu ji huba te dinalin Meqtûl ji fîraqa te çi Osman û Elî ne (M.C)

Bekra: Keç, keçînî, bakire

Be kul: *k.s.* Bi gelemperî, bi tamamî. Bi tevayî.

Bekullî: *k.s.* Yekser.

Bek û dekk û sek: Kutan.

Bela: Êş û jankêşî.

Geh geha ew eşkera ne

Her di nêv amê bela ne (S.)

Belaco: *k.s.* Ew kesê ku li belaya xwe digere.

Be la da dê: *k.s.* Bi vî alîyê ve diqîqile.

Belan: Erdê rast û germ, berrî, deşt.

Belaş: Bêpere.

Her çend bidî mal û meaş

Umrê ku çu nayête paş

Da hûn nedin êdî belaş

Xwe kar bikin j'bo mirinê (M.E.F)

Belakeş: Jankêş.

Çikû nabûyî bulbul ey belakeş

Bi vî wechê qebîh û sewta naxweş (Ş.M.E)

Belawey kird: Belavbûn.

Belaxet: Hunera xweş peyvandinê, duristaxaftinê: peyvandin û axiftina bi angonî îcaba halê, di cîhê wî da.

Belaxet der suxen hate zuhûrê

Keramet ba suxen hate zuhûrê (Ş.M.E)

Belayê asimanî: Bela asîmanan.

Dayîneke wan hebû zemanî

Teşbîhê belayê asîmanî (E.X)

Belazîz: Kulîlkeke mor.

Belazîz Lûle bûn, Beybûn bihîn dan

Gula min kanê? Sed carî heware ? (E.X)

Belexşan: Le'l.

Di camê mey belexşan bû

Bi feyrûzê cela daye (M.E.C)

Bellix: Bîgehîne.

Belîx: Yê xweş bêj û xweşpeyv, xweyê belaxetê.

Mîr û mela û mahîran, çendî belîx û şaîran "Xanî" û hindî haziran, dade! ji ber belayê zulf (E.X)

Belîxane: Bi belixî, bi xweşpeyvî, xweşgoyî

Belke: *k.s.* Belkî.

Bella: Bela, mûsîbet, bobelat.

Belorî: Tiştê ji belûr çêbûne.

Belqîs: Belqîsa jina Silêman Pêxember. Şahjina Yemenê.

Qet nema Hudhud xuyabît j'Belqîsa mesken-Seba

Pê mufferreh bit Suleyman mutmeîn bit canê ma (S.)

Belûqîya: Cihûyekî hilekarbûye. Yekî cihû ye û bi nebaşbûna xwe ve tê nasîn.

Belwa: Bela, tecrîbe. Bela û zorî.

Bem çawe: k.s. Bi vî çavî.

Bemujgan: f. Mijang.

Benagoş: f. Bineguh, penka guh.

Benan: Sertilî.

Benat: Keç, keçin. Armanç ji vê, Rihber (meriv û ajal) û hêşînayî û kanza ne. 2. Navê heft stêrkan e ku jê ra komika sêwiyan dibêjin.

Çar umehat in, sê benat

Her bê qerar in bê tebat (M.C)

Bend: 1.Girêdayî, hêsir, dîl. 2.Girêk, movikên qamûşê.

Bend û zincir dê vebin, cerhên di kul dê xweş bikit

Lew ku navê dilberê dermanê derdê bende ye (M.C)

Benda bendê: Girêka benda zulfe.

Benda girêdan: Benda berstûkê.

Bende: Xulam, benî, kole, evd.

Bi weslê suhbetek da min

Kirim bende di fermanê (E.X)

Bendegan: f. Benîyan, koleyan.

Bendeha: f. Piranîya “bende” Benîyan, koleyan.

Benda Heyderî: Girêdana Heyderî, lixwekirina Heyderî. Kemer, pişte.

Kewkeb û qewsê qezeh, lu’luê benda heyderî

Tên tewafa zulf û xalên dilrûbayê rast û çep (M.C)

Bendewar: Çavîrê, hêvîdar.

Biskê siyah zêr dane ber

Esîr û bendewar im ez (Ş.E.S)

Bend im: Girêdayî me.

Bendî: Girtî.

Dayîn û Sitî û ew perestar

Ew bendî û hebsî û giriftar, (E.X)

Bendîd: Bend, helbest.

Der axuşêş çû mîared, ke ez. dil canêş buspared

Ceres firyadê mîdared ke ber bendîde mehmil ha (M.C)

Bend kirin: Ez girêdam.

Bend nakît: Girênade, zevt nake.

Bendnam: Navxirab, Kesê navê wan bi xerabî belav bûye.

Bend te kirim: Te ez girêdam.

Bend û baz: Hunermendî.

Li sersinga te ya gewr bisetrencê dilîzin Lîskeyan û bend û baz bi xurtî tîn semayê (S.T)

Beng: Gîyayekî serxweşker. Gîyayekî ku merivan serxweş dike. Gêj û sersemi.

Bêjin ku mûqeddîme çî rene

Ev Hîrete yan xîyalî benge (E.X)

Bengal: Hîndistan.

Bengî: Ew kesê ku bengê dikişîne.

Bengîn: Ji bengê hatiye wergirtin û mebest xavî û nazikîya çavan e.

Ebrûhîlalan dîn kirim

Wan awiran bengîn kirim (Ş.E.S)

Bengkêş: Serxweş.

Benî: Xulam, qûl.

Sed carîye û dused benî çûn

Zerbefte lîbas û zerbenî çûn (E.X)

Benye, bekke: Ke'be

Be pakirdin: k.s. Qiyamkirin, rabûn.

Beqa: Man û hebûna her û her.

Ya Reb bide dewamê, î'zaz û îhtîramê

Tûla beqa û muddet, sed salik ê celalî
(H.F.H)

Beqayê bilheq: Mana bi Xwedê.

Hebûna bi rêya Xwedê.

Be qed: k.s. Bê pîvan.

Beqed xoya deka: k.s. Dixe ber xwe.
(Ji bo xençerê)

Be qirr de: k.s. Ji hole rake.

Beqq: Pêşû

Ber: Li ser.

Ber: k.s. Berhem. Mêwe, ber, fêkî.

Ber: 1.Kevir. 2.Bergeh. 3.Mêwe.

Berah: Rabûn, terkkirin.

Bera kir: Tûj kir.

Beramberî: Burcek li asîman.

Ber an asitan: Li ber wê asitanê, li
ber şemika derî.

Bûse-zenan her kî ber an asîtan

Mekkene min cubhetî hî la berah
(M.C)

Berat: e. 1.Şeva beratê ya 15ê meha
Şebanê. 2.Nîşan, elamet, fermana
padişah. 3.Bereket.

Subh û evarî şeva tarî şemala ke yî tu
Leyletu'l-qedr û Beratên nûr mala ke
yî tu (M.B)

Beratê husn: Nîşana rindîyê, sembola
bedewîyê.

Çi beratê husn e ya Reb, bi nîşanê
padişahî

Bi teref du turre tuxra weh bi mawerê
reşandin (M.C)

Beratê padişahî: Fermana padişahan
ku li pêş xelqê dihate xwendin.

Berayîk: Yê pêşî.

Berbad: Kavil, xerab, xopan, pûç.

Cem'îyyetê xasê agir û bad

Elbette diket mirov-i berbad (E.X)

Berbeste: Li ber girêdayî li ber danî.

Ber bike: Bişope, li xwe bike.

Ber bû: Pirîsk da. Vêket.

Ber bû me: Ber bi me hat.

Berbûye: Berbûn; herikîn çûna ber bi
tiştêkî ve.

Bercîs: Sitêra Mişterî, Jûpîter; nişana
bextê spî ye.

Kêwan-i di Delw'êda nîhan bû

Bercîs-i di Hûtê bînîşan bû (E.X)

Berçelan: Zozaneke Hekkarîyê ye.

Berd: Serma, sar.

Bidit qelbê weki dojêh

Li ber dojah dibit berd e (M.C)

Berde: Dîl, hêsîr.

Ber derke: *k.s.* Ber derî.

Berdemîd: Hilatin, dîyarbûn,
bêhnhilkêşan, degirîn.

Berde wirde: *k.s.* Kevirên piçûk,
xişik.

Ber dibarin: Di bin bardanê; yan jî
xêr û bêr didin, ked dibarînin, ber jî
wan dibare .

Ber dikim: Li xwe dikim.

Ber dit: Ber bigire.

Berehmen: Rêberên dînê
Berehmanîyan.

Bereldakirdin: *k.s.* Belawela kirin.

Berê reş: Kevirê pîroz, yê di Ke'beyê
da ku hecî tewaf dikin. Kevirê reş,
kevirê Ke'bê.

Kor e, xwe nasipêrit carek bi dest
delîlan Ebleh çiket tewafê, ew nabînit
berê reş (E.X)

Berê xara: Kevirê xaran.

Nezer de talibê husnê

Ku dilber dil berê xara (M.C)

Berê xare: Kevirê xişk.

Berg: Belg, pel.

Qenc e her beytek ji vê durdaneyê

Bê nivîsandin li bergê Sîdreyê (Ş.M.C)

Bergirê: *k.s.* Xweparastin, xwe
biparêze.

Mujet qullabî gîra, zilfî dilgîrit
kemend asa

Mehalle bergirê ya berbibê kes kewte
ber gîrit (MW)

Berguzîd: Hilbijartî.

Berhem: Eser.

Berhemen: Melayên dînê
Brehmanîyan. Dîneke Hindistanî ye.

Berik: Gule, fişek

Berî: 1.Bêrî. 2.Li ber

Berî: Bêpar.

Berî bû: *k.s.* Dûr bû.

Berîd: Name.

Cotek direxşanê seîd şandin wekî peyk
û berîd

Anîn ji etrafan murîn re'dê buhar ê
Xeznewî (M.M.E.H)

Berî deka: *k.s.* Jiberkirin.

Berî ev tişt çêbibin: Xwedê Mihemed
pêxember afirand.

Berîq: Tirêj. Biriqî, tiştê ku diçirise.

Ewwel beriqî ji hûsnê sermed,

Nûrek bûye me'neya Mihemmed (E.X)

Bêrîtesema: Dîlana Bêrîte an jî
Belûte. Cuereyeke Dîlana kurdî ye. Du
rêz li hember hev radiwestin, nêzîkî
hev dibin û ji hev dûr dikevin.
Feqeyan jî ev cure sema dikirin û navê
ya wan bûye Belûtan feqîyan.

Ber ji hev nexwarî: Xêr ji hev nedîtî.

Berk: Pelik, berg.

Ecêb berk e merari tê

Li seddê qewsê tarî tê (E.H)

Ber mûcib: Li gor.

Ber pêy ewim: *k.s.* Di binê lingê wî da me.

Berq: Brûsk. Lêdana ewran.

Ke'beya husn û cemalê ber kenarê Xeznewî

Hem bihişta îrem î,berqa buharê Xeznewî (M.M.E.H)

Berqa tecellayê: Birûsk û nûra xuya bûyî.

Dan dil ji ber husna bi nûr

Berqa tecella ya sudur (M.C)

Berqa lami': Birûska ronîdar.

Sohtin bi berqa laim' e

Ew necm û bedra tali' e (M.C)

Berqa xatîf: Birûska bilez.

Berqe': Perde, xêlî, hîzar.

Bê mî'cer û berqe' û serendaz

Reş girtî ji bo Memê bi dilxwaz (E.X)

Berqê subbûhî: Ronahîya Firîşteyî, ronahîya pak.

Berqê subbûhî ku îşraqê li sed canan didit Ew ku keşfa dil dikit lemzek ji esrarê te bî

Berqî lamî': Birûska biriqok.

Berq û lem'e da: Tîrêj û ronî da.

Berr: Erd, bej, erdê rast.

Der berr û behrê mulkê 'îşq

Me'lûm e xaqan î Mela (M.C)

Ber şefa'ey ew şefî'em xey xuda: Ey Xweda tu min bidî xatirê şefa'eta wî pêxemberî.

Berteref: Sûd nemayîn.

Ber terest ez an: *f.* Ji vê mezintir e.

Ber û dûş: Sîng û mil.

Berwar: Bi kêlekê ve, xwar.

Rast û evraz û nişûvî me biwarin yek û yek Lê tenê wê li me bû daîre berwari hudûs (M.C)

Ber xîdmet: *f.* Xizmetker.

Berxîz: Rabe.

Were saqî bide camê soxenrîz

Soraxê bigre kef ez cayê berxîz (Ş.M.E)

Berze: Winda

Berzeban: *f.* Serziman.

Ber zede daman: *k.s.* Dawa xwe hilkirin.

Berzeket: Wenda bike.

Berze meke: Winda meke.

Berzex: Perde, navber. Bejê zirav ê navbera du behran, sînor.

Wî berzexê mimkînat û wacib

Wî padîşehê li şiklê hacib.

Berzex-ul esma': Astengîya navan.

Berzrîgirî: Cotkar.

Bes: *k.s.* Tenê. Bi tenê.

Besacid: Têr dibe.

Besatîn: Bostanan. pirjimariya bostan e.

Rabûne ve xanim û xewatîn

Wan jî tijî gul kirin besatîn (E.X)

Beser: *e.* 1.Dîtin. 2.Çav

Munewwer bû beser hem ba besîret

Liwan pîran ê dil daîm di hîret
(Ş.M.E)

Beser çûbû: *k.s.* Çûyîna li ser serî.
Meşîna li ser serî.

Beserçûm: *k.s.* Dereng mam.

Be serî darewe: *k.s.* Hatiye
bidarvekirin.

Be serma bêne: *k.s.* Bi serê min bînî.

Besîr: *e.* Binêr, kesê dûr û nêz dibîne.

Besîret: Fem û feraset. Îdrak,
têgihiştina kûr, şarezayî.

Kan bi gewher çi bikit, gewher eger
pakî nebit!

Tu besîret te nebit, sîretê ecdadi çi kit?
(M.C)

Besme: Mor û şeqil.

Katib ji van herfên di pur

Nûnek xiyali besme da (M.C)

Besme da: Kir nîşan; nivîsî.

Besmel: Bismila.

Besmel: *k.s.* Ajelê ku bûye qurban.

Best: *f.* Girêdan, tewlandin. Girtin.

Helqe pe da best û hatin 'eqreb û îlan û
mar Nergiza şehla şepal i asemîna
mêrxuzar (M.B)

Best: *k.* Rihetî, xweşî, firehî

Best: *k.s.* Qel'e, kela.

Best: Rexê çeman, rexê rûbaran

Best: 1.Hesabê bestê. 2.Belavbûn,
firehbûn.

Best: *e.* Lêkdan, tehlîlkin.

Best: Penah, stargeh.

Beste: *f.* 1. Girêdayî. 2.Strana piştî
meqametê.

Fuadê bulbul ê can xeste ye ew

Di xarê werdê dîlber beste ye ew
(Ş.M.E)

Besten: *f.* Girêdan, bestin.

Bestîne zulfê derkemîn

Helqe bi helqe çin bi çin (M.C)

Bester: Cih, nivîn, doşek.

Besteyê niyaze: Girêdayê hewcehîyê.

Besteziman: *k.s.* Zimangirtî, bêziman.

Best ihram: Ihram girêdan, kincên
hecêlixwekirin.

Min di benda zulfekê dil da bi destê
pîre 'îşq

Lew di 'îşqê da ku best ihram û yek
zunnari bes (M.C)

Bestin: Girêdan, honandin. Li dar
xistin.

Bestin ayîn: Xeml girêdan.

Bestine: Girêdanê, pêçanê.

Bestî: Girêdayî

Bestî 'eqda niyyetê: Nîyeta
îhramgirêdanê kiriye.

Bestîn: Bi peywend, girêdayî

Bestîyê: Girêdaye.

Bestiye çerx: 1.Çerx girêdaye, lem
hemî girtîye. 2.Bi gerha xwe govend
girêdaye.

Heyheya reqs û semaya te çi xweş
bestiye çerx

Ku di burcê bi sema tête li ser destê
xwe berx (M.C)

Beşaret: *e.* Mizginî.

Dermanekî sihhet û şîfayê

Mizgîn û beşareta wefayê (E.X)

Beşer: Meriv, insan.

Perda beşerî dê biçit ayînesîfet kin

Madem tu nekî lê nezerê şubhê xurab
e(M)

Beşerîyyet: Siruşt û xilqet û fitreta
însanan.

Beşîr: *e.* Mizgînawer. Ew kesê ku
mizgînîyê tîne.

Ma kane leken'nasu şebîhen we
nezîren Ursîlte îlel xelqî beşîren we
nezîren (M.B)

Beşîr û Bûşra: Xulamên serkarwanî
ne. Ew hz. Yûsif di birê da dibînin
xeberê didin xwedîyê xwe.

Beşnewed: *f.* Bibihîze, guhdarî bike.

Beşukoh: Bişkok.

Betal: Vala, bêkar.

Kelamê di zêde, kelamê betal,

Xusûmet di heqqan mîra û cîdal

Betema hellî muşkîl e: Li benda
çareserîya pîrsgirêk û arîşeyan e,
mebest pêxember e.

Betir: Bedtir, beter.

Betî': Hêdîmeş, sist û giran. Ew kesê
di meşa xwe da giran.

Ev erd û sema betî'û daîr

Ev milk û melek miqîm û saîr (E.X)

Betl: Pehlewan, leheng.

Ew betl-i ku bû ji halê waqîf

Rabûn bi wîra Çeko û Arif (E.X)

Betn: Zik.

Betnê wan: Zikê wan.

Bettel: Merd.

Bettilîn: Westîyan.

Bewr: *k.s.* Ajeleke dirînde ye.

Bewwab: Dergehvan.

Bexel: Paxil, paşil.

Bexem: *k.s.* Xwedan lê kirin, mêze
kirin, mezin kirin.

Bexeml: Bi xeml, xemilandî.

Bexîl: Kesên pîs û nerast.

Bedxwah û bexîl û bedsekalan

Bed'esl û sefîh û bedfîalan (E.X)

Be xorrayî: *k.s.* Belaş.

Bexşende: Efûkar.

Bexşendeyê tuhmata gunahan

Ê çê kirî neynika cemale (E.X)

Bexşinde: Kesê tiştan dide, merd.

Bexşî: Da, îkram kir.

Bexşîn: Dan, xelat.

Xellaq-i, xirabî-yû xebîsî

Bexşîne wî, cennetê nivîsî (E.X)

Bexşîne zemîn: Dane erdê.

Bextek: Kabûs. (Mebest Bekoyê
Ewam e)

Wî bextekê rûsîyahê mel'un

Gava ewî di ku Mîr-i mehzûn (E.X)

Bextê Feyrûz: Bextê serkeftî, yê spî.

Bextiyar: *k.* Bextewar.

Ditirsim ey weten bimrim nebînim
bextiyarî tu

Li bin pencê neyaran tim bi ah û nal û
zarî tu (M.E.M.N)

Be xwênim tîniwe: Tîyê xwîna min e.

Bey’: Firotin, bazar.

Beyaban: Çolistan, pesar. Çol.

Eger Dîlber me bîr bînê

Tu minnet ber beyabanê (M.E.F)

Beyad: e. Spî, spîtayî. Temyîz; piştî
nivîsandina cara pêşî, ji nû ve
nivîsandin.

Şerhê halê min "Mela" narit beyadê hê
temam

Vê sewadê gerçî herdem jê birin sed
întîxab (M.C)

Beyandin: Jê kirin, jê xistin.

Goşeyên nûnan bi ser badan ji qewse
bê weter

Mislê engušta binê sed ser beyandin
mahi new (M.C)

Beyanê ehkam: Zelalkirin û
ravekirina rewş û hal.

Her yek dikirin beyanê ehkam

Bextê sîych û sefîde î’lam (E.X)

Beyanî waqî’im kem: Behsa hale xwe
bikim.

Beyaz: Spî.

Beydeq: Berik, pîyon; Peyadeyê
kişikê.

Beyda: e. Çol, beyaban. Deşt.

Sehra û çîmen dikirine mesken

Beyda û dîmen dikirine gulşen (E.X)

Beyda’ê zemîn: Axa dinyayê.

Beydestî: k.s. Kedî, malî, Bi hêsanî
hatina bi dest. Ehlî.

Çawekey beydestî mestîşe keçî

Her belehzê fitneyê berpa deka (MW)

Beyet: Destgirtina pêxemberî û
xilafetê, sozdayîna doza wan.

Bey’et: Peyman nû kirin.

Hemî ehlê Bedr û Uhud bey’etê,
Muheqqeq bûye, dê biçin cennete
(M.X.S)

Bey’i: Firotin

Beyne: Navbera.

’Enberîn beyne zulfeynî xudanê qab û
qewseyn

Li ser çavên me ne’lên bi te ey da’îye
serwer (M.B)

Beynelewam: e. Di navbera xelqê de.

Beynelmîlê: Di nav hemî milletanda

Beytê meqdes: Mescidu’l-eqsa;
qibleya pêşî ya misilmanan.

Beyreqa rayê: Alaya qebûlîkirinê.

Elîya Reb birîndar e

Li dergahê te zarzar e

Li derdê wî bike çare

Hilavêt beyreqa rayê (M.E.F)

Beyt: e.1.Mala Xwedê. 2.Helbest,
malik. 3 Mal.

Bê mîsal û bê ’edîl in

Gerçî bê rexbet zelîl in

Xweş li halê min delîl in

Beyt û eywanê di min (SP)

Beytê Meqsûd: Mala Xwedê ku xelk qesda çûyina wê dike.

Namê te ye şahê beytê meqsûd

Fîhristê mikatebatê mehmûd (E.X)

Beytêqudus: Beytulqudus, Mizgefta Qudsê, Mescidul Eqs.

Dibitin Beytiqudus ehlê zîyaret ji Hebeş tê Sîne putxane ye îro me ji mû qed û qîştê (M.C)

Beytil-Eqsa: Mizgefta bajarê Qudis'ê Dêma ku bi nûrê, Beytil-eqsa Qendîlê felek bi wê diîsa (E.X)

Beytil hezen: Mala şînê an jî şîna Yûsif Pêxember.

Beytul Eqsa: Mizgefta Qudsê. Qibleya misilmaneya yekem e.

Beytul Heram: Hec, Ke'be, Mekke.

Beytul hezen: e. Mala xemê, xefetxane, mebest dinya ye. Mala ponijandinê. Mala şînê an jî şîna Yûsif Pêxember.

Çav li rêya te ku kar kir Yaqûbê Beytulhezen

Qet nema qêd xuyabit Yûsifê Ken'anê ma (SP)

Beyyinat: Belge û delîlên xurt û zelal. Delîl û belge yên diyar, eşkere. Nîşanên diyar.

Qur'an û xeber çi mi'cîzat in!

Ayat û siwer çi beyyînat in! (E.X)

Beyza: Spî.

Wê cîsraemmewwera wekî rûh

Beyza qemera miqabelet yûn (E.X)

Be'zek: Hinek.

Bezî: Di halê bezê de, çalak.

Bezl: 1.Dan. 2.Camerî.

Ji bezl û bexşîşa wê Hatimê Tey

Bûye Hatim xwedanê şuhret û hey (Ş.M.E)

Bezlego: Qeşmer

Hin mest û hinek fikir debengî

Xwanende û bezlego û çengî (E.X)

Bezm: f. Civat, meclis. Meclisa suhbet û îş û noşe, 'îşq û mehebbetê. Civata hengê. Cihê ahenge, dîwanxane û cihê kêfê. Kombûna ji bo ahengê.

Were ey saqîyê bezma perînaz

Ji bo me lutfi ke hin badeya raz (Ş.M.E)

Bezma Elest: Meclisa Rûhanîya Ezelî, ku Xwedê tê da ji rûhan ra gotiye: elestû bi Rabbikum" Ma qey ez Rebbê we nînim?- ku Ruhan jî "gotine Belê Tu Rebbê me yî".

Li destê aşiqê şeyda, Mela û suxte û şeyda Ku lê "Bezma elest" mey da, bi ke'sa gewherê alî (E.X)

Bezma terebê: Civata şahiyê.

Bezma terebê bi dêre tertîb

Zewq û ferehê bi gêre terkîb (E.X)

Bezmê: Ahengê, civata vexwarinê.

Bêaşnayî: Bê aşinayî, nenas.

Bê bar. k.s. Bê derd û minet.

Bêbar: Bê mêwe, bê ber.

Ku îz'anêkî wê demê, zerreyek

Ji behra 'edem nayê bêbariyek (M.X.S)

Bêbedel: Kes nedikete şuna wan.

Ew hor û perî di bêbedelbûn

Lewra ku ji nûrê Lemyezel'bûn (E.X)

Bê beha: Bê rewneq û ronahî.

Bêbehre: Bêpar, mehrûm.

Meke mehrûm û bêbehre di her dem

Munewwer ke dilê wan pê hilîn xem

(Ş.M.E)

Bê beqa: Bê mayîn. Bêdewam, yê/a ku namîne.

Bê bêcab: f. Bêperde, vekirî.

Bêbuha: Bi nîrx û giran. Gelekî hêja.

Bêcela: Bê ronahî û ne safî.

Bêcurm: Bêşûc.

Bêçîn: Bêgire, enîgirê.

Bêçûn: Bêhemta, bêhempa.

Bi vê qasirnerîna xwe cîgerxwûn

Ku waqî' bin li kunha zatê bêçûn

(Ş.M.E)

Bê çûn: k.s. Bêşikl.

Bêdad: Zalim, bêdelet, sitemger.

Hasil: ji înad, eger ji bêdad

Ev bîd'ete kir xîlafê mu'tad (E.X)

Bê dad: Bê çare.

Bêdar: Bê xew. hişyar.

Fîryad ji destê kewkeban

Pursê bike j'bêdan çerx! (M.C)

Bê 'de hîn: Piştî demekê

Bêdil: Xemgîn û bêhteng.

Hesûd û reşdil in dilpirbikîn in

Ji ber wan eşqê bêdil hezîn in (Ş.E.)

Bê'eded: e. Bê jimar.

Bêeded: Bêhêvî.

Bê 'emel: Bê kelik, bê biha.

Bê 'emel tu j'kes meke hêvî 'etaya

hîmmetê Bêxerez nakêşitin qet kes ji

bo kes zehmet (E.X)

Bê emsal: Bêhempa, bêmînak.

Bêendaze: Bêqiyas.

Bê'arz: Bênamûs, berxweneketî.

Bê eser kewt: k.s. Bê şûn da man.

Bêfena: Bêmirin, herheye.

Ey baqîyê bê zewalê daîm

Wey hadîyê bêfenayê qaîm (E.X)

Bêfesal: Bêhed.

Bêfitur: Bênavber.

Bêgane: Biyanî.

Dîwane me be bi vî hewayî

Bêgane me be, tu aşînayî (E.X)

Bêgav: Bêçare.

Fewwareyê merhemet bikel hat

Bêgav-i girî ewî digel hat (E.X)

Bêhed: Bêşînor.

Bê 'hemdî: Bê xwestin, bê vayîn, bê

şî, bê îrade.

Bêhez: Bêpar.

Bêhez kî: Bêpar kî.

Bêhîsab: Bêhejmar, bêhesab, gelek.

Bêhnekî: Kêliyekê, gavekê.

Bêjen: Bêjing.

Ev bilbilê can di mehbese ten

Maye bi tenê mîsalê Bêjen (E.X)

Bêkamî: *f.* Bêmirazî. Bê kamanî.

Bê kem û keyf: Bê çend û çawa.

Ew keyfeki mehze, bê kem û keyf

Esrareke bê xiyal û bê teyf (E.X)

Bêkerûn: Bêserûbin.

Bêkeyf: Xemgîn.

Bê kêne: Bê kêr in.

Bê kizb û meyn: Bê vir û mir, bi rastî.

Bêllê: *k.s.* Bihêle, rê bide.

Bêmar: Nexweş, bêhal.

Çav in gelo? Ya serxweş in, ya kafir in
ya dilreş in

Bêmar in ew ya nexweş in, yan nêrgiz
û cadûkher e (E.X)

Bêmecal: Bêderfet, bêfersend.

Bêmeded: Bêpişt û bêxwedî.
Bêhewar, bê îmdad.

Weme, ez xerqeyê behra elem û derd û
xeman

Sed esef bo çi tu rû nadî ez ê
bêmededî? (M.E.Q)

Bê mefer kewt: *k.s.* Hilat, reviya, bê
cî mayîn.

Bêmelal: Bi sivikî, bê dilsarî.

Bê mewa bûm: *k.s.* Ez bê cih û war
bûm.

Bê mewanî: Bê asteng.

Bêmirwet: Bêînsaf, bêwijdan.

Bêmîsal: Bêminak bênimûne, yê ku ti
kes wek wî nîne.

Bêmisil: Bêhempa.

Bêne cinanê: Benê bihuştê, benê
cînetê.

Bênefs: Bêcan, mirî.

Bênemek: Nankor.

Bêneng: Bêar.

Bênesîb: Reşbext, bêpar.

Bênewa: 1. Bêawaz, bêgazî.
2. Bêçare. Bê hêz.

Digel wê heşmet û qedrê îlahî

Nezer dêra li mûra bênewayî! (Ş.M.E)

Bênewa: *k.s.* Kesekî bê nan û bê av.
Hejar, xizan. Bê tişt, lawaz, perişan.

Bênezîr: Bêheval, bêhempa. Wekî wî
nîn in.

Bêniyaz: Bê hewcehî û daxwaz.

Bênihayet: Bêdawî.

Bênîda: Bêdeng.

Bê nuzc: Bê ku qenc bistewe û
bigihîje.

Bê pal û pel: *k.s.* Bê dest û ling.

Bêpayan: Bêdawî.

Bêpenah: Bê pişt û alîkar.

Bêperde: 1. Strana bê meqam.
2. Bêşerm.

Bêperwa: Kesê eşkere û meşkûf,
gunahkarê hetka wî çûyî. Bêtaqet.

Bêqal: Bê axaftin û xebardan.

Heçî dost bit heq e dostek durust bit
Ewger neve şeqalî û beqalî (M.E.F)

Bêqedr: Bênirx, erzan.

Bê qela: Ne qilêkirî. Sifrê ne spîkirî.

Bêqerar: Bêhedar, cihnegrir.

Bêr bûn: Bêrî bûn, bêhiş ketin.

Bêrîte: Cureyekî govendê ye.³⁹

Bêrîte, sema û saz û govend

Şêrîn û şekerleb û şekerxend (E.X)

Bêrût: Paytexta Lubnanê.

Bêtemîz: Nebaş, nezan.

Bêsam: Bêeger, bêgermî.

Bêsamane: Bêpar, bêmal. Bê mal û be sermaye.

Venapirsît çi ye hale te Pertew

Weha besebr û besaman e dîsa (P.B.H)

Bêşe: k.s. Hêlîna şêr.

Bêşerîk: Bêhevpar.

Bêt: Bibêje.

Bêtab: k.s. Bêtaqet, bêhêz.

Bê tab: Bê ronahî.

Bêtabane: Bêgeşatî.

Bê tabî: k.s. Bêtaqetî.

Bê tawan: k.s. Bê sûc, bê guneh.

Bêteklîfêfî: Bêasteng, bêetîket.

Bêtemîz: Neqenc.

Bête perwaz: Bifire.

Mîrxê dilê mirde, bête perwaz

Bê perde bibit terane perdaz (E.X)

Bête qeranê birûyan: Nêzikî birûyan bibe.

Bê teqrîb: k.s. Bêwate.

Bêtewan: Bêhêz, jar.

Bêtewe: k.s. Bizivire.

Bêtin zuhur: Dîyar bibin, xuya bibin.

Berqek ji cewaba te eğer bete zuhûre

Dê hey bibin emwatî hemû ben ve xîtabe (M.)

Bêtu: k.s. Ew bê.

Bêt û birit: Bê û biçe.

Bêt û ret: Bê û biçe.

Bê û dal: Bi van herdu tîpan peyva bed yanî xirab çêdibe.

Bêvir: Nexweşê li ber mirinê, kesê bêhal.

Bêwer: Cîgir. Bêti wir.

Her cihê lê bêwerî tu

Bê xilaf ew Ke'be ye (M.C)

Bêweter: Bêtel.

Bêx: Kok û nejad.

Bêxab: Bê xew.

Bêxered: Bê armancên şexsî.

Bêxeş: Ne gerav, zelal, paqij.

Bêxe weqtê furset: Fersendê lê bîne, têxe keysa xwe.

Bê xulûd: Bi mirin e.

Bêxwab: Bê xew.

Nazik-qeda nûrîn-beşer, ew bû li min neqşê beser

Dîna xiyalî her seher, nav dîdeyê bêxwabî da (M.C)

Bê xweb û xurdenin: Bê xew û xwarinin.

Bêxwerd: Bêyî xwarin, birçî.

Bêzeban: Bêziman.

Bêzar: Tengezar. Neçar.

Di hîna ku ne serjê ra ne pa bû

³⁹ Gowenda feqîyan.

Ji can bêzar û ne mesken ne ca bû
(Ş.M.E)

Bêzarî: Acizî û nerihetî.

Bê zat: Bê evîna di dilê xortan de.

Bê zatê, sîfet erez misal e

Cewher ne bitin, erez betal e (E.X)

Bêzewal: Bêdawî. Yê ku fena nabe û namire.

Bêzî dikit: Dilê wî dixele, naxwaze, nefret dike.

Bêzî dikit ji qencan, ji remz û naz û xencan Qedrê gulan çi zanit? kerbeş divêt kerê reş (M.C)

Bêz û rê: Bê û biçe.

Biamoj: Fêr bibe.

Biba me'mûl: Pere bikirana, bi nirx bûna.

Bibazîn: Bilîzin.

Bi bend û baz e: Şareza ye di lîstikê de.

Bibestin ihram: Cilên hecê yên spî li xwe bipêçin.

Bibehê: Bibihîze.

Bibihit: Bibihîze.

Bibin wasil: Bigihîjin hev.

Bibir wawê wucûd: Coş, eşq.

Bibit: Carî biherike.

Bibit faş: Belav bibe, eşkere bibe.

Bibit xerq: Biqete.

Bi bîşe: Bi zêdehî.

Bibî texeyyur: Werî guhertin.

Bibose: Ramûse.

Bibosî: Maç bikî.

Bibûsîn: Maç bikin, ramûsîn.

Bibye le min: k.s Ji min bibihîze.

Bi cayê: Bi caweta, bi saya.

Bi caye nanî: Li şuna nan, bedelê nan.

Bi cemaliha mucella: Bi ciwanîya xwe rewşen û ronî ye.

Bi cûş hat: Fûrîya, pêl da.

Biçîn ver: Li ber dayînê.

Bi da'et: e. Pirtî, sermaye.

Bid'e: Şik. guman.

Heçî ku li ser wê 'eqîdê nebit,
Ji ehlê fesadê û bid'et dibit (M.X.S)

Bidehem: Bidem, bidim.

Bideraxûş: Hembêz bike, bigire.

Bid'et: Tiştê ku nû tê holê û berê nebû.

Bidêre me'zûr: Li min bibore.

Bidêre tertîb: Xweş li hev bîne.

Bid'i: Çend.

Bidurînin: Bidirînin, biqetînin.

Bi elfan: Bi hezaran.

Bi 'emda: Bi qesdî.

Bi 'eqî û aşîna ke: Vegerîne li ser hişê xwe.

Bi eseh: Bi tesbîta rast.

Bi'eynê kewkeb: Weke stêrkan.

Bi eynî: Bi çavê min.

Bi ferîb: Bi hîle û xapînokî.

Bifkir: Binêre, temaşe bike.

Bigêre: Bike.

Bigêre terkîb: Li dar bixe.

Bigêrî mircan: Wê ji xwînê sor bikî wekî mircanan.

Bigîr: Bigre.

Bigulgulîn: Xelek xelekî bike, wek gulan bike.

Bih: Bihok.

Biha: Bih, Bîyok, Bînoke.

Bihalî: Bibiha, giranbiha.

Bi heseb: Li gor.

Bi heq muttesif: Dadewer û adil bî ji dil.

Bihil: Bihêle.

Bihîtim: Helandin.

Bihriyan: Bêrî, bêrîkirin.

Billah ji nal û zarîyan

Derba fîraq û bihrîyan (M.C)

Bi îqtîza zemanî: Bi hoyê guherîna demê.

Elqîsse: Bi îqtîza zemanî

Bû firsetê eys û kameranî (E.X)

Bi îqtîzayê ulqet: Li gor siruştê.

Bîsin: Biçîrsin, ronî bidin.

Bijarin: Eda kirin, pêkanîn.

Tesellî dane hev dîse vexwarin

Dur û mircan û încî wan bijarin (Ş.M.E)

Bijarî: Eda kirine.

Bijêwîy: k.s. Debar, abor, îdare.

Bijûn: Bi sihhet, tiştê pak

Bi Ka'betillah: Sond bi Qe'beya Xwedê.

Bikalit: Binale.

Bike: Bi te.

Bike rû: e. Vala bike.

Bike seyrî futûhat: Li pirtûka Futahat el Mekîyye ya kurê Erebi binêre.

Bi kes ra nabê sêrî: Kes bi kesî ra îdare û tehemul nake.

Bikêne: Bikêr in. Bi feyde ne.

Bikim tam: Biçêjim.

Bikin gûş: Guh bidinê, guhdarî bikin.

Bikirim: Bikim.

Bikirin: Bikin.

Bikitin dad: Gazinan bike.

Bikit irade: Bixwaze. Ji dil bixwaze.

Bikîn: Bigîhin.⁴⁰

Bikî qehr: Zora wan bibî, wan têk bibî.

Bikr: Nezewicî.

Serî ba muhri bû bikr û dilaram

Mîzacê rûh ê tê kafûrî bû tam (Ş.M.E)

Bi kulî: Bi temamî.

Bilad-Bîlad: Welat.

Wan girtî bi şûr-i şehre şuhret

Tesxîr-i kirin bîladê hîmmet (E.X)

Bilafikir: e. Nehizirin, ne fikirin.

Bilal: Sehabeyekî pêxember Muhemed e û hebeşî ye. Yekem muezinê misilmanan e. Mebest şanikên reş in.

Bilav: Belav.

⁴⁰ Dibe ku bi şaşîti di şuna "bigîn" da "bikîn" hatibe nivîsin.

Bilbil: Balindeyeke deng xweş e. Di edebîyata klasîk da bi piranî gulê ra tê bikaranîn. Mebest dildar e.

Baxê ku her bihar lê sinbil û lalezar lê Çend kulîlket bi xal lê bilbilî nale-nal e (S)

Bilcimle: Tev, hemî, bihevra.

Bilcumel: Hemûyan.

Bi lef hatin: Lê hatin pêçan.

Bilh-Bulh: Ehmeqî. Eblehî, kawikî.

Ew sade ji bilh û natemamî

Dil nadine menşe'a kelamî (E.X)

Bilîs: 'Ezazîl, îblîs, şeytan.

Bilkul: Bi tevayî.

Billah: Bi Xwedê.

Billê: k.s. Bêje.

Billêse: k.s. Şuleya agirî, pêta agirî.

Billê xuda hafîz: k.s. Bibêje Xweda me biparêze.

Bilmez ki ne soyliye zebanim:

Nizanim çi dibêje zimanê min.

Bilorî: Şûşe; her tiştê ku ji camê çêdibê. Mebest safî û pak e.

Bil we'dî: Bi peymanê.

Bilkeyb: Di xeybê da. Nediya.

Mazmûnê miraselatê Iareyb

Meşhûdê mikaşefatê bîlkeyb (E.X)

Bimbexşî: k.s. Tu min bibexşînî.

Bimencinî: k.s. Tu min perçe perçe bikî.

Bi mewc bêt: Bi pêl bêt, biherike.

Bi miştaqî: Bi dilşadî, bi kêfxweşî.

Bimken be dara: k.s. Eger ew min bidarvekin, ango min daleqînin.

Bimxeletênê: k.s. Tu min bixapînî.

Bin: Bibin.

Binagoş: Binê guh.

Ew çi mehtab in binagoş, ew çi subh e nûrfeza?

Ruhnîya şama firaqê şem'ê mala kêyî tu (MC)

Binagûş û cebîn: Binguh û enî.

Bina guwê: k.s. Bêhna guh.

Binazim: k.s. Nazan bikim. Nazê xwe bikim.

Binbar kirin: Bindest kirin.

Binber: Mertal an jî zirxê ber singê ra jî tê gotin.

Bi nef'e: Bi fêde ye, bîkêr e.

Binefs: Menekşe.

Werdan ji nêv zulfan derîn şu'la binefsê têwerîn

Bala û qedda 'er'erîn her yan li ser marê reş e (E.H)

Binemal: Sulale, malbat.

Bi nemek: Ne keke; bi tam, bi adan.

Bi nezer: Di tesewifê da tê vê wateyê Dîtina kûr.

Bi nezm û tertîb: Bi tekûzî û rêk û pêkî.

Binê: Binêre, temaşe bike.

Binihed: Pê lê ke. Deyne.

Binmêt: Eşkere be, dîyar be. Xuya bibî.

Binmêt di husnê rengi reng
 Nay û def û qanûn û çeng (M.C)
Binmê xwe: Xwe diyar bike.
Binoş: Vexwe.
 Bi saya pîrê mazin mey binoşim
 Ji pêsîrê xezalan sir bidoşim (Ş.M.E)
Binper: Cureyekî çekan e, mortal e.
 Bilcimle bi zirx û zend û binper
 Înan ji mera bi şûr û şeşper (E.X)
Bintî: Keç.
Binumêtin: Dîyar bibin, eşkere bibin.
 Dîyar bibe, were.
Binumêt rêhanî: Xetê reyhanî xuya
 bibe.
Binû: k.s. Razê.
Bi nûr: Geş, ron.
Binûşim: Vexwim.
Binyad: 1.Hîm, temel, kok. 2.Avayî.
 Da xelqê nebêjtin, ku Ekrad
 Bê me'rîfetin, bê esl û binyad (E.X)
Binyamîn: Birayê Yûsif pêxember ê
 piçûk e.
Bi qabê du qewsan: Bi qandî navbera
 du birûyan.
Bi qeranê qabê qewseyn: Bi qasî
 nêzîkîya navbera herdu birûyan
Biqutin: Bikutin, lê bidin.
Birale: k.s. Ey birayê min.
Birale ro: k.s. Kesekî ku birayê wî
 wefat bike, li pey wî tê gotin.
B'rengêk welê: Bi awayekî wisa.
Bi rehkitina te: Bi tesûba xwe ya dînî

Birehne-birihne: Tazî.
 Enwaê mizekker û miennes
 Hmdek di birehne, hin milebbes (E.X)
Birhê bidî çayê: Zorê bide.
Birincok: k.s. Cureyekî qumaş e,
 qulqulî ye.
Biriş: k.s. Birîn.
Birra: Birrek, tûj.
Birrê: Çirrê, navê lîstikekê ye.
Birrwane mektûbat: Li pirtûka
 Mektûbata Rebbanî ya Îmamê
 Rebbanî binêre.
Birûd: e. Serma.
Birûdet: Sarî, cemidayî
Bi remz û mu'cizî: Xwedîyê îşaret û
 mûcîzeyan.
Biresin: Bigîjin, birêsin. Bigihîn.
Biret: Biçe, here.
Bi rê: Bi rê bikeve, here.
Birincî: t. Yekem.
Birîn: Birin.
Birûmet: Bişeref.
Birs: Birçitî.
 Li xeyr û zekatê telefke tu mal,
 Li birsînê cehdê bike mah û sal
 (M.X.S)
Birrwa: k.s. Bawerî, îman.
Birrwane çonim bot: k.s. Tu bibîne
 ku ez ji bo te çawa me.
Birrwane sûtinim: k.s. Tu sotandina
 min bibînî.
Bisaret: Dîtin, Zanîn.

Bisaret kir: Tê gihişt.

Bi ebsaran nezer min çû, ji çerxê
qewsê ebrûyan

Şukurxwazim, ku çehvan kari ber
'eynê bisaret kir (M.C)

Bisat: Cilik û xalî.

Te go perde ji bo exyari çêkir
Mûzeyyen kir bîsat û neqşî lê kir
(Ş.M.E)

Bisatê exzer: Xalîya kesk. Mebest
asîman e.

Bi sed zarî: Bi sed zimanî.

Bisellîs'seyfî ew mî lî teheyî: e. Yar
bi rakirina peçeya xwe birûyên wê yên
wekî şûr îşaret an ku dema kuştina min
hatiye.

Bi'senahû: Bi ronîya xwe.

Bi ser bike: Bi ser da li xwe bike.

Bi sin'et: e. Axaftina çêkirî, sexte.

Bisk: Zulf, perçem.

Zulfên di şehlewendan

Biskên mehbûb û rindan (S)

Bismillahîrrehmanirrehîm: Bi navê
Xwedayê dilnêrm û dîlovan.

Biste: 1.Bêtirs. 2.Rim.

Were xanim bikuj biste bixencer!

Melê, emma bi destê xwey mubarek
(M.C)

Bisûtên: k.s.Bisotin, bişewitin.

Bişaret: Mizgînî.

Dê bişaret bi îşaret ji neyê bête sîma'

Tu ji nayê di sîmaê bike bawer meke
behs (M.C)

B'şerh û sewad kin: Şirove bikin,
îzah bikin.

Bişko: Bişkok, bişkoj, xwençe, gula
nûbûyî.

Bişkoj-i bi pişkivîn ji xaran
xwînêj-i bibin demê hezaran (E.X)

Bişkuwên: Bişkoyên,bişkokên.

Biştewête: k.s. Bihelîne.

Bitaşin darî 'unnabî: Dara 'unnabê
biqelişe û bike darbest. Dara 'unnabê
dareke sor e û bi lêvê yarê ve hatiye
watekirin.

Bitat: Gotinên mesqere, gotinên pê
kenok.

Bi تمامیها mutella: Seranser
zêrkirî.

Bitewl: Bi hêz û xurtî.

Bi teqwîmî reqem da: Bi şeklê herî
delal nivîsî, çêkir.

Bitî zîw û senem le 'ac: k.s. Pûtê ji
zîv û senema ji hestîyê filê hatiye
çêkirin.

Bittemamî: Tevde, hemî.

Bittûlî wel 'erz: Bi pehnî û dirêjî.

Bit û Lat: Navê du pûtên Ke'bê bûn

Bitûn: Pirjimariya zik

Hindî weku sakinê bitûn e

Xamûşe û xwarina wî xûn e.

Bitûn: t. Tevde, hemî.

Bitûnan: Zikan.

Biwerit: Bête xwarê, bibare.

Biwerîne: Wer ke.

Biwîn: Bûn.

Bix: Kok, reh.

Bi xayet: Gelekî.

Mexmûrê xebûqê bê nîhayet

Miştâqê sabûhêbûn bi xayet (E.X)

Bi xef kin: Veşêrin, bikujin.

Hin zahir û hindekan bi xef kîn

Ra kîn hinekan, hinan telef kîn (E.X)

Bi xudê bestîye pişt: Piştâ xwe daye

Xwedê, tewekul, kirîye.

Bixwan: Bixwîne.

Bi vî tebî: Bi vî rewşê.

Biweş: Biweşîn.

Biwêrin: Derbas bikin, biborînin.

Veke lêvê û ji nîvê biwerîn qend û nebat

Ji lebi le'li-şeker bêj û ji şeker meke behs (M.C)

Biyd: Hêk.

Bi yek: Bi yek û din ve, bi hev ve.

Bizdand: Qut kirin, birrîn.

Haxta biçin qebrê heval

Wê heybet û bizdandinê (M.E.F)

Bizdandine: Qut kirine.

Bizdîne: Biqetîne.

Bizr: Tov.

Bizû: k.s. Bizota agir.

Bizzat: Bi xwe.

Bîar: Şîyar, payî.

Bîdad: Zordarî, Kutekî.

Bîdar: Şîyar. Hişyar.

Her çendî bi şev dimînî bîdar

Sibhan di nivî heta vi êvar (E.X)

Bîdar bext: Bext şîyar, bextewer.

Bîdarî: Hişyarî.

Bîdayet: Destpêk.

Husn û cemala canan, cama sedef ku gêra Herçî nebit bîdayet, esla nehm nihayet (M.C)

Bîd-dua: Bi dua.

Bîgan: Bîyanî.

Bîhusle: Bênteng û gêlnexweş, bil ez û beziya di karî de.

Bîhûde: Bêmifa, bêfedê.

Bîjen-Bêjen: Dildarê Menîje ye ku çîroka wan di şahnameya Firdewsî da heye. Bavê Menîjê Efresîyab, Bîjen digire û davêje binê bîrekê. Rustemê Zal wî rizgar dike.

Şecî'ane wekî Rostem xuya ye

Li ser çaba ku Bêjen tê numa ye (Ş.M.E)

Bîkeyte ber: Cil li xwe kirin.

Bîkr: Keçîtî.

Bîlcimle netaîcêd-i fikr in

Dûşîze û nûerûs û bîkr in (E.X)

Bîla xusûs: e. Bê taybetî, bê cîyawaz.

Bîlcimle: Hemî.

Bîl Heq: Bi Xwedê, xwedayî.

Bîli: Bîyok.

Bîl kul: Bi tevayî, hemî.

Bîl qetlî: Bi kuştinê.

Bîm: *f.* 1.Tirs. 2. Nexweş.

Bîmaqed etana: *e.* Tiştê ku ji me ra anî.

Bîmar: Nexweş. Bêkes, bêhal.

Hinik bûn serserî hin mest û bîmar
Ji bihna miska marê gerdena yar
(Ş.M.E)

Bîmê: Tirsê.

Bîn: Ji.

Bîna: Yê ku dibîne. Bi dîtin, bi bēnahî.

Diştin we bê fi'Îe peyda bikit,
Ku bê çav û koranî bîna bikit (M.X.S)

Bînave: Ji nû ve bianîya, vejanda.

Bînayî bika: *k.s.* Bibîne.

Bînende: Kesê ku dûr dibîne. Çavbîn.
Bînende bikî emêd-i aciz
Bê perde û bê hîcab û haciz (E.X)

Bînewa: *f.* Bêçare, belengaz.

Bîniş: *k.s.* Bînîn, nêrîn.

Bînî: Poz, bêvil, dîfîn.

Bîperistê: *k.s.* Ji bo wî ta'et bike, jê ra 'îbadet bike.

Bîrûn: Ji der ve, derve.

Bîsat: Cirax (Raxistin). Tiştê raxistinê.

Bîsata qedemê: Ka bike bin peyvên xwe.

Me mûşerref ke, du çeşmên me bîsata qedemê ke

Pur li nik min heye mey, mêzeke min sîne kebab e (M.C)

Bîsmîl: *e.* Bismilla.

Bîş: Pir, zêde.

Bîşe: Dara mêşe.

Bîşeng: Şorebî, bîya şûr. Salix babylonica

Bîş û kem: Pir û kêr.

Di 'alem de seraser qet kem û bîş
Nemabû xeyrî yarî wan bizan îş
(Ş.M.E)

Bîşter: Nêzîktir.

Bîtan: Dost.

Bîyabanî: *k.s.* Sehra, çol.

Bîz: Bêzi, kîn, nefret, rik.
Xweparastin, bêtîkirin, dilxelîn.

Xebais teb-'e, jahil seg sirişt e
Yeqîn ew ker ji canan lew dikit bîz
(M.C)

Bîz: Zik, bi mana turê bin çena xezalan yê tijî misk ji tê.

Goya kiribû ji miskê bîzî

Remmalê felek nîqat-i rîzî (E.X)

Bîzzat û bîzzeman: *e.* Berî wî tu kes nîn e.

Bo: *k.s.* Bêhn.

Boç: *k.s.* Ji bo çi, çima.

Boç ewende: *k.s.* Çima ew .

Bo çi dill netwêtewe: *k.s.* Çima dil nahele.

Bo'enber: Bêhnenber, bêhnxeş.

Hin guli bû enber in hin di şêrîn esmer in
Hin guherî daneyin. mîlê suheylê sema (M.C)

Bohtan: Cizîra Botan.

Her bengî-yû serxweşêd-i Bohtan

Têk hatine çerx û baz û lotan (E.X)

Bomawer: Bêhna ava gulê.

Boqrat: Hîpoqrat, filozof û nûjdarekî yewnanî yê navdar e.

Bor: Derbasok. Di çeman da cihê tenik ku meriv tê ra derbasî alîyê din dibe.

Boraq: *er.* Hespê bi per û bask.

Elaya eyyuhes'saqî

Xwedanê 'ehd û mîşaqî

Hilo siwarê li Boraq î

Here pêş Xaliqê ekber (M.B)

Borîn guzar: Yê dibore.

Bos: Maç, ramûsan.

Bose: *f.* Ramûsan, maç, bûse.

Saqî! Bi gerrîn badeyê engûrê bi tenbûr Cana! Bide min boseyekî her we bi dil xwaz (E.X)

Bo semaa: Ji bo bihîstina.

Bositan: Bostan, baxçe.

Bosîtanê 'iffet: Werzê pakî û namûsdariyê.

Lê zadeyê dûdemanê dewlet

Nûbadeyê bosîtanê 'iffet (E.X)

Bote: *k.s.* Bûye.

Bote: Aman û fîraxa ku kîmyager têda maden û avan têkel hev dîkin yan jî zêr û zîv tê da paqij dîkin.

Bo to: *k.s.* Ji bo te.

Bubekrî: *e.* Hz. Ebûbekir, xelîfeyê yekem.

Bud: *f.* Pût.

Bu'd: *e.* Dûrî.

Bugzer-bugzere: *f.* Derbas be, bibihure.

Di roja heşrê pir hey hey hezaran pê li se yek pey

Bi koma ra biya Batey xudanê bexş birew bugzer (M.B)

Buhran: Bêhişî, qeyran, krîz.

Bîmarê bi derdê îşqê sekren

Bê nezcê merez gîhîşte buhran (E.X)

Buhtan: *e.* Îftira, nerast, derew.

Hindek ji fesaneyêd-i Bohtan

Hindek di behane, hm di bûhtan (E.X)

Buhtan: Cizîra Botan.

Buhtî, mihemedî, Silîvî: Ligor Ehmedê Xanî sê zaravayên kurdî ne.

Bûk û zava: Erûs.

Buka': Girîn.

Bukam-Bukm: *e.* Lal.

Bul-beşer: *e.* Bavê mirovatîyê, Hz. Adem.

Bulend: Bilind.

Li min kurt bû rîya Ke'ba wisalê

Bi nûra tel' eta bala bulendan (E.X)

Bul-fuzul: *e.* Yê ku kirinên wî hîç û pûç û xirab e.

Bulhesen: Bavê Hesên, Îmamê Elî.

Teb'ê lami' weş ji minnet Bul-Hesên

Min di dest da Zulfîqar û Duldul e
(M.C)

Bulhewes: Evîndarê ne ji dil.
Evîndarê derewîn, yê ku bi dev
evîndar e.

Lê aşiq û bulhewes cuda ne
Hin faîdexwaz û hin fîda ne (E.X)

Bul-wefa: e. Bi wefa, mebest Hz.
Mihemed e.

Bul-weqt: e. Bavê demê, Mebest
Xweda ye.

Bun: Damar, reh

Bunmêt: Dîyar dibe.

Bunyanê mersûs: Avahîyê mukim.

Buqrat: Hîpokrat, Zanakî Yewnanî
ye.

Ne Calînûs û Suqrat ma

Ne Talînûs û Buqrat ma

Ne Zulqemeyn û Mifat ma

Ne Cumcum ma, ne Exbar e (M.B)

Buraq: e. Ew hespê ku pêxember lê
siwar bûbû çibûbû Mîracê. Hespê ku
di şeva Mîracê da pêxember lê siwar
bû û çû Qudusê.

Burc-birc: Cihê ku stêrkên asîmanan
tê ra digerin.

Eqarib hat û bê hed hat

Li wê burca zeberced ha (E.H)

Burca ‘eqreb: Birca Dûpişkê.

Bû mawer û şêrin-lebê

Wê xwûb û nûrîn-xebxebê

Bedra di burca eqrebê

Kengê ji ber perdê derê? (M.C)

Burca Esed: Birca şêr.

Pencîsalî, şehlewendê keftime çaha
resed Min nizanî çerxîdêm e tê heye
burca esed (M.B)

Burca hemel: Birca berxê.

Di vê meha nîsane

Bûne selatîn cebel

Dihat meha gulanê

Roj hat ji Burca Hemel (M.G)

Burca sewrê: e. Birca Ga.

Burcê mîzan: Birca mêzînê, birca
terazîyê.

Senemê ji qewsê ebrû, du hîlalê new
numandin

Du keman li burcê mîzan bi xezeb li
min kişandin (M.C)

Burcê xerçeng: Birca kevjal.

Nahîd-i bi erdêda dida çeng

Meh çû veşîrî di Burcê Xerçeng (E.X)

Burde: Qesîdeya Burde ye. Li ser
pesindariya pêxember e.

Burdibar: Xweşkêş û di xizmetê da.

Burehmen: Dînê Hindûyan,
Brahmanîzm.

Burh: Par, hezkirin.

Burhan: Belge û delîl. Nîşan.

Wî nedî bejna te, û dayê qîyas

Hikmetê lew çûye burhanê xelet
(M.C)

Burhanî Qatî': Ferhengeke farisî ye.
Muhemed Huseynê Kurê Xelefê
Tebrîzî nivîsiye. Leqeba wî Burhan e.

Burhan-ul Huda: Nîşana Xwedê.

Burilusu: Qencîya ji esilan ra (dê û bav)

Burîd: e.1.Cemidandin. 2.Razan.
3.Postê, hêştira postê.

Di uznê min kesê hîcran ê dîde
Xerîbê dil ji dunyayê burîde (Ş.M.E)

Burqu': Rûpoş.

Burqu'û niqab: Pêçe, perdepoş.

Burûc: Pîrjimarîya bircan.

Buryan: Biraştî

Me dil bû agir û nîran e dîsa
Ceger jê taze min buryan e dîsa
(P.B.H)

Buryani: Cureyekî kebaban, parêv.
Birişîye bûye kebab.

Buspared: Spartin.

But: Pût, senem, mebest dilber e.

Lêvêd şubhê nebatê

Ez nadim bi heyatê

Ji husna but û latê

Bi min cah û celal e (S)

Butegul: *f.* Destegul.

Butgul: *f.* Gulsenem.

Butkede: *f.* Pûtxane.

Butunî: Hemî, temamî.

But û lat: Navên du pûtan; kesên rind,
dilber.

Butxane-Buthane: Pûtxane.

Ne tenê qend û nebatê

Mezherê rûh û heyatê

Hem but û 'uzza û latê

Lew me dil butxane ye (M.C)

Buxar: Hilma kel, kelexbox.

Muheyya û lebaleb ke di camê

Buxara agirê işqa kelmê (Ş.M.E)

Buxara: Bajarekî kevn e û niha li
Uzbekistanê ye.

Ji le'lên diyarê e min mey vexwara

Bi dil dê bibexşî bedexşan, Buxara
(E.X)

Buxd: Kîn, nevînî, nefret.

Buxtanker: Bêbext, mufterî

Buwar: Pêş, beramber.

Weh ku bê şahid û mehbûbi te 'umrê
xwe buwar

Karekî rabe bike weqt e ku êvar e
dereng (M.C)

Buwarin: Biwartin, derbas kirin.

Ji Mekkê ku balî Medîneve çû

Li wê deh buwarin ji dunyayê çû.
(M.X.S)

Buwed: *f.* Bibe, bûye.

Buxd û 'edawet: Ne vînî, kîn.

Buxz: Kîna veşartî, zikreşî.

Belê piştî tu çeknas bî

Ji buxz û kînê derbas bî

J'Xwedayê xwe re mêrxas bî

Nedî des nefsê hefsarî (M.E.F)

Buzurg: *f.* Mezin, bilind.

Bû, Bo: Bêhn.

Bû 'Ubeyde: Ebû 'Ubeyde.

Bûchî: *e.* 'Emr kurê Hîşman. Ebû Cehîl.

Bûd: Bûn.

Bûd û nabûd: Bûn û nebûn, her tişt.
Herdu birhên te ne mihabi çi îman û çi kufr

Bûd û nabûd ku yek in, ev çi sewab û çi 'îqab? (M.C)

Bû 'Elî Sîna: Îbnî Sîna.

Ez dibêm: Îsa ye ew, ya Bû Eli Sîna ye ew
Lew bi remz û 'işweyan pur mu'cizat û şîwe ye (M.C)

Bû ferq: Ji hev vebû.

Bû heşregeh: Qiyamet rabû.

Bûleheb: *e.* Ebû Leheb. Bavê Lehebî.

Bûm: Kund.

Bûm: *k.s.* Welat.

Bûme xakî serî rêy: *k.s.* Bûme axa ser rêya yarê.

Bûn fereq: Ji hev qetîyan.

Bû muhessel: Bi dest ket.

Bû mukemmel: Temam bû.

Bûnnecat: Rizgar bûn.

Bûne fesh: Ji hev cihê bûn, şax şaxî bûn.

Herfî ji yek bûne fesh, ger bibirî wan biesl
Herfî dibit yek xetek, xet ku nema nuqte ma (M.C)

Bû qabilê 'alema butûnan: Amade bû di zikan da bi cih bibe, yanî dibe

ava mêr ku derbasî malzarokê dibe bi têkilîya cinsî.

Bûs: Ramûsan, maç.

Bûse-Buse: *f.* Maç, ramûsan, paç.

Ji me eswed-heceran secde divên

Bi ziyaret me ji wan bûse divên (M.C)

Bûse didan: Radimûsan.

Helesta rûbeh ez can şubhetê şêr

Du-sê bûse didan etrafê pennir (Ş.M.E).

Bûsezen: Yê ku maç dike.

Bûş: Tevihev, têkilhev. Tujî.

Bû tali': Hilat.

Bûte: Şûşe.

Derûnê kûreyê bû nar û ateş

Ku tê de bûte bû wek xemreya geş (Ş.M.E)

Bûy-Buy: *f.* Bêhn, bîn.

Zulf û sunbul muşki bûy û bisk û sosin sur-şirîn

Serwî bala sebzî-pûş û kl-nîşan û xunçebaz (M.C)

Bûyer: Hadîse, rûdan, qewimîn

Bûye salif: Bihurîye.

Bûye zail: Çûye, nemaye.

Heywanîyyeta me, bûye zail

Rûhaniyeta me, bûye kamil (E.X)

Bûyî cuft: Bû cot. Gihane hev.

C

Ca: Ka, hela.

Ca: Cih, alî

Caduwani: Çavên rind yên sêhrbaz.

Sehharê cohtê caduwan
 Îro ji remza ebruwan
 Dil girt û da ber kaşuwan
 Ker kir li miskinan kebed (M.C)
Cadû: Sêrkar, bêxûy, pîra sêrbaz.
Caenîlşseyb û weqe'tû fil'dîe'f: Pîrtî
 gihîşte min û ez bê çare bûm.
Cah: Kortik, çalik, çal.
 Dikim hêvî û sed zari
 Li dergahê te ya Bari
 Tu xweybext kî evî jari
 Bi cahê Xewsê Bexdadê (M.E.F)
Cah: Xatir, qîmet.
Cahid: Xwe biwestîne.
Cahil: Nezan.
 Agah ji Xwedê nîne,cahil û nezan e
 Ew ne hekîm e,tu wî yeqîn qatîl bizan
 e(X.U)
Cahîz: e. Zanayekî Îslamî ye.
Caîze: e. Xelat.
Calis: Nujdarekî yewnanî ye, li dora
 201 -131 berî zayîne jîyaye.
Calût: Lehengekî Filistînî ye.
 Pêxember Dawîd wî kuştîye.
 Ne Harût û ne Marût ma
 Ne Talût û ne Calût ma
 Ne Azer ma ne Nemrût ma
 Di axê mane xusar e(F.T)
Cam: Qedeha şerabê, îskan, pîyan.
 Qedeha meye.
 Şerbeta lefz û kelaman
 Wê di nêv tasa û caman

Dane cumle xas û aman
 Cam û fincanê di min (SP)
Cama cehanbîn: Qedeha efsaneyî ya
 Cemşîd ku dinya tê da xuya dibû.
 Ew reşhe da wê qulzumê
 Mey hate tasa alemê
 Cama cihan bin da Cemê
 Bi Îskenderî ayîne da (M.C)
Cama ecelê: Peyala mirinê.
 Cama ecelê heta bi noşî
 Nabînî ji bo xwe canfiroşî (E.X)
Cama meyê: f. Qedeha meyê.
 Kefa ku kûzî tas tê nazik û spî zend in
 Cama meya xas tê binêrin talib çend in
 Vexwin ji deste raste bi medhan
 mehbûb xwendin (F.T)
Cama qerqefê: Qedeha meyê.
Cama sedef: Qedeha ji sedefê.
 Lebaleb ke rehîqa nabî pursur
 Di wê cama sedef wî rûhê wek dur
 (Ş.M.E)
Cama zucac: Pîyaleya şûşeyî, qedaha
 cam.
 Dîsa ji nû bêhal e dil
 Saqî, werin cama zucac
 Muştaqê xemra al e dil
 Lê xwoşî anî bit mizaç (M.C)
Came: f. 1. Caw, qumaş. 2.Çek, cil,
 kinc. 3.Kefen.
 Şerh û teqrîrê îslamê
 Fîkr û teswîrê kelamê
 Reng û etwanê di camê

Sibhetê tawûsî bû (SP)

Came: Qedeha meyê.

Came Cem: Qedeha efsanewî ya Cemşîd ku deverên dûrji tê da didîtin û bi dijaminên xwe dihesîya.

Saqî! Tu jibo Xwedê kerem ke

Yek cir'e meyê di camê Cem ke (E.X)

Camedirîde: Cildirandî. Cilqetîyayî.

Hin camedirîde, hin di serxweş

Hin aqlê remîde, hin mişewweş (E.X)

Camekê sehbayî: Pîyaleke meye.

Came mul: Qedeha meyê.

Cametebdîl: Cilguhertî. Cilguhertin.

Wan herdu kurêd-i cametebdîl

Weqtê dikirin di şehre tehwîl (E.X)

Camê asimanî: Peyla şîn.

Saqî! Bike camê asîmanî

Raha wekû rûhê cawîdanî (E.X)

Camê cem: Qedeha Cemşîd şahê farisan ê ku di sedsala yekem ji zayînê da desthilatdar bû. Li gor efsaneye di qedeha xwe da her tiştê di dinyayê diqewimî didît.

Camê eyş: Qedeha jîyanê.

Cem'ê ezhar: Koma kulîlkan.

Ev bax û buhar û berk û esmar

Enwar û şikûfe, cem'ê ezhar (E.X)

Camê ferfûrî: Qedeha ferfûrî, qedeha çînî.

Ji 'eksa camê ferfûrê

Ku ateş hate fincanê (M.C)

Camê mîna: Peyala bi zêr û zîv û lacîwerdê neqîşandî.

Saqî! Tu bi rêje camê mîna

Ava ku diket zemîrê, bîna (E.X)

Camê rûhanî: Qedeha rûhanî, qedeha manewî ku dil dişo.

Daxilê meclis bûyî îşev 'Nîşanî' lew ku xef Camê rûhanî h ehlê dil nîşandin mahi new (M.C)

Camî': e. Hemî.

Camid: Bê ruh. Tiştên hişk yên beruh, weke axê û kevir. Hebûyê bêgan.

Camid çikin bi husnê ku wan nezer li xwar e

Xerteb' et in di ebleh, çi nêrgiz û çi kerbeş (M.C)

Camik: Şerbik, pîyale

Camî: Mewlana Camîyê Kurdî.

Camî: Yek ji mezintirîn helbestvanê mutesewif e . Helbestên xwe farisî nivîsîye. Di navbera salên1414-1492yan da jîyaye.

Cammeşreb: Ehlê vexwarina meyê.

Can:1.Ruh, gîyan. 2. Laş.

Zahida Kurdî rîyayî pak yekî ez can û dil Da bibî havalê Kurdî koç û koçbarên di min (M)

Cana: Canê, yarê. Mehbûb, dilber. Ey canê, rihê! Ey ruhê min.

Canaj'cemala te wan dî der sûretê xûban Şeyx û welî û sofî der zikre xwe ahîn da (E.X)

Canan: 1.Yara ku xweşik, yar.
2.Merivan, rihan, kesan û dostan.

Kî mîhman canê canan e

Li ser çehvê me mihvan e

Bi mala cumleyêxan e

Kîşahê cumleyêxan têt (E.H)

Canan teleb: Yarxwaz.

Caneha: Pirhejmarîya “can” e.

Caneş: Can, rih.

Canê muhbet: Dilber, evîn.

Canê wehdet: Eşqa yekîtîyê, mebest
Xweda ye.

Canfegar: Ruhmubtela, ruhbirîndar.

Canfeza-Canfiza: *f.* 1.Rihkişîn. 2.Ruh
jîyandin. Ew kesê ku ruh dubare dide
jîyîn.Canbexş, ya ku meriv kêfxweş
dike, can dibexşîne. Jîyanbexş.
Jînbexş, bexşendeye kefxweşîye.

Nazidar e, ew li textê dilberê

Dilrûba ye canfeza ye rûhşîfa (M.C)

Canfiroş: Yê ku dikare miriyan sax
bike.

Cama ecelê heta bi noşî

Na bînî Jibo xwe canfiroşî (E.X)

Canfişanî: Canfîdayî, xwe gorî kirin.

Cang: Padizqê, xizne

Cangah: Diltezîn û canguvêş.

Yarebbî! Bi derdê hîcrê cangah,

Yarebbî! Bi zewqê weslê dilxwah
(E.X)

Cangudaz: *f.* Canhelîyayî, şewitî.
Cankuj, ruh dihelîne. Kesê/a ku ruh
dihelîne.

Kî xeberdar bit ji 'îşqê , key ji ber
westa girit

Gerçî rah ez, zerre zerre sînesoz û
cangudaz (M.C)

Canib: *e.* Kenar, alî

Canibê zat: Alîyê zatê Xwedê.

Wan rê ku birin bi canibê zat

Baqî gerîyan bi zatê zerrat.

Cann: Cin.

Carî: *e.* Rewan. Ew ava ku nasekine
diherike. Herikîn.

Heta ew narî lê bû bax û bostan

Digel mayên di carî destê bestan
(Ş.M.E)

Casiye: Tirs.

Cawê şîle: Qumaşê nûye ku hê
nehatiye şuştin, mebest kefen e.

Cawîdan: Ebedî.

Cawidanî: Daîmî, ebedî, timmî

Mem teşne, tu abê zendeganî

Mem mirde, tu canê cawîdanî (E.X)

Cax: Hesin yan darê ku ji bo parastinê
li ber derî û penceran didin.

Ew xanima rengsosiî

Lê pal day caxê hesinî (M.E.F)

Cay: *f.* Cih, der.

Cazib: Libat, bi bal xwe ve dikêşe.

Cazîbe-Cazibe: Kêşker, hêza kêşanê,
şîrînayî, balkişandin.

Geh cazîbe batinê ve kêşit

Geh masîke bi'gvişit bi êşit (E.X)

Ceban: Qels, lawaz, bêhêz û zeîf.

Cebbar: Xwedîhêz, yê ku dikare bi zorê bide kirin. Navekî Xwedê ye, yê ku diceribîne, bi hev ve dike, yê mezin û hêzdar ku daxwaza xwe bi zorê jî tîne cih.

Cebbarê felek ji wî hezerkar

Meslûle ji sellê seyfê Cebbar (E.X)

Cebbarê felek: Cebbar ji navên Xwedê ye wateya wî: yê xurt e.

Cebêh: 1.Cebilxane, cebe, zirx, cewşen. 2.Enî, pêş, rû.

Xûbî yû dîlberi yû naz û telettuf bi te şên Xusrewa padîşehanî û xudana cebehê (M.C)

Cebel: Çîya.

Sahibê qelbê selîm im, dijminê dêwê recîm im

Cebelê Tûrê kelîm im tenenaha ya hû. (Ş.Ş.E)

Cebelê nûr û kelîm: Çîyayê ronahî û gotinê. Desthilatdariya bi zorê, zordar, zordest.,

Ceberût: Mezintîya Xwedayî. Herîbilind û mezintirîn. Rêya gihîştandina Xwedê. Mezinahîya pîralî ya Xwedê teala. Hêz, hêza bêdawî. Desthilat, zordar, yê ku zordariyê dike.

Ceberot: 1.Qudret. 2.Şên. 3.Mezinahî. 4.Qehr.

Cebhe: Enî.

Cebhet: 1.Rû. Pêş. 2.Meydan, enî.

Kesk û şînû sor û zer tèn rêşî yû belk û guhar

Cebhetê sunbul viser tèn,subhê çokanan dixwar (M)

Cebhetê o binumêt: Rûyê wê xuya bibe.

Cebhet keşîfî: Rû xuya bû.

Cebîn: e. Navçav, enî. Her du alîyen enîye.

Ey dil mebe farix nefesek ez xemê talî Sewdayê cebîn im (Ş.E.A)

Cebr: e. Zordarî cebir.

Ev rûh û cesed bi cebr û îkrah

Tezwîc-i buwîn bi emrê Ellah (E.X)

Cebrî: e. Mezheba Cebrîyê.

Cebr û ikrah: Bi zor û dijvînî, bê xwesteka mirov.

Cecal: Decal.

Ce'd: Kezî, Porê honayî. Mûyê badayî. Porê kurişkî, gustîlokî.

Ce'deyen eswed di ber tèn têk ji bala tene xar

Daîmen weqtê seher tèn yan kê yan tîr jê bi per (M)

Cedd-ced: e. Bav û kal.

Ji ferzane te'lîmîdana evan,

Li ebb û li cedd, seyyîd û mûde'an (M.X.S)

Ced'an: Girêkên por

Ce'de: Kezî.

Cedel: Têkoşîn, devjenî, nîqaş, minaqeşe, pevçûn, demeteqî. Guftûgo, axaftin.

Xelqê heye şibheyek di dînê

Behsê bi cedel bi ket ji dînê (E.X)

Cedî-cedîy: Birca Karikê.

Cedîd: e. Nû.

Nisfo bîn ra zî viraştîş da cedîd;

Lewh û kursî yû qelem, 'erşo mecîd (M.E.X)

Ce'dîn: e. Du kezîyên honandî.

Cedîy: Birca Karikê ji 12 burcên rojê.

Cedwel: 1.Cihok, çemê ziravik, rûbar, co. 2. Rastkêş, xetkêş.

Cedwel kiribû bi hellê sîmab

Şingerfe sîfet gulêd-i sîrab (E.X)

Cediy û 'enaq: Ne kar.

Cefa: e. Zehmetî. Elem, derd, nexweşî.

Vê cefayê her li nefsa xwe didit

Besyek in bêşek,ne sanî,rast û çep (Ş.N.B)

Cefacûya: Cefaxwaz.

Cefakîş: Azirandî, jankêş.

Derdê di dilê Memê cegerrîş

Zîna ji derûnê dil cefakeş (E.X)

Cegerdar: Bi ceger, netirs, wêrek.

Yan şibhetê Tacidîn di cebbar

Qettal û delawer û cegerdar (E.X)

Cegerê rîş: Cegera birîndar, kezeba perçebûyî. Dil birîndar.

Cegerriş: Cegerkul.

Cehan: Cîhan, دنیا.

Cehansûz: Cîhansot, ya ku cîhanê disotîne.

Di nar û nûrê kamil bû

Ji berqa wê cehansûzê (M.C)

Cehde-cehd: Ked, xebat, lebat.

Tu, malê ji xwe zêde telbe meke!

Di şolande cehdê li sebrê bike! (M.X.S)

Cehîm: e.Cehenem, dogeh.

Ew meya mexmûreal e,min vexwar ez çûm ji hoş

Lew dilî tê sed melal e,geh cehîm e, geh seker (M)

Cela: e. 1.Biriqîn, ronayî. Ronî, pak, zelal. 2.Tije, dagirtî, mişt.

Geh geha ew eskera ne

Her di nêv amê bela ne

Mislê rojê pir cela ne

Xal û nîşanê di min (SP)

Celab: Ew kesê ku benîyan/koleyan ji bo firotinê li bajarekî dibin bajarekî din.

Du cara nayî dunyayê

Celaba xweş heroj nayê

Bigir qûtê xwe zanayê

Niha ew qût dibe çare (F.T)

Cela bexş: Rewneqbexş.

Celad: e. Kujer, serjêker. Mebest çavên kujerên.

Gezmen ‘Eyn’ û ‘Sad’an bi işaret
remz û sirr in

Kişandin gûşe badan mehbûb te tîr
avir in Tiren di wan celadan bat’in di
dil difirin (F.T)

Cela da: Ronî da, pak û munewwer
bû.

Celadet: Mêrxasî, egîtî.

Ciwamêrî yû hîmmet û sexawet
Mîrînî yû xîret û celadet (E.X)

Cela girt: Pak bû, biriqî, ronî da.

Celal: Bala, pir mezin, bi heybet,
mezinatî.

Lêvêt şubhet nebatê ez nadim bi
heyatê

Ji husna but û latê bi min cah û celal e
(S)

Celalî husn: *er.* Mertebeyeke pir
ciwan, pir xweşik, delal.

Celb: *e.1.* Kêş, cezb. *2.* Vexwendname,
celbname, banga ji bo dadgehê.
Kişandin, anîn.

Mehbûbê qulûbê men lehul-qelb!

Qelban tu dikî bi bal xwe ve celb
(E.X)

Celbê qulûban: Kişandina dilan.

Celeb: Kesê ku ajelan ji bo serjêkirinê
dicivîne. Pezên kêrê.

Kuştiyên dîdar û dînê bê xeta her deh
sed in

Her seher dîsa ji nû, wên tene kêrê sed
celeb (M.C)

Celebî: *e.* Tevlihevîya tiştên baş û
nebaş.

Celew: Jora hefserê hespan, binê
çeneyê. Hefsar.

Işqa we celew ji me revaye

Manî' li me perdeya heyaye (E.X)

Celîd: Xûzî

Celîl: *e.* Payebilind, mezin, Xweda.

Koremerd im pur 'elîl im dûredest im
bê delîl

Lê bi hicra te birîn e, dil birîndar û
kelîl Her dema tete xiyalê, tete dil narê
celîl (M.E)

Celîs: Hevalê rûniştinê. Rûniştî.

Kesê bête li dergahî, celîsê suhbata
Şahî Cila bit dil wekî mahî, bi enzara
Elauddîn (M.E)

Cellab: 1. Yê ku cezb dike bi bal xwe
ve dikişîne. 2. Kewê ku dixwîne û
kewan dikişîne ser davan, muqabilê
kewê ribat.

Meşate yê husna ezel çengalê zulfan
tabî da

Da'îşqi hilbit pêl bi pêl, qelbê me pê
cellabi da (M.C)

Celladê felek: Wesfeke gerestêrka
Merixê ye. Di stêrknasîya klasîk da ev
Xwedayê cengê Mars e. Nîşana
bêyomîyê ye.

Celwa: Buhurandin. Fawitandin.
Çilmisandin. Çilmisî.

Herçi celwa bû ji navê

Nû gulek digirt xunavê
Wê ji dil çû muhbeta vê
Ew bi ya di ra teba ye (M.C)
Cem: Civat, kom.
Cem/ Cemşîd: Şahekî Îranîyan e.
Ez bendeyê naçar, sekê derge me her
dem Tu şah î sîfet-Cem (M.M.L)
Cem’: Civîn, kombûn. Pirjimar.
Cema : Cembûn, civîn, kombûn.
Cemabin: Bicivin, kom bibin.
Hun cumle li erdekî cemabin
Herçar-i bi meqseda xwe şabin (E.X)
Cemabûn: Kombûn.
Cemad: e. Bêruh. Hebûyên bêgan.
Nalan dikirin cemad û heyvan
Talan dikirin nebat û însan (E.X)
Cemadat: Her tiştê bê gîyan.
Cemaet: e. Civat.
Cema kin: Bicivînin.
Cemal: Xweşikî, xweşikîya rû. Delalî,
xweşikî.
Cemala mahitab: Bedewîya weke
ronahîya hîvê.
Ji ber benda nîqaba wê
Li ber fetla 'îsaba wê
Cemala mahîtaba wê
Mi bedrek dî di seywanê (M.C)
Cemala sebzepoşan: Bedewîya
dilberan, xweşikîya dilberan.
Dê bi gulzara cemala sebzepoşan wê
çi kit? Ê di mîhrê da nebit dîl pare pare
çaki rûh (M.C)

Cemala Samed: Rind û xweşiktîya
Xwedê
Em hezar hemd û senaxwûn ebedî ne
ji Xwedê ra
Ji cemala Samedî tîrêjê nûrîn bi qedê
ra (M.E.Q)
Cemalê Barî: Ciwanîya Xwedê.
Ew pencereye cemalê Barî
Şemsa feleka dilêd-i tarî (E.X)
Cemalê sermedî: Ciwanîya bê
destpêk û bê dawî. Ciwaniya Xwedê.
Cemalê zat: Ciwanîya zatê Xwedê.
Cemalê zulcelal: Spehîya Xwedê,
xweşîkbûna Xwedê.
Cemaliş: Cemala wî.
Cemal û celal: Du têgehên tesewîfî
ne. Li gor vê Xwedê hebûn bi du
destan çêkirîye; destek cemal e ku
qencî û her tiştê xweşik di nav da ye
evîn jî pê hatiye afirnadin. Destê din jî
celal e; mezinahî û hêzdarî û heybet e.
Cem’a wî: Komkirina mal.
Cemaze: Hêştir, deve.
Cemed: Qeşa.
Xunavê girte nesrîna
Cemed çêbû li Solîna
Gerîyame li esmîna
Perîşan im ji talanê (M.B)
Cemel: Deve.
Cemere: e.1.Pîroz. 2.Ricma şeytên.
3.Germîya ku di meha sibatê da dikeve
erdê.

Cem'ê masîwa: Koma tiştên bilî
Xwedê.

Wacib yeke, zatê Kîbrîya ye

Mimkun pire, cem'ê masîwa ye (E.X)

Cem'iyyet: Kombûn û têkelbûn.

Cemî': Hemî.

Cemî'ê ferzan: Hemî ferzan.

Cemîl: Rind, xweşik. Baş, meqbûl.

Selam ser te Cemîl her tu cemîl bî

Gelo vî weqtî halê te çewan e?

(M.E.F)

Cemmaş: Nukulxûz.

Cem'ul cewamî': e. Pirtûkek e. Behsa
şêwaza dînî dike. Nivîskarê wê Îbn
Sebkî ye. Pirtûka paşîn a rêzê ya
medreseyên Kurdistanê ye.

Cem û lubed, kesir: Pir, zef.

Cem' û wesil: Gihaştin hev û
bihevvebûn.

Cenah: Bask.

Cenahê Cibrîl: Baskên Cibrayîl.

Cebhet di numa ji terfê îklîl

Goya li ufuq cenahê Cîbrîl (E.X)

Cenan: Dil.

Seyda me dî j'ehlê zeman

Qedrê xerîba taze zan

Cih wî bibit rewda cenan

Eywah ji derde xurbetê (M.E.F)

Cenb: Tenîşt, alî, hêl, کنار.

Ceneytû: Gunehê min.

Ceng: Şer, pevçûn.

Ji re'na nêrgizên tey mest û xwûnrêz
Zeman bû 'ehdê ceng engîzê Cengiz
(M.C)

Cengengîz: Cengewar, şerker,
wêranker.

Cengî: Şervan

Cennat: Baxçe, bihuşt.

Reyhan û bax û bostan

Cennat û 'edn û ridwan

Hor û perî û xulman

Qurbana Şeyxê Taxê (Ş.E.S)

Cennatê xuld: Bexçeyên bêdawî,
Bihuştaya mayînde.

Katib qelem dîsa gerand

Îsmek ji îsman sewwirand

Kursî ji nûrê afirand

Cennatê xuld û sîdre da

Cennet: Bihuşt, rez.

Cenneta xas: Bihuştaya taybet ku dîtina
Xwedê ye.

Cennetê herem: Bihuştaya enderûnê.

Zînê dikujim meger bi emda

Tûba ye di cennetê herem da (E.X)

Cennetulfirdews: Navekî bihuştê ye.

Cera: Herikandî.

Derdê dilê min ku bê dewaye?

Çeşmê terê min çima ceraye? (E.X)

Cera'het: Birîn, birîndarî.

Cercîs: Ji mîrên Kapadokyayê ye. Di
ema Dekyanos da hatiye kuştin. Fileh
(mesihî) her sal 23yê Nîsanê wî li bîr
tînin û wê rojê weke cejneke dibînin

Cerd: 1. Rêgir, talanker 2. Cirîd, tîr.

Cerdan: Talanker in.

Bajêr û kelat û xanî ber dan

Teşbîhê bi nejdîyan û cerdan (E.X)

Cerde: Şûrê tazî, şûrê kişandî.

Cerd û cerde: Koma êrîşkeran.

Cer'e: Qurtek, firek, dilopek.

Ceres: e. Zengil, zîl

Cezbe dil ra dihejînit ji me, lew

Di şevan nale, ji rengê ceres in (M.C)

Cer'ekeşê hicran: Vexwerê ava xerîbîyê, çîlekeşê xurbetê.

Yusifê cur-'ekeşê hicran im

Nuqtaya daîreyê zindan im (M.C)

Cer'eyeke peymaneyê xûd: Fireke pîyaleya meya xwe.

Cerg: Ceger, kezeb.

Çendan kirin wan ceng û şer

Avêtine cergû ceger (M.E.F)

Cerge: Koma xelkê.

Cergebaz: Tevlihevîya jin û meran.

Xweşdeng-i hinek, hinek di xweşreng

Hin cergebezî, û hin dîger leng (E.X)

Cergî 'alemê debirrê: k.s. Cegera xelkê perçe perçe dike.

Cerh: e. Birîn.

Cerhên qedîm: Birînên kevn.

Vê firqetê pur dil şewand

Cerhên qedîm dîsa kewand (M.C)

Ceriyd: Defter, lênûsk.

Cerîd: Cirît, rim.

Cesas: e. Casûs, sîxur, ajan.

Cesed: Laş.

Hemî can û cesed nûra nefîse

Ji bisk û xal û xet her tev diîse

Cetin: Zehmet, zor, giran.

Cevandin: Kom kirin

Cewab: Bersiv.

Zû bême ve, ez digel cewabê

Tacdîn-i nigîn ji dest deranî (E.X)

Cewaba ewam: e. Bersivên cahilan.

Cewaben 'en hebîbê-l îzzetê: Bersiv ji delalîyê hejayîyê.

Cewahir: Piranîya Cewherê ye, hebûyê ku bi serê xwe di karê hebûna xwe nîşan bide, wek kevir.

Enwaê tecemmil û melabis

Elwanê cewahir û nefais (E.X)

Cewarih: Dest û pê.

Cewaz û ruxset: Destûr û rewayî.

Cewf : Nav, hundir.

Cewher: Gewher, tiştên giranbiha.

Şahînşehê îşqê bê xerez hat

Cewher veşêrî dema 'erez hat (E.X)

Cewhere: Navê pirtûkeke qaîdeyên dînî ye.

Cewherê 'alî: Cewherê pak û bala, nûra Mihemedî.

Cewherşunas: Gewhernas, qîmetnas.

Arifê cewherşunasî

Ê bi vî wesf û lîbasî

Dê qedir bêhtir binasî

Meq'edê sidqê ceza ye! (M.C)

Cewlan: Dewran, herikîn, zivirîn.
Ger, tûr.

Cewq: Cûq, kom, tîp.

Cewr: e. Sîtem, zulm, tehdâyî, neheqî, zorî, kotekî, zehmet, cefa, dijiwarî, êş, jan.

Ez birindar û xerib im bê dewa û bê
tebîb Kuştîyê cewra reqîb im hêvîya
min Zulcelal (M.E.F)

Cewra reqîb: Zilma dijamin.

Cewreb: Gore.

Cewrê Hindî: Zilma hindî, êş û çîleya
hindîyan.

Cewr û cefa: Zilm û eziyet.

Cewşen: Zirx, mortal.

Cewşen ku da deryayê, Cûd
D'ayineya îsmê Wedûd (M.C)

Cewşen û dir'û: Zirx.

Cewşen vebestîn: Zirx girêdan, zirx li
xwe kirin.

Ceyb: e. Kêlek teref, bêrik.

Hudhudê ridwanê xeybê
Sed xeber şerîn ji ceybê (M.C)

Ceyb: k.s. Yaxe, berstûk, sivang,
sikur.

Ceyran: Xezal.

Ceyş: e. Leşker, artêş.

Xwedanleşker in em bi ceyş û heşem
Hemî eskerê me sifûfê di xem (Ş.E.A)

Cezaxane: Zindan, cihê cezadayînê.

Cezb: Di zikir da xwe windakirin.

Bi cunbuş hate cezbe ew bi rewneq
Weşandin bal û perrê kurt î ebleq
(Ş.M.E)

Cezbe: Vegirtin, coşbûn, jixweveçûn.
Lerzîn û jixweveçûna di halê eşqê da.
Dîwanebûn, jixweçûn. Rakêşan, demê
dûr, rêka.

Cezbet: Vegirtin, coşbûn, jixweveçûn.

Cez'e: Girîna li ser mirî, dirandina
cîlan û kişandina por ji bo mirina wî.

Cezl û fereh: Şahi.

Cezm: Îşareta hevgirêdana tîpan di
erebi da. Xala weke “cezm”ê girover.

Yek yek bi îsmê wahibî
Î'rab û cezm û nuqte da (M.C)

Cezm: Bêdeng, sekinî, bêpar.

Cezme: Birîn, Armanckirin, îşareta
girêdana tîpan di elfeba erebi da li
dawîya bêjeyan.

Ew cezme dayî merkezan
Ê dil ji ber şewq û lezan (M.C)

Cezr û med: Rabûn û vekişîna ava
deryayê; çûyin û hatin, guherîna hal.

Cezwe: e. Bizota agir.

Cê da: Cuda kir.

Cêge: Cih, war.

Cêş/Ceyş: Leşker, artêş

Cibillet: Sirûşt, xûy.

Cibrîlê emîn: Cibrayilê pêbawerkirî,
Cibrayilê dilsoz.

Cidal: Têkoşîn, nîqaş, nakokî.

Cife: e. Mirar.

Cift: Cot.

Ciger goşe: *k.s.* Koşeyê cegerê, memest lawik e.

Ciger soxte: *f.* Cegerşewat. Kezebşewitî.

Cigerxûn: Yê ku kezeba wî birîndar bûye.

Yetîm ma dilperîşan û cîgerxwûn

'Ekû jî bir penîrê şubhetê rûn (Ş.M.E)

Cihan: Dinya, gerdûn.

Cihangêr: Ew ê ku serwerîyê li dinyayê dike, cîhangîr.

Cihannuma: Cîhanbîn. Wesfeke qedeha Cemşît e.

Da cam-i bi mey cîhannuma bit

Herçi me îradeye xuya bit (E.X)

Cihat: Piranîya cihet e, alî.

Cihaze-cihaz: Cihêzê bûkê.

Ne'dhate teeqqil ev cîhaze

Ne'dbûn mitehemmil ew cemaze (E.X)

Cila: Celîkirin, zelalkirin

Cilfo: Paçekî sor e diavêjin li ser çavên baz da ku wî kedî bikin.

Cilfû: Lehî, lêmişt, avrabûn.

Uskûfeke zilmetê bi serda

Cilfûyeke ulfetê bi berda (E.X)

Cilûs: Rûniştin.

Cilwa: Cela, derketin, jêketin.

Cilwe: Ronahî, xweşikî.

Cilwe da: Ronî da, ronî kir.

Em têk huwîyyat in yeqîn, îsmin ji mesder muşteqîn

Nûra qedîm bû îşq û vîn, wan lêkî naz û cîlwe da (E.X)

Cilwe lê dayî: Ronî kirî, bi nûr kirî.

Cilwenuma: Ronîdar, bi nûr. Bi xeml.

Cewabek lê veda wî hîlebazî

Bi sed cilwenumayê mekrisazî (Ş.M.E)

Cimşîd: Navê padişahêkî ye.

Çi heddê sedhezâr can bin, di fitraka hebîba min

Ku sed Cimşîd û Keyxusro, xulam in ser di vê rê da (M.C)

Cinan: *e.* Bihuş.

Nêrgîza bax û cinanan Xewsê alem e'zem e

Ez ji ber lêl û seker taca te pur sermeste me (M.M.E.H)

Cinaq: Hestîyê wekî tîpa "V"yê ye, hestîyê şertgirtinê.

Cinayet: Curm û gunehkarî.

Tacdîn ku tu kuştî bê cînayet

Barî bi wîra çi kir înayet? (E.X)

Cind: Leşker, şervan

Cindî: 1.Sipah, leşker. 2.Xortê rind, qeşeng, bedew.

Zerî tîn û diyar nabin cuşîl tîn û sitar nabin

Çi cindî tîn sîyar nabin bûye tarî li gûlanê (M.B)

Cinesrî: Nesrîn.⁴¹

Cinêw: *k.s.* Dijûn, gotina nebaş.

⁴¹ Li gor Mela Mihemedê Zivingî.

Cins: Cure, nifş.

Cinsê kîmiya: Nifşê kîmya ku madenên bînîrx diguherîne û dixê zêr. Yanî dilan pak dike.

Xweş cewhere cinsê kîmiya ye

Qedre wî bizan, giran biha ye (E.X)

Cinûd: Sipahan, leşkeran. Piranîya cundî ye: Leşker.

Cinûn: Dînîtî, dîn.

Unsîyyetê aşiqan sikûn e

Sermayeyê wehşetê cinûn e (E.X)

Cinûnî: Dînîtî.

Cir'e: Qurt.

Saqî! Tu jibo Xwedê kerem ke

Yek cir'e meyê di camê Cem ke (E.X)

Cirîd: Pêşbazîya hespan.

Sergerm-i bibin wekî di îdan

Hindî ku li hev didin cirîdan (E.X)

Cirm: Guneh.

Ew kuştîyê cirmê bê gunah î

Teşbîhê beratê padîşah î (E.X)

Cisim: Cusse, madde (beden)

Cisir: e. Par, pay.

Cismanî: Maddî, bedenî.

Hubbê cismanî du roj in

Gerçî dil pur pê disojin

Xef ceger peykan dinojin

Mîslê neqşê bê beqa ye (M.C)

Cisme letîf: Laşê nazik, sivik û tenik.

Civanî: Jivanî, hevdîtin.

Ciwanmerd: Camêr, mirovê merd û dilfire.

Ciwên: k.s. Dijûn.

Cizîr: Girav.

Cîbillet: e. 1.Fitret, siruşt. 2.Nejad û kok.

Cîbrîliye şatir: k.s. Qasid, peyamber.

Cîd: Stû.

Cîdal: Herb, şer.

Kelamê di zêde kelamê betal

Xusûmet di heqan mîra û cidat (M.X.S)

Cîdala Cemel: Herba Cemelê ku di navbera alîgirên Îmamê Elî û yê Hz. Aîşeyê da derketiye.

Cîdar û haît û ebnîyye: Dîwar in.

Cîfe: e. Berate, mirar, laşê ajelan.

Şêx ew in emel dîkin ji bo 'uqbayê

Ne ew in bi wî navî dixwin cîfeyê dinyayê (X.U)

Cîhad-Cihad: Şerê pîroz. Cehd û xebat, hewildayîn û têkoşîn- Ku eger mecbûrîyet hebe, cenga çekdarî jî daxil - Cehd û xebat û hewl û têkoşîna ji boy bi destxistin û parêstina mafên însanî -bi taybetî- ji bo azadî û serxwebûnê .

Wer mayî misir h ser înadê

Em dê bi kirîn we reng cîhadê (E.X)

Cîhanê cawîdanî: Cîhana herhebûnê, cîhana ruhan.

Wan terkê kirin serayê fanî

Ew çûne cîhanê cawîdanî (E.X)

Cîhangeşt: Cîhanger, gerok, seyyah

Ey ne'tê tû ez erş heta ferşê şehîra
Ey pertewê nûra te cîhan geşt e munîra
(M.B)

Cîhannuma: Nîşandayoxê dine.
Cîhanxuyaker. Nîşaneyê peyala
Cemşîd.

Cîhanpenah: Kesê ku dinya piştê xwe
pê girê dide.

Cîhat: Alî, hêl, teref. Piranîya cihet e
yanî Rojhilat, Rojava, Bakur û Başûr.
Ne misl û zehîr û wezîr û mekan,
Ne mani' mûîn û cîhat û zeman.

Cîlwa: Ronahî.

Cîlwe: Işwe, naz
Temaşa kit bi zar û cîlweyên xweş
Li kûhê bê sitûnê qelb ê bê heş
(Ş.M.E)

Cîlweder: e. Nazdar, dilbaz, cilwebaz.

Cîm: Tîpeke alfabeya erebî ye, di
hesabê ebced da jimara sêyan (3) nîşan
dide.

Cîma' û refes wet'î: Hevşabûn, gan.

Cîn (Jen): Bi me'na derûnpakî û
dîltemîzî û însanîyet û fezîlet û
Mehebbet e ye- navê rê û rewîştê
Konfuçyûs e.

Cîn: e. Cîn.

Cînyeta: Kuştinê, kuştin.

Cîniye (Jenîzm, Jaînîzm): Mezheb û
ekola feylesofê Hîndî **Mehawîra**
(595-527 bm.) ye.

Cîrah: Birîn.

Cîsm: e. Gewde, laş, cism

Cîwe: Cîwa.

Cîzye: e. Xerac.

Co: Co, cihik.

Co: k.s. Ceh.

Cobar: Çemê mezin.

Cobar û bax û bistan kamil bibûn
tevave Şehlûl û 'endelî bûn meşyane
hatin nave Cewab bibine reqîban wal'
nergîza xunav e (M.G)

Cocem: Cewcem, kulîlkeke zer û
xweşik e. Gogem.

Cogeleý kêşawe: k.s. Çêkirina cihoka
avê.

Cokenar: Perava coyê, dora coyê.

Coş: Coşî, coşbûn. Keldayin.

Coşîş: Bi coş.

Zatê Muqaddes bû wucûd, coşîş neda
bû behrê cûd

Wesf û îzafat û quyûd, yek jê tecellayê
neda (E.X)

Coşîş nedabû: Bi coş nebûbû,
nefûrîbû.

Coş û kelek: Kelîn.

Cotek esed: Mebest herdu çav in.

Cote xençer: Mebest herdu çavên
yarê ne.

Coya şîrîn: Çemê şîr yê ku Ferhad ji
bo Şîrînê kola bû.

Coybar: Cobar, çem.

Cubende: Jîndar.

Cubhe: Enî.

Cubhet: *e.* Enî.

Cubun: Penîr.

Cuda: Cîya, cihê, cîyawazî.

Tu Muhemed Can 'efû kî ey Xuda

Ez Hebîbê xwe meke xakî cuda
(Ş.M.C)

Culnar: Gilyaz.

Cullab: 1.Gulav, ava gulan. 2.Celb.

3. Şemate;qelebalix.

Mehbûb û reyhan pur gulav ker kir Ii
mîn cerg û hinav

Zehra helahil bû dinav, levv saqî ew
cullabî da (M.C)

Culûsî: Rûniştin.

Cumle: Hemî, tev, gişt.

Cumle daman: Piranîya xelkê
heyirîn.

Cumle eşya: Hemî tişt, hemî, heyber.

Ji wê nûra mûzeyyen cumle eşya

Bûye peyda, çi mîna berr û derya
(Ş.M.E)

Cunbeş: Pêldayin, hejîn.

Cunbuş: Bizav û çûn hatin.

Bi cunbuş hate cezbe ew bi rewneq
Weşandin bal û perrê kurt î ebleq
(Ş.M.E)

Cund: Leşker.

Cunneh û tirs: Mertal.

Cunûdê lem terew: “Me leşkerên ji
bo te şandin we ew nedidîtin, Mebest
ayetek Qur'anê ye, di şer da firîşte
piştgirîya pêxember kirin.

Cunûn: *e.* Dîn, mecnûn.

Cur'e: *e.* Qurt, qulp, vexwarin.

Cur'e da: *f.* Qur kir, vexwar.

Cur'ek: Firek, qurtek.

Cur'enûş: Yê/a gulpan vedixwe

Cureya: Qulpeka.

Curh: Birin

Curm: Guneh, tawan, sûc.

Ey Seyyîdê alem senedê Nûra hîdayet

Bê hedd hene bo me guneh û curm û
qebahet (E.X)

Curm û xeramet: 1.Bêş û qedarkirin
(tazmînat) 2.Neheqî, û ezîyet.

Curûh: Birînan.

Cust û co: *f.* Lêgerîn. Pêketin û
lêkolîn. Gerîn.

Cust û çelek: Bi lez û bez, zû.

Custûcû: Behs û teftêş.

Cuz': Perçe. Beş, par, pişk.

Her çendî zîyade têrbuhabin

Bîlcimle bi cuz'ê hisnê nabin

Cuz: *f.* Ji bilî.

Cuz'ek sefa: Piçek kêf û xweşî.

Cuz'ê husn: Beşek ji bedewîyê.

Cuz'ê ixtiyarî: Beşek ji vîn û karîna
hîlbijartinê.

Lê daye me cuz'ê îxtiyarî

Nefsa me pelîd û hîlekarî (E.X)

Cuzî: Parçe piçûçik, fendikî ji efradên
kullîyê.

Cuz sayeyê: Ji bilî sîbera.

Cuz û bend: Beş û qet.

Cû: Cihû, Yahûdî.

Cûb: Cobar.

Cûbar, Cûyebâr: Newal.

Sed cû û sed cûbar e tê

Sed gulşen û gulzar e tê (M.C)

Cûbb û qelib: Bîr e.

Cûd: e. Comerd, baş, qenc. Kerem û comerdî, ciwamêrî. Ji bo kesê pir pere belav dike ra tê gotin.

Madena cûd û sexayî, mushefa husn û cemal

Maîda ehlê sefa yî, wasilê baxê wîsal(M.E)

Cûded rey' û qesd û sîrat û sebîl: Rê ne.

Cûdî: Cûtî gûtî, gotî. Çiyayê Cûdî yê ku şeş km. ji **Şirnexê** wê da ye. Çiyayê ku gemîya Nûh li serê rawestîye.

Cû'i: Birçî.

Cûkenar: Cokenar.

Cûq: Kom, tîp

Cûstimenî: Gerandina bi dû tiştêkî.

Cûş: Kelîn, li hev ketin û pêldan

Cûşiş: Coşbûn.

Cûşîde: Kelîn.

Cûwa sirişk: Cihoka hêsrân. Mebest cihoka Ferhad ji bo Şîrînê dikola da ku şîr biherikîne koşka wê.

Ferhad-i cûwa sirişkê pirxûn

Nîna, ne di dî siwarê gulgûn (E.X)

Ç

Ça bû: k.s. Çak bû, baş bû.

Çah: Çal.

Cemalek nûra wî Xeyrulbeşer bû

Di çahê da sebir jê ra kerem bû (Ş.M.E)

Çaha xebxeb: Kortika çene

Çaha zegen: Çala navbera arzenîyê û lêva jêr.

Çaha zîqenê: Kortika çene. Çalika navbera lêvê jerîn û çene ye.

Hisna xetê rux ji xetê yaqût

Çaha zîqenê ji sîhrê Harût (E.X)

Çahê Nexşeb: Bîra Nexşebê. Di dema xelîfeyê Ebbasîyan El Mensûr da li bajarekî başûrê Semerqendê Nexşebê kesê navê wî Muqenne'ê Xorasanî doza pêxemberîyê dikir, wî weke mucîze ji xwe ra hîvek çêkiribû û ronahîyeke mezin dida derdora xwe. Dibêjin hîva wî ji bîreke wî bajarî derdiket.

Çak: f. Qelişî, qetiyayî, dirandî.

Wekî wan merdomê dîlpare û çak

Li xakê bû rewan û ew bi xwe xak (Ş.M.E)

Çak: Baş, qenc, jêhatî.

Çak: k.s. Perçe.

Çaker: Berdestî, xulam, xizmetkar. Noker, pêxwas.

Cehde û se'y û teleb bê eserek safî nehin Tu ne bi perdenişîn, çaker û qewwadi çi kit? (M.C)

Çal: Gor, mezel.

Cismê me, eger diçîte çalê

Rûhê di me, dê bigên wîsalê (E.X)

Çalak: Jêhatî, zîrek. Bi sivikî, bi lez.

Çalekê ruh: Rihjêhatî; nefsa pak.

Heyf di qeyda xak û gil bit arifê çalaki

rûh Dê mucerred bit ku pertew dit ji

nûra paki rûh (M.C)

Çam: Şîr, helbest.

Çapik herekat: Bizav sivik, kesê çalak. Kese ku bilez tev digere

Çapuk: Bilez, zû.

Çar: Qiralê Rûsî.

Çar: Çarik.

Çarane: Cureyekî cilê cengên ne.

Zirxê sîng û pişte diparêze.

Çarane û cewşenan di ber kîn

Zendane û mîxferan li ser kîn (E.X)

Çaraperdaz: Kesê çare dibîne, çarebîn, çaresaz.

Çar bakire: Çar element, Av, ax, hewa û agir.

Çar dewrî çar: k.s. Çar dewrên Çarên Qeyserî.

Çare ebrû: Birûreş. Kesên mûyên wan nû şîn hatibin.

Ev mûyemeyan û maregêşû

Ev çarîdesale, çareebrû (E.X)

Çare girij eka: k.s. Çehreya xwe tûj dike.

Çareperdaz: Çaresaz.

Ey waqîfê remz û kaşîfê raz!

Bê çare me ez, tu çareperdaz! (E.X)

Çarî ken: k.s. Çareser bikin.

Çarî kird: k.s. Aşkirin, bergerîn.

Çarsû: 1.Rêya ku dibe çar alî. 2.Sûk, çarşî.

Çarşev: Desmala reş.

Çar umehat: Çar tiştên sereke; sar, germ, şil û ziha.

Çar umehat in, sê benat

Her bê qerar in bê tebat

Pur 'îşq û meyl in iltifat

Vê taze-deyrê kuhne da (M.C)

Çar 'unsur: Çar bakire; Av, ax, hewa û agir.

Çar unsur in, çar teb'et in

Vêk ra bi mîzan vêk ketin

Bi hev ra muxalif sîret in

Der sûretê şexsiyye da (M.C)

Çaryar: Her çar xelîfe, Ebûbekir, Umer, Osman, Elî.

Ne Eyyûb ma, ne Yehya ma

Ne Harûn ma, ne Mûsa ma

Ne Meryem ma, ne îsa ma

Ne Ehmed ma, ne çaryar e (F.T)

Çaşînîgîr-çeşnîgîr: Çêkîroxê kefxweşîye û hengê.

Çaşîtî: Çeşît, cure.

Çavêt ti bengî: Çavên di xav û mest.

Çawekî bînatir: k.s. Çavekî ku baştir dibîne.

Çawezar: k.s. Nezer, çavzer.

Çawêşedarî Hîcir: *k.s.* Ew kesê ku çavên wî ji ber hicrê kor bûye, yan diêşe.

Çawî kewê: *k.s.* Çavlêketin, dîtin.

Çawûş: Pêşleşger.

Çeha: *f.* Çend kes.

Çehçehe: *k.s.* Dengên balindeyan.

Çehre: Dêm, rû.

Ey çehre perî dil me ji eşqa te kebab e
Daîm ji firaqa te, me can her bi 'ezab
(M)

Çelebî: *t.* Bazirgenekî maqûl.

Çelek: Serxwar, çilakî, bi gulî,
sergopal.

Ji hewa bend te kirim şubhetê bayê di
sivik Çi ji biska te bibêm? ahi ji biska
te çelek (M.C)

Çelek: Qeşeng, lihevhatî.

Çeleng: Şeng, xweşik.

Sed emanet ey hevalo tu çeleng be
lipiya Da di nêv ehlê diyanet bî,ne dûrî
kerîya (M.E.Q)

Çelîd: Çûn.

Çest/çust: Bilez.

Zanî bi teemmil û bi îdrak

Rabû ji cîyê xwe çest û çalak (E.X)

Çeman: Qedeha meyê.

Çemen: Çîmen.

Dîlbera gerdensefîqî danuwa durr a
Eden Nazik û mewzûnletîfî,nexlîya
selwa çemen (M.B)

Çemenistan: Bexçeyê çemenan û
gulan.

Çemim: Çavê min.

Çend: Keytar e amûreke muzîkê ye.

Çendekî salik: Gelek sal.

Çene: *t.* Erzing, Hestîyê navbera dev û
gerdenê.

Çeng: *f.1.* Amûrekî muzîkê ya pirtêl,
keça reqas. 2.Zend, per. 3. Nîve
Kulmê. 4.Kef, mist, gems.

Nalîna teyrû tiyûran

Kalîna çeng û bilûran

Xulxulîn d'qesr û qisûran

Bilbilê xweşxwan im ez (F.T)

Çengî: Sazvanê saza çengê.

Çengûl: *k.s.* Pençe, lam, nahpelûşk,
pencik.

Kotirî çengûlî bazî qeza ye'nî mujey

Dî be zulfî çû pena ba, kewta nêw
dawî bella (MW)

Çengul: Mist

Çû: Wekî.

Çelîpa: Xaç.

Terh û terz e bûne zunnar û çelîpa yek
bi yek

Lew mi zunnar û çelîpayek tenê
yekcari bes (M.C)

Çelte: Tûrik.

Çepandin: Standina bi hîle û
xapandinê.

Çeper: Sîper, enî; tişta ku meriv dide
ber xwe, xwe pê diparêze, kozik.

Tîrî sed tenê cîger, sîne li ber maye
çeper Ji dil û cergê kul û sîneyê ker
ker meke behs (M.C)

Çeprew: *k.s.* Yê ku di rêya şaş da ye.

Çerakirdin: *k.s.* Çêrandina ajelan.

Çerb: Bi don, çivir.

Çerd: Çehre, rû.

Çerde: *k.s.* Rengrû, Rengê serçav.

Çermeker: *k.s.* Çermê kerê, postê
kerê.

Key lekin ehmeq debê hacetî dana
rewa?

Qet dekrê çermeker ya be 'eba ya
kewa? (MW)

Çerix: *k.s.* Gerdûn.

Çerx: 1.Gera stêrkan, dewran, felek.
Ger, asîman. 2. Reqs, çerixîn.
Çûnûhatina reqsê.

Neh çerxê felek bo te ne sergeşte evînê
Xelkê ku neênit bi te îman û yeqînê
(M.B)

Çerxa bedendîş: Zemanê hizirxerab.

Çerxa bêwefa: Gerdûna bê soz û bext.

Çerxa etles: Asîmanê nehan ku hemî
asîmanên din di xwe da digire.

Çerxe: Biçenxe, bibûre.

Çerxê dewwar: Feleka gerok.

Gelek bê i'tîbar e çerxa dewwar
Zîyade qatil e xeddar e xwînxwar
(Ş.M.E)

Çerxê etles: Feleka nehan ya herî
mezin. erşê Xwedê ye.

Vêkra dikirin hewar-i her kes

Efxan digîhane çerxê etles (E.X)

Çerxê lewleb: Feleka ku dizivire.

Qet mimkune ev ji çerxê lewleb:

Tali' bibitin ji bo me kewkeb (E.X)

Çerxê pencemîn: Asîmanê pêncemîn.
Stêrka Behramê (Merîx).

Çerxê rab'i: Çerxê çarem, cihê rojê li
asîman.

Çerxê semadar: Asîmanê xwedîyê
stêrkên gerok, Asîmanê weke semayê
dizivire.

Perwane bê destûr e

Di çerxê semadar tê (M.C)

Çerxê tis'e: Çerxa nehan; Asîmanê
herî jor, erşê Xweda.

Çerx û burûc: Asîman û bircên
asîmanan.

Çerx û dolab: Ger, zivirîn; bûyer û
rûdan.

Çerx û felek: Gera stêrkên her heft
felekan.

Çerx û lewleb: Felek, gerh û dewran.

Çerxê warûn: Çerxa xwar.

Çesan: *f.* Çewan, Çawa.

Çespan: Bicîkirin, te'sîr. Zeliqandin.

Çespandin: Peyitandin, tesbîtkirin

Tîr û rim herdu li dil dan, li ceger
çespani kir

Ew ji xwûna mine riştî, tilîyên sohri
'eqiq (M.C)

Çespan kir: Tam îsabet kir, lê hat.

Çest û çalak: Bilez û çelengî.

Çeşm: Çav, bînahî.

Bi qurban bin ji bona bejn û bala

Bi heyran bim ji bona çeşmê şehla
(H.F.H)

Çeşme: Kanî.

Çeşmeê çeşmen: Kinîka çavê min.

Çeşmeê dil: Çavkanîya dil, çavê dil.

Çeşmeê heywan: Ava jîyanê, Kanîya
heyatê

Çeşmeê heywanê heqîqet: Ava jîyanê
(heyatê) ya rasteqîn.

Qesdi ser çeşmeye heywanî heqîqet ke
Nîsanî

Bi cihanê mebe mexrûr ku cîhan eynî
serab e (M.C)

Çeşmesar: Çêrêgeh, mêrg

Çeşme şehla: Çavên reşika wan ji şînê
tarî. Çavên rind.

Badamê sîyah û çeşmê şehla

Nar û bîh û sêv û şaxê bala (E.X)

Çeşmezar: Cihê ku kanî lê pir in.

Çeşmê qehr û xeşmê: Çavên hêrsbûn
û dijmintîyê.

Çeşmê şahidan: Çavên dilberan.

Wan dest û zend û sa'idan, mey dane
şeyx û zahida

Mesti bi çeşmê şahidan, ew nêrqiza
seyrabi da. (M.C)

Çeşmê ter: Çavên şil û bi hêsir.

Çeşmê xûnbar: Çavên ku hêsirên bi
xwîn dibarîne.

Teskîn diket ev nigîn, dilê jar

Dem dem ku didim bi çeşmê
xwînbar(E.X)

Çeşim 'xurab: Çav qirr.

Çeşm: f. Çav

Çeşmeya heyat: Kanîya ava jîyanê.

EJw têhne, tu kanîya Feratî

Ew xeste, tu çeşmeya heyatî (E.X)

Çeşn: Heng, sifreya xwarinê.

Çeşne: Nimûne, mestere, nimûç.

Pê zeyyînan lewhê 'edem

Her yek bi yek di çeşne da (M.C)

Çeşnegîr-çaşinîgîr: Yê ku di dawetan
da xwarinê peşkêş dike.

Çetir: Gutil, tilp.

Çetr: Kon

Erzê halê mm bigota yê bi 'inwanê
edeb Asîtan bikra zîyaret çetr u
seywan û tunab (M.C)

Çevan: Çemandî, tewandî.

Çevandin: Xwar kirin.

Xemrîyên xemzede nisbet dalan

Ku çevandine ji reng kopalan (M.C)

Çevî: Xwar bû, tê da ma. Tewandî,
sergulî.

Bayê evinê ku livî

Ew qîşt û zulfê ser çevî

Her dem hezar dil dakevî

Xal lew di damê dane da (M.C)

Çevî bûn: Xwar bûn.

Çevîn: Pê da berdan.

Çevkan: Darê serê wî xwar û pê bi gokê tê lîstin, gopal.

Çewgan: *k.s.* Gopal.

Çewkan: Darê serê wî xwar ku pê bi gogê tê lîstin, ev dar nîşana serwerîya padişahan e jî.

Ela Seyyîdê sefwet

Tu roja heşr û pirfitnet

Bibêjit ummetê "ummet"

Fekende ser wê çewkanê (M.B)

Çewkan û dal: Bisk û gulîyên weke gopal û tîpa dalê.

Çewşen: Sîng, zirx, coş.

Çewtawe: *k.s.* Xûz, xwar.

Çexane: Tembûra pir tel.

Horên di bihiştê û perî cumle cema tên
Zuhre reqisî çeng û çexane bi xina tên
(M.C)

Çêl û çep: Hilebaz, bi xap û rîp.

Çi derbest e: Tu mineta wî nîn e.

Çigon: *k.s.* Çawanî, keyfîyet.

Çihar: Çar, 4.

Çihar erkan: Çar bingehên hebûnê:
Agir, av, ax, ba.

Çi hasil: Çi feyde, çi encam.

Çi hez: Çi nesî, çi par.

Çillexane: Cihe ku peresdar têda perestî dîkin. Cihê sofî çil rojî tê da îbadet dîkin.

Çilon: *k.s.* Çawa.

Çilroje: Kesê dikeve çileyê.

Tûrê Sînaya dilê min daîma 'erşê te ye
Ehdeyê çilroj temam kir Mûsayê
îmranê ma (SP)

Çil û çêwim: *k.s.* Qirşikên ji bo şewitandinê.

Çil û erbe'în: Çil rojên ku sofî têde dûrî xelqê diçe da ku perestîya Xwedê bike û xwe ji qirêja dinyayê pak bike.

Çill û çoker: *k.s.* Fesad, ew kesê ku gotina dibe û tîne.

Çim: *k.s.* Çîyayê min.

Çim le pêş e: *k.s.* Li pêşîya min çi heye.

Çin çin kirin: Helqe helqe kirin, kirin gustîlok.

Çîn çîn bike turreyd-i şebreng

Gul gul veke arizd-i gulreng (E.X)

Çineş: Çikesê, her kî.

Çiqî: *k.s.* Serê tiştêkî tûj, wekî derzîyê, serê strî.

Çira: Ji bo çi, çima?

Çirax: Çira.

Muhemmed seyyide alem şeff'e roja mîzana

Çiraxê dîdeê Adem xudanê wehy û Furqanê (M.B)

Çiraxê şêx: Koçekên şêx e salê carekî ajelekî ji mala şêx ra dibe.

Çiraxê zerrîn: Çira zêrîn, çiraya rengzer. Mebest roj e.

Yanî ku vekuşt çiraxê zerrîn

Wer girtî ji nû hîbasê rengîn (E.X)

Çirb: Xurekên rûnî.

Enwaê teamê çirb û şêrîn

Elwanê xîda û nuqlê rengîn (E.X)

Çirî: Awaz gotin.

Çirkîn: Bê biha, bê nîrx.

Çiro: k.s. Derketina pelên şitilan.

Çitîr: k.s. Tiştîr.

Çivîyayî: Xuz. Xwar bûyî.

Rûniştî ji pêşê wanve Zal'ek

Qametçivîyayî rengîlalek (E.X)

Çix: Derkeve. Ji “çik”a Tirkî.

Çi xered: Çi pêdivî pê heye; armanca me pê çî ye?

Çî dewê: k.s. Çi dixwaze.

Çîhar erkan: Her çar goşe, yani Rojhelata bakurî, Rojavaya bakurî, Rojhelata başûrî, Rojavaya başûrî.

Çîharim: Yê çaran.

Çîhre: f. Çehre, rû.

Çîn: 1.Xelek, helq, gulî. Hunandina por, fetl û pêç. 2.Tebeqe. Beşeke taybet ji komekê. 3. Xûz.

Ji tesîra buxara wê bixûrê

Ji çînê zulf û neqşê rûbinûrê (Ş.M.E)

Çîna turreya mişkîn: Girêka biska reş û bêhnxeş wekî miskê.

Çînawî: k.s. Navê kincekî taybet e.

Çîn bi çîn: Xelek bi xelek.

Çîn çîn: Xelek xelek.

Çîn çîn bike turreyd-i şebreng

Gul gul veke arizd-i gulreng

Çîn û tab: Dema mûyê serî dibe xelek xelek.

Çîr: Serkeftî, serdest.

Çîro: Çîrok.

Çobî ter: Dara ter.

Çogan: Gopal, şiv, çoyê gogê.

Çoganê di dest digel gupalan

Avêtine gerdenêd xezalan (E.X)

Çokar: Xizmetkar, seyis.

Çolax: ‘Ezil.

Çolperwer: Kesê ku ji çolê hez dike.

Ço mah: f. Mîna hîvê.

Çon: Mîna, wekî

Çop: Dar.

Çore awêk esiltew ewwel: Ey meriv tu ji niqutek av hatiye afirandin!

Çox: k.s. Sal.

Çu: Tu.

Çunan: f. Wisa, wiha, wilo.

Çun can û sûret: Çunkî ruh û leş.

Çun gulzar: Wekî gulzarê ye.

Çunîn: f. Herwekî, mînak

Çunîne: Hîç nîne.

Çust û çalak: Bi lez û bez.

Çust û çapûk: Bi lez û bez.

Çû: Wext, dem.

Çû bal ve: Çû bi alî wî ve.

Çûn: Wekî, dema, ji ber, lewra.

Çûn can: Wekî rih.

Çûnxweş: Bihêle çûna pîr û kalan û tevgera wan xweş be.

D

Da: Nebî nebî..

Da': Derd, jan, êş, nexweşî.

Da: k.s. Heta ku, da ku, ji bo.

Daberistin: Êrîş kirin.

Daberizîn: Berizîn, êrîş kirin, hicûm kirin.

Peyweste du fêris ji me ra daberizin dil
Zulfan bi çep û rasti li oxilme cema
girt (M.C)

Dabetul erd: e. Li gor dînê îslamê
ajelê ku ji bin erdê derdikeve û
misilman û kafiran ji hev diqetîne.
Heyîneke pir ecêb e ji erdê dertê.

We Ye'cûc û Me'cûc ku pirr heybetin,
Digel Dabbet-ul erdê, rojdertin
(M.X.S)

Dabê qedîm: Adetên kevn.

Dac: Tarî, Şeva tari.

Qebûl in ba cû bo me xakîpa tac
Sîracê bo feqîran der şebê dac (Ş.M.E)

Da çîn: Da biçin.

Dad: 1.Edalet. 2. Gilî, şikayet, hewar,
gazî.

Kes bi dada ma ne pirsit gilleh û dadi
çi kit?

Te nebit dadiresek beyhûde fîryadi çi
kit? (M.C)

Dadayî: Dadan, lêdana amûrên
muzîkê.

Dadayî û teblexan û sazan

Çawûş û seda û gaze gazan (E.X)

Dadernirê cil: k.s. Jixwekirina kincan.

Dadires: Yê ku meriv gilî li cem wî
dike; yê ku bi hewarê ve diçe.

Dadirînî berok: k.s. Çirandina
beskurkê.

Dadî: Bigre.

Dad kim: Hawar bikim, gazî bikim.

Mi navêt ez bi fîryad kim

Li zulma dîlberê dad kim

Sehi dê şubhê Ferhad kim

Bidim rûhê ji kovanê (M.C)

Dad û meded: Însaf û hawar.

Çengelek avête dil kun kir li min dad û
meded

Qelbekî hişk û sefalîn min divêt can tê
ebed (M.B)

Dafi'e: Hêza çarem e ya xwarinê
didhefîne derve.

Dafi': e. Yê ku ziyanê ji holê radike.

Avêjer, nehêler, raker.

Daheristin: Bi hev ve çûn.

Daheristî: Bi ser hev da çûyî, têkel
hev bûyî. Bi hevdu ra daket.

Dahî: Bela.

Dair: Gêrbûyî, gerîde. Halê
zîvirandinê.

Ger de tu nebuya nedibû çerxê be dair
Sergeşte ji şewqe tenê ne melikî ne
(M.C)

Da'iye: Sebeb.

Da'î: Gazîker.

'Enberîn beyne zulfeynî xudanê qab û
qewseyn

Li ser çavên me ne'lên bi te ey da'îyê serwer (M.B)

Daim: Yê ku hebûna wî her berdewam e, ji navên Xwedê ye.

Daîmen: e. Her dem.

Lew me dil mesrûrî hal e daîmen jê têt xûroş

Nazika gerden şemal e hate metle'e perdepoş (M)

Daîre: Xeta gilover.

Daîrebend: Qora govendê ya gilor. Di xelekekê da govend gerandî.

Hin daîrebend û hin di dewwar

Hin sîlsîlebend û hin di seyyar (E.X)

Daîye: Sedem.

Herçî bibitin ji xeyr, eger şer

Bê daîye nabitin miyesser (E.X)

Dakî: Hildî, şîreta qebûl bikî.

Dakî sêbero: k.s. Nexweşiyeke efsanewî ye.

Dal: Wendabûyî.

Dal: e.Tîpeke (D) di alfabeya erebî da. Tîpa 'dal' a alfabeya erebî.

Gula bê xar û pur saf a herîfan

Hela rake ji ser "dal" û "elîfan" (Ş.M.E)

Dalalê mitleq: Avarêtiya yekcarî.

Înkar-i biket dalalê mitleq

Îqrar-i biket bi sûretê heq (E.X)

Dalê dam: Weke tîpa dalê kirin dav.

Dali dayê: Mîna tîpa 'dal'ê li hev bada, lê tewand.

Dal û rê: Du tîpên alfabeya erebî ne, armanc ji wan 'dur' e. Remzeke ji bo diranan tê gotin.

Dam: 1.Davik, dav. Gulî û biskên weke davê 2. Heywanên kedî. Canîwerê kedî. 3. Tûr.

Wî ji zulf û xalê danî dam û dane bo dîlan Da biket hebs û qefes her lehz û sergerdanekî (P.B.H)

Dam: f. Ben.

Dam: Dafik, faq, 2.Cureyekî lîstikê, malik.

Damad: 1.Zava. 2.Dîlan.

Ursa ku firîşte dawetî ne

Damad û erûs-î cennetî ne (E.X)

Dama muhbetê: Dava evînê, davika hezkirinê.

Bi dama muhbetê bend im, xedenga firqetê dil nuht

Bi şubhê murxî nim besmel, di hev wertêm di xunê da (M.C)

Daman: 1.Qûntar, daw. 2. Bi kûranî fikirîn.

Rabû ku ji pêgve çû xeraman

Kêşa li zemîn bi naz-i daman (E.X)

Dama sunbulan: Gulîyên weke davê.

Dil girt bi dama sunbulan, berda û disa hebsî kir

Mîre ku ew her daîma girtin û berdane xerez (M.C)

Damen: f. Daw, pêş.

Damê: Davê.

Dana: *f.* Zana

Te'eccub jê dihate pîrê dana

Neçû,seknî temaşa kir li vana (Ş.M.E)

Danawu tê geyûn: *k.s.* Kesên zana û têgihiştî.

Dane: *f.* Gewdeya gulan , gulpike, gulan. Tene, tov, dendik, heb, gulle.

Daneê nar: Daneya agir.

Da nellên: *k.s.* Ta ku nebêjin.

Danem: *f.* Dizanim, zanim.

Danend: Zanîn.

Ji herfan, mah û salê ma, nehat der, şiklê xalî ma,

Ku ca danendi hali ma, sibikbarai sahil ha (M.C)

Danim: Dayinim.

Daniş: *f.* Zanist. Şêwr, zanîn, têgihiştin.

Danîn: Da bizanibin.

Danyal: Pêxemberekî cihûyan e bi pêşbîniyên xwe ve navdar e. Di Tewratê da beşek bi navê wî heye.

Dar: *k.s.* Sêpê.

Dar: *e.* Mal, xanî, cîgeh.

Ne min dar û dîyar e dil berî çû

Esîrê zulfê kirme dil berê rû (Ş.M.E)

Dara: Şahê Hexamenişînan yê dawîye. Darayê sêyem e.

Abi-heywan te divêtin, tu bibe hemrehê Xudr

Cami Cem bin û ji Dara û Sikender meke behs (M.C)

Darbest: Tabût

Darek: Xanîyê te.

Darekey ser kel: Dareke ku li dora wê tu darên din tune be û ev dar li ber ba bilerize.

Darende-Darinde: *f.* Xwedî, dewlemend. Malî, finans

Darê dinya: Cîhan.

Hîkmet ewe ew ji darê dinya

Çûn seyr-i kirin serayê uqba (E.X)

Darêht: Avêt, pê çêkir, nivîs û qeder.

Darê mihnet: Mala derdan.

Eywan li me bûye darê mîhnet

Zindan bi me bûye baxê cennet (E.X)

Darîn: 1.Li gor ku tê gotin, navê cihê ku Xizir û Elyas lê hev dîtin. 2.Li rojhilatê Hicazê, li perava Xelîcê Besrayê bajarekî kevnar e ku berê yek ji navendên bazirganîyê bûye.

Me ji le'l-lebê yarê xwe vexwar avi heyat Exyari bila têkî biçin Darînê (M.C)

Daro: Derman.

Darul qerar: Bihuşt, cennet.

Ew çi dem e şahebax e gulşena darul qerar Sed hezaran nal û awazê bilbil çar kenar (M.B)

Darusselam: Bihuşt, mala xweşîyê, warê aşîyê, welatê misilmanan.

Dinyayê bavêjin تمام

Zikrê bikin daîm mudam

Da hûn biçin Darus'selam

Ew der ku salih diçinê (M.E.F)

Daruşşîfa: e. Nexweşxane.

Daruw: Derman, darû, îlaç.

Mawêra belgên gulê bû

Bêhn û bû ya kakulê bû

Daruwê qelbê "Melê" bû

Lew bi çehvên min cela ye (M.C)

Daruwê evînê: Dermanê evînê, hilma evînê.

Darû: Derman, îlaç

Dasîtan: Destan, Serpêhatî, çîrok, qiset. Çîroka kevn.

Xendan bike xunçeya dehanê

Nalan ke hezarê dasîtanê (E.X)

Da tiya bimirim: k.s. Heta ku ez di nava wê wextê da bimirim.

Dav: Da ev.

Dav: Dafik. Dava ku pê çivîk tên girtin.

Davdoz: Fêlbaz

Dawer: Dadwer, navekî xweda.

Dadgerê adil, mebest Xweda ye.

Sed şîkr-i te bext-i bûye yawer

Çawa te di vê, we da te Dawer (E.X)

Da'wet: 1.Dua. 2.Dîlan.

Da'wet gerîya bi sîdîq îcabet

Bû wasîteyê qezayê hacet (E.X)

Dawên: k.s. Dang, serkap.

Dawidî: Kesên li ser dînê Dawid Pêxember

Dawûdî û Sibî: Cihû.

Gava ewî dîn kir aşîkara

Dawûdî-yû Sibî-yû Nesara (E.X)

Dax: t. Çîya.

Dax: Birîna şewatê, cihê şewitî. Birînen şûna agir.

Ji xeyri daxê xem nîne dewayek

Ku ser da derdê bê derman e dîsa (P.B.H)

Daxa qedîm: Birîna pir kevin, birîna kevnar.

Şubhetê çengê dinalim, hêj ji dest daxa qedîm

Herwekî meş'el disojim, dost nizam agah heye? (M.C)

Daxdar: Bi dax, daxdayî.

Daxê işqê: Kewandina evînê. Daxa evînê.

Daxil: Di hundir de.

Daxil geriya: Tev lê bû.

Ew bû sebebê heqîqeta me

Daxil gerîya terîqeta me (E.X)

Daxilê meclis bûyî: Ketiye civatê da.

Daxistan: Welatekî pir bi kevir û çiyayî. Li Qefqasyayê ye.

Daxîdar: Daxbar, birîndar, hesretkêş. Xemgîn dertgiran.

Daxkeş: Daxker, yê birînê dax dike.

Daxo: k.s. Aya.

Daye Rêzbar: Navê jinekê ye. Tê gotin ku ev jinik ji yarsanan Kakayî ye. Di şerekî da ev jin ducanî bûye, ji ber ku di wî ji mêran kes nemaye û ji

bo ku dunde ya (dola) wan berdewam bike, bi zarokê xwe ra zewiciye.

Dayete: Daye.

Dayê te nezer: Te guh daye.

Dayî' mekun: Wenda nekin.

Dayimen: Herdem.

Dayim wekû: k.s. Her dem wekî.

Dayî' bû: Wenda bû; vala çû.

Dayî didî: e. Wenda dikî

Dayîn: Daye.

Dayme awa bê: k.s. Her dem avadan be.

Daynandinê: Danîne.

Da zenn nebîrî: Nebî ku tu guman bikî.

Dazîne min: Dane min.

Deb: k.s. Adet, nerît.

Deba bûn: Lerizîn.

Deba nekî: Nehejînî.

Debaxane: k.s. Cihê ku postên ajelan saz dikin.

Debdebe: Hêlehêl, gurmegurm.

Vê debdebeyê we kirne aşiq

Bû zelzele, rakirin xelaiq (E.X)

Debeng: Gêj, ehmaq, mest bûyî.

Hin mest û hinek fikir debengî

Xwanende û bezlego û çengî (E.X)

Debê: k.s. Dibê, lazim e.

Debir: Debar, tebat, semax.

Di ateş de Xelîlê Heq sebir kir

Ji nûra wechê dîlber bû debir kir (Ş.M.E)

Debîq: Dermanekî rengesk. Cureyekî hevrişimê Misrî. Debiq bi xwe bajarekî Misrê yê bi hevrişimê xwe ve navdar e.

Îrohe du keç xerîqê şîba

Ser ta bi qedem debîq û dîba (E.X)

Debîr: Nivîsvan. Katibê dîwanên mezinan.

Debîrê dîwan: Katibê dîwanê.

Tacdîn weledê Wezîrê Dîwan

Mem jî xelefê Debîrê Dîwan (E.X)

Debr: Îdarekirin, birêvebirin.

Hemyan bi teye midare û debr

Feyyazê rîyazê xelqê wel-emr! (E.X)

Debrîtewe: k.s. Qut dibe.

Debye: Tu dibî.

Decacîl: e. Pirjimariya decal e.

Ded: k.s. Dirînde. Ajelên dirînde, wekî şêr û piling. Ajelên kûvî.

Dede: t. Kalik, Bapîr.

Dedirewşayewe: Şule dayîn, ewşen bûyîn, ronîdar.

Dediwan: k.s. Wan digot.

Def: Dev.

Def': Vegerandin, qewirandin.

Mexmûrî ku defê kir meya nab

Bêhn kir gul û sinbilêd-i têrab (E.X)

Defaîn: Piranîya defîneyê ye.

Def' bikim: Dûr bixim.

Defê tuhmet: Dûrxistina gumanan ji xwe.

Defê agir: Vemirandina agir.

Defê mermer: Sînga spî wekî defeke mermerin.

Deftera cihazê: Deftera ku tiştênji bûkê ra divên tê da hatî nivîsandin.

Me'fikir di heqîqet û mecazê

Binvîse li deftera cîhazê (E.X)

Degirim: k.s. Datînim.

Degirnewe le nexoşî mina: k.s. Ew tûşî nexweşîya min dibin. Ji nexweşîya min nexweşîya werdigirin.

Dehan: Devan, Dev.

Yusifê dewr û zemanê

Go: Nesîm han vê nişanê!

Lê ji bo nekhê dehanê

Nexweşan ew lê şîfa ye (M.C)

Dehanê ejder: Dêvê ejdeha.

Dehir: e. Zeman, çerx, serdem.

Dehl: Bostan, bexçe.

Ehmed im sîne sîper pêşberî tîra felekê
De'wedare te me îro, tu ji dehlê were der! (M.C)

Dehqan: 1.Axa. 2.Baxvan, cotkar.

Dehqan tuwî em wekî nîhalîn

Ezman tuwî, em bi xwe dilalîn (E.X)

Dehr: Zeman. Tekrar, zemanê dirêj.

Me ra sermayeyê zîn behrê nîne

Suxen ra qîmetê der dehrê nîne!

(Ş.M.E)

Dehşet: Erjeng, tîrsa pir, saw, kabûs.

Sermayeyê wehşeta cinûnan

Mermûze di dehşeta uyûnan (E.X)

Deka: k.s. Dike

Dekrê: k.s. Kirin, dê bike.

Delale: Delalî, nazî.

Îsal ku ji pêş da wê bibînim te delalê

Ser pasê hilînim ez ji ber husn û cemalê (M.E.F)

Delalê mutleq: Jirêçûna xwerû, windabûna bi yekcarî.

Delalîy: k.s. Rênîşandan.

Delawer: Mêrxas.

Ferdeki ji sehabeyêd-i Kubber

Pênsed ji delawerêd-i kuffar (E.X)

Delal: Jirêketî, rêwindabûyî.

Delek: Têgihiştin, mizdan. Çû ava.

Delek: k.s. Kûze, kûzik, sansar.

Delîl: Rêber, pêşewa, sultan.

Dell: Wendabûn.

Dellak: Berber.

Dellal: Bangkirox.

Delle: Tol (Fahişe), kunek, pîrê.

Ew delle bi dil we bûye dellal,

Dildade ji pêşve man demek lal (E.X)

Delle û muhtal: Hîlekar.

Dellê: k.s. Dibêje.

Delq: Ebaya derwêşa. Ebayê qetîyayî, yê peritî.

Tinê ew secdeya şukrê, te bir mîhrabi qewseynan

Ku delq û şeml û seccade, bi vê avê qesaret kir (M.C)

Delw: Birca Satilê ji 12 bircên rojê.

Birca dewlê.

Kêwan-i di Delw'êda nîhan bû

Bercîs-i di Hûtê bînîşan bû (E.X)

Dem: 1.Zeman, geh.

J'Hinde bibin talanî bikirin kile
subhanî J'bo çehvêt şehsultanî, dema
têtin sersal e (S)

Dem: e. Xwîn.

Dem: k.s. Dev.

Dem': Stêrên çav, hêstir.

Sohtin te bese mîsalê şem'an

Bes şibhetê min bibare dem'an (E.X)

Dema: Germetî.

Dem'an: Piranîya 'dem' e yanî hêsir.

Demax: Mejî.

Demaxê çax: k.s. Mejiyê qelew.

Dembest: Bêhnçikîyayî.

Dembeste: Kese ku bi zehmet helma
xwe dide û distîne.

Nîhayet betillî dembeste der dem

Ji neqnîq û şehîq û sewtê pir xem
(Ş.M.E)

Demdeme: k.s. Dengê pir.

Demê sûr: Roja qiyametê dema li
boriyê bê pîfikirin.

Dem'ê sewqê: Rondikên hêstirên
evînê.

Demgeş: Kese bi hêsan helma xwe
dide û distîne.

Sermest-i hinek, hinek di serxweş
Dembeste hinek, hinek di demgeş
(E.X)

Demgezê: k.s. Gezkirin.

Demîr: Dil.

Ney dût e hebîbê me çi fîryad û fixan
kin? Wê guh li demîra dil e, awazî çi
hacet? (M.C)

Demîr: Cînavk; Cînavkên erebî weke
“hû, ha” gotin û îşaretên kin.

Demkeş: Yê ku bêhna xwe berdide.

Demkujît: k.s. Min dikuje.

Dem le dem nan: k.s. Şerê devkî, bi
axaftinên nebaş.

Demrin: k.s. Dimirin.

Demsaz: Dost, heval. Hevdeng.

Şahîn û xeman divête enbaz

Derdan û deman divête demsaz (E.X)

Dem û dest: k.s. Demildest, derhal.

De'n: Mih.

Denaet: e. Nebaşî, xerabî.

Dengiz: Ji “deniz”a tirkî; derya, behr.

Denî: Nebaş. Pîs, beradayî.

Girtî di vê behra denî

Qet nanivî nasekinî

Reh şubhetê qelbê min î

Ji mihnetan û zehmetê (F.T)

Denîşe pâyewe: Mêşê: Mêş bi wê ra
rûdinê.

Deq: Kutan, lêdan.

Deq didin: Dihêrin, dikutin.

Ew çend ewî deq didin, dihêrin

Ew çende di şehrê ten digêrin (E.X)

Deqîq: Kûr. Têgihîstina pir zor. Tiştê
pir hûr.

Der: f. Li, di... da.

Der': Guhan, memik.

Zava bi edeb ku çû ji der'dan

Şem'a ku li pişt hîcab û perdan (E.X)

Deramet: Dahatin, warîdat

Der axûş: Di hembêzê de.

Derazîn: Derîzan, berderî.

Ji toza wê derazîne dikim feryad û
nalînê Xudê çekit di wê h'inê wîsala
lutf û îhsanê (M.B)

Derb: 1.Lêxistin. 2.Çapkirina diravan.

Neşêm êdî ewan derdê bê hed

Bikêşim lew bi derb û jan e dîsan
(P.B.H)

Derban: k.s. Dergevan.

Derbar: Koşkên şahan.

Derbend: 1.Rêyên teng, rêyên asê.

2.Hudûd, sînor. 3.Li Îranê navê cihekî.

Xassê teşrîfa te bin derya û derbendê
'Ecem

Da xelatên her seher sed zerkeş û
mexmûrî bî (M.C)

Derbeder: Tenzere, aware, mişextî.

Perîşan, aware.

Şubhê mestan im wekû dîwane ez
diwan ne ser

Badenoş im pur xuroş im bêyî huş im
derbeder (M.B)

Derbeste: f. Derîgirtî.

Der bê: k.s. Bê der, derketina derve.

Derbêtext: Bextewarî.

Derbûmesel: Gotinên pêşîyan.

Derc: Xuricandin. Têxistin, weşan.

Tiştê neqşandî, nivîsa li ser neqşê.

Daxilkirin.

Neqş û nîgarên dîlberan

Dercîn ji remzên esmeran

Her tîni ji dest neyşekeran

Me ji gulşenê ferxari xet (M.C)

Der came: f. Di şûşeyê da.

Dervedar: f. Xwedan derd.

Ke çerx Eskenderî dî dervedar e

Witî: em hem biwe hemderdî Dara
(MW)

Derdeha: f. Pirjimariya "derd" e.

Derdem: k.s. 1.Derhal. 2.Di nava dev
da.

Derdemend-Derdimend: Derdnak.

Biderd, xwedîderd.

Hemderdê dilêd-i derdemendan

Hemperdeyê sirrê misteraendan! (E.X)

Derdenak-Derdnak: Biderd,
derdmend.

Derdes: k.s. Di nava destan da bû.

Derd guzîn: Yê ku derd û kulan
hildibijêre.

Der dîde: Di çav da.

Derdkeş: Derdkêş, derdnak.

Dermend: Pirjan, nexweş.

Derece: Pele, rutbe.

Derê xemmar: Derê meyxaneyê.

Hin ji nik dêrê ve tîni, qesta kenîştê hin
dikin

Ney ji van im, ney ji wan im, min derê xemmari bes (M.C)

Derfet: Îmkan

Dergehê fethê: Derîyê dilberê.

Lê li tûlê asîtanî, "çix" bi wan le'lan kirin Dergehê fethê vebû, îro li mehcûran 'eceb (M.C)

Der girdîş: Li derdor.

Derhal: Di cih da.

Derhem: Pereyekî hurde ye, piçûk, quruş.

Derim key: *k.s.* Tu min derxe.

Derî: Zimanê farisî.

Kurdî, Erebi, Derî û Tazî

Terkîb-i kirin bi hezl û bazî

Derîçe: Derîye piçûk

Emma ku derîçe têk kuşadin

Reng qur'eyê texteyê miradin

Derîxa: Mixabin.

Derîzan: Şîpanek, dergeh, şêmîk.

Derk: *e.* 1. Kûrahî 2. Tebeqeya dojahê, berjêr.

Derk: *e.* Famkirin, têgihîştin.

Der kemîn: Li kozikê, li kêminê

Dermenîşan: Derdmend.

Dermende: *f.* Bêcare, belengaz, reben, perişan.

Ewan gurganê teb'an der kemîn in Kesê dermande ew carek bibinin (Ş.M.E)

Der mehel: Di gavê da, der hal.

Dermende: Nexweş.

Dermeyan: Di nav da.

Der mezarê sehle: Di gorê da.

Der qel'e: *k.s.* Di nava kelayê da.

Derr: Zîrar, dij.

Ev herdu cîhan bi hev hewîne

Ev derre li derrê bev qewîne (E.X)

Derrak: Têgihîştin.

Derrakeyek: Yê ku têdigîje, fam dike.

Ber ji can derrakeyek rewşentir û wala divêt

Sûretê husna mûqeddes da bikit îdraki rûh (M.C)

Derre: Hewî.

Derrende: Heywanê çirînok.

Derrende, dewende û perende

Hin kuştî digirtî, hin fekende (E.X)

Der sucûd: Kesên di secde da. Xwe tewandî, xwe çemandî.

Derubar: *k.s.* Ber derî.

Derûn: *f.* 1. Hindur, nav, daxil, 'alema melekût. 2. Ruh.

Derûnê kûreyê bû nar û ateş

Ku tê de bûte bû wek xemreya geş (Ş.M.E)

Derûnim: *k.s.* Hindurê min.

Derûnî: Hundurî, ji hundir, ji dil, nefsanî

Der sûretê tehqîqi: Di rastîyê da, di heqîqetê da.

Derwaze: Derî, dergeh.

Westanî û Nêrgizî û Seqlan

Derwaze û Omerî û Meydan (E.X)

Derwêş: Kesê girêdayê terîqetekî, sofî. Kesê ji bo rêya Xwedê da hejarî û dîlnizmîyê qebûl kiriye.

Hikayet kir ji bo wan pakê Derwêş
Yetîmê bêkes ê dilçaki Derwêş
(Ş.M.E)

Der xatir: Di dil da.

Dibû der xatir û hem jî digotin
Xeberdanê ku wan pê dil disotin
(Ş.M.E)

Derxor- Derxur: Layiq, babet. Seza û misteheq. Şayan, kêrhatî, hejî.

Derxur: Xurek.

Îlla ku hinek ji îbnê Adem
Bûn derxurê agirê cehennem (E.X)

Derxuriş: Layiq û hêja.

Deryemîn: e. Di sondê da, bi sondê.

Des: Dest.

Desatîr: Navê kitêba pîroza
“Mehabad pêxember” e

Desênirê: k.s. Stendin.

Destbeste: Dest li ser hev bi stûxwarî.

Şayeste bike tu îhtîramê
Destbeste vewest, bike selamê (E.X)

Dest bi dar: Karbidest.

Destda-detsdan: Destxistina tişteki.

Destegîr: Alîkar, alîgir, piştgir,
piştevan. Yê ku bi destan digire.

Wesî yû qeyyim, multeqit, muste’îr,
Îmam û xizim, salih û destegîr.
(M.X.S)

Destemlanî şîşey mul: Dest dixin
milê şûşeya meye.

Destexane: Sifre.

Destê sure: Destê bi cazîbe, destên
bedew û şîrîn.

Neyşeker û dêm-dûrê, da me bi destê
surê Cam û qedeh şubhê av, lew me
rewan tên xezel (M.C)

Dest helgire: Dev jê berdan.

Destim dewê suwawî esef: Destekî ji
xeman pir ta’b dîtiye, dixwazim.

Destîgir: Alîkar.

Destkor-destkol: Simê hespan.

Dest û awîz: Dest û şûr.

Destûbira: Destbirak.

Destûr: Qanûn, emir, îzin, yasa.

Detiwêtewe: k.s. Helandin.

Detkate tîrok: k.s. Ew te dike tîrika
nan.

Dew’: Tîrej, ronahî.

Gava weku pêkve miqtebis bûn
Ew herdu li dewê min’ekis bûn (E.X)

De’wa: Doz û daxwaz.

Dewa: e. Derman.

Ji xeyri daxê xem, nîne dewayek
Ku ser da derdê bê derman e dîsa
(P.B.H)

Dewab: Heywanan. Her curê ajelên li
ser rûyê erde.

Ev dar û ber û dewab û însan

Ev maden û ev nebat û heywan (E.X)

Dewair bûn wesil: Daîre gihatin hev,
perçe bi hevra bûn.

Dewa kit: Derman kir.

Dewan: *k.s.* Hilatî, rakirin.

De'wa nesebê bikit bi Xalid: Bêje ku
ez jî ji nijadê Xalid kurê Welid im.
Mîrên Botanê ji alîye nijadê da xwe
digehandîn hevrêyê pêxemberXalid
kurê Welîd.

Dewende: Beza. Devende, ajelê ku
dibeze.

De'wet: Dua, zemawend.

Dewfed: Pîvaz.

Dewh: Dar.

Dewhe: Dara mezin.

Her dewhe ji wî, û her tiyûrek
Yek qesrê ji cennetê, û hûrek (E.X)

De'wî yî: *k.s.* Dewa, doz, îddîa.

De'wîyyet: *e.* Angaşt, îddîa.

Dewlet: Bext.

Elî rûnê ji vê qelqê

Bike sebrê bibîn zewqê

Menêre dewleta xelkê

Çiku pasê tu bêy nayê (M.E.F)

Dewlet îfza: Dewlet zêde, dahatû baş.

Dewleta xelkê: Dewlemendîya xelkê.

Dewletxwaz: Xerxwaz.

Dewr: Dor û car, ger.

Dewra felekê: Çerx û gerîna felekê.

Dewran: 1.Gerdûn, cîhan, felek, çerxa
felekê. 2.Zivirîn, ger. Zeman.

Lê me her dewran e subhê guljenê

Em li dewra baxîbanî rast û çep
(Ş.N.B)

Dewran dewamê nadetê: Dewran,
dewamê nade sefayê, bi dawî tîne.

Dewrê hal: Wergerîn û guhartina hal.

Dewrê eyyam: Çûn û hatina rojan,
dewran.

Agahê ji halê dewrê eyyam

Ev rengehe gote min serencam (E.X)

Dewrê munteha: Çerxa dawî ji
felekê, dawîya dinyayê.

Dewruber: *k.s.* Derdor.

Dewr û teslîm: Cîguhertin.

Dewwar: Zivirok, ya ku pir dizivire.

Dinyaya ku digere û dizivire. Gêrbûyî.

Dinê mehd e û malok e

Dinê le'b e û leyzok e

Çi zanin tîfl û zarok e!

Felek çerx e û dewwar e (F.T)

Dexel: Ne safî, qelp û sexte.

Qelbê dexelî, bi dil neyarî!

Pir çîl û çep û xirab û xwarî (E.X)

Dexl: Dan.

Dexm: Pir qelew.

Deyf: *e.* Mêvan.

Deymûmiyyet: Dewamîti timîti

Deyq: Teng

Deyr: *e.1.* Warga feqîran. 2. Dêr.

Dav kuhne-xani mislê deyr

Çendin kewakib tene seyr

Peykan bi davê şubhê teyr

Her jê dibarin nari çerx (M.C)

Deyrê ezreq: Dêra şîn, Asîman.

Deyrê kuhne: Dêra kevn, xana kevn, dinya.

Deyşîpîrsî: k.s. Ew jî dipirse.

Deywit: k.s. Wî digot.

Deyyar: Meriv, kes, niştecih.

Agah-i ne bûn ji wê çu deyyar

Ne daye, ne xadim û perestar (E.X)

Deyyûmî: Dewamî, hertimî.

Dêhat: k.s. Gund.

Dêm: 1. Rû, çehre, suret. Gurçikê rû.

2. Erdê bêav û ziha

Dêmdur: Rûyê weke durrê rind.

Nêrgîza nazik û ter neyşekera mest û xamar

Dêmdûr û le'lîleb û muhteşem û mu"tebere (M.C)

Dêmê gulî: Rûyê wek gulan, sorava.

Dêmkewkebê: Rûstêrk, dêmên weke stêrkê bi nûr.

Dêmmelek: Rûmelek

Dêmnedîr: Rûyê weke agirê ku ji bo agahdarbûna tiştê li cihê bilind tê vexistin.

Dênê hemî demê: k.s. Di hemî deman da tîne.

Dêrê ezreq: Dêra heşîn, asîman.

Qendîlê minîrê dêrê ezreq

Mîşkatê Hemel ku kir mirewweq (E.X)

Dêrîn: Kevn, kevnar.

Bi çeşmê dil bibînim qedda şêrîn

Jibîra kim xem û ekdarê dêrîn (Ş.M.E)

Dêwane: k.s. Dîn, şêt.

Dêwanegî: k.s. Dînî, şêtî, cunûnî.

Dêwê: Ehrîmen, şeytan.

Çû dêwê heftserî, pîra meroxwir

Li te zahir dibit ba xedreke pir (Ş.M.E)

Dêwê kâbus: Dêwê ku di kabûsan da xuya dibe.

Dê neql bikin: Koç bikin.

Dêwê serkeş: Şeytanê li hember Xwedê serî rakirî.

Elqîsse: Bi kî ku dêwê serkeş

Tenha û tenê bi çîte ateş (E.X)

Dibac: Cureyek qumaş.

Heramî û dîbac û qez ber meke!

Bi wan ta'etê xwe tu berze meke! (M.X.S)

Dibestin: Girêdîdan.

Dibihê: Dibihîzî.

Dibihî: Dibihîze.

Dibûn muheyya: Sax dibûn

Didan: Diran.

Dideret: Didirîne, jê dibe.

Diderit: Dide.

Didirim: Didim.

Didirit qudretê: Ma kes dikare.

Digergûn: Guhêr, bi regekî din.

Teşwîş-i biçin ji qelbê mehzûn

Dîsan bibim ez ji nû dîgêrgûn (E.X)

Digerin: Dibin.

Digêra: Digerand.

Digêrî: Fiileke jêdera wê “gêran” e bi wateya kirin û çêkirin.

Dihan: *f.* Dev

Dihem: *f.* Dev.

Diheş: *f.* Dehşet, şaşmayî, heyirî.

Dihilêtin: Derdikevin, têrê dikin.

Dihingêvit cefa: Êş û ezaya dide.

Dihnêrim: Dihinêrim, dişînim.

Dihqan: Kesên ku çandinîyê dike û guh li dar û beran dike. Mebest Xweda ye.

Dikêşin siyaset: Dikevin azmûn û tecrubeyan.

Dikin dewr: Karên cihêreng dikin.

Dikirin: Dikirin fixan û zarî.

Dikirin zewc: Dikirin cot, têkel dikirin.

Dikir iqrar: Mukur tê, itiraf dike.

Dikirit feyz û meded: Ji kerema xwe qencîyê dike, bersiva daxwazan dide.

Dikir muxateb: Dihesiband, bi axaftin berê xwe didayê.

Dikit ihyayê mewatan: Mirîyan sax dike.

Dikitin qebûl: Dipejirîne.

Dikit meşq: Dinivîse.

Dikit nifûz: Dibuhure, derdikeve.

Dikî derç: Hildigirî, dixî.

Dikî musewwer: Şayese dikî, teswîr dikî.

Dilara: *f.* Dilrevîn, dilxweşî.

Dunya bûye pejrûne

Terazin bû dîlara

Biemrê “kaf û nûn”e

Werandin 'enber sara (M.G)

Dilaram: Hêsayîya dil. Sebra dilan.

Serî ba muhri bû bikr û dilaram

Mîzacê rûh ê tê kafûrî bû tam (Ş.M.E)

Dil’aşufte: Dilperîşan, dilbirîn.

Dila toş: *k.s.* Ey dil tu jî.

Dilawerê kuffar: Lehengê gawiran.

Dilawiz: Dîlpêve.

Rumanê le'lê minqar ê goherrîz

Dilawîze kirin morxê dilawîz (Ş.M.E)

Dilbend: Dilgirêdayê zulfê yarê.

Ew çi dilbend in muselsel, ew çi zincîr in kezî?

Ew çi mehyûş in, çi ala kesk û sor û qirmizî? (MC)

Dilberê di sade: Dilberên xweşik, yarên spehî.

Dilberi: Evîn.

Dilbirêj: *k.s.* Dîlpijêr.

Dilcû: Dilnerm.

Ewî Derwêşê sahibraz ê dilcû

Hîkayet kir ji bed yaran weha go: (Ş.M.E)

Dildade: Evîndar, yar.

Têk çûne bi ma'reza mezadê

Dildadeyê meqsed û miradê (E.X)

Dildan: Berdilandan.

Dildar: Mehbûb, evîndar, yar.

Ey dilo dildarê yaran

Esmer û zerrînguharan (SP)

Dildaş: Hevalê dil.

Ev îşq û hewa ku bûne dildaş

Can û dilê dê bidin bi şabaş (E.X)

Dile ‘erşî Xuda: *k.s.* Dilê kesê misilman ‘erşê Xweda ye.

Dilefga: Dilbiêş, xemgîn.

Dilefgar: Dilbijan, xemgîn.

Dilefkar: Xemgîn. Dil bitirs.

Ku 'ekkû bir penîri ew maye naçar

Me dî dîse ku deşî ew dilefkar
(Ş.M.E)

Dilefroz, Dilefrûz: Rohnîkîroxê dil.

Beyan kim razehayê her wekî rûz

Ji nav perda şevê herfên dilefrûz
(Ş.M.E)

Dilestin: Dileyistin, dilîstin.

Dil’ewîz: Dilgir, ya/ê ku dil digire.

Dilê beran: Dilê kevîran.

Dilê perde lê: Dilê ku aram bû û raza
xwe veşartibû û evîn eşkere nedikir.

Dilfigar: Dilbirîn, diljan.

Dilfîkar: Dildarê xembar.

Ez xar û zelîl û xakîsarim

Ev rege zeîf û dîfîkarim (E.X)

Dilfirûz: Dilronîker.

Dil geşt e: Dil naxwaze, bêzî dike.

Dilgir: Evîndar, aşîqi. Dil girêdayî.

Çû seyyadê bi fen pîrê mudebbir

Ji 'ekkû gotinê dîlgîri seh kir (Ş.M.E)

Dilguşa: Tiştê seng pê fireh dibe.

Dilha: Dilan, qelban.

Dilhezîn: Dilxemgîn.

Zînhare! eger di bî nigînê

Zû bîne ve, bo me dilhezînê (E.X)

Dilistan: Welatê dilan.

Dilkeş: Dilkişîn, ya ku dila dikişîne
xwe.

Ji cilwe w 'îşweyên şebazê dîlkêş

Hinik durr û goher dîse kirin pêş
(Ş.M.E)

Dilkişaf: *f.* Dilperçeker.

Dil kuned yad: Dil bi bîr tine

Dilkuşa: Vekîroxê dil, vekerê dil.

Dill azar: *k.s.* Ew kesê dilan dişikîne.

Dilldoz: *k.s.* Ew kesê ku bandor li dil
dike. Dilqulker. Ew tiştê ku dil qul
dike.

Dill lew dawê ber bûnît: *k.s.* Dil ji
benê evîna te rizgar bibe.

Dill nişîn: *k.s.* Li dil rûniştîye, cih
girtî.

Dill têkel hatin e: *k.s.* Dilxeliyayî,
dîlxelandin.

Dill tuwênewe: *k.s.* Dil helandin.

Dill zindûwe: *k.s.* Dil zindî ye.

Dilme pêtewe: *k.s.* Dilê min bi te
hatiye girêdan.

Dilnewaz: Dilgerm, dîlletîf. Geşkîroxê
dil, dîlxweşker.

Gotin: Ji mera tu dilnewazî

Ey daye! Ji bo me çaresazî (E.X)

Dilnişîn: *k.s.* Kesê ku ji dil e.

Dilpezîr: Bi kêr dil tê. Xwînşîrîn,
hezîrî.

Ew sehsuwarê dilpezîr, teb'ethelîmê bê nezîr

Şahê bi tuxra û serir bû xwendikarê Xeznewî (M.M.E.H)

Dilqeşan: Dil girtin

Dil pezêr: k.s. Dilgîr.

Dilrîş: Xemgîn, bêhêvî, dilbirîn.

Da bêne bi ser hîkayeta pêş:

Xelqê ku ji derdê îşqê dilrîş (E.X)

Dilruba: Ya ku dilan ji xelkê dibe, dilber. Dilrevîn, dilkişên, dilbir, dilstan.

Ew çi bejn e ew çi qamet ew çi qed e dilruba?

Ew çi exbar in te canan ew çi durr in pirbuha? (MC)

Dilseng: Dilkevîr.

Dilsitan: Dilber, dilstîn.

Dilsûtan: Dilsotan.

Dilxwah: Daxwaza dil. Tiştê dildixwaze, dilxwaz.

Carek bi dîya min ew bi dilxwah

Edî ne fikir min Ah-i billah (E.X)

Dilxwaz: Di lîstikên berê da navê şertekî ye. Yê têk çû yî razeke xwe yê serkeftî ra dibêje. Îro jî ev lîstik di nav gelên cîhanê da wek “rastî û wêrekî” tê lîstin.

Ji wan ehlê heqîqetnasî nîn im

Welê yek kelbekî dilxwazê dîn im (Ş.M.E)

Dilxweşker: Dilşaker, bicoş, bizewq, pesindar

Dimaî: Xwînîn. Yanî ew avika mêr di malzarokê da dibe pariyek xwîn.

Geh xûte di xut di behrê maî

Rengîn dibitin demek dîmaî (E.X)

Dimax: Poz, bêvil.

Dîmax sote bilbil ji bihna min dînalîn Çîçek û terh û sinbil hindî zehr li bal in

Av û hevva di daxil di bezma lîsane hal in (M.G)

Dimaxê can: Kûranîya gîyan.

Dmen: k.s. Kirasê ji navtengê berjêr.

Dimen: Kavil û xirbe.

Di merteba ceres bûn: Li şûna zengilan bûn.

Di mest in: Serxweş bûn, diçûn û dihatin.

Dimênim: Miz didim.

Dimû: e. Rondik, hêstir.

Lisîne destek û êdî di dil da

Dimû'an şîn kirin sebzê di gil da (Ş.M.E)

Dinazit: Hêvî dike, dixwaze.

Dindan: Diran.

Dinma: Dinuma, xuya kir.

Din mezheran: Zahir bibin, dîyar bibin.

Dinuma: Dixuya.

Dinumêt: Xuya dibe.

Dinya be kaman: Yê ku dinya bi kêfa wan e.

Di pê: Di pey ra, li pey.

Dipoşim: Vedişêrim.

Diqqet: 1.Zirav. 2.Hûrî.

Diraz: 1. Dirêj. 2. Razan.

Her me ji burcê sunbul e

Pence di sîne û dil e

Dûr û diraz û müşkil e

Qisseyê macerayê zulf (M.C)

Dirc: Qalika mirarîyan.

Dildar-i nezer bikin ji bircan

Durdane bi derkevin ji dircan (E.X)

Direm: Diravekî zîvî ye.

Dirandibûn: Qet qetî kiribûn

Direnê: Diçinê.

Dirext: Dar

Mûzeyyen bû dirext û şaxê însan

Mûsenne' ba suxen bû kaxê însan (Ş.M.E)

Direxta Tûr: Dara li Tûrî Sînayê ku ji wir dengê Xwedê hate Mûsa pêxember û pê ra axivî. (Sûretê Qeses: 28/30.)

Dirêx: k.s. Sînor, tixûb.

Dirhem: Dirav.

Wan kirin hîle di nav kod û şehîn

Kêm kirin dirhem li huqqe d'gel mêzîn (F.R.H)

Dirîxa-Dirîx: Mixabinî, ax û ox.

Ey dirîxa! Ma me تنها ez ji şemsa xawerê Xan û man têk bûne zulmet, paşî wê dêm enwerê (E.X)

Dirozin: k.s. Derewîn.

Dirr: Şerrûd, bed, beter.

Dirrende: Goştur.

Dirrik: Strî, dirî, xar. Kelem û strîyên tûj û girîft.

Dirs: Diran e.

Di şûn: Di şuna.

Diwênê: k.s. Duh, do.

Dixt: Têkil.

Diyar: e. Welat.

Zerî tên û diyar nabin cuşîl tên û sitar nabin

Çi cindî tên siyar nabin buye tarî li gûlanê (M.B)

Dîba: Kirasê hevrişim ku bi zêr û zîv hatîye xemlandin û neqîşkirin. Cureyekî qumaşê hevrişîmê rengîn e.

Mûlebbes ke direxta taze zîba

Bi libsê etles û qummaş û dîba (Ş.M.E)

Dîbac: e. Qumaşê tevli hevrişim. Qumaşê ji hevrişîmê xas û rengîn

Dîbace: Destpêk, serî.

Dîbace ku însa kir, fihriste ku îmla kir, Cildek ji 'enasir best, nefxek di sûfalîn da (E.X)

Dîbaqeba: Qebayê ji hewreşîmê ku bi zêr û zîv hatîye xemilandin û neqîş kirin.

Dibihin: Dibihîzin.

Dîdar: f. 1. Rûyê xweş. 2.Çavpêketin. Hevdîtin, dîtîna yarê. Dîtin.

Em telebdarê li dîdarê di her hîn û deman Ji inayet nezera xwe me nekî dûr û heman (M.E.Q)

Dîde: Çav, hêza dîtînê.

Muhemmed seyyidê alem şefî'ê roja mîzanê

Çiraxê dîdeê Adem xudanê wehy û Furqanê (M.B)

Dîdebanî: Çavnêrî.

Dîdebaz: Çavbaz, Çavvekirî.

Dîdeê dil: Çavên dil.

Dîdeê nemnakî: Çavên ter, mebest ew çavên rondikan dibarîne.

Dîde heyran: Yê/a ku mirov li çavên wî heyran dimîne. Çavheyirî.

Dîdem: Çavên min.

Dîdesaz: *f.* Xweşkiroxê çav.

Dîdeyê tewella: Çavên guhdanê û dostanîyê.

Dîger: Êdî, yê din.

Dîgergûn: Bi cureyekî din.

Dîm: *k.* Rû, dirûv, çehre.

Dîmaî: Xwînî.

Dîmar: Wêranbûyî, helak.

Dîmax: Mejî.

Ji şehwet hilbû der me'de heraret

Buxarê da dîmax û kirye xaret (Ş.M.E)

Dîmdur: Rûdur, rûyê weke durê.

Dîmen: Erdê bejî.

Sehra û çîmen dikirine mesken

Beyda û dîmen dikirine gulşen (E.X)

Dîmî: *k.s.* Wî ez dîtîm.

Dîn: Ol, kêş, ayîn.

Dîn: Dîtin.

Dînar: Diravê zêrîn. Cureyekî pereyên zêrîn e.

Dînarperes: Diravperest, Kesê/a ku ji pereyan ra îbadetê dike.

Ateşperesê wadîyê 'îşq in 'eceb

Dinarperesî wê dibirin tekfire (M.C)

Dînber: Dînbir, ya ku ji dîn derdixe.

Da dema suhbet bi coş bî

Cam bi xweş le'lan binoş bî

Me j'hebîb sed deng surûş bî

Dînber û pur 'îşwe ye (M.C)

Dîneş: Dîn, ol.

Dînî bitane dînî: *k.s.* Dîna yekem wateya dîn (ol) da ye, ya duyem jî di wateya dîtînê da hatiye bikaranîn.

Dîram: Koziya agir.

Dîrayet: *e.* Jîr, zekî, danefêmkirin. Zanyarî, têgihîştin. Bîrbirin.

Mewzû'û meqasid û hîkayet

Mermûz û menaqib û dirayet (E.X)

Dîrter: Dûrtir.

D'îsa: Di îsa, dibirisî.

Dîwan: 1.Civata mezinan. 2.Pirtûka şê'ran

Mulkê Mîsr û burc û eywan

Bax û cennet hor û ridwan

Ev sema û mah û sîwan

Text û dîwanê di min (SP)

Dîwane: Şêt, dîn.

Dîwanekî pir dîkul im

Zer bûm ji rengê sunbul im

J'meyla evînê dihelim

Suhtim wekî mûman im ez (Ş.E.S)

Dîwaneê mehcûr: Dînê koçber,
muhaçir.

Dîwanê guneh: Deftera gunehan, an jî
civata gunehkariyê.

Dîwanê qidem: Lewhulmehfûz,
dîwana ku hemî tişt tê da hatine
nivîsin.

Dîwanê refî: Dîwana bilind.

Dîwanî: 1. Cureyekî nivîsa erebî ku bi
tîpên dirêj tê nivîsîn. 2. Beşdarên
dîwana mîr û şahan.

Reyhanî yû diwanî yû hem suls û
muselsel Yek yek weh hezar rengi ji
husnê neqîşandin (M.C)

Dîwe: k.s. Dîtiye.

Dîya: Ronahî.

Dîyafet: Gund in.

Dîyar: Eşkere, xuya

Dîyarî: Xelat, hediye.

Dîz: Firaxa kelandina xwarinan.

Dîzdar: Dergevanê girtîxanê, yan kele
ye.

Helgirtin û birine pêşê dîzdar

Mehbûs-i kirin di qulleya tar (E.X)

Do: k.s. Dew.

Doht: Keç, qîz

Doj/Dojeh: Cehenem

Narê ji rengê dojehê

Husn û cemala wê mehê

Me d'perdeya vê xergehê

Xef kir, çi 'Umman Mela! (M.C)

Dom nakete: Nadome, nakutîne, ku
daye me merivan dê dîsa ji bistîne.
Mebest jîyan e.

Dorox: f. Derew.

Dos: Dews, şûn.

Dost: Heval.

Doşîne: k.s. Şeva borî.

Dox: 1.Doq, doqik. Darê kin û serê wî
gilover. Darê lêxistinê. 2. Toqmaq ,
gurz.

Doxîteçêşm: Çavkeç, yê ku çavên wî
wek ên keça nin.

Ew doxîteçêşmê herdu şahîn

Ew soxîteper Memo û Tacdîn (E.X)

Dozex: Dojeh, cehenem.

Ger nekit rehmê li te şahê Wedûd

Dê bibî tehqîq di dozex nar û dûd
(Ş.M.C)

Dua: Xwestin.

Duaê merwî: e. Duayên ji pêxember û
hevalên wî hatine rîwayetkirin.

Tu "Elhemd" û "îlaf" û "îxlas" bixwîn,
Du'ayê di merwî jî bê hed bixwîn
(M.X.S)

Du'ago: k.s. Ew kesê ku du'ayan dike.

Dubba: Kunder.

Dubur: Paşî.

Duçar: k.s. Giriftar, tûşbûn.

Duçar: Marûzmayîn, liqayhatin.

Nageh li me bûn duçar û zahir

Ger bûne ji dûrve herdu nadir (E.X)

Duçendan: Ducarekî, duqatî.

Dudem: Şûrê dudevî.

Duezmanî: Du zimanî, durûtî.

Duguş: Şer.

Duha: Bi roj, tava serê sibê.

Pur 'umur min çû bi suxtê

Lê şukurxwazim ji bextê

Zuhreyek bû ew li textê

Belku bêm: şemsudduha ye (M.C)

Duhat: e. Behremend, pirzan.

Duhî: Duh, roja bere.

Duhûr: e. Pirjimariya 'esr, serdemê ye.

Duker: Du parçe

Dulbe: Çinar.

Duldul: Hêştira ku Pêxember dabû Hz. Elî.

Bû rakibê duldulê enamil

Derhal-i digel me bû miqabil (E.X)

Dum: Terî, dûvik.

Dunîn: Xwedest.

Dunîye: k.s. Dinya

Du nûn: "Nûn" tîpeke alfabeya erebî ye mebest "birû" ne. Du çav.

Dunyatir: k.s. Ji dinyayê zêdetir.

Dunyayê denî: Dinyaya bêkêr, bê wefa, bê bext.

Dunewî: Tiştên dinyayê, tiştên ku peywendiyên wan bi dinyayê ve hene.

Du qed: k.s. Du perçe.

Dur-Durr: Mirarî, încî.

Dîlbera gerdênşefîf î daniwa durra Aden Nazik û mewzûn letîf î nexlîya selwaçîmen (M.B)

Durc: Sindoka piçûk a jinan a ku tiştên giranbiha tê da vedişêrin. Qutîya xişran.

Durd: Tilpa binê kaseya meyê.

Safî şemirand, vexwarî durdî

Manendê durê lîsanê Kurdî (E.X)

Durdan: Teneyên mirarîyan.

Durdane: Liba mirarîyê. Qutîya duran, durdank.

Qenc e her beytek ji vê durdaneyê

Bê nivîsandin li bergê Sîdreyê (Ş.M.C)

Durdaneya seyyale: Mirarîyên helandî, meya wek mirarîyan safî û zelal.

Durefşan: Durweşîn

Durexşan: Ronîdar, ronî.

Durext: Dar.

Durê nîsarê: Mirarîyen ku li serê bûkê tên reşandin.

Duric: Ew cihê dur û mirarî tê de.

Durr: Hewî.

Durrac: 1.Ji malbata kewan cureyekî hûr.Teyrê spî. 2.Porê topik.

Min dî seherê di xwabê mestî

Bê deng tezerû we lali durrac (M.C)

Durrê meknûn: Mirwarîya di sedefa xwe da. Ya destnedayî.

Durrê muradê: Mirada weke durrê rind û pîroz.

Durrê nasufte: Durrên nequlkirî, yên xam; gotinên rind.

Durrê şehwar: Mirwariyên bêhempa û biha.

Durrê xeltan: Mirarîyen tevîhev, asîmanan. Durrên girover ku digindirin.

Durrê xoşab: Durr û mirarîyên sipehîtir.

Durif, dirif, dirov: Nîşan, nîşana ku tişteki ji tiştê dinê diqetîne

Durrê ‘eqîq: Qutîya ji eqîq; dev.

Durrê yetîm: Durrê di nava sedefê da; Hz. Mihemed. Durra bêbiha, mirarîya bêhempa.

Durrşînasî şî’r: Nasîna durra helbestê. Ew ji helbestê baş fêhm dike.

Durrînkemer: Yên kemerên wan ji durr û gewheran in.

Dur suftin: Dur qul kirin, yanî rondikên çavan barandin.

Du saqepê: Du ling.

Duşeş: Zarên her du alî şeş in. Nîşaneyê bextewarî û serkeftinê ye.

Duşnam: Xewn û xeyal.

Dildan û newaziş çi ne? duşnamî bes in min!

Pur derd û cefa, hurmet û î’zazî çi hacet? (M.C)

Duşwar: Zehmet, giriftarî.

Duta: Duqat.

Duwar: Gêj.

Duwê şamalê: Dûyê mûmê.

Duxan: Dû, dûman.

Dûxanê ah ê buryanê zemîran

Sema tarî kir û rengê munîran (Ş.M.E)

Duxmeya Sikender: Radara Eskender e. Gora Îskenderê Makedonî ku dibêjin tijî durr û gewher in.

Mecmûê xezainêd-i Qeyser

Hetta vigî duxmeya Sikender (E.X)

Duxter: Keç.

Dûşîze û duxter û ruwalan

Pakîzeîzar û zilf û xalan (E.X)

Duxterane: Keçikane.

Duxul: e. Ketina hundir.

Duxûl: Derbasbûn.

Duzdar: Dizdar. Pasevanê kelehe.

Duzeyek: Qurçek, firek.

Dûd: Dû, duman. Dûyê agir.

Dûdê cîger: f. Dûmana cîgerê.

Dûdeman: Nîjad, kok, binyad.

Lê zadeyê dûdemanê dewlet

Nûbadeyê bosîtanê îffet (E.X)

Dûdiman: Kok û malbat.

Dûj: Dojeh, cehenem.

Dûkel: k.s. Dûyê agir.

Wî mirde çiraxê nagîhanî

Dûkel ji serî di çûye banî (E.X)

Dûn: k.s. Nebaş, sivik.

Dûne: Ji bil.

Dûqîtor: Doktor, Bijîşk, nûjdar.

Dûrbîn: Tiştê ku dûr nêzik dike.

Dûrebîn: Kesê dûrdîtox, kesê dûrbîn.

Dûredestî: Feqîrî, hejarî, xizanî

Dûş: Sermil. Mil.

Dûşîn: Şeva çûyî.

Da def'i bikim xumarê dûşîn

Heşyar-i bibim ji xwabê nûşîn (E.X)

Dûşîze: Keça bakire.

Dûşîzegan: Keçên bakir e.

Dûxte: Durûtî.

Dûxte çeşm: Çav durûtî. Balindeyên ku wan dibin nêçîrê, çermikekî yan qumaşekî diavêjin ser çavên wan.

Dûzendeter: Kunkertir, baştir ji karê kunkirin û simtinê ra dibe.

Dûzex: Dojeh.

E

'Eba: Şalik, xirqe.

Dikim hêvî yû her dem pur ricayî

Ji bona xatirê ehlê 'ebayî (Ş.M.E)

'Ebab: Av, vexwarin.

'Ebes: e. Beyhûde, bêşûd, beradayî, vala, badîhewa.

'Ebd: Kole.

Me can bada fîdayê te tenim xaka serayê te Ziban weqfa senayê te dilê min 'ebde fermanê (M.B)

'Ebdulhimîd: Sultan Ebdilhemîde Osmanî yê duyem.

'Ebîd: Piranîya ebd e yanî kole, benî.

'Ebîr: e.1.Pêhisandin. 2.Bêhnaxweş.

Biskên ji herîrê tu ji nû mawerê lê ke Zulfên ji 'ebirê şeke bavê xem û tabê (M.C)

'Ebîq: Belavbûn.

'Ebûd: Bask.

'Ebûs: Rûtîrş, kelûh.

Erûsane ne zîba ye 'ebûs e

Ne sîmayê sipîd e abinûs e (Ş.M.E)

'Ecac: Ba, bahoz. Bablîsok, toz.

Qulzûmê 'îşqê ji bayê xwo mûxalif demekê Di hemamatê 'ecacê me li ser destê xûrab (M.C)

'Eceb: Sosret, nedîtî derasayî, seyr.

Yan kî yan tîr jê dibarin tenê qelban rast û çep

Cumle serpeykan ji nar in pir bi êşan in 'eceb (Mîna)

'Ecem: Îranî, mebest şî'e ne.

Ev Rûm û 'Ecem bi wan hesar in

Kurmanc-i hemî li çar kenar in (E.X)

'Ecl: Golik.

'Ecûz: e. Pîrejîn, cazû, cadû, pîrejîna xapînok.

Evê kulxaneya kohne xwîya ye

Fena ye, ev 'ecûz a bêbeqa ye (Ş.M.E)

'Ecz: Bêçare, nikaribûn.

'Eda: Pirjimariya dijmin e. Dijminan.

'Edalet: Dad, qanûn, zagon, yasa.

Ev çale eger çi zêde kûre

Emma ji edaletê ne dûre (E.X)

'Edaleyêd tazî: Hespên Erebi, kehêl.

Mîrin hene ew seyêd-i tazî

Nadin bi edaleyêd-i tazî (E.X)

'Edawet: e. Dijmintî, neyarî

Hubba di dilan û ger helawet

Buxza di dilan û ger ‘edawet (E.X)

‘Edaweta reqîban: Dijmintîya neyaran.

‘Ed bikin: Hesab bikin, bijmêrin.

‘Eded: Jimar, hejmar.

‘Edem: e.Tune, nîne. Tuneşî, tuneşî, tuneşîn. Neman, tuneşîn, nebîn.

Eşkal û xetên daîreyê nûqteyê ‘ilm in
Ev neqş û misal in di xeyalatê ‘edem da. (M.C)

‘Edl: Dad, edalet.

‘Endelîb: Bilbil.

Wan digot, "Luqman tebîbe"

Gote min xef 'endelîb e:

Şafîyê derda hebîb e!

Pê bawer û îman im ez (F.T)

‘Edes: Nîsk.

‘Edîd: e. Pîranîya “ededê” ye.

‘Edîl: Hemta, wek.

Bê mîsal û bê 'edîl in

Gerçî bê rexbet zelîl in

Xweş li halê min delîl in

Beyt û eywanê di min (SP)

‘Edîm: Nebûyî, tune.

‘Edl û munesif: Bi însaf û edalet.

‘Edn: Navekî bihuştê ye: Bihiştê herheyî.

Reyhan û bax û bostan

Cennat û 'edn û ridwan

Hor û perî û xulman

Qurbana Şeyxê Taxê (Ş.E.S)

‘Edû: Dijmin.

‘Eeyhîlle’ne: Lanetlêbûyî, melun.

‘Efff: Bi namus û pak.

Efserê zîb: Taca ciwanîyê.

Ew cewherê tac û tace cewher

Ew efserê zîb û zîbê efser (E.X)

‘Ehd: e.1.Peyman, soz. 2.Serdem, dem, wext.

‘Ehda elest: Soza ku merivan di alema rihan da daye Xweda.

Min di ber "qal û bela" batin vi wê ra bû evîn

Hêj li ser 'ehda "elest'im, ta bi roja axirîn (M.C)

‘Ehdes-sîba: Çaxê zaroktîyê.

‘Ehdê şebab: Dema ciwanîyê, dema xortanîyê.

Xweş perîşan sîfet û mecme'eyê sûretê hal in

Pirê 'îşq in û cuwanteb' û dilî 'ehdê şebab e (M.C)

‘Ehd û peywend: Soz û Peyman.

‘Ehmet: Met.

‘Ekisbûyîn, ekiskirin: Ji para zivirrîna deng û ronahîyê. Wek ‘eksa sûretê tişteki ji neynikê da

‘Eks, ‘Ekis: Dij û zidd, ji para veğerandîna deng û nûrê. Tîrêj, wekilandin. Dijîtî, înad, hesûdî.

Di nêva mecmerê wan qelbê pir nar

Bixûr û 'udê 'eksa gîsûyê yar (Ş.M.E)

‘Eks pezîr: Wênepejêr. Yanî êdî amade dibe ku bikemile û her tişt lê xuya bibe.

‘Ela: e. Li ser

‘Ela ercaî ha: Li hawirdorê wê.

‘Elaiq: Peywendî û têkilî.

‘Ela kullî ecme’în: e. Li ser hemûyan.

‘Ela ma misleha Mûsa tewekke: e. Wekî Mûsa Pêxember li ser ‘esayê xwe radiweste.

‘Elamet: Nîşan.

‘Elamet ji bo sa’etê ra pirrin,

Bi kullî ji ferzane bawerkirin (M.X.S)

‘Elayha: Li serê.

‘Elaiq: Têkilî. Qutkirina têkiliyan têgeheke tesewifê ye. Yanî dûrketina her kesî û wateya bi Xwedê tenê re.

‘Elb: Cureyeke beroja darînî.

‘Eleddewam: Berdewam.

‘Elef: Alif, êm.

‘Elel fewrî: Bi lez.

‘Elel xusûs: e. Bi taybet.

‘Elem: e. Nîşan, ala, beyreq.

‘Elemdar: Aladar, beyreqder kesê ku ala di dest da.

Rayeta fethê ji nesra te ku her menşûrî bû Şehsiwarê ferrê subhanî ‘elemdarê tebî (M.C)

‘Elen: e. Beyan, eşkere, diyar.

‘Elettewalî: Li pey hev.

‘Elîl: Nexweşî.

Îro feqîr im bêkes im

Jar û ‘elîl û her ez im

Bê te neşim gavek bezim

Ya Reb dere feyzê vebî (Ş.E.S)

‘Elî: Alî, bilind, mezin.

‘Elî: Xelîfeyê çarem û kurê apê pêxember û zavayê wî ye.

Pîr û ustad çi hacet bi ‘Elî Heyder hestin Şev û rojan ji te ra pîre xudawendî ‘Elî bit (Ş.N.B)

‘Elîl û derdnak: Nexweş û bi êş.

‘Elîm: e. Zanyar.

Bilakutk û ‘endelî pur ji neqşî selîm in Dixûnin subha ewwelî di zikre şahê ‘elîm in

Şebî gulî bilbilî e aşiqê nesîm in (M.G)

‘Ellem-el esma: “Xwedê hemû nav hînî Adem kirin.” (Sûretê Beqere: 2/31.)

‘Ellam-xebîr: Zana.

‘Ellilandin: Birîndar kirin.

‘Elq: Li ser me.

‘Em: Ap, mam.

‘Emberemîz: Weke enberê bêhnxeş.

‘Emd: 1.Kêmasî. 2. Jiqest.

‘Emaret: Cihê bûk lê rûdinê. Textê bûkê.

‘Emel: e. Kirin, kar.

‘Emelbetalan: Kirin vala, emel vala.

Umîda me ji tîfalan

Ku me ‘emelbetalan (E.X)

‘Emeldar: Karker.

'Emel kir: Kar kir.

'Emil: Reng, awa.⁴²

'Emîm: e. Tevayî, tev, hemî.

'Emîq: Kûr.

'Emûd: Sitûn.

'Ena: Westiyan

'Enasir: Element û bingehên hebûnê ku çar in: av, ax, ba û agir.

'Enasir çihar in, ji wan in melek,
Wekî ins û cin, nûre qismê gelek
(M.X.S)

'Enberdaneya xalan: Cihê enbara xalan.

'Enber'efşan: Enber belavker.

'Enber'emêz: Enber'mîz,
bêhnamber. **'Enberê sara:** Enbera saf,
nîşana rûyê yarê.

'Enberî sara: e. Giyayekî bêhnxeş.
Nizar ku bûne xara beroj ku bûne etles
Reşandin 'enber sara ji zêr camî
museddes Di mexrib û sehara ve
ezman hate exres (M.G)

'Enbersiken: Wek enbera reş û
kurîşkî, gustîlokî.

'Endelîb: Bilbil, cureyekî çivîkên
dengxeş.

'Enke: Ji te.

'Enqa: Balindeya enqa. Sîmurx. :
Balindeya sîmir, balindeyeke efsanewî
ye. Li gor gotina sîya wî kê bikeve ew
dê bextewar bibe.

Sîyeh bextê min e zanim ku heqqa

Wîsala dîlberê bû teyrê 'enqa (Ş.M.E)

'Eqd: Gerden.

'Eqd dibit: Tîr dibe û dimeye.

'Eqdê îhramê: Lixwekirina kincên
hecê, girêdana îhramê.

Hêvîyan qet nabirim, carek tu bêyî
şefqe kî 'Eqdê îhramê dêbînim, hadirî
bim secde ye (M.C)

'Eqîb: e. Xurcîk, çente.

'Eqîq: Kevîrekî bihagiran û sor e.

Er 'eqîq û durr û gewher

Incî yû elmas û cewher

Le'l û yaqûtê di ehmer

Tên ji seylanê di min (SP)

'Eqlê ewwel: Di felsefeya Farabî û
Platon da tiştê yekem Xwedê afirand
'eqlê ewwel yanî aqilê yekem bû, Ji vî
felek û gerdûn hate afirandin heta
gihiştê çerxa hîvê.

Ev ewwel û rûh û 'Eqlê ewwel,

Hersîne bi ewwelî mûewwel (E.X)

'Eqlê kul: e. Aqilê mezin.

'Eqlî nelengê: Hişê wî şaş nebûye.

'Eql rimîde û muşewweş: Sergerdan
û lihevketî.

'Eqreb: Dûpişk, gulîyên weke
dûpişkan.

Ji mexmûran tu mexmûr î be cî hişt
'eqreba jûrî

Tewafa beytê me'mûrî le burcan xûn
be sîran têt (E.H)

⁴² Li gor Mele Mihemedê Zivingî.

'Er'er: Dara hevrîstê
 Rast û çep têne ceger sîne kulab
 'Er'erên şengî dilestin çep û rast (M.C)
'Er'd: Nîşandan, helêxistin.
'Er'erxiram: Meş û tevgera weke
 dara hêvrîstê.
'Erez: Her tiştê ku hebûna wî bi serê
 xwe nabe, divê di tişteki da were xuya.
 Ne cism û ne cewher ne nûr û 'erez,
 Ne zû lewn û mîqdar û şîkl û merez
 (M.X.S)
'Erîz: e. Fîrh, pehn.
'Er'r: Dara Hevrîstê. Evrist.
'Er'ermal: Bejinbilind.
'Er'erxeram: Tevger, nazî û libabûna
 weke dara hêvrîstê.
'Ereq: Xwêdan.
'Ereq rîtin: Xwêdan rijandin.
'Erq: f. Tamar, damar.
'Erse: e. Meydan, hol, ebir.
'Erşê Barî: Textê Xwedê.
'Erûsê ayîn: Di renge bûkê de.
'Erz: Behskirina tişteki.
'Eseb: Reh.
'Escud û 'eyn û nedr: Zêr.
'Erş: Ban, Text. Textê desthilatdarîya
 Xweda.
 Hasilî hendî çi vacî ey beşer?
 Yo kû Homayî berdo 'erşê xo ser
 (M.E.X)
'Erşê e'la: Erşa herî bilind. Erşê
 Xwedê.

'Erşê Xweda: Textê Seltene û
 Hukûmranîya Xweda; hemî Kaînat,
'Erş û kursî: Erş û kursiyê Xwedê.
'Erûsxane: Koşka bûkê.
'Erz: Pehnayî.
'Erzê hebîb: er. Bexşê yarê.
'Erzihal: Daxwazname, dilekçe.
'Esa: e. Gopal, Mebest gopalê Hz.
 Mûsa ye.
'Esel: e. Hingiv, hingivîn
'Eses: Nobedarê şevê.
 Li xennasan gehî mîrê 'eses bûn
 Geh enwarê rû yê yarê qebes bûn
 (Ş.M.E)
'Eskerê tirkan û mestan: Mebest
 kezî û bisk in, ew ên wekî serxweşan
 dihejin û wekî tirkan xwînê dirêjin.
'Esr: e. Serdem.
'Eşa: Şîv.
'Eşayir: Piranîya eşîrê ye.
'Eşer: Deh.
'Eşqer: Sorê tarî, qemer.
'Eta: e. Dan, Dayîn.
 Bê 'emel tu-j kes meke hîvî 'eta û
 himmetê Bê xered nakeştin qet kes ji
 bo kes zehmetê (E.X)
'Eta bit: Bête dayîn.
'Etarid: Stêrkeke gerok e. Utarid,
 Merkur, Zawe. Stêrkeke pir digere û
 sembola edebîyatê û fesahetê ye.

Lew bi şeş burcan 'etarid j'afitabê dûri
bû Lê zuhel bû muşterû avête çerxê
înqîlab (M.C)

'**Etbe**: Derîzan e .

'**Etir**: e. Bêhn, bêhnaxweş.

'**Etiyye**: e. Xweda.

'**Ettiş**: Têhni.

'**Ewam**: Xelkên ji rêzê.

Gelek xwarin û şehwet û sût û zen,
Ji xelqê û cehla 'ewamê diken (M.X.S)

'**Ewamê 'alem**: Piranîya xelqê, reşeya
xelqê.

'**Ewn**: e. Alîkarî. Hevsengî.

'**Ewq**: e. Pek ketin, ji hal ketin.

'**Eyadet**: e. Nexweşî. Ew kesê ku ji
ber nexweşîya ve ketiye nava nivînan.

'**Eyal**: Zar û zêç.

'**Eyan**: e. Xuya, diyar.

Rebbî halê ma bi xwu to ra 'eyan,
Lazimey hendî çîya vaco zuwan
(M.E.X)

'**Eyb**: Kêmanî û nuqsanî.

'**Eyn**: Kanî, çav.

Qelb û dil mecruhê 'eyn û eswedî
burhê te ne

Nîne bê cama me yek xet melhem û
dermanê ma (SP)

'**Eynel'eyan**: Pîrr eşkere.

'**Eynelyeqîn**: Zanîna di dereceya
dîtînê da; Zanîn û dîtina bêguman.

'**Eynemel**: Balindeyekî reş e.

Nêçîrvanê kulîyan e.

'**Eyneyn**: e. Herdu çavên dilberê.

'**Eynê basir**: Çavên ku dibînin.

'**Eynê beqayê**: Bêdawîbûn bi xwe,
ebedîbûn, nemirin.

'**Eynê kafûrî**: Kafûr bi xwe ye,
bêhnaxweş e.

'**Eynê kereme**: Bi çavên qenc û
rehmê.

'**Eynê tewhîd**: Tewhîd bi xwe. Wek
yekitiya Xwedê.

'**Eyni**: Çavên min.

'**Eynik**: Tîpa "eyn"e ku bi wateya çav
tê bikaranîn.

'**Eyn-ul fîsah**: Serdarê Fesîhan.
Qiserewan,peyrewan.

'**Eyn û sad**: Çav.

'**Eyn û şîn**: Rumuza eşqê.

'**Eyn û şîn û qaf**: 'Eşq, evîn

'**Eyş**: Jîya bi kêfxweşî, jîn, heyat.

Dinya hemî bûye 'eyş û îşret
Zala felekê ji kerb û hesret (E.X)

'**Eyşê dinya**: Xweşîya jiyanê.

'**Eyşê xubarî**: Jîna tozewî ya nexweş.

'**Eyş û 'işret**: Şahî û kêfxweşî.

'**Eyş û kamiranî**: Xweşî û şahî.

'**Eyş û neşat**: Şahî, kêf û çalaki.

'**Eyş û nûş**: Xweşî û şahî.

'**Eyyar**: Ya ku diçe û tê, şaş dike.
Hîleker.

Hewce sihrê Samirî nin in, ku zulfa reş
bikit

Çeşmê benda dilrûbayan kakula
'eyyari bes (M.C)

'Eza: e. Taziye, serxweşî.

'Ezab: Êş û derd.

Ey çehre perî dil me ji eşqa te kebab e
Daîm ji firaqa te, me can her bi 'ezab e
(M)

'Ezapoş: Yê/a ku cilê şînê li xwe
kiriye.

'Ezar: Rexê dêmê, Ew cihê bisk bi ser
da têne xwarê.

Xal Musteri, dêmenwerî û meta boya
emberi

Peyxam ji dura rehberî nûrîn 'ezarê
Xeznewî (M.M.E.H)

'Ezazîl: Ehrîmen, Şeytan, Iblîs.

'Ezeb: Îqab û nekal. .

'Ezîz: Bi qedr û qîmet.

'Ezîz: Mezinê Misrê ku Hz.Yûsif
koleyê wî bû, Zuleyxa jina wî bû.

Kanê 'ezîzê Misrîyan kanê 'edûwwê
Wanîyan?

Kan hevrikê Mehmûdîyan ka Padîşahê
Serhedan? (E.X)

'Ezîm: Mezin, gir, gewre.

'Ezîzî Misr: Wezîrê Firavûn ê dema
Hz. Yûsif e.

'Ezl: Dûrxistina ji karê hukumdarîyê.

'Ezmê remîm hey bûn: Hestîyên rizî
sax bûn, vejîn.

'Ezra: Keça nezewicî û hêj nevebûyî.

E'ada: e. Parçe.

E'alî: e. Bilindtirîn, giregir.

Ealî: Kesen mezin, bilind.

Eb û bab, û ubûwet: Bav, peder.

Ebariq: Misîn.

Ebarîqê qinînan: Surahîyên di
qalibên xwe da.

Ebd û reqîq: Kole, benî, xulam.

Ebed: Bê dawî, heta hetayê. Dawîya
bêdawî.

Dinê mehd e, dinê mak e

Dinê tîn e, dine xak e

Bi ewladan ebed nake

Ew e bê rehm û diwar e (F.T)

Ebeden nîme melaz: k.s. Qetîyen
stareyeke min tune ye.

Ebediyet: e. Bê dawî, bê nîhayet.

Ebes: Tewş, bêkêr,

Ebîd: Koleyên, benîyan.

Alem hemî bûye îşretabad

Şehrî bedewî, ebîd û azad

Ebîr: Pêhisandin, bêhna xweş.

Ebkem: Lal, bêziman.

Nizanî ma eya bêaqila kem

Ne yî bulbul, qijal î lal û ebkem
(Ş.M.E)

Ebleh: Bêhiş, kêmaqil. Bêaqil, ehmeq,
nezan.

Ebleq: Belek, spî û reş, mermer.
Destpêka berbangê.

Ebru hîlala 'îde ebleq şubhê nahîdê

Dêm her wekî xurşîdê cebhet meha
kema e (S)

Ebna: *e.* Piranîya “kur” e

Ebr: Hewr, ewr.

Ebrac: Burc.

Ebrêsmî: Hevrîşim.

Ebr-i sifet: Wek ewran.

Ebrî: Hewaya têrav.

Ebrû: Birû, birh.

Ew çavxezala çavxumar

Resmar ji burca mane xwar

Avête dil zehrek xedar

Dêmxawera ebrûhîlal (SP)

Ebrûhîlal: Birû wek hîva nû.

Ebrût: Birûyen te.

Ebsar: Çav, çavan, dîtîn.

Nişana qabê qewseynan ku qews avête
ebsaran

Di teqwîma tecellayê beser lê bûn hîlal
ebrû (M.C)

Ebsere: Dît.

Ebter: Bêbereket. Bêkes, bêpar,
perişan. Kêmbiha. Bêhiş, mehrûm.

Sewda û dîn û ebter im

Pabendê vê nefsa le'in

Muksîyê jar û bedtir im

Fe'rhem nî xeyrerrahimîn (F.T)

Ebter kirîn: Bêkes û perişan kirin.

Ebutalîb: *e.* Apê Hz. Mihemed.

Ebûzeydî Surûcî: Lehengekî pirtûka
Meqametê Herîrî ye. Ev pirtûk ji alîyê
Qasim kurê ‘Eliyê Besrayî hatiye
nivîsin. Ji bo edebîyata erebî ya klasîk
da berhemek girîng e.

Ebûcabir: Nan.

Ebû cami': Sufr e.

Ebû-ce'de: Gur.

Ebû-ce'fer: Mêş.

Ebûl-emn: Têrî.

Ebûl-fedl: Zêr.

Ebûl-hers: Şêr.

Ebûl-kîbr: Zîv.

Ebû-Iehw: Tenbûr.

Ebûl-murre: Şeytan.

Ebûl-necm: Rovî.

Ebûl-qeys: Torî.

Ebûl-xefl: Fîl.

Ebûl-xemr: Birçî.

Ebûnnaci': Hulw e.

Ebûnnafî': Sirke ye

Ebyat: *e.* Piranîya “beyt” e, yanê xanî,
malik.

Ebyed: 1.Mîrê cinan, navê şeytanekî
ye. 2. Spîtir. 3. Zîv, faq.

Ehremen te'lîmê da bû, ebyedi dest tê
hebû Pur bi vê te'lîm û rayê hatibû
çûbû xîtab (M.C)

Ecanib: Kesên xerîb. Piranîya ecnebi
ye; bîyanî.

Ecel: Dema mirinê.

Ecir: *e.*1.Xêr. Biha, mukâfat.2.Kirê,
îcar.

Ecnas: Cinsan, cureyan.

Ecnasê milel: Cureyên neteweyan,
cureyên miletan.

Ecr: *e.* Padaşt, mukafat. Padaş, xêr.

Ecram: e.1.Piranîya “cirm” guneh e
2.Tiştê bêrih.

Ecsam: e. Piranîya “cism” e.

Eczaê cismî: Temamî bedenê.

Ed: e. Hesabkirin.

Eda: Gotina xweş, awa uslûb.

Eda kir: Pêk anî.

Edanî: e. Kêmtirîn, nizmtirîn.
Piranîya ‘Edna’ ye.

Edake: e. Bide.

Edanî û esaxir: Kesên piçûk û
bêqîmet.

Eda parçe: Parçeyê laş, parçeyek
bedenê.

Edbere: Pişt da.

Ed bikin: Bihesibînin.

Edeb: Tore û rêzgirtin.

Aşiqan kohvan diyar in lew dinalin bê
edeb Ew elem nayên veşarîn ger ji
'eynan bêt eser (M)

Edem: e. Tunebûn, tuneş.

Ji ketma 'edem, 'alem anî wucûd,
Bi vî wechê ehzen wî şahê Wedûd
(M.X.S)

Eden: Bihuş, cinet.

Dîlbera gerdensefîqî danuwa durr a
Eden Nazik û mewzûnletîfî,nexlîya
selwa çemen (M.B)

Edhem: e.1.Kal, pîr 2. Şev 3.Hespê
reş 4.Kavil.

Edhem di tewîleyê nihîn kir

Eşheb ji xwe ra ji nûve zîn kir (E.X)

Edîb: Bêjevan.

Edîbê tencim: Sehha. Ew kesê ku
naveroka pirtûkan ji hev diqetîne û her
beşekî di cihê wî da datîne.

Edîd: e. Gelek, pir.

Edîl: Hevta, beranber.

Edîm: Tune, nîne

Edîr: Bigerîn.

Edl: Dad.

Edn: Navê bihuştêkîye

Edna: Jêr, piçûk, ne hêja. Kesê
nizimtir.

Edû: Neyar.

Edward: e. Wirdên ku sofî bi tizbîyan
dikêşin.

Edxas û emşac: Têkilbûn.

Ef'a: Mar.

Efa û mar û ejder e, misk û zebad û
'enber e

Nefxe yê rûhî perwer e, raîheyê
hewayê zulf (E.X)

Ef'al: e. Pirjimarîya “kirin”ê ye.
Kirin, kiryar.

Eşya bi hesab sîfat û ef'al

Înane wicûdê mixtelîf hal (E.X)

Ef'al: Piranîya ‘fi'I’ e . Kiryaran.

Ef'alê eswed: Kirinên nebaş

Efêyan: Serê du marên bi jêr, kezî.

Efgar: Derd. Bi êş, birîndar, kesîre.

Efife: Keç, yan jina paqij, a bi namus.

Wê perdegeya efife, mestûr

Wî bê gunehê ji tuhmetê dûr (E.X)

Eflak: Pirjimarîya felekê. Felek, asîman.

Eflef: Yê ku tiştan dubêş dike. Mebest roj e ku tarîyê ji ronahîyê diqetîne.

Sersibhe, ku şehsiwrê eflef

Eşheb ku kişande cayê eblef (E.X)

Efna: e. Piranîya “fena” ye.

Efqa: Cureyekî maran

Efrasîyab: Serekekî efsaneyî yê Tûranîyan. Ji alîyê lehengê kurd ê efsanewî Rustemî Zal (Kurd) ve tê kuştin.

Keyber reşandin bê hesab

Misrî ku dan sîqal û tab

Sed Rostem û Efrasiyab

Kuştm li wan ker kir cesed (E.X)

Efre': Bi mû, bi pîrç

Efrûxten: Helkirin, geşkirin, sojandin.

Efrûz: Ronahî.

Efsane: Serguzeşt, dastan.

Efsanekî faşe: Efsaneyeke eşkere.

Efseh: e. Fesîh, zela, rewan, ron.

Ez im ku nezm û şîrê xweş birêje

Ez im ku efseh-ul elfazi beje (Ş.E)

Efselussafilîn: e. Tebeqeya dogehê ya herî jêr, Newala wawaeylê.

Efser: 1. Melûl, xemgîn. 2. Kulah, tac.

Ji hîcra dîlberan efserde bûne

Bi qurban bim, bi qurban bim, bi qurban (H.F.H)

Efsîfet: Weke mar, weke zîha.

Efsurde: Xemgîn.

Efsurdehal: Perîşanhal.

Efsûn: Sêhr.

Çi sehharî kir û hîle çî çê kir

Çi efsûn xwend û tezwîratê lê kir (Ş.M.E)

Efsûngerî: k.s. Efsunkarî, sêrbazî.

Efsûn kirin: Sêhr kirin.

Efsan: Belav kir, belavkirin.

Siyeh maran kire seyrana le cote şubhete cîran

Ku xas û 'am bibûn heyran le cîran 'enber efsan têt (E.H)

Efsande: f. 1. Ya/ê ku diweşîne, belav dike. Dadiweşîne 2. Ya/ê ku hatiye belavkirin û reşandin.

Eftab: f. Aftab, roj.

Efuwîn: e. Sûcan bibexşîne.

Efwacî melek: e. Ref bi ref firîşte.

Efxan: Girîn, qîrîn, zarîn, hawar, fixan, nalîn. Hawar.

Min diye muhbet çî reng e sohtime doja pîr-ye'ke

Min mudam dil jê biheng e bi nalîn û efxan im ez (F.T)

Ehbab: e. Pirjimarîya “hebîb” e. Yaran, dildaran.

Wîsala seyyide ehbab Xudaye minber û mihrab

Muyesser bin li min esbab me can havâte meydan (M.B)

Ehda elest: e. Peymana rihan û Xweda.

Ehde: e. Birû, ebrû.

Ehdê çil rojê: Peymana çil rojan.

Ehed: Yek.

Ehediyet: Yekitî.

Şebê zûlmatê bi îmkanê dibit subhî numa Afitabê Ehedîyyet ji feleq tête zuhur (E.X)

Ehîbba: e. Dostan, hevalan

Ehlam: Xewn.

Ehlê bîdet: e. Kesên mixalifê eqîda rast dimeşin.

Ehlê bîsaret: Ehlê dil, xwedî qabiliyet.

Ehlê delal: e. Ew ên li ser kufrê çûne. Ew ên ku li ser kufrê diçin.

Ehlêdil: Ehlê evînê, ehlê eşqê.

Ehlê hal: Yên ku hal tê ser wan. Sofî. Evîndar.

Ehlê ‘irfan: Xwedan nasîn, zana.

Ehlê nezer: Yên çavnas û zana.

Ehlê nûr: Merivên ronahîyê.

Ehlê raz: Kesên zana kur azan dizanin.

Ehlê şeqa: Kesên xirab, nebaş.

Ehliyan: Kesên niştecî.

Ehlî nezer: e. Temaşevan.

Ehlê nezer: Kesên zana, bîrbir.

Ehlullah: Ehlê Xweda, kesê qenc.

Ehmed: Bernavekî Hz. Mihemed e. Navekî Hz. Muhamed e.

Ekser: Piranî

Emma: Lê.

Esl: Kok û rîşe.

Husn û hub anî zihûrê işq e eslê alemê Eslê eşya da bizanî wane esl û made bû (M.C)

Ehmed le asman: k.s. Li asîmanan navê pêxember ehmed e.

Ehmeq: Çavên weke qijikê reş û spî; çavên belek.

Ehmer: Rengê sor.

Reyahîn sosin û werd in
Li Şêx Elyê xerîb ferd in
Werestê ehmer û zerd in
Hero sed car di efxan têt (E.H)

Ehremen: Şeytan: 1. Li gor zerdeştîyan Xwedayê xerabîyê ye. 2. Li gor ku tê gotin şeytanê ku gustîla pêxember Silêman dizî ye.

Ehremen te'lîmê dabû, ebyedi dest tê hebû Pur bi vê te'lîm û rayê hatibû çû bû xîtab (M.C)

Ehrîmen-Ehrumen: Rêber û musebbibê neqencîyê, mûmessîlê şerr û tarîtiyê, Îblîs.

Ehsen: e. Delaltir. Baştirîn. Xweşiktir, çêtir, aferin. Maşellah! Çi bedew e!

Ellah çi zatek ehsen e

Zêde letîf û qadir î (F.T)

Ehsenellah: Maşellah, çi xweşik e!

Ehsenellahu tebarek: Xwedê çi xweşik çêkirîye, çi bedew e.

Ehsenallah we tebarek: Maşellah!

Xwedê çi rind çêkirîye.

Ehsente: Te qenc kir.

Ehwal: e. Piranîya hal, rewş e.

Tîr û rum dil ma di navê helqereng

Min bi ehwalî nizanî rast û çep

(Ş.N.B)

Ehwal: e. Çavxwar.

Ehya: Zindîyan.

Ehzan: e. Pirjimarîya xem û derdan.

Ejdeha: Mar, marên defneyan
dipêrêze. Ejderha.

Her nehr-i ji rengê ejdeha bûn

Her sebze bi mu'cizan Esa' bûn (E.X)

Ejnû: Çok

Eîdîn-nezrete: Car din mêzeke. dîsa
binêre.

Ejê: Ez jê.

Ekabir: Mezin û giregir.

E'yan û ekabir û ealî

Mîrza û ruwal û laubali (E.X)

Ekber: Mezin. Mezintir.

Çewan ayîneyê şêrîn e şekker

Tu jî bî neynika ellahu ekber (Ş.M.E)

Ekdar: e. Piranîya “kederê” ye.

Ekhel: Mirovê çav bi kil.

Eklî lahm: e. Çêja goşt, tama goşt.

Ekmeh: Kor e.

Ekmeltû: Îşareta vê ayete dike. “Min
îro ji we ra dînê we tamam kir.

Ekrad: Piranîya Kurd e.

Ew xetme ji bo qebîlê Ekrad

Wan dane bi şûr û hîmmetê dad (E.X)

Eks: Ronahîya tiştê ku di avê, olan.

Qîrana zuhreyê min dî di ber 'eqda
sureyyayê

Ji perwînan dibêjim eks e hêj keftî di
camê da (M.C)

Ekser: Piranî

Ekserûhum: Pirê wan.

Ekserûn: e. Piranî

Ekşem: Guhê hatiye jêkirin.

Ekwan: Bûyîn, heyîn, bûyî, heyî.
Gerdûn, cîhan.

Dilo ger te dibê carek ji tenzîmatê
ekwanî Bikî seyrê di etwarê heqîqet
seyrê rûhanî (M.Y.Y)

Ekyes: Merivê tîj fehîm.

Ela: Hayadar be!

E'la: Giregir, yê bilind. Bilindtir.

Ela, ma, hedek: e. Li ser tiştên ku
bexşandîye te.

Elaîq: Ben û rehên ku mirov bi jîne
ve girêdidin.

Elalet: Zar û xêç, xelk.

Ela ya eyyuhel-îxwanu ma lî: Gelî,
birayan, çi bûye bi min!

El'ayaz: e. Xwe bi Xweda girtin.

Elbet: Bêguman, mîsoger.

Elef: Pût.

Wan kirin maê yetîman her telef

Lew bûye îro li wan agir elef (F.R.H)

Elem: Serenav.

Elem: e. 1.Êş. 2.Ala, beyreq.

Geh dev davête canê xwe çirandî
 Gehî êş û elem dil lê helandî (Ş.M.E)
Elestu: “Ma ez na”.
El’etiş: e. Tîbûn.
Elettewalî: Li pey hevdu.
 Hublaye leyalî, ey mewalî!
 Kanê çi dizên elettewalî? (E.X)
Elest: “Elestu bî rebbîkum?” (ma ez
 ne Rebbê we me.)
Eleyke: Li te.
Eleyye: Ser min.
Ele zalimîn: e. Li ser zaliman.
Elf: e. Hezar.
Elfaz: e. Pirjimarîya lafîzê ye. Yanî
 peyvê. Gotinan.
 Şubhetê Tûba ye bê qîl û xeber
 Beyt û elfaz in wekî hûsn û semer
 (Ş.M.C)
El-fîraq: e. Cudabûn. Ax cudabûn, ax
 veqetin.
Elhal: Niha.
Elhan: Awaz, deng, nexmeyên
 balindeyan.
 Ewan morxê xweş elhanê xezelgo
 Siya şaxê bi meywe çiçek û bo
 (Ş.M.E)
Elhed: e. Kevirê nava gorê yê ku mirî
 serê xwe datînin ser.
Elheq: Bi rastî.
El-hezer: e. Agahdarî, baldarî, dîqet.
El hûwe: Ewê ku ew e.
Elîf: e. Mîna tîpa elifê. Yar, dilber.

Elîf Ellah: e. Mebest bi vê tîpa Xweda
 ye.
Elîfqam: Kesa/ê qam dirêj, bejnelîf.
 Ey dîbera gerdenletif
 Wey nazika qametelîf
 Qamet ji reyhana zerîf
 Wêran ez im malim xerab (F.T)
Elîf û du lam û hê: Yanî Xweda
 (Ellah).
Elîhîmem: Hîmmetbilind.
 Her çendî li ba we navî Mem bû
 Lê padîşehk elîhîmem bû (E.X)
Elîl: Nexweş.
Elîm: Pir zana.
Elîmas: Şûrên wek elmas hişk û
 birqînokî.
Elîmeqam: Rutbebilind, payebilind.
Ellemel esma: Navan hîn kir.
Elmasê gilk: Pênûsa ji elmas.
Elmasî: Şûrên weke elmas hişk û
 dibiriqin.
 Şîrê elmasi kişînit, tu ji lamî' de xeber
 Vegirit huqqeyê yaqûtî ji gewher meke
 behs (M.C)
El-minnetu lîllah: Minet ji Xweda.
El mulku: e. Milkê dinyayê û axiretê.
Elqab: Nasnav, leqeb.
Elqet: Avêt.
Elqiba: Kiras.
Elqisse: Bi kurtî, encam. Kurtana
 gotinê.
Eltaf: Lutf û kerem, qencî.

Eltef : Naziktir, nermtir.

Paşê ji wî, eltefî cuda kin

Temyîz-i bikin, ji hev bela kin (E.X)

Elwan: Rengan. Piranîya lewn e.

Enwaê newadir û cewahir

Elwanê nefaîs û zewahir (E.X)

Elwanê di came: Rengên di şûşeya mey da.

Elwend: Navê çîyayekî ye, li Kurdistana Rojhilat e.

Elwîda': e. Xatirxwestin.

Ema: Kor, kesê çavên wî nabîne.

Em'a: e. Rovî, hûr û rûvî.

Email: Navê pirtûkeke qaîdeyên dînî ye.

E'mal: Karin, şuxilan.

Nîne der destê te yek e'malê qenc

Tu biçî derbas dibî ez cumle renc (Ş.M.C)

Eman: e. Ewlehî, bi emniyet.

Emanet: Spartin, raspartin. Tiştek bi deyn an jî ji bo parastinê dan kesekî an jî kesan ji piştra bide xwedîyê wî.

Heta heyin em mail in hişyar bibin ey xafilîn

Em dê ji heyate dest hilin ji we'deya emanete (F.T)

Emanetê heq: Emanetê Xwedê. Mebest ruh û giyan.

Emca: Vê care.

Emced: Pir bişeref, kesên xwedî rûmet û xeysiyet. Pir bişans û bisiûd.

Go: Mijde didim, Resûlê Emced

Dê paşê me bê, bi navê Ehmed (E.X)

Emd: e. Bi qest, bi hemdî.

Emda: Biqest, qestden.

Eme: k.s. Ev e.

Emeldar: Karker.

Emende: k.s. Miqdar, qas, hind.

Emete: k.s. Ev.

Em fitne helbeste: k.s. Ev fitne hatiye çêkirin.

Emin: k.s. Min.

Emîn: Hevraz, sozdar. Pêbawer.

Mî'race digel kes nebûyî sedrê rîsalet Qasid ji Xudê bo te bi Cibrîlê emîn e(M.C)

Emin barî sefer beste: k.s. Ez ji bo rêwîtiyê amade me û mirina min nêzîk bûye.

Emîr: Mîr an jî Xweda.

Çiraxe rohnîya ummet ji bo çî tu bûyî xilqet

Fetahê dergehê cennet emîrê sedrê dîwanê (M.B)

Emîşe: k.s. Em jî.

Emîşim: k.s. Ew jî yê min.

Emleh: e. Şor.

Emles: 1.Rêk, dûz. 2.Rast, rastgeh, edil

Emma: Lê.

Em ma: k.s. Ev ma. An jî ev kes li heyatê ma, nemir.

Emr: 1.Ferman. 2.Kar.

Şehbazê emrê Ehed

Felek kirin neylîgûn

Danya ferşê zumerred

Reqem kirin "kaf û "nûn" (M.G)

Emrad: e. Pirjimariya “nexweşî”yê ye.

Emraz: e. Pirjimariya nexweşiyê/marazê ye.

Ji emrazê dilrene ferze dewa,

Ku hirs û hesed, kîbr û 'ucb û riya!(M.X.S)

Emred: Xort, genç.

Emrê kun: “Dema Xweda ji tiştêkî ra bibêje bibe ew jî dibe.” (Sûretê Yasînê: 36/82). Fermana kun; fermana ku Xwedê bi her tişt afirandin.

Wucûda alemê tev emrê kun bû

Hinik hişyar û hin mestê sexun bû (Ş.M.E)

Emrê te: Fermana te.

Emrro: k.s. Îro.

Emsal: e. Mîsal, mînak.

Emsile: Metelok.

Her qîsse ji hîsse behremend in

Her emsîle, ger bizanî pend in (E.X)

Emsîle: Pirjimariya ‘mînak’ e.

Emşew: k.s. Îşev.

Emwac: Pêl.

Ena: Ez.

Enadil: Bilbil.

En’am: Sûretê en’am sûretê sêyem yê Qur’anê. Meriv, însan, mexlûq.

Enamil: Sertilik. Pêçî, tilî.

Enaniyet: e. Xweperestî, ezezî.

Enarê bistan: Hinara bax.

Enarê pistan: Hinarikê memikan, memik.

Enasir: Piraniya ‘unsur’e: Av, ax, agur û hewa.

Enasîr: Tuxm, nijad, regez

Enbar: Mexzen, kîler.

Enbaz: Heval.

Şahîn û xeman divête enbaz

Derdan û deman divête demsaz (E.X)

Enberfeşan : Enberbar, enberweşan, weşandina bêhna xweş.

Du zulfên enberfeşan in

Du le'lên şekeristan in (E.H)

Enbîya: Piraniya “nebî”ye yanî pêxemberan.

Xwedê ew kire xatemê enbîya,

Welêkin ewe serwerê etqîya. (M.X.S)

Enbîyayê muhteşem: Pêxemberên nûwaze û mezin.

Encam: Netîce, dawî, aqûbet

Encim: Stêrkan.

Encim sîfet encimên firozan

Heft şev di temara û heft-i rozan (E.X)

Encimen: Civat.

Encum: Piraniya ‘necm’ e yanî stêrk.

Encumenfirûz: Ya/ê ku civatê xweş û geş û bi ronî dike.

Endaz-endaze: Pîvan, derece.

Her hey'eta lê rûh û cism

Gelkê ku lê danî tilism

Her yek ji yek ra bûne îsm

Lew herfi herf endaze da (M.C)

Ender: *f.* Li wextê.

Ender: Din av da

Enderûn: *f.* Nava dil.

Dîsa ji nû isqa berî

Pur enderûn in ateş e

Zulfa muzeyen enberî

De'wa digel xala reş (E.H)

Endişe: Tirs, hizir, têfikirîn.

Hizirkirin.

Endiwe: Xem.

Endo: *k.s.* Xefet, xem.

Enduwe: Xem, kovan, alozî.

Ene: Ez; kurtkirina gotina Mensûrê Hellac ku digot: “enelheq”. (Ez heq im).

Enelheq: Gotima Mensûrê Xellac ku gotibû “ez heq im”.

Ji "enel heq" bi lebên le'li xeberdari bûyin Bi gulaba serê zulfa xweh, te mensûri kirin (M.C)

Enellah: Ew banga ku Hz. Mûsa li darê bihîst. “Ez Xwedê me.”

Bi ziyadî were qeydê şecerê wadîyê quds Ku bizanî bi bihê sît ê enellahê ji Tûr (E.X)

Enelxeyr: *e.* Ez ji xelkê baştir im.

Enfas: *e.* Pirjimariya nefesê ye.

Engebîn: *f.* Hingivîn.

Engêw: *k.s.* Gezkin.

Engîz: Barbari, wehşet.

Ji re'na nêrgizên tey mest û xwûnrêz

Zeman bû 'ehdê ceng engîzê Cengiz (M.C)

Engoşt-enguş: Tilî.

Bide engoştê serzêr û bemê zar

Binalîne kesê hesretxurê yar (Ş.M.E)

Enguşta nebî: Tilîya Hz. Mihemed ku pê hîv kir du şeq.

Engûr: Tirî.

Lew ji lebê le'lê te cam bû xecil

Badeyê engûri kuca selsebîl (M.C)

Enguşterî: Gustîlk, hingulîsk

Enhar: Piraniya “nehr” e, yanî rûbaran, çeman

Enîl alemîn: *e.* Ji alemê.

Enîn: Nalîn, zarîn.

Enîs: *e.* Hogir, heval. Xemrevîn.

Zeynan û Siyanis bûne qîble di xemîsan Qesdê dikirit wan çi xerib û çi enîsan (M.M.M)

Enîs: Hesin

Enne: Miheqeq, Bêguman.

Enqere: Teşqe, bela.

Ensar: *e.* Alîkar, mebest misilmanên Medîneyê ku alîkarîya Mekeyîyan kiribûn.

Ente: Tu.

Enwa': Cureyan.

Enwa'ê: *e.* Cureyên teblixa xwe.

Enwa'ê milel: Cureyên neteweyan, miletan.

Enwar: Pirjimarîya peyva 'nûr'e. Ronahî, ronakbîr, bi nûr.

Ji tesîra enwarê vê xameyê

Beyan kim gelek xarîquladeyê (Ş.E.A)

Enwer: Ronîtirîn, geştirîn, herî ronî.

Enzar: Nêrîn, raman.

Eqar: Tixub, sînor

Eqarib: 1.Dûpişk, gulîyên weke dûpişkan. 2. Xizm, eqrebe, nas.

Rabûne ve xasekî û xadim

Hindek di eqarib û meharim (E.X)

Eqbde: Berda.

Eqd: 1.Marbirîn. 2.Dîlan. 3. Nîyet, mebest. Girêdan. 4.Bi benvekirina morîyan. 5.Diravên ku dema xwestina bûkê Ji ala bavê wêra tê dayin.

Ger eqd û nîkahê tu dixwazîji Xweda ye Lê mayîye bewsek ji du çêsmê te bidim ez (M.E.F)

Eqdah: Qedehan.

Eqdam: Lîngan. Piranîya qedemê, lîng û pê.

Eqdes: Herî pak û pîroz.

Roj i tu li şerqê bi cemala xwe di berqî Billah ku ji ser çêsmeyê eqdes qebesî tu! (M.C)

Eqel: Kêmtirîn.

Eqlam: Pirjimarîya qelemê

Eqli'î: Bes baranê bibarîne. Mebest sûretê Nûh e.

Eqre': Keçel.

Eqrebutterîq: Nêzîktirîn rê. Yanî evîn rêya herî nêzîke jib o gihandina Xwedê.

Eqrebut-terîqe: Rêya nêzîktir.

Xafil me be îşqê filheqîqe

Ey rehrewê eqrebut-terîqe ! (E.X)

Eqsam: Piranîya qismê ye, cure û nifş.

Eqtean: Şûr û qelem.

Eqwam: Piranîya qewm e, Qewman.

Er: Heke, heger. Eger.

Er'ar: e. Şerm, fedî, eyb.

E'raz: Tiştên çêbûyî.

Erazil: Piranîya 'rezîl'e.

Erbab: Ehl, şareza, pîspor. Xwedîyan.

Erbabê xerez: Kesên dil bi kîn û dîlnexwaz.

Eshabê kemalê perdepoşin

Erbabê xerez di pir xuroşin (E.X)

Erbe': Çar.

Erbe'a: e. Çarşem.

Erbeîn: Çil.

Belkî ne çil û ne erbeîneq

Zenna di dilê wî bû yeqîneq (E.X)

Ercû kit: Bixwaze.

Ercumend: Giranbiha, xwedanqedir.

Erdem: Xûypakî, dîlpakî, fezîlet.

E'redet 'ennî: Rû ji min veğerand.

Ereq: Nazîktirîn, zarîftirîn.

Er'er: Navê darekîye, dara merxê.

Telebkar in dil araîm medîm yarin
bûyî şaîm

Le bejna 'er'erîn daîm siyeh mar le be
colan têt (E.H)

Erin: e. Hêrs, xeyd.

Eristetalîs: Aristo: Feylesofekî
yewnanî yê navdar e. Şagirtê Platon e.

Erînî: e. Tu xwe nîşanî min bide.

E'rec: Kulek, leng.

Erez: 1.Çemê Erez (Aras). 2.Tiştê ku
nikare bi serê xwe hebûna xwe nîşan
bide, di vê yeke da mihtacê cewherê
ye, wek reng.

Cewher ku temamî mizmehil bit

Teşbîhê erez ku minfeil bit(E.X)

Erjeng: Wêne. Asteng. Pirtûka
wêneyan ya hunermendê danyarê
Manîheîzmê Manî.

Ji wan Erjeng û Manî şermîsar in

Li teswîr û nuqûşan destîsar in
(Ş.M.E)

Eristetalîs: Zanayê yewnanî Arîsto.

Erkan: e. Xîm, bingeh.

Ermarh: Rim, rîman.

Ermexan: t. Diyarî, xelat. Ew xelata
ku rêving digel xwe tîne, diyarî

Ermûş: Hevrîşim.

Erq: Reh.

Erqem: Mar. Marê reş. Kezîyên weke
maran.

Zinhar e kesê destî bibit erqemê ser wê

Bê 'işweyê le'Ian ne bi teslîmê jiha girt
(M.C)

Erre:Birrek.

Erş: Text.

Erûs: Bûk.

Lewra ku cîhan wekî erûs e

Wê hukmê di destê şûrê rûs e (E.X)

Erwah: Piranîya “ruh” e. Rih, can,
rewan.

Erwah-i ji maneya Pêxember

Çêbûn, mesela nebat û şekker (E.X)

Erwahê muqeddes: Rihên pak û
pîroz, ferîşte.

Erxewan: Kulîlkeke sorê pembeyî.

Dareke kulîlk sor e. Kulîlka hinarê.

Ji rûhê wan gulê pîr ê mûxanî

Bide çend camê raz ê erxewanî
(Ş.M.E)

Erxenûn: Dengê xweş. Navê sazekî
ye , org e.

Erxewanî: Sorê mîna erxewanê.

Ery û senûn û dureb: Wisa, wusan.

Erz: 1.Nîşandan 2 Fereja, ber.

Erz: e. Erd.

Erzen: Erçen.

Erzikî: Daxuyanî.

Erzîn: Nebatat.

E'sab: e.Rehê sinirê, esebiyet.

Esabî': Tilî, pêçî.

Esaxir: Piçûkan.

Esbab: e. Pirjimariya peyva “sebeb”ê
ye. Tiştên lazim.

Esbê': e. Tilî.

Esed: Şêr.

Zulf çûne ser nûra zelal

Carek were bayê şimal

Biskan ji ser dêmê vema

Zulfan ji ber cotê esed (M.C)

Esedullah: Şêr'e Xweda, bi piranî ji bo Hz. Elî tê gotin

Esef: Poşmanî.

Esef e rû dekey be sac: Heyf û mixabin e ku rûyê xwe dikî wekî sêla nan, ango reş dikî.

Eser: Nişane, Şop.

Eser kir: Kar kir. Berhem da.

E'ses: e. Hestîyekî hûrik ji boçika însan, beden tev fema dibe ew dimîne.

Esfel: e. Nizimtirîn, jêrtir, bindesttir.

Kesê bitin munaîfîq şubhê şeytan

Cihê wî esfelê safil di nîran (Ş.M.E)

Esfendiyar: Kurê Guştasîp e. Kesekî qehreman û cengawer bûye. Digel Rustemê Zal şer kiriye.

Esfer: Zer.

Esfiya: e. Şexsîyetên mezin

Eshab: Heval, hevalên pêxember.

Sed tehîyat û selat û sed selam

Ser Resûl û al û eshaban temam (Ş.M.C)

Eshabê kemalê: Kesên ku bi edebîyatê ra mijûl in. Edebîyatnas.

Ehabên resûl: Hevalên pêxemberî, xelîfe.

Esheb: Hespê gewez û çîl. Zereng, roj.

Esîr: Dîl.

Eger dostek b 'esîri bêfirotin

Bi wî em nadine qurşek Kemalî (M.E.F)

Esîrit: e. Hêsîrê te, dîlê te.

Eskele: Keştîgeh, gemîgeh, lîman.

Eskemil: Îskemle, kursî.

Esl: Kok û rîşe.

Esl û bix: Regez û kok.

Eslab: Dûnde, zurîyet.

Eslan: Şêr.

Eslex: Wekî eyhem kerr e.

Esl û fesil: e. Bav û bapîr.

Esma: Nav. Navên hemî tiştî.

Esmaê heq: Navên Xweda.

Alem bi alem ew neseq

Bû ayîne esmaê heq

Nûra tecellaya teteq

'Eks û xeyalek sade da (M.C)

Esmar: Piranîya semereyê ye; Mêwe û ber.

Esme': Mirovê guh piçûk.

Esmer: Rengê genim, gûn.

Esna: (c. sennî) Navber. di nav da

Esnafe: Cur bi cur.

Esnam: Piranîya "senem" e, ango pût

Esp: k.s. Hesp.

Digel esp û rûx û filê bi heybet

Sipî ne tev bi hev re tene xîret (Ş.E.)

Espehan: Esfehnan.

Cuhtê Hebeşan bi terfet-ûl 'eyn

Anî qederek ji Espehan bac (M.C)

Espê qul: 1.Hespê kumeytê kapreş.

2.Kul û kor.

Eşqerê bed fê'l i, çi hê kir 'ecêb!

Barekellah xweş bezî espê qul e.

Espîde baz: Bazê spî.

Esr: Sedsal.

Esra: Di erebî da ji rêveçûna di şevê da, yani tişteke ku tişteke dinê di şevê da bi rê ve dibe.

Esrar: Raz, tiştên veşartî ku herkes nizane.

De çend bibejî Sadiq ji esrar û deqaiq
Evan wesfên di laîq ji husna ya delal e
(S)

Esrarên muêlla: Razên hêja.

Esrarê qidem: Razên kevnar, tim û tim.

Esrî se'adet: e. Serdema bextewariyê ye. Hatina îslamê.

Esselat: Silav û selewat û dua.

Essela: e. Rehmet, xweşî. Azan, bang.

Estar: Perdeyan.

Estewdîûk-el barî: Te dispêrime Xwedê.

Estobend: Derdor girtin.

Estuqus: Pisporekî Yewnan.

Estûn: k.s. Sitûn.

Eswed: e. Reş. Nîşan, şanik.

Eswed birû: Birûyên reş.

Eswed Hecer: Berê Reş yê li Ke'beyê; yanî xala rû.

Ji me eswed-heceran secde divên

Bi ziyaret me ji wan bûse divên (M.C)

Eswed'uyûn: e. Çavreş.

Eswed-xurab: Reşbelek. Qijika reş, çavên bi wî rengî.

Esxer: Piçûk.

Eş'ar: Helbestan.

Eşa'îre: e. Yên ku peyrewên mezheba Eş'arî ne.

Eşbah: e. Piraniya şebê e ku tê wateya cendek û laş. Li van tiştan.

Eşcar: Piraniya "şecer" e, ango dar.

Eşheb: e. Sifateke hespan e ku di wateya pir balkêş da tê bikaranîn.Hespê şîboz.

Eşhedeyn: e. Du eşhed.

Eşhel: Mirovê çav belek.

Eşk: f. Hêsrên çavan, hêsir, rondik.

Bi eşkê ateşî perwerde ke heb

Ji wê ebrê dirêje hesretê leb (Ş.M.E)

Eşkal û ewwda 'ên bedî': Dirûv û awayên bêmînak.

Eşkence: Azar.

Eşkewt: k.s. Şikeft

Eşkê al: Hêsrên ku ji xwînê sor in.

Eşkê çavan: Rondikên çavan.

Eşkê şefqet: Hêsrên dîlovaniyê.

Eşkî sûr: f. Rondika sor, firmêska sor.

Eşna: Bi biha, Gewhera bi biha.

Eşqer: Mirovê çav şîn.

Eşya: Tişt, meta.

Eta: Dayîn, qencî.

Etehrîq: Gelo tu yê bişewitînî?

Etfal: Zarokan.

Nûbare eger şêrîn, eger tal

Metbûe ji rengê new'ê etfal (E.X)

Etîbba: e. Pirjimariya “tebîb” e.

Etles: Cureyek qumaşê hevrişimê.

Eto: k.s. Te/tu.

Eto mebûre: k.s. Çi dikî bike.

Etrab: Keçên hevsalên kuran.

Hemsal, kesên temenê wan wek hev.

Etrab û kewaîbêd-i ezra

Mirdan û mirahiqêd-i zîba (E.X)

Etraf: Piraniya teref e, alî, hêl.

Etrûş: Kerr.

Etşan: f. Tî.

Etwar: Tewr, rewş, hal, tevger, merhale, wezîyet.

Etwarê hudûs: Hal û ehwalên dine, rûdanên dine.

Da nigarê xwe bi sed rengî bibînî (tu)
îro Were carek bike seyrê tu di etwari
hudûs (M.C)

E'urûc û su'ûd: Hevrazçûn.

Ev emr: Ev kar.

Evhe :Ev e.

Evişandibûn: Parastibûn. Ji zevîyê ku
dîwarekî ji şaxikan yan ji stirîyan li
dorê be ra tê gotin. Di destê xwe da
hîştibûn, parastibûn.

Evîn: Aşk.

Perwane lew dimirît xoş nîye ew bi
jîne Zeîf e xo nagirit tîj e berqa evînê
Bi perdê nasebirit perde kemala dîne.
(F.T)

Evraz: Hevraz, kaş.

Evrazi: Berjor.

Evşî: Parastin.

Evxan: Efxan, fixan. Qêrîn, nalîn.

Ewam: e. Reşexelk, kesên tebeqeya
jêr. Xelk.

Ewan: k.s. Serdem, çerx, qern.

E'wan: Alîkaran.

Ewbaş: Du xortên bi hevdu ra.
Hevbejn û hevbal.

Van herdu biran ku ew du ewbaş

Dîtin, dil û can we dan bi şabaş (E.X)

Ewc: 1.Serê çîyê, lûtke. 2. Meqameke
muzîkê ye.

Uşşaq û newaîraqî-yû ewc

Vêkra dikirin bi rasiî zewc (E.X)

Ewcan: Cihên herî bilind.

'Ewca û cewn û sefra qews û qisiy:
Kevan in.

Ewda': Rewş (pirane).

Ewda' û eşkal: Hal û teşe, rewş û
dirûv.

Ewde: e. Vegerîna ji par ra.

Ewde nebî: Careke din nezivirî.

Ewe tewbeya te peşîman bibî,

'Ezimkî, tucaran lê 'ewde nebî. (E.X)

Ew dexom: k.s. Ez wê dixwim.
Mebest xem xwarine.

Ewende: *k.s.* Ewqas.

E'wer: Yek çav e.

Ewîsim: *k.s.* Ew jî yê min.

Ew kesey sûtûte: *k.s.* Ew kesê ku şewitiye.

Ewliya: *e.* Pirjimariya “welî” ye. Dildarên xweda, kesên qenc.

Tu ku ne salikê mesleka ewlîya yî

Fîr'ewn î, neke de'wayê Mûsayî (X.U)

Ewqat: Piraniya weqt e; dem, zeman.

Ewrad: Wird, werd. Dubarekirina zikiran. Pinepin, peyvên bi dizî.

Me qebûl e xemr û saqî, dêr û zinar û senem

Me nevêt seccade û ewradê wek sedaneyê (SP)

Ewsaf: Wesif, rengdêr.

Ew seganen Siplle: *k.s.* Ew kuçikên bêwefa.

Ewşe: *k.s.* Ew jî.

Ewtan: Pirjimariya welat

Ewtar: Têlên sazê, têt, jîh. Jîya alavên muzîkê.

Ewtar-witir: *e.* Fer, tek.

Ewwel: *e.* Yekem, pêşî, li destpêke.

Ewzar: Guneh.

Dikim tewbe ji ewzara

Bi hingî pelçimê dara

Ji min deyne ewan bara

Xuda wek me, me ra nakî (M.E.F)

Ex: Bira.

Exbar: Çîrok û serpêhatî.

Seyyadê şîkarê hisnê exbar

Kir bo me ku serguzeştê îzhar (E.X)

Exdab: *e.* Piraniya “xezeb”ê ye.

Exder: Kesk e.

Neqşî kirin cûybar bela çû werda exder Sinober û gulbihar kulîlkêt mu'enber Gulşilêl û lalezar nîsanokên di ehmer (M.G)

Exger: Pel.

Exlat: Hebûyên ku ji ûnsuran çêdibin.

Exleb: *e.* Piranî.

Exlebûhum: Gelekê wan.

Exnam: Pezin, pezan

Exraz: Piraniya xerez e yanî mbest û daxwaz.

J'ev ademîyêd-i sahib exraz

Mehza fikir ihtîraz û f'raz (E.X)

Exres: Lal

Bi nexmeê tesbîhan ve ezman têt tuyûre

Ji exres û fesîhan pakî dibit zuhûre

Ji Musa yû Mesîhe da'î bi xo Mensûr (M.G)

Exter: Navê stêrkekî ye. Stêrk.

Exteri îqbal û meh i burcê bext

Mihri sipehrê kemer û text û tac (M.C)

Exterme: 1.Laş, kuştî û birîndarên şer. Dîl, hêsîr. 2.Çoleçira, gûstêrik.

Wer ser de carek kuştîyan

Extermeyên wan yengîyan (M.C)

Exûn: *e.* Pirjimariya bira ye.

Exyar: Bîyanî. Xelk, kesên din, reqîb, xerîb.

Xelweta dil ji te rengîn nebitin,eynî nîfaq e Ger di dil em hemî exyar û muberra û xelî bit (Ş.N.B)

Exz: Girtin, standin.

Exzê can: Girtina can.

Ey "Mela" bawer bi mehbûban meke
Karê wan her exzê can e, bê xeta.
(M.C)

Exzê îman: Girtina îmanê; ji dîn derxistin.

Exz û î'ta: Girtin û dayîn.

E'yan: Kesên giregir.

Eyan: 1.Dîtin. 2.Xuyayî.

Eyanî: Eşkerayî.

Eyal: Malbat, aile

Eyas: Eyaz, navê dilketîya Mehmûd e.

Eyax: Pîyaleya vexwarinê.

Van meşrebe û eyaxê cînî

Dewran dikirin bi nazenînî (E.X)

Eyaz: Wezîrê destê rastê yê Siltan Mehmûdê Xeznewî.

Eyisandîm: Ez pak kirim, ronî kirim.

Eyisîn/teyisîn: Çirîsin, biriqîn

Eyîsa: Vêxist.

Eylan: t. Mar

Eyma: e.Ya/ê ku dipîve.

Eymen: Alîyê rast, bi ewle.

Ji wadê eymena Tûrê

Tecella kir di nêv nûrê (M.C)

Eymen û yumma: Rast.

Eyn: Çav.

Di bezma me qeyam ke saqîyê can

Ji firqet 'eynê min teşbîhê mircan

Eyne: Li ku.

Eyne selmak: Selmaya te li ku derê ye. Di edebîyata evîndarîya ereban da Selma her wekî Zîn û Leylayê tê nasîn.

Ey şeff'ê sabibe: Ey xwedî bexşende, xwedî, xwedan.

Eynu: 1.Westa. 2. Zeman. 3.Mar. 4. Zilam.

Eyn-ûl yeqîn: Rastîya nedîtî.

Eyn-ûl 'îyan: Rastîya ber çavan.

Ey şewnim gelîne: k.s. Ey komeleya şebnemê.

Eyn û Sad: Du tîpên alfabeya erebî ne. Mebest ji wan “çav” in

Eyn û Şin, Qaf: Sê tîpên alfabeya erebî ne. Mebest ji xwendina wan “eşq” e.

Eyser: Çep.

Eyş: Jîna bi kefxweşî.

Dinya hemî bûye eyş û îşret

Zala felekê ji kerb û hesret, (E.X)

Eyûb: Pêxemberê ku sembola sebrê ye. Kurê Îshak pêxember e.

Eywan: Kolik, sîwan, şemsiye.

Du alem pêkve muhtacê

Ji bo wî hate îxracê

Şeva ew çûye Mî'racê

Çixulxul kefte Eywanê (M.B)

Eyyam: Rojan.

Bi işqa yar û noşa bade û cam

Ji bo me xweş diborîn weqt û eyyam
(Ş.M.E)

Eyyamên wîsalê: Rojên bihevrebûnê,
rojên gihaştina yarê.

Eyyar: 1.Rihetîya dil, aramîya dil.
2.Hespê serbilind. 3.Sîwarên Ewropî.
4.Fêlbaz.

Ez: *f.* Ji.

Eza: *e.* Ezîyet, êş.

Min sed hêvî heye dîsa ji seyyad

Mi eza ke ji qufî û qeyd û bendan
(E.X)

E'za: Piranîya ‘uzw e, endam.

Ezaim: Nivîştan.

Ezazil: Şeytan.

Senema sur ji semed şevvqê ji heq
daye wucûdê

Ger Ezazîli bidîta ne dibir xeyri sicûdê
(M.C)

Ezberayê: *f.* Ji bo xatirê wî.

Ezcumle: Ji nav tevî, ji hemî. hinek ji
tevî, ji hemîyan hinek

Ezdad: Tiştên dijê hevdu. Piranîya
zidd e, dij, dijan.

Ezel: *e.* Pêşîya pêşî, pêşîya
bêdestpêk. Yê ku destpêka wî tune ye.
Defterê îşqê neda dest te mû'ellim ji
ezel Me'neya ayetê husnê li te lew ma
mesitûr (E.X)

Ezelyet: *e.* Bê serî, bê seretayî.

E'zem: Mezintir , mezintirîn

E'zem îsmî: Navê Xwedê yê mezintir.

Ezfarul menîyye: *e.* Neynûkên
mirinê.

Ezfer: *e.* Zer

Ezfer: Kîskê bin çena xezalan ku misk
têdaye. Bêhn xweş.

Ji ber pertawê bisk ê wechê dîlber

Xezalan ketye gerdên miskê ezfer
(Ş.M.E)

Ezhar: Kulîlkan.

Şîrazeyê selsebîl û enhar

Mecmûeyê xidrewat û ezhar (E.X)

Ezheran: Roj û heyv.

Eziyyet: Êşandin.

Ezîm: Mezin, gewre.

Taha tu resûlê milkê erşê ezîm î

Der behrê kemalî tu tene durra yetîm î
(M.B)

Ezîz: 1.Rûmetdar, şerefdar 2.Ezîzê
Misrê, Mebest Hz.Yûsif e.

Ezîzê Misrê: Potîfar, Kitfîr. Serokê
Misrê.

Kî: Ey mîslê herareta xerîzî!

Îro he di Misrê dil Ezîz î (E.X)

Ezîzî nezdê min: *f.* Ezîzê nêzîkî min.
Ezîzê cem min. nik min ezîzî.

Ezkar: *e.* Piranîya “zîkr”ê ye.

Ez lebê le'l: Ji lêvên sor.

Ezm: Daxwaz, vexwend.

Ezman: Ziman.

Ezmanbirrî: Bêdeng, bêsewt

Ezmê remîm: Hestîyê rizîyayî.

Ey le'lê lebet 'ezmê remîmî dikit ihya
Coşan û xuroşan ji firaqa te ne derya
(M.B)

Ezmîne: e. Pirjimarîya zemanê ye.

Ezra: Keça bakîre.

Ezreq: Hêşîn, şîn e.

Ez Seb: Ji bajarê Sebeyê.

Ê

'Êbîd: Kole.

'Êmel: Kar, kirin.

Êdek: Suxme. sencaq.

Zalimê kuştim, şepalê nazikê qencê
delalê Bûn hîcaba zulf û xalê, êdek û
ala û tox (M.C)

Êmin: Emîn, bi ewlekarî.

Êre: Vê derê, ev derdor.

Êsand: Gerand, gihand.

'lşqa ji nûra la yezal

Husn û cemala bê mîsal

Êsandi yelmûm û şemal

Dîsa xwe lê perwane da (M.C)

Êste: k.s. Niha.

Êstekeş: Niha jî.

Êzdî: (Îzedî, ezdî, yezdanî) Tabî û
peyrewên dîne Îzid, dînê Yezdan in.
Kurd û Kurdistanî yên heqîqî ne,
mishefa reş û **cîlwe** jî, kitêbên wan ên
pîrozin, perestegêh û ma'beda wana
pîroz jî **Laleş** e.

F

Facîr: e. Xirabkar, gunehbar.

Fah: Belavbûna bêhna xweş.
Belavbûn.

Fahîşe: e. Jina xwefiroş. Mebest dinya
ye.

Fa'il: Yê ku dike; çêker. Kirde, biker.

Xwe dît û fexrê kir fa'il xwe dîtî

Ji lew ket qelbê rovî nar û pêtî (Ş.M.E)

Fa'ilek muxtar: Kesên di kirinên xwe
da azad, serbixwe.

Faiq: Bilind, baş.

Faîh: Belavbûna bêhnê.

Faîz: e. Bextewer.

Falatûn: Eflatûn.

Fam: Reng.

Fanî: e. Nemayînde, tunebûyî. Yê ku
dimire, namîne.

Fanîd: Şîrînîyekeji şeker û ard tê
çêkirin.

Fanîfî: Fenabûn. Mirina sofîyane.

Fanîz: Cureyekî vexwarinê ye.

Fanîz û nebat û qend û şeker

Mawerd û zibad û misk û enber (E.X)

Fanûsê beden: Çira laş: Dil.

Fanûsê qefes: Çira sîngê: Dil.

Faq: Dûvika tîr.

Fare: Mişk.

Farix: 1.Cuda 2.Vala.

Ji hubba sîm û zer farix be bêxem

Ku da qelbê te nûranî be her dem
(Ş.M.E)

Faris: Siwar.

Farisî: Zimanê farisan, zimanê persan.

Farûq: e. Hz. Emerê kurê Xettab, xelîfeyê dewleta îslamê yê duyem e.

Fasid: Xirab, şaş.

Bawer kir û gote merdê Qasid:

Ey pîr-i! Meke tu fikrê fasid (E.X)

Fasile: Bend û navber.

Faş: k.s. Eşkere, diyar. Mînak:

Waleh û mest im û faş im, ser û rîşantî tiraş im

Geh evist mal û qumaş im, te ne na ha ya hû (Ş.Ş.E)

Fatiha: Destpêkirin, têketin, xatîme. Sûreta Qu'ranê ya yekem e.

Fatîrî: Aferîdeyên Xwedayê aferîner, mexlûqên nişana afirandina îlahî.

Remzek xerib û fatîrî

Peyda bibit nîv xatîrî

Qewet te nînin ragîrî

Xef kî di nêv qelbê xwe da (M.C)

Fayîz: e. Bextewar.

Fazil: Fadil. Zêde.

Fea'il: Karkeran.

Febîha: e. Gelekî baş.

Fec: Rê,

Fe carek: Te zordestî kir

Fecr: e. Berbang, Şefeq, şefeqa sibehê.

Fecrê ku numaye wan elamet

Rabû di wî şehrî de qiyamet (E.X)

Fecrê kazib: e. Spêdeya derewîn.

Fecrê sadîq: e. Spêdaya rasteqîn

Fedla hinan: e. Mezinahîya hinekan.

Welê nessê dalin li fedla hinan,

Ji bo te bibêjim hemî efdelan (M.X.S)

Fedxulûha xalîdîn: Têkevinê, heta bi hetayê.

Fe'fû 'ennî ya îlahî leyse lîzzenbî 'eded: Gunehên min bêhejmar in, îcar min negire ey Xweda.

Fegar: Birîndar, biêşan.

Fehhaşt: Derketina ji hed.

Fehm: Têgihiştin.

Gerçî Kurmancîya me nefesîh e

Fehma manayê ji wê xayet melîh e (X.U)

Fehmîde: Fama, zana, têgihiştî.

Fehrest: Naverok, pêrist. Mijar û naveroka pirtûkê.

Fehris: Mêr, leheng.

Feirdil eynîze: e. Ferzên zatî, takekesî.

Fek: e. Hilweşandin.

Fekane: Hema bû, yanî Xwedê got 'Bibe' hema ew jî bû.

Xuda hez kir ji wê Nûra yekane

Xerez ew bû ji emrê KUN fekane (Ş.M.E)

Fekende: Lawirê ku ketîye davikê.

Fekende ser bîya derbey

Dikim hêvî ji mîrî hey

Şefa'et kî ji bo Batey

Bide ber zille sîwanê (M.B)

Fekeyfema: Çawa be.

Fekkirî: Fikirî, bala xwe daye.

Felatûn: Platon, feylesofekî yewnanî navdar e

Feleka etles: Asîmanê etles, yê bê stêrk.

Feleka fena serencam: Feleka ku dawîya wê mirin e.

Felekê tedwîrê: Dewran.

Felek mutî'ê ferman: Felekê bi ya fermana wî fikir. Fermanpejêrê wî bû.

Feleknuşîn: Cihê wî felek e. Rûniştvanê felekê.

Felek û kelek: Keştî û beleme.

Felemma zuqtuhû qed kane eswe':
e. Ew 'ezabê ku min kêşa ji 'ezabê dozexê xirabtir e.

Feleqte: Te anî hebûnê.

Felsefe: Ji du bêjeyên Yewnanî ye
Phîlo: dostî û evîn, sophy: zanîn û me'rîfetî û hikmetî ye.

Fem: Dev.

Fema bûn: e. Mehû bûn, xelas bûn.

Femen ye'mel: e. Kî dike. Mebest sûreta Zilzal e.

Fena: Neman, mirin. Bi wateya tesewifî têkilîbirîna ji dinyayê. Tunebûn.

Fenaî: Tunekirin, kuştin.

Fenayê mutleq: Nemana bi yekcarî.

Fanî ne bitin fenayê mutleq

Na bînitin ew beqayê bîl-Heq (E.X)

Fendan: Xapandin, fêl.

Feqd: e. Windabûn, cuda.

Feqet: e. Lê, belam, tenê.

Feqed efleh: Birastî ew kesê ku nefsa xwe paqij kirî serfiraz e. (Şems 91/9)

Feqed male îlel-hîcranî balî: Bi hîcranê ve meyl bûye dilê min.

Feqî: Şagirt, xwendekarê îlmen dînî.

Nabalix û ebleh û sefih in

Ya zahid û sofî-yû feqîh in (E.X)

Feqîh: Feqe. Şagirtê dînî.

Feqr: e. Hejarî feqîrî, xizanî. Feqîrîtî û xizanî, bê darayî.

Fe qultu ya rûhî meta: Min got, "rihêmin, heta kengî?"

Fer: Bi xeml, heybet

Fer': Şax, beş, ya ne eslî.

Feramoş kir: Ji bîr kir, ji dest da.

Feramûş: Kesê ku xwe ji bîr dike

Feramûş bikin: Ji bîr bikin.

Feraset: Kûr û dûrbînî.

Şukur da me dev û nutq û şhadet

We hem çehv û guh û 'eqî û feraset (Ş.M.E)

Ferax: e. Vala.

Feraz: Bilind, hindav.

Ferç: Quz.

Ferd: Yek, bêmînak. Takekes. Yek bi tene.

Ferda: f. Sibeh, dema ku bê.

Ferd eyn: e. Li ser herkesî ferz e.

Ferdî: Takekesî, yekayîtî.

Ferd û hey: Yekaneyê zindî.

Ferec: e. Rizgarî, xilasî.

Yeşîn ke, sebr e mîftaha ferec her
Dibîn pê fethê her dem qapî yû der
(Ş.M.E)

Fereh: e. Şahî, kêfxweşî. Dilxweşî.

Werîne bulbulê gulzar ê weznê
Fereh ke bendeyê pabest ê heznê
(Ş.M.E)

Fereng: Bîyanî, Rojavayî.

Ferengistanî ruxsarî: Dirûvê wê
wekî rojavayê spî û sor e.

Feres: Hespê kişikê (setrence). Hesp.
Wê bi peykê bikirin mati reqîbi dîsa
Bi rex û fil û feres, ez şeh û matê
nadim (M.C)

Ferezîn: Wezîrê kişikê (setrence).

Ferfûr: 1. Serekên welatê Çînê,
2.Porselenên çînî. Kasa Çînî.
Nêv kaseya ferfûr bikî

Feyzê li dil da fûr bikî (M.C)

Ferfûrî: Kevirê giranbiha ye.

Ferheng: Zanist, edeb û têgihiştin.

Ew reng e sezayê text, û ew reng
Ferzane bi eql û ferr û ferheng (E.X)

Fer'i: Çiq.

Ferîb: e. Xapandin, xap, dek.

Ferîdun bî ey bîhî: e. Bi şerma xwe
bi tenê be.

Ferîq: e. Bir, komele.

Ferîştan: Firîşteyan, melekên.

Fer kir: Ferz kir.

Fermûde: f. Ferman, Tiştê ku hatiye
emirkirin.

Ferq: 1.Cudayî. 2.Tepla serî. Ser.

Damujêtin têk wucûda wî ji pa ta ferqê
ser Lew me dayê îltifat paşî me jê
kirbû hezer (M)

Ferqê can: Jora serî, patika serî.

Ferqê perdaz: Ji perdan veqetin.

Ferqê ser: Jora serî, qalikê serî.
Kulîvanka serî.

Ferqe ser: Tepika serî.

Ferqperdaz: Pora serî ku ciwan
hatiye şeh kirin.

Ferq û hicran: Dûrketina ji cihê xwe,
xerîbî; êş.

Ferr: Fer, hêz, mezinahî. Rindî.

Ferraş: Perperok, perwane.

Ferraşê qeza bi sun'ê qudret
Xebra kiribû mîsalê cennet (E.X)

Ferraş: 1.Firfirok. 2.Raxistox.

Ferraşê qeza: Qeder di destê wî da
ye, mebest Xweda ye. Raxistoxê
qederê.

Ferre: Revîya çû.

Ferrux: Pîroz, ciwan.

Ferseng: Fersex (pivana rê ye,
beramberî 4482 m ye.).

Bi fixan bêtî û ji ber sed ferseng
Çi xeberdim ji dilê tey wekî seng
(M.C)

Ferş: Kevirê pan û berfireh, mecazen
ji bo dinyayê tê gotin.

Ey ne'tê tû ez erş heta ferşê şehîra

Ey pertewê nûra te cîhan geşte munîra
(M.B)

Ferş: k.s. Xalîçe, rayex, merş.
Raxistin.

Ferşê xebra: Erd.

Fert: Pirî, derketina ji hed.

Fertê teşwîr: Xemilandina zêde û pir.

Mehbûb û mihîb ji fertê teşwîr

Hatin ku bibin bi şewqê teqdîr (E.X)

Ferwar: Ferman, emr, xizmet.

Bi rehmet Rotema ba fezl û îhsan

Bike ferwarê bîne der ji zindan

(Ş.M.E)

Ferx: Çêlik, têtjik, zarok.

Ferxar: Ferhar, li Tirkistanê cihekî bi
bedewên xwe navdar.

Ferxende: Şadî, pîroz. Delal.
Bextewer.

Ferxende kirm bi ferqê, efser

Tabende kirin bi tacê, gewher (E.X)

Ferxî: Ferrûxî Sîstanî. Helbestvanekî
faris e.

Ferxunde: Pîroz.

Feryad: Hewar, gazî, nalîn.

Feryaderes: Alîkarîxwaz Kesê ku di
îmdada mirov da tê.

Kî: Ey heranefesêd-i bê newayan
Feryaderesêd-i pircefayan (E.X)

Feryad-i res: Palpişt, alîkar.

Feyya'd: Navdar, mirovê binavûdeng.

Ferz: e. Ferz, Pêwîstî, Gerek.

Ji îsyane ferze tu zû tewbekî,

Biterkî, gunahê di xwe pirr nekî
(M.X.S)

Ferzane: k.s. Xwedan aqil û tegihiştî.

Kesê pir zana, di Zanînê da bê hevta

Ferzenegan: Aqildaran, hişmendan.

Ferzin: Di kişikê da wezîr e.

Fesad: Fitne û tevlihevî.

Zahir tu meke evê înadê

Carek ve kuj agirê fesadê (E.X)

Fesad engêz: f. Xerabxwazî.

Fesan: Efsane. Serpêhatî, çîrok,
hîkaye.

Fesane: Efsane, çîrok. Feshet: Fesahet,
edebîyat.

Fesil: e. Navbeyn, navber, tixub.
Bend. Rez. cuda, cihê

Fesl: Navbir, demsal, werz. Dem,
mewsim. Cuda. ji hev veqetandî.

Fesla: f. Xezan, Payîz.

Gulîstan weh ku sorgul tê, çimen misla
ku sunbul tê

Hezar bulbul bi xulxul tê, di fesla
mahê nîsanê (E.X)

Fesle: Navbera mêweyan di rez de.

Feslê nîsan: Meha nîsanê.

Feslê xîtabê: Gotina ku rastî û şaşitîyê
ji hev diqetîne, dîyar dike.

Feslî xezan: Demsala payîzê.

Fesl û bab: Beşên pirtûkan in. Fesl ji
bab piçûktir e.

Fesm: Birrîn

Feşandin: Reşandin, belav kirin, bi cih kirin. Veweşandin, (dest) vekişandin.

Feta: Xort, ciwan. Keç, qîz

Fetehe: Fetih kir.

Feterat: e. Zîyan zerer.

Fe terda: e. Razîbûn ji te çêbûye.

Feth: Vekirin.

Fethê bab: Vekirina derîyan. Ango bûye dem ku derî vebin.

Qelbê te dibêjitin ku: Rabe

Ev saete eynê fethê babe (E.X)

Fetilîn: Zîvirîn.

Hasil: Li firû', eger usûlan

Ej lê fetilî wekî fuzûlan (E.X)

Fetîl: Fitîla çirayê. Tayê ku zeytê da kirî ku vêdikeve.

Fetl: Gerîn û zîvirîn.

Fetrak: Bendê dafîkê.

Fettan: Fesad, bi fitne. Fitnekar.

Fetû: Fetwa.

Fetwî wela yeqdeh: e. Fetwaya ji bo vexwarina meyê bêzirar e, helal e.

Fewa'il: Tiştên ku dibin sedem, çeker.

Fewc: e. Pêl.

Ehma mûqabil bûne zewc

Lê cumle jêbûn fewci fewc (M.C)

Fewc: Bir, tîp.

Fewqel- ade : Di ser adetê ra.

Fewqel'eyn: Li ser seran.

Fewqê 'Ednan ta ji Adem ixtilaf: Di çend malikên piştî vê da helbestvan

navê babûkalên Mihemedî ji Ademî ta wî bi xwe rêz dike.

Fewqê nar: e. Ser agir.

Fewt: Mirin. Winda.

Zîna ku dused birîn li cergê

Çû haletê fewtê, şadê mergê (E.X)

Fewt nekin: Li xwe nebin.

Fewware: Pet, kanîya ku difûre.

Fewwareyê merhemet bi kel hat

Bêgav-i girî ewî digel hat (E.X)

Fewz û felah û necah: Xilasbûn

Fexfûr: 1.Padîşahê Çînê. 2.Kasa meyê 3.Zelal, şefaf.

Fexfûr bikî: Pak û zelal bikî, ronî bikî.

Fexfûrsur: Weke serekê çînê fexfûr bi heybet û mezinahî.

Fexir-fexr: Rûmet, qedir, qurebûn. Şanazî.

Tu dersê didî hem ji bo wî bide,

Ji bo xizmet li tem' û fexrê mede! (M.X.S)

Fexxar: Herrîya hişkbûyî, pijîyayî, cêr û kûp û kasik û kodîkên ku ji herrî ra pijandîne. Kerpîç.

Mîm, metleê şemsa ehed, ayîn e sifet kir. Lami' ji 'Ereb, birqê li Fexxarê Ecem da. (M.C)

Fexxar: Pirr bi fexr û pirr qurre.

Fexz: Ran e.

Feyda 'ulûmê hikmet: Xêr û bereketa hikmetê; bereketa zanîna sebebê tiştan.

Feylesofane: Wek feylesof û zanyaran.

Feyroz: Pîroz, şen, kêfxweş, firûz, bextxweş.

Dewra felekê ji bextê feyroz

Dîsan ku numa ji nûve Newroz (E.X)

Feyrûz: Renge şîn. Pîroz, biserketin.

Feyrûzelîbas: Kincşîn, cilên ji şîne asîmanî.

Feyzê nûbuharî: Pirbûna şopa nûbiharê.

Her dar-i ji feyzê nûbuharî

Têk şu'le di da ji nûrê Barî (E.X)

Feyyaz: Pirr bi feyz û bereket.

Barandoxe feyzê, Xweda.

Hemyan bi teye midare û debr

Feyyazê rîyazê xelqê wel-emr! (E.X)

Feyyazê Mûtleq: Xwedîyê feyza bê payan, Xweda.

Feyz: 1.Xêr û bereket.Himmet û bereket; hêz û zanîn. 2.Rêj, rijîn.

Feyzîyab: Bextewar.

Fezaîl: Karên baş.

Fezîhet: Eşkerekirina ne li gorî daxwazê.

Îşq agire, nefheye nesîhet

Sirperdeye, lewraeye fezîhet (E.X)

Fezîle:e. Fezîlet, xuypak.

Fêhwa kelam: e. Kurtasî, wafa kelamê.

Sû'alê di zêde cewaba 'ewam,

Nezanîna xet'ê di fehwa kelam (M.X.S)

Fê'l: Lêker.

Fê'l mute'eddî: Lêkera gerguhêz.

Fêris: Mêr, siwar, çavên weke siwarîyan. cengawer; çav.

Cengê Hindî dikirin Fêris û rumbazê "Ereb Tox û ala di Firingî ne, kemandarê Hebeş (M.C)

Fi: e. Di....de

Fida: Gorî.

Fidd, luceyn û nuqr: Zîv.

Fidê: Fida, gorî.

Fi'dûl: Maytêkirin.

Figende: Kuştî.

Fihê nakî: Fedî nakî, şerm nakî.

Fîla gusfend: Karê mîyê, bizine.

Fikar: Birîndar, bixem.

Fikirî: Nihêrî, dît.

Fikr: Tirs, vekişîn.

'Îşwe tûr e rawada û xemze û fikr û nigh We cuda her yek nihan tavete dil peykanekî (P.B.H)

Fikr: Hizr û bîr.

Fikrê fasid: Hizr û bîrên pûç û ne di rê da.

Fikrî batin: Ramana dil.

Fikr û teswîrê: Hizr û ponijînê.

Fikurîn: Fikirîn

Fi'l: Kiryar.

Filcumle: Bi tevayî, hemî.

Filfal: Di cî da

Filhedîd: *e.* Di hesin de.

Filk: Gemî.

Filka feleka melek di navê

Mewcan ku reva di weqt û gavê (E.X)

Filorî: Paqij, safî.

Qelbêd-i zexel diket belorî

Pûlêd-i dexel diket filorî (E.X)

Florî: Cureyek pereyên ewrûpî yên zêrîn di serdema Osamanîyan de.

Filûs: Fils, pere. Manqiran

Find: Çira, mûm, şemal.

Sîyeh çeşmê spî zendê

Te suhtim şubhetê findê (M.C)

Fiqhiyet: *e.* Pirjimarîya “fiqh”ê ye.

Fir: Firkirin, vexwarina bi lez.

Firangan: Fransîyan. Rojavayî, Xiristîyan.

Firaq: Cudahî. dûrî.

Ey çehre perî dil me ji eşqa te kebab e
Daîm ji firaqa te, me can her bi 'ezab e (M)

Firar: Revîn.

Firaz: *f.* Hevraz, evraz.

Fireng: Ewrûpayî.

Firêb: Ferîb.

Firingî: Fransî, Bîyanî.

Firîb: *f.* Dilbikûl.

Hûr û eyn î xemrevîn î dil teşîn î dil
firîb Be qusûr î hem çi hûrî nura Tûr î
pur 'ecîb (MC)

Firîb: Xapandin.

Firoz, Firûz: Ronahî, bi şewq.

Firqe: Komel, partî.

Firqet: *e.* Cuda, codayî, cudabûn, jihevduketin. Dûrketina ji yarê. Cuda bûn, cudabûna ji yarê.

Firseng: Kêmezêde: 6 km.

Firsex bi firsex: *k.s.* Qonax bi qonax.

Firû': Çuqlî û şax û liqên darê.

Firûzî: Fekkandin. Fekk. Di lîstika damê û nehberkê da dixebite.

Firyadîres: Alîkar, adil.

Firzend: *f.* Kur.

Fisane: Efsane, çîrok û serpêhatî.

Fisûn: Sexte, cadûgerî, sihêrbazî.

Fisûnger: Cadûkar û sêrbaz.

Ey şairê saxir û nikûnser!

Wey sahirê saxir û fisûnker! (E.X)

Fişan: Belavkirin.

Fitneengîz: Fitnebaz, fesad. Fitnekar.

Sewaşek rêhte dîsa alema dil

Bi cadûwê du çeşmê fitne engîz (M.C)

Fitne qestê: Mebest rakirina fitneyan e.

Fitrak- Fîtrak: *e.* Zîn, marek, bergeh, eyer. Bendê (werîs) girtina ajelên kovî. Bend, Dav, kement. Bendê ku pê nêçîr tê kirin. Ew kinifa bi zînê dewarî ve tê girêdan da nêçîrê bixin hundirê wê.

Şigarek der xwûrê şah im

Di wê bendê di fitrakê (M.C)

Fitret: Siruşt, tebîet.

Fitûr: Sistî.

Fizûl: 1. Tewş. 2. Bê ar

Fizûn: Zêde.

Fî: Di ...da, têda. Li ser.

Fî beynî: *e.* Bi dizîkê min ve.

Fî beynî umet: *e.* Di navbera umetê da.

Fîlcimle: Hemî, bi carekî.

Fî ehsenî teqwîm: Şiklê herî delal.

Fî hazen-neba: Divê xeberê da.

Fîheqîqe: Birastî, rastîn.

Fîhî: Tê da.

Fî hesenî: Li ber çavê min.

Fîl: Kirinên keçan.

Fîl behrî: Di deryayê da.

Fîlhal: Di cih da.

Fîlheqîqe: Bi rastî.

Fîl û rex û kerkeden: Navê kevirên kişikêne. Niha di kişikê da kerkedan tune ye.

Fîraq: *e.* Dûrketina ji warê xwe, Dûrketina ji yarê, êş, hicran. Cudahî

Fîrî îftîra îddî: Derew.

Fîroz: Serketî.

Fîrqe: *e.* Komel, cemaat, partî.

Fî şîta: *e.* Di zivistanî da.

Fî teyyîha neşru'n-neba: Tê da belavbûna tiştan heye.

Fîtneyê berpa dike: *k.s.* Fitneyeke mezin derdixe.

Fîtret: Reçe, siruşt, tebîet.

Fîtrî: Reçeleyî, siruştî.

Fîxan: Qerîn û hewar.

Qelbê me zîyade pir hezîn e

Karê me fixan_û her girîn e. (S.H)

Fîxanê ti me: Hewar û qirînên me.

Fîza: *e.* Di dema, di çaxê.

Fîza': *e.* Hawar û nalenal.

Fuad: Dil.

Fudul: *e.* Tiştên zêde.

Fulfulîn: Reşê ji rengê bîbera reş.

Fulk: Gemî, keştî.

Te go, ew cismek in, yek ruhî tê da

Wekî fulka ku hakim Nûhi tê da (Ş.M.E)

Fulka felek qaîm sukan: Keştîya felekê ku sekanê wê gera wê eyar dike.

Fuqera: Piranîya feqîr e, xizan, hejar.

Furat: Ava çemê Firatê. Mebest aveke xweş û şîrîn e.

Furqan: Navekî Qu'ranê ye. Ango ya ku rastî û nerastîyê ji hev diqetîne, ferq dike.

Muhemmed seyyîdê alem şefî'e roja mîzanê

Çiraxe dîdeê Adem xudanê wehy û Furqanê (M.B)

Furûx: Ronahî, geşatî.

Fustat: Kon.

Fusûn: Sêhrebendî, sêhr

Futuwwet: Lawînî.

Futûh: Rêlêvekirin, qencî û kerema îlahî, dayîna Xwedê.

Ji pertaw û ji enwara wî Rûhî

Bûye Ke'be xwedanê her futuhî
(Ş.M.E)

Futûhat: *e.* Pirjimarîya fethê ye.

Futûhî roh: *k.s.* Vekirina ruh.

Futûr: *e.* Sekan, bênavber, ji para mayî. Sistî û sarî.

Fuwarey awî: *k.s.* Biliqîna avê.

Fuzûl: Ya/ê ku pir û di her tiştî da diaxive ku ne karê wî be jî.

Fuzûlî: Sînorbuhurîn.

G

Gah: 1.Carna. 2.Gav, zeman.

Gahê: *f.* Car caran.

Gaf û lam: Gul

Gam: *k.s.* Pengav.

Garden geçim: *f.* Dev û qirik kilskirîne.

Gaz: 1.Kelbetan, meqes. 2.Şîşê hesinî.

Gaze-gaz: Qîre-qîr.

Gazikê: Bi qasî gazekê. Ji serê tilîyan heta enîşkê.

Gaziya xwe raheşt: Kire gazî û hewar.

Gazî: Nîda.

Gazî ket: Gazî bike.

Gebel: *k.s.* Kemêl. Rêxa bi hirîya pez ve dimîne û hişk dibe.

Gebr: Mecûsî.

Geç: *f.* Kils.

Geda: *f.* Parsek. Xulam, benî, xizmetkar. Xwazok.

Şah û geda û adî nêv mehfelan û nadî

Bûn yek biyek munadî her yek ji dil dinalî (H.F.H)

Gedayê bênewa: Xwazokê hejar. Parsekê hejar.

Ged û gîpal: Hûrê mezin.

Geh: *k.s.* Dem, zeman. Demekê.

Gehê: *k.s.* Carek.

Geh geh: Carinan.

Gejdum: *k.s.* Dûpişk.

Gele: Reva askan. Reva ahûyan.

Gelk: Herî.

Gelwaz: Benî, meşlûl. Bendê ku dendikên gêzan, hêjîr û hwd. li ser têne raxistin.

Gelweha: *f.* Pirjimarîya qirikê ye.

Gemall: *k.s.* Segê nêr.

Gemş: Gemşa dest.

Genc: *f.* Gencînê, xizne, xezîne.

Gencî tu di nêv tilîsmê alem

Kenzî tu eyan ji îsmê adem (E.X)

Genca zuhûrê: Xezîneya vê aleme.

Gencîne: Xezîne, Kenz

Gengaz: Mimkun, pêkan

Genim gûnî: *k.s.* Renggenim.

Genimreng: Ji rengê genim.

Gerav: Şilo, ne zelal.

Gerek: Pêwîst, lazim.

Ger qabil î: Ger dikarî.

Gerdan: Gera stêrkan, felek.

Gerdûn: Kaînat, çerx û asîman, cîhan.

Dê min 'elema kelimê mewzûn

'Alî bikira li banê gerdûn (E.X)

Gerd: Toz. Ger. Toz, xubar.

Gerdayî: Bi ser hev da hatî, xwe li hev gerandî.

Gerdena beyça: Gerdena wekî destê Hz.Mûsa spî, dema wî mucize nîşanî firewûn kir.

Gerdek: Tenê mayîna bûk û zavê.

Gerdê ehmer: Kibrîta sor ku sembola her tiştê buha û kêmpayda ye.

Gerdînit: k.s. Gerdena te.

Gerdînkeçî: k.s. Îte'etkarî.

Gerdiş: Gerok, zîvirok, dewrana çerxê.

Seb'eyê seyyare û neh çerxê sergerdan, bi vê

Gerdiş û dewrê 'eceb der xizmet û karê te bî (M.C)

Ger divêtin hûn: Eger hûn bixwazin, eger hûn hez bikin.

Gerek: k.s. Tax, mehele.

Gerem bî: Ger ji min ra, ji bo min bêyî

Gerew: Ji ber deyna ve, tişên tîn standinê heta ku ew deyn bête dayîn.

Germiyyet: Germbûn.

Germî bazar: Bazara wan qenc dike, xweş dixebitin.

Gestî: Gezkirî.

Gestîme: Ez gez kirime.

Geşt: Ger, seyran.

Dilrubayan têne geştê

Sunbulan ta ta sema ye (M.C)

Geşteban-geştîban: f. Keştîvan, gemîvan.

Geştî: Gemî.

Nageh gerîya bi Cûdî meftûh

Dergahê kerem li geştîya Nûh (E.X)

Gewah: k.s. Belge, şahid.

Geweşt: Meqameke muzîkê ye.

Gewher: Cewher.

Seyê dikirin cumle xewasên di me'anî

Bo eslê gewher xwe sedefî bûye nîqab e (M)

Gewhera beqa: Gewhera hebûnê, jiyan.

Gewher'efşan: Zêrbelavker.

Gewherî: Gewherfiroş.

Gewre: k.s. Mezin.

Gewrî: Gewriya aş. Devê aş ku dextê ra dikevê.

Gewza: k.s. Xwe gevizandin.

Geyme: k.s. Ez gihiştim.

Geyne: k.s. Gihiştine.

Geywet: k.s. Ew gihiştî ye.

Gezend: Zîna.

Gezme: Sintîrik, sertîr. Tîr.

Geztin: Devlêkirin, gezkirin, pêvedan.

Gêran: Sersal. Kirin, gerandin.

Bi hev şad û muferreh bûn zîyade

Li hev gêran bi şahî cam û bade (Ş.M.E)

Gêran di cih û meqamê mehmûd:

Sersal di erdekî baş û pesendkirî da çêkirin.

Gêrane: Gerandin, derbazkirin

Gêrbûn: Gindirîn.

Gêsû: Kezî.

Pirtewê mir'xî dilî te ger te pirsî min
diye Wey te destê şoxekê gesû xemî
peçanekî (P.B.H)

Gêfî: k.s. Cîhan, dinya.

Gêyo û Pêşeng: Du pêlewanên çîrokê
ne.

Gihan yek: Gihaştin hev; êrîşê hev
kirin.

Giftî da: k.s. Soz da.

Gil: Herî .

Gilaraw: k.s. Li cihekî sakîn nebûn.

Giley pêşim: k.s. Piyên min li min gilî
dikin.

Gilgî: Gazinde, gileyî, dalehî.

Gilî şika: k.s. Çavbînan, Dîtîna çavan.
Çavên wî ji kortîyê rizgar bû. Behsa
Yaqûb pêxember dike.

Gilk: Qelem.

Gilk û xame: Pênûs, qelem.

Gill: k.s. Ax, xak.

Gulleendez: Segvan, nêçîrvan.

Gil û seng: Herî û kevir.

Gir: Girs û mezin.

Giram: Ezîz, hêja, Binirx.

Girdemîr: Koma mîran, an jî mîrên
mezin.

Girdewarî: Berhevkirî, civandî.

Girdiş: Gerandin.

Gird gerd: Bêhna xweş.

Girdîgar: f. Mezin, wesfa Xweda ye.

Tu sayeê lutfê Girdîgar î

Îro li me şah û xundekar î (E.X)

Gird û heba: Toz û 'ecac. Bablîsok;
toz û duman.

Girhêt: Girêkên.

Giriftar: Malûl, girtî û girêdayî.

Zîna ku dused perî perestar

Hora ku Memo ji bo giriftar (E.X)

Girih: Girêk, çingal.

Girihdar: Xwedîgirêk.

Ji ber şebrengîyê zulfê girihdar

Bi sewda bûye Şebdîzê Şêrînbar
(Ş.M.E)

Girîban: Gerden.

Dê bi ser canê me mirwet da me îx
Bişkuwên benda giribanê xelet (M.C)

Girîdan: Stû, gerden.

Girîftar: f. Girtî, dîl.

Girofî: Xirecir, qelebalix.

Giryan: Di halê girî da.

Ji ahê serdê nar ê qelbê giryan

Zeban sûzî kir û dil kirye bûryan
(Ş.M.E)

Girye: k.s. Girî.

Gişt: Porê top li ser serê keçan.

Enwera rengê firişte beşera horîsirişt
Ya ji miski Xetenê xal û xet û kakul û
gişt (M.C)

Giwah: Şahid û delîl.

Giyan: Rih, can.

Ku ji mu'ciza xummarîyan

Rûh bête dîsa ser giyan (M.C)

Giyanelaw: *k.s.* Ruhkêşan, dema ruhkêşanê.

Gizîr: Çare, îlac.

Gîr: 1.Şîyan, zehmet, ê afat bi ser da hatî. 2.Rehmet.

Gîramî: *f.* Ezîz, bi rêz.

Gîrîft: Linavhevetî

Gîro: Çavnêrîn û bendewarî.

Elw lew nediçû heta ve îro

Mabû li ji vanîya te gîro (E.X)

Gîrudar: *k.s.* Bigire.

Gîs-geysu: *f.* Kezî.

Gîso: Kezî, bisk.

Gîsû: Kezî, gulîyê por

Gîw: Li gor Şahnameyê serleşkerê Îranî yê kevin.

Giwê nagrim: *k.s.* Guh nadimê.

Gîyan: Can, rih, ezîz.

Go: *k.s.* Top, gog.

Goderz: Navê pêlewanekî navdar e. Guhderz.

Goft: *f.* Got.

Gohtin: Gotin.

Gom bû: Berze bû, winda bû.

Gor: Angor, angorî.

Gor: Tirb.

Goran: Gundi.

Gorişman: Hevdîtinan

Goş: Guh.

Bi goşê dil tu guhdarî bike qenc

Bizanî halê van xelqê xwedîgenc (Ş.M.E)

Goşe: Koşe.

Goşware: Guhar.

Goşî bi ‘amê mede: Guh nede xelkê.

Goşîdar: *f.* guhdar, guhdêr

Goşwar: Guhar.

Gotrum: Pintî.

Goy: Gog, top.

Goya: *k.s.* Axiver, peyvker.

Goya: Tu dibêjî qey. Wekî ku.

Goyan: *f.* Gotin, gazîkirin.

Dibazim her weki goyan

Dema ew tene meydanê (M.C)

Goyende: Di gotin, dipeyîvîn. Bêjer.

Goyîn: Teyrekî bişev diqîre.

Goyî: Pepûk. Navê balindeyekî ye.

Neyyahe û mihreban û dayîn

Goyende bi nale şîbhê Goyîn (E.X)

Gudaz: *f.* Helandok. Tewandî, xwar.

Dewixandin, sîngtewên.

Dil bi kî dim ez ji wan, her yek bi xencan dil dibin

Dilrubayin, canfizayin, dilber in, aşiq gudaz (M.C)

Gudazende: *f.* Ya/ê ku dihelîne an jî dişewitîne.

Gudaziş: *k.s.* Helandin.

Guft: Got.

Guftar: Gotin, peyv.

Zahir ji wera selîse guftar

Batin bi wera xebîse kirdar (E.X)

Guftar tutiy: *k.s.* Ew kesên wek tûtîya gotinan dubare dike.

Gufta da: Xeber da.

Guften: *f.* Gotin.

Guftim û ra: Min jê ra got.

Guftûgo: Gotûbêj, gotin.

Guh dêre: Guh bide.

Guher: Gewher, cewher.

Guherbar: Gewherrijîn, hêsir barandin.

Ew çende li ser buwîn guherbar
Ser lê vekirin ji nûve tekrar (E.X)

Guherçîn: Ya/ê gewher derdixe.

Guherê dane : Daneyên gewherê,
libên mirariyan.

Guherguhar: Yên ku guharên wan
gewher in. Guhargewheran.

Dest bestî ji pêşve pêşekaran

Durrînkemer û guherguharan (E.X)

Guherrêz: Ya/ê ku gewher belav
dike. Gewherrêz.

Guhersenc: Ya/ê ku gewher dikêşe,
diwezinîne.

Guhrî: Gorî, feda

Guhsar: *f.* Çîya û banî

Gulab: Gulav, ava gulê.

Cennet ji gulîstanê cemala te hebîbê
Gulxunçeyek e girtî ji bihna te gulab e
(M)

Gulac: Poxik, gulik, gulack.

Gula Dehhak: 1.Gula ku dikene, ya
ku nû vedibe. 2.Gulîyen weke herdu
marên li ser milên Dehhak.

Herdu ilanên te di min toqî gerden kir
mudam

Da me her bêtin tebessum wek gula
Dehhaki rûh (M.C)

Gulbav: Renggul, bavgul, gula bi
xunav.

Şivanê esherê gulbav

Hilo ey nêrgiza têrav

Xedenga 'eşweyê pirtav

Bike ez kîsewa 'enber (M.B)

Gulben: Şaxa gulê.

Zîn gulbenê baxê îsmetêbû

Zîn serwê rîyazê îffetêbû (E.X)

Gulberk: Guldank.

Gulbûn: Dara gulan.

Gulçehre: Gulrû, biskên weke gulan.

Gul endam: Endamgul.

Guley werwer: *k.s.* Cureyeke
demañeyê ye.

Gulfam: Rengegul. Rengê sor, ji
rengê gula sor.

Xulase, yek hîkayeya serencam

Tu menzûm çêke bo me rind û gulfam
(Ş.M.E)

Gulfişan: Gulbelavker.

Gulgeşt: Meqameke muzîkê ye.

Gulgûn: Rengê gulê, weke gula sor.
Gulreng.

Saqi ku da min ew sulaf

Feyza meya gulgûn û saf (M.C)

Gulgûn: Hespa Şîrînê û pê diçû jivanê
Ferhadê evîndarê xwe.

Gulgûn û al: Sor, rengê gulê.

Gullîzar: Hinarikên rû yên sor. Rûsor.
Dêmgul, rûsor.

Gullî re'na: *k.s.* Gula ku bêhna wê
xweş e. Mebest ciwan, bejinbilind.

Gulmix: Ew çengala cilikan datînin
ser, li ser rengê gulê tê duristkirin,
anku: stêrk, hîv û roj di çengala derê te
da hatine danîn, di xizmeta te da ne!

Gulnar: Gula hinarê, kulîlka hinarê.
Ava kulîlka hinarê.

Gulnîgar: Gulsifet

Gulpîrehen: Kirasê bi gul. Kesê ku
kirasê wî wek gulê ye.

Nazik û mewzûn letîf î nexlîya
selwaçîmen Gullîbas î gulqiyas î
gulenî gulpîrehen (M.B)

Gulqend: Ava şekirê qend.

Terkîb-i kirin ji bo xwe gulqend
Tezwîc-i ku bûn bi yekve dilbend
(E.X)

Gulrux: Gulrû, serûsîmayeke rind.

Lêvîa'I-û semen'îzar û gulrux
Rewneq şikenê bi tanê xullux (E.X)

Gulşen: Gulistan, baxçeyê gulan.

Di bax û gulşenê raz ê peder de
Tenê ew bulbulê pur 'îşq û derd e
(Ş.M.E)

Gulşen û raz: Gul û xar: Gul û strî. Bi
wateya dilber û reqîb tê bikaranîn.

Gulşenî raz: 1.Pirtûka Mehmûd
Şebusterî ya navdar e, pirtûka
helbestan e, bi farisî ye. Şebûsterî
helbestvanekî Ezerbaycanî ye. 2.Baxçe
û sir.

Gulxan: *k.s.* Agirxaneya hemamê.

Gulxen: *f.* Pixêrika hemamê. Cihê agir
ji bo serşûştinê tê helkirin.

Ji gulxendîdenê Şêrîn ê gulgûn
Qedem der rahê xizmet çû cîgerxwûn
(Ş.M.E)

Gulzar: Baxçeyê gulan, gulistan.

Her çendî Xelîl'î, ey belakeş!

Gulzar-i te di bîte ateş (E.X)

Gul-'zar: Gulançk, gulbisk, gevdek
por.

Gum: *f.* Wendabûn.

Deryayê mehebbet uştulum kir
Aram û şekîb û sebrê gum kir (E.X)

Gumbiwan: *k.s.* Wendabûn.

Gum kerde: Rahan bi berzeyî daye
rêkê.

Gum kir: Wenda kir.

Gumkird: *k.s.* Wendabû.

Gumrah: *f.* Jirêderketî. Avare.
Rêwinda.

Xanî bi nezaniya xwe der heq
Gumrah-i bibit, ne dûre, elheq (E.X)

Gunbed: Qubbe, kumbet.

Ateş dirêjit her mudam

Ev gunbedi dewwarî çerx (M.C)

Gunbedê dewwar: Qubeya ku dizivire. Asîman, Gerdûn.

Guncayîş: *k.s.* Aheng armonî, hevgirtî.

Gunbedê mîna: Asîman.

Gunehtelaşî: Peyketina gunehan û kirina wan.

Hindî ku serê te min teraşî

Ew çend-i te kir gunehtelaşî (E.X)

Gurc: Neteweya gurcî ku neteweyeke li Qafqasê niştecih in.

Gurd: Leheng, li gor gotina peyva “kurd” ji gurd hatiye.

Gurg: Di çîroka Hizanî da kesekî nîvsembolîk e. Wateya bira û hesûdiyê hatiye bikaranîn.

Gurg: Gur.

Gurgê gurisne: Gûrê birçî.

Gurîz: Rev.

Gurr: Navê çemekî ye ku Erez tev lê dibe.

Gurz: Çekek e.

Ra bestî sîlah û gurz û şimşîr

Bîlcumle digel me bêne nêçîr (E.X)

Gustax: *k.s.* Bêtirs, bêperva.

Gustaxane: Bêdebane.

Gustaxî: *k.s.* Bêşermî.

Guşad: Vekirî.

Guşad e goşe ew der întîzarê

Cewabek ta bibêje ew ji darê (Ş.M.E)

Guşade: Vekirî

Guwan: Gog, gogan.

Guweşt: Cureyekî meqameke muzîkê ye.

Guwê: *k.s.* Guh.

Guzaf: *f.* Tewş, vala. Gotinên tewş.

Qewlêd-i wî ser serî güzaf in

Fî'lêd-i wî cimleten xîlaf in (E.X)

Guzar: *f.* Bihurî, bihurîn, derbasbûn.

Her yek ba meyked dike ew geşt û guzar e Der koh û diyar e (M.M.L)

Guzer: Ger, derbasbûn.

Guzer ke: Bibûre, tê ra here.

Guzerker: Derbasker.

Guzîde-guzîn: *f.* Bijare, bijarte.

Nûbareye, tîfle, nûresîde

Her çendî nehin qewî guzîde (E.X)

Guzîde kir: Hilbijart.

Gûn: Reng.

Gûne: Cure.

Gûnegûne: Rengareng.

Gûr: Kovîker.

Gûrasin: *k.s.* Toza hesinê li ber destê hesinkar.

H

Ha: Wê

Hebeş: Habeşistanî, çav, xala rû.

Ha bê: Hindik ma bê.

Ha bî: Wiha bî.

Hacib: Birû, ebrû.

Hacîb: Payvan, dergevan.

Wî berzexê mimkînat û wacib

Wî padîşehê li şiklê hacib (E.X)

Haciz: Navbir. Bend û kelem.

Hacîz: *e.* Rêgir.

Hadir: Di cî da. Hazir, amade, hemen.

Hadis: *e.* 1.Nû peydabûyî, ne kevnar.
2.Nûçe. Peydak.

Tu me'dûm û hadis bizane ewî,

Heyûla tunîne ku 'alem ji wê (M.X.S)

Hadî: Kese ku mirov tîne rêya durust.
Rêzan.

Em fanîyû jar û miştexakîn

Hadî ne tu bî, xwe em helakin (E.X)

Hadî subul: *e.* Rênîşanîder.

Hafiz: Helbestvanekî klasîk ê Îranî ye.
Hafizê Şîrazî.

Hafî'z: Parêzvan, kesê ku tiştê
diparêze. Parêzkar.

Nebêj "Ez hafiz 'im, bê dest û pê me"
Cemala herkesi b'qelb û lisan e
(M.E.F)

Hail: *e.* Perde, dîwar.

Ha'il: Bend û kelem.

Haiz: *e.* Pêbûyî, jiheqderketî.

Haîl: Navbir.

Haîm: *f.* Hîm, xîm, binyat, esas.

Da mirşidê bê terîqê haîm

Sergeşte ne bit wekî behaîm (E.X)

Haîm: Wendabûyî, beredayî.

Hakîmane: Mîranî. Hêjayî mîran.

Hal: Dema niha.

Hala: Tişte ku têdikeve nava tişteki
din, mebest evîn e.

Hala: Niha.

Halan: Gerên li dor hîvê. Helqe.

Hale: Toqa li dor hîvê. Seywan.
Seywana dora hîvê.

J'bona yeqîna nûri zat

Sîwan û şewq û hale da (M.C)

Halet: Rewş, hal.

Haletê nezê: *e.* Dema ruhdayînê.

Halî: Dema niha.

Halî helwela: *k.s.* Halê berî mirinê;
sikrat, rihdan.

Hall: Tiştê ku cih digre.

Hal û qal: *e.* Şêwe, dirûv, cure.

Haman: *e.* Wezîrê Firewûn.

Hame: *e.* Kurê Şeytanî.

Hamêlanê êrş: Erş hilgir.

Hamil: Bardar.

Hamilî: Hatî hilgirtin.

Hamî: Parêzdar. Parêzer û bervedêr.

Wey hamîyê dad û dîn û dewlet !

Tu sayeê lutfê Girdîgar î (E.X)

Ha Mîm 'Eyn Sîn Qaf: Destpêka
sûretê Qur'anê ye 41. Sûreta Şûra.

Wateya rastîn ya van tîpan nayê zanîn

Hamûn: Beyaban, xerîbî.

Hamûnê fîraqê: Çola dûrketina ji
yarê.

Hamzade: *f.* Hemzayende, hevcandar.

Han: Hawar.

Hane: Hawar.

Hanî: Li ku.

Haris: Cotkar. Pasvan, çavdêr.

Wî garisî harisek diçînit

Ev harise bo me dê helînit (E.X)

Haris û leys û esed: Şêr.

Harr: Germ.

Harûn: Pêxemberek e, birayê Hz. Mûsa ye.

Harût û Marût: Ev navê du firîşteyan in ku di Qur'anê da derbas dibin. Di Zerduştî û nav meselên dînî yên Ermenan da jî derbas dibin. Dibêjin ev Harût û Marût berê du firîşte bûne. Ji ber ku jî rê derketine û bi sêhr da ketine Xwedê ceza daye wan û heta roja qiyametê dê girêdayî bimînin bi darekê ve.

Ne Harût û ne Marût ma

Ne Talût û ne Calût ma

Ne Azema, ne Nemrût ma

Di axê mane xusar e (F.T)

Hasid: e. Çavnebar.

Hasil: 1. Tişte ku bi dest dikeve. 2. Kurte gotin.

Hasil ji qîl û qalê, dil zêde pir melal bû

Dil zede pir melal bû, hasil ji qîl û qalî (H.F.H)

Hasil bibitin: Peyda bibe.

Hasil bi wî: Bi saya wî peyda dibin.

Hasil geriyaye: Bi dest ketiye.

Haşa: Dûr be.

Haşiya şerha lubabê: Navê pirtûkekê ye.

Haşiye: Not, îzah.

Hat: k.s. Bextewarî.

Hatem: Hatem Taî, yê ku bi camêrîya xwe ve navdar.

Hate mesek: Hate girtin, êdî sekini.

Hate saz: Çêbû.

Hate tehewwurê: Hêrs bû, keribî.

Hatif: Dengê xeybê. Xeber, qasid.

Hatim: Hatem Taî, yê ku bi camêrîya xwe ve navdar.

Hatîfî xeybî: Ew dengê ji xeybê tê.

Hatî ke: Ha ji te re.

Hatî yedek: Ka destê xwe bide.

Hat sewadê: Hate nivîsîn.

Hatuwan: k.s. Yên ku hatine.

Hat û bat: Geh berê xwe dide mirov geh piştê xwe. Tê û diçe.

Havîn: Seyf, tabistan, summer, navê demsalekê ye.

Hawiye: e. Cihêkî di nava dojehê da ye.

Haw û hû: k.s. Ha û ho. Hat û hewar.

Hayim: e. Ew kesê ku revîya be. Bi serê xwe çûbe. Sergerdan. Aware.

Hay û hûy: Heyhey, qîrîn, dengê zikirkirinê.

Haziq: Hunermend, şareza.

Berê ser şaxê vê işqa hebîb e

Eger zehr e vexwe haziq tebîb e (Ş.M.E)

Hazir: Amade, li ber dest.

Hazirûn: Kesen hazir.

Hazirxezeb: Zû diengirin.

Qasirnezerin di bê teemmil

Hazirxezebin di bê tehemmil (E.X)

Hazîhî cennatu 'ednîn: Ev bihuşta cîgira ye.

Hazîme: Hêza hezimkirinê.

Heba: e. Pir û pûç. Tune, vala

Hebab: Peqpeqonkên li ser rûyê avê.

Peqpeqok, kef û kunc. Biliqîna avê.

Şewqa te li nik ehlê dilan behrê 'emîq e Sed şukrê ku dil min di wê deryayê hebab e (M)

Hebandin: Jê hez kirin, perestin

Hebbe: e. Daneyek, hebek.

Hebbeza: e. Çi rind, çi xweş.

Hebeş: Gulî û biskên reş, birû yan jî xemlên reş.

Sef sef me dîn vêkra bi ceng

Hindek Hebeş hindek Fireng (E.X)

Hebîb: e. Yar, dost, hezkirî, dilber û ezîz.

Ey hebîba qelb û rûhê min qerara canê ma Çi dibit carek xuyabit ger tu bî mêvanê ma? (SP)

Hebîbellah: Hezkirîyê Xwedê.

Hebîbê muxtar: Dildarê bijarte, mebest pêxember e.

Hebl: Ben, werîs

Heblul metîn: e. Benê bi hêz.

Hebqe: Pûng.

Hebsê ten: Girtîgeha laş. Mebest ruh di laş da ye.

Hetta ku ne bû ji dev te îqrar

Ew mayî di hebsê ten giriftar (E.X)

Hecamet: e. huccam, xwîn ji can kişandin.

Hec'e: Xew.

Hecer: Kevir, xala weke Berê Reş. Kevirê Reş ku di dîwarê Mala Xwedê daye.

Hecerê Swed: Heceru'l-Eswed, Berê Reş, yê ku Ke'beyê da yanî xala reş.

Bewsa ku ji çeşmê te bidim bo min tewaf e Naçim Hecer-il Eswed ku ew dûr e mesafe (M.E.F)

Hecir: Sirgûnbûn, dûrçûyin.

Hecle: e. Cihê taybet ê şeva yekem ji bo bûk û zava. Bermal.

Hecm: Êrîş.

Hecm: Ker.

Heco: Civîndan, sihêf.

Hecr: Dûrîya ji yarê.

Hecrîtu: Cudabûna te.

Heçwekî: Mîna, weke.

Hed: e. Tola şerî'etê.

Hed: e. Rade, pile, derece

Hedar: Sebr û hedan.

Hedare: Neçarge, kemîn, tuzax.

Hebîb û nazîdara min

Tebîb û gul'îzara min

Çewa bête hedara min

Nebî hazir li meydanê (M.E.F)

Hedd: Tixûb, sînor.

Heddad: Hesinger.

Fa'ilek lazim e da fi'l û eseri peyda bit

Ger tu heddadi nebit, kûreyê heddadi
çi kit? (M.C)

Hedd û xayet: Dawî, sînor.

Hedef: Armanc.

Hedeyan: e. Gotinên nebaş.

Hedîd: 1.Hesin. 2. Cihe mezintir.

Hedîq: Bostan.

Hedîqe: Bax, baxçe.

Nûrestê hedîqeyê fuade

Masûme, efife, xanezade (E.X)

Hedîqeê sifet: Baxê akar û navên
Xwedê.

Hed niye: Hesab nîn e.

Heds-Hîds: Bi xwe za, zû întîqal, jî
nîşkeva, zû têngihîştîn

Hedes: Tiştê çêdibe; ya ku nû çêdibe.
Çêbûn, hebûn. Bûyer, rûdaw.

Hedîs: Peyv û gotin, gotinên
Pêxamber.

Ji 'ilmê bixwîne heçî wacîbat,
Hedîsan û tefsîr li hem fîqhiyat
(M.X.S)

Hedîsa Qutsî: Gotinên pîroz, ew
gotina ku Pêxamber li ser zimanê
Xwedê dibêje, me'na wî ji Xweda da
ye, bêjeyên wî ji Pêxamber da ye.

Heftar: Dirîndeyek e , keftar.

Dinê pîr e û me'lûl e

Ew e pêxwar û milxwûl e

Û piştqor e sîfexwûl e

Qewî tehl e reng heftar e. (F.T)

Hefteya hemel: Hefteya ku roj tê da
yanî di birca berxê da ye. Serê biharê.

Heft Ha Mîm: Heft sûretên bi tîpên
“Ha, Mîm” dest pê dikin.

Hek: k.s.Vemirandin.

Hekîm: Pir zana, şareza. Navekî
Xwedê ye.

Hekkak: Sîqalkirin, xurandin.Yê ku
vedikole, pak dike, safî dike. Nivîsên
li ser maden, yan keviran.

Manendê şemalê ew tiîsî

Hekkak-i bi navê Zîn nivîsî (E.X)

Hel: Ma, gelo, qey

Hela: Şîrîn.

Helal: Serbest, ne qedexe ne heram.
Tiştên ku destûra wan hene, tiştên ku
durist e were kirin û xwarin.

Helahil: e. Giyayekî ku jehr jê çê
dibe. Kuşttox.

Qehweya telxî digel zehra helahil
biderî Me ji destê te mûbarek,
şekeramîz e gulab (M.C)

Helate: e. Gelo hat.

Helal eqda muşkila: Vekirina girêka
arîşeyan.

Helawet: e. Şîrînayî. Şîrînî.

Hubba di dilan û ger helawet

Buxza di dilan û ger edawet (E.X)

Helaweta hebîban: Şîrînîya yaran.

Hel debirrê: k.s. Çavvekirin.

Heldequlê: k.s. Biliqîna avê.

Helek: Helak, xetere. Şevereş.
Têkçûn, mirin.

Hel eta hedîs: e. Gelo hedîs hatiye.

Helf û yemîn û qesem: Sond.

Helgîrsa: k.s. Vêket, gur bû.

Ke

Helhal: Navê guleke xenîqok e.

Helhele: k.s. Lîlandin.

Helîm: Nerm û bi aram.

Hell: Pişkafîn, çare.

Hellal: Pişkafîn, çaresaz.

Ey mirşid û pêşewayê miqbil!

Hellalê uqûd û hellê mişkil! (E.X)

Hellê: Derketin, derketina rojê.

Hellê le rût: k.s. Derkeve li rûyê te.

Hellê muşkil bû: Pirsgirêk çareser bû.

Hellê sîmab: Avzîva helandî.

Hel mîn mezîd: e. Gelo zêde heye?

Dengê “Ma hinekî din jî heye?”

Xweda ji dojahê ra dibêje, ‘ma tu tije nebûyî?’ Dojah jî dibêje, ‘ma hinekî din jî tune ye?’ (Sûreta Qaf: 50/30.)

Helle: Helal e.

Hel qelbuha nehîwî seba: Weke bîya li ser girekî liba bû.

Helqeyê fitrak: Xelekên wê kinifa bi zînê dewarê ve tê giredan da xwedîye nêçirê xwe tê deyne, anku; ew serê nekeve xeleka fitraka dilber e, çêtir e ew bê rimbarkirin û di bine axê da bê veşartin.

Helsandin mirdû: k.s. Derketin an rabûna mirîyên qebrê.

Helw: Şîrîn.

Helwela: Gotina; lahewle wela quwwete îlla bîllah.Yanî perîşanî û bêçareyî.

Helyawesîm: k.s. Bidarvekirin.

Hema: Her wiha, di cî da.

Hema: Huma; balindeyê bextê

Hemail: Benda çekan, bend û qarişên ku çek pê tîn hilgirtin.

Hemaîl: Cureyeke nivîştan

Hemaşîyan: Hevalê hêlînê.

Heraşîre û hem cenah û hemser!

Hembîze, hemaşîyan û hem per! (E.X)

Hemaxûş: Hevhembêz, hembêzkirî.

Hemayî: Bextîyar.

Hemayil: Benikên ku şûr pê li gerdenê dadiliqîn. Navbend.

Herdu destên xwe hemayil, şevêkê

Me ji bo yarê dixwestin çep û rast (M.C)

Hemayûn: Pîroz.

Hembeyze: Balindeyên li ser hêkê yan jî li ser hêkekî.

Hembîze: Hevalên zik, bira û xuşk.

Hemcefa: Hevalê zor û zehmetîyan.

Hemcenah: Hevbask.

Hemçunan: f. Hema wisa.

Hemd: e. Pesn, sena, spasî

Hemdem: f. Heval,refîq, hevalê meynoşînê.

Şêxê cam er nefesî hemdemî dil ket bi murad

Li muradê dilê murde dibîtin keşfê qûbûr (E.X)

Hemderd: Kesên ku derdên wan yek in.

Hemdûş: Heval, hevrê.

Hemd û şukr: Spasî û pesindan.

Heme: Hemî.

Hemedan: Paytexta Hewramanê ye.

Hemedanî: Mexlesa Baba Tahir e.

Hemefser: Hevalê Kulah.

Hemel: Berxik, berx. Navê bircekê ye. Birca Beran ji 12 bircên rojê.

Hindî ku di hefteya Hemel bûn

Ew zêde di wehşî-yû xebelbûn (E.X)

Hemele: e. Pirjimarîya hamîl e. Hilgir. Mebest firîşteyên erşên Xweda hilgirtine.

Hemewend: Eşîreteke kurd e, li başûrê Kurdistanê.

Hemgam: Alîkar, hevkar.

Hemgî: Hemî

Hemhal: Havalê hal û razan. Hevrewş.

Hemil: e. Bar, hilgirtin.

Hemiyet: Xîret û sergermî.

Hemî berîn: k.s. Em hemû pak in.

Hemîd: e. Pîr qenc bûn.

Hemî duşçin be xinkan: Em hemî di nava wê serabê da dixeniqin.

Hemîm: e. Kêmxwîn.

Heçî cennetî dê ji hewzê vexwin,

Hemî cehnemî her hemîmê vexwîn(M.X.S)

Hemî sehb: Hemî hevalên pêxember.

Hemîşe: Her tim, herdem.

Hemkase: Hevalê vexwarinê.

Hemkaseyê xwanê bê teaman !

Hemmeşrebê rahê telxekaman ! (E.X)

Hemkêş: k.s. Hevmezheb.

Heml: Helgirtin, rakirin.

Hemlehm: Hevgoşt, xwişk.

Hemlîqa: Hevalê li hev dîtînê.

Lewra ku tu şahî, ez gedabûm

Ez bo te ne kufw û hemlîqabûm (E.X)

Hemmaletel heteb: e. Dar hilgirtîye û dibe. (Sûreta Mesed, Ayet-4)

Hemmalî dikir: Hildigirt, radikir.

Hemmeşreb: Hevalên meynoşînê.

Hemnefes: Hevalê herî nêzîk, wek bi hevra nefesê bide û bistîne.

Ew bextereşê leqeb li wî Mem

Bê hemnefes û heval û hemdem (E.X)

Hemnişîn: Hevmalî, xwemalî, kesên di heman malê da. Hevalê rûniştinê. Heval.

Dem, şem'ê dikir ji bo xwe demsaz

Kî: Ey hemser û hemnişîn û hemraz (E.X)

Hemnûşîn: f. Heval.

Hemper: Balindeyên yek bask û per.

Hemperde: Hevraz; yên ku razên dile xwe ji hev ra dibêjin.

Hemqal: Hevalê peyvê, hemgotin.

Kesê gotinên wan yek in.

Hemqedem: Hevalê ling, di sewîyekî da.

Hemqeran kir: Nêzîkî hev kir.

Hem qerîn: *k.s.* Hevcot.

Hemrah: Hevalê rê, hevrê.

Zînhare! Hinek ji xakê dergah

Bîne ji mi ra digel xwe hemrah (E.X)

Hemraz: Hemsir, sirdaş.

Ney muxnî me hemraz in

Di remza ayîna camê (M.C)

Hemrehê Xudr: Hevalê Xizir (e.s).

Hemreng: Wek.

Hems: Deng.

Hemsaye: Cîran.

Hemseng: Beranber, hevta.

Go: Qence heqîqeta humaman

Hemsenge sdaqeta xulaman (E.X)

Hemser: Heval, hevrê. Hevserbalgeh, du serên li ser balgehekî.

Ne hemser bû ku derdê ser hebit min

Ne ewladê 'edû ne fitneê jin (Ş.M.E)

Hemsuhbet: Hemaxêv hemsohbet.

Hemsuhbetî: Hevaltî.

Hemşadî: Hevalê şahîyan.

Hemşahî û hemxem: Hevalê şahî û derdan.

Hemsihbet û hemdemê Memê bû

Hemşahîyû hemxemê Memê bû (E.X)

Hemşire: Xwişk, xûşk.

Hem tek: *k.s.* Hevta, hevyeke.

Hemxelwetî: Hevala/ê xelwetê.

Hemxwabe: Hevala/ê xewê, hevala/ê razanê.

Hemrazê dilêd-i dilbirînan!

Hemxwabeyê xatirê hezînan! (E.X)

Hemwar: Hemwelatî, yên ku ji eynî cihî ne.

Ahan ku verê biket sehergah

Hemware digel nesîmê hemrah (E.X)

Hemware: Her gav, tim. Li pey hev.

Hemyan: Tûrikê pereyan.

Hemzad: Hevalê xwarinê. Hevtemen, hevsal.

Hemziye: *e.* Pirtûka Şerafeddîn Busîrî ye. Helbestên derheqê pesindariya pêxember *e.*

Hena nîgar: *k.s.* Bi hineyê hatiye neqîşandin.

Henase: *k.s.* Nefes, hilm.

Henayî: *e.* Hine.

Henbel: Nifşek ji xemlê ye ku çend ayetên Qur'anê tê da nivîsî ne.

Henbelî: *e.* Navekî ji çar mezhebên ehlê sunetan yek.

Hendesî: Hesabî, Pîvanî.

Henen: *e.* Biaqil û jîr.

Heng: *k.s.* Mêşa hingiv.

Hengame: Bi qelebalix û deng û dor.

Henzel: Petîşok, zebeşê ebû cehl. Mêweyeke wek zebeşêye, lê piçûke û pir tale.

Nebatê henzel e baxê dil ê min

Qijal e ne hezar e bulbulê min (Ş.M.E)

Heqşunas: Mafnas, dadwer.

Heptê taet: e. Betalbûna taetê.

Heq: e. Xweda. Rast, durust, Xwedê.

Heqaîq: Rastîyan.

Heqîq: e. Layîq. Musteheq, xwevayî

Heqîqet: e. Rastî, rasteqîn.

Efrasîyabê mana, Eskenderê heqîqet

Darayê textê îrsad, serdefterê mewalî
(H.F.H)

Heqîqeta letîf: Rastîya nazik û zor e
ku were naskirin.

Heqîqeta muheqqeq: Rastîya
tesbîtîkirî

Heqîqet û mecaz: Rast û nerast.

Heqîqî: Rastîn.

Heqîr: Piçûk, bêbiha, erzan, bêqîmet,
bêîtîbar.

Heqqa: Birastî, heqq, ey Xweda.

Heqqî: Xwedê.

Heqşinas: Xwedanas, ew kesê
bawerîya wî bi Xwedê heye.

Heram: Qedexe, memnû. Tiştên ku
kirin û xwarina wan ne reva ye.

Heraret: Germî.

Herareta xerîzî: Tîna can a siruştî.
Germiya xwezayî ya laş. Germiya
siruştî. Ku di laş da ye ne ku ji derve
tê.

Kî: Ey mîslê herareta xerîzî!

Îro he di Misrê dil Ezîzî (E.X)

Herb: e. Şer, ceng.

Her be tîrê xistimî: Wê bi tîrekî min
xist.

Herb û hezimet: Revîn.

Herb û wexa: Şer.

Hercan: Piranîya herc e, bêbextî û
gotinên zêde ku xelq derheqê tiştêkî da
dibêjin.

Her çend: Ger çiqas.

Herdu canib: Herdu alî. Yar û
evîndar.

Herdu kewn: Dinya û axiret.

Herdu qeran: Herdu birû.

Herdu sera: Dinya û axiret.

Herem: Derdora Ke'beyê, hawirdor.
Pawan.

Heremsera: Di koşkên siltan û mîran
da cihê jinan, alîye jinan.

Go: Mîr bi mişawerê û rayê

Weqtê weku çû heremserayê (E.X)

Herf: Hurf, diwarî, hişkitî û tûjîtî.

Herfan negirin: Şaşbûnan der nexin,
rexne nekin.

Herfê: Karî.

Her ga: k.s. Her gav, her wext.

Hergah: Herdem.

Hergiz: Tu kes, herkes.

Herif: Hevrik, zêrevan.

Heristin: Kombûna wek weşiyê. Bi
hev ve hatin guvaştin.

Sorgul ji xweda li ser rehistî

Sinbil bi xwe pêkve da heristî (E.X)

Herişandin: Şeridandin, rût kirin.

Herîf: Hevdem. Hevkar, dost.

Herîfan: *f.* Pişeyan, meslekan.

Herîfane bide saqî binoşim

Seraser zahir û batin bi coş im (Ş.M.E)

Herîkey bê mana: *k.s.* Ey ew kesê pir
bi tevger û tevgerên wî bê wate. Ew
kesê ku bilez ditevgere lê bêfem û
nezan e.

Herîm: Mehrûm, bêpar.

Herîq: *e.* Sotin şewat.

Di deryaya gunehkarî xerîq im

Di narê hubba dunyayê herîq im
(Ş.M.E)

Herîr: *e.* Hewrîşim.

Herîs: Kesê ku zêde ji mal hez dike.

Her kesî tê kewt: *k.s.* Her kes dikete
nav.

Her le kara ye: Her wext tê bikaranîn.

Hermel: Sping.

Her nefes: Hertim.

Hero: Her roj.

Herr: Germ.

Her sê weled: Her sê zarok, maden,
giya û canîwer.

Her sût: Her alî.

Her yekî tesbîhekî: Pesindan, gotin
“subhenallah”.

Herze: Kelevajî, tewşo mewşo. Kesê
ku ‘eqî û zanîna wî sivik e.

Herzeger: Gerdeser, sergêj.

Herze gerd: *k.s.* Çûn û hatina bi
bêkarî.

Herzekar: Kotoxê gotinên tewş. Vala
axêv. Yê ku gotinên pûç û vala dibêje.

Herzgû: Gotina bêmifa, lexû.

Hesaiya can: Rihetîya can, aramîya
can.

Hesar: Keleh, sûr. Dîwar.

Tirên tîn ji hesaran

Sed car û sed hezar in (F.T)

Heseb: Nijad, kok û bingeh. Esl û rîşe.

Nesl û neseb û heseb eyan bû

Serdefter û serwerê kuran bû ((E.X)

Hesed: *e.* Bexîlî, hesûdî, dexesî.

Hesen: Kurê îmam Elî ye neviyê Hz.
Muhammed e.

Hesret: *e.* Bêrî, keser.

Hesretzede: Kese ku belaya hesrete bi
serî da hatîye, bê mirad.

Lebteşne û ber ji hev nexwarî

Hesretzede çûne pêşê Barî (E.X)

Hessas: Pîrr bi hest û hiss.

Hest: *f.* Heye, hebû.

Hestî: *f.* Hebûn, heyî.

Hesûd: *e.* Çavnebar, Hasid.Dexes.

Heşaş: *e.* Kêfxweşî be.

Heşem: *e.* Leşker. Meîyet. Koma
xulam û xizmetkaran.

Xwedanleşker in em bi ceyş û heşem

Hemî eskerê me sifûfê di xem (Ş.E.A)

Heşîş: Kela.

Heşrigeş: Cihê kombûna xelkê.
Qerebalix.

Heta çawî bika birr: *k.s.* Heta ku çavên wî/ê dibînim.

Heta hem: *k.s.* Heta ku ez hebim.

Heta pê da: Heta binê pêya.

Hetav: Tav, roj.

Gul im di destê xaran ismê Mihemmed nav im

Bilbil im di gulzaran ji 'eşqê lew zirav im
Di remza mihirdaran tu roj î ez hetav im (F.T)

Hetaw: *k.s.* Tav, roj.

Hettane: Heta, hetanî.

Hetteb: Suxtenî.

Hevdang: Bi rex ve, li kêlekê.

Hevdem: Hevzeman.

Hevdemam: Hevdema min.

Hevot: Qewartin, fêkirin, hînkirin.

Hostayê 'îşqê dil hevot

Ser ta qedem hingî disot (M.C)

Hewa: Xuricandin, daketin.

Hewa: *f.* Meyl, hezkirin, evîn. Hewes.

Me ji wê roja te dîtî cism û can tev çûn hewa

Tu dizanî ku esîr bûm mam di qeyda xederê (M.E.F)

Hewa bûn: Vala bûn, wek ba bûn.

Hewalî: Derdor, çarmedor, jîngeh.

Feqet her kes nizanî sûtê hal

Kesê ne l'mal nizanîtin hewalî (M.E.F)

Hewaxwahan: *k.s.* Alîgiran.

Hewayaya te: Vîna te.

Hewayê bilbil: Evîna bilbil.

Hewd: *e.* Hewzê bihuştê.

Hewes: Rexbet. Arezû.

Hewên: *k.s.* Havên.

Hewil: Xebat, hewldan.

Hewiyyat: Huwiye, rastî û eslê tiştêkî.

Belge, dîtal, delîl.

Em têk hewiyyat in yeqîn

Îsm in ji mesder muştêq in (M.C)

Hewl: Bizav, çalaki

Hewl: Cehd, hewl, kefarete.

Mi hewl nehin quwet nehin

Mi sewt û ezman bi teye

Mi zehr û ezman qet nehin

Destji te ye, çeng ji te ye (F.T)

Hewl: Sal.

Hewl: *e.* Tirs.

Hewr: *k.s.* Ewr.

Hewran: Ewran.

Hewsile: Sebir û tehemmul.

Hey: *e.* Navê Ellah, Xwedayê hertim sax. Heyî, sax, xweş.

Heya: Şerm û fedî.

Heyalî: Hîleyan, piranîya hîleyê.

Hey'at: Piranîya hey'etê ye.

Heyat efzat: *f.* Jiyanbexş.

Hey'atê felek: Cihê stêrkan û şeweyê gera wan di felekê de.

Heyatê sermed: Jiyana her û her.

Yek kesb-i biket heyatê sermed,

Ê dî diçite mematê mimted (E.X)

Heybet: Tirs, saw

Hey bin di beqayê: Di axretê da bi te bijîn. Li axretê da bextewar bin

Hey bikin: Sax bikin, jîn bikin.

Da em bi wê dil hey bikin

Pê sîne dax û key bikin (M.C)

Heyder: f. 1.Jîr 2.Bernavkê Hz. Elî.
3. Şêr

Heyderê Kerrar: Bernavkê Hz. Elî ye. Leqeba Hz. Elî; yê ku diçe û tê û herûher lêdixe, yê ku şûr dihejîne.

Rast û çep û gav û se'et her li me ew datînit

Zulfêqarê qidemê heyderê kerrari hudûs (M.C)

Heyderê Xazî: Hz. Elî.

Hey'et: Dirûv, hal, şekl, awa.

Heyf: Mixabin.

Heyihat: Pir dûr e nabe.

Heyin: Hene.

Heykel: Laş, peyker

Hey kir: Sax kir.

Heykirin: Saxkirin

Heyran: e. Sersem, Mebest ew kesê ji ber evînê dîn bûye. Cunî. Gêj û sergerdan.

Heyret: Matî, sergerdanî.

Heyretzede: Hêbetî, muteheyir.

Heyşet: Avayî, şenayî.

Naçar-i ji heyşetê diçû dûr

Hemderd-i dibû digel şetê kûr (E.X)

Heyûla: Maddeya bingehiya hebûnê.

Tu me'dûm û hadis bizane ewî,

Heyûla tunîne ku 'alem ji wê (M.X.S)

Heyûlî: Kesê ku ji heyûla bawer dike.

Heyûla; madeyek e ku berî hemû madeyan hebûye. Li gor feylesofan hemû made ji wê çêbûne.

Heywan: 1.Jîyan, heyat 2. Hiş, aqil.
Ez geham ava heyatê xef ji dil

Xudri vajî çûye heywanê xelet (M.C)

Heywaniyet: Hovîtî, nemerivayetî.

Heywanîyeta me bûye zail

Rûhanîyeta me bûye kamil (E.X)

Heywan sifet: Mîna ajelan.

Heyy: e. Jîndar, zindî, sax.

Heyyal: Hîlekar

Giha cem roviyê heyyal î sehhar

Bi kerb û qehrê lê xistin du-sê dar (Ş.M.E)

Heyyalan: Xapînok, hîlebaz.

Heyye: Mar.

Heyyî: Xweş.

Heyyî: e. Zindî. Navekî Xweda ye.

Heyyî la yemût: e. Dijî û nemir.
Mebest Xweda ye.

Hez: Par, beş.

Hez': Bext.

Hezar: Navê balindeyekî dengxweş e, tûtî, bilbil.

Goya hejîya hezar-i bîşe

Meybû, rijîya ji qelbê şîşe (E.X)

Hezarpîşe: Hebanekî derwêşan yan rêwîyan e ku gelek qulik û bêrik tê da hene. Xiştexişt gelekî pê dikeve.

Hezec: Têkilbûn.

Hezer: *e.* Dîqet, bal. Xwe parastin hişyarî. Tirs û hayjixwebûn.

Teemmul ke hezer ke Eskerî tu

Wekî rûbeh neçî da serserî tu (Ş.M.E)

Hezerdastan: Bilbilê ku bi hezaran awaz dertîne.

Hezerkar: Bitirs.

Cebbarê felek ji wî hezerkar

Meslûle ji sellê seyfê Cebbar (E.X)

Hezer xewf: Tirs.

Hezer kir: Em tirsîyan , me xwe jê dûr kir.

Hezîn: *e.* Bixem û keder, xemgîn.

Ne mislê Xusrewan im şahê Şêrîn

Hezîn im ez çû Ferhadê cîgerxwîn (Ş.M.E)

Hezîn: Hej, hejîn

Hezîz: *f.* Pergara hîvê ya herî nêz ji dinyayê ra.

Hezl: Henekî, ne ji dil, yarî.

Kurdî, Erebi, Derî û Tazî

Terkîb-i kirin bi hezl bazî (E.X)

Hezm: Hilandin û parçekirina xwarinê.

Hezm: *e.* Tundî, şidandin.

Hezret: Pêşedest.

Hezretî rîsalet: *e.* Pêxember.

Hêcet: Bahane.

Hêja negihîştî: Dewrê salê, hîn salek tamam nekirî.

Hêlûn: Hêlîn.

Hêsa: Rihet, hêsan.

Hêşet-heyşet: Avahî û malen di kelehê da.

Hêşta: *k.s.* Heta niha.

Hêzimkeş: *k.s.* Êzingêş, ew kesê ku darên hişk li pişta xwe dikin û dibin.

Hicab: Perde.

Hiccet: Delîl.

Ey hiccetê aşiqêd-i saib!

Wey mibtilê middeayê kazib (E.X)

Hicirîn: Devjêberdan, terk kirin

Hicleya erûsê: Koşka bûkê.

Hicr: Hicran, cudabûn, êşa cudabûnê. Xerîbî.

Hicran: Mişextbûyî, koçkirî. Xem û derdê dûrketinê. Dûrketin, xerîbî, êşa xerîbîyê.

Sohtî ji hicranê te bit

Dê mestê fincanê te bit (M.C)

Hicre: 1.Zindan. 2.Kunca Simaîl Pêxember ya li rex Ke'beyê.

Hicret: *e.* Cudabûn, dûrketin, koçberî.

Hicreta Yûsif dikêşim

Ye'qûbê Ken'an im ez (F.T)

Hidayet: Hatina li ser rêya rast û heq.

Hif'z: Parastin, jiberkirin.

Hedîsa Deccalî hemî hifzîkin,

Mudamî ji fitna wî te'wîzîkin (M.X.S)

Hifz dibin: Têne parastin.

Hikmet: Zanyarîya pirr û kûr.

Welê nîşanê ilm û hikmeta wî

Ji alem tête zanîn qudreta wî (Ş.M.E)

Hikmekî Kawîsî: Kevanbirû, birûyên
wek kevanan zirav.

Hikmetbin: Hikmetnas, zana, arif.

Hikmetê ustad: Qebilîyet û hunera
ustad.

Himmetbelend: Hikmetbilind, yê ku
hêz, zanîn û têgihiştina wî pir.

Hikmeil'eyn: Berhema Necmeddînê
Qezwînî: ya pir zehmet.

Hikmetil'eyn: Kitêba Necmeddînê
Qezwînî ya li ser mentiqê ku bi hêsanî
nayê fahmê.

Hikmetul'eyn: Raz û hikmet a di
çavan da.

Hilak: Têkçûyî, mirî.

Sih sal e, ji derd û ji belayê te hilak in
Hetta bi felek her diretin, ah û ehê min
(M.C)

Hilal: Hîva yekşevî.

Te nezer kir li semayê jê heybet kirbû
hîlal Hat îmanê bi tesdîqê xwes
Melikê Yemenî (M.E.F)

Hilak nabit: Nerize û fena nebe.

Hilguhast: Bir, bi jor ve bir.

Hilkelitin: Bikele heta bifûre.

Hilm: Dilovanî.

Tu hilmê bike bê hed li bê qiyas,
Wekî munkerek te nebîtin ji nas
(M.X.S)

Hilû: 1.Rêk, dûz. 2.Rast, rastgeh, edil

Hilûl: Têketina canê laşekî piştî
mirinê di laşekî din da.

Hilwe û Heddad: Navê du gundên
Qamişlo ne.

Himmet: Hêz û tewana derûnî û ruhî.

Bide saqî bike hîmmet ji bo me

Li dil xem cem'i bûne kom e kom e
(Ş.M.E)

Hinar: Peyv, xeber, danezan, mesaj.

Hinara: Bişanda

Hinarî ji bo min der axoşê pirr durr
Hinarek di taze hebîna dil ara (E.X)

Hinayan: Kîsê diravan.

Hinca: Hingê, wê deme.

Hind: Hindistan.

Hind: Hinekî.

Hinde: Evqas.

Hinde qeder: Vî qasî.

Hindewane: Zebeş.

Hindis: Şeva pir tarî, şeverêş.

Hindiwane: 1.Bi rêk û pêk. Qaîdeyên
çandinîyê. 2.Kelek, petîx.

Hindî: 1.Xala reş. 2.Çiqas. Evqas ku,
çiqas ku. Bi qasî, herçendî.

Hindû: Xizmetkar , kole.

Xizmetkarên reşik an jî Hîndû.

Zulfîkaf û helqedalan

Hindî yû Zengî û xalan

Her teref wan bir bi talan

Sebr û samanê di min (SP)

Hine ma: Gava ku.

Hingaftin: Destdan, lêxistin

Hingam: Bi qelebalix.

Du'ayan ku bê şek eser bo hene,

Ji defa belayêre hingame ne (M.X.S)

Hingur: Êvar, mexrib.

Perişan in li hingûre ji cumerza gûla
jûrî Micala d'Berçela bûrî zerî nayêne
seyranê (M.B)

Hinte: Genim.

Hir: Vir, vê dere.

Hiraset: Parastin.

Elbette xwe dê biket hîraset

Naket çu qebûliya necaset (E.X)

Hira wêra: Vir da wê da, filan kes û
bêvan kes.

Hirqet: e. Şewat.

Fîraqê têk hirqet e

Be'îd e ji xeyalê (F.T)

Hirre û sinnewr: Pisîk.

Hirs: e. Hezkirina malê dinê.

Hirzul eman: e. Duaya nezerê.

Hisarkirin: Dorlêgirtin.

Hisse: Pişk û par.

Hissedar: Beşdar, Xwedan pişk û par.

Hiss û hereket: Hest û bizav.

Hişar: Cihê asê.

Hişkiteb': Xûyhişk, tebîetnexweş.

Zahidê hişkiteb' i sewda ye

Bi du caman tebi'etê ter ke! (M.C)

Hizbu-l behr: e. Duayek e. Di pirtûka
navdar a Delaîlûl Xeyratê da heye.

Hî: Wî.

Hîcab: Parastin , Mûhafa,za,
perdevegîrtîn, xwegîrtîna jî
namehreman. Perde, star.

Meqsûd ku bibînin te bi çehven te
beşer pûş

Husna te bikin seyr û nebit cismê
hîcabê (M)

Hîcaz: e. Herêma pîroz. :Meke-
Medîne.

Hîcr, Hîcran: Dûrketina evîndar ji
yarê

Hîcret: e. Koçkirin.

Hîdayet: e. Rêya rast, fêmkirina
heqîqetê. Ketina rêya rast; dema ku
meriv li ser rêya rast be.

Hîkmet: Zanîn, felsefe.

Hîlal: Hîvik, birû tîn dirûbandin bi wê

Hîle: Xap û fen.

Hîlê rizq: e. Rizqê helal.

Hîma: Pawan.

Hîmam: f. Mirin.

Hîmar: e. Ker.

Hîn: Dem, wext, kat.

Hîna: Dema ku.

Hîndû: Xulamê reş.

Hîndûîzm: Dîn û felsefe Hîndê ye.

Hînen: Hingê, wê gavê.

Hîra: e. Şikefta ku ji Hz. Mihemed ra
peyam hatibû.

Hîraset: Xwe parastin.

Hîret: e. Heyret. Şaşbûn. Sersamî,
ecêbmayî. Heyirîn.

Hîrman: e. 1.Bêhêvî, bêçare. Ew kesê
ji agahyên rast mehrûm e. 2. Tunebûn,
tuneyî.

Hela derdê dikî derman e jê ra?

Hela eşkê dikî hirman e jê ra? (Ş.M.E)

Hîrql: Heraklîos.

Hîrql: Sotin. Şewat.

Hîrz: k.s. Parastin, parêzrawî.

Hîsab: e. Lêpîrsîn.

Hîss: Têgihîştin.

Ho: Sebeb, bûne, behane, wesîle.

Ho: Lo, hey, herf û tîpa gazîkîrîna nêra ye.

Hodrî Meydan: Bêje û îdyomeke Kurdî ye. Bi wateya ho derê meydanê an jî bi wateya bî xwe derê meydanê ye.

Hok: k.s. Acizbûn.

Hokil: k.s. Ew kesê ku aciz û ture bûye.

Hol: Gog.

Homayon: Dilgeş, dilxeş, pîroz.

Horî-Hûrî: Horîyên bihuştê.

Ahuya desta Tetarê, rehzena eska Xeten Horîya baxê bihiştê çavxazala kê yî tu (M.B)

Horî meqlûb: Vajîyê ji horîyê.

Horîsirişt: Xûyperî, weke dilberan.

Horîsurişt, horîxûy, horîmîsal.

Horîweş: Horîmîsal, horîmînak, weke horîyan.

Hub-Hubb: e. Evin, hezkirin.

Perwanemîsal in û ji huba te bi reqs in Ezman tezen û qelb û ceger çeng û rebab e (M)

Hubara: Çîrg.

Hubb û rîza: Evîn û razîbûn.

Hubla: Avis.

Hublaye leyalî, ey mewalî!

Kanê çi dizên elettewalî? (E.X)

Hubûb: Gerînek.

Huccac: Hecî.

Huccet: Behane û belge.

Hucre: Malik, cîgeh. Kun.

Hucûm: e. Êrîş.

Huda: f. Hidayetkîrox. Rastîker. Yanê Xweda.

Xeyala wî dema dem herXweda bû

Mirada wî ji dil raha huda bû (H.F.H)

Huda: e. Hidayet.

Hudhud: e. Dawûdokê du nikil, çûkê Silêman. Silêmanê du nikul.

Qet nema Hudhud xuyabit ji Belqîsa mesken-Seba

Pê muferreh bit Suleyman mutmeîn bit canê ma ((SP)

Hudûr: Amadebûn, hazîrbûn.

Hudûs: Çêbûyî, tiştê ku paşê çêbûye, peyda bûye. Rûdan, hebûn.

Hufre: e. Kort, çal. Kûr.

Hufreê nîran: e. Kortika agir.

Hukema: Arif, zana, feylesof.

Hukkam: Mîran, fermandar.

Hukkam-i bi batin û bi zahîr

Bê şîbhe mişabîhin bi agir (E.X)

Hukm: Ferman.

Hulahul: Ser e.

Hulle: *e.* Xişir, zînet. Cil libas.

Hullepoş: Kesê ku xişir bi xwe vekirîye

Hulqûm û helq û heczen : Gewrî.

Hulul: *e.* Ketina tişteki di tişteki din de.

Huma: Pîroz. Teyrê dewletê. Balindeyê humayun.

Sahib kereme, xwedan etaye

Zilla wî sîha perê Huma ye (E.X)

Humadeng: Weke balindeya bextê û dewletê.

Humam: Xwedî hîmmet û qencî, mêrxas.

Humayun: Padişah, fermanîdar.

Hemyan li dêm tuxra kirit

Emrê humayûn ser me tê (M.C)

Humre: Sor.

Xal û nuqet û beyaz û humre

Bejt û Hecer û tewaf û umre (E.X)

Hum rîcal: *e.* Ev mêr in. Perçeyek ji ayeteke Qur'anê ye.

Hunermend: Xwedan huner. Bi merîfet.

Weqtê ku Memê bihîstin ev pend

Ev renge he go ewê hunermend (E.X)

Huqqe: Qutî, dermandank. Şûşeya murekebê, hoqe.

Midadê huqqe yê yaqûti bê renc

Tijî kir milkê elmasan wekî genç (Ş.M.E)

Huqqebaz: Hilebaz. Sextekar.

Huqqeê yaqût: Qûtîya yaqût, yanî devê yaqût.

Hurman: Mehrûm, bêpar.

Lew şubê daîre sergerdan im

Badenoşê qedehê hurman im (M.C)

Hurqet: Şewat.

Hurrem: Xweşik

Huseyn: Kurê Îmam Elî ye nevîyê Hz.

Muhamed *e.* Di sala 680 da li çola

Kerbelayê da hate kuştin.

Husn: Rindîtî, bedewî, xweşikayî, rindayî.

Wesfên di cemala te nişim qet xwe eda kim

Lew meseleyek husnê te wahid du kîtab e (M)

Husna ehse nitteqwîm: Xweşikîya bêhempa.

Husna munezzeh: Bedewîya pak. Xweşikîya bêqisûr.

Husna muqeddes: Bedewîya pîroz, xweşikbûna pak.

Husnê bedî: *e.* Bedewîya bêhempa.

Husnê eda: Awayê xweş yê gotinê; wêje, edebîyat.

Husnê edayê te: Rindbûna şewaza te.

Husnê eltaf: Gugdaneke qenc û nazikî.

Husnê e'mal: Kiryarên qenc.

Husnê la yezal: Bedewîya berdewam û dê bimîne. Bedewîya Xwedayî.

Husnê zayî': Ciwanîya ku dê wenda bibe.

Husn û cemal: Spehîtiya dêm û bejn û bal e.

Husnê e'mal: Karên qenc.

Husnê meqte': Dawîya baş.

Husnê sermed: Ciwanîya herheyî, ciwanîya Xwedê.

Husn û hub: Spehîbûn û evîn.

Husn û mehebbet: Rindîtî û hezkirin.

Husn û sur: Spehîti û cazîbe, bedewî û şîranî. Xweşikî û cazîbe.

Ne tinê rûh î tu rûh û can î

Zîneta husn û sura xuban î (M.C)

Hûşyar: k.s. Hişyar.

Huwe: Ew.

Huwel-Heq: Ew heq e. Ew Xwedayê rast e.

Huwellaû ehed: e. Xweda tekane ye. Mebest sûreta Îxlasê ye.

Huweyda: f. Vekirî, beyan, kifşe. Eşkere, dîyar.

Derîne tilismê mekr ê huweyda
Qijalê pê bike mecnûn û şeyda (Ş.M.E)

Huxema: Aşiq, evîndar, helbestvan.

Huzûrî ger hemî xahî meşû hafiz ez û xayib: f. Eger tu dixwazî her dem li cem yarê bî, divê tu qet'îyyen xwe ji wê veneşêrî, wenda nekî.

Hû: Wî.

Hûlehûl: k.s. Hû hûya derwêşan.

Hulûl: Di tesewifê da yanî bicibûna Xwedê di mirov da.

Tenasux ji bo ruh hulûla Xweda
Tu nînin, eya mu'minê canfida (M.X.S)

Hûma: Balindeyê dewletê ku balindeyekî xurafî ye.

Hûn: e. Sivikî û serşorî, zelîlî.

Hûrê zat: Horî bi xwe.

Hûrîbihişt: Bihuştora horîyan.

Hûrî'în: Ew a çavên wê reş û mezin wekî horîyan.

Hûrî kirin: Hîn kirin.

Hûş: Hiş.

Me xîret kir hinek xwûn hate coşê
Dilê medhûş ê cuzî hate hûşê (Ş.M.E)

Hût: Birca Masîyê ji 12 bircên rojê.

Hû û hey hey: Deng û dor, qelebalix.

Hûwe: Ew.

Hûwwîyet: Kesayetî, Ewetî.

Hûweyda: Eşkera.

I

'Ibarat: Hevok û şeweyê bihevexistina wan.

'Ibaret: Peyv, gotin.

'Ibtî: Binçeng.

'Icac: Ba û bahoz.

'Icz û hîre: Bêçareyî û matmayîn.

'Iffet: Pakî.

'Ille: Derd û nexweşî.

'Illet: 1.Sedem, sebeb. 2. Nexweşî

'Illeta fena: Sebeb û hoyê mirinê.

'İlmê ledun: Zanîna ku ne bi hînbûnê tê hînkirin. İlmê ku Xwedê dide, ilmê wehbî, dayîna Xweda.

'İlmê teqlîd: Zanistîya bêbingeh yanî peyçûna zanistên berê.

'Inad: Serhişkî, rikoyî.

'Inan: f. 1.Fezîlet 2.Pêşber, dizgîn.

'Inayet: Çavderî û guhdan.

'Inberefşan: Enbarweşan.

'Ind: Bal.

'Inde cuheyne-l xeber: e. Xebera rast li aliyê Cuheyneyê ye. Mebest ji Cuheyneyê yar e.

'Ineb: Tirî.

'Inwan: Nîşan, sernivîs.

'Inwanê edeb: Bi hermetkarî.

'Iqab: 1.Eylo, qertel. 2.Ceza û tawan

'Iqd: e. Gerdanlix, gerdenî. Girêdan. Gerdembend, kolye.

Teyrik û "iqd û şurab û netrik û berg û wereq

Her bi lerz û cezbeyên yaqûtî ta yê rast û çep (M.C)

'Iqda Sureyya: Gerdenîya Sureyayê. Komikeke ku ji heft stêrkan pêk tê û weke gerdenîyê xuya dike. Ulker, Perwîn.

'Iqdê Perwînê: Komikeke ku ji heft stêrkan pêk tê, 'iqta Sureya: Gerdenîya Sureyayê, Ulker.

'Irfanteleb: Zanînxwaz.

'İrq: Ava an jî xwedan ji laş derdikeve.

'İsyân: e. Serpêçî, guneh, serîrakirin. Jirêderketin.

'İsmet: Dawpakî, bêgunehî.

'İşret: Dostinî, hevalxweşî.

'İşretabad: Di kêfxweşîyê da mayî, geş û şên.

'İşweê le'lan: İşareta ku ji nav lêvan dertê, gotinên bi naz.

'İşweper: Dilberên bi naz.

'İşweperî: Weke perîyan bi naz û işwe.

'İşwê: Peyv. Naz. İşaret.

'İşwekar: Nazdar

'İtab: Gazîn û lome.

'İtr: Bêhn.

'İyan: Xuya, diyar.

'İyaz: Dûrî ji wara!

'İzam: Pirhejmarîya 'ezîm e. Qedirblindan.

'İzam: Hestî.

'İzar: Hinarkên rû. Rûdem.

'İzzet: Bilindî û mezinayî.

'İzz û naz: Serbilindî û qedr.

'İzz û temkin: Serbilindî û xurtî.

Ibda' kirin: Afirandin.

Ibhitû minha cemî'en: Dakevin ji vir hemî. Mebest Sureta Qur'anê 2.38 e.

Iblîs: Şeytan, ehrîmen.

Iblîs'ê feqîrê bê cinayet,

Hindî te hebû digel înayet (E.X)

Ibni: Kur

Ibrîq: Avrêj, misîn.

Icabet: Bersiv.

I'caz: Tişta ku mirov nikare bikin, mu'cîze.

I'cazê beyanê: Şaşkirin, matkirina bi gotinên edebî, Radeya rewanbêjîya herî bilind.

Icib: e. Xwe razîbûn.

Idrak: Têgihiştin.

Idrîs: Pêxemberek e, di Qur'anê da behsa wî tê kirin. Dibêjin ew yekem kese ku bi pênuşê nivîsiye û terzîyê yekem e. Xwedê ew hilkişandîye asîmanan.

Ife'lu haza: e. Vî bikin.

Ifteh: Vekel.

Iftiraq: e. Ji hev dûr ketin.

Ihbît: e. Raweste, bisekine.

Ihsan bike: Qencyê bike.

Ihtiram: Rêzgirtin.

Ihtiraq: Şewitîn.

Ihtiraz: Xweparastin

Ihya dibid: Sax bibe.

Ihya kirit: Sax kirî, vejîrandî.

Iklîl: Kilîl, tac.

Iklîm: Herêm, cih.

Iksir: Jehrî.

Iksîr: Li gor bawerîyên kevnar, madeya ku madenan dike zêr, madeya dijar ku tiştan safî dike.

Iktitam: e. Înkarkirin.

Ilan: t. Mar.

I'lam: Haykirin û xebardan.

Ilhaq: Pêvekirina tişteki bi tişteki ve.

Ilîa: Feqet, bes, ji bilî.

Iluwa: e. Bilindahî.

Imkaniyyet: Hebûna me ya mîna afrîdeyên ku Xwedê dikare wan neafrîne jî.

Imşeb-êşem: f. Îşev.

Imtihan: Azmûn, ceribandîn.

Imza bikirin: Bipejirîn.

Ina': Firaq, aman.

Inayet: Alîkar.

Infisal: Cudabûn.

In'ikas: Xuyakirina di neynikê da.

Inqilab: Zivirîn û ger.

Inqiyad: Çûna li pey kesekî.

Ins: Merivatî, hemî meriv.

Ne belî bit ji te yek reng û ne nasê ji tu resmî

Ins û wehşet ji te ra waris û hemzar û welî bit (Ş.N.B)

Ins û cann: Meriv û cin.

Inşa: Avakirin, şeweyê derbirînê di nivîsandinê de.

Intizar: Bendewar.

Inzal: Rijandin.

Iqlîdes: Euklides, Euklid von Alexandria, Bîrkarzanekî yewnan yê dema berê. Li dor 300 salan berî zayînê jîyaye.

Iqlîmê rabi': Iqlîmê çaremîn.

Gerçi der iqlîmê rabi' hate textê
seltenet Padîşahê hefti iqlîman
selamkarê te bî (M.C)

Iqlîmê suxen: Warê gotinê, ji hêla
edebî ve.

Iqrar biket: Bawerî bîne.

I'rab: Herekekirina herfan;
biserûberkirin. Teşeya xweşik û
êşkere. Sererastkirin, biserûberkirin,
çareserkirin.

I'raz: Dûrketin, veçînîn.

Irci'î: Vegere. Mebest ayeteke
Qur'anê ye.

Irfan: Hişmendî. Zanîn, şarezayî,
merifet.

Iskof: Çerm yan paçê ku datînin li ser
çavên bazê ku wî ji bo nêçîrê amade
dikin.

Istita'et: Şîyan û karîn.

Istizan: e. Destûr xwestin.

Ismê e'zem: Navê Xwedê yê herî
mezin, ev nav kîjan e nayê zanîn.

Ispêde: Ronî.

Isrebreq: Nîşkek ji hevrişim e.

Istilam: Xwegihandina hacêrê esved.

Istixna: Xwetêrdîtin, nemuhtacbûn.

Istîwa: Nîvê asîman; cîhê ku nîvrojê
roj lê xuya dike.

Şems dinêv burca şeref da

Sed kewakîb çar teref da

Muşterî hatî bi ref da

Istîwa çû quble ye (M.C)

Isxa: Guhdarî.

Işqbazî: Evînbazî, evîndarî.

Işq û mehebbet: Evîn.

Iştîyaq: e. Evîn, hezkirin, bengî,
bêrîkirin.

Pertewa şem'a cemalî,min disojit dem
bi dem

Iştîyaqa zulf û xalan têkkirin deryayê
xem (M.B)

I'tibar: Hesibandin, hejmartin.

I'tidal: Nokteya ku roj di 21ê Adarê
da digihîje.

I'tikaf: Dûrketina ji xelqê ji bo
perestîya Xwedê. Cîhê girtî.

Itlaq: Berdan û rizgarkirin.

Itra resûl: e. Nesebê Hz. Mihemed.

Ittifaqî: Tesedufî, lihevraştatin.

Ittihad: Yekbûn.

Ittirab: Kelecane, perîşan.

Ittisal: Gihîştin.

Ixfa: Veşartin.

Ixtilaf: Têkilî û tev li hevî.

Ixtiyar: Vîna bi dest mirov.

Ixtiyarî: e. Erê û na.

Iz'an bike: Bizanibe.

Iz'ankî: e. Bihizirî.

Izar: 'Eba; cilên pêşî vekirî ku bi ser
milên xwe da berdidin.

Izhar: Êşkerekirin, dîyarkirin.

Izhar meke: Veneke.

Izz û rif'et: Serbilindî.

Î

‘Îbadet: Perestin.

‘Îbaret: Gotin, awayê gotinê.

‘Îd: Cejn.

‘Îdana: Dujminên me.

‘Înan: 1.Fezîlet, 2.Dizgîna hespê,
3.Ber pê ve.

‘Înanê himmete: Hêza rêvebirinê,
serkeftin.

‘Înayet: Alîkarî

‘Îqab: Cezakirin, cezayê xirabîyê.

‘Îrabe: Î’rab, ango şîrovekirina peyvê
ji hela rêzimanê ve.

‘Îsab: Serpêç. Pêçek, kofi.

‘Îse: Hz. Îsa.

‘Îş: Jîn, zewq, îş û noş. Xweşborandin.
Jîyana xweş.

‘Îşweger: Nazker, kesê ku bi naz.

‘Îtab: e. Lome, serzeniş.

‘Îzar: Devê alavên weke şûr, kêr û
hwd.

Î’ane: e. Alîkarîkirin.

Î’anet û nusret: Arî ne.

Îbaret: Beyan. Peyv, peyvekî.
Dariştin, xuyakirin.

Îbda’: Çêkîrîn û peydakîrîna jî ber
xwe da,bê nîmûne. Aferandina bi
awayekî xweş.

Heryek ji edem kirin te peyda!

Îbda’i kirin te bê heyula (E.X)

Îbde bîma yeûl: e. Dest bi kuştina
wan kesên ku girêdayî min in bike.

Îbham: Tila beranî, tila sereke û stûr
ya destan.

Îbilîs: e. Ehrîmen, şeytan.

Îbl û beîr îs û cemel naqe cemaz:
Hêştir, deve.

Îbn: Kur, pis.

Îbn ‘Ewf: Ebdurehmanê kurê ‘Ewf.
Yek ji sehabîyên girîng ên pêxember
e.

Îbnussebil: Rêwî.

Îbra: e. Saxkirin.

Îbtihac: Kêfxweşî.

Îbtîda: e. Destpêk, sereta.

Îbtîla: e. Hatina belayê bi ser kesekî
de.

Îcab: Bersîv.

Îcabe: e. Qebûlbûna duayan. Bersiv.

Îcabet: Qebûlîkirina vexwendinê.

Îcad: Afirandin.

Î’caz: e. Mûcîze, gotina ji xeybê.
Bêtaqetxistin, gotina pir delal ku
merivan jê şaş dihêle.

Îcazet: Destûr, musade.

Î’cazê beyan: Gotina bêmînak, gotina
ku xelkê diheyirîne.

Îc’el: Bigêr, Mebest emr e, gerandina
emr e.

Îcmal: Kurtîkirina tiştekî, kurtebêjî.

Îctînab: e. Xwedûrirtin.

Îçtinab: Xweparastin.

Îdafat: Nisbet.

Îdbar: Bextreşî, bê talihî.

Îdman: Dewamkirin.

Îdrak: *e.* Têgîhîştîn, fahmkîrîn

Îdrib: Biquit, Mebest kutana emr eç

Îfade: Bêjî, gotin.

Îfrat: *e.* Rapiî, pê da çûn. Ji heddaborîn, pirr pêşvaçûyîn.

Îfrat û tefrît: Pirr zede û pirr kêmkirin.

Îfşa: *e.* Derxistin, dîyar.

Îfşa deka: *k.s.* Îfşa kirin, dîyar kirin, eşkere kirin.

Îfşa kirin: *e.* Eşkere kirin

Îfşanî: Dîyarî, eşkereyî.

Îfşayî ‘alem: Di nav cîhanê da belav bûyî.

Îfşaneyê xûd: Dîyarkirina raza xwe.

Îftade: *f.* Ketin, pîrbûyîn, bêhalbûna ji destê pîrtiyê.

Îftîraq: Dûrketina ji yarê.

Îhate: Dorpêç.

Îhdîna, ya Reb, sîratel musteqîm: Xwedêyo, rêya rast nîşanî me bide.

Îhmal: *e.* Paşguhkirin.

Îhrami best: Îhram girêda.

Îhsan: *e.* Xêr, karên baş û qenc. Xweşiktî, rindayî, qencî.

Îhsanek ‘ezîm: Qencîyeke mezin.

Îhsan ke: Qenciyê bike, rind fam bike.

Îhtimam: Pirr pêdaketin.

Îhtiras: Pir bi arzûbûyîn.

Îhtiraz: Xweparastin û xwedanpaş.

Îhtîraq: *e.* 1.Sotin, şewat. 2.Helakbûn.

Îhtîraz. *e.* Xweparastin.

Îhtîşam: *e.* Heşmet, mezinahî, gewretî.

Îhtîzaz: *e.* Lertzîn.

Îkaf û berzî'et: Kurtan.

Îke: *k.s.* Êdî.

Îkincî Kerbela: *t.* Kerbelaya duyem.

Îklîmî ‘îşiq: *e.* Warê evînê

Îkrah: Zorkirin.

Îksîr: Madeyeke kîmyewî ye, bi wê zêr, ji madenên din tê cihê kirin.

'Îşqa te, me go: Zêrê sîfet zer dikirin, go: Îksîr e evina me bi 'eynî û mes î tu(M.C)

Îksîrî e'zem: Madeyeke efsanewî ye. Paxir dixê zêr ciwayê dixê zîv.

Îktîfa: *e.* Kîfayet, bes.

Î'la: Bilindkirin.

Îlah: *e.* Xweda.

Îlahî: Xwedayî.

Îlahî pur gunehkar û feqîr im

Di qeyda zulfê dîlber de esîr im (Ş.M.E)

Îlahiyat: *e.* Mijarên girêdayê Xwedê.

Î'Iam: Eşkerekirin.

Îlan: Ji “yılan”a tirkî, mar.

Î'lan: *e.* Ragihandin.

Î'lanî: Dîyarkirin, eşkerekirin.

Îlanmîsal: Kezîyên weke maran.

Îlelebed: *e.* Heta hetanî.

Îlel xerbi: Heta rojava.

Îlem: Bizan.

Î'îdal: Hatina cihê adetî, rastbûn.

Îlle, îllet: 1.Sedem. 2.Nexweşî.

Îllet: Çirratî, çîmatî,sebeb.nexweşî, nesaxî, êş

Îlham: Xweza, avêtîna dil û hiş.

Îlhaq: Pêvadayîn.

Îllyet: Sebebîyet, rewşa sebeb û musebbeban.

Îltîca: e. Pena. Ji ber zilm û tadeyan koça ji welêt.

Îlyas û Xizir: Du kesên dibêjin herûher sax in, çunkî wan ji ava jîyanê vexwariye.

Îma: Hîma, dirke.

Îma: e. Îşaret, şop.

Îmam: Bawerî.

Îman: Bawerî.

Îmaret: 1.Avahî. 2.Text.

Îmareya nîgarê: Textê Sitîyê.

Manendê îmareya Sitî tê

Her şibhetê mehmela perî tê (E.X)

Îmdad: e. Hawar, alîkarî xwestin.

Îmkan: Hebûna ne zerûrî.

Îmla: Rastnivîs, rastî, qaîde.

Îmlaqî: Xizanî.

Îmroz-êmroz: f. Îro.

Îmsak: e. Dema devjêberdana xwarinê ji bo rojiyê. Xwegirtin, nexwarin. Xwedûrkirina ji tiştan.

Îmtîla: Tijebûn.

Îmtiyaz: Veqetandin.

Îmtîsal-ul emrî: Ber fermanê.

În: f. Ev, vî.

Îname dere: Ez derxistim 'În: Yên ku çavên wan reş û mezin in.

Înan: f. Van.

Înan: Anîn

Înas: Meta Yûsif pêxember.

Înaye nizam û intizamê: Li pey hev bi rêk û pêk rêz kiriye û ristiye.

Înayet: 1.Baldayin. 2.Alîkarî.

Ewwel ku yarê da me yek zerreyek 'înayet Qismet me xemr û cam e di deftera hidayet (M.C)

Îneb: Tirî.

Înfisal: Jêbûyîn, jêqutbûn.

Înhelle: Heliya.

Înhezemû cümle: Revîn.

Înhîraf: Ji rê derbûn , rê şaşbûyîn.

În'îkas: Tîrêjdan.

Înkîşaf: Keşîfbûn, dîyarbûn.

Înne: Bê şik.

Înnehû:Bêguman ew.

Înnenî le raz: e. Bêguman ez razî me.

Înqîbaz: e. Diltengî.

Înqîraz: e. Belavbûn, perçebûn, nemayîn.

Înqîyad: Rambûyîn, serîdanîn.

Înqyad: e. Pabendî, mildanîn.

Îns: e. Însan, meriv.

Însan: Meriv, adem.

Însanîyet: Merivayîtî.

Însîcam: Lihevbûn.

Înşa: 1.Îcad, peyda. 2.Nivîsa spehî, nivîsa rind. Xweşikçêkirin. 3. Damezrandin, avakirin.

Înşad: *f.* Beyta bi menzûm kêş.

Întilaq: Rehabûn, çûyîn.

Întîxab: Hilbijartin, neqandin.

Întîzar: 1.Bendewarî, raçavî, rêpanî.
2.Nifir

Înzal: Daxistin, rêhtin.

Îqametgah: Cihê rûniştinê navnîşan.

Îqbal: *e.* 1.Dahatû, pêşende. 2. Siûd, bext.

Îqre: *e.* Bixwîne.

Îqtîza: Xwestin, îcab.

Î'rab: Jihevderxistin, dîyarkirin.
Lihevanîn, şikilçêkirin.

Î'rab û cezm û nuqte da:
Zêrûziberkirina nivîsê bi nuqte û hereketan ku êdî rast bê xwendin, dîyarkirin, zelalkirin.

Îrabi da: Bi serûber kir, sererast kir.

Î'rab û dal: Xet û nîşanên li rû.

Î'rac: Pişt dan, xwe dûr kirin.

Îradet: Vîn.

Heyate digel 'ilm û sem' û beser,
Iradet di gel qudreta xeyr û şer
(M.X.S)

Î'raz: *e.* Piştaxwedana tişteki, piştê kirin. Zivirîna ber.

Îrci': Veger

Îrem: 1.Navê bihiştê derewîn *e.* Navê baxekî ye li Cizîra Botan. 2.Bajarê

Yemenê yê ku bi avahî û baxçeyên xwe ve navdar.

Îremê Bohtan: Baxçeyên Botan, yên weke baxçeyê Îrema Yemenê.

Gulê baxê îremê Buhtan im

Şebçiraxê şebê Kurdistan im (M.C)

Îrfan: Zanîn.

Îrfanteleb: Kesê ku daxwaza naskirinê dike.

îrfe': Hilîn.

Îrohe: Îro.

Îrşad: Nîşandina rêya rast, rêberî.

Îrtîcal: Kelejenî ji ber xwe gotin.

Îrtîhal: Barkirin.

Îrtîkab: *e.* Tûşbûn, pêrgîbûn, tûşî belayan bûn.

Îrtîqa: *e.* 1.Şan û şeref. 2.Bilindayî.

Îrtiyab: *f.* Guman.

Îs'a: *e.* Çirîst, çirisî. Gerîya, gerandî, çirisandin.

Îsab: Pêşenîk. îsabet.

Îs'ad: Seadet, bextewarî, dîlşadî.

Îsand: Biriqand, ronî da.

Avête durdana xwe dur

Isand ji misbaha xwe sur (M.C)

Îsaye: Ronî daye.

Îsewî: Xiristîyan, mesîhî.

Îsheq: Bihêr, Mebest emr *e.* hêrandina emr.

Îsîwa: *e.* Cîgirtin, rûniştin

Îslîtaet: Hêz.

Îsm: Nav.

Îsmû-alet: Navê alavan.
Îsmû-cins: Hevenav.
Îsmû fa'il: Kirdenav. Lêkernav.
Îsmû mef'ûl: Biresernav.
Îsmû-mekan: Hokera cihê.
Îsmû-zeman: Hokera demî.
Îsra: Rêwîtîkirina bi şev.
Îstebreq: Cureyekî qumaş e, ji herîr û zîr hatiye çêkirin. Di Qur'anê da ji bo cil û bergên bihuştîyan hatiye vegotin.
Îstifham: Pirsnişan.
Îstismar: Kedmijî.
Îstixraq: Xerqbûn, têda wendabûyîn.
Îstîhza: e. Hinekê xwe pê kirin.
Îstî'fa: e. Daxwaza destjêberdanê.
Îstîwa: Xeta îstîwayê li asîman. Nîvê asîman.
Îstîxna: e. Muhtacî kesî nebûn. Maldar, bênîyazî.
Îstîzan: f. Daxwaza destûrê.
Îşan: Wan
Îşqebazî: Evîn.
Îşraq: Ronîkirin, saxkirin û ronîkirina dilan.
Îşraqî: Agirperestî.
Îşret: Heng.
Îşretabad: Kesê bi şahîyê jîn dibe.
Îşteş: k.s. Niha jî.
Îşti'al: e. Agirpêketin.
Îştîqaq: Jê şeqbûn, jê perçebûn.
Îştîyaq: Arezûkirin. Pirr şewq û arezû.
Îşwe: Nazî

Îşweyek da me seher wê perîya horî sirişt Şefeqê berq û cemalê dil û can suht û perişt (E.X)
Î'ta - î'tane: Dayîn.
Îtab: Gazin.
Îtham: Tawanbarî, sûcdar kirin.
Î'tibarkirin: Ferzkirin, wilokî hesibandin.
Î'tîbar: e. Qedr û qîmet.
Î'tîbarî: Angoreyî, îzafî.
Î'tîdal: e. 1.Bêqisûr 2.Wekhevî, beramber 3.Navîn, nav.
Î'tîkaf: e. Ji bo îbadetê di mizgeftê da man. Perestîya di mizgeftê da.
Î'tîqad: Bawerî.
Î'tîraz: e. Rexne.
Îtmî'nan: Dilrehetbûyînî, emînbûyîn.
Îtlaq: Berdan, rehakirin, rizgarkirin.
Îtmî'nan: Bawerî û îtîmadî.
Îttîba': e. Peyrewî.
Îttîfaq: Bihevrabûyîn.
Îttîfaqat: e. Pirjimariya peyva "ittîfaq"ê Hevgirtin, peyman çêkirin, rêkeftin.
Î'tîzalî: e. Mezheba Mutezîle.
Îtrê şahî: Dermanê bêhnxeş ê wek ê padîşahan.
Îttîhad: Yekbûyînî, yekîti.
Îttîham: Hiştina di bine tohmet û tawanberîtiyê da.
Îttîsal: Hevdîtin, gîhana cem hevdu.
Îttlaqî: Berdan.

Îttîsal: Pêvegirtin, gihîştin.
Îwec: Xwerû ye.
Îxfa: *e.* Veşartî.
Îxtelesû: Revan.
Îxtisas: Pisporî.
Îxtiyarî: Bi îrada xwe, bî arezûya xwe.
Îxtiyarî çar yarî kird: *k.s.* Ew kesê ku bextewar e ku çar yaran hildibijêre.
Îxtîlat: Têkilî.
Îxtîra': *e.* Dahênan, tişteki tazeçêkirin. Nûvedanî.
Îxwan: Pirjimarîya bira. Bira birayan. Gazî ket îxwan_û hîlbîtin çira. Bête xwendin mewlûda xeyr-îl wera
Îlahî seyyîdî: Xwedayê min, ezbenî.
Îyyake we îyyak: *e.* Mebest ayeteke sûreta Fatîhayê ye. Em her ji te ra 'îbadetê dîkin û her ji te alîkariyê dixwazin.
Îz: Gava.
Îza: Wextê.
Îza: *e.* Ezab. Êş û nexweşî.
Îzafe: Nisbet, aidbûna tişteki.
Îzam: Yê mezin.
Îz'an: Qebûlkirina rastîyê.
Îzar: 1.Cênîg. 2.Pêstemal.
Îzar-îzarek: 1.Tîr. 2. Gulançk. 3.Rûmet. 4. Lome.
Î'zaz: *e.* Hurmet dayîn, qedir girtin. Rûmet.

Îzhar: *e.* Beyan. Eşkere kirin, dîyar kirin
Îzheb: Here.
Îzîl'enwar û min zînnarî tenşe': *e.* Hemî ronahî ji agir hatine çêkirin.
Îzlet: Mayîna bi tene.
Îztirab: Jan, êş.
Îzz: Heybet, mezinî.
J
Jahil: Ji alîyê.
Jahil: Nêzan, cahil, nadan.
Jakaw: *k.s.* Pûç.
Jale: Xunav, avî, şebnem. Liser wê gulsitanê rêhtî jale Mûşe'se kir di hev durrê meqale (Ş.M.E)
Jar: 1.Bê goşt, zeîf. 2.Reben.
Jehra helahil: Jehra kujek.
Jehremîz: Jehra kujek.
Jende: *k.s.* Kevn û rizîyayî.
Jeng: Zeng, zinger. Ji jeng û zerqê da dil bişotin Cama sedef bîn rend û keramet (M.C)
Jengar: Zerê ji renge zengarê. Dîsa li bedrê katibî Kêşa ji nû jengari xet Nûr e reşandî wahîbî Der girdişê pergari xet (M.C)
Jengarî: Rengê jengê.
Jengê zuhd: Zenga sofitîyê.
Jêk: Ji êk ji hev.
Jêkiran: Ji hev û dinê.

Jêkra dibit: Ji hev cuda dibe. Ji hev dikeve.

Jêkve: Ji hevdu.

Jêkra bi ketin: Ji hevdû biqetîne, belav bike.

Jêrê: li jêr, li bin

Ji belgê rewneqî şîştîm: Ji pelên ter û taze mehrûm kirim.

Ji ewwil Bû-'Ubeyde: Di gel herçariyaran Se'id û Se'd û Telhe, Zubeyr û Ebdurrehman.

Ji 'inayet nezerê: Ji hêla alîkarîya Xwedê ve; bi çavên alîkarîya Xwedê.

Ji 'ilmê bête 'eyn: Ji asta zanîne bigihe asta dîtinê. Rastîya bînîqaş.

Jih: Mû, têt. Têlên sazê.

Zinhar e kesê desti bibit erqemê ser wê
Bê 'işweyê le'Ian ne bi teslîmê jiha girt (M.C)

Ji jeyn xaran: Ji xeynê strîyan, yan jî "ji jînxaran" kesên xirab.

J'kestiye: Şikestiye.

Ji neseq saîqe: Wek dengê birûskê.

Ji nûkê: Ji serî.

Ji pay: Ji pêyan heta serî.

Ji sema ta bi semek: Ji asîman heta bi erdê.

Ji şeh bikev: Ji şahê dûr bikeve.

Ji xeflet: Ji nişka ve.

Ji xucle ma ji îxrac: Ji mehcûbbûnê derket çû.

Ji xeybê fek bû: Ji cîhana nedîyar rizgar bû. Ji dayik bû.

Ji wan weye ku: Ji wan wisa ye ku, dibêjin qey ku.

Ji weslê yek têhn: Tîyên hevdîtina hev.

Jîha: Zîha, zîya, ejderha. Marê mezin, kezî.

Nexwî jehra jîha yê yarê bêtî

Dixwî bêşubhe jara mar ê gêtî (Ş.M.E)

K

Kab: Kabok. gûzek.

Bil ji sultanê qîdem, min bi te îqrarî nehin Ger li kaba me nihen metqeb û bizmari hudûs (M.C)

Ka'betullah: Mala Xwede.

Ey qîbleyê qelbê min ! Bi dilxwah,

Wey Ka'be'yê can! Bi Ka'betullah (E.X)

Ka'beyn: Herdu kap, zar.

Tacdîn ku digel biran bi meş hat

Ka'beyn-i ji bo Memê duşêş hat (E.X)

Kabir: e. Qure, pozbilind.

Kabîn: Cureyekî xelatên bûka ne.

Lê eqd û sîdaq û mehr û kabîn:

Lutf û kerem û eta û bexşîn (E.X)

Kade: e. Nêzik bûye.

Kadiz: Stêrkistana ku mîna rêyeke spî di asîmanan da xuya dike.

Çû j'dest nedihat û maye aciz

Naçar-i ecûze bûye kadiz (E.X)

Kaf ha: Sûreta 19. "Meryem" yê ku bi tîpên "Kaf Ha Ya 'Eyn Sad" dest pê dike.

Kafir: Gawir, Xwedênenas. Kesên ne misilman.

Kanîya heyatê: Di efsaneyan da ew kaniya ku kî jê avê vexwe dibe nemir.

Yan şibhetê şûşeya nebatê

Yan mênbeê kanîya heyat (E.X)

Kafûr: Şîrê darekê ye, li Japon û Çîn û Endonezyayê çê dibe, bêhna wê pir xweş e û ji bo serêşê bi kar tînin. Madeyeke spî û bêhnexweş. Bêhneke xweş. Dareke kulîlkên wê spî û bêhndar.

Kagul dibest: Zulf û tembûrîk dihûnandin.

Kahil: Keslan, bêxîret.

Kahîl: Kil.

Kahîn: e. Ew kesê kehanetê dike. Yê ku ji xeybê xeber dide.

Kaînat: Hemî tiştên çêbûyî, hemî alem.

Kakaî: Wek elewîtî û Êzdîtî ya bi rewşa rast û dirust yek ji dînen kevnên Xwedaperestîyên Arîyanî.

Kakolî muşkîn: k.s. Biskên reş.

Kakul: f. Bisk, perçem, kakûl. Tuncik, tenborîk. Porê ku li ser enîyê da dadikeve.

Ji bisk kakulan bîne meqamê

Bi hawa û seda xweş ke nîzamê (Ş.M.E)

Kala: Mal û milk.

Hindî ku di qeyserê di dinya

Vêk dane Xwedê meta'û kala (E.X)

Kalafiroş: k.s. Qumaşfiroş.

Kalan: Qalikê alavan, qilifê tiştan. Cîdanka şûr. Malika şûr, şûrdank.

Weke kîso serê xwe k'şande kalan.⁴³

Kalîbed: k.s. Gewde, qeware. Hecma bedenê. Îskelet, qerqûde.

Kalîwe: k.s. Ew kesê ku lêva wî qalik girtibe. Mebest kesekî nexweş û xwedîderd e.

Kam: k.s. Miraz, daxwaz. Mebest, armanc, lezzet, çêj, tam. Rutûbet, şil. Hez, arezû. Hêvîya dil.

Kame: Armanc, xwestin, arezû.

Gula fikri ji bo wan bulbula da

Gerîban pare kir kamê dila da (Ş.M.E)

Kame 'eys: Hêvîya jînê.

Kameranî - Kamiranî: Bextewerî, kêfxweşî.

Kami: k.s. Hez, arezû.

Kamkar: Dilxweş, Kamîran, kesê ku digihîje miradê xwe.

Kamyab: Jêrazî, kêfxweş, mirad. Kesê wê digihê miradê dilê xwe.

Kan: Maden, cihê ku jê dertê. Cihê zêr û me'denan.

Seyyêdê heq nezer vê ra

Di iqlîman 'elem gêra

Qutara gewheran vê ra

⁴³ Dîwan Seyid Eliyê Findikî, (2017), Amedekirin: Selman Dilovan-Huseyn Şemrexî, İstanbul, Weşanên Nûbihar, r. 152.

Ji nêv kana bedexşan têt (E.H)

Kan: Kanî.

Kane: Bû.

Kan û kun: Dema Xweda bixwaze tiştêkî çêbike, jê ra dibêje “kun, fe yekûn”, “bibe û ew jî dibe.” Sûreta Yasînê, ayeta 82yan.

Kanûn: 1.Korta li ber tifikê.

2.Berfanbar, çile.

Buye tarî û zulmat e sir û serma ji nû hate

Yeqîn Kanun eda hate binerin dax û kovane (M.B)

Kara ye: Dixebite.

Karesazî: Sazkirin û meşandina kar.

Sultanê serîrê bê nîyazî

Na bînî ji boyê karesazî (E.X)

Karger: f. Karker.

Karîgeh: Kargeh, mebest jê roj e.

Ev karîgeha ezîm û dewwar

Ev barîgeha bedî'û seyyar (E.X)

Karîger: Bandor.

Karîger: k.s. Kar.

Karisaz: Pêkanîn, karîn.

Karîgen: Gerdûn.

Karîger e tirî: k.s. Tîrên wî gelekî bi bandor in.

Kas: Peyale, qedeh.

Kas: Kêm, biquşûr

Kas betilî: westîyayî, jihaldeketî.

Kase: Qedeha meye.

Nêv kaseya ferfûr bikî

Feyzê li dil da fûr bikî (M.C)

Kaseçîn: Xizmetkarê ku pîyalan ji ser sifrê berhev dike.

Kasib: e. Xebatkar.

Ewe mubdi'ê fi'lê, kasib tuyî

Cezakarê fi'la ku talib bûyî (M.X.S)

Kasid: Tiştê bêbiha yê kes negire.

Kast: Kêm.

Hene em ey gelo ger em hene rast

Hebûn naxwazî te qet kêmi yû kast (Ş.M.E)

Kâşifê raz: Yê ku razan dîyar dike.

Ey waqifê remz û kaşifê raz!

Bê çareme ez, tu çareperdaz! (E.X)

Kaşo: 1.Darê ku pê bi gokê tê listin.

2.Darê sultanê yê nîşana serwerîyê.

Herçar-i serêd-i me wekî go

Çoganê iradeta wî kaşo (E.X)

Kaşû: Dara gogê. Dareke weke gopal ku pê li gogê tê xistin.

Kaşuwan: Darên gogê.

Katib: Nivîskar, çeker, Xwedayê ku her tiştî çêdike, teşe dide û dixemlîne.Yê ku dinivîse, teşe dide û dixemlîne, Xweda. Nivîskar, debîr. Wesfeke gerestêrka Utarîdê jî.

Dîsa li bedrê katibî

Kêşa ji nû jengari xet

Nûr e reşandî wahîbî

Der girdîşê pergari xet (M.C)

Katibê husnê: Xwedayê ku bedew çêkirîye nivîsiye.

Katibê xeybê: Xwedaye ku tenê ew xeybê dizane.

Kaxenê: Ji bo kalan dikeve şuna xwarinê û wan têr dike ku nema bi hacetî xwarinên din in.

Kaxik: 1.Kax, holik, köşk, qesr, xan.
2.Cih, koz.

Her neh felek lê kaxik in

Dûr û diraz wek axik in (M.C)

Kazib: e. Derewker. Derewîn.

Ey hiccetê aşîqêd-i saib!

Wey mibtilê middeayê kazib! (E.X)

Ke: Ey, ya.

Ke: Tu.

Ke': Te.

Ke: Weke.

Kebayîr: e. Pirjimarîya “kebîr”ê ye. Mezinan.

Kebed: Ceger.

Kebaba dil: Dilê biraştî.

Ke'be: Mala Xwedê.

Ne ew qedr û şeref bit, Ke'be seng e!

Yekî sengê sîyeh bêsewt û deng e (Ş.M.E)

Kebbere: Tekbîr da:

Kebed: Kezeb, cerg, mêlak.

Sehharê cohtê caduwan

Îro ji remza ebruwan

Dil girt û da ber kaşuwan

Ker kir li miskînan kebed (M.C)

Ke'bey amal: e. Ke'beya emelan, awadan. Hêviyan.

Ke'beyn: Du kap, du zar.

Kebik reftar: k.s Weke kewê bi naz.

Kebk:Kew.

Qulung û kebk û ordeğ û qîtk û qaz

Tezerw û tawus û tûtî digel baz (Ş.M.E)

Kebkê xeraman: Kewê ku bi nazdarî dimeşe, kewê kubar.

Kebuter: Kotir, kevok.

Kec: f. Li hev badayî, xwar.

Ke cewr û cefa ye baw: k.s. Cewr û cefa û zilm berbelav e, rewac e.

Keckuleh: f. Kofîxwar. Kumxwar.

Keçikên ji xwe razî ji payebûnê kofî û kumên xwe xwar dikin.

Zêrînkemeran û keckulahan

Tel'etqemeran û xetsîyahan (E.X)

Kecrew: Rêxwar, rêşaş.

Kecrû: Bi ser rû ra xwar.

Keç: Xwar.

Keçbaz: k.s. Ew kesê ku kirinên wî xirab in.

Keça kufarî: Keça gawir. Ew keça file ku dile Şêxê Senanî ketibûyê.

Şêxê weku pence hec bijarî,

Dîn kir te ji bo keça kufarî (E.X)

Keç ebro: k.s. Birûxwar.

Keç esto: k.s. Milxwar.

Keçî: k.s. Belam lê belê.

Keçî pêşim dellê: k.s. Lêbelê ji min ra jî dibêje.

Keç keleh: Serxwar, kêfîxwar.

Keçrew: Xwar zivirîn.

Keç û kecrew: Xwar, ne rast.

Keder: *e.* 1.Tarî. 2.Tal.

Kedî: Ajela ku hînî mirovan bûye.

Nayê beyanêya mi dî

Em bûne teslîm û kedî (M.E.F)

Kef: Nava dest.

Kefaet: Hevtaî.

Kefş: Dîyarkirina tiştên veşartî.

Kefş bibit: Xuya bibe.

Kehanet: Pêşbînî, xebardana ji xeybê.

Kehil: *f.* Kilên çav.

Kehl: Kal, pîr

Keîb: *f.* Bixem û derd.

Ez im îro reîsê 'endelîban

Serawerdê temamê dilkeîban (Ş.M.E)

Kej û ko: *k.s.* Çîya.

Kelal: Westandin.

Yareb! Bi kelalê îşqê sadiq,

Yareb! Bi kemalê sidqê aşiq (E.X)

Kelam: Axaftin, gotin, peyivîn.

Kelamê di zêde, kelamê betal,

Xusûmet di heqqan mîra û cidal
(M.X.S)

Kelamdan: Axaftin, xebardan.

Kelamê Ellah: Gotinên Xweda. Yanî
Qur'an.

Kelamê besît: *e.* Gotinên vekirî, ezeli,
bê destpêk.

Kelamê mewzûn: Gotinên bi kêş û
qafiyê. Helbest.

Mîna dê 'elema kelamê mewzûn.

Alî bikira li banê gerdûn (E.X)

Kelat: Kelehan.

Bajêr û kelat û xanî ber dan

Teşbîhê bi nejdîyan û cerdan (E.X)

Kelb: *e.* Kûçik, se.

Kele: Sûr

Keleber: Kuç, keleha wêran

Kelef: Reşayî.

Lew şuphet ê pîra bi hewes talibê

Yûsif Dor hatîye 'Xanî' kelefa rîsê di
desta (E.X)

Keleş: Ciwan.

Kel'ewabim: *e.* Mîna balindeyê îqab

Kelim: Mûsa Pêxember (Hz. Musa)

Kelî: Kelîya.

Kelîd: Kilîd, mifte,

Kelîl: Jar û westa.

Kelîlen: Westîya.

Kelîm: *e.* Bêjer, sifetê Hz. Mûsa ye.

Kelkele: *k.s.* Xeyal

Kelkî kê degrim: *k.s.* Fêda min bo
kesî nîn e.

Kell: *k.s.* Mêrxas.

Kella: Na, hîç.

Kelleqend: Kelê şekirê.

Kelte: Kelebûtî, pevşabûn.

Sermest-i bi destê têk heristm

Bû kelte û gelc, û da haristin (E.X)

Kem: Çend, çiqasbûn; miqdar. Kêm,
pîs.

Kema kane: *e.* Wekî ku bû.

Kemal: Gihîştayî, gihîştîbûn.

Bi Qur'anê xeyrê wê mensûxî bûn,
Kemal û fedil bo me pê zêde bûn
(M.X.S)

Kemalat: Gîhana bilindîyê. Zanîn û edeb û huner.

Kemale ulfet: Hogirîya pir.

Kemalê bê kemalî: Temambûna kêmayîyê

Kemalê re'feta te: Kamilî û pîrbûna dîlovanîya te.

Keman: Kevan.

Serxoş û mest û xirab û be ser û saman
im ez

Dîlbera ebrû-keman dil daye ber tîra
Qecer (M)

Kemandar: Kevandar, tîravêj.

Kemandar reş-qatîl in

Gezme li dil bi cot in (M.C)

Kemandarê weşqatîl: Tîravêjê kujer, nêçîrvanê ku dikuje.

Kemend: Bend yan ji werîsê serê wî helqekirî, ji bo girtina tiştan ji dûruc. Werîsê ku di nêçîrê da heywan pê tîn girtin.

Xemê xumrî kemendê zulf ê mehbûb
Xerabe kir ji bin dil kirye meqlûb
(Ş.M.E)

Kemendar: Kevandar, qumandar. Kesên ku tîran diavêje.

Lew ne hişyar û xumar in, me ne xwarî
mey û beng

Li me îro du kemendarê Hebeş hatine ceng (M.C)

Kemendarê Hebeş: Hebeşistanîyên tîravêj; birûyên awirtûj.

Kemend asa: k.s. Wekî kemendê, fitrakê.

Kemer: Taq, piştîn.

Kemberbeste kirin zulfê kemendî

Heman perwane sotin şewqê rindî
(Ş.M.E)

Kemberbest: Xwe amade kir ji bo şer.

Kemberbeste: k.s. Kemer li piştê girêdayî.

Kemergeh: Newq, nav.

Kemter: Hindik.

Kem'iyar: 'Iyara wî kême, ne safî ye.

Kemîn: Kêm.

Şahê ser textê edalet di sexa girtî kemîn Hatem û Noşîrewan şagirtê wî bûn bi yeqîn (M.E.Q)

Kemîyyet: Çendîtî, çiqasîtî.

Kemmalê zerbet: Derbên giran. Zehmetîyên di jîyanê da arasteyê mirov dibin.

Kem sadetil eswede bi elhazîhel mîraz: e. Bi tîrê çavên xwe elek şer kuştîye û nêçîra wan kiriye.

Kemxe: Kêmxê, cureyekî qumaşî.

Ken'an: e. Kurê Hz. Nûh e, yê ku bawerî bi Xweda neanîbû.

Di hebs û hem di zîndanê

Wekî Yûsuf li Ken'anê (F.T)

Kenarî: Kesên li کنار û rexan dijîn.
Yên li dûrê navendê. Ji qerax.

Kendî: Çîle, cefa, ezeb.

Kenîşt - Kenîşte: Perestgeha cihûyan,
hewra.

Dil geşt e min ji dêrê naçim kenîşteyê
qet Mîhrabi wê bi min ra, wer da
biçîne Laleş (M.C)

Kenz: Xezîne, gencîne.

Çe încîl û çe Tewrat in di mensûx in di
mulx'at in

Bi wî navî misemmat in hukim çû
kenzê rehman (M.B)

Kenza qudretê: Xezîneya karîn û
hêza Xwedê.

Kep: Kepû, poz û bêvil.

Ker: Perçe.

Keramet: 1.Îkram, dayîn. 2.Ji bo
Xwedê, bi xatirê Xwedê.

Keramat: 1.Tiştên seyr ku li ser
desten welîyan diqewimin. 2.Şeref,
heysîyet, rêzdarî.

Dibin ku welî bin, keramatê wan,

Di dunyayê heqin, mebe ziddê wan
(M.X.S)

Kerameta kerîman: Comerdîya
destbelayan.

Kerb: Qehr.

Firqeta wê her bi derb e

Daîma êsan û kerb e (F.T)

Kerbela: Çola ku tê da Îmam Huseyn
tî û bê av hate kuştin.

Ji ahê dil evî ewrî belakit

Cîger par e çû deşta Kerbela kit
(Ş.M.E)

Ker bit: Parçe parçe bû.

Kerb û elem: Qehr û jan.

Keşmekeş: Şer û nakokî, kaos û
qeyran.

Mem ger bi vî rengî zû fena bit

Dê keşmekeş û nîza-i ra bit (E.X)

Kerdan: Meqameke muzîkê ye.

Kerden: f. Kiriye.

Kerem: Qencî, comerdî.

Rûnişt û bi leb kerem mesref

Exbar û qise kirin mesref (H.B)

Keremkar: Ciwamêr û bexşende.

Keret: k.s. Car, kere, defa.

Kerixîn: Pir westîyan, bêhal man.

Kerî: Parçe.

Kerîm: e. Bexşende kesê ku
kêmahîyan dibaxişînê. Qenekirox.
Comerd, esîl. Ji navên Xwedê ye.

Lu'lu' sifet î der sedef î behre kerîm î
Ehsentir î ez Yûsufe sedîqê helîm î
(M.B)

Ker kir: Parçe kir.

Ker ker bû: Parçe parçe bû.

Kerr: Yê ku nabihîze.

Kerr: Di lîstika begmegizirî da rûyê
ku dibe wezîr an jî mîr e.

Kerrar: e. Gelek caran êrîşî dijminan
kiriye. Leqeba Hz.Elî ye.

Ehlê dunyayê seraser dijminên min bin
Mela

Piştemêrê min 'Elî bî heyderê kerrar î
bes (M.C)

Kerrena: Navê sazekî ye.

Sazan mirî hey kirin wekî Sûr

Kûs û def û Kerrena û naqûr (E.X)

Kerrûbî: Komeke firîşteyan e ku pir
nêzikî Xweda ne.

Kerx: Kerxa kîka, navê gundekî
Diyarbekirê ye.

Ke's: Kas, kasik.

Kesad: Bazara sar û bê kirin û firotin.

Çibikim ku qewî kesade bazar

Nînin ji qumaşê ra xerîdar (E.X)

Kesb: Kar, bidestxistin, ked, xebat.
Karkirin.

Ji subhê heta tavê zikrê bike,

Ji bo xwe hec û 'umreyek kesb bike
(M.X.S)

Kesb bikit: Bi dest bixe.

Kesbê enwarê bikin: Ronî bistînin, jê
ronî bibin.

Kesbê mal: Bidestxistina dirav û
pereyan.

Kes dar: k.s. Berpirsiyar.

Kesf: Qetkirin, birrîn.

Kesif- Kesîf: Tîr û hişk.

Kesir: e. Pir.

Kesixandin: Birrîn û qelemkirina şaxê
daran.

Kesîr: e. Şikestî.

Qed kane leke'l-fedlû lek el cûdû
kesîra Ursilte île'l xelqî beşîren we
nezîra (M.B)

Kes kin: Perîşan kin.

Keslan: f. Westa.

Welêkin tev ne bokeslanîya min

Ji vê behsê wuha pes manîya min
(Ş.M.E)

Kespik: Morîyê şîn ê ku dixin stûyê
ajelan.

Kesr: e. Şikandin. Cerr, di dawîya
peyvê da denge “î” ye.

Kesret: Piranî. Pîrbûn, zefbûn.

Hindek bi tebaî-yû bi kesret

Hindek bi hevalî-yû bi wehdet (E.X)

Kesret wehm e: Pîrî wehm e, xiyalî
ye. Mebest: Tenê jib o Xweda wicûd
heye, hemû tiştên mayî wehmî ne û bê
wicûd in.

Keşafulkurûb: Xemrevîn, ev
rengdêrên Xwedê ne.

Keşakeş: Nîqaş, mucadele.

Feyza me şubhê Nîl e, em Dicle û
Firat in Ger şeyx û wer îmam e, vêra
ye min keşakeş (M.C)

Keşf: Keşfa halê rûhanî, dîtina tişteki
ku kesî nedîtîye.

Metlûb-i ji le'b û bend û bazan

Qet nîne bi xeyrê keşfê razan (E.X)

Keşfa raz: Dîyarkirina sirran.

Keşfe hal: Ravekirin û zelalkirina
rewşê.

Keşf û şuhûd: Dîtin.

Keşşaf: Navê tefsîreke Qur'anê ye. Yê ku keşif dike, derdixe, dizane. Çareserker.

Di remza kufr û îslamê

Yeqîn fehmê te keşşaf e (M.C)

Keşşafê Cemal: Ew Xwedayê ku bedewî û spehîtiyê kite bi kite dizane û dîyar dke.

Keşşafê rûmûzê hîkmetil-eyn : Kesê ku îşaretê zanîn û hîkmetan kifş dike.

Keşşîfî: Xuya kir, derket.

Keşşîfî bedr: Hîva çardehşevî derket.

Keşt: Çandin, çand.

Keştiya Nûh: Gemîya Nûh pêxember e.

Keştî: Gemî.

Da dil ji nû bayê mecaz

Wê keştîyê sukkan e reqs (M.C)

Keşwer: Welat.

Mensûr-i buwîm li keşwerê xem

Xem bûne ji bo mira misellem (E.X)

Ketîb: f. 1.Tertîb, nîzam. 2.Leşker 3.Alayî.

Ketn: k.s. Tawan, sûc.

Kevî: Bikevî.

Kew: Kewandin, şewitandin.

Kewa: k.s. Cilekî wek ebayê ye. Lîbas. Cilekî mêran e, wekî jakêt e.

Kewaîb: Keçên memikgilover.

Etrab û kewaîbêd-i ezra

Mirdan û mirahiqêd-i zîba (E.X)

Kewakîb: Pirjimariya stêrkê.

Kewkeb: e. Stêrk.

Her lehze wekî kewkeba durrî ku bi meş tê Dil pir xweş û geş tê (M.M.L)

Kewkeba se'da ebed: Stêrka muşteriyê ya nişana xweşikî û xweşbextiyê.

Kewkeba subhê: Stêrka sibehê.

Kewll: k.s. Post.

Kewn: Hebûn, bûn, kaînat. Madde, kurre. Gerdûn.

Têk kewn û mekan û roz û şeb alemê cism e

Êk ilmê Ehed sirrê Elest fehmê cewab e (M)

Kewneyn: Herdu gerdûn. Herdu dinya. Dinya û axiret.

Kewn û kaînat: Bûyîn û bûyakan.

Kewser: Ava bihuştê, çemekî bihuştê ye. Navê sûreteke Qur'anê ye.

Pistî lêvê wê venaxwim mutleq ava Kewserê

Min nevêt dinya bi carek paşî wê sîmaperî (E.X)

Kewtote: k.s. Ketiye.

Key: Dax, birîn.

Key: k.s. Kîngê, qey, çi demê.

Key: Kî ye.

K'ey: Kurteya: Ku ey!

Keyb: Xemgîn. Xem, keder.

Bê hed ji dil nalî û keyb

Da buxçeya ridwanê xeyb (M.C)

Keyber: Birînên tîran. Birînên kêran.
 Keyber reşandin bê hîsab
 Misrî ku dan sîqal û tab
Key bikin: Bikewînin, bişewitînin. Bi
 dermankirinê, Kuştina mîkrobên
 birînê.
Keybir: Keyber 1.Tîr. 2.Kêra mezin,
 sator.
Keyd û şeyd: *e.* Fêl û fir, hîle û pile.
Keyê: Kewadinê, sotinê.
Keyf : 1.Çawa, çawabûn. 2. Şahî
 xweşî.
 Veda dama xemê der keyf û şahî
 Ji bo wan serxweşê mexsed îlahî
 (Ş.M.E)
Keyfe: Çawa, rewş, kêf, hal.
Keyfiyet: 1.Çawayî. 2.Kêfxweşî.
Keyfiyata seyyal: He'yet û rengê ron.
Keyl: Sultan, padişah, qral.
Keyl: *k.s.* Pir, zaf, tijî.
Keywan: Qiralîyet. 2.Gerstêrka
 Saturnê.
 Her kenarê pê ve wergêrî 'înanê
 himmetê Zuhre bi peykê te û keywan
 rikêbdarê te bî (M.C)
Kezê: Qewz.
Kezib: Derew.
Kezm: Daqurtandin.
 Dem hazîme bêt, ew î biket hezm
 Dem dafîe bêt, ew î biket kezm (E.X)
Kê dîwîye: *k.s.* Kê ew dîtiye.
Kêhe: *k.s.* Kî.

Kêj: Keç.
Kêl: Kêlik, kevirê lîstoka kêl ji kêlê.
Kêm û kast: Kêmasî, qisûr.
Kêmxê: Cureyekî qumaş *e.*
 Ya xar *e* lê kêmxê û qedîf
 Feryad ji destê firqetê (M.C)
Kêmxê û xare: Du cureyên qumaş.
Kêşa: Kîşand.
 Sun'a Xudê wedayê sefhe ji nûr
 danîyayê Enber li ser kêşayê ebrû û
 xet û xal *e* (S)
Kêşan û keşan: Bi dudilî û têramîn û
 erê nayê.
Kêşaye cefa: Zor û êş dîtiye.
Kêw: *k.s.* Çîya.
Kêwan: Stêrka Zuhelê, stêrka mezin
 ya nişana bedbextîyê, Saturn.
 Kêwan-i di Delwê da nîhan bû
 Bercîs-i di Hûtê bînîşan bû (E.X)
Kêzirî: *k.s.* Çalak.
Kibriya: *e.* Herî mezin.
Kîçik: Piçûk.
Kidne: Bez.
Kiflet: Zar û zêç.
Kift-Keft: Sermil.
 Lê çi şîranî ye Ellah te ji wê keft û
 çenê? Ez dibêim bedr *e* bi dêm lê
 dîkitin guft û kene (M.C)
Kih: *k.s.* Piçûk.
Kihter: Kêmtir.
Kilab: Kûçik, se, kelb.
Kilan: Hejandin.

Meydan bi dewan kilan, bi dest kor
Goya ve didan li dijaminan gor (E.X)

Kilk: Qelem.

Ne ew kilkê felek fulkê necat e

Ne ew zulmat e tê abê heyat e (Ş.M.E)

Kilk: k.s. Pence, nahperûşk.

Klasîk: Berhem û huner e ku ji
pêşîyan da maye û her dem bî rûmet e.

Kileh: Kulav.

Kile û Kilç: Kildan û kilçiv.

Kilox: Serî, qaf.

Kinar: Berav, rex, kenarê çem.

Kinêr: Darek bi strî ye.

Kinûz: Xizeyan, gencîneyan.

Kir cûş: Hilkeft, tev rabû.

Kirdar: Karker, kiryar.

Zahir ji wera selîse guftar

Batin bi wera xebîse kirdar (E.X)

Kirdebengî: Bengîbûyî, bengî.

Hin mest û hinek di kirdebengî

Xwanende û bezlego û çengî (E.X)

Kirdigar: Çêkirox, xeysetnavê
Xwedê. Xwedayê ku tiştan çêdike,
diafirîne.

Ew bû murada kirdigar

Lew kir îrade û îxtîyar (M.C)

Kirdiwe zayî: Wendakirin, zayikirin.

Kir du ker: Kir du parçe. Kêrkirin,
perçekirin.

Kird û koşîş: Xebatkirin.

Kire ferş: Raxist.

Kir gûş: Guhdar kir, bihîst.

Kir i'lam: Ragihand.

Kirin deraxûş: Hembêz kirin.

Kirin di şehr tehwl: Dageriyan û
daketin bajêr.

Kirin teqrîr: Şirove kirin û gotin.

Kirişme: Girişme, naz û delalî.
Îşaretên çavan.

Şîweyê dîlberê bizan, sunnet e şiwe,
'işwe ferz

Her.du nezer ku bin qeran wacib e yek
kirişme ferz (M.C)

Kir izhar: Eşkere kir.

Kirîdar: Kesê ku dikire.

Kirî tewarî: Çûne ava, xwe veşartine.

Kir nezer: Lê nihêrî, berê xwe dayê.

Kirre: k.s. Dengê destar.

Kir tey: Tewand, pêça.

Kir zemîr teqrîr: Ya dile xwe got.

Kisrayê 'Ecem: Şahê farisan.

Şahê Erebi elem ku rakir

Kîsrayê Ecem, eceb duta kir (E.X)

Kişt: Zevî.

Kişwer: f. War, welat, diyar

Kitabet: Nivîsîn.

Kitabê mestûr: Ew sifeteke Qur'anê
ye. Wateya wê; pirtûka bi pênuş û
rêzikan nivîsandî.

Kitan: Qumaşê ji kitanê.

Kiyan: Gîyan.

Kiyaset: f. Keys, mecal, feraset.
Kûrbînî.

Paşê, tuwî sahibê kîyaset

Laîq wî bi bîn çîye siyaset (E.X)

Kiyaşem: Biçim cem kê.

Kizb: Derew.

Ewî divê Xwedê bide we sed derd û belayê Heta ku malê we bixwin bi kîzb û îftirayê (X.U)

Kîbir: e. Kibr, quretî, pozbilindî.

Kîbîrya: e. Mezinayî, Mebest Xweda ye.

Kî'êl: Cureyeke mahînan e.

Kîfayet: Besbûn, têtî. Têrî.

Etwarê 'işq û mestî, esrarê but-perestî Teqrîrê sed rîwayet, nakit ji bo kîfayet (M.C)

Kî ihsanê: Qencîyê bikî.

Kîj: Keç.

Kîlab: Kûçikan, segan.

Kîmiya: Mebest ew îlmê berê ku Xwedê giravî madenên erzan dikirin zêr.

Mîrê ku bi navê Mîrîza ye

Mehza nezera wî kîmiya ye (E.X)

Kînayet: Peyvandin û bêje û gotina bi menakî xwazmanî, bi qurf û şirove.

Kîsra: Şahê Sasanîyan e. Bi edaleta xwe ve navdar e.

Kîsre: Şahê Îranê.

Kîsû: Kesî.

Kîswet: Cil.

Kîşan: Tîrdan. Tûrikê tîran.

Kîşan/kîş: Dîn û sunnetan.

Kîşverguşa: f. Kesê ku welatan fetih dike, cîhangîr.

Kîşwer: f.1.Welat, memleket, rewşa hewayê. 2.Îqlîm.

Kîtab: Mebest jê Qur'an e.

Kîtabet: Nivîsîn.

Kî tibê: Kî dibêje.

Kîzb: e. Vir, derew.

Ko: Hewş, derdora xanî. Der û ber, derdor.

Ko: k.s. Kolan tax.

Ko: Çawa.

Ko be ko birrwa: k.s. Bila ew bajar bajar biçe.

Kodek: f. Zarok.

Koh: Çîya.

Dêmê xalêt di hûr lê eniya xulfêt ştûr lê Rewneqa Kohê Tûr lê mehbûb e bê misal e (S)

Kohê Qendîl: Çîyayê Qendîlê.

Kohê Tûr: Çîyayê Tûrê, Tûrî Sîna.

Kohî: Çîyayî.

Kohken: f. Ew ê ku çîya kul dike, mebest Ferhad e.

Kohsar: Çîya, devera ku gelek çîya hene.

Kohsare: Çîyayî, cihê çîya

Kok: Lixwekirina bedew, bi cilên lihevhatî.

Tu bimeş kok bi ser derê qesrê !

Bixwe kokî li Şah û Qeyser ke! (M.C)

Kok: k.s. Amadebûna ji bo kar.

Koken: *f.* Ew kesê ku çîya qul dike.
Mebest Ferhad e.

Le xwên û xakeda koken witî meqsûdî
Xusrew bu

Bibînin macera, tebilîxî ken şahîd le
bo xayib (MW)

Kokirdin: *k.s.* Civandin, komkirin.

Kokî ke: *k.s.* Bixebitîne, bişixulîne.

Kolê kil: Dûvan, boçikan.

Kolê turrehat: *k.s.* Tiştên hîç û pûç û
nebaş.

Kolik: Xaniyê piçûk, holik

Koma tetar: Mebest çavên reş an jî
biskên reş û xwînrej wekî tetaran.

Kose: Zilamê ku rih û simbelê wî tune
ne.

Kosî: Defa hewarê.

Kosî ku hingaftî bi şahî li text

Padîşehan neqdî-rewan dan xerac
(M.C)

Koş: *k.s.* Serpî, daw, hembêz.

Kotah: Kotîbûn.

Berê meqsûdê ji tûbayê negerîn
me'lûm e Me ji destê xwe yê kotah û ji
payê xwe yê leng (M.C)

Koter: Gerdenî.

Kofî ji cewahiran mikellel

Koter ji netrikan miselsel (E.X)

Kotir: *k.s.* 1. Balindeyeke; koter,
kebokurk. 2. Gerdenî, kolye.

Kotirî haqû: *k.s.* Kevokek e xwendina
wê gelekî hezîn e.

Kotirk: Kotir, desmala ku li serî
digerînin.

Kovan: Birîn, kul, xem.

Sed ah û kovan û keser

Heyft eyn û "lam çûn hicrete (F.T)

Kovanên mihirdaran: Birînen
evîndaran.

Kovanên mihirdaran

Bê hedd û bê ejmar in (M.C)

Koz: Kozik, cihê ku nêçîrvan xwe tê
da vedişêre.

Kozî: Çeper, kûz

Ku: 1. Li ku. 2. Çawa. 3. Kîjan. 4. Eger.

Ku bin qeran: Ku nêzîkî hev bibin.

Kubbar: Mezin.

Heçî vêkis ewî xwarin

Eger alim di kubbar in (F.T)

Kubera: Giregir.

Kubra: Mezintir.

Kuca: Çawa, ji ku. Li ku.

Kuç: Kevirê lepê.

Kuçik: Argûn, tifîk

Kudam: *f.* Kîjan.

Kudek: Zarok, gedek

Qureyşî bû penahê dîn xudanê sûreê
yasîn Şivanê kûdekê nûrîn melek hatin
di fermanê (M.B)

Kuffar: *e.* Kafiran.

Kufr: Xwedênenasîn, bêdînî.

Welê ehlê qiblê tu kafir mezan,

Serîhî ku kufrê nebînî ji wan (M.X.S)

Kufrîzulf: Zulfên weke tarîtiya kufre reş.

Kufû: Hevta, wek.

Kufw: Hevta. Hemta, wek.

Lewra ku tu şahî, ez gedabûm

Ez bo te ne kufw û hemlîqabûm (E.X)

Kuhensal: Kevnesal, pîr.

Zanayê miemmerê kuhensal

Ev renga he go ji bo me ehwal (E.X)

Kuhl: Kil.

Tozekê bîn bi xwe ra ta bikirin kuhlî beser Li terîqa qedema dîlberê wê rehguzerê (M.C)

Kuhlê beser: Kilê çavan.

Kuhlî'l: e. Gewher, gewhera kilê.

Kuhnexan: Xaniyê kevn, دنیا.

Ku kem: Çawa bikin.

Kul: e. 1.Hemî, gişt. 2.Rîş.

Kulab: Pence, çengal. Neynûkên balindeyan.

Bide da sehlî bit ev îş û müşkil

Kulaba gul dilê kul kir gil û mil (Ş.M.E)

Kulaf: 1.Kulav, zerf, cil. 2.Pêkan e ku "kulab" be; yanî pence. Pence, lepê balindeyan.

Kulah: Kum, tac.

Medhûş û mestê wê meyê

Şaş û kulah aşufte da (M.C)

Kulav: Kepene, tatî

Kulbe: Kevirê piçûk

Kulbe: Kolik, qulûbe.

Kule: k.s. Kulî, melex.

Kuleng: Mîrkut, pêkutk.

Kulfet: Hilgirtina karekî li ser mile xwe. Zehmet, zor.

Wan mi'telifan-i pêkve ulfet

Axir wekirin, nema çu külfet (E.X)

Kull: Bi tevayî. Gişt, tev, hemî.

Kullab: 1.Hînkirina ajelan ji bo nêçîrê.

2.Seyîsê ajelên nêçîrê. 3. Qulab, hesinekî sertûj. Çengal, çilak. 4.Toq.

Serê zulfa te bi kullabi dua

Hate destê me bi cullabi dua (M.C)

Kulle: Hemî.

Kullî: Giştî. Her tişt. Bi tevayî.

'Elamet ji bo sa'etê ra pirrin,

Bi kullî ji ferzane bawerkirin (M.X.S)

Kullîyatê xemse: Pênc giştî: Cism, Cûrc, Bend, Peydabûna taybetî û peydabûna giştî (tevayî). Di ilmê mentiqê da pênc tişt; cins, new', fesh, 'ereda am, 'ereda xas.

Kullu men: Her kesê.

Kulibe: Jûr, mezel, ode.

Kulxan: Di demên berê da cihê ku agir lê dihat dadan. Argûn.

Evê kulxan eya kohne xwiya ye

Fena ye, ev 'ecûz a bêbeqa ye (Ş.M.E)

Kulxen: f. Kuçika ahir a serşoyî, tifik.

Kulye: Gurçik.

Kumeyd-Kumeyed: Kumêd, Hespê sor, hespê lingê wî ji renga din.

Çûme ser piştê kumeydî

Min jê pur ew jan û key dî (M.C)

Kumêd: Hespê sor, hespê lingê wî ji renegekî din.

Kun: 1.Bibe, fermana Xwedê ku dibejê "Bibe" 2.Qul.

Subhan ji Şahe bê çun çi biharek keskûn e Qadir "kun feyekûn" ji erdan derbûn 'iyûne (M.G)

Kunc: Kujî, kuncê tarî.

Kunc: Hêl, zawiye.

Kunce zeqene: Ew çala li erzenkê.

Kuncê xelwetê: Quncikê tenêtîyê.

Sofî ku gîhîşte kuncê xelwet

Şêxînî gîha meqamê wehdet (E.X)

Kuncî 'uzlet: Cihekî xalî, vala; ji bo xelwet û tenêmayînê.

Kuncû: Kuncî.

Kunendan: f. Dikin.

Kunende: f. Yê ku dike, kirox.

Tedbîr-i kunende pîrê aqil

Ev renga he bû ji bo me naqil (E.X)

Ku êne hasil: Kengî bi dest meriv dikevin. Yanê dinya û axiret bi rêya derd û xeman dikevin dest meriv. Ew nêrînên tesewîfî ne.

Kun fekan: e. Got: bibe û bû.

Kungir: Kund.

Kunh: Bingehe rastîya her tiştî. Binê kar, mahiyet. Naverok

Bi vê qasirnerîna xwe cîgerxwûn

Ku waqî' bin li kunha zatê bêçûn (Ş.M.E)

Kunhê: Rastî, heqîqet.

Kunî hebîbê Ehmeda: Peyda bibe ey Ehmedê delal!. Mebest jê Hz. Mihemed e.

Kunk: Qul, qulik, qulikên wê gir.

Kunkirin: Qulkirin

Kun kirî: Qul kirî.

Kun kun: Qul qulî.

Kunt û kenz: Bûm genc, xezîne. Hedîsa Qudsî ku dibêje: "Ez xezîneyeke veşartî bûm min xwest werim naskirin, min xelk afirandin da ku min nas bikin."

Kunûz: Piranîya kenzê ye. Gencîne, xezîne.

Kupal: Gopal.

Kurd: Jîr û jêhatî, qehreman, milletê Kurd ku yek ji gelên 'esil û kevnareyê Mezopotamya, koma Zaxrosîye, ji nijada gelên Hindû- Ewrûpayî(Arî- Aryanî), beşa Îranî ye.

Çapikherekat û nûciwanan

Wan faris û kurd û pehlewanan (E.X)

Kurdemîr: Mîren Kurd.

Şêxêm! Tu di zanî ev Cizîr e

Têkda kubera û Kurdemîr e (E.X)

Kurdewrî: Welatê kurdan, Kurdistan.

Kurê Sikender: Tacdîn.

Kurk: Quling.

Kurmanciye: Welatê Kurmancan, Kurdistan.

Bi'fikir ji Erab heta ve Gurcan

Kurmancîye bûye şîbhê bircan (E.X)

Kursî: *e.* Di baweriya îslamê da hemî asîman û erd di nava kursiyê da bi cih bûye. Felek. Kursiyê Xwedê ye, tê gotin ku li asîmanê nehan e.

Dolab û çerxê neh felek

Pêş destê kursi bûn helek (M.C)

Kursîyyê dewwar: Kursiyê ku pir dizivire, Asîman, gerdûn, kaînat.

Kurûb: Xem, piranîya xeman e.

Kurûr: Pênc sed hezar.

Kusa-Kusan: 1.Çawa, çima.

Kustax: Çelaq, bêşerm.

Kuşad: 1.Vekirî. 2.Dilxweşî, kêfxweşî.

Kuşaî: Derkeve, vebe.

Emma ku derîçe têk kuşad in

Reng qur'eyê texteyê mirad in (E.X)

Ku şayî: Li gor nusxeyekê "Kuşayî": Kîşandin, hilkişîyayî.

Kuştar xaney: *k.s.* Cihê ku xelk lê tên kuştin, qesebxaneya merivan.

Kuştegan: *f.* Pirjimariya kuştîyan.

Kuştey: *k.s.* Hatiye kuştin.

Kuştimî: *k.s.* Te ez kuştim.

Kutah: Kurt, kin.

Kutek-kotek: Zor û tundî.

Ya dê bi kutek Memê xwe ber dîn

Ya cimle bi merdî ser bi der dîn (E.X)

Kutub: *e.* Pirjimariya kitabê ye.

Kuvan: *f.* Hawar, gazî.

Kuwe: Çawa.

Kûçek: Piçûk.

Kûh: Çîya.

Kûje: Ajeleke ku ji rovî piçûktir û ji kîvroşkê mezintir e, totik, quzik. Di helbestan da bi rovî ra tê bikaranîn.

Kûre: *k.s.* Kana komirê.

Kûrerah: Korêrê.

Kûs: Dahola ku di şer da tê lêxistin. Def, dahol.

Kûtah: Kinkirin, vebirîn.

Kûtiya: Bêxêrî û bêbihayî.

Kûvî: Ajelên nekedişîr.

Ayîne li pêşê tûtîyan girt!

Davek te h pêşê kûvîyan girt! (E.X)

Kûyan: Kohan, çiyayan.

Were êdî temaşa ke 'ecûzê

Bibîne zulm û xedra piştikûzê (Ş.M.E)

Kûz: Piştewîyayî, jarbûyî, ketî.

Kûze: Kûzik, cêr.

L

La: Na, ne.

Laberê: *k.s.* Bide alîyekî.

Labida: *k.s.* Nehêle.

Labidde: Teqez lazim e.

Labudde: *e.* Bi naçarî, bi mecbûrî. Her divê.

La budde minhû: *e.* Naçar, mecbûr, lazim.

La cerem: *e.* Bêguman. Rast e, wisa ye. Heq e, heq dike.

Laf: Peyv.

Lafeta îla elî: *e.* Ji xeynê Elî xort tune ne. Mebest Hz. Elî ye.

Lafîz: *e.* Axifger.

Laf û guzaf: Gotinên bê wate û beradayî û vala.

Xaniya dê hebitin bê huneran laf û guzaf Aferîn ber te! Ku ev şîwe ji bo kes te nehişt (E.X)

Lagrî: *k.s.* Ji bo xatirê.

Lah: Derketin, Eşkere.

La hewle wela quwwe: *e.* Tu hêz tun ji bilî hêza Xwedê.

Lahût: *e.* Xwedayî, îlahî. Zanista Xwedayî, ilme îlahî. Tiştên mensûbê alema îlahî, tiştên xeybî, manewî. Nolên paqij. Beşa Xwedayî û ruhanî li ba merivan. Ji bo her fikren Xwedayî jî tê gotin.

Soxen tezyînê da ezmanê yaqût

Tijî kir qelbê yaran sirrê Lahût (Ş.M.E)

Lahûtî: *e.* Îlahî.

La îlahe îlla tu: Tu Xweda nîn in ji bilî te.

Lak: *k.s.* Berate, mirar. Mirar, laşê ajelên mirî.

La'I: Gewherekî sor *e.*

Elmas û guher cebîn û dindan

Tebdîl-i buwîn bi la'l û mircan (E.X)

La la: Na na.

Lala: Biriskdar, xulam, mamosteyê şahzadeyan

Lale: Lale, helale. Mebest hinarkên rû.

Lale misal e: Wekî gula beytanokê ye.

Lalezar: Baxçeyên laleyan.

Neqşî kirin cûybar bela çû werda exder Sinober û gulbihar kulîlket mu'enber Gulşîlê û lalezar nîsanokên di ehmer (M.G)

Lalixawe: *k.s.* Alîyekî dev.

Lalî: Kesên li alî wan. Nêzîkî wan. Peyrewên wan.

Li kû dê bête zanîn halê Seyda

Bi te'rifû beyana wek mi lalî (M.E.F)

Lall: Bê ziman.

La mekan: Bê cî, bê war, bê mekan. Mebest Xweda ye.

Lam elf û lam û hê: Lale.

Lami': Ronak, ronîdar.

Westane şaxis sef sef in

Batin di 'eynê da xef in

Teşbihê berqa xatîf in

Lami' di çerxê tîs'e da (M.C)

Lami'ê fetha ezel: Ronahîya alîkarîya ezelî.

Lami'ê husna te : Ronî û tîrêja rindîya te.

Lamî': *e.* Xwedan şewq.

Lamî'sifet: Wek berqê.

Lam û bê: Du tîpên alfabeya erebî ne. Leb; lev.

Lam û lam: Gulî û biskên weke tîpa lamê ser badayî.

Lami'weş: Weke birûskê bi çîk.

Lane: *f.* Hêlîn.

La reyb: Bêguman, ayeta duyem ji Sûreta Beqere ku dibêje “guman di vê pirtûkê da tune ye, ji xweparêzan ra rêber e.”

Çi ayet bû ji la reybe?

Reşandî nuqteya nûrê (M.C)

La seyfe îla zulfîqar: *e.* Ji xeynî zulfikarî şûr tune ne.

Lasîyyema: *k.s.* Bi taybet.

Laşey: *e.* Ne tişt, tişteke nîne.

Lat: Pût, senem. Dilberên weke pûtan rind. Wek putê navê wî Lat bedew.

Lêvêt şubhet nebate ez nadim bi heyatê

Ji husna but û latê bi min cah û celal e (S)

La tefreh: *e.* Dilê xwe xweş neke.

La tehzen: *e.* Berxwe nekeve, mehzûn nebe.

La teqnetu: *e.* Bêhêvî nebin.

Lateqnetû: Erebi ye. “hêvîya we nebirin.” Mebest ayeta Qur'anê ye; ji dilovanîya Xwedê bêhêvî nebin.

Latezal: Bêdawî.

Latê da: Di zinar da.

Latîf, Samed: Navên Xwedê ne.

Laûbalî: Bi delalî, serbest. Kesê ne cidî û guh nadê, kesê têr û bitir ku haya wî ji bayê felekê jî nîne.

Ji bêînsafî me d'vê dostê safî

Bixwe j'dotê Xweda em laûbalî (M.E.F)

Lawîn: Xurt û ciwan.

Kêjêd-i sivik, kurêd-i lawîn

Manendê benat û mîslê Perwîn (E.X)

La'xir: Lawaz, hejar.

La yehsebi'l-enasiyyû en yutrekû

suda: *e.* Dibê meriv nefikire ku wê neyê muhasebekirin, lewra teqez tê heşîrkirin.

La yemût û yehya: Ne dimire û ne dimîne. Mebest sûreta Taha ye.

La yenam: Neniv, ranekev, yê ku ranazê. Yê ku ranazê.

La yenqetî: *e.* Berdewam, nebirî, timî.

La yestewî: *e.* Ne wekî hev e. Amajeyê ayeteke Qur'anê dike.

La yezal: *e.* Naçe fenayê, bêdawî.

Layezal: Ew ê ku nayê guhertin. Xweda.

Sefhê kêşa katibê xeybê ji nûra layezal Xalek e wal' gerdene misle berê reş mah û sal (M.B)

Layiq: Hêja.

La yufna: *e.* Venamire, natefe.

Lazim: Divê ,pêwîst.

Lazim û melzûm: Bêyî hev nabin.

Le'b: *e.* Lîstik, lîstin.

Dinê mehd e û malok e

Dinê le'b e û leyzok e

Çi zanin tîfl û zarok e!

Felek çerx e û dewwar e (F.T)

Leb: Lev, rex, کنار.

Rûnist û bi leb kerem mesref

Exbar û qise kirin mesref (H.B)

Le'bê: Lîstik.

Lebaleb: 1.Heya bi levan tije, pir tije, seranser . Lêv bi lêv 2.Şûşeya tije (dagirti).

Lebaleb ke rehîqa nabî pursur

Di wê cama sedef wî rûhê wek dur (Ş.M.E)

Leb ber leb: Lêv ser lêv.

Leb bi leb: Lêv li ser lêvê.

Lebe le'l: Lêvên sor.

Leben: Şîr.

Leber kerî kalayî bê rewac: k.s. Kesê ku cil û bergê bê qîmet li xwe bike, bipoşe.

Le ber pê kewt: k.s. Kete binê lingan.

Le ber pêya dirêj: k.s. Ketim binê piyên wî.

Leberya bê ber û bermûr: k.s. Gerdenbend bi stûyê wê ve daleqandî be.

Le'bet: e. Lîstik.

Lebê meygûn: Lêvên wekî meyê.

Lebê teşne: Lêva tî.

Her bi can teşnelebê le'lan im

Dil di benda girîha zulfan im (M.C)

Lebê xendan: Lêva vekirî, lêva bikêf.

Lebileb: k.s. Kevokên ku dike gimegim.

Lebit: Lêva te

Le bo: k.s. Ji bo.

Lebrêz: f. Tijî.

Lebrîz: Heta dev tijî.

Zêrîngedehêd-i mestê lebrîz

Reyhan û binevşe cimle newxîz (E.X)

Lebs: Çek, kinc.

Husna te ya dil xah e dîlber lebsî siyah e

Bi min Ke'betullah tewaf bikin her sal e (S)

Lebsê enfes: Cilên herî bedew.

Lebteşne: Lêvtî, lêvziwa.

L'ebu lewh: e. Herdu navên lîstikê ne.

Le'b û baz: Lîstik û xweşbêjî.

Ledunnî: e. Zanista Xwedayî, zanista taybet.

Ledûn: e. 1.Îlahî. 2.Li nik, li cem.

Feyyazê 'ilmê "Min ledûn"

Pey pey ji behra "Kan" û "Kun" (M.C)

Ledxe: e. Pêvedan.

Le'eb: Lîstik.

Lef: e. Pêçan. Pêçek, pêç, ta, qat.

Lefz: e. Gotin, şor, lefz. Peyv, bêje.

Leha: Jê re.

Lehaleb: f. Devedev, heta ber dev dagirtî, tijî.

Lehce: 1.Peyv, qise. 2. Dîyalekt, zarava. Mebest axaftina şîrîn e.

Lehce da: Deng da.

Nefsan bi 'îşqê da nefes

Qelban bi hubbê lehce da (M.C)

Lehd: e. Gor, tirb.

Lehda ku Memê meleknezer tê
 Yanî sedefa ku ew guher tê (E.X)
Le helqulane: *k.s.* Biliqîna ava
 kanîyan.
Lehel 'ukûsû: Lêwekilandin.
Le heşrîşa: Li roja heşrê.
Lehim-lehîm: *e.* Goşt.
Lehîb: *e.* Gurîya agir, pêldana agir.
Lehîbî: Pêlêdana agirê min.
Lehn: Deng, awaz.
Lehu û le'b: Tiştên pir û pûç.
 Beradayî.
Lehû: Jê re.
Lehw: Heng. Karên bêsûd, necidiyet.
 Ji bo çi tu vê le'b û lehwê dikî?
 Heçî ku bi nefe çire dê nekî? (M.X.S)
Lehyan: Her du alîyan.
 Lehyan û neqîyyê pêkve dîtin
 Tacdîn û Sitî ye pêkve dîtin (E.X)
Lehyan û neqî: Ev peyv bi zimanên
 falbêjan *e.* Dema falbêj qûmê dirêjînin
 xet çêdibin, eger mîna elifan bin
 dibêjin Lehyan; lê xelek û giroverik be
 dibêjin neqî.
Lehz: 1. Tefekur. 2. Temaşe.
Lehze: *e.* Demeke kurt. Gav.
Le'il: Yaqût, renga sor.
Le'in: Lanetbûyî, şeytan, ehrîmen.
Leîm: *e.* Gazin, lome.
Leîm: Kesê nejadnizim û çavbirçî.
 Lê zayîe hîmmeta kerîman
 Derheqqê nelaîq û leîman (E.X)

Le'in: *e.* Yê lenet lê hatî. Mel'ûn.
 Lanetbûyî, şeytan.
 Te bê fayde umur borand
 Di qelbê xwe le'in rûnand (M.E.F)
Lek: Di zimanê hindî da hezar *e.*
Lek: *k.s.* Navê eşîreke kurdan *e.* Bi
 nebaşîyên xwe ve tê nasîn. Mebest
 hejar û xizan.
Leke: Ji te ra.
Le kel debirê: *k.s.* Lingê wê ji serê
 çîya bilindtir dibe.
Le kin: *k.s.* Li cem.
Le kin min: *k.s.* Li cem min.
Le'l: Kevirê giranbûha û sor *e.* Ji bo
 leva yarê tê bi kar anîn Lêv. Lêvên
 sor.
Le la: *k.s.* Li alîyê.
Le'la Bedexşan: Dura Bedexşana li
 rojhilatê Efxanistanê.
 Her sîne tabî na temam
 Na puxte xam bê mihr û cam
 Xerqîn di xwûna dîl medam
 Le'la Bedexşan î Mela! (M.C)
Le'lê lebiş: Lêvên wê yên sor.
Le'lê noşîn: Lêvên sor wekî le'lan,
 yên ku tene metin yan jî dimêjin.
Le'lê şekerxa: Lêvên sor, weke le'l;
 zimanê şîrîn. Lêvên sor yên
 xeberşekir, peyvşîrîn, xweşgotin.
Le'lişeker: Lêvên weke le'lê sor. Sorê
 şekirîn.

Le'l û xendan: Kenmirarî, kenên mîna dur an.

Lem': Tîrêj.

Ji lem'ê şem'ê pur nûra hebîban

Mûnewwer ke dilê miskîn xerîban
(Ş.M.E)

Lem: k.s. Li wê

Lema-leman: Lewma.

Lem'an: Ronahî.

Lem'e: Ronî çirûsk.

Lem'e- lem': Beriçîn, teyisîn

Lemewla: k.s. Ji niha û pê ve.

Lemma efel: Dema ava bû. Dema çû ava. "Dema Birahîm pêxember dît ku hîv bi ronahîya xwe ve derket got, 'ev Xwedayê min e.' Dema çû ava got, 'eger Xwedayê min hîdayet neke, bêguman ez ê bibim ji jirêketîyan.'" (Sûreta En'am: 6/77).

Lems: e. Destlêdan, pelandin.

Lem yekûn: Tunebû, tunebûn.

Lem yezel: Tiştê ku naqede, bêdawî. Ya ku bi dawî nabe, naqede. Mebest Xweda ye.

Le'n: e. Le'net.

Lena: e. Ji bo me. Ji me re.

Lendeha: Leheng.

Ew Ristemê keywe, lendehaye
Gencîneme ez, ew ejdehaye (E.X)

Leng: Qop, seqet. Pîseqet.

Nêrgizên mestî bi naz û neyîreng

Lê tu tûba û ezê xesteyê leng (M.C)

Lenger: .Firaqek pêjgehê ye, hesinê keştîyan.

Ev lengerîyêd-i zîv û zêrîn

Şibhet felekêd-i jor û jêrîn (E.X)

Lengeri: Legen.

Len teranî: e. Tu qet min nabînî. Mebest sûreteke Qur'anê ye.

Leper: k.s. Ji nişke ve.

Le pê kewtîn: k.s. Kesê ku nikare bimeşe.

Le pîrr: k.s. Derhal, ji nişka ve.

Le rêya kewtûn: k.s. Li rêya wî ketine. Di rêya evînê da ketine xwar û nikarin bimeşin.

Lerzan: Di halê ricifîn û lertzê da.

Ji ber vê ni'metê şukrane xorşîd
Dikîtin secdeyê lertzane wek bîd
(Ş.M.E)

Lerzî hate: k.s. Lerizî.

Lesa: Ji me ra.

Le sed 'ellame danatir: k.s. Ji sed aliman zanatir.

Leş: Laş, beden.

Tacdîn ji serê xwe tac û tomar

Havêtine ser leşê Memê jar (E.X)

Le şîrî biryewe: k.s. Ji şîr qutkirin. (Ji bo pitikan)

Let: k.s. Perçe.

Leta (Lea, Liya): Keça Lavanî ya mezin jina Ye'qûb pêxember a yekem e.

Letafet: Nazikî.

Li wî qametek mu'tedil bû letîf,
Ne kurt û dirêj û ne zexm û zeîf
(M.X.S)

Letîf: Nazik, narîn, nerm. Xwedayê
ku her tiştên piçûk û zehmet dizane û
hukim li wan dike, yê ku pir qencîyê li
qûlên xwe dike.

Letîfedan: Kesê ku bi gotinên xweş û
zirav dizane. Zana.

Lew: Eger, loma, lewre. Ji ber, wisa.

Lewaşîq: Bi bawerî, xatircem.

Lewh: 1.Texteyê ku bûyer li esmanan
lê tên nivîsîn. 2.Textereşê nivîsandinê,
dep.

Lewhê dil: Textenûsê dil.

Lewhê 'edem: Lewheya tunebûnê.

Lewhê mehfûz: Textenivîsa
parastî. Textereşê Xwedê qedera her
tiştî li ser nivîsiye.

Kitêba me dibîtin lewhimehfûz

Heçî tişta ku qewmî, tê beyan e?
(M.E.F)

Lewhê reqîm: Lewheya reqemkirî.

Lewhê sine teqwîmê: Nivê lewheya
bedewî û xweşikîyê.

Lewhê sîm: Lewheya ji rengê zîv,
rûyê yarê yê spî.

Le wişkîyşa meley mexlûq: Xelk di
nava wê hişkayîya serabê da avjenîyê
dikin.

Lew kan: e. Eger ku bû.

Lewlake-lewlak: e. Hedîsa Qudsî ku
Xwedê ji Pêxember ra dibêje. “Ger ne

ji te bûya min gerdûn (alem)
nediafirand.” Heke tu nebûyayî.

Şehrîyarê mesnedê lewlakî şahê
enbiya

Ya Resûlellah dexîl im, ya Hebîbellah
dexîl (Ş.E.A)

Lewleb. 1.Çerxa ku li ser bîrê pê av
derdixistin, mecazen ji bo çerxa felekê
tê gotin. Zivirîn, çerx, felek. 2.
Lewlebê meşka dew.

Şukurdar in ji vê halê

Hewayê lewleba salê (F.T)

Lewme: Gilî û gazin.

Lixwe sêrin meke newmê

Li nefsa xwe bike lewmê (F.T)

Lewn: Reng, awa.

Mûnezzeh zatê Barî bê mekan e

Û hem bê lewn û reng û bê nîşan e
(Ş.M.E)

Lewnê beraqê: Weke birûskê.

Lexav: Gem

Le xew dîbê: k.s. Di xew da dîtibe.

Le xo birrwa: k.s. Ji xwe çûyîn.

Leyalî: e. Bi şevan. Piranîya «Leyl»e.

Leyî: Lehî, şap.

Leyl: e. Şev.

Min nivîsî ev kîtab leyl û nehar

Lew ji bo îxwanê dîn ra yadîgar
(F.R.H)

Leyla: Hezîrîya Mecnûn e.

înkariya Leylê ji eşqê bawerîya

Dayê mana kiriye wê Mektebê (H.B)

Leylî deycûrî: Şeva reş û tarî.

Leyse: 1.Tune. 2.Kaşkirin.

Leyse fî qelbî sîwake ya hebîbî kulle hal.

Her demem xem hem demem şud der firaqet mah û sal (E.X)

Leyt: Xuzî.

Lezîz: Xweş û şîrîn. Biçeş. Çêjxweş, tamxweş.

Ev meywe eger ne pir leziz e

Ev tîfle bi min qewî ezîz e (E.X)

Lê heqîqet her dizanitin xudê: Lê tenê Xwedê rastîya wê dizane.

Lêk: Li hevdu.

Lêk-lêkî: Lêkin, lakîn, lê.

Lê kir nezer: Lê nihêrî, berê xwe dayê.

Lêkîn: Lê.

Lêk piçiyar: Li hev geriyan.

Lêl: k.s. Şêlî, şolî, jîyaneke nexweş.

L'êlan: Mebest lêvên sor in.

Lêm: k.s. Li min.

Lêre: Li vir.

Lêrehe: Li vê derê.

Lêşaw: Êrîşa ref bi ref.

Lêwe lerzey xist: k.s. Lerizandina lêvan, ketina lerizandina lêvan.

Lêwî Meygûnit: k.s. Wekî lêva te ya ku wekî meya sor e.

Lêzme: k.s. Barana tavî.

Li: Ji bo. Têkeve cî.

Li bal: Li bîr, di dil da; jibîrnekirin..

Libas: Cil û berg, kinc.

Mehbûbe, lîbas û goşîwar e

Milkêd-i min in, ne mistear e (E.X)

Libasê dilberanî: Cil û kincên keçikan.

Libas kerr kim: Cilan biqetînim. Di edebîyata klasîk da ji bo gulbişkivînê tê bikaranîn.

Libasê matem: Kincên şînê, cilên şînê.

Libas-i telbîs: Cilguhertin.

Li bîrsînê: Di dema birçîbûnê de.

Li ha: Liv ir.

Li hêr: Li vir.

L'hir: Liv ir.

Lik: k.s. Perçeyek piçûk ê dawênê.

Li kar in: Di xizmetê da ne.

Li kar nabî: Amade nabî, hazir nabî.

Lillah: Ji bo Xwedê, bi xatirê Xwedê kî.

Lillahîlhemd: Hemd ji Xwedê ra.

Li Misrê dil 'ezîzî: Tu şahê textê dil î.

Li paşê: Li pey.

Li qebû hat: Bersiva dengê kew da, ber bi wî da hat.

Li rexmê: Li dijî xwesteka.

Lirf: k.s. Bi hev ra.

Lisan: Ziman

Lisanê Kurdî: Zimanê kurdî.

Safî şemirand, vexwarî durdî

Manendê durê lîsanê Kurdî (E.X)

Liwail hemd: *e.* Ala herî baş ala pêxember.

Li wan tebi'et melean: Ji zarokan ra dibêje ku siruşt wan wek a firîşteyan *e.*

Li wifqa meşreban: Li gor vexwarinan.

Lixab: Gem.

Lixaba tev ew ê bigrê

Xudadar î çi xemdarî (M.E.F)

Li yek Li hev.

Liyumna: *er.* Li rastê.

Lî: Ji bo. Ji

Lîbas: Çek, cil, kinc.

Lîkî dem û liçî: *k.s.* Girêza dev û lêvê.

Lîl maî: Ji avê.

Lîp: Xap û rîp.

Lîqa: *e.* Liqaybûn. Rastîhevhatin, hevdiştin. Gihiştin, mebest gihiştina Xwedê ye.

Gelek hêvîkarê liqaya teyîn,

Me bê behr û muflis nekî, bendeyîn (M.X.S)

Lîsan: Ziman.

Lîwa': Ala, beyreq.

Ceng û suwaş e wan bi xef

Hatine ber lîwa'yê zulf (M.C)

Lîyebkû: *e.* Heta ku hûn bigirîn. Amaje ji bo ayeteke Qur'anê ye.

Lîyessaleb: *e.* Mîrata wî bo min *e.*

Lî yetmeînne qelbî: “ ji bo ku dilê min aram bibe.” (Sûreta Beqere: 2/260)

Lola: Luyeluyka agirî.

Lolo: Daçeka gazîkirina nêran *e.*

Lot: Lotik.

Her bengî-yû serxweşêd-i Bohtan

Têk hatine çerx û baz û lotan (E.X)

Lot: Dewlemendên mezin.

Lubab: 1.Pirtûkeke fîqha şafî.
2.Pirtûkeke li ser zimanê erebî. 3. Xalis. Kakilê guzê.

Cama ne şekerleb bi me dit 'eynî heram e Fetwa weh numa Haşîyeya Şerha Lubabê (M.C)

Lucce da: Pêl da, herikî.

Lucec: Kûrayî.

Lucce: *e.* Mewc, pêl. Pêlên avê. Pêla mezin.

Ew herdu demek veman teheyyir

Bûn xerqeyê lucceyê tefekkir (E.X)

Lucen: *e.* Zîv

Luhce: Tişt.

Luhçê dil: Zimanê dil.

Lu'lu: Mirarî, dur, sedef.

Lu'luê mensûr: Mirarîyên liblibkirî, durên ji hev veqetandî, libo libo.

Ger lu'luê mensûrî ji nezmê tu dixwazî! Wer şî'rê Melê bîn, te bi Şîrazî çi hacet? (M.C)

Lu'luwa mensûr: Mirarîya liblibkirî, durên ji hev veqetandî, libo libo.

Luqman: Hekîmekî navdar e, Di Qur'anê da bi navê wî sûretek heye.

Di Luqman û Îskenderî lec meke
Ne pêxember in wê 'înadê meke
(M.X.S)

Luqme: Parî. Gep.

Lutf: Rindî, nazenîn. Qencî, kerem,
xêr, îkram.

Lutf a te seyatîn ji sema kime
mureccem Ger dê tu nebûya, nedibû
çerxê mu'ezzem (M.B)

Lutfê barî: Qencîpêkirina Xwedê.
Rehma Xwedê.

Lutfê heq: Qencîya Xwedê û
dilsoziya wî.

Lutfê kirdigar: Nazikî û dilovaniya
Xwedê, Hîv.

Luxet: Ferheng , zar û ziman.

Ewê dî kelmê besîtê qedîm,
Hurûf û lûxet hedîsin ey hekîm
(M.X.S)

Luxewî: Zimanvanî, bêjeyî.

Lûl: k.s. Gangilî, kurîşk.

Lûzum: Tiştên ku ji hev cuda nabin,
lazimên hev.

M

Ma: 1.Hema, hertim. 2.Sekinî,
rawestîya, di halê xwe da ma.

Ma: Ew. wî.

Ma: Ne.

Ma': Av.

Ma: Emma, belam.

Ma baluke, weyhek ente minnî: Te
xêr e hey xwelî li ser! Tu ji min î. Bi
erebî ye.

Mabeqa: Wan dîtir.

Ma beqa summen we 'umyan: e. Her
tiştê heye ji ber heybeta roja qiyametê
kor û ker dibe.

Mabeyn: Navber.

Vêk ra ku bûne wesl û cem'
Barin ji mabeynê du lem' (M.C)

Ma ca bîhinnebî: e. Ew tiştê ku ji bo
pêxember hatiye.

Macera: Serpêhatî, serguzeşt.

Gelek dûr û diraz e macera dil
Çiqa kin qet'ê kin pir baş e hasil
(Ş.M.E)

Macin: 1.Bêh e. 2.Hîlekar an jî kesê
rêya hîleyê hîn dike.

Maçîn: Cihekî li Asyaya Navîn e.

Xerez şiklê te bû Manî
Ji neqşên Çîn û Maçînê (M.C))

Madame-l'heyat: e. Heta ku tu li
heyatê bî.

Madar: Dormedar, cîh, derdor.
Wargeh, cihê gerê.

Mebe xergûş di nêv dehlê
Seyad dê bête madar e (F.T)

Madarê bedrê: Derdora hîva
çardehşevî, yanî derdora rû.

Mader: f. Dê, dayik.

Heta bû şîrî ew xwûna sîyehreng

Kete pûstanê mader saf û bê zeng
(Ş.M.E)

Madî: Mazî, Rabirdû

Ma dua-ul kafîrîn: Daxwaza kafiran
çi ye?

Madûm: Tune, nîne.

Mewcûd-i kirin dema ji madûm

Em pêkve di lazîmîn û melzûm (E.X)

Ma 'erefnak: "Me tu nas nekirî" Di
hedîsekê da pêxember gotiye: Ey
Xwedayê me tu bi şêweyekî rast
neperistî û me tu renekî rast nas
nekirî.

Ma fewqe-ttebî'et: Tiştê di ser tebîetê
ra Tiştên der siruşt.

Mafî: Tune ye, nîne.

Mafîha: e. Di nava wê da.

Mafû: Bexşandî.

Mah: Meh, heyv. Sipîk.

Ev reng dibê ava zelal

Borîn li min çend mah û sal (F.T)

Mahê Azer: Meha Adarê.

Mahê ruxsar: Hîva rû. Rûyê mîna
hîvê xweşik.

Mahêtab: Tavehîv, rûyê weke hîvê,
mebest yar.

Mahê taba: f. Hiva ronî.

Mahir: Şareza.

Xasete der vî 'ulûmê şairî

Qabilê sihr e beyan û mahirî

Mahisîma: Mehrû, Rûmeh.

Mahitab: Ronîya hîvê, hîvron,
tavehîv. Weke hîvê ronî.

Mest im ji xemra mahîtab

Ciwanletifa nûseb (SP)

Mahitabê dîdar: Dêmê mîna hîvê.

Mahiyyet: Çawabûn.

Mahîtab-Mehtab: Tavehîv.

Ma'hî: e. 1.Mehûkirox 2.Yê ku tiştê
heyî tune dike.

Mahî: 1.Masî. 2.Asîmanî.

Mûdamî abê cû me mislê mahî

Cîger ateşxurê dîdarê şahî (Ş.M.E)

Mahî ken'an: Mebest Hz. Yûsif e.

Mahîrû: f. Rûheyv.

Mahîrûyê miskî bûyê

Sur-pilingê şerî xwûyê (M.C)

Mahî siyam: f. Meha rojîyê,
Remezan.

Mahîsîma: Hîvrû.

Mahiyyet: Çûnyetî, çawayîtî, bi çi
awayîtî ya tiştan, heqîqete wan.

Mahrûyî: f. Rûhîvî, rûyê weke hîvê
xweşik û ronî.

Mahtab: f. Heyv, hîv.

Ma hû: e. Ew nîne.

Mahûd: Kifşe.

Mail: e. Hewes, arezû, meraq.

Lewra ji şerê tê da du hezar mesail Yê
xwendî ji terîqa musteqîm nabitin mail
(X.U)

Maîl: Dilbijok, meylidar.

Mak: Dayik, dê.

Dinê mehd e, dinê mak e

Dinê tîn e, dine xak e (F.T)

Ma kane berqen xulleba: Ne berqeke bêfeyde û derewîn bû.

Makêhel: Çavên kilkirî.

Mala: e. Tiştê ku ji hêzê der.

Ma la nîhayet, mala yetenaha: Tiştê ku bê payan e, yê ku dawîya wî nayê.

Mala ye'nî: e. Tiştê bê wate, beredayî.

Malayîk: e. Pirjimarîya melekê ye. Firîşteyan.

Ma la yûtaq: Tiştên ku hêz li serî dernayê. Tiştên bi darê zorê nikarin bê kirin.

Mal'behrê ferqê duşmenan: Hertim li serê dijminan.

Male pîtkênê: k.s. Mala ku zarok ji bo listikê çêdikin.

Malik: 1.Serwerê karwana ku rastî Yûsif pêxember hatiye. 2.Xwedî, xwedan. Mebest Xweda ye.

Mem kir bi tekellimê xeberdar

Kî: Ey malikê milkê cîsm û canî! (E.X)

Malikê Mulkê Celîlê Zulcelal: Padîşahê milkê hêja û rêzdar

Malî: Maland.

Malîk: e. Dergevanê dogehê.

Malîk û Sahîb: Xwedî, xwedan.

Malîk rîqab: Xwedanê gerdûnê.

Ma'lûl: 1.Nexweş. 2.Tiştê ku jê ra delîl tê anîn.

Mensûx-i kirin wî dîn û millet

Ma'lûl-i kirin elîl û îllet (E.X)

Malxolî-malxûlî: Nexweşe bi serayê, dîn û şet.

Go: Goh me dine Memê, ku dîne

Malxolî ye, wî aqil çunîne (E.X)

Ma melek: Tiştê heyî, tevahîya mal û milk.

Mamerd: Gulav.

Ma mest: Ma serxweş.

Mamewe tak: k.s. Ez bi tenê mame.

Mamûl: Tiştê ku pê tê emelkirin.

Ma'mûr: 1.Dinya, cîhan. 2.Ava.

Manaî, Manayî: Beşekî gelê Arîyanî yê kevnar e.

Manend: Mînak, wek, mîsal, mîna.

Manendê Rubabê, bê kemançe

Deng bê ji defa me bê tebançe (E.X)

Manî': Rêgir, bend.

Eger bihnkî ji cem camêrekî bê

Hezar mani' bi hev ra têne rê da (M.E.F)

Manî: (216/277 m.) Danyarê dînê manîtiyê ku wêneçêkerekî bi huner bû.

Mîna wênayên Manî, weke wan bedew. Neqqaş û nîgarendeke herî navdar e, ku dînê wî jî dînekî eklektîkî bûye; ji hemî dîn û mezheban girtiye.

Ressamê Çînî yê binavûdeng.

Manî': Asteng, qedexe.

Mare gêsû: Yên kezîyên wan mîna maran in.

Ma'reke: Ceng, têkoşîn.

Ev ma'reke nabitin bi dîwan
 Em mane û sibhe sehnê meydan (E.X)
Ma remeyte iz remeyte: *e.* Dema ku
 te neavêt.
Ma'rez: Temaşegêh.
Marîfetnak: Kesê bizanîn.
 Lê hakimê weqtê marîfetnak
 Mesmû'î nekir bi sem'e îdrak (E.X)
Marûf: Naskirî.
 Her Marûfa rengîn bi xar
 Dor merqeda Şahê kubar (M.N.T)
Mar û mûr: Mar û marmarok.
Masder: Rader, kok.
Ma'ser: Guvaşgeh.
 Wer mayî wisan li ber hewayê
 Ew dê çite ma'sera cefayê (E.X)
Maset ke banin fi ruba: Weke bîya li
 ser girekî liba bû.
Masike: Hêza duyem e ya ku xwarinê
 dihelîne.
Masîke: Hêza ku digire.
 Geh cazîbe batinê ve kêşit
 Geh masîke bigvişit, bi êşit (E.X)
Masîwa: *e.* Ji bilî wan. Hebûyên ji bilî
 Xweda. Ji bilî, giştî bûnewerên heyî ji
 bilî Xwedê.
 Wacib yeke, zatê Kîbrîya ye
 Mîmkun pire, cem'e masîwa ye (E.X)
Masuwelleh: Ji xeynê Xweda.
Masûwa, masîwa: Ji xeynê wî, ji bilî
 Xwedê her tişt.
Maşa: Kesê ku dimeşe.

Mat: 1.Bêdengî, mirin. 2.Di kişikê da
 binketina kevîrê şah e, yanê têkçûn.
 Gerçî li ber derb û cefan filî bûm
 Bê mefer ez mati kirim şah û fî (M.C)
Ma telewna: Me nexwend.
Matem: Şîn.
 Sivik bim da seyahet kim di alem
 Bi dîl, ku def'î bin ev şîn û matem
 (Ş.M.E)
Matemî: Beşdarê şînê. Kesê şînî.
Matemzede: Şingir, yên şîn girêdane.
Maun meîn: Aveke rewan.
Mawe: *k.s.* Maye.
Mawer: Gulav. Ava gulê. Mawerd,
 bêhna xweş.
Mawerd: Ava gulê, gulav.
 Nesrîn û binefşe tewwuzandin
 Mawerd direşandî şuşeyî ac (M.C)
Mawera: Hawirdor, etraf.
 Mawêra belgên gulê bû
 Bêhn û bû ya kakulê bû (M.C)
Maweraînehir: Yên li pişt çem.
Mawer bike: Gulav bike, ava gulan
 lêke.
Mawetin: *k.s.* Maye.
Mawî: *e.* Şîn, hêşîn.
Ma xeleqte: Her tiştê ku tê afirandin.
Mayîl: *e.* Dildayî. Hezjêker.
Maza te'murîn: Çi ferman kî.
Mazî: Borî, derbasbûyî.
 Hela carek bi teyyara fikir tu
 Bi mazî da bi guhdarî bifir tu! (Ş.M.E)

Mazûl: Derketîye ji kar.

Mazûlî: Derketina ji kar.

Mîrê ku mirin hebit, ne mîr e
Mazûlî hebit, ewî esîr e (E.X)

Meab: e. War.

Meadin: Piraniya «Maden»e.

Meal: Mana, wate.

Farix ji teeşşîqa xezalan
Şiklê ku we dîtî bê meal e (E.X)

Me'anî: Wate, maane. Piraniya
«Mana»yê yanî wateyê ye.

Mebada: k.s. Ne ku.

Mebanî: Çêkirin û li hevanîna
gotinan.

Elfaz û meanîyû îbarat
Înşa'û mebanîyû îşarat (E.X)

Mebde': Destpêk, despêke, hîm,
serkanî

Mebde yê Mûtleg: Destpêka
negirêdayê bi tu qeyd û mercan va,
azad. Di destpêkê da azad û serbixwe.
Mebest Xweda ye.

Mebe: Mexrûr, nexape.

Mebe mexrûr: Nexape.

Mebhes: e. Mijar.

Mebhût: Heyirî, matmayî.
Me wunda kir xwe û xwe çû ji destan
Wuha mebhûti mam teşbîhê mestan
(Ş.M.E)

Mebizwe: Tev negere.

Mebna li wî: Li gor wî.

Mebnî: Li ser, li gorî.

Mebrûk: e. Pîroz, mubarek.

Mebtûn: Zikêş

Me'bud: e. Jê ra îbadet tê kirin.
Mebest Xweda ye.

Wî Secde nebîr li xeyrî Me'bûd
Gêra te ji ber derê xwe merdûd (E.X)

Me'bûs: Şand, newenger.

Mebye: k.s. Nebihîze.

Mecal: 1.Derfet, fersend. biwar, cîyê
ger û lepatê, 2.Şîyan, taqet.

Mecal e ew bi xewxa kit
Binêr carek çi hawar e (F.T)

Mecalîs: e. Pirjimariya meclîsê ye.
Civat, Civatan.

Mecan: Mift, badî hewa, bê bedel

Mecaz: Mecazî. Xwaze, xwazman
(bêjeya ku ne bi me'na Aweya heqîqî
ye).

Bila dîlber mecazî bit
Ji renga pêş e tazî bit (F.T)

Mecazî: Xwazmanî, ne heqîqî. Ne
xuyayî, menewî.

Mecbûr-i: Bê gav.

Mecer: Rêça kadîzê.

Tîr dane dil şahê mecer
Bê mirwet amanc kir ceger (M.C)

Mecîbiddêwe: Bersîvde

Meclis: Civat, bezm.

Xetim ke tu jê meclisa şairan
Bi rast û Hîcaz û Seba, îsfehan (Ş.E.A)

Meclis arayî: f. Meclis sazîkirin.

Meclîsî: Yê tene civata mîr û şahan.

Meclûb: Cihê balkêşîyê.

Zanî ku perî di bê libas in

Meclûbê mehebbetê unas in (E.X)

Meclûbe mehebbeta unasin: Bi evîna merivinan hatine kêşan.

Mecme': Cihê civînê, cihê kombûna tiştêkî.

Mecmer: Menqera agir. Kozîya agir. Buxûrdank, agirdank. Menqela pelan.

Di nêva mecmerê wan qelbê pir nar

Bixûr û 'udê 'eksa gîsûyê yar (Ş.M.E)

Mecmû': Bi temamî, ji serî heta binî.

Mecmû'e: Kom.

Mecmû'î enbîya: e. Hemî pêxember.

Mecnûn: e. Evîndarê Leylayê ye. Navê wî Qays ibni Mulevvah e.

Mecnun: Dîn, şet, cinaketî.

Mecra: Avrewk, rewange, cihok, rêya avê.

Mecrûh: e. Brîndar.

Nîne der qelbê me bestek çunkî mecrûhî kul e

Bê tebîb im, bê tebîb im, bê tebîb im, bê tebîb (Ş.E.A)

Mecrûhê qewsê tûzreş: Birîndarê birûyên reş.

Mecrûr: Kêşayî.

Me'cûn: Melhem, yan jî xwarinek.

Meczub: Dîn, cunûn. Di tesewifê da bi wateya Xwedê êdî ew bal xwe ve kişandiye. Di tesewifê da payeyeke

bilind e. Dîwane, dîn. Yên ku ji eşqê bi cezbe dikevin, dîwane.

Mehbûb-i te çêkirin di dilkeş!

Meczûb-i te pêkirin mişewweş! (E.X)

Meçore: k.s. Tu meçe.

Med: Dirêjbûn, dirêjbûna pêlên behrê, dijê cezrê ye, mad, madî, maday.

Meda: Tecellîgeh, xûyangeh, neynik.

Meda: f. Dema bihurî, rabirdû, mazî.

Ditirsim ez ji mime pêş muradê

Meda umrî we lem axuz kemalî (M.E.F)

Me'den: Kan

Medad kin: Bînin bi hewarê ve.

Medam: 1. Meyxur. 2. Daîmî, her tim, timî.

Saxer medam pur bade bî

Pur şefqe û xweş-me'de bî (M.C)

Medar: Ya/ê ku tiştêkî li ser hatibe danîn. Debar, sebr.

Ji dil derxe huba vê pêrebûkê

Medara pê bike, der qelbê tu kê (Ş.M.E)

Medarê dunya: Li her derê dinyayê.

Meddah: Pesinker, pesinbêj, pesindar.

Fehmê min e qasir û neşim wesfê eda kim Meddah ji tu ra Xaliqo hindî melekî ne (M.C)

Mededkar: Alîkar.

Mede şane: Şeh neke.

Meded: e. Alîkarî xwestin, hawar xwestin.

Medeh: Medh, pesn, pesindan.

Medfen: *e.* Cihê lê hatiye defînkirin.

Ewî Ebdullah babe, da Amîne,
Medîne û Mekke mewlid û medfen e
(M.X.S)

Medfûn: Veşarî.

Medh: Pesin.

Medhoş-Medhûş: Gêj.

Bi xwûna rezgehê ew mest û medhoş
Geh wek perwane wan dewrane û coş
(Ş.M.E)

Medh û sena: Pesindan.

Medhûş: Şaşbûyî, ecêbmayî.

Medîd: *e.* Dirêjî

Medîne: Navê bajarê Yesribê ku
pêxember koçî li wir kir û li wir wefat
kir.

Medrek: Têgihîştin.

Medrekê 'ilmê demîrê: Cihê ku
zanîna qelbî tê digihe, fam dike.

Medrekê 'ilmê demîrê şemmeyek
wesfa te hat

Wer ne key alem bi şe'nê qedr û
miqdarê te bî (M.C)

Me'dûm: *e.* Tunebûyî, tunebûn.
Tişteki ku peyda nebûye.

Me'dûmî: Tuneşî.

Mebe zalim dibî paşê tu mezlûm
Bi şûrê heqqîyê dê bî tu me'dûm
(Ş.M.E)

Me'dûm û laşey: Tuneşî û netutişt.

Medyenulilm: Bajarê zanînê û mebest
Hz. Elî ye.

Meêk: Bi te ra.

Mefrûş: Raxistî

Meftûh: Vekirî.

Keşfa cemîê raz im

Meftûhê her dîmax e (M.G)

Meftûl: Badayî û geriyayî.

Meftûn: Evîndarê bêheş. Ketina fitnê.

Girêdayî, dîldayî, bengî.

Kî: Ey cîsmî letîfê şibhetê rûh!

Dergahê beden li ber te meftûh (E.X)

Me'fû: *e.* Bexşandin. Efû kirin.

Mefûl: Bireser.

Meger: 1.Îlla, eger ne. 2.Mera, bi raya
Xwedê.

Meges: *f.* Heng, mêşa hingiv.

Min go: Me bi tîxan ve dê nakin ji
derê te Go: Em ji nebat in û li teb'ê
meges î tu (M.C)

Meh: Hîv, heyv.

Meh û sal û şev û roj û dem û kat ez
hemî 'emr

Me boran bi xisaret ta ve kengî hezelî
bit (Ş.N.B)

Mehabet: Heybet, saw, tirs.

Kemendê gîsû yê wê şahibazê

Mehabet da dili şîb û firazê (Ş.M.E)

Mehalat: Ne pêkan.

Mehaq: *e.* Girtin.

Meharet: Hunermendî.

Meharim: Kesên malî. Xizmên nêzik.

Rabûne ve çûne nik hevalan

Çendek ji meharim û ruwalan (E.X)

Mehbes: Zindan.

Mehbûb: Dilber, maşûq. Ya/ê jêhezkirî, xoşewîst. Kesê ku tê hez kirin.

Mehbûs: Girtî.

Mehcebîn: Enîhîv.

Mehcor: Macir, bê têkili.

Mehcûb: Şermkirî, fedîkirî

Mehcûr: e. Terikandin, cudayî, koçber. Kesê hatîye terkkirin, bêkes. Terkkirî. Mişextî, bi êş.

Lê li tûlê asîtanî, "çix" bi wan le'lan kirin Dergehê fethê vebû, îro li mehcûran 'eceb (M.C)

Mehd: Dergûş, landek.

Mehder: Şefaet. Şefa'et, daxwazîya efûkirinê.

Ji zehmet lê bikin avê

Şefa'et kîji bo mehder (M.B)

Mehderçî: Şefaetvan. Mebest pêxember e.

Mehebbet: e. Evîn, xoşewîstî, dildarî.

Işq û mehebet min li bal

Wêran ez im malim xerab

Mehek: Kevirê ku zêr pê tê rindekirin ji bo kifşkirina eyar. Kevirê ku pê xalisbûna zêr ê zanîn. Mîheng.

Ta çendî bi hicra xwe tu min tecrîbe êni! Zêrê ji xwe xalis, mehek û gazê çi hacet? (M.C)

Mehell: Cih û war. Şûn.

Mehelle sewda: Evîngeh, dil.

Dûkel ji herareta siweyda

Rabû tijî bû mehelle sewda (E.X)

Meheq: Da ku mehf bike, bikuje, ji meydane rake.

Mehê new: Hîva nû.

Mehê taban: f. Hîva ronî

Mehfel-mehfil: e. Civat, meclis

Mehfuz: e. Parastî, mihafîzekirî. Ragirtî û veşartî.

Qesda te ew e ger tu b'kî îslaha nefsê

Mehfûz bî ji hebsê (M.M.L)

Mehkûmu 'eleyhî: Ferman lê hate birîn. Bin hukum, bin ferman.

Mehleke: e. Xetera ziyad.

Mehlîqa: Rûhîv, Rûbedew.

Mehlûk: Ji bilî Xweda her tişt. Têkçûyî.

Dinê mehd e û mehlûk_e

Wekî le'b û leyzok e (F.T)

Mehmel: Bar, zorî, dijwarî, ezîyet, nîrê zulmê, texterewan.

Mehmil: Cîyê ku kar lê dibe. Zîn kurtan.

Mehmûd: Mehmûdê Xeznewî. Siltan Mehmûdê Xeznewî.

Mehmûd: e. Paqij, bilind, bi qedir. Qenc û pesendkirî.

Mehnew: Hîva nû, yanî ebrû, birû.

Mehpare: Wateya wê "perçeyek ji hîvê.

Yanî di teheyyir û melal in

Mehpare di haletê webal in (E.X)

Mehpeyker: Ya ku rûyê wê mîna hîvê geş

Mehr: *f.* 1.Roj, tav 2.Evîn, hevhezkirin. 3.Çem

Mehr: *e.* Mehr, mareyî. Heqê marbirîna bûkê.

Hilîne heçî hûr bûyî ber piyan,

Ewe mehre bêşek ji bo horîyan!
(M.X.S)

Mehr-mihr: *f.* Diloanî, şefqet.

Ew xanima şêrinkelam

Mihr e di destê "la"û"lam" (M.E.F)

Mehrem: Bi dizî, tiştê ku ji bîyanîyan tê veşartin, tê parastin, xism û eqrebayên nêzîk. Kesên ji malê, yên zewaca wan li hev nabe. Heram, qedexe.

Ew Zuhre, mîsal-i zerre reqqas

Bû mehremê razê xelweta xas (E.X)

Mehreme: Temezî

Mehremraz: Xwedanraz, razveşêr.

Meh seyr: Ya/ê ku weke hîvê diçe.

Mehrû: Rûyên weke hîvê rûyên bedew.

Mehrûm: Bêbehr, zirbehr, bêpar.

Mehrûr: Tagirtî.

Mehsûb: Alîgir, terefdar.

Mehşur: *e.* Civandî.

Mehter: Amûrên muzîka şer. Muzîkvanên leşkerê Osmanîyan.

Me'hûd: Naskirî, tiştê ku bûye edet.

Meh û Xurşîd: Hîv û roj.

Te divê dil te bi rengê meh û xurşîdî celî bit

Her le jingarê sifir cewher û gewher 'emelî bit (Ş.N.B)

Mehveş-mehweş: Hîva geş. Weke hîvê. Wek delalîya hîvê.

Horya di baxê cenetê

Serdarê çendîn mehweş e (E.H)

Mehwe: Wendabûn.

Ê birî 'eynê beqayê badenoşê 'îşqê bû

Ê bûyî mehwê fenayê aşîqê bêçare bû
(M.C)

Mehweş: Mîna hîvê. Weke hîvê.

Mehwiyet: *e.* Wendabûn, neman.

Mehz: *e.* Safî, xalis, sirf. Rût, tazî. Xwerû, tenê.

Mehzen: Bi tenê, xwerû. Hîç.

Mehzê qudretullah: Hema bi qudreta Xwedê.

Mehzûf: 1.Jêhatîye birin, di cihê xwe hatiye rakirin, hatiye veşartin. 2. Bi tîpên bê xal hatiye nivîsin.

Mehzûn: *e.* 1.Xemgîn, xembar. 2.Awazeke muzîkê ye.

Dilê mehzûn kefarete bit

Kî îmşeb taze mîhman têt (E.H)

Mehzûr: *e.* Tirsnak.

Nikarî ger biçî balayê darê

Çi mehzûr e ku cîbnê bînî xwarê?
(Ş.M.E)

Mehzûz: e. Bextewar. Xwedî par.

Me'idde: Mîde.

Meraqa wî li ser pennîrê qaşar

Dil û sîne me'idde girtibûn nar
(Ş.M.E)

Me'iyet: Guneh.

Mekan: Cî, war.

Mekan girt: Bi cih û war bû.

Me'kel: Xurek. Xwarin.

Ev çende he nî'met û nefaîs

Ev renga he me'kel û melabîs (E.X)

Mekfûf: Bi çembilên xwe ve baş
hatiye girêdan û wek xurcikan hatiye
darvekirin. Hatiye kilîtkirin, xurcik,
yên hatine qedexekirin.

Mekir: Nekir.

Mekkar: Fêlbaz, hîlekar.

Ji wan pîrê sihirbazê di mekkar

Tenê yek ma li meydana xalibê kar
(Ş.M.E)

Meks/Miks/Muks: Navê bajarê
Feqîyê Teyran e. Ev navçe niha bi
Wanê ve girêdayîye.

Ji Çirya Paşîye pêda Melayê Bateyî
kanê Sefer keşa bi Mukse da li ser
weqtê zivistanê (M.B)

Mekkare: Feryad, hawar.

Mekkare çerx: Çerxa xapînok,
mebest dinya ye.

Mekkene: Cih girt.

Mekmen: Veşargeh, pûsû, tele.

Yanî ewî, vî bibit miberhen

Hisna wî bi derkevit ji mekmen (E.X)

Meknûn: Nepenî, veşartî.

Meşhûne ji her yekê xezînek

Meknûne ji her yekê defînek (E.X)

Mekr: Hîle, xapandin, dek.

Çavreşa cadûsîfet ew sahira pir mekr û
fen Çav û bendê vêtikit her dem bi yek
'inwanekî (Ş.N.B)

Mekruh: Kirêt, naşêrîn.

Meks: e. Man.

Mekseb: Kar, tiştê bidestxistî

Meksûr: e. Şikestî.

Mekşûf: Xuyayî.

Mekşûfe terîqê aşînayî

Rûhan qe nekir ji hev cudayî (E.X)

Mekşûf biwîn: Dîyar bûn, eşkere bûn.

Mektûb: Nivîsandî, name.

Mela: Yê ku pişkkirin û parêkirinê da
dibe yekem.

Melabîs: Piranîya melbes e, cil û
alavên lixwekirinê. Cilan, cil û berg.

Ev çende he nî'met û nefaîs

Ev renga he me'kel û melabîs (E.X)

Mel'eb: Pehnavê lîstîkê.

Melahet: e. Bi xweyî. Rindî, xweşîtî,
nazîkî, şîranî.

Yûsif ji melaheta wî mehcûb

Ristem ji şecaeta wî mexlûb (E.X)

Melaîk: Firîşte, melaîket.

Melaîk ji bo wî hene bê 'eded,

Mudamî îbadet dîkin bê meded
(M.X.S)

Melaîke muqerreb: Firîşteyên nêzîkê Xweda.

Mela'în: Melûn, sifeteke şeytane bi wateya pîs û xerab e. Mel'ûnan.

Melal: *f.* Perîşan, sistî, rihtengî. Bêzarî, acizî, zeîfî.

Melam: *e.* Gazin, lome.

Melamet: *e.* Gazin, lome. Lomekirin, rexnelêgirtin.

Ruswayê îşqê tenha ne ez bûm

Kes dî zemanan heb bê melamet?
(M.C)

Melamet ger: Lomeker, serzenişker.

Melbûs-Melbus: *e.* Cil. Kincên bedew. Çekên rind.

Melekwar: Wek firîşteyan.

Gava ku te dîtî ew melekwar

Kifşe ji qumaşê jî xerîdar (E.X)

Melekkîsal: Kese bi nola firîşteyan Yê ku bi tevgera xwe wek firîşteyan in.

Melzûm: Tişt, yan kesê ku ji meriv naqete. Pêwîst.

Melce: *e.* Penahendegah, cihê xweavêtinê. Penah, stare.

Melceyê me Mustefa ye

Himeta wî pur xuya ye

Karê me daîm wuha ye

Ya Hebîbellah meded (M.E.F)

Melek: Firîşte, milyaket.

Çehvên belek qewsên helek

Çerx û felek xalib melek (M.C)

Meleknezer: Çavfirîşte, nêrînfirîşte.

Melek ruh: Ruhfirîşte, canfirîşte.

Melekût: Jîyana Firîşteyan.

Ya Resûlellah resûlê Qureyşî û medenî
Selwîbaxê melekût î û gula her çîmen î
(M.E.F)

Melemme': Rengîn, ronî

Melîh: Xweşik, spehî.

Tu guh dêre nutq û beyana fesîh,

Ji bo ferzueynane merdê melîh
(M.X.S)

Melul: Bêcare, bêgav, bêzar.

Her kesê cîranê min bîta ebed nabit
melûl Min bi ustadê liboyî bulbulî
kerdem qebû (M)

Melû: Komikên paleyan ku ji çend qevdan çêdibin..

Melûf: *e.* Ulfet, pirhezkirina tiştêkî, dostanî.

Melûkêş: Jî ew e yê ku wan dikêşe ser hev.

Me'lûl: Nexweş.

Bekir me'lûlekî j'mêj im

Kul û cerhan mî huda bû (B.B.E)

Me'lûl kirin: Nas kirin, teşxîs kirin.

Me'lûm: Zaniriyak, naskirî.

Mel'ûn: Lenetbûyî, mebest şeytan e.

Memat: Mirin.

Me'mean: Germî.

Memê bi teqşîr: Memê sûcdar.

Memlû: Tijî.

Memlû be dilê wî ji beyanî û meanî

D'gel seb'elmesanî (M.M.L)

Memnû': Ne pêkan, ne mumkin.

Me'mûl: *e.* Tiştê ku jê tê payîn, hêvîkirin. Tiştê ku tê hevîkirin. Hêvîkirî.

Me'mûl-i ewe ji ehlê razan

Ew dê nekirin bi min tinazan (E.X)

Me'mûr: 1.Fermanber, karmend, kesê hatî emirkirin. 2. Ava, abad.

Memzûc: Tevîhev, têkilhev.

Me'anî û lefzê şêrîn tev di nav hev

Wekî şîr û şeker memzûci ke tev (Ş.M.E)

Men: *e.* Minet.

Men: *f.* Ez, min

Men: Ki, kê.

Menahî: Qedexeyîyên Xwedê. Hêram; tiştê nehîrikî.

Vêk da ji menahîyan gelek mal

Yek pûl-i ne hin ji hisnê e'mal (E.X)

Menal: Mal û milk, ritbe.

Nuha nîne mirin bo te menale

Tu her zêde bike mal û menal e (Ş.M.E)

Menam: *e.* Xew, razan.

Menaqîb: Jînenîgarîyan, Pesn û sîfetên qenc.

Menayê sehdê: Du wateya şehadetê.

Menazil: Piranîya Menzîlê ye. Xeta ku stêrk tê da digerin, rêyên stêrkan.

Menbe': Çavkanî, serê kaniyê.

'Enber û bihna bixûrê

Meş'ela Sîna û Tûrê

Menbe'a ava tehûrê

Têt ji zozanê di min (SP)

Mencel: *e.* 1.Mengene 2.Tirpan, das. 3.Qazana mezin.

Mencenûn: Gerdûn.

Mend: *f.* Wekî, mîna, fena.

Mendal: Zarok.

Tîflê xwe xilas ke, dê biçit mal

Mal bo min û ha ji bo te mendal (E.X)

Mendel: 1.Şar û temezî, desmal. 2.Giroverîka ku remildar tê da rûdinin û duayan dîkin.

Ev zînet û xeml û qîşt û mendel

Ez pêş û pes û yemîn û qenbel (E.X)

Me'ne: Wate. Di edebîyata klasîk da bi wateya tiştê derûnî û nedîyar wek gîyan û nefis û hiş tê ku namirin tê bikaranîn.

Men'eref: Hedîseke, xwenasîn, Xwedênasîn.

Me'newî: Mebestî, ne maddî.

Şirîba me'newî bû swarê Şebdîz

Xefiyye bû di seyra rûwê Perwîz (Ş.M.E)

Me'newîyat, ma'newîyat: Hêza me'newî, tiştên me'newî.

Menfî: Neyî, neyînî.

Menfûr: *e.* Sik, lanetkirî, melûn. Tişteki ku kerîh e, Tişteki ku gel jê hez nake.

Menhec: Rêç, rêçik.

Ey saîyê meqseda tewafê!

Wey salikê menheca metafê! (E.X)

Menhiyat: e. Tiştên ne pak .Tiştên ku çêbûna wan nayê xwestin, qedexebûyî

Menî': Zexm, sert û serkeş.

Men'î cem'î zid: e. Du tiştên dijberî hev li cem hev kom nabin.

Menkib û ketfî: Herdu mil,

Menkûr: Kirêt û pîs.

Mekrûhe wekî dehanê ejder

Menkûre wekî Nekîr û Mînger (E.X)

Men lehulqelb: Kesê ku dile wî heye, xudandil.

Menna': Çikûd.

Mennan: e. Nîmetbexş. Navekî Xweda ye.

Menqel: Agirdank.

Êvarê ku asîmanê menqel

Danî û li wan veşarî meş'el (E.X)

Men qetel: e. Kî hate kuştin.

Menqûr: Qulbûyî, nikilkirî.

Menqûş: Neqîşkirî.

Ger dê bibuwa bi derbê menqûş

Ne'dma wehe bê rewac û mexşûş (E.X)

Menseb: Peywir, wezîfe, kar.

Men seqûlet: e. Ew kesê ku mîzana wî giran e.

Mensror: Şad, kêfxweş.

Mensub-mensûb: 1.Çikandî. cîgirtin. Tayînbûyî, kesekî ji bo karekî hatiye hîlbijartin û şandin. 2.Girêdayî nijadekî.

Me'mûr bit bi te mehbet, balayê sîmawerdan

Mensûbî bi te nisbet,kêmayî xwe cewher da (M.M.E.H)

Mensûr: Mensûr Hellacê ku di dema cezba evinê da digot : Ene-l heq, "Ez Xweda me". Gotina Huseynê kurê Mensûrê Hellac.

Mensûr: 1. Nivîsara pexşan. 2. Belavbûyî, reşandi. 3. Hêjayî. Bi serkeftin, serfiraz.

Mensûrî bî: Serkeftî bî.

Mensûrî kirin:1.Kirin weke Mensûrê Hellac. 2.Weke mirarîyan bi qîmet kirin.

Mensûs: e. Dîyar, eşkere.

Mensûx: e. Betalkirî, bê hukum.

Bi Qur'anê xeyrê wê mensûxî bûn, Kemal û fedil bo me pê zêde bûn (M.X.S)

Mensûx kirin: Betal kirin.

Menşe': e. Destpêk, jêder, çavkanî, serçav.

Menşe'a kalam: Bingeh û armancên axaftinan.

Menşur: Belavbûyî, navdar.

Menşur-i kirin bi nûrê pakî

Mestûr-i di nêv qubûrê xakî (E.X)

Menşûr kirin: Belav kirin, vekirin.

Menttîqe-mîntteq: Kemer.

Men xeffete: e. Yên ku karên wî yên baş hindik in.

Menzer: Cihê xuyabûnê, dîmen, nêrîngeh, pencere.

Xebîs-ul menzerek der jora darê Kerîhussewt e wek sewta hîmarê (Ş.M.E)

Menzera xeyalê: Perdeya ku dîmên li ser xuya dibin. Dîmena perdesazê.

Menzil: 1 Xanî. 2.Cihê ku meriv dixwaze bigihîjê.

Sed menzilan pê tey bikin

Ew dê di seyrê kit rewac (M.C)

Menzila tarî: Gor, qebr.

Menzîl: Meqam, cih, wargeh. War, mal, jûr û qonax.

Menzîlet: Paye, pile, payedarî, pilebilindî.

Menzûr: e. Mebest, armanc.

Yanê ew xaneyê gil nabite qabil qet'a

Ne bi çeşmê dilê nazir, ne bi rûyê menzûr (E.X)

Menzûri: Pîvek.

Menzûrî bî: Bête nêrîn.

Mepoş: Wernegire, li xwe neke.

Meqadîr: Miqdar, pîvan.

Çi zeman û çi mekan û çi cîhat û çi hidûd? Çi meqadîr û tefasîl û hesab in çi 'eded? (M.C)

Meqalat: Gotinan.

Temyîz-i dibûn ji hev meqalat

Mimtaiz-i dibûn xwedan kemalat (E.X)

Meqalîd: Mifteyan, bi mana mecazî ji çerxa feleke ra tê gotin.

Eflak û enasir û mewalîd

Exlat û tebayî'û meqalîd (E.X)

Meqam: Cih, Cihê seknê, êwirge, mertebe, paye. 2.Cihê Birahîm Pêxember ku li hember Mala Xweda ye.

Esfaf kirin jiber kilamê

Behsa me gihîşte vê meqamê (H.B)

Meqamet: e. Cih, mertebe, ast, qonaxên ku mutesewif ji tê ra derbas dibin. Di tesewifê da qonaxeke. Pile, rade.

Meqamat: Cureyeke awazê ye di stranan da.

Zînê ku numane wan keramet

Ev çende menazil û meqamat (E.X)

Meqamê malûm: Cihê kifşe yê dostên Xweda.

Meqamê me'lûm: Meqamê naskirî, cihekî bilind. Cihê naskirî. Pile û payeyên bilind.

Meqamê mûtû: Payeya 'bimirin' di tesewifê de. Mebest hedîsa 'bimirin berî hûn bimirin' e.

Meqamê tecrîd: Qonaxa ku sofî digihê piştî. Zehmetkêşîyeke mezin. Qonaxa xwe ji dinyayê pakkirin û hew di Xwedê tenê da fikirandin.

Meqamê wehdet: Radeyeke tesewifi ye. Dîtîna hebûnê hemî, wekî yekîneyeke ku Xwedê di her tiştî da tê xuyakirin. Wehdetulwucûd.

Meqasid: Piranîya «Meqsed»e. Yanî xwestek û hêvî.

Meqber: Gor, goristan.

Ez dê bi cenazeyê wîra bim

Hetta veku meqberan teba bim
(Ş.M.E)

Meqbûl: Pejirandî.

Welê bêxwedan in nehin me reîs

Ku meqbûlî bin nik wî şî'rê selis
(Ş.E.A)

Meqdem: Cihê ling, pêpelûk. Hatîn.

Wan gotine wê ku: xejn:e meqdem!

Halen nexweşin ji me du hemdem
(E.X)

Meq'edê sidqê: Cihê rastîyê, mukâfata rastîyê.

Muq'enber: Tiştê bêhna enberê jê tê.

Meqer: e. Wargeh, cih.

Meqhûr: Têkçûyî, kuştî.

Meqleb: 1.Embar. 2.Xapandin, hîle.

Meqlûb: 1.Vajî. 2.Can, ruh.

Xemê xumrî kemendê zulf ê mehbûb
Xerabe kir ji bin dil kirye meqlûb
(Ş.M.E)

Meqquer: e. Cih, war.

Meqreme: Cilên tenik ên bi hevrişîm.

Îstebreq û sundus in di berda

Çend mi'ciz û meqreme bi serda (E.X)

Meqsed: Armanc û daxwaz.

Çirameqsed te pir bûne?

Bela ye malê dinyayê (M.E.F)

Meqseda eqsa: Miradê mezintir û dûrtir.

Meqseda seramest: Daxwaza ku serîyan mest dike, yanî dirav.

Meqsûd: Armanc, hedef. Miraz daxwaz, xwestî.

Meqsûd ku bibînin te bi çehvên te beşer pûş

Husna te bikin seyr û nebit cismê hîcabê (M)

Meqt: Buxz, nefret. Dijmintî, neyarî.

Meqtel: Şergeh. Qada şer.

Min ji seffeynan ji nîva meqtelê rim tene dil

Lê li wan destan nihîn xwûna xezaya ez şehîd (M.C)

Meqteya ba ê: e. Mebest berata Xweda ye.

Meqtûl: Kuştî.

Me' qûlat: Tiştên ku dikevin 'eql û hişş, tiştên ku derka wan bi 'eql û hişş tîn kirin.

Meqûle: Cur, curê ku hatîye gotin, bûye mewzû'.

Me'qûlî: Baqilî û aramî û giranî.

Mer'a: Çêregeh.

Merah: e. 1.Libat 2. Tevger 3.Cihê çûyînê.

Gelek teyyê menazil rahê dişwar

'Eceb qet'ê merahil kirye ev car
(Ş.M.E)

Meraret: Zirav. Endamekî hundirê merivan e.

Bi wan remza îşaret kir, bi zilfan dil meraret kir

Me zanî dil xesaret kir ku biskan wê kirin çerd e (M.E.F)

Meratib: Rutbe, paye û pile.

Min gote wî: Ey xwedan meratib!

Aya tu xwedanî, ya ne hacib? (E.X)

Merd: Wêrek, mêr, mirov.

Merdane: Bi ciwanmêrî. Mêranî

Merdane di bexşî canê erzan

Heyfa! Ku bimir geranî lerzan (E.X)

Merdê melîh: Merivê qenc.

Merdê qasid: Peykê mêran, merdan.

Merîzad: Nerizin.

Merdum: Meriv, mirov, însan, zîlam.

Merdumên çehvên Melê 'eksa xwe dî

Wek Nîşanî ma li nîşanê xelet (M.C)

Merdumek: Bîbîk û reşka çav.

Merdumekspî: Kor, ama.

Merdumê çeşm: Reşika çav. Bîbîk.

Merdumên çehv: Reşika çav.

Merdûd: e. Pesendnekirî, tiştê ku hatiye redkirin. Qewirandî. Kesê ji ber derî hatiye redkirin.

Mered: e. Nexweşî.

Mere 'eses: Mêrê tarîtiyê (Şevger).

Me şevan cam di kef û yari di ber

Hey hey û suhbet û mêrê 'eses in (M.C)

Mereh: e. Kubar.

Me'reke: e. Şergeh, cenggeh, cihê şer.

Merence: k.s. Dilê te sar nebe..

Merencan: f. Neêşîn û neazirîn.

Mereq: Şorbe.

Merez: Nexweşî.

Me'rez: Pêşangeh.

Înane bi me'reza wicûdê

Kêşane bi menzera şihûdê (E.X)

Merg: f. Mirin.

Mergever: Herêmeke li başûrê Urmiyeyê dikeve sînorên Tirkîyê, Iraq û Îranê ye.

Eslê wî dibên ji Mergever bû

Mehza wî beşer bi şor û şer bû (E.X)

Merhem: Melhem.

Nehist cerha bikim merhem

Me (ne) hal e Xweda zanê (M.E.F)

Merhemet: e. Dîlovanî, qencî.

Me'rîfet: Zanîn.

Me'rîfetnak: Zana, zanyar.

Merî: e. Tiştê ku hatiye dîtin.

Merî'd: Nexweş, nesax.

Me'rîfet: Zanyarî.

Eyb e li bal ehlê eqil

Teftêş bikin me'rîfetê! (F.T)

Merîx: Stêrka piçûk ya nîşana bedbextiyê. Behram, Mars.

Dê ji çerxê pencemîn bêtin, tenezzul kit merîx

Mislê şemsê ger kişînîtin li wan tîxên xezeb (M.C)

Merîxa nehs: Stêrka piçûk ya nîşana bedbextîyê. Behram, Mars.

Merîz: Nexweş.

Gerçî merîz û nexweş û malûl û dîn e
Evî dînî, îman bi der daye, agah ji hal
xwe nîne (X.U)

Merîza: Aferîn.

Merkeb: e. Mêker, ajela barhilgir. Ker

Merkeb ereb: Yên ku xwedî mehînen erebî.

Merkeb'ereban: Yên ku li hespên Erebi siwar bûbûn.

Mehbûbê mîsalê şehlewendan
Merkeb'ereban, xwedan kemendan
(E.X)

Merkebê cehlê: Hilgirê nezanînê.
Kerê cahilîyê, yê ku tiştekî nizane.

Merkeza turabê: Navenda axê. Erd.

Mermûz: Tiştê ku tê îşaretkirin. îşaret
Mewzû'û meqasid û hikayet

Mermûz û menaqîb û dirayet (E.X)

Merqed: Gor, goristan.

Merre: Kerre.

Mersef: 1.Tixûb. Saxlem. 2.Sekana gemîyê. Çakûç, Kuling. 3.Rêzkirin, aheng.

Mersef di nav van meş'elan

Qeta mesafa merhelan (M.C)

Mersîye: Stranên ser mirîyan. stran û lawjekên şînan. Şîn.

Wan mersîye di'stiran bi aheng

Zîn ra bûye pê, bi qameta şeng (E.X)

Mersûl: Hinarî.

Mersûs: Qewî.

Mertebe necaset: Paye û dereceya lewitî û pîs.

Mertebe: e. Paye, ast.

Ev hîmmete xasê aşiqan e

Ev mertebe rahê sadigan e (E.X)

Mertebey wusûl: Asteke bilind e ji bo gihaştina bal Xweda ve.

Me'rûf: Şêx Me'rûfê Kerxî.

Me'rûf: 1. Ji alîyê herkesi ve tê naskirin, navdar, nasker. 2. Ew tiştên şerîat reva dibîne û dicibînê û ferman dike.

Merwane: k.s. Te nebîne.

Merx: 1.Çavkanî. 2.Avzê, çal. 3. Kember.

Da binasî xeterên rê, tu nebi xafilê jê:
Dicle ye, lê di pir in, birbirê pê û ber
û merx (M.C)

Mer'xizar: Mêrg, çîmen.

Merxuzar: Mêrg û çîmen.

Nêrgiza şehla şepal î asemîna
merxuzar Lebxemûş i meyfiroş î
dempiyala ke yî tu (M.B)

Merxûb: e. Tê xwestin. Pesen, dilxwaz.

'Eceb îqbalî ji bo min nihe Xanî ku li
bal Padîşahê xem û derdan wehe ez
merxûb im ez (E.X)

Merxûl: Dirêjkirina deng di stranê de.
Dengê tilûran.

Merzîyye: Razîkirî.

Lew hatime da bikim we razî

Merzîyye bibim li pêşê Qazî (E.X)

Merzuq: e. Ew ên ku rizqên wan tên dayîn.

Mesa: e. Êvar.

Nalîn dike subh û mesa

Em ketne weqtê teresa (M.N.T)

Mesafe: Qonax, navber.

Mesal: Çîrok.

Mescûd: Kesê ku secde jê ra tê kirin.

Ew kesê jê ra secde bûye.

Bê secde te ey cenabê Mabûd!

Adem kire qîblegah û mescûd (E.X)

Mesder: Çavkanî. Rader, Jêder, koka ku peyv jê çêdibin.

Mesdûd: Xitimî, kilîtikirî.

Mesek: Girtin.

Mesele: Pirs, arîşe.

Mes'ele: Pirsên zanistî.

Mes'elegoy: Yê ku mijarekî dibêje.

Xet û xalên te bi mûm û ji me ra meselegoym

Me ji wan haşîyeyan sîne tejî şerhê lûbab e (M.C)

Mes'elexwah: Yê ku rastîyê dixwaze, erbabê dil, ehlê dil, kesê ku ji manewîyatê fam dikan.

Me'ser: Cihê ku têde tirî diguvêşin da bikin mey.

Me'sera heqîqî: Masera rastiye. Tecrubeyên zor yê sofî di rêya tesewifê da rastî wan tê.

Mesîh: Hz. Îsa.

Nageh fikirî ku Mem ji der hat

Bîmarê Mesîh-i dî bi ser hat (E.X)

Mesîha: Pêxember Îsa yê ku mirî sax dikan. Hz. Îsa. Mebest dilber e; ya wekî mesîh e ku evîndarê mirî zindî dike.

Mesîhasifetî: Bi awayê Îsa Pêxember mirî sax kirin.

Mesken: Cih û war.

Meskenê fenayê: Cîhana nemanê, dinya.

Meslehet: Kartekûzî, berjewendî.

Aya te çi meslehet di min dî?

Nîşanê me da te yêkê cindî (E.X)

Meslek: e. Rewîşt, ehlaq.

Tu ku ne salikê mesleka ewlîyayî

Fîr'ewn î, neke de'wayê Mûsayî (X.U)

Meslex: e. Cihê serjêkirina ajelan.

Meslûl: Şûrê kişandî.

Mesmû': Guhdarî.

Mesmû' nekir: Nebihîst, guh nedayê.

Lê hakimê weqtê marîfetnak

Mesmû'i nekir bi sem'e îdrak (E.X)

Mesned: e. Palpişt.

Mesnewî: Navê berhema navdar a Mewlana Celaledînê Romî ye.

Mesrûr: e. Kêfxweş, dilşad.

Mest: Serxweş.

Mestan: Serxweşan, gêjan.

Mestane: Bi serxweşî, weke serxweşan. Mestbûyî, jixweveçûyî.

Mesteîb: Feqîyê talib.

Mester-mestere: Rastkêş, xetkêş, cedwel.

Eger te divê tu binvîsî xetê rast
Tu binvîse xetê xwe d'mesterê da
(M.E.F)

Mestê Tebrîz: Dîwaneyê Tebrîzê;
Şemsê Tebrîzî.

Mestî namîzac: Mesta nexweş.

Mestûr: e. Nixumandî, setirbûyî, veşartî. 2. Rêzkirî, nivîsandî.

Zahir bû cumle mestûr

Di meha paş adarê (M.G)

Mest û xumar: Serxweş, dîwane.

Me'sûd: Bextewar, dilşad.

Mesûl: e. Berpirsiyar.

Me'sûm: e. Bêguneh.

Mesxere: e. Qeşmerî pê kirin.

Meş: k.s. Em jî.

Meşam: Lebatê bêhnkirinê. Difîn, poz, bêvil.

Zînê ku gîhande ber meşamê,
Seydê mirî zinde kir bi damê (E.X)

Meşamê can: Cilên can ku bêhnê digirin.

Meş'el: Ronahî, çira, xetîre. Meşale, agirdank.

Meş'el û fener: Xetîre, çira. Darê serî bi agir e.

Meşhed: Cihe şehîdan.

Gava ku cenaze wan helanîn
Şahid ku ji meşhedê deranîn (E.X)

Meşhur: Navdar, binavûdeng.

Meşhûd: Xuyayî. Dîyar û berçavan.
Tiştên berçav û xuya.

Meşhûd biwîn: Xuya bûn.

Meşhûn: Dagirtî, tijî.

Meşkîn-mişkîn: f. Bimisk. Miskî, ew a bêhna miskê jê tê.

Wesif kir gerdenê mişkîn xezalan
Dil û dîn û ruh û can bir bi talan (E.X)

Meşkûk-teşkîk: 1.Guman, biguman, qelb. 2.Diravên çapkirî.

Neqdê me dibû bi sîkke meskûk

Ne'dma wehe bê rewac û meşkûk
(E.X)

Meşq: Nivîsana gir ku mamoste ji bo hînkirina qutabîyan dinivîse, nivîsîn.

Nûr in ji ser hetta qedem

Neqqaşê ser-meşqê qîdem (M.C)

Meşreb: Avxarwargeh, xûy, adet.
Bawerî, rê. Cihê vexwarinê; vexwarin.

Van meşrebe û eyaxê çînî

Dewran dikirin bi nazenînî (E.X)

Meşreba ilahî: Rêya Xwedayî.

Meşrebe: Surahî, amana vexwarinê.

Meşrîq: e.Rojhilat.

Rojê ku ji meşrîqê numa nûr
Afaq-i kirin ji zîmetê dûr (E.X)

Meşrû': Rewa.

Meşşate: Ya ku bûkê dixemilîne.
Rindçêker, Spehîker.Yê ku dixemilîne,

rind çêdike. Xwedayê ku tiştan bedew
çêdike. Jina xemlînok. Ew jina serê
dilberê şeh dike û wê dixemilîne.

Hûn nebên meşşateyê xef danîye!

Hem qeran kir xal û nîşanê xelet
(M.C)

Meşşate sifat: Mîna xemilkeran.

Meşsiha: Meşî, çû.

Me'sûq: Dilber, hezkirî.

Me'sûq û 'aşiq: Dilber û dildar.

Husn û mehebbet zatek in

Me'sûq û aşik latekin (M.C)

Meşxûf: Pir bi evîn, gêjê evînê.

Meşxûlî: Mijûlî, bilandin.

Bilbil bi gulêd-i sore meşxûl

Hun mayîne şîbhê min di ma'zûl (E.X)

Meşyet: e. Îrade.

Meşyî: Çûn e.

Meta: 1.Gava. 2.Kengê.

Meta': e. Kelûpel, tişt, malê ticaret û
bazirganîyê. Eşya, male firotinê.

Metaê yek: Eşyayê hevdu.

Metaf : Cihe tewafa Mala Xwedê.

Ey saîyê meqseda tewafê!

Wey salikê menheca metafê! (E.X)

Meta' û kala: Pirtal û mal.

Metbû': e. Ew kesê ku xelk peyrewê
wî ne.

Metbûx: Pehtî, pijandî.

Napuxteyî eybekî tamam e

Metbûx-i dibêjinê ku xam e (E.X)

Me teleb: Nexwaze, teleb neke.

Me'tem: e. Şîn, Şînoyî.

Di her hîn û di her lehz û di her dem

Di her an û sine der sûr û me'tem
(Ş.M.E)

Metelok: Gotinên pêşîyan.

Meter: e. Baran.

Metleb: e. Dawa, daxwaz.

Ew heykelê metleba mecazî

Bû mel'ebê tîflê îşqebazî (E.X)

Metle'ê şemsa ehed: Jêdera ronahîya
yekîtiya Xwedê.

Metle': 1.Cihê derketina rojê.
2.Destpêka nivîsarê.

Metleba mecazî: Daxwaza mecazî.

Metlûb: 1.Daxwaz. 2.Tiştê ku tê
xwestin. Dilberên tîn hezkirin

Metmûre: Binax, veşartî.

Metrud: e. Qewitandî.

Xurûr û fexr û 'ucb e karê şeytan

Ji van şeytanî bû metrûdê dîwan
(Ş.M.E)

Metruk: Li cih mayî.

Metrûk û bê hal hiştîme

Her talibê derman im ez (Ş.E.S)

Mevzû-î behs: Mijara behsê.

Me'wa: Hêwir, penah.

Ez mayîme herwekî Zileyxa

Bê Yûsif û bê mirad û me'wa (E.X)

Mewakib: Piranîya mewkib e, ew
kesên ji kesên giregir ra dimeşin,
qetara giregiran.

Salarê mewakîbê kewakib

Serdarê tewalî'û xewarib (E.X)

Mewalîdin: Welidîne, çê bûne, peyda bûne.

Mewalî: Dostan.

Mewalîd: Piranîya mewlûdê ye, zayî, zarok.

Mewani': Astengîyan.

J'ew çende enasir û sehaban

J'ew çende mewani'û hîcaban (E.X)

Mewat: Mirî.

Dikit ihyayê mewatan bi sur û reft û çunê Te nehin bawer û îman nezerê dê û bine (M.C)

Mewe: Pêl.

Meweddet: Evîndarî.

Sultanê wîlayetê mehebbet

Serxeylê eyaletê meweddet (E.X)

Mewc: Pêl

Mewc eda: e. Pêldayîn, dengvedan.

Mewcûd: Heyî.

Mewcûdat: Tiştên heyî.

Meweste tiya: k.s. Tu li nav dinyayê raneweste.

Mewheb: Tişta ku têr dayin, dîyarî.

Mewhûm: Xeyalî.

Mewhûme: Ferz kirî, di eslê xwe da tune.

Sergeşte hatin ew gelek

D'wê nuqtaya mewhûme da (M.C)

Mewla: Xwedayê dostê bawermendan.

Mewlana: e. Di zimanê erebî da bi wateya mezinahîyê ye. Pîrê terîqetê. Li vir mebest Mewlana Xalidê Şarezorî ye.

Mewlana Ziyaeddîn: Leqeba Mewlana Xalidê Şarezorî ye.

Mewlewî: Mela ebdurrehîmê Mewlewî, alim û helbestvanekî klasîk ê kurd e. Bi zaravaya hewramî dîwana xwe nivîsiye.

Mewlê: Xweda.

Mewlid: e. Cihê ji dayîkbûnê. Çêbûna ji dayikê.

Mewqûzet: Kuştina bidar, bidar kuştî.

Mewrid: Ne esil, tişta ji tiştêkî din çêbûye.

Hem mesder in, hem mewrid in
Vê qulzumê ev reşhe da (M.C)

Mewsuf: e. Xwedî sifet.

Mîrî ji wîra bi zîn-i mewsûf

Zînet ji wîra bi dîn-i ma'rûf (E.X)

Mewt: e. Mirin.

Ev hîcr û wîsal û şahîyû xem

Ev mewt û heyet û sûr û matem (E.X)

Mew'ude: Ji keça hê sax dixin qebrê tê gotin. Beriya Îslamê ereban keçên xwe nû bûyî sax e sax dixistin binê erde.

Mewwac: Pêlên pir. Pir bi pêl.

Dil behr e û sed hezari mewc in!

Zahid çi xeber ji behri mewwac?

Mewwicî: Pêl pê ket, li hev ket. (M.C)

Mewzû: Bi rêk û pêk.

Mewzû': 1.Babet. 2.Danandî.

Mewzûn: 1.Peyv û nivîsînên helbestî.

2.Munasib, têr. Birêkûpêk. 3.Kêşa.

Mexafet: Tirs

Mexare: Şikeft.

Mexbûn: Xapîyayî. Mezlûm.

Mexdûm: Kesê ku jê ra xizmet tê kirin. Yê ku xizmeta wî tê kirin, kesê mezin û qedirbilind.

Hazir wî dibî meqamê malûm

Ger xadime wî digêrê mexdûm (E.X)

Mexfer: Kumê hesinî.

Mexfî: Veşartî.

'Erş û kursi hêj di mexfî bûn di kenza qudretê

Husnî heq bû îstîwayê lamia 'îşqê hebû (M.C)

Mexfur: e. Efûkirî, azadkirî.

Mexfûr: Nuxaftî.

Mexîd: Dew.

Mexleb: Neynûkên ajelan, pençeyê teyran.

Mexlûb: Binketî, têkçûyî.

Mexlete: Hîlekari.Şaşkirin. Cihê xeletîkirinê.

Wê dikit mexlete her dem li herîfan bi cedel

Bi du caman vedixwun sîretê ebyedû weswas (M.C)

Mexlûq: Xuliqandî, aferîde, meriv.

Hemî emrê te ne zahir nihanî

Tu cêtir îşê mexlûqê xwe zanî (Ş.M.E)

Mexlût: Tevlihev.

Mexmer: Firaqa meyê.

Mexmor: Mest, xewgêj.

Mexmur: f. Meyvexwarî.

Mexmûm: Xemgîn.

Mexmûr: Serxweşbûyî, serxweş, jixweçûyî, mest.

Ji dil daxwazê yarê me

Qewî mexmûrê bade me (Ş.E.A)

Mexmûrqeba: Kirasxemrî, fîstansor.

Mexmûr û mest: Serxweş û gêj.

Mexrib: Rojava.

Mexrîb û meşrîq: Xafîqan.

Mexrûr: 1.Qure. Pozbilind.
2.Xapîyayî.

Mexrûri kirin: Xapandin.

Mexsûl: Şûştî.

Mexsûs: Bi taybetî.

Mexşûş: k.s. Nepak, Tiştêkî toz girtiye.

Mexûf: Bi tirs, tirsnak.

Mexz: e. Qinik.

Mexzî: Mejî.

Lêkîn hemîyan yeke yeqîn dost

Ferqa ku heye ji mexzê ta post (E.X)

Mey: Eraq, şerab, mey.

Medhûsê serab û meya îşq im bi helalî

Sergeşte û dîn im (Ş.E.A)

Mey, ney, def, çeng: Amûrên muzîkê ne.

Meya dûş: Meya guvaştî.

Meya kuhne: Meya kevn.

Meya me'rîfetê: Badeya me'newîya zanîna heqîqetê.

Meya mizac: Xwîn.

Dîza ceger û dilê zicacî

Teqtîr-i bikin meya mîzacî (E.X)

Meyan: *f.* 1.Nîvek, orte. 2.Newq, noq.

Ew rehmetê cimle alemîn bû

Adem di meyanê ma'û tîn bû (E.X)

Meybaze: *k.s.* Ji destê xwe dernexe.

Meyê nab: Meya zelal û safî.

Meyê nabî: Şeraba xalis, meya xalis.

Meygûn: *f.* Rengemeyê. Wekî meyê.

Bide filkê dilim hin narê meygûn

Temaşa kim li vê behra hemî xwûn (Ş.M.E)

Meyit: Mirar .

Meyitê sedsalê ji wê rêveber qebrê kevit Dê vejî, rûh bête ser sata xweh bîtin zînde ye (M.C)

Meyked: Cihê vexwarina eraqê, meyxane

Meykede: *f.* Meyxane.

Meykeda qidemê: Meyxaneya pêşîn; çavkanîya evîna Xwedayî.

Meykeş: *f.* Ew kesê ku meyê dide xelkê.

Meyl: Balveçûn.

Meylê xeta ye: *k.s.* Tu mebêje ev tişt wiha ye û wiha ye.

Meynet zede: *f.* Giriftarî zehmetê bûyîn.

Meynoş: Meyvexwer.

Ji wan derwêşê meynoş ê di pir nûr

Ji vê deryayê dewrana bi der dûr (Ş.M.E)

Meyteles: Jixweçûyî, serxweşê meyê.

Me'yûs: Bêhêvî.

Hindî weku Mem ne bûyî mehbûs

Hêja nedibû ji weslê me'yûs (E.X)

Meyxane: Cihê mey vexwarinê.

Meyxur: Eraqvexwer, meyvexwer.

Meyxur û mest im meger meddahê esilzade yim

Ez ku îro serxoş im xelqo ne mestê bade yim (M)

Meyyilîn: Meyl kirin.

Meyyit: Mirî.

Me'z: Bizin.

Mezahib: *e.* Pirjimarîya “meseb”ê ye.

Mezheban, terîq û rêyên şopkirî.

Mezaliman: Binsiteman, bindestan.

Mezaq: *e.* Çêja dev. Tam, çêj. Tamkirin.

Rûniştine bê mezaq û meşreb

Winda kirine zîqen di xebxeb (E.X)

Mezar: *e.* Gor, goristan.

Mezbeh: *e.* Cihê serjêkirina ajelan.

Mezbût: Girtî, rakêşayî.

Mezc: Têkilî. Li nav hev xistin, li nav hev kirin.

Mezher: *e.* Tiştê tê xuya kirin, cihê tê xuya kirin. Derketin. Cihê xuyabûnê. Xuyaker, diyarker. Diyargeh.

Ev reng ji axretê di mezherî
Yûsif bi cernal bûye meşhûrî (S.H)
Mezhere: Xuyakirina xal, dîyaririna
awayê xwe.

Mezin biket: Mezin bike.

Mezîdufîh: Zêdehî.

Mezlem: *e.* Tarî.

Geh nûrê numane gah-i mezlem
Geh sûrê numane gah-i matem (E.X)

Mezleme: *e.* Zilm, Cihêzilmê.

Mezmer: Veşargeh.

Heryek ji tera we bûne mezher!
Ew renga di wan tu bûyî mezmer!
(E.X)

Mezmûn: *e.* Naverok.

Mezre': Zevî, mezra, erd.

Di nîva mezre'ê sîne defîn ke
Ji derdê sîne ra dane rehin ke (Ş.M.E)

Mezre'ey ummêd: Cihê ku hêvî lê
heye.

Me'zûl: Dûrketî û bi tene.

Me'zûlî: Dûrxistina ji fermanbarîyê.

Me'zûn: Bi destûr. Destûrê.

Me'zûr: *e.* Xwedan 'uzr. Bêguneh.

Mêhman-mêhîman: Mêvan.

Cedy û Hemelê di asîmanê
Biryana û kebabê mêhîmanê (E.X)

Mêhr: 1.Evîn. 2. Roj

Mêlak: Kezeb, ceger, cegera reş.
Sed keser min jê di dil nalîn ji ber tîn
bêhisab

Lew ji ber narê evînê cerg û mêlak
bûn kebab (M)

Mêrînî: Mêranî.

Mêrûle: Moristan, gêrik.

Mêter: Seyisê hespan, xizmetkarê
hespan.

Mêw: *k.s.* Dara tirîyê.

Mêyrewem: *f.* Diçim.

Mêzer: *k.s.* Şaşik.

Mi: Min

Miadat: Neyarî.

Lewra ku mexûfbû ew milaqa
Melzûme li aşiqan miadat (E.X)

Miadil: Hevta.

Aya, ne te çêkirin miqabil!
Heryek te bihevkin miadil! (E.X)

Mialif: Hogir.

Hin mi'telifin, hinek mixalif
Hin mixtelifin, hinek mialif (E.X)

Mianiq: Kesên ku hevdû hembêz
dikin.

Têkda di minasib û miwafiq
Vêkra di misafih û mianiq (E.X)

Miateb: Bergazin.

Geh gah-i Sitî dikir mixateb
Ev renga ew melek miateb (E.X)

Mibahî: Helal.

Mibexxerat: Cureyên bixûrê.

Mibeyyen: Beyankirî.

Mi bir xwe dilxwaz: Ez serketim
şertê dilxwazê mafê min e.

Mibtil: Betalkirox.

Micadil: Yê ku têkoşîn dike.

Micedded: Teze, Ji nûve.

Micella: Ronî, cîlakirî.

Fîlcumle kirin bi rux micella

Goya ku kirin bi zêr mitella (E.X)

Micenned: Civandî, komkirî.

Mi'cer: Gulac, kofi, serpêç.

Micerreb: Tecrûbekirî.

Micerred: Rût.

Micessem: Bi cîsm û laş.

Micezza: Parçekirî.

Mi'ciz: Mi'cîzeyên Pêxember.

Midad: Hibr, murekkeb.

Midamî: 1.Berdewam. 2.Meyxur,
serxweş.

Vî meclisê meyxuran midamî

Mestane bike ji nû midamî (E.X)

Midbir: Bi dek, fenek.

Midebber: Yê ku tedbîra wî tê girtin.

Middea: Tiştê ku tê dozkirin.

Miderris: Mamoste, fêrker.

Naxwande sebeq, miderrisê am

Bê mal û menale, sahib-în'am (E.X)

Midewwer: Gilor.

Mi dihn da: Min dêhna xwe daye.

Midxem: Tiştê ku di tişteki da winda
dibe

Midîll: Kesê ku mirov avare dike, rê
derdixe.

Miemmer: Navsal, extiyar.

Miennes: Mê.

Miettîrat: Dermanên bêhnxeş.

Mecmû-i bike miferrîhatan

Mexlût-i bike miettîrat (E.X)

Miewwel: Te'wîlkirî. Tefsîr kirî,
şirove kirî.

Mieyyen: Kifşe.

Miferrîhat: Tiştê ku kefxweşî didin.

Mifîd: Dayoxê mefayê.

Miflis: Bêpere, nedar.

Mifriq: Sifir, paxir, mis.

Mift: Belaş.

Mifte: Kilîd.

Kenza xwe qufl û mifte kir

Hêj wê di qufl û mifte da (E.X)

Mihal: Tiştê bê pêkan.

Teqrîr û edakirin mihal e

Tedbîr û dewakirin betal e (E.X)

Mihce: Sergul.

Mihenna: 1.Hinekîrî. 2.Kêfxweş.

Serpence û naxunê mihenna

Roncîdeyê xatirê mihenna (E.X)

Miherra: Hêrayî.

Mihessel: Tişte ku bi dest dikeve.

Miheyra: 1.Amade. 2.Vejandî.

Mihîbb: Evîndar, dost.

Ger qismê mihîbb-û ger hebîb in

Elbette bi dijmin û reqîb in (E.X)

Mihît: Plan, pêşnûma.

Mihlîkat: Tiştên ku meriv dibin
helaqê.

Mihman: Mêvan.

Kî mîhman canê canan e

Li ser çehvê me mihvan e (E.H)

Mihnet: e. Zorî, eziyet, derd. Êş, perîşanî, azar, kul, kovan, bela.

Mirdin buwe mîrawî heyat: k.s. Merivê ava jîyanê dabeş dike, belav dike.

Mirov: Meriv,însan.

Mirre: Hêz, quwwet.

Mirwet: Merivatî, însaf.

Mihnet'ebes: Êşa ku li vala diçe. Zehmetîya pûç.

Mihnetkeş: Zehmetkêş.

Zehmetpirê mihnetkeşê

Lê nazikê teb'etxweşê (F.T)

Mihr: 1.Roj. 2.Evîn, hezkirin.

Mihrab: Navbera birûyan ku mihraba mizgeftê ye. Pêşî, pêşber. Di mizgeftê da cihê mela.

Mihrabê qewseynan: Pêş herdu kevanan, di nava herdu birûyan.

Mihra butan: Hezkirina dilberan.

Mihra şehinşah: Hezkirina şahê şahan. An jî hezkirina Xwedê.

Mihrdar: Hezkar, dilovan.

Azarî mihrdaran ne dî

Lê destê bedkaran ne dî (M.C)

Mihredar: Evîndar.

Mihrê enwer: Roja bi ronî.

Mihrê Sipihîrê: Roj, roja gerdûnê, roja kaînatê.

Mihriban: Jina ku serkara mala giregirekî yan jî mîrekî ye.

Mihriq: Şewitandox.

Mihr û Muşterî: Roj û stêrka Muşterî. Navê mesnewiyeke bi farisî ye jî. Çîroka du evîndarên navê wan Mihr û Muşterî ye. Helbestvanê faris 'Essarê Tebrîzî ev nivîsî ye.

Ew yarê ji dil, ne serserî bû

Reh şibhetê mihr û Mişterî bû (E.X)

Mihtal: Bi hîle, hilebaz.

Miîn: Alîkar.

Mijdê: k.s. Mizgîn, beşaret.

Mijgan: Bijang.

Ji mijgan geh dirêjim daneyê dur

Tijî kir gencê sebra wek sedef pur (E.X)

Mikaşefat: Tiştên ku tên kifşkirin.

Mikatebat: Tiştên ku di navbera hinekan da tên nivîsîn.

Mikedder: Şelû, ne zelal.

Neynîkê xiyalê bû mikedder

Ayîneyê aqlê bû mixebber (E.X)

Mikellel: Xemlandîyê bi gewheran

Mikerrem: Qedirbilind.

Ev renge felek hemî miezzem

Ev çende melek hemî mikerrem (E.X)

Mikerrer: Li dû hevdu.

Mikewwenat: Hebûyin.

Milaqat: Hev dîtin.

Milebbes: Bi cil.

Milettex: Lewitandî.

Milezzezat: Tiştên biçêj.

Perhîze ji qismê miştêhatan

Teqwaye ji van milezzezatan (E.X)

Milh: Xwê.

Mil keç bû le tekyana: Yên ku di tekyayê da milên xwe xûz kirine û bi perestîne.

Milkeçî: k.s. Peyrewkirin, li ser rêya wî bûn.

Milzem û xîrk: Mişar

Mimkînat: Piranîya «Mimkun»e . Yanî pêkan e.

Mimkun: Tiştê ku pêkan e.

Mimnaz: Bijare.

Mimted: Direj.

Min: Ji.

Minall: k.s. Zarok, mindal.

Minazî': Kese ku pevçûn dike.

Min be'd: Ji piştî.

Mindal: k.s. Zarok.

Mineqet: Nuxtekirî.

Ev cîsm-i li min bûye mixettet

Ew xet hemî bûyîne mineqet (E.X)

Min'ekîs: Ronahîya ku di neynikê, yan avê da dixuye.

Min'em: Kesê ku nî'met dibîne.

Minennas: Ji xelqê.

Minewer-Minewwer: Ronahî, bironî, ronak.

Minfeil: Tiştê ku tesîr dibîne.

Min heysilbeşer: Ji alîyê merivahîyê ve.

Minîr: Tiştê ku ronahî dide.

Min ledun: Zanîna ku Xwedê dide qûlên xwe, zanîna ku ne bi hînbûnê tê bidestxistin.

Min nediînanane wucûdê: Min nediafirandin, min nedianîn hebûnê/jiyanê.

Minnet: Spasdarî, minet.

Minqad: Stûxwar.

Minşar: Birek, xizar. .

Minteha: Dawî.

Minzem: Zeliqandî.

Min î le'nete: k.s. Xweperestî, ezîtî.

Miqarin: Beranber.

Bê wasîte wan kirin miqarin

Bê fasîle ew bi hev siparin (E.X)

Miqbil: Ew li ber me hat.

Miqdar: Çendîtî.

Miqebbes: Girtoxê çirîskê.

Qelbê vî ye wadîya miqeddes

Rûha wî bi nûrê Heq miqebbes (E.X)

Miqeddîme: Dest pê kirin.

Bêjin ku miqeddîme çi reng e?

Ev heyrete, ya xiyalê beng e (E.X)

Miqerreb: Nêzîkbûyî.

Miqerrebîn: Serekên firîşteyan.

Hun vê seferê xelet me xûn in

Şahîd ji me ra miqerrebûn in (E.X)

Miqerrrer: Tiştê ku tê biryarkirin.

Miqirme: Meqreme, qumaşê ku jin pê rûyê xwe vedişêrin.

Miqessem: Pişkkirî, parçebûyî.

Da zen nebirî micessemim ez

Ser ta bi pîyan miqessemim ez (E.X)

Miqewwîyat: Tiştên ku hêzê zêde dikan.

Miqeyyed: Girêdayîyê di qeydê da.

Miqîm: Rawestox.

Miqtebis: Girtoxê çirîskê.

Miradat: Piraînya «Mirad»e.

Mirahiq: Kurê ber balixbûnê.

Miraqîb: Kesê ku dikeve miraqebê.

Weqtê weku ew dibû miraqîb

Rûha wî dibû li cîsmê xalib (E.X)

Mirarî: Dur: Gewhereke giranbiha ye.

Muresse' teyr û qemçî ne rex û rex
belg û rêşî ne

Hemî zêr û mirarî ne li ser enîyê
temenna bû (B.B.E)

Miraselat: Tiştên ku di navbera
hinekan da tên şandin.

Mir 'at: Neynik, eyne.

Ya Rebb xetê reyhanî ye ser sûretê
Qur' anî ye

Yan xatema sultanî ye, mir 'at e, yane
menzer e (E.X)

Miratê felek: Asîman.

Mircan: Sor.

Mirdan: Xortên ku hêj rî û sinbêlên
wan nehatine.

Mirdar: Berate, laşê ajelan ê mirarî.

Welêkin ser çiqê bala yê serkeş

Veniştî 'ekkuwek mirdara wek leş
(Ş.M.E)

Mirde: Mirî.

Mirdûş: k.s. Kesê mirî jî.

Mirebbe': Rûniştîyê civatkî.

Erşek ji cewahiran miresse'

Belqîs-i celîsê wî mirebbe' (E.X)

Mirexxes: Bi destur.

Edî ne dibûn ji hev mişexxes

Te d'go hemî mîrekin, mirexxes (E.X)

Miresse': Neqîşkirî.

Miretteb: Rêzgirî.

Meclis bibitin bi wan mizehheb

Tehnîyye bibit ji nû miretteb (E.X)

Mirewweq: Zelal, safî.

Mirincan: Yê ku canê xwe mirandîye,
feda kiriye.

Mirîd: Peyrew.

Xwes divê efwa Mecîd e

Tulekê babê Seîd e

Ger bixwahî ew mirîd e

Bîne Dîwana xwe (Ş.E.S)

Mirsel: Şandî.

Bi hukmê Seyyêdê mirsel

Nebîyyê axir û ewwel (M.B)

Mirşid: Nîşandayoxê rê.

Mirtaz: Razî.

Dîsan ve gerim ji ba we reqqas

Mirtaz-i bibim bi cenneta xas (E.X)

Mirwit: Mirwet, însaf, wijdan.

Mirx: Teyr, balinde, çûk.

Mirxîzar: Bexçe balindeyan / teyran.

Serwêd-i çi cûyebarekîn e?

Teyrêd-i çi mirxîzarekîn e ? (E.X)

Misafih: Yê ku destê yekê dişidîne.

Misal: 1.Sûret. 2. Wek mîna. 3. Gotinên pêşîyan, metelok.

Misebbab: Ya/ê ku ji sedeman tê zanîn

Esbab û wesîle qet nemînin

Carek te misebbabî bibinin (E.X)

Miseffa: Safîkirî.

Misefîd: Ya/ê ku îstîfade dike.

Misexxer: Bin ferman.

Misellem: Teslîmbûyî.

Misenne': Nexşkirî.

Serleweheyê sefheyê misenne'

Zîbende bi zîwerê miresse' (E.X)

Miselsel: Zincîrî.

Misewwer: Çêkirî, bi şîkl û sûret.

Miseyqel: Biriqandî.

Misale: Wek, mîna.

Misalê asyab: Weke aşên avê.

Misalê murcan: Wek mircanan.

Misbah: Çîra, ronî

Mishef: Qur'an.

Feyza 'ulûmê hikmet cama sedef ku gêra Me j'destê muxbeçan dît bi mishef û bi ayet (M.C)

Mishefa husn û cemalê: Pirtûka rindî û bedewîyê, rûyê bedew.

Miska ebyed: e. Miska spî.

Miskê ezfer: Miska bêhnxeş.

Miskibo: Bêhnmisk, bêhnxeş.

Miskir: Serxweşkiro.

Mecmûê mibexxerat û mi'tir

Memzûcê miferrehat û miskir (E.X)

Miskînxişam: Dawîya baş, aqibeta rind.

Mislê: Wek, mîna.

Mismar kirin: Zixt lê dan, mix kirin.

Misr: Malik.

Misrê dil: Bajarê dil. Misr cihê ku Hz. Yûsif tê da hatiye firotin û bû kole.

Misrî: Navê cureyek şûr e.

Misr û beled: Bajar, şar.

Mist: k.s. Kulm.

Mistear: Emanet.

Mistecme': Civîngeh.

Mistexreqê nî'met û tereb bûn

Mistecme'ê şahî-yû leeb bûn (E.X)

Mistefad: Ya/ê ku jê îstîfade tê kirin.

Misteîd: Şagirtê ku nû dest bi xwendinê kiriye.

Mitleq tu mifîd û mistefadî

Bê şîbhe mirîd û hem miradî! (E.X)

Mistek: Wirwarek, çengek.

Mistemend: Rebên, perîşan.

Wan pirs-i kirin ji xelqê bendî

Halê wî feqîr û mistemendî (E.X)

Mistemî': Guhdar.

Ey mistemî'ê mesal û teswîl!

Wey mictehidê qiyas û te'wîl! (E.X)

Mistesqî: Vexwarox.

Mistesqîyê şerbeta meya nab

Axir ku nebûn bi şîrbê têrab (E.X)

Mistewcib: Li gorî.

Mistewî: Dûz, rast, misawî.

Wer'a wî we rengî dîn qewî kir

Şer'a wî sîratê mistewî kir (E.X)

Mistexreq: Noqbûyî.

Mistû: 1.Mizdan. 2. Mest. 3. Germî.

Miş: Meş, bi meş.

Mişextî: Penaber, sirgûn

Mişgîn: Reş mîna miskê.

Mişîr: Amûra îşaretkirinê.

Mişkat: Kulik. Penceroke ku çirayê tê da datînin.

Bejna letifa enwer e

Qamet bi mislê erer e

Mişkatê nûra Ekber e

Jê tê bixûra Zulcelal (SP)

Mişk bêzî: Bi bêhn, bêhndar.

Mişketê îzedî: Çiraya Xwedayî.

Mişkîbo: Bêhnisk, bêhna miskê.

Mişkîn: Ji misk. Miskkirî, bêhnxeş.

Wesif kir gerdenê mişkîn xezalan

Dil û dîn û ruh û can bir bi talan
(Ş.M.E)

Miş: Tije.

Mişteha: Tiştê ku dil dibijê.

Ev çendehe middea û metlûb

Ev rengahe mişteha û mehbûb (E.X)

Mişterî: 1.Kirîdar. 2.Stêra Mişterî.

Miştin: Gevizandin, têwerkirin.

Mitabiq: Li gorî hevdu.

Miteaqid: Kirînox û firotox.

Bê şertê kefactê rewaye.

Şertê miteaqidan rizaye (E.X)

Mitehher: Paqij.

Saqî! Bike kaseya micewher

Wê şîreyê ma'sera mitehher (E.X)

Mi'tekîf : Peresdarê di mizgeftê de.

Mi'telif: Hogir.

Wan mi'telif an-i pêkve ulfet

Axir we kirin, nema çu külfet (E.X)

Mitella: Avzêkirî, avzîvkirî.

Mi'temîn: Ewle, pêbawer.

Gavek sekinîn û mitmeîn bûn

Hîna ku bi yekve mi'temîn bûn (E.X)

Mi'tir: Dermanê bêhnxeş.

Mitî: Binferman.

Mîrê ku felek mitî ferman

Go: Sibhe nebûyî, qewmê Bohtan
(E.X)

Mitmeîn: Dil bi cî, bawerker.

Mitrib: Sazvan.

Mittehîd: Yekbûyî.

Bê şibhe yekin; çî ten, çî erwah

Ew mittehidin ; çî can, çî eşbah (E.X)

Mittesil: Zeliqandî.

Miwafiq: Bi dil, pejirandî. Hevbiryar.

Miwasa: Alîkarî.

Miwessem: Bi nişan.

Mixebber: Bi toz.

Mixedderat: Keç û jinên piştperde.

Hindî ku hebûn di şehre meşhûr

Xatûn û mixedderat û mestur (E.X)

Mixelled: Hertim, Ebedî

Mixelledun-nar: Yê ku tim di agir da dimîne.

Yek secde ne bir li pêşê exyar

Qehra te kire mixelledun-nar (E.X)

Mixettet: Xêzkirî.

Mixeyyer: 1.Guhartî. 2.Bi kêfa xwe.

Neqşê ku Xwedê kirî mixeyyer

Kî qadîre wî biket mixeyyer? (E.X)

Miyan: k.s. Kember, navqamet.

Miyan: Nîv, senter. Di nav da.

Mizab: Helandî.

Mizac: Tevlihev. Xûy û siruşt.

Dilim qendîlê Rewzê bit

Lebim mîzabê Hewzê bit (M.C)

Mizacim: Xûyê min, zewqa min.

Mizebzebîn: Xapînokê durû.

Menna'û mizebzebîn û îblîs

Xedda'û xeberbezîn û telbîs (E.X)

Mizehheb: Avzêrkirî.

Mizekker: Nêr.

Mizewwir: Derewçîn, derewker, virek.

Mizmehil: Tiştê ku di tişteki din da winda dibe.

Mizrab: Midrab. Darê pê daholan didin.

Mîzrabê zebanê xelqê nasaz

Bê perde ka bû terane perdaz (E.X)

Mizraq: Rim.

Kirim amancê mizraqan

Di dil da tîrî çûn faqan (M.C)

Mî'ad: Civangeh. Dema pêkanîna sozê.

Mîared: Hênijandin, xelandin.

Mîbered: Guhartin, guhastin.

Ke dil ra tabî her çîneş bi kufrê mibered dineş

Zi tabî ce'dê muşkîneş çi xwûn uftadi der dilha (M.C)

Mî'cer: Laçika ku jin li serê xwe dipêçînin.

Mîdared: Bilindkirin.

Mîdrac: Pê bi pê.

Mîet: Sed.

Mîftah: e. Kilîd, mifte.

Mîhîn: k.s. 1.Mezintir. 2.Sivik.

Mîhman: Mêvan.

Mîhmanî: Ji bo mêvanan.

Mîhfer û sekne: Miqar.

Mîhnetkêş: Zehmetkêş, azarkêş, belakêş.

Zehmetpirê mihnetkeşê

Lê nazikê teb'etxweşê (F.T)

Mîhnetkêşî: Derdkêşî.

Mîhr: 1.Evîn, xweşî, dostî. 2.Roj

Mîhrabî biro: Birûyên wê wekî mihraza mizgeftê ye.

Mîkoned: f. Dike.

Mîlah: 1.Delalî. 2.Bayê ajotina keştîyê/gemîyê.

Mîlel: Neteweyan, miletan.

Enwaê mîlel xwedan kitêb in

Kurmanc-i tenê di bê hesêb in (E.X)

Mîmê mulk: Tîpa mîmê ji peyva “mulk”.

Mîm û Hê: Du tîpê di alfabeya erebî da ne. Ev tîp kurtkirina Mihemedê

Hekarî ye. Ev mexleseke/leqebeke
Feqîyê Teyran e.

Mîm û hê û waw yê: Mehwi.
Helbestvanekî klasîk ê zaravaya soranî
ye.

Mîna: 1.Şûşe, neynik. 2. Kulîlkek e.
3.Qedeha meyê.

Tuxra ku zer nîşan kir dav bilbile
malxirab Seba 'enber vişan kir mînayî
reng da ciwab Gule xunçe 'eyan kir bi
hal û xef da ciwab (M.G)

Mîna gerdin: k.s. Gerdenspî.

Mînen-nas: Ji merivan.

Mîneş-şerqî: Ji rojhilat.

Mînha: e. Îstîsna kirin, cuda kirin.

Mîn ledun: e. Ji Xwedê ve. Îlahî.

Mînna: ji me.

Mîno: Bihuşt.

Mînû: Bihuşt.

Narinc û turunc û nar û leymû
Newbaweyê şaxîsarê mînû (E.X)

Mîqado: Leqebeke împaratorên
Japonî ne.

**Mîq'ne'e û mîqreme mehreme û
hamme:** Ser.

Mîqras: Meqes.

Bê qalib û bê mihît û mîqyas

Bê alet û bê mişîr û mîqras (E.X)

Mîr: Fermanbidest, hukûmdar.

Mî'rac: e. Pêpelûk, pêlêk, merdîwan,
mertebe û meqamê me'newî yê bilind

û pîroz. Bilindbûn, çûyina pêxember a
li cem Xwedê.

Mîranî: Malmîran.

Îro bi min ra xweş nîye

Dêmxawera mîranî ye

Nabim ji wê bêhêvî ye

Her racîyê efwan im ez (Ş.E.S)

Mîrat: Mir'at , mîrêk, eyne.

Husn û mehebbet zatek in

Me'şûq û aşîk latek in,

Lê sûret û miratek in

Her yek di me'nayê xwe da (M.C)

Mîraw: k.s. Ew kesê ku avê bi ser
çandîyaran/cotyaran ve dabeş dike,
belav dike.

Mîrewem: f. Diçim.

Mîrê ecel: Ezraîl, Firîşteyê mirinê.

Bê mîrê ecel bi ser me acil,

Roja mine umr-i çûye êvar (E.X)

Mîrê mîran: Padişahê mezin. Mebest
Xweda ye.

Em çûne huzûrê Mîrê mîran

Wî hakimê hakim û feqîran (E.X)

Mîrfeqe û mustened: Balgeh.

Mîrfeq: Enîşk.

Mîrî: Fermî

Mîrsed û mînhac û terîq: Rê ne.

Mîrza: Navê mîrê Bazîdê yê ku di
dema nivîsandina Mem û Zînê da bû.

Mîsaf: Wijdan, însaf

Mîsal: Mînak, numune.

Mîsaq: Peyman.

Ela ya eyyuhe's-saqî xudane 'ehd û
mîsaq î Hulo siwarê Boraqî here pêş
Xaliqê Ekber (M.B)

Mîsbah: Çira.

Mîsbah û nûra kulekê

Ew horîya meşwerdekê

Çi b'kim bi dewra felekê

Dûr kir ji min kovan im ez (Ş.E.S)

Mîskîn: e. Hejar, feqîr.

Mîsl: Mîna

Mîsra': Baskê derî, baskê şî'rê,
perçekî ji du perçeyên wî.

Mîşan: Mîyan.

Mîşk: Misk.

Mîşkat: Fanos. Kulek, çiradank.

Mîşkate Hemel: Fanosa Beran,
mexsed jê Birca Beranê ji 12 bircên
rojê ku di Newrozê da roj dikevê.

Mîter: Ronahî, roj; yanî kesekî îlmê
ku wek camê ye ji xwe ra nake roj û li
pey ronahîya wî naçe.

Kes nakete mîterê_xwe camê.

Ranagiritin kesek nîzamê (E.X)

Mîwan: k.s. Mêvan.

Mîwe: k.s. Mêwe, fêkî.

Mîwek: Qulpik, mehîke.

Mîxfer: Kumê ku leşker didin serê
xwe.

Mîxwahem: f. Dixwazim.

Mîzac: Xûy, siruşt, tebîet.

Mîzan: Pîvan, terazî, mêzîn.

Modemed: f. 1.Bêhndayîn, pîfkirin
2.Biba, hatina bayê.

Mo l'te bidîtin: Meriv li te bidin.

Mu'adat: Dijminî.

Mu'adil: Wek hev.

Mualif: Li gor hev, hogirî hev bûyî.

Mu'amele: Dan û standin.

Mu'aniq: Di hemêza hev de.

Mu'anîd: Rijd, ingir, înad.

Munafiq: Durû.

Mu'ateb: Lomekirî, gazin jê kirî.

Muaxat: Biratî.

Mubada: e. Nebî nebî! Nebe nebe!

Mubah: Rewa û durust.

Mubahat: Şanazî, medih.

Mubarek: Pîroz, bimbarek.

Mubdî: e. Afirande, çêker.

Ewe mubdî'ê fi'lê kasib tuyî

Cezakarê fi'la ku talib bûyî (M.X.S)

Mubeddel: Guhertî.

Mubeddel ke bi bax û bosîtan

Muferreh ke dilê pîr û cuwanan
(Ş.M.E)

Mubeddîl: e. Bedêl, guhartin, guhirî.

Muberhen: Bi belge û delîlan isbat
bûyî.

Mubexxirat: Bixûr û darikên ku bi
şewitandinê bêhneke xweş didin.

Mubeyyen: Xuya û dîyar.

Mewcûdê kirin bi hev mûeyyen

Ezdadê kirin bi zidd mûbeyyen (E.X)

Mubîn: e. Rûvekirî, dîyar, zelal, xuya, eşkere.

Hemdi be hed bo Xudayi alemîn

Ew Xudaye daye me dîni mubîn (M.B)

Mubtela: Yê ku bela pê ketiye, nexweş, dîwane. Belagirtî, yê ku ketiye.

Were pêşber "Melayê" xwe

Şehid û mubtelayê xwe (M.C)

Mubtela bûn: Pê ketin, li wan xuya bû.

Mubtelaye: Bi derd, xemgîn, belakêş.

Mubtil: Pûçker.

Mubxîd: e. Nefretker, rikker.

Mucadil: Kêşedar. Yê li hember yekî dikeve nakokîyan.

Mucbir: Bi zor e.

Mucedded: Nûbûyi, nû.

Ma bi 'îş û noş û şahî ew qeder 'umrê te bit Çendeki salik mucedded bit û bê, zarê te bî(M.C)

Mucella: Şayik û pak. Geş û ronî.

Ey ayîneyê dil bi cemala te mucella

Sed sefhe bi yek zerre ji nûra te mutella (E.X)

Mucenned: Yê ku ji bo leşkerîyê amade bûyî.

Mucered: e. Rû, تنها. Sade, xwerû.

Bi tu tiştî ve negirêdayî, serbixwe.

Nezewicî. Rûtbûyî, bêpar.

Mucerreb: Azmûnkirî, hatî ceribandîn.

Mucessem: Bi cisim, bil aş, li ser xwe. Ji surê ji balkêşî û xwînşîrîniyê çêkirî.

Bedel yara perîpeyker sîfethûr

Sehîserwa mucessem heykela nûr (Ş.M.E)

Mucewher: Bi gewheran neqîşandî.

Mucewher qefesek nûranî ye dil

Muşe'se' kohekî tûranî ye dil (Ş.M.E)

Mucezza: Parçe parçe.

Mucîb: e. Bersivdana li nik daxwazê.

Ew qedaya barîye, razî bibe ey mal xirab! Belkî bîtin mûcîbê narê ji bo te ew xitab (E.X)

M'ucîb: e. Ew ê ku erênî bersiv dide.

Mu'ciz: Weke mûcîzeyekê, mûcîzane.

Tiştê ji edetê der.

Ku j'mu'ciza xummarîyan

Rûh bê te dîsa ser gîyan (M.C)

Mu'ciz'amûz: Mucîzehîner.

Mu'cize: e. Bûyerên xarîqul'ade. Ew karê ku nuwaze ye, hiş û 'eqlan mat dike, ne karekî ku meriv karibe pêk bîne.

Mucmel: e. Kin, kurt, qut, bi kurtî.

Mucmelen: Bi giştî, bi tevahî.

Mucme'un 'eleyh: e. Ehlê sunet hemî wekî min difikirin.

Muctehid: Yê ku meseleyekê vedikole û dîtina xwe tê da dibêje.

Muctemî: e. Yên civîyayî, yê civandî.

Weha renga tiştê weh, ku muctemi'
Li wê bûne mu'min, eya mustemi'
(M.X.S)

Mudaef: e. Qat bi qat, du carkî.

Mudaf: Raveber.

Mudafu-îleyh: Raveker.

Mudaim: e. Her tim daîm.

Mudam: e. Daîmî. Timî, her gav,
herdem, her tim. 2.Mey.

Mudamî: e. Her tim, bi dewamî.

Mudara: Qedandina bi nermî.
Dîyarkirina nermiyê li ber dijminekî
yan nezaneî.

Mudamî di destê xeman da zebûnem
Mudamî dixum mey bikim da mudara
(E.X)

Mudare: Dan û standina bi zanîn û
rêk û pêkî û nermî. Îdare.

Mudare û depr: Debara jiyanê.

Mudari': Dema niha.

Mudar û teskin: Hêwirî û hogirî.

Mudawa: Tedawî, dermankirin.

Ceger rîşî mudawa ne kirî

Bikujî aşiq û perwa ne kirî (M.C)

Mudbir: Stêrka bêyomîyê.

Mudde'a: e. Tiştê tê xwestin. Mebest,
daxwazî. Iddiaya evîndariyê.

Mudde'a metlûb: Daxwaz û xwestek.

Mudde'î: e. Ew kesê ku îddî'a dike.
Kesê ku îdî'a evînê dike.

Û hem jî mudde'î bûn ew ku goya:

"Em in umînet" dibûn bêtirs û goya
(Ş.M.E)

Muddeteş: Dema wê

Muddetul'umrî: e. Muddetê jiyanê.

Mudebbir: Tevdîran dîkin.

Muderris: Mamoste, fêrkar. Dersda.

Muderrisê 'am: Mamosteyê giştî.

Mudewwer: e. Glover. Girover.

Xalên mudewwer filfilîn, mawer ji
bîskan lê werîn

Zulfên perîşan têne mest, bêhna biha
wan e xerez (M.C)

Mudhammetan: Reşbûna ji ber
avdanê.

Mudmîn-mûdamî: Meyxwer

Mudter: Perîşan, bê çare.

Mudxem: Di hev de.

Mu'ella: e. Bilind.

Mu'ellim: Mamoste, fêrker.

Defterê îşqê neda dest te mu'ellim ji
ezel Me'neya ayetê husnê li te lew ma
mesitûr (E.X)

Mu'emma: Tiştê ne her kes tê
dîgihîje. Şîfre. Tiştên ku herkes
nizane., tiştê bi zehmet û tevlihev.
Tiştê zehmet ku kes nikare jihev
derîne.

Gelek nukte mu'emma û sir û raz

Ku tê da bin ziyade îşekî şaz (Ş.M.E)

Mu'emmîr: Saldar, kalemêr.

Mu'enber: Emberkirî, bi enber.

Muennese: Mê.

Mu'eqeb: *e.* Cezaxwar.

Mu'erref: Dîyarkirî

Mu'ettel: *e.* Bêkar, vala.

Mu'ettel dê bibin xurde hemî tev
Mûheqqeq wê fena bîn ev ro û şev
(Ş.M.E)

Mu'etter: Itirkirî, Bi bêhna xweş.

Ji wê bihna xweş û zewqa tamam em
Wuha mest û mû'etter bûn û bê xem
(Ş.M.E)

Muewelke: Tewîla bide.

Mu'eyyen: Nasandî.

Mu'eyyen li kes le'netê tu meke,
Li ehlê 'ezabê 'umûmen bike! (M.X.S)

Mu'ezzem: Mezin.

Lutfa te şeyatîn ji sema kirne
mureccem Ger tu nebuya qet nedibû
çerxê mu'ezzem (M.B)

Muezzin: *e.* Bangbêj, bangder.

Mufa: Mefa, çare. Derman, feyde.

Yar li ber zaran îcaz e
Şerbeta şêrîn mufa ye (M.C)

Muferreh: *e.* Dilxweş, dilşad.

Muferrihat: Her tiştê ku kêfê dide.

Mufessel: Cuda, Veqetandî.

Mukemmel, muttesil, xalis, mutehher
Mufessel mu'teber etwel çi eqser
(Ş.M.E)

Mufessel ke: Ji hev veqetîne,
mufessel bike.

Mufesser: Tiştê ku tê dîyarkirin,
dîyarbûyî.

Muflis: Kesê bê pere, nedar.

Mufred: Yekjimar.

Mufsid: Fitnekar.

Mugîmin: Rawestane.

Muhaba: Cudakirin.

Muhacir: *e.* Koçker, koçber.

Muhal: Ne pêkan.

Bi vî terzî muhal e wesla meqsûd
Dibit lê ev penîrê taze mefqûd (Ş.M.E)

Muhal e menzil: Gihiştina armancan
ne pêkan e.

Muhasere: *e.* Dorpêçkirin.

Muhbet: Hezkirin.

Muhce: Rovî. Hinav, giyan.

Muhdîy û hadîy: Delîl in.

Muheddeb: Cihê bilind, gir.
Encumê çerxê muheddeb her ji zatê
tey şerîf

Kesbî enwarê bikin hetta ku nefxa sûri
bî (M.C)

Muhammed le serzemîn: *k.s.* Li erdê
navê pêxember Mihemed e.

Muhenna: Hinnekirî.

Muheqqeq: *e.* Misoger.

Muherra: Genim û dextlê di enbaran
da veşartî.

Bi narê qelbê cama pur muberra
Ewan sotin dilê pîra muherra (Ş.M.E)

Muheyya: *e.* Amade, hazir.

Heçî qenciya ku tu xalis bikî,
Ewe ê ji bo xwe muheyya dikî
(M.X.S)

Muhirdar: Dilber, evîndar.

Muhîb: e. Hezkirî.

Tu şehînşah î besî min ji butan

Ne muhîb her ne kes û xar û xes in
(M.C)

Muhib xirab: Dostê neqencan.

Muhît: e. Deryaya mezin.

Aşiqan rahetî kême

Agir û pêta dilê me

Çend hezar medhan dibême

Mûhîtê esman im ez (F.T)

Muhkem: Xurt û asê.

Muhlet: Fersend.

Limin ferz e bikim namûs û xîret

Mutî'ê emrê bim, nedmê tu mûhlet
(Ş.M.E)

Muhr: Mohr.

Muhr: Kuri, hespê hîsan.

Muhredar: Marê jehrawî.

Hukkam-i ji cinsê şahê mar in

Eshabê simûm û muhredar in (E.X)

Muhriq: Tiştê ku dişewitînin.

Muhrî: Morîkên bînîrx.

Serî ba muhri bû bikr û dilaram

Mîzacê rûh ê tê kafûrî bû tam (Ş.M.E)

Muhsînî: e. Qenckiroxe.

Muhtesib: Ew kesê ku serokatîya
pasvanan dike.

Da şehne û muhtesîb nebînîn

Şahî bi civin çu xem nemînin (E.X)

Mu'în: e. Alîkar.

Ji ferzane nesba îmamê ku dîn

Hîfîzkit, ji mezlûmîre bit mu'în.
(M.X.S)

Muj: Mijang, mijgul.

Muje: f. Mijang.

Mujgan: f. Bijang, mijang. Mijgulê
çavan.

Ew çi mujgan in çi tîr in, ew çi elmas
in bi qal?

Qatîlê xwînrêz û xwûnxwir pîr qîtala
kê yî tu (M)

Mujgînper: Mijangên weke tîrên bi
per.

Mukaşefatê bil'xeyb: Diyarkirina
nediyaran.

Mukatebatê mehmûd: Nameyên herî
baş, mebest Qur'an e.

Mukedder: Tozgirtî, rengçûyî.

Lîkê der eşqê miskîn hebîtin

Mukedder her ji destê wan dibîtin
(Ş.M.E)

Mukellel: Xemilandî, tacdar.

Mukellel heykelek husn û cemal e

Çi ahûçeşmek e gerden şemal e!
(Ş.M.E)

Mukerrem: Bi qedr, hêja.

Ey serwerê dîn, mehbete ayatê
mukerrem Îsme te ye hindî sefehan
buye mufexxem (M.B)

Mukerrer: e. Pircaran, dubar.

Mukeşefat: Diyarkirin û dêrînan,
keşfkirin, têderxistin.

Muketebat: Nivîsar, ji bo hevdu name nivîsîn.

Mukewwen: *e.* Durustkirin, hatiye çêkirin.

Mukewwinatê ‘alem: Tiştên ku vê cîhanê saz dîkin. Element û beşên hebûnê.

Mul: Tije, bade.

Mulaim: Aram û nerm.

Mulaqat: Hevdîtin.

Mulaqî: Rastî hev hatî.

Ji nûra bade û dîdara saqî

Heye ba dîlberê dil bit mulaqî (Ş.M.E)

Mulazim: Xizmetkar, bedrest. Kesê bi yekî ve girêdayî, xizmetkar.

Di deh salan mulazim mam û yarê rû neda carek

We ger ne, yar eger rû dit heye carek di salê da (M.C)

Mulebbes: Bi cil û berg.

Mulettex: Lewitî.

Mulettex meke qet perê mushefan

Bi tiştê necis 'emd û hem mescidan (M.X.S)

Muletex meke: Nelewîne, qirêj neke.

Mulezzezat: Her tiştên çêxweş.

Mulhaza wî: Mulaheza wî, anîna wî ya ber çav.

Mulhid: Xwarbûn, kesê ziyanker.

Mulhim: Yê ku îlhamê dide.

Mulhimê xeybê weh îmla dikirit

Meded û feyzi ji rûhil qudus in (M.C)

Mulkê ten: Welatê laş.

Multemes: Xwedîyê daxwazê, yê ku karê wî tê dîtin.

Bêje, ji çi nûrê û tecella li çi tûrê?

Geh geh li sera perdeyê can multemes î tu! (M.C)

Multeqa: Cihê hevdîtinê.

Pur mulazim tê lîqayê

Mame hetta multeqayê (M.C)

Multeqit: *e.* Yê zarok emanet hilgirtiye.

Wesî yû qeyyim, multeqit, muste'îr,

Îmam û xizim, salih û destegîr (M.X.S)

Mulûk: Piranîya “melik” e, yanî şah.

Mumeyyîz: *e.* Cuda, bijarte. Cudaker, jihevcihêker.

Mumerred: Hilû.

Mumîdd: *e.* Alîkar.

Mu'mîn: *e.* Bawermend, Îmandar.

Fîlcumle, çi ewwel û çi axir

Elqisse, çi mu'mîn û çi kafîr (E.X)

Mumînat: *e.* Bawermendên jin.

Mumkin: Tişta ku dibe û dikare û diqewime hebe.

Mumkinat: Her afrîdeyên Xwedê.

Mumkinulwucûd: Ew afrîdyê ku dikare hebe û dikare nebe jî.

Mumkin û masîwa: Her tiştê ji bilî Xwedê di hebûnê da.

Mumtaz: *e.* Bijarte, berguzîn.

Mumted: Dûr û dirêj.

Mumtelî: *e.* Dagirtî, tije.

Muna: Umîd, hêvî (yê ku daxwaza alîkarîyê jê tê kirin).

Munadî: *e.* Gazîker.

Munafat: Dîtinên zit. Terkkirina hev. Ziddiyet, li dijîbûn, nexwestin, dijber.

Çi munafat û lîzûm in çî qiyas û çî mîsal? Ev çî tewlid û çî terkib e çî rûh in çî cesed? (M.C)

Munafî: *e.* Tiştê ku di wateya wê da tunebûn hebe.

Munazî': Şerxwaz, şerok. Yê ku dikeve nava şerê devkî. Yê bi gotinan şer dike.

Muncelî: *e.* Ronî, Bi nûr, şuledar.

Mun'ekîs: *e.* Wênewergirtî.

Mun'ekis: Vegeriyayî

Mun'ekis bûn: Şewq li hev vedan.

Mun'em: Nîmetdar, Xêrpêbûyî.

Xizan û geda we bûne mun'em

Miflis bûye jinberest û muxlem (E.X)

Muneqqeş: *e.* Nexşandî, nigari.

Muneqqeş bûn cîbal e

Ji palal û beybûnan (M.G)

Muneqqet: Xal xalî.

Munewer: Rewşenbîr, ronakbîr.

Metle'ê wechê hebîba min sefeq jê hate der Rewneqê da Kohê Qaf alem munewer bû ji ber (M)

Munezzeh: *e.* Jê dûr, ne tê da ,pak.

Paqijê ji nepakiyan.

Me jî gel wan 'efû ke ey şehînşeh

Bi fezla zêde û cûda munezzeh (Ş.M.E)

Munfe'îl: *e.* Têkçûyî, aciz.

Munfe'îl in: Aciz in.

Munîr: *e.* Ronî, ronîdar.

Munîs: *e.* Heval, hogir.

Mûnisê derd û xeman im sakinê beyt-ul hezen

Tar û mar im,întîzar im,sehsiwara min nehat (M.B)

Munkîr: *e.* Ew kesê ku înkara Xwedê dike. Yê ku înkâr dike, qebûl nake.

Min rê ji serabê bi şerabê bir, û munkir Hetta bi ebed teşne ceger ma di serabê (M.C)

Munkir est nadan û e'ma: Yên ku înkâr dîkin nezan û kor in.

Munqad: *e.* Teslîm, serîdanîn. Ajelên ku li pey meriv dimeşe.

Heçî hukmê şer'ê tu muhtacî bî,

Ji bo zanîna wê dê munqadî bî (M.X.S)

Munqelib: Sernixwîn, berevajî.

Munserif: Di zîmanê erebî da, peyvên ku dawîya wan bi “tenwîn” û “cerr”ê qebûl dîkin, yê ku guherbar.

Muntexeb: *e.* Tiştê ku hatiye hilbijartin.

Muntezîr: *e.* Çavîrê, libendêbûn. Çavnêr.

Munzele: *e.* J aliyê Xweda ve hatiye şandin.

Munzem-mundem: Bi hev ve.

Muqabelet: Li hember.

Muqabil: *e.* Pêşber, beramber.

Muqabil hat û rawesta

Du xadim dest li ser desta

Li pêşî dîlberê westa

Hilat roja l'dinê dabû (B.B.E)

Muqarin: Li ber hev.

Muqate: *e.* Cedela bi înkare.

Muqbil: Stêrka bextewerîyê.

Muqebbes: Şewq wergirtî. Mebest
serpêhatîya pêxember Mûsa ya li Turê
Sîna ye.

Qelbê wîye wadîya mûqeddes

Rûhê wî bi nûrê heq, muqebbes (E.X)

Muqedder: Hesibandî, jîmartî.

Qedera hatiye nivîsandî.

Ji ezel aqibetê karê ku me'lûmi ne bit
Camê mey noş û ji teqdirê muqedder
meke behs (M.C)

Muqeddime: Pêşgotin, di ilmê
Mentiqê da muqeddime têgehek e yanî
destpêka gotinê ku li ser wê encama
rastî û nerastîya wê gotinê ava dibe.

Muqeddir: Qederan datînin.

Muqellîd: *e.* Teqlîdker.

Muqerrebb: Kesên nêzîk.

Muqerrebbîn: *e.* Firîşteyên ku pir
nêzîkî meqama Xwedê ne.

Muqessem: Parçe parçe.

Muqesser: Kurt, qut, kin, kurtayî

Muqessir di behê: Kêm biha

Muqewwes: *e.* Mîna kevan, kevanî.

Ji xeyri te nevê kes min

Bi reştûzên muqewwes min (M.C)

Muqewwiyat: Hêzda, şîyanbexş.

Muqeyyed: Girêdayî.

Muqim: Hertim.

Muqîm: Niştecih, ehle cî.

Min heyf li cotê sorgulan

Zulfê muqîm li ser milan (F.T)

Muqtebis: Yê ku pêtekê ji nav agirekî
ji xwe ra dibe. Mebest hev dîtina
Xwedê û Hz. Mûsa li çiyayê Tûrê ye.

Muqtebis bûn: Ronî ji hev standin.

Muqteda: serwer, serdar, pêşîvan,
rêber, pêşeng.

Muqteza: Li gor, bi nisbet.

Murad: Xwestî, xwestek.

Muradat: Pîranîya murad e, yanî
xwestek û mirazê mirov.

Murahiql: Xortê nû balixbûyî.

Muraqib: Nerînvân. Di tesewifê da
kesê ku hal û rewşa xwe û gerdûnê
dipê û tîrsa xwedê dikeve dilê wî ji ber
vê gelek razên Xwedê dibîne jê ra
dibêjim muraqib.

Muraselat: Şandina nameyan ji hevdu
ra.

Muraselatê lareyb: Nameyên beşik,
mebest Qur'an e.

Murcan: Mircan. Mircan sor û di
deryayê da digihjin.

Niha sertaci heybet çû di burcan

Verêtin qelbi ber can rengê murcan
(Ş.M.E)

Murdan: Xortên hêj rû û sinbêlên
wan şîn nehatine.

Murdar: Kujek, kujok, kujon, qatil,
kujer.

Ev e şeytên bi carek birye talan
De ka rabin nebin j'wan sistê murdar
(M.E.F)

Murde: Mirî.

Murdeçirax: Çira vemirî

Murdî'an: e. Emînê zarokan, şîrdayî.

Murebbe': Li ser textê desthilatdarîyê
rûniştî.

Mureccem: Recimbûyî

Murekkeba qebayib: Hibra karê
kirêt.

Muresse': e. Nîşane, Madalyaya bi
zêr kildayî. Neqîşandî.

Muresse' teyr û qemçî ne

Rex û rex belg û rêşî ne

Hemîzêr û merari ne

Li ser enyê temenna bû (B.B.E)

Muressem: Neqîşkirî, kêşayî.

Muressex: e. Bidestûr.

Muretteb: e. Barkirî. Rêzkirî,
nijinandî, bi tertîb.

Eser ku li fi'Iê muretteb dibit,

Bi îcad ij fi'Ia wî peyda dibit (M.X.S)

Murewweq: Safî û pak.

Murexxes: Destûrdayî.

Destûrwergrîtî.

Murîd: Xwestiyar, xudanvîyan.

Murîde ji bo xeyr û şeran welê,

Riza wî tunîne bi şola nelê (M.X.S)

Murîdê muqbil: Têgeheke tesewîfî ye
wateya wê ev e; Kesê Xwedê di dilê
wî da ronahîyekê geş dike û piştra
razan pê dide naskirin û dîtin.

Murîdê wasil: Peyrewê gihiştî
daxwaza xwe. Di tesewîfê da kesê
vîna xwe vîna Xwedê da winda dike.

Murîs: e. Sedema peydabûnê.

Mursel: Hinartî, şandî.

Bi hukme seyyide mursel nebiyê axir
û ewwel

Betal kir dînha mucmel bi ayat û bi
Qurane (M.B)

Murşîd: Yê ku we'z û îrşadê dike,
rêya rast nîşan dide. Rêber, yê ku rêya
heqîqetê nîşan dide.

Ger dixwazî tu ji dest nefse xelas bî ey
betil

Wer bibîne murşîdê kamil terîqa bê
misil (M.M.E.H)

Murtaz: e. Riyazet, Mebest xwe
birçîkirina ji bo kuştina nefsê.

Murtaz bibim: Bigerim.

Murted: e. Ew kesê ku ji dîn
derketiye.

Mucedded ke tu her le'net di her hîn

Li wî qewmê xebîsê murted ê dîn
(Ş.M.E)

Murteda: *e.* 1.Hilbijartin. 2.Eyîşandin
3. Yê ku jê razî ne. Jê razîbûyî,
bernavkekî Hz.Elî ye.

Murtesim: Resimkirî, çêkirî.

Ew nusxeya alî îsim

Lewhek divê jêra cisim

Da herfî lê bin murtesim

Herfan şikil-nûrîyye da (M.C)

Murtefî': *e.* Bilind.

Muruwwet: Însaf.

Ji destê van reqîbê bê muruwwet

Dixwum her daîma pur zor û zehmet
(Ş.M.E)

Murwe: Mêranî

Murwet: Însaf, wijdan

Ez dixew da bûm mi dî bêmurwetan

Rête canê min nîşanî rast û çep
(Ş.N.B)

Murx: *f.* Sîmir. Teyr, balinde.

Yanî şehrih û can,murxê dil ê aşîyane
Mahê sema ya qelban,mîrê melekmişal
î (H.F.H)

Murxê nîmbesmel: Balindeyê nîv
serjêkirî, Balindeyê ku “bismillah” li
ser hatîye gotin û nîvê stûyê wî hatîye
birîn.

Murxê seher: Balindeyê ku sibehan
distire.

Murxi: Navê balindeyekî ajela ku nû
serê wê jê dibe.

Murxî bê wade: Çûka bê wext.

Murxîzar: *f.* Wargeha, balindeyan.

Nêrgiza sehlaşepal î,asimîna murxîzar
Lebxemûşê meyfirosê dêmpeyala kê
yî tu (M.B)

Musafih: Dest di destê hev da.

Musahim: Hevrê, hemra.

Musa'id: Alîkar.

Felek bo kes musa'id nîne ey can
Muheqqeq dê fena bin ev ten û can
(Ş.M.E)

Musayî: Cihû.

Musebbeb: *e.* Yê ku bûye sebeb,
sedem.

Gelek salan mûsebbîh Nûra macid
Û hem şûle veda ew şem'a qasid
(Ş.M.E)

Musebbîb: *e.* Ew ê ku sebebana li hev
tîne. Sedemsaz, sebebçêker. Mebest
Xweda ye.

Museffa: *e.* Hatiye pakkirin.

Museffa dê bi der bê gotina wî

Bizan bêfeyde nabe sotina wî (Ş.M.E)

Musella: Sicade. Cihê nimêjê.

Musellem: Bê berxwedan teslîm bûn.

Ji fertê îştîha ew pîrê fanî

Musellem ev xeber lê bû 'eyanî
(Ş.M.E))

Muselsel: Zincîrîkirî, honandî.

Muselselehayê mişkîn: Kezîyên weke
zincîran û yên bêhna miske ji wan tê.

Muselsel turre tuxra: Gulîyên weke
mohra padişah bêmînak û rind
honandî.

Musemma: Tiştê ku nav lê tê danin.
Binavkirî. Navdar, tiştê ku nav lê hatiye kirin.

Musemmat: Navlêkirî.

Çi Incîl û çi Tewrat in
We mensûx in we mulxat in
Bi wan navan musemmat in
Hukum çû kenze Rehman (M.B)

Musenna: Dudi, duqiloçî.

Musenne': Xemilandî.

Çi rast e leysê fil îmkani ebde
Ku mîmma kane xweş bûye
mûsenne'(Ş.M.E)

Museref: e. Bextmezin.

Musewwer: Çêkirî, bişiklbûyî.
Ez çûme derê derê min dîtî ku
Rûhîllah Têkda di musewwer bûn
hetta vînihalîn da (E.X)

Musewwir: Ressam, wênesaz.

Musexxer: Bindestkirî, di xizmetê da.
Bi naz û şîwe geh gahî fikir ceng
Musexxer kirbû mülkê vî dilê deng
(Ş.M.E)

Museyqel: Çirûsî û biriqî.

Mushefa cemale: Qur'ana ciwanîyê.

Musirr: Rikdar.

Muskir: Serxweşker, mey.

Muste'an: e. Yê daxwazîya alîkariyê
jê tê kirin. Mebest Xweda ye.

Muste'ar: Tiştê ku meriv ji bo
demeke naskirî ji hinekan distîne da
ku pişt ra li wan vegerîne.

Mustecab: e. Maqûl, erênî.

Mustecmi': Yê ku tişt li xwe
civandine.

Mustedam: e. Berdewam.

Mustefa: Mistefa, navekî Mihemed
pêxember e tê wateya "bijarte".

Mustefîd: Feqîyê ku hîn nebûye mela.

Mustehesnat: e. Tiştên qenc.

Ji ew paş ku zanî te ev wacibat,
Tu guh dêre şolê di mustehsenat
(M.X.S)

Mustemend: Hejar, pêdivî. Feqîr û
miskîn. Xemgîn û jar. Bêmeded.

Mustemir: e. Dmandin.

Muste'id: Feqîyê nêzî îcazê, yê pir
xwenda. Amade. Feqîyê ku pirtûkên
wî li ber.

Mustemî': e. Guhdar. Guhdayî.

Weha renga tiştê weh, ku muctemî',
Li wê bûne mu'min, eya mustemî'
(M.X.S)

Musteqbel: Dahatû, Dema li pêşîya
meriv. Dema bê, hatin.

Bi musteqbel de wer fir de,nizani
Ji bo te ka çî ye ku bit 'eyanî? (Ş.M.E)

Musteqîm: Rast.

Musteri: Muşterî, kirîdar.

Mustesqî: Dilxwazê vexwarinê.

Mustetî: e. Paqij, paqijkirî.

Mustewî: e. Cîgirtî.

Û hem ser neyîstanê al û eshab

Çû zer'ê mustewî ber saqê pur ab
(Ş.M.E)

Mustewî kir: Rast û dûz kir.

Mustexas: Parêzer, parêzvan.

Mustexnî: *e.* Bê pêdivî, ji pêdivîyê dûr.

Çira dil xwîn e gul mustexnî ye ew?

Çira şem'ê wuha dil pêtî ye ew?
(Ş.M.E)

Mustexreq: *e.* Noqbûyî, xeniqandî.

Mustimend: Rejî, ew ê wekî rejîyê/komirê lê hatî.

Muşabih: Şibandin, dişibihe.

Muşawerê û rayê: Bi şewr û şîret.

Muşe'se': *e.* Belavbûna tîrêjên ronahîyê.

Mûşe'se' Nûra safa pak î tahir

Wekî durrê Yetîm tîsa sena ki (Ş.M.E)

Muşewweş: *e.* Tevlihev, têkilhev, serûbinbûyî, gêj.

Min noşî û serxweş bûm, filhalî
muşewweş bûm

Ez çar û neh û şeş bûm, min tekye bi
balîn da (E.X)

Muşexxes: Nîşankirî, naskirî.

Muşikbar: *k.s.* Yê ku barê wî misk *e.*

Muşkil: Pirsgirêk, arîşe, problem.
Zehmet, zor.

Muşkîle: Alozî, arîşe.

Muşkîl guşa: *f.* Yê ku arîşeyan çareser
dike. Mebest pêxember *e.*

Muşkîneş: Miskkirî, wek miskê reş û
bênhxweş.

Muşrîkistan: Welatê muşrîkan.

Muştaq: Kêf. dilxweşî. Dildayî. Yê
ku bêrî dike.

Muşteha: Tiştên ku dilê meriv dibije
wan.

Muştehat: Xweşîyên jîyanê.

Muşteq: Çêbûyî, ji tiştêkî din çêbûyî.

Muşterik: Hevbeş, şîrîk.

Muşterî: 1.Navê stêrkekê ye. Stêrka
Sibehê. 2.Kirîdar, kirdox.

Mutabiq: Weke hev.

Mu'tad: *e.* Tore, xûy, edetî,
kevneşopî.

Hasil: ji înad, eger ji bêdad

Ev bîd'ete kir xîlafê mu'tad
(E.X)

Mutala kirin: Nêrîna pirtûkan ji bo
xwendin û lêkolînê.

Mutbîqîyet: *e.* Seranser dagir dike.

Mute'aqid: Du alîyên firotinê. Kirîdar
û firoşkar.

Mu'teber: *e.* Hêja, nirxdar.

Şubhê Melê dimînî esîr

Guh dêre qewlê mu'teber (M.C)

Mutedîl: *e.* Navçe, devnêrm.

Mutehher: Pak.

Mutekellîm bîlalîsan: *e.* Bi bê ziman
diaxeve. Mebest Xweda ye.

Mu'tekif: Kesê di xelwetgehê da
mayî.

Mu'telif: Hogir.

Mutella: Avzêrkirî, zêrîn.

Mu'temin bûn: Li hev bawer bûn.

Muteneffis: *e.* Henaseder, ruhê ku nefesa xwe dide û distîne.

Muterra: Bêhneke xweş, misk. 2. Ter û nazik.

Muterra turreya: Tarî, gulîyên kezîyên reş.

Ji neqş û sun'ê cebbarî

Muterra turreya tarî (.M.C)

Mutewwel: *e.* Dirêj.

Mutewellid: Çêbûyî.

Mu'tir: Bêhnxeş.

Mutî': Yê stûxwar ku çi jê tê xwestin dike.

Mutleq: 1. Serbixwe. 2. Bi her halî, bi yek car.

Mutmein: *e.* Biryar girtin, zexm sekinîn.

Mutme'in bûn: Bi hev hêwirîn. Aşt û aram bûn.

Mutrib: Sazkar, sazband.

Ji xeyrî yar û saqî mutrib û mey

Mexwaze zêde ta dil pê bibit hey
(Ş.M.E)

Mutrik: Terkkirî

Muttehem: Kesê tometbar û bergumanbûyî di gunehkarîyekê da.

Muttehid: Yekgirtî.

Mutteqîn: *e.* Yên ku xwe ji gunehan diparêzin.

Muttesil: *e.* Bi hev ve zeliqandin. Peyderpey, pê ve pê ve.

Mukemmel, muttesil, xalis, mutehher
Mufessel mu'teber etwel çi eqser.
(Ş.M.E)

Muttesîl: *e.* Hemî, hemîdem.

Muyesser: Bi dest ketî. Pêkhatî.
îlahî digel me bi lutfa xwekî,
Heçî ku sewabe muyesser bikî
(M.X.S)

Muwafeqet: Lihevkirin.

Muwafiq: Lihevhatî, li gora hev.

Divê her dem muwafiq bit

Wekî Şeyxê di Sen'anê (E.X)

Muwafiqê dîrîn: Heval û dostên kevin.

Muwalî: Bilindkirî. Hezker, dost.
Lazim ew zanit bi halî

Dîlber û yarê muwalî (M.C)

Muwasa: Sebûrî.

Muweffeq bû: *e.* Serkeftî bû.

Muwehhîd: *e.* Ew kesê Xwedê yek dizane.

Muwessef: Pesinkirî.

Muwessem: Mohrkirî, nîşankirî.

Mux: Melayê zerdeştî. Peywirdarê perestgeha mecûsîyan *e.*

Rehmê ke eypîrê muxan

Ya Reb dere lutfê vebî (Ş.E.S)

Muxalefet: Dijayetî.

Muxalif: Dijber, hevrik, reqîb.

Qulzem û bayên muxalif tê pur in

Da nekelşin darê sukkânê xelet (M.C)
Muxalifsîret: Ne weke hev, cihê.
Muxan: *f.* Mecûsî, pîrê meyxaneyê.
 Meygerên meye, yê weke zarokên rojperestan.
Muxbeçe: *f.* Meyger ,Zarokê mecûsiya. Meygerên ciwan.
Muxbeçan: Meygêran.
Muxber: *k.s.* Di nava tozê da mayîn.
Muxebber: Tozgirtî.
Muxedderat: Keçên veşartî. Keçên di malan da.
Muxelled: Nemir.
Muxelledinnar: Yê ku her û her di dojhê da bijî.
Muxeref bûye mizac: Gêlê min yê têkçûyî.
Muxettet: Xêz xêzî.
Muxeyla: *e.* Veşartî, sergirtî.
Muxeyyer: Bijartî
Muxeyyer⁴⁴: Bêhêvî.
Muxlem: Tolazê ku bi kuran xirabî dike Kulampara.
 Xizan û geda we bûne mun'em
 Miflis bûye jinberest û muxlem (E.X)
Muxnî: 1.Dengbêj, stranbêj
 2.Alaveke muzîkê ya bi têt.
Muxrem: Girtîyê evînê.
Muxtab: *e.* Xeybetker.

Ne lewwam li sebbab li nemmam heqûd, Ne muxtab, bexîl û 'ecûl û hesûd (M.X.S)
Muxtelif: Cihêreng.
 Ku em yek qetreyê abê fena ne 'Enasir muxtelif tê da civan e (Ş.M.E)
Muxtelit: *e.* Mexlûte, dexle, tevlihev.
Muxteser: *e.* Kin, kurt, qut. Bi kurtî, Bi kurtayî.
 Da bibînî senema min te bigîn xwe bide xet
 Bike telxîsi cewaba me ji vê muxteserê (M.C)
Muzab: Hilandî.
Muzcat: Hindik.
Muzekka: *e.* Pakbûyî, temîzbûyî.
Muzebzebîn: Pir rû, pir dirûv.
Muzehheb: Zêrkirî.
Muzekker: Nêr.
Muzewwir: Sextekar.
 Çira nakî du-sê sihrê muessir
 Tu ey heyyalê bedmekrê muzewwir? (Ş.M.E)
Muzeyyen: Xemilandî.
Muzhir: Diyarker.
Muzill: Yê ku mirov ji ser rê dibe.
Muzkîrat: *e.* Bîranîn.
Muzlem-muzlîm: Tarî û reş.
Muzmehil bû: Winda bû, hilîya.
Muzmer: Veşartî, nexuya.
 Heryek ji te ra we bûne mezher

⁴⁴ Muğeyyer

Ew renga di wan tu bûyî muzmer
(E.X)

Muzn û sehab û arid xeym û
xemame: Ewr

Muznib: Gunehkar

Muzter: Mecbûr.

Muzzemîl û muddesîr: Cil li xwe
werdayî.

Mû: Min.

Mûberra: e. Pakderketina ji tiştêkî,
bêrî.

Mûbeşşer: Bi mana mizginîyê ye. Li
dinyayê ji deh kesan ra ji alîyê Xwedê
ve mizginî hate dayîn ku wê herne
bihuştê.

Digel Telheto Bû 'Ubeyde bizan!

Ku "Eşr-ul mubeşşer" bûye navê wan
(M.X.S)

Mûbeddel: Hatiye guherandin,
guheriye, hatiye tebdîlkin.

Mûbid, mûbed, mewbed, mûbez,
mewbid: Zana, serokê dînê Zerdeştî,
xwedîyê perestgeha agir.

Mûcerred: Tenya, rût, bi tenê, bi serê
xwe. Bes, tek. Nenêrbir. Ezep. Tazî.

Mûcib: Ho û sebeb.

Mûçe: Par, ratib, xwarina ku hinek
didin feqîran. Ratib, para feqîran.

Wî behr di nîşanê te bit

Mûçe ji ber xwanê te bit (M.C)

Mûdamî: Meyxur, meynoş.

Mûellim: Mamoste.

Mûzezb: e. Ezabdayîn, zor zehmet
dayîn.

Mûfredat: Yekûyekên tiştan,
yekyekên ji koman peyda dikin.

Mûhakat: Teqlîd, wekîti kirin.

Mûhal: Mehal, bê îmkan, tiştê ne
mumkîn.

Mûhasebe: Pê ra hesab dîtin, hesab
pirskirin

Mûhawere: Peyvandin, mijûlayî.

Mûhtewa: Naverok

Mûhtîra: Bîranînek, bîrdarînek

Mû'în: e. Alîkar.

Mûkar: 1.Hesinê ku text qul dike,
miqar, minqar. 2.Birîn.

Şehîdên şîr û mûkaran

Kirî amancê nûbaran (M.C)

Mûkellel: 1.Kesê ku zerzeng di serî
da, kesê zerzeng daye serê xwe. 2.
Birqok, xemlandî, muzeyen. 3. Ew
kesê ku zerzengê wî bi duran hatiye
xemlandin.

Mûkteseb: Derdest, bi destketî,
wergiraw.

Mûlaheze: Lêfikirandin, û
mutalekirin, têbînî, têbînekî.

Mû le çawî 'aşiqanî hat: Di çavên
evîndarên te da, mû şîn hat.

Mûmarese: Pêdaketin, pêdaketina ji
bo zanîn û hînbûyîne ji bo
mahirbûyîne

Mûmkînat: Tiştên mumkîn, tiştên dibêyî

Mûn: Qels, temah.

Mûnawere, Minawre: Lebt û lipat, çûyîn û hatina li dor tiştekan, ji bo tiştekan.

Mûnewwer: Bironayî.

Mûnîr: Ronîker, ronîda.

Mûnîs: *f.* Xwenşîrîn. Hogir.

Mû qed: Bejna wekî mûyê zirav e.

Mûqîm: *er.* Her tim, timî.

Mûr: *k.s.* Morî, gêrik.

Mûraqebe: Lêwar, qontrolkirin

Mûrr: Tahl.

Mûrûr: Derbas bûn, borîn, çûyîn.

Mûrûrî zeman: Derbasbûyîna deme.

Mûsa: Mûsa pêxember, cihûyan ji destên Firewun rizgar dike.

Mûsax: Layiq.

Mûsbat: Erînî, erêyî, bi hawe.

Mûselsel: Rêzkirî.

Mûsewî: Cihû, peyrewên Hz. Mûsa.

Mûstesna: Awerte, awertekirî, yê qetandî

Mûşewweş: Tevlihev. Bê tertîb.

Mûşîkaf: *k.s.* Ew kesê ku ji zîrektîya xwe dikare muyekî di navê da bike du parçe.

Mûtefekkîr: Kesê ku difikire, xwedî fikr e.

Mûtî: Ram.

Mûtîeq: Berela, reha, azad, ne girêdayî, bê merc û, bê qeyd û bend.

Mûtmeîn: Emîn, dilrihet.

Mûtû: *e.* Mirin.

Mûqeddîme: Pêşek, pêşekî, pêşgotin

Mûqeyyed: Girêdayî, bendkirî.

Mûr: Morî, gêrik.

Mûrekkeb: Mîdad.

Mûsirre: *e.* Israrkirin.

Mûwafîq: Lêhatî, di cih da, ne dij.

Mûxalîf: Hemrik, dij.

Mûxîs: *e.* Hogir, ê ku tê hawaran.

Mûyê meyan: Yên newqa wan mîna mû zirav e.

Mûye miyan: Mûyê mêşîyan.

Mûzmer: Tê da veşartî.

Mûzmerîyyet: Tê da veşartinî, di navdayî.

N

Nab: Safî, zelal

Nabalix: Negîhayî, xav.

Nabecê: *k.s.* Neşayan, nelayîq.

Nabedîd-napedî: *f.* Nepenî, nexuyayî.

Na bekar: *k.s.* Bêkar.

Nabekes: *k.s.* Bêkes, nakes. Mebest kesekî xirab e.

Nabica: Nerêkeftî.

Nabûd: Nebûn.

Naçar: Neçar, belengaz, bêçare.

Nadan: *f.* Nezan, bêfam. Cahil.

Nadanî: Nezanî.

Nadem: *k.s.* Bêwext.

Nadêritin tu payan: Xilas nabe,
bêdawî, bêpayan.

Nadinê we newbeta çu derban: Em
rê nadin we ku hûn derbên xwe
biavêjin.

Nadir: Tiştê kê m peydabûyî.

Nadirul wuqu’: Kê m peyda dibin.
Kê m peydabûyî.

Nadîde: Nedîtî. Tiştê ku kê m peyda
dibe.

Durê nadîdeyê şehwar ê namê
Goherhayê kîramîter kîramê (Ş.M.E)

Nadîm: e. Poşman.

Na ehlan: k.s. Kesê nebaş.

Nafe: Cureyekî miske; qûtîya miske.

Nafeyêd Tetarî: Miskên welatê
Teteran.

Her lehze ji nafeyêd tetarî

Sed bar-i ji tureyyan di barî (Ş.M.E)

Nagah: f. Ji nişke ve.

Behra dilê perde lê, bi coş hat

Nagah-i bi gazî-yû xuroş hat (E.X)

Nageh: Ji nişka ve.

Nagihan: Ji nişka ve

Nagehan: Ji nişkê ve, bi xefletî ve.

Naguncine: Hilnayên, nakevin.

Nahîd: Stêrka Zuhre, gelawêj.

Nail: Yê ku tiştê bi dest xistibe.

Umîd e nailê xeyr û sewabê

Bibî, paşê nedî dil ber kebabê!
(Ş.M.E)

Naile celal: Yê ku digihîje mezintîyê.

Naîb: e. Nûner.

Naîl: Gîhîştux.

Nakam: k.s. Nekemilî, temamnabûyî.

Ne temam. Miradnîvco, bê mirad.

Nakes: Nekes. Kesê bînîrx û nehêja.

Nakes ne sezayê genc û male

Nûres ne minasibê celale (E.X)

Nakes karî: k.s. Karê neehlan.

Nakirin: Nakin.

Na kuncine: Bi cî nabin.

Nalan: Bi nalîn.

Nalan dikirin: Dinalandin.

Nallandim: k.s. Nalenal kirin,
hawaranîn.

Nallem: Nalîna min.

Nalley bê newayanit: k.s. Hawar û
nalînên hejarên te.

Nam: f. Nav.

Name: 1.Mektûb, kitêb. 2.Nav.

Namewer: Navdar.

Namidar: Navdar.

Kanê emîrê namîdar, serhed nişînê
xundekar

Paşan ji bo pêşkêş hinar, ka Padîşahê
serhedan? (E.X)

Namiwafiq: Nebaş, ne li gor dil e.

Namiwer: Navdar, binavûdeng.

Namîzad: Mensûbê bi navê yekî.

Namurad: Yê ku hêvîyê wî pêkehatî.

Namuwer: Navdar, binavûdeng,
meşhur.

Namzad: Destgirtî.

Nanewa: *k.s.* Nanpêj.

Napedîd: Nepeî, veşartî, Nexuya.

Gerçî her daîm ji mihre neynika dil
bedr e min

Wek hîlala subhê tîm ez carinan bim
napedîd (M.C)

Napesend: Karên ku nayê ecibandin.
Yên nepejirandî.

Sehw-û xelet û xeta û nîsyan

Mecmûeyê napesendê îsyan (E.X)

Napeyda: *f.* Tunebûn.

Napijiyayî: Nebiraştî.

Napuxte: Nestewîyayî, xam,
çênebûyî. Ne pijîyayî, ne gîhayî.

Naqe: Hêştira mê

Naqil: Neqilkirox. Yê ku axaftinan
diguheze. Xebirguhêz.

Naqis: Kêm

Naqûr: Navê sazekî ye.

Nar: *e.* 1. Agir. Agirê dojhê, agirê
cehenemê. 2. Hinar.

Nareskit: Şîn nayê. Negîhayî,
napijîyayî.

Narê firqatê: Agirê cudabûnê, agirê,
firaqê.

Narê hesret: Agirê cudabûnê.

Narê kelîm: Agirê Mûsa Pêxember.
Agirê ku Mûsa pêxember li Tûrê Sîna
dîtî.

Narê muhbetê: Agirê evînê, agirê
eşqê.

Narê qurbê meqsûd: Agirê
nêzîkbûna mirazan.

Narê şîqala dil: Agirê ku wek cîlayê
dil pak dike. Ronî dike.

Narê Xelîl: Ew agirê boş ê
Hz.Îbrahîm di nav da hatiye avêtin.

Narê Xelîlullah: Agirê ku Brahîm
pêxember avêtinê, ew agir ditefe, sar
dibe.

Narha: Agiran.

Narine: Narencîye.

Narinc û tirinc: Du cure mêwe ne ji
malbata leymûnan.

Narî mûqed: *e.* Ew agirê çerm
dişewitîne.

Nar û dûd: Agir û dû.

Nar û nûr: Agir û ronî.

Nas: *e.* 1. Xelk, meriv. 2. Naskirî.

Nasaz: Ne li rê, bêrê.

Nasih: Şîretkirox, pendbêj.

Nasih fikirîn ku we'z û teqrîr

Nakin bi çu rengî nef 'û te'sîr (E.X)

Nasir Şa: Nesredîn Şah Qaçar. Şahê
xanedana Qaçaran *e.*

Nasix: Xirabkirox.

Ew nasixê nusxeya cimal *e*

Bê rewneq û rohnî-yû kemal *e* (E.X)

Nasiza: *k.s.* Ne şayan, ne layiq.

Nasîhan: *e.* Pirjimarîya amojgar û
şîretker *e.*

Nasufte: Nequlkirî, pak, xam.

Emanet da ji bêhuş î

Durên nasufte nefroş î (M.C)

Nasûr: Eş. Navê nexweşîyekî.

Nexweşîyeke ku zû rihet nabe.

Nasût: e. Merivayetî, însaniyetî.

Însan. însaniyetî, meriv, merivatî.

Beşa meriv ya maddî.

Naşikufte: Nepişkivî, pindik.

Naşitî: k.s. Çikandin. Wekî çikandina

darekê bi erdê de.

Natemam: Kêm. Negihiştî.

Natewa: Qels, sivik.

Natewan: Bêhêz, bê desthilat.

Cîsmê minê bê newa giran bû

Rûhê minê natewan rewan bû (E.X)

Natiq: e. Peyvkirox.

Natiwan: Perîşan, derbeder.

Naumîd: Bêhevî.

Nave: Felek.

Naveyê misk: Ew kîsikê tijî misk.

Navê ebed: Navê mayînde, mebest

navê Xwedê ye.

Navê sorgul: Hinavê gulan.

Nawil ha: Bidê, bigijînê.

Nawî em nawe: k.s. Navê wê nazê.

Naxelef: Kesê ku nabe wekîlê Xwedê.

Nankorê dê û bavê xwe.

Naxuda: k.s. Keştîvan.

Lem behrî fitne belkînecatit bida Xuda

Dawênî baxuda bigre; berde naxuda

(MW)

Naxun: Neynûk.

Naxwende: Nexwendî.

Nay: Saza ney.

Nayab: k.s. Pir baş, nuwaze.

Nayete şumar: Nayê jimartin.

Nayê gerdan: Saza ney a ku digerîya,

yan jî ji gerdana dengbêj a wek neyê

dengzirav.

Naz: Xwebînî, delalî.

Nazende: Nazdar.

Çûn zeyn-i bikin Sitî û Zînan

Nazende bikin du nazenînan (E.X)

Nazewer: Nazenîn.

Naziperwerî: Xwedîbûna di nazikî û

delaliyê da.

Nazikqed: Bejinzirav.

Evê nazikqed û çeşmê di mexmûr

Di wan da cûwe da pertawê an Nûr

(Ş.M.E)

Nazikweres: Weresa nazik, gîyayekî

nazik kup ê çekên hevrişim tên

rengînkirin.

Nazil: Daketin.

Nazir: Mêzekirox. Tamaşeker.

Çavdêr, amade, hazir. Nihêrtox.

Nazirin: Nihêrtoxan, çavdêran.

Nazperwerd: Yên di nazikiyê da

xwedî bûne.

Neban: Ajela ku nahêle têjika wê şîrê

wê bimije.

Ewê bêje: "Tu zanî bo çi hatim ?

Ji do va çêleka min za,neban e!

(M.E.F)

Nebar: k.s. Bê baran.

Nebat: 1.Rowele, roweke, rehêle, rehik. 2.Ava qamişê şekir, şerbet. Cureyekî şerbetê.

Nebatat: Rowekegan, rehêleyan.

Nebestî: Negirêdayî.

Nebewiyyat: e. Mijarên girêdayê pêxember.

Nebihî: Nebihîzî.

Nebî: Pêxember, resûl.

Çihar û sed û bîst hezar in nebî,
Rusul sêsed û sêzdeh in, ey ebî
(M.X.S)

Nebîd û beşere: Bi lêdana dilî werengê ser û çavan.

Nebîye: k.s. Nebihîstîye.

Nebîyy: Pêxember.

Nebi: Tîr, darê tîrê.

Sufûfê setrê mest ê nameya dil

Ji neblê zehrîdarê qews ê rûgul
(Ş.M.E)

Nebote go: Nebûye gog, nebûye top.

Nebrawewe: k.s.Qut nebû,temam nebû.

Necat: e. Rizgar, azad, xilasbûn.

Necaset: Pîsî. Kirêtî û gemar.

Necaşî: Leqebeke şahên Habeşan e.

Necm: Stêrk.

Necmî futûh: e. Stêrka bextê.

Necm û kewkebên lami': Stêrkên ku dibiriqin.

Neçûyê narî: Neçû dogehê.

Nedahte te'eqqul: Nedihat bawerkirin.

Nedamet: e. Poşmanî.

Hindî ku ewan dikir melamet

Wê zêde dibû ji wan nedamet (E.X)

Nedar: Bêkes.

Nedaret: Geşbûn, ronahî, tezetî.

Nedared quwwetê meywe dirext im
Xusûsa meyweyê şêrîn ê bextim
(Ş.M.E)

Nedbûn mutehemmel: Di bin bar da tehmûl nedikirin.

Nedda xetan: Navê peqpeqokan e, ku bi ser rûyê avê dikevin.

Nedehfî: Me red nekî.

Nedetê: Nede wî.

Nedêrê sanî: Yê duyem tune ye; Yekî din weke te tûne ye.

Nedêrîn: Me nîne.

Nedîm: e. Hogir, heval, rind, yawer; hevmeyxwir, kesê ku meriv pê ra meyê vedixwe.

Keramat û di me'nayê, di rayêw eql û danayê

Nedîm wek wî di dinyayê wî da yani muheyê kir (M.H.Q)

Nedîr: Agirê serê çîya, ji bo agahdarîyê. Agirê ku bi armanca agahdarkirinê li cihê bilind tê vexistin. Dêmnedirê bo 'ebîrê xemri û ges û herîrê

Sîne kir amancê tirê dil ji min bir dil ji min (M.C)

Nedşî: Nikaribû.

Nef’: Mefa, feyde.

Nefaîs: Tiştên hêja. Piranîya nefîs e, ku tê wateya giranbuha.

Nefek: Faydeyek.

Nefextû fîhî: Min pif kir. Mebest mucîzeyê Hz. Îsa ya mirî bi jîn dîkir.

Nefha: Pifkirin.

Nefîr: 1.Gelek meriv. 2.Borîzan.

Mîr hatî li ser wî hinde esker

Zirna û nefîr û kûs û mehtar (E.X)

Nefîs: Bi nîrc û biha.

Nefsa xwe nizanin: Qedrê xwe û mesleheta xwe nizanin.

Nefsa emare: Nefsa ku hatiye emirkirin.

Nefseyn: Du nefis, du kes.

Nefsê emmar: Nefsa ku berê meriv dide rêya xirab. Nefsa mirovan ya ku emrê wî bi gunehkarîyan dike. Nefsa meriv ya fermanker.

Nefsê şûmum: Nefsa bextreş.

Nefsil’emr: Heman tişt, eynî tişt.

Nefsî emmare: e. Nefsa ku daxwazên tiştên xirab dike.

Neft: Petrol.

Qulzem û behr in di hev tê

Agirê isqê ku keftê

Dê bisojit şubhê neftê

Min dîye pê zanim ez (F.T)

Nefûr: Nefretkirox, nefreker, rikdar.

Hindî ji şecaetê xeyûr in

Ew çende ji minnetê nefûr in (E.X)

Nef’ û zerer: Sûd û zîyan.

Nefx: e. Pifdan, pifkirin.

Nefxa sûr: Pifkirina sûrê.

Nefxe da: Pif kir.

Nefxeê qanûn: e. Pifkirina qanûnê.

Negeyme: k.s. Ez negihîştim.

Ne geyne: k.s. Em negihîşîne.

Nehafet: Zebûnbûn e.

Nehand: Veşart.

Nehar: e. Safî. Roj, biroj, navroj.

Nehcil enam: Rêya ameyê, rêya gel.

Nehcûr: Hicretbûyî, koçberbûyî

Neh çerxê sergerdan: Her neh tebeqeyên asîman.

Nehen: Deynin. daynin.

Neheng: Hût, timsah.

Ne hequd: Bi kîn nebe.

Neheş: Bêhiş, gêj.

Nehin: Nabin. Tune, nîne.

Nehin efxan: Qerîn û hawar nînin.

Nehing: Neheng. Tîmsah, hût.

Tu dizani çi neheng in çi neheng?

Veke le’lan tu ji ser şekerê teng (M.C)

Nehin ji bo qeyd: Qedexê li ser wan nîne. Pirs ji wan nayê kirin.

Nehî: e. Qedexe.

Nehîn: Veşarî, nepenî.

Wê gotî ku: Hun meger nebînin

Wî derdî, elamet in nehîn in (E.X)

Nehînder: Di hundirê xwe da dil bi kîn.

Ev laîqê dergehê te nîne

Ev kelbe, nehîndere bi kîne (E.X)

Nehnû ‘aşiq: Em evîndar in.

Neh qubbe: Neh felek.

Nehr: Çem û rûbar.

Nehs: Kesê bextreş, gunehkar.

Dilo newma me jê behs e

Beyana xefletê nehs e

Ne hişyarî gelek tehs e

Me nêv xewn e ku murdar e (F.T)

Neh sedef: Mebest neh gerestêrk in.

Neh taq: Felek, asîman. Neh kumbet, neh felek.

Nehs û kur: Bêyom, bêoxir, bêpar, mehrûm.

Nehw: Sentaks, hevoksazî

Neîlet: Neletî, neletlêbûyî

Ne’îm: e. 1. Bihuşt. 2.Nîmet. Pirjimariya ni’met û qenciyan.

Nejdî: Talanker.

Neken guzer: Di vê rêyê ra derbas nebin.

Nekh: Bêhna xweş.

Yusifê dewr û zemanê

Go: Nesîm han vê nişanê!

Lê ji bo nekhê dehanê

Nexweşan ew lê şifa ye (M.C)

Nekhê dehanî: Bêhna dev.

Nekin te’eccub: Seyr nemînin.

Nekin tesewwur: Neynin ber çavên xwe. Xeyal nekin.

Nekîr û munker: Du firîşteyên di gorê da pîrsan dîkin û şikenceyê kesên xirab dîkin.

Nekit qebûlê kîne: Kîne nepejirîne. Gemar lê negire û her pak bimîne.

Ne’leyn: Cotên sol e.

Ne’lê feres: Nala ku li binê lingê hespan dixin. Nalên hesp.

Ne lewam: Lewmekar nebe.

Nema: Keskbûn û şînhatina giya.

Nemam: e. Xeybet.

Duezmanî û xeybet û medh û zem

Nemamî herifi kirin dem bidem (M.X.S)

Nemamî: Fesadî.

Nema qaim: Nema li cih.

Nemaz: Nimêj.

Nem: Tertî, nem, terayî.

Nemek: 1.Xwê. 2.Nem, terayî.

Nemekheram: Nankor.

Wî gote qebîleya xulaman:

Hun bo çi, gelî nemekheraman! (E.X)

Nemê heywan: Çipkeke ava jîyanê.

Nemmam: Peyvgerîn, fesat.

Ne lewwam li sebbab li nemmam heqûd, Ne muxtab, bexîl û 'ecûl û hesûd (M.X.S)

Nemnakk: Ter.

Ne nemam: Xebergerîn nebe.

Neng: Şerm.

Nenoşî: Nevexwarî, venexwarî.
Venexwî.

Camê îşqê pakê rûhanî tehûra batine
Yê nenoşî her we ma hetta ebed
napakî rûh (M.C)

Nepijya: Nebelav kir.

Neqam: Kûrahîya ji bejneki zêde.

Neqd: e. Next. Dirav, pere.

Neqdeyn: Zêr û zîv, bi mecazî di
mana wêjeyê da hatiye bikaranîn.

Neqdê rewan: Qîmeta maqûl, bihayê
li bazarê.

Neqi': Toz.

Neqîq: e. Ters, dij.

Çen û minqarê te her şerqîşerq e
Neqîqê te, nemqê ker çi ferq e?
(Ş.M.E)

Neqîyy: Paqij.

Neql: Meze-fêkîyê badexwiran. Nuql,
tiştên ku bi meyê ra tên xwarin, meze.
Hal ji wê remzê giha min, mestê wê
remzê me hêj
Serxweş im hetta ebed, bê cam li neql
û bade ye (M.C)

Neqqad: e. 1.Erbab, kontrolkerê
diravan 2.Rexnegir. Tenqîdkirox.

Neqqaşê sehîfeyê hikayet

Neqqadê sebîkeyê rîwayet (E.X)

Neqqaş: Yê ku dineqîşîne, dixemlîne,
çêdike. Di tesewifê da ji bo Xwedê tê
bikaranîn. Nexşker.

Neqqaşî: Wênesazî, şewekarî.

Neqs: Kêmasî, kêmanî.

Neqsan: e. Kêmayî.,

Neqşê heyola: e. Nîgarên bingehî,
heyber, resen mayî.

Neqşê senem: Xweşikîya pûtî; Bi qasî
peykerekî xweşik.

Neqşê sewad: Neqşê reş; xal.

Neqt: Dirav, pere

Nerd: Tawle. (Cureyekî lîstîkê ye).

Ne me'lûm e çi setrinc e çi nerd e

Ne mestûr e çi herr e yan çi berd e!
(Ş.M.E)

Nerd zar: Lîstîka tawleyê

Ne're: e. Halan, qirçir. Hewar û gazî.

Key xilas ez dozexê hecrî tu ya bim ey
cuwan

Her nefesdared sela û ne'reyê hel mîn
mezîd (M.C)

Ne'rezen: Yê ku diqîre, dinale.

Nerx: Qîmet, biha.

Neqşê elmasî li elmasê binî girtîye
herf Xettê yaqûti li yaqûtê şikênandîye
nerx (M.C)

Nerxandin: Nerx lêdan

Nes: e. Delîlê qetî.

Nesara: Fileyan, Xiristiyanan. File,
Xaçhebîn.

Nesb: e. 1.Çikandin, tayîn. 2.Di
zimanê erebî da “zêr-kesre”

Nescî ‘enkebût: e. Tevna pîrê,
calcalok.

Neseb: 1.Nijad, regez, binemal.
2.Zehmet.

Ne seba: Çêrçêrok nebe.

Neseq: Tekûzî, tertîb. Tekuzî. Cure, celeb, awa, şêwe. Dîsiplin.

Nesib, meqşîme û hisse: Par, qismet

Nesix: Cureyekî nivîsa erebî.

Çi xet eşkeste musulsêl ya Reb?

Ku te pê nesix kirî dîwanî (M.C)

Nesîhetger: f. Amojgar, pendker.

Nesîm: f. Bayê hênîk û hêdî. Bayê sibehê. Sira bayê sibehê.

Nesîmê seherê: Bayê sibehê.

Nesl: Sertîr, serê rîman.

Nesle pak: Nîjada pak. Mebest malbata mîr e.

Nesl û neseb: Kok û binyad. Nîjad.

Nesr: Alîkarî, serkeftin.

Nesrewtin: k.s. Her berdewam.

Nesrînwereq: Pelên weke nesrînê spî; rûyê yarê.

Ness: Heqîqet, rastî.

Nessê Qur'an: Teksta Qur'anê, metna Qur'anê.

Nester: Kêra ku pê xwînê ji birînan tê derkirin.

Nesteren-nester: Nesrîn, şîlan. Gulên sor.

Were canim ku çî nazik weres in

Ji gul û nesterînan em te bes in (M.C)

Nesx: e. Hilweşandin, bêhukumhîştin.

2. Cureyekî xweşik e ji xêzkişîya erebî jê ra dayika xêzan tê gotin.

Xudanê wehy û tenzîlê bi eqlam bi tebcîlê Qelem da nesxê încîlê nema Tewrat û xecanî (M.B)

Nesxî cumle edyan: Hilweşîna hemî dînan.

Ne's: e. Laş, term.

Neşa: k.s. Ne layiq.

Neşac: Şîn û girî. Kelogirîbûn.

Ji ava heyatê bi me da şerbetek

Zînde kirin ma ji 'edû ra neşac (M.C)

Neşat: Kêfxweşî.

Neşe: Di roja qiyametê da dîsa afirandina merivan.

Neş'e: Şûn, cih.

Neş'e: Dilxweşî, serxweşîya sivik.

Ji camê neşe bigrim, pur quwwet bim

Jibîra kim xeman, gavek rihet bim (Ş.M.E)

Neşem: Nikarim.

Neşere: Belav bû.

Neşeteyn: e. Mirin û jîyan.

Neşêm: Nikarim.

Neşêm edî ewan derdê bê hed

Bikêşim lew bi derb û jan e dîsan (Ş.N.B)

Neşi: Tesîr û kêfxweşîya meye.

Neşim: Nikarim.

Neşî: Nikarî, nikare.

Neşîb: *e.* Birîndarê tîran, tîrxwarî, serejêr.

Neşîr: *e.* Belavbûna rihan ji surê.

Neşîtin: Nekarîn.

Neşşab: Tîr *e.*

Neşunasî: Nas nekir.

Ne't: Pesin, medh. Wesifkirin û pesindan.

Ne'tê te bi îlmê min mihale

Meddah-i ji bo te Zilcelal *e* (E.X)

Netaîc: Derketî, ked.

Netayic: Netîce, encam. 2.Berhem.

Ne terzê xwe: Ne layiqê xwe.

Netîce: Duwayîk, zayeke, zuwe.

Subhan ji şahê Zulcelal

Ew nisbet û husn û cemal

Min dî netîce bû xiyal

Hiştîm di nêv derd û bela (M.H.Q)

Netrik: Guhar, xişreke zînetê ye.

Polik û pellikên hîlalî, mangîleyên

lerzane, şirrik. Li gor Zivingî; Xişrekî

zivîn ku jin bi serê xwe dîkin.

Nevîşt: Nivîsî.

Nevî: Nevê, nexwazê.

New': Cure, cur. Nifş.

Newa: 1 Dengê stranê, awaz. 2.Hêz.

3.Havil.(Çare)

Newadir: Piranîya «Nadir»*e.*

Kêmpeyda.

Newaîraqî: Dengzirav.

Newaya mutrib: Dengê stranbêj.

Newaya mutrib û çengê fixan avête
xerçengê

Were saqî heta kengê neşoyin dil ji vê
jengê (M.C)

Newaziş: Lavakirin. Îltîfat.

Newbawe: Nubar.

Newbe: Dor.

Newbet: *k.s.* Dor, kat, dem.

Newcewan: Ciwan, xort, sinêl.

Newcewanî: Ciwanî, xortî.

New'ê Adem: Meriv.

New'ê eftal: Nifşê zarokan.

Newhe: *e.* Nalîn, giryan, hawar, qîr û gazî.

Newheê “inna zelemna”: Dengê
“min neheqî kir.”

Newheger- Newheker: Kesê di şînê
da digirî û dilivîne. Kese ku li ser mirî
da distire.

Ew matemîyê ku baxeber bû

Ev renga ji bo me newheker bû (E.X)

Newîşt: Nivîşt. Nivîsand.

Ku nesîb da ji ezel heq ji me ra 'îşqê
newîşt Feyde nakin li ine îsm û ne
tilism û ne nivîşt (M.C)

Newîd: Mizgîn.

Newm: Razan. Xew.

Newmêdî: *k.s.* Poşmanî.

Newmîd: Bêhêvî.

Newneman: *k.s.* Şitleke nû, mebest
yarê.

Newxîz: Nû rabûyî, nû gihiştîyî.

Newzuhur: Nû derketî, nû peydabûyî.
Nexasim: Nemaze, bi taybetî, baxusûs
Nexçîr: *k.s.* Nêçîr.
Nexçîrbani: Nêçîrvanî.
Nexemat: *f.* Piranîya kilam û stranan.
Nexl: Dara xurmê.
Nexlî balat: *k.s.* Bejna ku weke dara xurmeyê bilind.
Nexlî mired: *k.s.* Dara miradan.
Nexm-Nexme: Stran.
Nexme: *e.* 1.Dengê xweş di helbest û stranê da. Dengê stranê yê hêdî, newa, melodî, awaz. 2.Hewayaya muzîkê.
Nexmexwan: *f.* Stranbêj.
Next: 1.Pere. 2.Qelen.
 Menêre ehlê vî wextî
 Ku distînin hemî nextî
 Dikin l'hev hîle û bêbextî
 Qe axret bîra wan nayê (M.E.F)
Ne xubarek ji xumarî: Tu tiştêkî ku meriv serxweş bike tê da tunebû.
Nexwet: Quretî, tekebur.
Ney: Amûreke muzîkê ye. Şimşal.
Ney': Xav.
Ney can berî: Canê xwe ji ber nebîr, ji mirinê xilas nebû.
Neydîwe her kesê: Her kesî ew nedîtiye.
Neyêtewe: *k.s.* Nezivire.
Neyistan: Baxê zilan. Cihê ku qamiş lê şîn tê.
 Bibexşe wî neyîstanê derûn pak

Çû gul xwînxorde ne dil pare û çak (Ş.M.E)
Neynika cemale: Mîrêka ciwanîyê.
Neyşeker: Bejinzirav. Weke qamişa şekir bejinzirav.
Neytiwanîwe: *k.s.* Nikare.
Ney û Nay: Du amûrên muzîkê ne.
Neyyahe: Jina ku li ser mirî distre. Lawjebêj.
Nezaket: Nermî, nazdarî, letafet.
Nezar: Lawaz.
 Zîn dî ku h pencerê dîyar e
 Mîhre li mehê diket nezar e (E.X)
Nezc: Gîhan.
Nezd: *e.* 1.Teref. 2. Li bal 3.Li gor.
 Bi nîfê ket lîbasê pîrê salik
 Bi ahiste meşî nezdê qijalik (Ş.M.E)
Nezer: Nihêrtin. Nêrîn, mêzekirin.Dîtin.
Nezera 'eynê: Nêrîna bi înyet.
Nezerbaz: Nêrîn. Kesê ku nihêrtina wî wek a teyrê baz e.
 Ew rege bikim ji nû serefraz
 Da bêne temaşeyê nezerbaz (E.X)
Nezer da te: Me li te nihêrî.
Nezerge: Cihê ku ewlîyayên Xwedê tê da rûniştî ne. Cihêkî taybet e bo sofîyan.
Nezer kir: Nêrî, meze kir.
Nezer kî: Lê binêre.
Nezerîyye: Dîmane, bîrdoz, doktrin.
Nezerîyyat: Nêrîn, dîtin.

Nezi’: Standin, jiberdaxistin.

Nezîf: Pak, paqij.

Dûr bûm ji wê bejna letîf

Wê heyeta pak û nezîf

Meşhed kirî Ke’ba şerîf

Bêpîri man sofî û mela (M.H.Q)

Nezîr: Wek.

Nezm: e. Helbest. Rêzkin.

Nezmê letîf: Honandina bedew,
zimanê rewan.

Nezm û tertîb: Xweşdanîn û rêkûpêkî
û tekûzî.

Nezr: Soza sedeqekirina tiştêkî,
pêregotin. Sozdana kirina tiştêkî.

Nezra nezera tebûn bi carek

Weqfa besera tebûn mibarek (E.X)

Nê: Jixwe, nexwe, mane.

Nêk: f. Çak, baş.

Nêk bext: f. Bextê reş.

Nêk xûn: k.s. Rewiştbaş, exlaqbaş.

Nêrgiz: Kulîlkeke; Di şeklê xwe
dişibe çavan. Çavên sermest.

Nêş: k.s. Derzîya mêşê, azar, elem.

Nêw: Nû.

Nîbiwwet: Pêxemberî.

Nidakunende: Bangker, yê ku bang
dike.

Her nexlê nîdakunende her gah

Teşbîhê Şecer digo: Enellah (E.X)

Nidd: Beramber û hevta.

Nabînî ku pêkve cimle ziddin?

Hîkmet çîye, bo çî pêkve niddin?
(E.X)

Nifrîn: Nifir. Lome kirin.

'Îşqê ji Xwudê da tu bixwazî jê ra

Ger dê li neyarek xwe bikî nifrînê
(M.C)

Nifûs: Piranîya nefis e, gîyan.

Nigah: Nêrîn, sehkirin.

Nigar: Dilber, pût û wênayê xweşik.

Nigarîn: Rengîn, gelek reng.

Nigeh: Nêrîn, mêzekirin. Nihêrtin.

Nigehdar: Yê ku diparêze, muhafiz.

Hafîz, parêzvan, zêrevan.

Heq nigehdarê te bit padîşeha
serwîqedan Bi kenarê me feqîran bike
carek nigehê (M.C)

Nigîn: Gustîlk. Ew cewherê ku ji bo
gustîlkê dibe qaj. Morî.

Nigûnser: Serberjêr, sernişîv.

Nigûnserbûn senem aciz

Ji tewlîda gula qirmiz

Bi Kisrayî giha mu'ciz

Tezelzul kefte Eywanê (M.B)

Niha: Danî, hîşt.

Nihad: Veşart.

Nihal: Şitil, fîdan, şitla teze, çiqil.

Sorgula xonçe dehen nazik nîhala ke
yî tu Mehweşa gul pirehen şox û
şepala ke yî (M)

Nihalê serkeş: Şax û dara serî ber bi
jor ve kişandî. Şaxên ser bi jor da
kişandî.

Nihan: *f.* Veşartî, sergirtî, nepenî.

Nihaye: Danîye, hîştîye.

Nihayet: Dawî.

Nihayî: Danîye, hatiye danîn.

Nihen: *f.* Nîn in, tune ne.

Nihênî: Bi dizî.

Nihifte: Veşartî.

Nihin: Lê bikevin.

Nihin: Tune, xuya nake.

Nihîn: Veşartî, bi dizî, nepenî.

Nijde: Êrîş, rêbir.

Nik: 1.Eyişandî, ecibandî. Xweşlêhatî.

2.Cem, bal.

Nikat: *e.* Piranîya niqte.

Nik hebîban: Cem yaran.

Nikokar: Yê ku karê wî qenc û pak e.

Nikonam: Merivê ku navê wî bi qencîyê ve belav bûye.

Nikoserencam: Dawîxêr.

Nikûl: *k.s.* Poşmanî poşmanbûn.

Nim: Nîv.

Nim: *k.s.* Terayî.

Nima: Numa, dîyar.

Nimek: Xwê.

Nimek: *k.s.* Wefa, ked.

N'imel îttîfaq: *e.* Boneke baş, munasebeteke rind, wexteke baş.

Ni'melmeqam: *e.* Çi xweş cih!

Ni'me ni'me: Çi baş ni'met û qencî ye.

Ni'met: Nan û nîmet; Hemû xurek û vexwerekên ji bo jîyanê pêwist.

Nimûç: Nimûne, mestere.

Bergên gula reyhanîyê

Katib nimûçek danîyê (M.C)

Nimûd: 1.Libat, tevger, hereket, livîn.

2.Xuyayî.delîl.

Bê hisnê te nîne wan wicûdek!

Bê nûrê te nîne wan nimûdek! (E.X)

Nimûdar: Dîyar, eşkere, aşîkar.

Nimûnedar: Dîyarker û eşkereker.

Niqab: Rûçavk, rûbend, Rûpêç, serrûk, perde.

Niqandin: Ji xwe ra girtin, bijartin

Nisa: Jin.

Nisar: Belavkirî, bijalekirî. Pere, zêr û şekirên ku bi ser serê bûk û zava ra direşînin.

Rêhtin tebeqê durê nîsarê

Jorda li îmarîya nîgarê (E.X)

Nisfinnehar: Nîvro, nîvê rojê.

Nisbet bi me: Li gor me.

Nisbî: Angorî, bi angorî tiştên din.

Nisf: Nivî, nîv. Nivê navê mîr di îmlaya erebî da Zîn e.

Nisfê ewwel: Nivê yekem.

Nisfê sanî: Nivê duyem

Nisfîyye: Bi însaf.

Nistî: Tilsim şikenandin.

Niswan: Jin.

Nisyan: Jibîrkin. Ji bîr çûn.

Belkî kiribit xeta û îsyân

Însan xuliqîn bi neqs û nisyan (E.X)

Nişab: *e.* Tîr.

Nişag: Çelengî, zîrekî.
Nişêvî: Nişûvî. Berjêr.
Nişîn: *k.s.* Rûniştin.
Nittirandin: Pir xweşik neqîşandin, xemilandin.
Nivîn/nivîstin: Razan, raketin.
Niwanî: Talde. Perdê û veşargeh.
Niwêj: *k.s.* Nimêj.
Niwêjî rojawa: *k.s.* Nimêja mexribê.
Niwîsîn: Nivîsin.
Niyaz: Hêvî û hewcehî.
Niye: *k.s.* Nîne, tune ye.
Niyet-niyyet: Niyaza nava dil, daxwaza dil.
Niza': Nakokî.
Niza'iname: Kêşaname. Pirtûka nakokîyan.
Nizam: Sazkarî, rêkûpêk, pergal.
Nikhet: Tam û bêhn.
Nizûl: *e.* Daketin jêr ketin. Rijîn.
Nizhetgeh: Cîhê bêhn berdanê.
Nizhetgeh û şehneşîn û eywan
 Lê bûne hesar û hebs û zindan (E.X)
Nîal: *e.* 1. Pê, ling 2. Qabqabik.
Nîbal: Tîran.
Nîda: Hewar û gazî.
Nîdakunend: Bangkîrox.
Nîgah: *f.* Nihêrtin, awir.
Nîgar: *f.* 1. Neqş û nimûş, resm, suret.
 2. Dilber, Mehbûba pir rind, dilber. pir bedew, keçika rûxweşik
Nîgehdaş: Parêzvan.

Nîgehdarendeş: Parazvanê wê.
Nîhad: Bilind.
Nîhal: *f.* Taze, şitl, fîdan, şax, leylan, cih.
Nîhan: Veşartî, sir, sergirtî. Xef, ne dîyar. Bi dizî.
Nîhayatu bîdayatî: Dawî û destpêk.
Nîhayet: Dawî.
Nîk: *f.* Çê, baş
Nîkesîret: Xûybaş.
 Îlla ku nefis û paketînet
 Yanî ku nufûsê nîkesîret (E.X)
Nîkû: Kesên baş pak.
Nîk û bed: Baş û xirab.
Nîkûkar: Karê baş.
 Herçî ku te çê kir, ey nîkûkar!
 Heryek di hedê xweda sezawar (E.X)
Nîkûnam: Navbaş.
Nîkûserencam: Kesê ku dawîya wî baş û xêr e.
 Bextê me ji taliê te reştir
 Bilbil ez im, ey nîkûserencam î! (E.X)
Nîlgûn: Şîn
Nîlofer: Guleke avî ye bi rojhilat ra dibişkive. Lûleper.
Nîlufêr: Navê kulîlkekî ye. Ji ber têkîlîya wê rojê; bi derketina rojê ve derdikeve û dema roj hiltê diçilmise ji ber vê dişibe evîndar.
 Nîlûferê nazeperwerî kir!
 Ew jî te li mîhrê mişterî kir! (E.X)
Nîm: *f.* Niv.

Nîmbismil: Balindeyê nîvserjêkirî,
nîvkuştî.

Nîmerah: Nîvrê.

Nîm û naz: Nîv nazdarî.

Nîm xend: *f.* Nîv ken, Kênê kê.

Nîmxwab: Nîvnivistî, çavên xav yên
niqrosk bi ser da tîn.

Nîna: Ne anî.

Nîqab: *e.* Xêlî, rûpêç, perde, star.

Nîqat: Nuxtayan.

Nîkilbext: Xweşbext.

Nîran: *e.* 1.Ronahî 2.Agir, agiran,
dojeh.

Nîsa: *e.* Jin.

Nîsa': Jinan.

Nîsab: Miqdarê zekatlêketinê.
Miqdarê ku zekat lê dikeve. Standart.
Minnet ku ji bextê xwe û tali' bi nesib
im Husna te ye îro ji me ra çûye nisabê
(M.C)

Nîsar: *e.* Belavbûyî. Amade,
xweavêtin, şabaş. Qurbankirin.
Avêtina pere, meze û hwd. Bi ser serê
bûkê yan zavê da.

Nîsarî kird: *k.s.* Belav kir.

Nîsbet: Angor, angoreyîtî, munasebet,
peywendî.

Nîsf: Nîvî.

Te namûs û nisfli me bi ba kir

Loma Ereba li me rewa kir (H.B)

Nisfiyye: Xebitandina li ser dur û
gewheran û paqijkirina wan.

Nîst: Nîne.

Nîswan: Jinan.

Nîsyan: *f.* Jibîrkirin.

Nîş: Derzîqîtk, zelqetût. Derzîya
ajelên ku pêvedidin.

Nîş: Ta û êşan, pêvedan û gestin.

Nîşab: Tîr.

Li lewhê sîne dim tîr û nişaban

Lidil dax û ligerden pur kulaban
(Ş.M.E)

Nîşan: Nîvîs û xêz û xal.

Nîşanî: Nasnavê (leqeb) Melayê
Cizîrî.

Nîş e: *k.s.* Tune jî.

Nîşter: Neşter.

Nîyah: Hawar.

Nîyaz: *er.* Daxwaza dil, lawa.

Nîye: Nîne.

Nîzam: Sazûman.

Nîzamî: Xwedîyê pênc destanên
navdar bi pênc genc *e.* 1135-1217 z.

Nîze: Rim.

No: *k.s.* Nû.

No çerx: *k.s.* Heft asîman û erş û
kursî.

Noş: Vexwarin.

Noş bikim: Vexwim.

Noşî: Vexwar

Noşîn: Vexwarin, nemaze vexwarina
meyê.

Noşmendî: Vexwarinî

Nubuwwet: *e.* Pêxemberî.

Nucûm: Pirjimariya stêrkan. Stêrkan.
 Şemsê tehqîqî di nav ehlê 'ulûm
 Alimêwextê li etrafêş nucûm (Ş.M.C)
Nucûmê seyyar: Gerestêrk, Stêrkên li
 dora rojê digerin. Mebest miraz nebû,
 bi dest neket.
Nufûz: e. Kar.
Nugîn: Qaş, gustîlk.
Nuhin: Veşartî.
Nuhînder: Ji nişke ve xuya dibe. Seyê
 nuhînder yê ku ji nişke ve tê meriv.
Nuhîn kir: Veşart, tewiland.
Nuht: Girt, hingaft, îsabet kir.
Nuhtine: Îsabet kirine, lê ketine.
Nukte: Meseleyên hûrik û wateyên
 wan xweş û kûr in. Zanîna hûr.
 Meseleya hûr ya meriv bi hizirkirinê.
Nuktedan: Zanayê bi tiştên zirav.
 Lê Mîr, ji kuran hebû ciwanek
 Mehbûbê zemanê, nuktedanek(E.X)
Numa: Eşkere bû, xuya bû. Dîyar bû,
 nîşan da.
Numaî: Veşartî
Numan: Eşkerebûn, dîyar bûn, xuya
 bûn.
Nu'man: Kurê Munzîrê Lexmî ye.
 Padişahê Lexmîyan ê dawî ye.
Numandin: Dîyar kirin, dan der.
 Derxistin, nîşan dan.
Numane wan: Raberî wan kir.
Numa sade: Safî bû, zelal û ronî bû.
Numayin: Xuya kirine.

Numayî: Dîyar kir, eşkere kir.
Numûc: Numûne, mînak.
Numûçek: Numûneyek.
Numûd: Dîyar, xûyabûyî.
 Bê husnê te nîne wan wûcûdek
 Bê nûrê te nîne wan numûdek(E.X)
Numûne: Mînak
Numûnedar: Mînakdêr, numûnevan.
 Lewra tû nûmûnedarê zatî,
 Ayîneyê sûretê sifati (E.X)
Numûnexane: Cihê numuneyan.
Nuniye: e. Qesîdeya ku qafiyeya wê
 bi tîpa nûnê diqede.
Nuqatrêzî: Rêzkirina tîp û herf û
 xalan li ser qûmê yan jî kaxezê ku
 falbêj wisa dîkin da ku bextê yekî nas
 bikin.
Nuqet: Nuqte.
Nuql: Şekirê behîvan û fisteqan.
Nuqle: Rengekî şîrînîyê ku ji şekir tê
 çekirin.
Nuqsan: Kêm.
Nuqteya rebî'î: Cihê ku roj di gera
 xwe da digihîje û dinya dibe bihar.
Nuqûl: e. Pirjimariya "neql" ye.
Nuriye: e. Ew jina ji nûrê çêbûye.
Nusret: e. Alîkarî.
Nusus: Ayetên Qur'anê.
Nusxe: Pirtûk; çêbûn, teşe.
Nusxe da: Nivîsî, neqîşand.

Nusxeê tewhîdê: Gotina “la îlahe îlêlallah” (Ji Xweda pê ve tu Xweda tune ye.)

Nusxeya cemal: Destnivîsa xweşikîyê.

Nutq: e. Axaftin.

Nutqa selîs: Axaftina sehil.

Nu’ût: e. Pirjimarîya sifet, xeslet.

Nuzhetgeh: Seyrangeh.

Nuwanî: Tevger, hereket.

Herdu di wî halîda eyanî

Bê perdesera û bê nuwanî (E.X)

Nuzûl: Daketin.

Nû’as û sîne: Ponijîn.

Nûbade: Nûgîhayî.

Nûbar: Bera nû, kevanê kun û tîran diavêje. Tîrên nû.

Nûbare: Nûgîhayî, tazeber, mêweyê nûgîhiştî.

Nûbî: Navê gelekî ye; mebest xîşrên reş in, yan jî gulî û tembûrîne.

Nûerûs: Bûka nû.

Nûerêse xurşîd: Roja wek bûka nû.

Nûh: Navê pêxemberekî ye. Wek Ademê duyem tê binavkirin.

Nûhas: Paxir e.

Nûk: 1. Nikul. 2. Serê stiriye yê tûj.

Nûke çizwe: Serê derzîyê. Ji bo derzîya dûpişkê tê bikaranîn.

Nûmîd: Bêhêvî.

Nûmudam: Meya nû.

Nûn: 1. Tîpeke (N) di alfabeya erebî da. Mebest birû ne, birûyên weke tîpa nûnê. 2. Navê masîyekî ye.

Nûnek: Bi qasê nûnekê, tişteki piçûk, xalek, nuqtayek.

Nûnên li ser sadan: Birûyên çavan.

Nûn û qelem: Sûreta “Nûn Welqelemî” çav û xweşikî; nivîs û qelem.

Nûn û sad: Birû û çav.

Nûqaba zulmete: Serrûka reş, perdeya tarîtiyê.

Nûr: Ronahî.

Nûra beser: Ronîya çavan.

Nûranî: Ji ronahiye.

Nûra tecella: Ronahîya ku derketî.

Nûr’efşan: Nûrbelavker, ronîker.

Nûres-Nûresîd: f. Nûgihiştî, nû giheştî, nûgîhayî, nûdîtî.

Nûbareye, tîfle, nûresîde

Her çendî nehin qewî guzîde(E.X)

Nûrest: Nûgihiştî.

Nûrê barî: Ronahîya Xwedê.

Nûrê heq: Ronahîya Xwedê.

Nûrê zat: Nûra zatê Xwedê.

Nûrînbeşer: Meriva/ê bi nûr, nûr afrîde

Nûrîn eraik: Enzelên nûranî, textên pîroz.

Nûrînxebxeb: Qirika bi nû, gerdenzîv.

Nûriye da: Ronî da, nûr da.

Nûr nadit: Ronahî nade.

Nûrnuma: Ronahîder.

Nûrû ha: Nûra wê.

Nûsrawe: *k.s.* Hatiye nivîsîn.

Nûş: Vexwarin.

Nûşîn: Şîrîn, xweşçêj.

Bîl firaqî lîl telaq be sikûn im ta seher
Xo leb nuşîn ba ezîz im dilnîgara min
nehat (M.B)

Nûştênûs: *k.s.* Ew kesê ku nivîştan çê
dike.

Nûxîz: Nûhatî, nû şînbûyî.

O

Obal: *k.s.* Guneh, tawan.

Oftad: *f.* Ket.

Okilme: Belayên giran.

Omîdwar: Hêvîdar.

Oxilme: Şer, pevçûn.

Rom û 'Ecemî girtiye oxilme bi sef sef
Cohtê Moxulan hatine cengê Hebeşî
(L)

P

Pa: Pê, ling.

Pabend: Girêdana lîngan.

Pabende: Pêgirêdayî.

Pabeste-papeste: *f.* Lingê wî girêdayî
ye. Pê girêdayî.

Pabesteyê qeydê îşqê xwînxwar
Seyda ku Memê kirî birîndar (E.X)

Pabûs: *f.* Lingmaçkirin. Aramî, hizûr,
lî cem.

Dîlberek min dî bi çavan sed
elîfpabûsî bû Agirek berda hinavan
şem' û derfanosî bû (SP)

Paçebend: Benê ku pê balindeyên
mîna baz û eyloyan tîr girêdan.

Dîtin xwe bi paçebend û zengil

Perwaz û firîn mihal û mişkîl (E.X)

Padaş: Mukafat, şabaş.

Padişahê encum: Şahê stêrkan.
Mebest roj e.

Padişahê mesnede xûbî: Tu firîşteyê
textê ciwan î.

Pakbaz: Evîndarên pak. Yê tevgerên
wî pak.

Pakî nedikir: Neditirsiya.

Pakîteb': Xûypak, rûnêrm, dilpak.

Pakîz: Pak.

Pakîze: Paqij, spehî.

Pakîze dura sedef ji dircan

Laîq te ne bû bi gêrî mircan (E.X)

Pakîze siruşt: Xûypak, xweza pak.

Pak tînet: Regezbaş, siruştqenc.

Pakzat: Yê ku tevhev pak be.

Pale: Karkerê çandinîyê.

Didin pale û melûkêşa b'dilê xweş

Didin behra mela, ema li behane
(M.E.F)

Pamal: *k.s.* Di binê lîngan da
herişandin. Şûn pêlav, pêpestkirî,
berze, zelil. Jar û perîşan.

Papûnewe: *k.s.* Pakbûn, temîzbûn.

Paqle: Baqil, bakla.

Parwêk: *k.s.* Parîyek nan.

Pasiban: Pasevan, nobedar.

Wan jî hemî pasîpan ji san in?

Ew jî hemî qismê dergevan in (E.X)

Pasiban ji san in: Pasevan ji segan in.

Paspan: Zêrevan, nobedar. Pasdaz, muhafîz.

Paşan: *k.s.* Piştî hinge, paşê.

Paşehiyê: Paşê, dawîyê.

Pawan: Te'an, perjan. Cihê qedexekirî.

Binefşe sunbul û nesrîn û nergîz

Bi reqs in ta seher pawançî yû diz
(Ş.M.E)

Payan: Dûmahî, dawî.

Dest û payan ji berê zêde bikî, dê te
bikim Mislê Hemmadê 'Ereb, herwekî
Şêx anî biser (M.C)

Paybûs: Ramûsana pê û derîyan.
Rêzgirtina zêde.

Payendaz: Bi jêr da şehkirî.

Paye û cah: Par û meqam.

Pehlû: Perasî. Rex, tenîst.

Pej: Reh û rêşî, çiqil, hej, şax, şitil.

Pejiya: Pêjiya, kemilî.

Pejmûr: Jihevketî.

Pejmurde: *e.* Çilmisîn, pelisîn.
Çilmisî.

Turreya şengi dil aşufte divên

Mihndarên xwe di pejmurde divên
(M.C)

Pek: *k.s.* Asteng.

Pela xûn: Pêla xwînê.

Pele: *k.s.* Lez, ecele.

Peleng: Piling, bebr, qeplan.

Biderin sîne bi ser pence peleng

Romê puşt dit Ecemi bête Fireng
(M.C)

Pelîd: *f.* Pîs, rêzîl, necîs. Xerab,
neqenc. Lewitî û gemarî.

Pel pel kirdin: *k.s.* Ker ker kirin,
parçe parçe kirin.

Pena: *k.s.* Sitare.

Penah: Îltîca, pena, star, piştgirî,
stargeh. Muhafîz, pasvan.

Penah û newa: Hawar û gazî û
piştevan.

Penbe: *k.s.* Pembû.

Penc: Neynûkên dirîndeyan

Pence: *k.s.* Tilîk, pence.

Pencebaz: *k.s.* Ew ê ku pençeyê wî
wekî baz bi hêz .

Pend: Şîret, nesîhet.

Pendê xelet: Şîretên çewt û xelet.

Pendi gîr: Bi şîretê bike, guh bidîyê.

Pengîyan: Tijîbûn

Penhan: Veşartî.

Vê illetê beyan bike

Bes vê surê penhan bike

Carek li min beyan bike

Da seh bikim ez qîssetê (F.T)

Perandibûn: Firandibûn.

Perbeste: *k.s.* Derbestî.

Perçem: Temerî, bisk, zulf.

Kagul kinbûne turre her sû

Perçem kinbûne zîlf û gêsû (E.X)

Perde. Perdeya muzîkê.

Perdedar-perdeder: Bi perde, di pişt perdeyan, veşartî. Ya/ê ku razan dîyar dike.

Şem'î, ne ji qismê nûr û narî

Şemsî, ji eyan tu perdedarî! (E.X)

Perdegî: Keça bi şerm.

Perdeguşa: Yê ku perdeyê li ser tişteki radike. Razder.

Perdekeş: Yê ku perde avêtiye li ser razan. Mebest Xweda ye.

Lê perdekeşê rimûzê hîkmet

Bê sir nekir ew kinûzê qismet (E.X)

Perdenişîn: Yê ku li pişt perdê rûdinê; kesê pak.

Perdepûş: Kesê ku eybekî bibîne çavên xwe jê digre.

Perdesera: Seraperde , konê mezin. Sitare.

Perdeya zelalê: Perdeya rêwindabûnê.

Perende: Balinde, teyr, ajelên bi per.

Pereng: 1.Piring, pizot, agir. Perengê agir. 2.Pel.

Min dîye mihbet çi reng e

Suhtime doja pereng e (F.T)

Perê: Perî, bedew.

Perêht: Peritand, şewitand.

Perêhtîne: Peritandine, şewitandine.

Perê ka: k.s. Hebên kayê.

Pergar: Pergal, Alava ku pê daîre çêdibin.

Perhîz-perhêz: Parastin, xwedûrkin, devjêberdan.

Perind: Gir.

Peristar: Xizmetkar.

Perişan: Perperit bûyî.

Perîçehre: Sîmahorî, rûperî.

Perhîz: Pakkirina nefsê; dûrbûna ji tiştên heram. Parastin.

Perîmisal: Wek perîyan.

Serhelqeyê wan perîmîsalan

Sertacê ewan melexîsalan (E.X)

Perîruksar: Dêmpêrî, pir bedew.

Perîşanxatir: Kesê ku bala wî tevlihev e. Şexsê ku xatirê wî perîşan e. Dilperîşan.

Perîtîn: Peritand.

Cewra te behîtin û cefaya te perîtin
Qurbani te bim guh bide carek gilehê min (M.C)

Perkar: Peygar, peyger. Alava ku pê xetên girover çêdibin.

Perkende: Perîşan, tarûmar, belawela.
Ziyade xemzede hem dil tijî dax
Gelek perkende bêçare ne wek sax (Ş.M.E)

Pero: Perçeyê qumaş.

Peroşî: k.s. Hêzeke pir bi hêz.

Rûte le seyrî poştayek bû çi xoşî wit:

Seyrî heye feres ke peroşî cilî şika (MW)

Perpût: *k.s.* Jihevketî.

Perr: Bask.

Pertal: Malê bazirganîyê.

Li ku dest dide bo te ev tarzê genc,
Ku pertalê xwe tu bikî bîstûpenc?
(M.X.S)

Pertew: Tişk, tîrêj, ronahî.

Perû: Xelat

Pertewa cemalê: Ronahîya
xweşikîyê.

Perwa: 1.Tirs, pîxav 2.Têkilî,
peywendî.

Perwanesifet: Weke perperokên dora
agir.

Perwanê: Perperokên ku bi şev li
dora agir û ronahîyê digerin û xwe
davêjin agir.

Perwaz: Firîn.

Perwazî: Firînî

Perwer: 1.Serpereştîker 2.Dilsoz.

Perwerd: Perwerdebûyî, terbîyebûyî.

Perwerde: Terbîye, fêr kirin

Perwerdîgar: Xwedanker, yê kesan
perwerde dike. Mebest Xweda ye.

Ellah nîgehdarê te bî,ey tacidarê
Xeznewî Perwerdîgar yarê te bî,ey
sehriyarê Xeznewî (M.M.E.H)

Perwerîş: Xwedîkirin û fêrkirin.

Perwerî: Perwerdekirin.

Ez pêlewer im, ne gewherî me

Xudreste me ez, ne perwerî me (E.X)

Perwewar: Wekî perwaneyê, wekî
perperokê.

Perweş: Perweşîn, tîra ku bask jê
dipekin.

Burhên ji qewsê qudret, nîşane kir
Nişani Lami' ji ber dibarin, çi
yengîyek weh perweş? (M.C)

Perwîn: Komikeke stêrkan, Ulker,
Sureyya.

Perwîz: Biserketî, nasnavê Key-
Xusrew bû.

Perxaş: Şer.

Pes: *f.* 1.Madem, hemin. 2.Pişt. 3.Êdî.

Pesenddîde: *k.s.* Pesendkirin,
pejirandin.

Pesmande: *f.* Paşdemayî.

Pester: Kêmtir, nizimtir.

Peşeng: Di Şahnameyê da, kurê
padişahê Tûranîyan ku di navbera wî û
Gîw da şer çêbûye.

Peşêw: *k.s.* Xembar.

Peşêwan: Serê wan têk çûye. Rewşa
wan ne baş e.

Peşîman: Poşman.

Peşim: Hirî, sûf.

Pet: *k.s.* Kindir, werîs.

Petot: Gelekî pîr û kal, rizîyayî.

Petyare: *k.s.* Xuyxerab, Xerabker.
Kiryarxerab.

Pexşawe: *k.s.* Belaw bûye.

Peyade: Peya.

Ey rakibê waqî peyadê!

Wey aşîqê sefheyêd-i sade! (E.X)

Peyak: Pîyon, berik.

Dil maye li pencer û şibakan

Hepsê xwe dida li cih peyakan (E.X)

Peyam: Mesaj, bersivname.

Ey dil! Tu ku lê dikî selamê

Zû bîne ve bo me ra peyamê (E.X)

Peyamber: Pêxember.

Erwahê ji me'neya peyamber,

Çêbûn, mesela nebat û şekker (E.X)

Peyapey: Li pey hev.

Peyaz: *f.* Pîvaz, pîyaz.

Peyember: Pêxember.

Peygan: Peykan, Sertîr.

'Iswe û terz û eda û xemze û fikr û
negeh Wê cûda heryek nihan tavête dil
peyganekî (P.B.H)

Peyk: *f.* Qasid, yê ku xeber û nameyan
dibe û tîne. Peyka stêrkan. Sintîrik

Peykan: Hesinê tûj yê di serê tîran da,
Sintîrik, sertîr.

Peykana qizil: Sertîra sor.

Peyker: *f.* 1.Rû, çehre, sîma 2.Heykel.

Ew herdu puser wekî du peyker

Tabende bi şîklê şahê exter (E.X)

Peykê heremê: Qasidê mala yarê.

Peymane: Qedeha meyê.

Li sînge dit hero sed şûşeyî 'ehd

Ji new qayim dikit peymanê dîsa (E.X)

Peyrew: Şopajo.Kesê ku dide pey
hinekên mezin mîna şexan û welîyan.

Peywend: Bend, girêdan.

Kan qewl û. qerar û ehd û peywend,
Peyman û qesem, yemîn û sewgend?
(E.X)

Peyweste: Hertim, daîm. Li pey hev.

Peyweste bû: Daîm bû, berdewam bû.

Peywir: Wezîfe, gorev

Peyxam: Nûçe, peyam, xeber.

Peyxamî: Qasid, xeberbir.

Dilo mizgîn e min şabe, ku sultanê me
dê betin

Ji min bawer ke. peyxamî seher
mizgîn bi min pê da (M.C)

Pêç: *k.s.* Poşîya serê jinan.

Pêç: Girê û xwarî.

Pêça we: *k.s.* Derdor girtî.

Pê çû: *k.s.* Feft bû, mir.

Pêç û tab: *k.s.* Derz, tewq. Ji bo ku
tiştên ku li hev tên tewandin.

Pêç û helqe: Girê û xelek.

Perîşan im ji wê zulfa perîşan

Bi peç û helqe wek davan e dîsa
(P.B.H)

Pêgeyîw: Kesê gihiştî.

Pê geywîn: *k.s.* Pêgihîştin, kamilbûn.

Pêht: Pêt.

Pêkewe na bin: *k.s.* Bi hevra nabin.

Pêkve: Bi hevra pevra.

Pêlek: Demek.

Pê lê nihaî: Pê lê kirî, pê danî ser.

Pênhan: *f.* Veşartî, nixumî, temartî.

Vê illetê beyan bike

Bes vê surê penhan bike

Carek li min beyan bike

Da seh bikim ez (F.T)

Pêrar: Sala berî par, berî du salan.

Pêro: Komeke stêrkan e. Sureyya.
Komika sêwîyan.

Pêşûs: Lambe, çira

Pêşdest: Berdest, li ber.

Qest û daxwaza Melê daîm ji can û dil
ev e Her di benda xizmetê pêşdestê
didarê te bî (M.C)

Pêşekî: *k.s.* Pêşgotin.

Pêşewa: Rêveber, rêber.

Pêşîwar: Ya/ê li pêşîyê, yê layiqê
pêşîyê.

Muhemmed resûlê Xwedaye hinar,
Ji bo ins û cin û melek pêşîwar
(M.X.S)

Pêşrew: Ya/ê ku li pêş diçe. Serek,
pêşeng.

Wê pêşrewê batin revam

Yexma kirim sîmînberê (M.C)

Pêşter: Pêştir, ya li pêş.

Pêt: Gurî.

Pêtek: Çirûsk.

Pêvedin: Pê biparêzin.

Pêvketin: Lihevhatin.

Pêwend: *k.s.* Kelepçe, qeyd û bend û
pêyan.

Pêxemberistan: Welatê pêxemberan.

Pêyekî ta pêma na: *k.s.* Lingê xwe
danî ser min.

Pêy wit: *k.s.* Ji bo wî got.

Pîçê: Piçek, misqalek.

Pîçiya: Geriya, hat pêçandin.

Dîsan xwe gîhande wan hebîban

Ew lê piçîya wekî reqîban (E.X)

Pider: *k.s.* Bav, peder.

Piderwar: Bavikwar

Pilî Sîrat: Pira siratê.

Pilox: Pizot, piringê agir, perçeyê agir.

Lew heriftim ez ji meylê, şubhetê sihlê
û seylê

Muhbet û îşqa di leylê, ez kirim yekser
pilox (M.C)

Pilte: Fitîl.

Pinhan: Veşarî

Pirand: Firand.

Ew qulzemê xem kelî bi ser coş
Ser coş û kelî, pirande serpoş (E.X)

Piraye: *f.* Alavên jinan ên makyajê.

Pirbêjî: Axaftina pir.

Her çendî ku min qewî dirêj kir
Pirbêjiye, ser li te me gêj kir (E.X)

Pircefa: Kesê ku derdên wî pir in.

Pir dene: Penciklêxistin.

Pirgunahî: Gunehên pir.

Mehrûm-i nebûn bi pirgunahî

Bûn mezherê rehmeta îlahî

Pirhewes: Pirhêvî.

Ew bilbil eger çi pirhewes bû
Zindanê beden li wî qefes bû (E.X)

Pirî: Firandî.

Pirnûr: Pir bi ronî.

Her gul ji mîsalê atêşê Tûr

Yek meş'elê be qusûrê pirnûr (E.X)

Pirr tab: *k.s.* Pêç û lûl. Badan, yîw.

Pirsira hal im: *k.s.* Halê min pirsî.

Pirtewfişan: *k.s.* Tîrêjdayîn, tîrêjbelavkirin.

Pirişîş: *f.* Pirsîyar.

Pirtab: Avêtî; yanî bê hesab xwe davêje nava agir wek perwaneyê, mebest evîndar e.

Pirûpûçî: *k.s.* Tiştên nebaş.

Pis: Kur.

Pisa: *k.s.* Qetandin.

Piş'k: Pişik, pixik, cegera spî.

Pişkil: *k.s.* Bişkul.

Pişkinî: *k.s.* Gerîn li her cihî. Venêrîn, li dûv çûn.

Pişko: *k.s.* Bizot.

Pişkutiwe: *k.s.* Peyda bûye.

Pişmînek: Cilikê ji herîyê çêkirî.

Pişî: Piştgirî.

Piştekûz: Piştûz, piştwar.

Were êdî temaşa ke 'ecûzê

Bibîne zulm û xedra piştikûzê (Ş.M.E)

Pişî: Bar, çente, barê mirov davêje piştê xwe.

Pişkertme kirin: Mahrkirina di landikê da.

Piyade: Pîyon, berikên kişik/setrencê.

Piyal: *k.s.* Îskan peyale, qedeha meyê.

Piyale. Qedeh

Piyaw: *k.s.* Mêr, peya.

Pîç û tab: Xelek û gire.

Pîda: Peyda, eşkere.

Pîç û xem: Girê û xelek.

Pîldar: Falavêj.

Pîlek: Pêlek, demek.

Pîlewer: Ettar.

Pîlox: 1. Pizotê agir. 2. Pelixandî. 3. Pixpixandî.

Pîlawî: *k.s.* Kincên pînekirî.

Pîran: *k.s.* Ji ber girîyê pir an kenê pir birîna nefesê.

Pîraye: Xeml û xêz.

Pîraye ji rewneqa cemalê

Bû hale li xermena hîlalê (E.X)

Pîrayîş: *f.* Xweşikkirin, rindkirin.

Pîezen: Pîrejîn.

Pîroz: Bimbarek.

Paşayê li sertext î,şewket li te pîroz e
Razî me ji vî bextî,her îde û newroz e
(M.M.E.H)

Pîreda: Pîrik, dêya merivan.

Pîrehen-Pîrahen: Kiras.

Pîrê meyxwer: Şêxê meynoş. Şêxê terîqetê.

Hetta ne bi destê pîrê meyxwer

Ew hel kelitin di xummê ekber (E.X)

Pîrê moxan: Pîrê Meyxaneyê.

Bi yekcarî ji dest çû me hewar e

Meded pîrê moxan ê bordibar e
(Ş.M.E)

Pîrê muyxan: Pîrê Meyxaneyê.

Pîrê Xerabatê: Serekeyê meyxaneyê, murşid, pîr.

De bikin pîrê xerabatê meger ew hel
bike Wa'iz û muftî nizanin beyt û
eş'arên di min (M)

Pîrê zall: *k.s.* Pîrê rûspî. Mebest dinya
ye.

Pîrî Pîranî Buxara: Behaeddîn
Mihemed kurê Ehmed Farûq e. Wekî.
Şahê Neqşebend navdar bûye. Di sala
1389an da wefat kiriye. Terîqeta
nexşebendî bi navê wî hatiye avakirin.

Pîş: Pêşî.

Pîşe: Kar, huner.

Pîşeyê wan xenc û naz e
Sin'etê aşîq nîyaz e (M.C)

Pîşekar: Xizmetkar.

Pîşok: *k.s.* Giyayekî ku biharê
derdive. Tê xwarinê.

Pît: Sindoq.

Pîyawetî: *k.s.* Mêrxasî.

Pol: Pere.

Post: *k.s.* Qalik.

Poş: Cil, perde.

Poşî: Pêçe, niqab.

Bila rûzerdê bê talî binoşî
Ji vê şekerfema sîma dipoşî (Ş.M.E)

Poşîde: Lixwekirî.

Poşîn: Xwe pêçan, xwe girtin.

Şahîn û bi xef bi libsî dîba
Zahir ji xwe em pelasî pošîn (E.X)

Poşte: *k.s.* Berevajê rût, kesê ku cil û
bergên wî heye. Dewlemend, zengîn.

Poxte: *f.* Pehtî, pijîyayî.

Ji wan pertawê ab û ateşe cam
Bikim poxte dilê napoxteyê xam
(Ş.M.E)

Poyende: Bi meş û liv.

Goyende hinek, hinek di xamûş
Poyende hinek, hinek di medhûş (E.X)

Pur: Pir, gelek, tije.

Purlu'luwê enmsûrî bî: Weke durên
yên liblibkirî bî.

Purnigar: Tijî nexş û nîgar.

Purr: Tijî.

Pursir: Pir bi cazîbe, xwînşîrîn.
Hebîba keckuleh purheybeta şah
Zerîfa nazika pursir dilagah (Ş.M.E)

Pursiş: Pirsîyar, lêgirtin.

Puser: Kur, lawik.

Pustan: paxil, pêşîr.
Heta bû şîrî ew xwûna sîyehreng
Kete pûstanê mader saf û bê zeng
(Ş.M.E)

Put: Senem. Peykera ku jê ra perestî
dibe. Sembola jina xweşik e.

Putkede: Pûtxane.

Ger xwe nîşan sequerê dit dikirit horê
bihişt Ke'beya tê nebit ew putkede ye
dêr û kenîşt (M.C)

Puxt: Gihaştin.

Puxte: Pehtî, Stewîyayî û birijî.

Pûd: *k.l.* Lûf.

Dilî dîrum xerîdarê mehebbet
Kezû germest bazarê mehebbet
Lîbasî baftem ber qametê dil

Zi pûdê mîhnet û tare mehebbet
(B.T.U)

Pûl: Pere, dirav.

Pûlad: Pola.

Pûr: *f.* Kur.

Pûrî Merwane: Emerê kurê
Ebdulezîz e ku ew jî nevîyê Merwanê
kurê Hekem e.

Pûş: Giyayê zer û hişk. Qirş, ka.

Pûşî: Cil.

Pûşîş: *f.* Poşekirin, pêçandin.

Pût: *k.s.* Pûç, xerab.

Pûtxane: Xaniyê pûtan. Cihê ku pût di
tê da tên perestin.

Q

Qab: Qeder, miqdar, navbera koşê
kevan û pêgirtoka wî.

Qabê-qewsen: Navbeyna birûyan.

Qabê qewseyn: Navbera du birûyan;
ewqas nêzîk.

Qabil: Dikare, amade.

Qabilê cefa: Zorhilgir; yê xwe li ber
êş û zorîyan radigire û xurt e.

Qabilê wisal: Hêjayê hevdîtin û
bihevgihiştinê.

Qabilê zewale: Ji çûn û wendabûnê ra
amade ye.

Qabilunnar: Hêjayî agir. Şewatpêjer.

Qabilî: Kêrhatin û şarezayî.

Qabîlun-nar: Misteheqê agir.

Qabî qewseyn: Miqdarê du kevanan,
bi qederê du kevanan, kevanê wucûb û
îmkanê .

Qadir: *e.* Bihêz. Xwedan şîyan.

Tu me'nayê şehdê ku bawer bikî,
Teleffuz eger qadirî pê bikî (M.X.S)

Qadir heyê: Dike ku bibe.

Qadir nedibûn: Nikaribûn.

Qaf: Çîyayekî efsanewî ye.

Qafî ta qaf: Hawîrdor, her cih û war.

Qaf û qaf: Çîya bi çîya, bi qasî çîyayê
Qafê mezin.

Qail: Gotox, bêjer.

Qaim: Her li pêyan e.

Qaim dibitin: Pêk tê.

Qaîm: 1.Kese ku hebûna wî bi wî ye,
Xweda. 2.Li ser lîngan.

Qal: *e.*1.Gotin, galgal. Peyv. Behs. 2.
Qalik, sebeta sîngê.

Qale: Got.

Qalet: Ew ê got.

Qale: “Uktub La îlahe îlla Ene: Got:
Binivîse: ti Xweda nînin ji bilî min.

Qalib: Laş, beden, ten. Qalik.

Qalib, muhît, miqyas, muşîr,
miqras: Amûrên hendeseyê û pîvana
erdê ne.

Qalibê etal: Laş.

Qalibê qelp: Ew gewdeyê qelp.

Qalib û meqlûb: Laş û can.

Qal û Qil: Gotgotin.

Qalû bela: Gotin belê. Wê roja ku Xwedê ji rihan ra gotîye “Ma ez ne Xwedayê we me?” wan jî gotîye: “Belê”

Xwe wenda kin bibîn "Qalû bela" ye Hezaran can û dil bo te fida ye (Ş.M.E)

Qaluqîl: e. Gotegot.

Qame: Rabû.

Qamet: Bejn û bal.

Qamet û bejna çeleng bir li me namus û reng.

Zî û kemañçe û beng dan li me tîr û xedeng (SP)

Qameta: Bejn.

Qameta senewber: Bejna ku mîna kajedarê ye.

Qamêta şimşad: e. Bilind û bedew.

Qamet çivîyayî: Bejin tewîyayî, piştixûz.

Qametê meyyad: Bejna ku liba dibe, balê dikişîne.

Qametzumerred: Bejinzumrûd, weke zumrûda kesk.

Qamî qiyamet: e. Hatina roja qiyametê, roja heşrê.

Qanî': e. Razîbûn, qanîbûn. Razî, qanî.

Bike îhsan evê nefsa teme'kar

Dibit qanî' ji îhsana te ey yar (Ş.M.E)

Qanî: Pir sor, sorexwîn.

Kafûre mîsil, îzarê qanî

Sorgul gerîyane za'feranî (E.X)

Qanûn: 1.Pergal, nîzam, zagon, aheng, pîvan 2. Alaveke muzîkê ye.

Qanûn û rubab: Du alevên muzîkê ne.

Qanûnên tekwinîyye: Qanûnên fitrî, siruştî, sûnnetellah.

Qanûnên teşrîyye: Qanûnên damezirandî, yên wez'î

Qapî: t. Derî, der.

Qar: k.s. Kîn.

Qar: Ya/ê ku di parêkirin û qurakirinê da dibe herî dawîn.

Qardo: Qardox, Qardoxî, Baqarda. Navê kurda yê demên kevnar.

Qariê Qur'an: e. Qur'anxwîn.

Qarûn: Yek ji dewlemendê Cihûyan e. Di serdema Mûsa pêxember da jîyaye.

Qarûr-Qarûre: Şûşe.

Werîne saqîyê esrarê dîlber

Hinek qarûre muhir miskê ber ser (Ş.M.E)

Qasid: Resûl, pêxember, peyamber, şandî.

Qasir: 1.Nezan, nekar, negihîştî. 2.Kin, kurt.

Qasirnezer: Hişvêl; kesê ku kûr û dûr nabîne.

Qat: k.s. Nema, tune.

Qatil: Kujer.

Qatilê nefse: Kujerê nefse.

Qati'terîq: *e.* Rêbir.

Qatî bûye: *k.s.* Nemaye.

Qazî: Dadmend, dadyar.

Qeba: *e.* 1.Kefî, kevnîk, egal. 2.Eba.

Qeba gulgûn: Kirasê gulgulî.

Qebahet: Karê pîs.

Qebaîh: Guneh in.

Qebayîl: Qebîleyan. Piraniya qebîleyê ye. Êl û eşîr.

Qebd: Tewirêkî şekirê.

Qebde: Desteyek, mistek, kulmek.

Her ji kevanê biweş, qebde zerê goşe reş
Gezme bi cuht tene dil, kes dimirit bê
ecel? (M.C)

Qebes: 1.Pizotê agir, çirûsk. Perçeyê agir.
2.Perçeyê tiştêkî, jêgirtî.

Qebes îsa: Pizotê agir û ronî da.

Qebir helken: *k.s.* Ew kesê ku qebrê vedikole.

Qebîleya ricalan: Koma meran.

Qebîlê Ekrad: Neteweya Kurd.

Qebîlê pakbazan: Koma evîndarên pak.

Qebîlê 'uşşaq: Koma evîndaran.

Qeble en temûtû: Berî ku hûn bimirin.

Qebî: Berî min.

Qebûlî: Pejirandin, qencî.

Qebze: Serwerî, desthilatdarî, rêveberî.

Girtî yek qebzek ji nûra xwe, Xweda,
Gote wî "kûnî hebîbî Ehmeda" (M.B)

Qeçer-Qecer: Navê eşîreke Tirkmenan *e.* Xweşbez. Bipê.

Qed: Miheqeq. Bêguman.

Qedd: Bejn.

'Er'er-xerama bi qedd û qamet

Yek bûse da me bi sed qîyamet (M.C)

Qeddê 'er'er: Bejna rast.

Qeddirand: Teqdîr kir; çêkir, parve kir.

Qedd-Qed: *e.* Bejn û bal.

Qedd û qamet: Bejn û bal.

Qed efleh: *e.* Bi rastî ew serfiraz bûne.

Qedehnûş: Meyxur, meynoş.

Qedem: *e.* Pê, ling, nig.

Qederek hal: Miqdarek ji zanîna hal.

Qedê meyyal: Bejna ku liba dibe, bejna kubar.

Qedirandin: Texmînkirin

Qedîd: Goştê hişkbûyî, goştê bê gîyan. Goştê ziwa.

Şêxê weku ez bi dil mirîd im

Ew rûh û rewane, ez qedîd im (E.X)

Qedîf: Qumaşê qedîfe.

Qedîm :*e.* Kesê ku ji berêya berê ve heye, Xweda. Kevnar, her heyî. Kevn, herhebûyî.

Qedîmî mutleq: *e.* Xweda ye. Yê ku bi zat û dem qedîm *e.*

Qedîr: Xurt, bi hêz, Xweda.

Arifê cewher-şunasî, ê bi vî wesf û lîbasî
Dê qedir bêhtir binasî, meq'edê sidqê ceza ye! (M.C)

Qedneyşeker: Bejna weke qamişê şekir.

Qed serwe: *f.* Bejna wek dara selwîyê.

Qed û qam: *f.* Bejn û bal.

Qe'ed: Rûnişt, danişt.

Qef: Berqef, stargeha ji tehtê.

Wer tu negrî destê min dê ez li ber pêla kevim

Nagirim qef û qerarê ta biçim gêra delal (M.E.F)

Qefa: Li pey.

Qefes: 1.Qefesa heywanan. 2.Sîng.

Qeff: Derketina ji avê bi kevîyan ve.

Qehir: *e.* Qehr, xezeb. Zordarî, tundî.

Qehhar: Pir bi xişim, Xweda.

Nema şey'ek bi destê me bi yekcar
Temamê alemê bû mulkê Qehhar (Ş.M.E)

Qehram: Çêle, têtîk, nazik.

Qeht: *e.* Xelayî.

Qehtî: Xela.

Meqber ku tijî bin wekî bîr û
qenewatan Ger qehtî û xela ye ji bo
me 'eles (M.M.M)

Qel: Balindeyekî reş *e.*

Qelaş: Hîlebaz û pîs.

Qelb: Dil.

Qelbê cami': Dilê ku tiştan tomar dike, di xwe da dicivîne.

Qelbê e'yan dikirit: Rastî û hebûnê diguherîne.

Qelbê şîşe: Du wateyên wê hene. Yek dil ango mey ji dilê şûşeyê rijîya. Ya din jî dil qulibandine ango mey ji qulibîna şûşeyê rijîya.

Qelbê xemnak: Dilê xemgîn.

Qelbî: Dilê min.

Qel'e: *e.* Kele, qele.

Qelem: *e.* Pênûs, xame. Pênûsa hemî bûyerên li cem Xweda.

Qelem dadedem: *k.s.* Tûjkirina serê pênûsê.

Qelem ket: Bibire, jêke.

Qelender: Ew kesê barê giran dikişîne, an jî kesê girêdayîyê terîqata Qelenderîyê ye.

Qelîl: *e.* Hindik.

Qelîl-ul fesad û kesîr-ul 'emel,
Sedûq-ul lisanî qelîl-uz zeel! (M.X.S)

Qelîl û zelal: *e.* Hindik û safî.

Qelîl xilaf: Dijber hindik bûn.

Qella': Dergevanê kelehê.

Daîm li derê wî qapûcî bû
Qella'û qela û qehwecî bû (E.X)

Qellaş: Dilêr, Wêrek.

Qelp: Madenê erzan, pereye bînirx.
Dexel û sexte.

Qelq: *f.* Qiliqandin, qilqilandin, libat.

Qelq: Bêaramî, bêsemaxî.

Qelqe: Hejîn û tevrabûn.

Bû qelqeleyek di qelbê xemgîn
Esla ne dibû di xanî teskin (E.X)

Qelûçk: Qalikê hişk

Qelzem: *f.* Derya.

Qemer: Heyv, hîv.

Şems û qemer û şu'le ji ruye te veda bû
Ya mûm ji te bû mûm û şemalî ji ayîn
e (M.C)

Qemerê tali': Hîva ku derketîye.

Qemqam û yem: Derya, behr.

Qems: Derewçîn, virek.

Ew çende di meclisan gerandin

Ew çende bi qemsîyan gîhandin (E.X)

Qenbel: Alîyê çepê. Çep.

Qend: Şekir, şerbeta şekir. Şerbeta
qamişê şekir.

Qendexayan: Yên ku peyvên wan,
wek ku şekir xwaribin şîrîn in.

Gulpîrehen û semenqebayan
Şekkerdehenan û qendexayan (E.X)

Qendîl: Lambe, çiradank.

Qendîlê felek: Roj.

Qendîlê qefes: Çira sîngê: Dil.

Qend û nebat: Şîranî, şekir; gotinên
xweş.

Qend û şeker: Şîranî.

Qendxa: Ya ku şekir dikeritîne, keça
gotin şîrîn.

Qentar: 1.Mêzîna ku tiştan dikişîne,
diwezinîne. 2.Quntar.

Gavek ji dengê zengilan

Ê min çi rûnin menzilan?

Hey hey dibînin mehmilan!

Firyad e her qentari çerx (M.C)

Qeqnes: Balindeyeke efsanewî ye.

Qer: Reş.

Qer': Lê xistin, tehmdan.

Qerabe: *k.s.* Kûpê meyê.

Qeral: Qral, şah, padişah.

Qeran: Nêzîkî hev.

Qeranî: Nêzîkî hev.

Qerar: Rawestan, rehetî.

Qerd: Meymûn.

Qerye: Gund

Qerewîl: Nobet.

Qerh: Kul, birîn.

Bê cerhe û qerhe û birîn e

Navê li wî derdî her evin e (E.X)

Qerh û cerahet: Birîn.

Qerîb: *e.* Nêzîk.

Ji hevdu nê qerîb û nê gelek dûr

Ez û rûbeh heta çûn çayeka dûr
(Ş.M.E)

Qerîn-qerîne: *e.* Heval. Hevalê nêz.
Hevalê nêzîk û samîmî.

Qer kir: Qerz kir, deyn kir.

Qern: 'Esr, sedsal.

Qerqef: Mey, bade, şerab.Cureyekî
meyê.

Ji şehkasa ku qerqef tê

Meya nûrin muşerref tê (M.C)

Qer' û inbîq: Du aman û firaqên
kîmyageran in.

Qeryetan: Xas bûye, qeryatan ji bo
Meke û Medîneyê tê gotin.

Qerz: Deyn.

Uslûb û sîfat û mane û lefz

Esla nekirin me yek ji wan qerz (E.X)

Qesar: Cil spî

Qesaret: Şûştin. Di arava pîs da werdan.

Qesaret kir: Pak kir, şûşt.

Qesd û xerez: Mebest û daxwaz.

Qeseb: 1. Destîyê şûr û tîran. : Rimên dirêj. 2. Têl, têtên zêrîn. Mebest porên zer e. Bendikên kumên jinan. 3. Qamiş.

Serbendê qeseb didan cebînê

Aşiq dimirin ji dest evînê (E.X)

Qesem, yemîn û sîgend: Sond.

Qesîd: e. Qesîde.

Qesîy: Durû.

Qesrê Şehbal: Qesra Şahê Perîyan.

Qesrî xuld: k.s. Koşka ku mirin tê da nîn e. Mebest bihuşt e.

Qessar: 1. Ya/ê ku tiştan pak dike, lekeyan jê dibe. 2. Birrîn, birek, qutkirox.

Şukur şev çû û roj hat e

Xwedê xessal û qessar e (F.T)

Qess'e: Kas, kasik.

Qesr: Kurt.

Qet: e. Hergiz, tew.

Qet'a: Tu car, hîç.

Qetal: Kuştî.

Qetaya: Qitik. Balindeyê navdar.

Qete: Dilop.

Qet'e: Parçehelbest, beşek ji helbestê.

Tu behra şîrê şêrîn ey şekerken

Umîd nakim qetê' kî şîrê ez men (Ş.M.E)

Qet'en: Bêguman.

Qetîl: Kuştî.

Ji herba sehaban mekin qal û qîl,

Bihiştîne hem qatîl û hem qetîl (M.X.S)

Qetlê mubah: Kuştina rewa, kuştina caiz.

Qetmer: f. Kulîlk, çiçek.

Qetre: Dilop

Qetrîne: Çara Rusî Qetrîneya duyem. (1729-1796).

Qettal: Mêrkuj, kujer.

Qettalan: Kujekdar, kujer. (Mebest pirkuştine). Mêrkuj, yê ku pir dikuje.

Qett'i: Birrîn.

Qewam û quwwet: Hêz û tewanî.

Qewariyir: Şûşe.

Qewatîne lîsan: Gotinên bi devkî, hinek gotin.

Qewi: Rûtirş e

Qewî: Gelek, xurt. Pir, bi tundî, dijwar.

Qewî canî: Kujer, gunehkar.

Qewl: Soz, gotin, peyv.

Qewlê qedîm: Îctîhad û dîtinên îmamê Şafiî, yên dema ku li Iraqê dijî.

Qewlê ze'îf: Gotina lawaz, bawerîya qels.

Qewm û xwêş: k.s. Xîzm û eqrebe, kes û kar.

Qews: Kevan. Birûyên weke kevanan.

Qewser û deysem û dilhas: Şêr

Qewseyan: Herdu birûyên weke kevanan.

Qewsê ebrû: Kevanê birûyan.

Qewsê eflak: Kevanê felekan. Mebest hîva yekşevî ye.

Qewsê hilalî: Birûyên wek hîlale, weke kevanan.

Qewsê purweş: Kevanên tîravêj; awirên birûyan.

Qewsê qezeh: Keskesor, bûkabaranê

Qewsê şevîn: Kevanên wek şevê reş. Birû, ebrû.

Qewsûqeseh: Qozeqer, keskesor.

Qewşên xelek: Kevanên tewandî; Birû, ebrû.

Qewwad: Îtaetkar, hezgo.

Qewwal: Stranbêj, yê ku dibêje, goyende. Yê qewlan dibêje. Qewlbêj.

Qewwal û mixennî û xezelxwan

Mexmûr û sîyah û mest û sekran (E.X)

Qewwel: Qeşmer.

Qeyd: e. Bend, zincîr. Girêk, girêdan.

Qey kirdin: k.s. Vereşandin.

Qeyl: Mîr .

Qeys: Mecnûn, lehengê çîroka di Leyla û Mecnûn da. Evîndarê Leylê, Mecnûn e.

Leyla te kire bela li Qeys-î!

Ramîn bi te ram-i bû li Weysî! (E.X)

Qeyser: Serokekî Romê ye.

Qeyserê Rûmê: Şahê Romê, Qralê Romê.

Qeyserî: Çarşîya sergirtî, sûka sergirtî. Sûk, bazar.

Tersî'i kirin wekî biçûkan

Înane bi qeyserî û sûkan (E.X)

Qeyyûm: Karbidest. Navekî Xwedê ye, yê bêdestpêk, bêdawî, bi serê xwe, ne hewce û hwd.

Qeyyûmî: Biserêxwebûn, herhebûn.

Qez: Qumaşê sade hevrîşim.

Qeza: 1.Qeder. 2.Nimêja derengmayî.

Qeza û qeder: e. Pîvanekî îmanê ye.

Qezayê hacet: Pêkanîna daxwazan.

Qeziyye: Mesele, arîşe. Bûyer,rûdan.

Rabûne ve cimle çûne nik Mîr

Ev renge kirin qezîyye teqrîr (E.X)

Qibab: Qube, qubeya ku dinixwimîne, vedişêre.

Serpoş û qibaba me ye tesbîh û musella Wer da bidirînin li xwe vê perde û niqabê (M.C)

Qiblegah: Cihê ku nimêjan da meriv berê xwe didê.

Qiblegeha ebrû: Birûyên ku wekî qibleyê ne.

Qidem: Pêşîya pêşî, bêdestpêk. Ezeli, ezeliyet.

Qidemî: Qedîmî, her hebûn.

Qidem pus: f. Pê maç kirin.

Qidr-i: Dîz, dîzik.

Qilade: Ristik., gerdênî, milwank.

Lazim ewe dîlberêd-i sade

Xet lê nebitin wekî qîlade (E.X)

Qil û qal: Gotinên pûç û vala.

Hasil ji qîl û qalê, dîl zêde pir melal bû

Dil zêdepir melal bû, hasil ji qîl û qalî

(H.F.H)

Qinar: Çengelê ku goşt pê ve tê daleqandin.

Qinare: Cihê ku laşên gurandî li selexaneyê pê ve dadiliqîn.

Qinîn: Şûşe.

Qintar: Qenter, mêzîna giran û mezin.

Qinwan: Goşî.

Ew hûbbê hebîbê pakî zat e

Qînwanê hedîqeyê sîfat e (E.X)

Qir: k.s. Qirkirin, neman.

Qir: Qijik.

Qiran: Nêzîkayî, kombûn, nêzîkbûn.

Birû. Rasthatina du stêrkan, nîşanên xweşbextiyê ye.

Qirana yek: Nêzîkî hev.

Qirên: Pevçînîn.

Qirim: k.s. Mirx; xeyalkirina tiştekî xweş di fikirina xwe da.

Qirtasîye: Kaxiz, rûpel; bi mana mecazî ji paxirê sayî ra hatiye gotin.

Qirttas: Kaxez

Qise: k.s. Gotin, axaftin.

Qiset: Çîrok, hîkaye.

Şîrê pê kuştî heqîrî ku ji elmasî ye şulf

Çi qiset bû ew î şîrî ku birî muhbet û ulf? (M.C)

Qisey bê ca: k.s. Gotinên ne xweş, axaftinên ne li cî.

Qism: Teher, cure, nîfş.

Qismet: Beş û par.

Qismê muhib: Nîfşê evîndaran.

Qiss: e. Qis kurê Se'îd.

Zimanrewanekî serdema cahîlîyê ye.

Zimanfesîhekî baş bû.

Qisse: Çîrok.

Qissa: Xîyar, selete.

Qistas: Terazî, mêzîn.

Qışlexan: Qerargeh, bingeha hêzên leşkerî.

Qîst: Tûncik, berenîya piçûçik û xweşik. Bisk, kezîyên hûr. Zilfa piçûk.

Qitar: Kerwan.

Seyyidî heq nezer vêra di îqlîman ilim gera Qitara gewheran vêra ji nêv kana bedexşan têt(E.H)

Qit'e: Kaxez. 2. Parçe, beş.

Qitre: Dilop, peşk.

Qitf: Ber.

Qiyafet: Dirûv û reng û rû.

Qiyam: 1.Rabûn, serhildan.

2.Qiyamet, dawîya dinyayê.

Di yewm-il Qiyame me dilşad bike,

Di yumna Muhemmed me derbaz bike (M.X.S)

Qiyam û qu'ûdê: Rabûn û rûniştina di nimêjê da.

Qiyas: Muqayesekirin, liberhevgirtin. Pîvan, berawird. Pîvandin, dan ber hevdu.

Qizil: Sor.

Ah û oxên min j'dil tîn, lê ji ber tîra qizil tîn

Yan ji kovanên di kul tîn, jê dizêt her xwûn û zox (M.C)

Qizilbaş: Sensor; Mebest leşkere Sefewîyan e. Yanî Şîî ne.

Qîbab: 1.Şûrê tûj. 2.Qubbe, qubeya ku dinixwimîne, vedişêre.

Dil kemer besteyê 'îşq e, me xweh zunnari perestîn

Mey û me'şûq e duayê me û seccade qibab e (M.C)

Qîdem: Kevnîtî, bê berî, bê ewwîl.

Qîlade: Gerdenî

Qîlêkî ze'îf: Qewlekî ze'îf. Bawerî bi vê gotinê pir nayê, ji ber ku lawaz e.

Qîl û qal: Gotin û xeberdan.

Qînwan: Weşî, guşî.

Qîr: Reş, reşê tarî.

Qîran: Nêzikayî. Beranber.

Qîrat: Mêzîneke, zêrê bîst û çar qîrat yanî zêrê xwerû zêr e.

Serref-i eger bi bîte Buqrat

Texmîn biketin bi wezn û qîrat (E.X)

Qîra: Gund.

Qîtal: e. Şer, herb, kuştin.

Qîtar: Rêzika hêştiran.

Qîtmîr: e. Navê kuçikê eshabûl kehîf e.

Hem di nîva asîtana Mustefa şadar bikî

Da ku Mîna subhê Qitmîri bibîte xakê der (M)

Qîwam: Hêz.

Qîyam: Rawestin. Li pêya mayîn.

Qol: Bende, qûl, benî

Qore 'eyn: Çav ronî.

Qoşîcî: t. Bezoke.

Qubab: f. Şûrê tûj.

Qubbe: Kumbet, bi mecazî ji asîmanan ra tê gotin.

Qubbeya xedra: Kumbeta kesk, gora pêxember.

Qubul: Pêşî.

Qubûr: Piranîya qebrê ye, gor.

Qudis aşîyan: f. Ew teyrê ku hêlîna wî li cihekî bilind e.

Qudret: Hêz, şîyan û karîn. Qudreta Xwedê teala; hêz û quweta wî. Hêza Xwedê ya bêhempa ku pê diafirîne û çêdike.

Qudretê def'ê: Hêza parastin û mudafekirinê.

Qudsî: Firişteyên pîroz.

Qudsî ayat: e. Nîşanên pîroz.

Qudsîsîfat: Xwedîyê sîfetên pîroz, xwedîyê taybetîyên bêmînak.

Qudsîsîrîşt: Pir pak, weke ferîşteyan, xûymelek.

Qudsîyan: Yên pîroz û pak, ferîşte, milyaket.

Qudûm: *e.* Hatîn.

Qufle: Qefl.

Qulhuwellah xwênekan: Yên ku sûreta Îxlasê dixwînin.

Qullab: Kullab, çengel.

Qullabî gîra: *k.s.* Çengelê tiştgir.

Qulle: Lûtke, serê çîyê, zîrve.

Qulleya teng: Çal û zindana teng.

Qulqul: Mirqemirqa an jî bilqebilqa dengê meyê, dema dagirtina wê bi bal qedehê ve.

Qultebanî: Gulyabanî

Qulûb: Dilan, qelban.

Qulûbê arîfan: *e.* Dilên zanyaran.

Oulûbêmen Iehul-qelb: Dilên kesên xwedî dîl.

Qultû-qulto: Min got.

Qulzem: Deryaya sor.

Qulzema sifatan: Deryaya akarên Xwedê.

Qulzûm: Derya, behr, deryaya sor.

Qum: *e.* Rabûn.

Qum: *k.s.* Qurm, qurç, kutik.

Qumlax: *k.s.* Qerqer, gerger. Cihê ku bi kevir û kuç *e.* Cihê ku tije kevir û ber be û meriv nikare bi hêsanî tê da bimeşe.

Qum qum: Rab rab.

Qumrî: Balindeyek *e.*

Ji qaz û qumriyan û kundê meşûm

Ji bulbul geh gul û perwane û mûm (Ş.M.E)

Qunca selamet: Cihê ewlehîyê.

Qundus: Birceke xweşî û bextewarîyê.

Ew perî weqtê di sundus da, ji qundus bit xwuya

Bende dê şah û geda bit, Xusruwê şêrîn kelim (M.C)

Qundûs: Tarîstan.

Quqnis: Balindeyeke efsanewî ye, Di agir da tê sotin û dibe xwelî, paşê ji xwelîya wê balindeyeke din radibe.

Qurb: *e.* Nêz, nêzîk. Nêzîkayî.

Qur'e: Pişk, beş kirin.

Qurmiz: Sor.

Ew çi dulbend in muselsel ew çi zincîr in kezî

Ew çi mehyûş in çi ala kesk û sor û qurmizî (M)

Qurmizîn: Sor.

Qur pêwan: *k.s.* Herî bi ser xwe da rijandin.

Qurr: *k.s.* Herî.

Qurrbeser: Herî an jî xwelî li ser.

Qurrena: Amûreke muzîkê ye pîfkirinê ye. Ji qiloçan çêdibe.

Qurşek Kemalî: Qurişek pereyê Tirkîyê.

Qurt: Guhar.

Qusûr: *e.* Kêmayî.

Qusur ê aliyat: *e.* Qesrên bilind.

Qutni: Pembû.

Qutta'î terîq: *e.* Rêgir, çete.

Qu'ûd: Rûniştin.

Quwa: Hêz

Quwayê heywan: Hêza jîne. Hêzên jîyanê, sise ne; kezeb, dil û mejî.

Aqî û xîred û şîûrê însan

Hîss û hareket, quwayê heywan (E.X)

Quwwe: *e.* Hêz.

Quwwetê derrake: Hêza ku pir têdigihe.

Quyûd: Şert û qaîde.

Qû: *k.s.* Navê balindeyekî ye.

Qûça dem: *k.s.* Devgirtin.

Qûl: Benî, kole.

Qûqu: *k.s.* Xwendina çûkê.

Qûşçî: *t.* Ji “kûşçû”ya tirkî, xwedîyê balindeyan, seyîsê çûkan.

Qût: Dan, zad.

Bi le'leynanê le'l ê le'l û yaqût

Ji behra qelbê wan ra wî kire qût (E.X)

Qûtî rewan: *k.s.* Xwarina ruhan.

R

Ra: *k.s.* Tedbîr.

Rabestî: Li xwe kirî.

Rabîte: Girêdek, têkilî, elaqe.

Ew bû di cumle rabîte

Mîzan û îsm û basîte (M.C)

Rabîta terîqete: Yek ji edet û ayînên terîqetê ye, îbarete ji mûtleq girêdana murîdan şêxekî şêxê wan va ye.

Rabuwêre: *k.s.* Bila ew bi dilê xwe bijî.

Racil û maşî: Peya.

Racî: *e.* Tikakar, ricakar.

Racî': *e.* Zewr, zivirîn.

Rad: Rade, dûvika tîr.

Rafizî: *e.* Ew kesê ku di rêya ehlê sunetê da naçe.

Rafiziyyet: Rafizî beşek ji şîiyan bûn ku li hember îmamekî xwe rabûn û biryara wî nepejirandin. Refz yanî nepejirandin.

Çûna te bi bîte Xariciyyet,

Terka te bi bîte Rafiziyyet (E.X)

Rah: 1.Mey, Bade. 2.Rê

Rahê cennet: Rêya bihuştê.

Rahgir: Rêgir, rêbir.

Rahiber: Rêber.

Rahî: Rêwî, rêçik, şop.

Xeyre te nehin der sedefe behr wucûd î Lew lazim e em qesde bikin rahî Medîne (M.C)

Rahî: *k.s.* Karekî ku çûbe serî.

Rahîb: *e.* Peywirdarên xaçparêz ên ku nezewicîne.

Rahîl: Koç.

Rahîl (Raşel): Keça Lavanî ya piçûk *e.* Jina Ye'qûb pêxember a duyem *e.* Dêya Yûsif û Binyamîn *e.*

Rahîm û rehman: *e.* Dilnerm û diloan.

Rahrew: Rêbiwar, Rêwî.

Rahrû: Qentar, ew rêya merivî digihîne alîyekî din ê xanî, “mermer”.

Raib: Mast.

Rakîb-rakib: *e.* Siwar.

Rakid: Sekin, rawestîyayi.

Kullab bi destê wahib *e*

Yan rakid *e* yan cazib *e*

Yan xafid *e* yan nasib *e*

Yan ref-'*e* û yan cezme da (M.C)

Rakişawe: *k.s.* Dirêjbûn.

Rakî: Kesê di rukûyê da.

Ram: 1.Meram. 2.Aram, hizûr.

Rame: *k.s.* Kedî. (ji bo ajelan).

Rame hetta bo segêkî wek reqîb

Ew cenab *e* her le minîye îctî nab
(MW)

Ramişger: Stranvan.

Ramî: Tîravêj.

Ramîn: Evîndarê keçika navê wê
Weys bû.

Ranagiritin: Napejirînin, naxwazin li
ba we bihêlin.

Ranî: *f.* Diçî.

Retb: Şil, ter.

Ev band û harr û retb û yabis

Ev mîr û geda, xenî-yû bais (E.X)

Rapêç: Bergkirin, cîwergirtin

Rastrewî: Çûna di rêya rast da.

Rastûrê: Demildest, di cî da.

Ratib: Meaş, an jî xwarina feqiyan û
pêdivîyên wan.

Xelqê ku heta bi sibhê kazib

Hazir kiribûn bîsat û ratib (E.X)

Rawê: Ravê, nusxe.

Rawî: Ya/ê ku çîrokê dibêje.

Ji bo me rawî yê 'eqlê hunerwer

Ewî pîrê soxendan ê munewwer
(Ş.M.E)

Rax: Binanîya çîyê ya kesk.

Hindek bi peyayî çûne baxan

Hindek bi siwarî çûne raxan (E.X)

Raxibê wisalê: Yê ku li pey dîtina
yarê diçe.

Kes nîne, ne talibê cemalê

Kes nîne ne raxibê wîsalê (E.X)

Rayeganî: Rayganî; mift û belaş.

Durdaneyê bêbuhayê canî

Der daye ji dest xwe rayeganî (E.X)

Rayet: Ala.

Rayeta fethe: Nîşana alîkarî û
serkeftinê, ala serkeftinê.

Rayic: Biha.

Rayî: *k.s.* Mişweret û şêwr.

Raz: Sir, tiştê veşartî, nepenî.

Nebilît ji te yek reng û nenas ji te
resmê Ins û wehşet ji te ra waris û hem
raz û welî bit (Ş.N.B)

Raze dehrê: Razên demê, razên
zemên.

Raziq: *e.* Ew ê ku rizqan dide, mebest
Xweda ye.

Tewekkul ke,ewê bêtin çîqa ye

Bizane raziqê 'alem Xweda ye (Ş.M.E)

Rea: Dît, dîtin.

Reb: *e.* Xweda.

Rebab: Cureyekî sazê, kemançe.

Rebb: Xwedî, xwedan, terbiyeker, xwedîker.

Rebbanî: Îlahî, Xwedayî, tiştê ku pêwendîya wî bi Xwedê ve heye.

Rebbaniyûn: Ew kesên ku xwe bi temamî dane Xweda, xwe bi wî ve girêdan.

Nîsan bi lufet e bi kevî yû kaniyan
Kêrî bûne cinnete bi qudreta rebbaniye
Çi xelkî be' îbret e dana be nêv şahiyên (M.G)

Rebbîşreh: *e.* Mebest bi ayeteke sûreta Tahayê ye. Wateya wê Xwedayo tu sînga min fireh bike.

Rebiy': Bihar.

Rebwe: Erdê bilind.

Rec: Hejandin.

Recac: Lerz.

Receb: Mehek ji wan mehên ku şer kirin di wan da heram bû.

Rece'e: Gerîyaye. Vegerîyaye.

Recmiye: *e.* Helbesta ji bo rezîlkirin û kepezekirinê.

Re'd: Gurmîna ewra. Xurxura ewran ya dema ku brûsk dikeve. Dengê ewran. Dengê ewrlêdanê.

Redda cewab: *e.* Bersiva pirsê.

Rediyun: *e.* Razî be, ne xeydok be.

Re'es: *e.* Ser, serî.

Ref': *e.* Ji hole rakirin.

Ref: *e.* Bilindkirin, hildan.

Ref': Bilindkirin, çekirin.

Ref' bibin: Rabin û werin hılanîn.

Ref' bûn: Rabûn.

Ref-'e: Bilind. Di gramera erebi da tê wateya pêş.

Refet: *e.* Dilovanî, rehm.

Refî': Bilind, hilgir, raker, hilder, ragir.

Refîq: *e.* Heval, hogir.

Mi nale refîq in, xem û tehlîn e
musahib Firyadî enîsê min e demsazî
çi hacet? (M.C)

Refîq û sahib: Heval, hevrê.

Refref : *e.* Ferş û şînayî û tiştên tîn raxistin.

Hazir ji tera Buraq û refref

Şatir bi tera Firîşte ref ref (E.X)

Ref: Çûyin.

Reftar: *f.* Meş, Çûyîna bi naz.
Tevgerên kubar, meşa bi kubarî.
Rêveçûna bi kubarî, tevger.

Gerçî tîn reqs û semayê, her seher sed
ney-şeker

Min di bezma surşîrînan, ew şîrîn
reftari bes (M.C)

Refz: *e.* Redkirin, nexwestina tiştêkî.
Nepejirandin.

Refzê meke tu, bi dil be sinnî

Ma Baluke? Weynek, ente mînnî
(E.X)

Reh: Rê.

Ji wê zulfê ji wê bendê

Reha bûn lê ji peywendê (M.C)

Reha: Rizgar, xilas.

Reha bim: Xilas bibim, bifilitim.

Reha kirin: Serbest kirin, xilas kirin

Rehawî: Meqameke muzîkê yeke kevn e, ji meqama rastê hatiye.

Rehber: Rêber.

Rehe: Dînekî navdar bû li Silêmanîyê da. Gelek caran xwe di nav xelkê da rûtî tazî dikir.

Rehê hidayet: Rêya rastçûnê.

Rehguzer: Rêwî, ya ku di rê da diçe.

Rehinde: k.s. Sergerdan.

Rehistî: Şînbûyî.

Rehîm: Navekî Xwedê ye. Yê ku rehm peyrewên xwe dike. Dilovan.

Rehîmun: e. Dilovan, bi şefqet.

Rehîn: Gerew, destbiser, kefalet

Rehîq: Mey, şereba bênxweş. Meya saf, meya bihuştê. Safî, zelal.

Rehîqê mextûm: Meya devgirtî û xitimandî. Hêj kesî jê nenoşîye. Mebest meya bihuştê ye.

Rehman: e. Dilovan, mihrîvan. Bexşende.

Rehmanurrehîm: Dilovan û mihrîvan.

Rehmeta îlahî: Dilovanî û bexşîna Xwedayî.

Rehmeta rehîmîn: Dilovanîya pir dilovanî.

Rehmê ummehatan: Malzaroka dayikan.

Rehmî nazil culmeê ‘illet ibit: e. Dilovanî datê û hemî eşan jê dibe.

Rehm û şefqet: Dilovanî û dilsojî.

Rehn: Gerew, hecz.

Rehnimûn: f. Rênîşander, rêber.

Rehnuma: Rênîşander, rêber.

Here peşe Xudaye me rehîm û rehnumaye me

Şefa'et ke xetayê me li dîwanê bike meh'der (M.B)

Rehrew: f. Rêbiwar, rêwî. Rêwingî, rêwî, karwan.

Reht: Meraqdar, bêsemax.

Rehtî: Westabûn.

Temam îşê me bûye qehr û rehtî

Derê zewqê li me Xaliq girêda (M.E.F)

Rehwan: Xweşikmeş, hespê rihwan, hespê xweş meş.

Tu zû ke hiş dewa ke vê seqîmê

Ku rehwan bim li rahê musteqîmê (Ş.M.E)

Rehwar: Dijwar.

Şeyxûxeyê çerxê rengsemawî

Rehwarê semaê kir reha wî (E.X)

Rehwarê semaê: Rewanê govendê.

Rehzen: f. Keleş, fêriz, rêbir, rêjen, isat.

Re'iyye: Tebaya di bin fermana sultanekî da. 'Ame.

Rejû: Komira dara ya şewitî.

Rekb: Siwar.

Van rehrewên himmet-bilind

Berdane meydanê semend

Şergeşte bin hetta bi çend?

Ev rekbê meş'eldari çerx! (M.C)

Rekbehacî: Hecîyê siwar.

Rekbê meş'eldar: Siwarên bi meş'ele.

Rekîb: *f.* Rikêba hespê, siwarbûna li pişt siwar.

Rem: *k.s.* Hilatina rojê. Hilatin, revîn.

Remed: *e.* 1.Êşa çav. Ewrê çav, goştê ku tê ser reşika çav û nahêle rind bibîne. Çavêş. 2.Ditirse, vediciniqe.

Afitabê Ehedîyyet di xwe da girtîye kewn Ne ku 'ewrek heye lê girtîye çavê me remed (M.C)

Remel: Zûhrêçûn *e.*

Remeq: Şopa hindik ya jîyanê ku di meriv da dimîne berîya mirinê.

Hetta remeq hebit ji canî

Cana! tu di canêda nîhanî (E.X)

Remetnî: Avête min.

Remîm: Rizîyayî

Remîq: Awirên tûj. Nêrîna bi hêbet.

Remz: Nîşan, sembol

Rem kem: *k.s.* Birevim.

Reml: Cureyekî falan *e.* Ji bo falvekirin û bextnasîyê qûm dianîn û xêzik li ser dikişandin.

Remlate: Tali'ê te, îxbala te.

Remmal: Remildar, falbêj

Remmalê felek: Falbêjê felekê.

Remz: Nîşan. Îşaret.

Re'na: *e.* Narîn, xweşik, rind. Nazik.

Renc: Zor, zehmet, êş û azar

Rencan: *k.s.* Turebûn, hêrsbûyîn.

Rence: Ew kesê ku êş û kulên wî hene.

Rencide: Yê ku diêşîne.

Rencûr: Tengayî. Keder. Bi derd. Ne aram. Bi êş, nexweş. Çîlekêş, zehmet kêş.

Er dil ji te mesrûr bitin

Min ji "Melê" destûr bitin

Dê kit cîhan pur nûr bitin

Lê daima rencûr e dil (M.C)

Rend: Rind, bedew. Merivê kamil yê ku dinyayê terk dike. Sofî, derwêş. Dildarekî, evîndarekî dest û dil pak. Mebest yar *e.*

Rendeş: Rende, rinde.

Rendeş: Alaveke ku tex û dar pê tên qewartin.

Reng: Wek, mîna.

Req: Reh, damar

Reqem da: Nivîsî, çekir.

Reqem kir: Nivîsî.

Reqî': Table. (Lewhe). Nivîştî ku bi xetê bedew hatiye nivîsîn.

Ehsen ji vê wesfî reff'

Eşkal û ewdaên bedî'

Têtin ji nûrê wek reqî'

Bê 'eyb û neqs û rexne da (M.C)

Reqîb: Kesên ku ji xef ve guhdar dikin, sîxur, fesad, xêrnexwaz. Dijmin, dijber.

Reqîm: Nivîsar, reqem.

Yek yek ji teqwîma qedîm

Lê bû neseq hukmê hekîm

Avête wê lewhê reqîm

Têk alemê pê şû'le da (M.C)

Reqîq: 1. Kole, jar. 2.Tenik, zirav.

Ger bi kuştin, wer bi hîştin emr û fermana te bit

Ehmedo ebdun reqîqun waqîfun beynel-ebîd (M.C)

Reqqas: Dawetker, kesê di govêndê da şareza. Semager.

Reqqas diçû: Rêveçûna wek semayê.

Meşa bi dans.

Reqs: e. Dans, sema.

Res: e. Serî.

Resed: Gihaştin.

Resednuşîn: Kesê ku li cihekî bilind rûdinê û stêran dipê. Kesên li ser kelehan dijminan dipê. Dîdeban.

Goya bi xwe ew resednişîn bû

Ew çal-i ji bo wî dûrebîn bû (E.X)

Resen: f. Werîs.

Resi: Çal.

Resiya: Gihîşt, kemilî.

Resm: Esl, şêwaz.

Resmê qedîm: Edetke kevn.

Resmî: Mîrî, resmî.

Resm û ayîn: Urf û adet. Dab û rêçûn.

Resm û dab: Urf û edet.

Resm û rah: Reng û şêwe û rêşop.

Reste: f. Filitî, rizgarbûyî.

Restin: Şînbûn, gihaştin.

Resûlê emced: Pêxemberê qedirbilind.

Resululwera: e. Pêxemberê alemê.

Re's: Lertzîn.

Reşbelek: Mamosteyê me yê mezin, di vir da Ehmedê Xanî ji "Nûbar" a xwe ra dibêje.

Da bi van çend reşbelean

Li wan tebi'et melean (E.X)

Reşhe: Herikandin. Rewan terayî, şilayî. Dilop, nivîs, nuqte. Dilopa hibrê.

Reşhe da: Dilop kir, şil kir.

Reşk-rişk: f. Çavnebarî, hesûdî, kulzikî, dexesî, kumreşî.

Reşk: Reşahîya çavan.

Hisna teye zîneta hebîban!

Reşka te ye xeyreta reqîban! (E.X)

Reşmar: Kezîyên yarê.

Şefqê bi dîdarê xwe kit

Qesta birîndarê xwe kit

Şehîdê reşmarê xwe kit

Ê ser li fetla pişterê (M.C)

Reşrû: Rûreş.

Reştöz-reştûz: Bîrh, bîrû. Awirên çavan yê tûj.

Reştözên Semed: Birûyên reş yên ku Xweda bêmînak çêkirine.

Reştûzên helek: Reşbirûyên xelekî.

Reştûzên muqewwes: Birûyên kevanî.

Reştûzên siyehyengî: Birûyên reş.

Ret: Here! bibore! Birê, biçê.

Rete: Biçe.

Retb: Ter.

Reva: Revandin.

Revde: Birr.

Rewa: Heq, maf, durust.

Rewac: Rexbet, xwestin.

Rewacî kilî şika: *k.s.* Nirxê kilê wî nema.

Rewal: Ciwan, tolaz.

Law û rewal û rîspîyan, mîr û wezîr û cindîyan

Serxoş û mest û bengîyan, derde ji macerayê zulf (E.X)

Rewan: 1.Çûyîn, herikîn. Bi rev, herikbar. Çûna bi lez. 2.Ruh û can, gîyan.

Rewan bû: Sivik bû, derket.

Rewandiz: Bajarekî li başûrê Kurdistanê ye.

Rewan dizî: *k.s.* Dizê ruh.

Rewan kirin: Herikandin.

Rewan-nal: Nalînên li pey hevdu.

Rewaq: Eywan.

Rewde- Rewd: *e.* Baxçe. Çîmen.

Bi werdan zeyyînîn gulşen, çimen da lale bişkiftin

Binefş û çiçekan vêk ra, şefeq da yek, di rewdê da (M.C)

Rewdatû needîn: Çîmenên gira.

Rewdeya muhce: Bexçeyê can/ruh.

Rewec: Biha. rûmet. birêzî, pîyase.

Rewem-revem: *f.* Diçim.

Rewh: *k.s.* Xweşîya dil.

Rewiyê: *k.s.* Rêbaz.

Rewneq: Ronahî. Spehî, delal. Biriqandî, rewşen.

Rewneqê zafî: Ciwanîya sirûştî.

Rewneqşikenê: Keça ku bi ciwanîya xwe bazara ciwanên din dişikîne.

Rewrew-rehrev: *f.* Rêwî, rêwing.

Rewş: Sinc, xûy.

Rewşen: Ronî, ronahî.

Şukur bînahîya min hat û Ye'qûp dide rewşen bû

Bibûya Yûsûfê Misrî, li Ken'anê beser peyda (M.C)

Rewşen kit: Ronî kir.

Rewşenter: Ronîtir.

Rewze: *e.* Mezelê pêxember, baxê gulan.

Rex: 1.Rexên kişikê (setrence). 2.Wezîr.

Rexan: Du berikên kişikê/setrencê. Kenaran.

Rexim: Birîn.

Rexne: Krîtîk, eleştirî, lêgirtin, qisûrdîtin.

Rexş: Hesp.

Rexşan: Reşandin, biriqandin. Ronî, roşen.

Di rexşanê de rexşan bû

Sena berqa tecellayê (M.Ş.C)

Rexşan e roj: k.s. Rojên pir bi ronayî.

Rexşinde: f. Ronayî, rewşenbûyî.

Re'y: Fikr û dîtin, bîr û bawerî.

Rey: Bajarekî li Îranê ye.

Reyahîn: f. Rihan, reyhan. Piranîya rihanê ye.

Reyhanî, dîwanî, suls, muselsel: Cureyên destnivîsa spehî.

Reyhanî: Nivîsa reyhanî, awayekî nivîsa spehî.

Rezem: Şer û ceng.

Rezim: Rezm. Şer, herb.

Çendî ku xûban bên rezim

Min jê di dil danîn gezim

Amancê wan remzan ez im

Sereskerê seyyari çerx (M.C)

Rê: Birûyên weke “r”ya erebî.

Rê danadê: Rê nagire.

Rêhtin: Rijandin.

Rêkewt: k.s. Rasthatinî, tesadufî.

Rê nakewê: k.s. Ne hêja.

Rê naxeye meydanî ‘îşq: k.s. Tu nikarî biçî meydana evînê.

Rêş: k.s. Birîndar. Dax, birîn.

Rêşeqetnî: Reşande min. li min weşand.

Rêşgawî: k.s. Xeyalên xav.

Rêtin: Rijandin.

Rêwîy: k.s. Rovî.

Rê xene cennet: k.s. Rêya wan biçê ser bihuştê.

Rêz: Rêht û rijand.

Rêzûresm: Rêç û şêwe.

Ri'ayet: Çavdêrî, guhdan.

Rical: Piranîya recul e, mêr, meran.

Ricl: Pê, gav.

Ridwan: 1. Dergevanê bihuştê. 2. Rezvan.

Ridwanê xeyb: Bihuştê ku firîşteyê bi navê Ridwan dergevanê wê ye.

Ridwanê xeybê: Qasidê weke dergehvanê bihuştê, ku xeberan ji dûr ve tîne.

Rif'et: e. Payedarî, payebilindî.

Elqîsse: Bi îq tizayê xîlqet

Mîrê bi kemal û îzz-û rif'et (E.X)

Rifq: Dilovanî.

Rifû deka: k.s. Pîne dike.

Riha: Azad, serbest, rizgarbûyî.

Riha bûyî: Vala bûyî ji xwarinê.

Rihlet: Ger û seyran.

Ew mintezirin li rihleta me

Fexrê dikin ew bi dawate me (E.X)

Rikab: Cihê ku meriv lingê we dide ser û li hespê siwar dibe.

Rikêb: Alava ku pêlî dikin û li hespê siwar dibin.

Rikêbdar: Seyis, xizmetkar.

Rikin: Bingeh, binyat.

Rikiya: Lerizî, ricifî.

Rim: Amûreke şer e, mizreq.

Riman bibazin: Bi riman bilîzin, li ba bikin.

Rimbaz: Ya/ê riman diavêjê, rimavêj.

Çi şahek min hebû şêrîn û şehbaz
Hebîb û dîlrubayê rah û rimbaz
(H.F.H)

Rimûz: Piranîya remzê ye, sembol, nîşan.

Rind: Fêlbaz, xemsar. Kêşê karên dinyayê xweş dibîne. Li gor wan xem û şahî ji bo wan yek in. êş û dîlşadî xirabî û başîyê xweş dibîne.

Rindê xerabat: Sofî û rindê meyxaneyê.

Bixwe rindê xerabat im, ji dêrê vê demê hatim

Çi hêvi hûn dîkin îro, ji vî rindê xerabatî? (M.C)

Riqqet: Diltenikî.

Westan û nezer kirin bi dîqqet

Wan hate bi qelbê rehm û riqqet (E.X)

Risalet: Pêxemberî, resûltî, gotinê kesekî an kesan teblîxê kesên din dike.

Risas: Kelah.

Risgar: k.s. Rizgar.

Riskîn: Riskan, şînhatina ji xwe ber bêyî ku kes biçîne.

Riskîn du eded nîhalê serkeş

Rabûn bi hewave herdu serxweş (E.X)

Risl: Şîr e.

Riswa: Ruyit, ruyis, mebest şermezarî ye.

Rişêne: k.s. Dilopên baranê, hebên baranê.

Rişênayek baran: k.s. Barana kêr ku tenê dikare axê şil bike.

Rişte: 1.Ta, bend. Bendê ji bo çêkirina gerdenîyan. Riste, werîs, zincîr. 2.Kar, meslek.

Daîm disojit me rişteyê can

Te nasojitin bi xeyrê ezman (E.X)

Riştime: Rengîn kirime, sor kirime, bi xwînê sor kirime.

Hubba te, ma xweş hiştme?

Her roj ji nû ez kuştme!

Yekser ji xwînê riştme

Tîr û xedengên mecerê (M.C)

Riştime: Li gor Mela Mihemedê Zivingî boyax kirine, bi xwîn kirine.

Rişî: Rijandî.

Riwayet: Vebêjî û axaftin.

Riya: e.Riyakarî, durûtî.

Riyad: Mêg.

Riyaî: Rîya, durûtî, minafîqî.

Riyaset: Serwerî, mezinî.

Riyaz: e. Baxê bihuştê.

Her rewze, rîyazê Xuldê ekber

Her çeşme ji eynê abê kewser (E.X)

Riyazet: e. Perwerdeya tenha ji bo kunde kirinê.

Riza: Razîbûn.

Rîayet: Bi cih anîn û pêkanîna hukm û fermanan, parastina wan.

Rîba: Zêdeyî.

Rîcal: e. Mêr.

Rîc'et: Zivirîn.

Rîfaq: e. Heval, hevrê, dost.

Rîh: e. Ba.

Rîhlet: e. Barkirin, koç. Hicreta şevê.

Rîmah: Rim.

Rîq: k.s. Tif.

Rîş: Dirîyayî, birîn, birîndar.

Bulbulê mecrûhê 'îşqê taqeta xaran nihin Dê gulava rîşê sîne bişkuwek bê xari bit (M.C)

Rîş: Perr .

Rîşa cegerê: Birîna cegerê.

Rîşe: Reh, binaxe.

Rîşî xurmayî bika: k.s. Rîyê xwe sor bike.

Rîşter: Şewitîtir.

Rîwayet: Gotin, neqilkirina gotinê.

Rîyah: Ba.

Rîyat: Rewd, çîmen, baxçe.

Rîza: Xuşrûda, pesendî.

Rîzayê îlahî: Razîbûyîn û vayîna Xweda, tiştê ku Xwedê jê razî ye.

Rîzwan: e. Rizamendî, razîbûn.

Ro: Çem, rûbar.

Robe: Rovî.

Roçûn: k.s. Noqbûna tişteki.

Rohî murewwêh: e. Ruhê şad.

Roja elestê: Civîna elestê, roja qalûbelayê ku Xwedê ji ruhan pirsî: “eleste bîrebbîkum?” û ruhan jî bersiv da “qalûbela.” Ev telmih e bi bal wê ayetê be.

Roja esîr: e. Roja giran. Roja qiyametê

Roja mehşerê: e. Roja civandinê, roja ku mirî dê ji gorên xwe rabin û li pêşberî Xwedê bêne dadgehîkirin.

Ji lutfa seyyîdê 'alem bibînim

Di roja mehşerê şermî neminim (E.X)

Rojê: Roja qiyametê, w'eîd.

Rojhilat: Dem hilatina rojê, şerq.

Rojî dîn: k.s. Roja heşrê.

Rojî restaxêz: k.s. Roja qiyametê.

Rolle: k.s. Keç û kur. Zarok.

Romî duxn: Kîn.

Ron bûn beser: Çav ronî bûn, êdî dîtîn.

Roşnayî: Ronahî.

Royandin: k.s. Mirandin.

Royî: k.s. Revî.

Royî be ba 'umrim: Umrê min ket ber ba û revî û çû.

Royî komeley yaran: Koma yaran û ehlê dil belav bûn, revîyan û çûn, mirin.

Royîn: k.s. 1.Mirin. 2.Revîn.

Royîn piya: k.s. Pêdeçûn.

Royû: k.s. Mirî.

Roze: Rojî.

Rozeê 'îdê: Roja cejnê, roja eydê.

Name tey kir rozeyê 'îdê vekir fesla meye Lê bi zim ziin tên bi awazê neyê fincan û cam (M.C)

Rozgar: Dinya, roj, dem, heyam.

Rozperest: Rojperest. Li pey rojê digerin.

Roz rezm: Roja şer.

Roz û şeb: Roj û şev.

Ru'b: e. Tirs.

Rubab: Amûreke muzîkê ye.

Rub'ê me'mûr: Ribê avakirî ji dinyayê, erd.

Rub'î meskûn: e. Ji çaryek e dinyayê ax e û meriv tê da dijîn. Bejahî.

Ruhaniyyet: Giyanewerî, pakîya ruh.

Ruh emanet e: Gîyan emnanetê Xweda ye.

Ruhê rewan: Giyanê sivik.

Rumman: Hinar.

Rummanî: e. Weke rengê hinarê.

Şeraba nabî rummanî

Şefeq da "îqdê perwînê (M.C)

Rumuz: Remz, nîşan, îşaret.

Rukn: e. Sitûn, bingeh.

Ruq'e da: Pêk hat.

Ruqûm: Pîranîya ruqm e. Mora ku li ser pirtûk û gencîneyan e. Nivîsin.

Rustem: Pêlewanekî kurd e û di Şehnameyê da serpêhatîyên wî derbas dibin Rustemê Zal.

Rustemê Gêw: Rustemê zal. Gêw bavê Bîjen bû ku Rustem şande welatê Efrasyabê tirk da ku Bîjen ji zindana wî rizgar bike.

Rusul: Pîrjimarîya resûl e.

Rusûm: Pîranîya resm e. Şîkl û wêne.

Ruswa: Rezîl.

Ruxset: Destûr.

Ruş: 1.Kamilbûn, Balixbûn. 2.Tefekura rast û dirust. 3.Dîtin û çûyina li rêya rast.

Ruşte: k.s. Tiştê badayî.

Ruteb: Tazexurme, xurmeyên nûgihiştî.

Ruteb nîne direxta me çûbîd e

Ne serw e hîz im qamet xemîd e (Ş.M.E)

Ruwanîmê: k.s. Min temaşeya wê kir.

Ruwaw: k.s. Şînbûyî.

Ruwew sehra: k.s. Ber bi beyabanê ve çûn.

Rux: f. Rû. Hinaroka rû. Gep.

Rux: Ruh.

Ruxfener: Rûfener, rûyê mîna çirayê ronî dide.

Ruxsar: f. Dêm. Rû, çehre.

Ruxsarê şeb'efrûzê: Rûyê mîna ronahîya di şevê da.

Ruxsarî zerd: k.s. Rûyê zer, sîmaya zer.

Ruxset: k.s. Destûr, îcaze.

Ruzab: k.s. Parçeyê tifê.

Ruzgar: Rojgar, dem, zeman.

Binêr carek çi bangîn e

Ji newmêxwe bi hiş bîne

Dinê qetl e, dinêxwîn e

Dinê gerdûn û ruzgar e (F.T)

Ru'yet: Dîtin

Rûbbe û rûbbema: Gelek, pir.

Rûberût: *k.s.* Rûbirû.

Rû be xall: Di ruyê wî da xal heye.

Rûd: Kemançe, têla sazê.

Rûd-ûd: Du aletên muzîkê ne.

Rûfat û se'îyd: Ax, nalîn.

Rûh: Can, cewherekî mûcerede,
letîfekî îlahîyê pîroz e.

Rûhanî: Alema rûhan, tiştê ku
peywendîyên wî bi rûhan va heye,
me'newî.

Rûhanîyên qudsîmîsal: Dilberên pak
û pîroz.

Rûhê cawîdanî: Giyanê hebûna
bêdawî.

Rûhperwer: Tiştê ku şadî û kêfê dide.

Rûhûlqudûs: Can û gîyanê pak û
piroz û hîlbijêre. Yek ji navên Cebrail
e.

Husnek munezzeh sewwirand

Nûra hebîb jê afirand

Alem di "kun" hê heyyirand

Ruhulqudus can nefxe da (M.C)

Rûkbe: Çok, ejn

Rû keyne: *k.s.* Biçin. Berê xwe dan.

Rûmet: *k.s.* Dêm, gep, alek, rû..

Rûmit nîşan edem: *k.s.* Rûyê xwe
nîşanê te didim.

Rûnima: Rûderketî.

Rûq-'e: Table. Parçeyek erd. Pîne,
nivîsara ruq-e.

Rûreş: Rûsiyah.

Rûs: Rût û tazî.

Lewra ku cîhan wekî' erûs e

Wî hukmê di destê şîrê rûs e (E.X)

Rûsiyah-rûsîyeh: *f.* Rûreş.

Nebî pêşê destê xwe me y'rûsiyah,

Nizandin emê dê çi bêjine Şah! (M.X.S)

Rûş: Şewq, ronahî.

Rûşen: Ronahî.

Rûşî nedamê: *k.s.* Rûyê xwe jî
nedayîn. Bala xwe nade min.

Rût: Bê cil. Kesê hejar, feqîr.

Rût: *k.s.* Rûyê te.

Rûtî dî: *k.s.* Wî rûyê te dît.

Rût û uryan: Tazî.

Her kesê îşq tê eser kit

Sed hezar perdan di ber kit

Hemuyan dê ker bi ker kit

Tazî yû 'uryan im ez (F.T)

Rûxende: *f.* Rûken

Rûyê Xanî: Xanî dibêjê rûyê Zînê
wek rûyê wî zer bûye.

Rûyê zîba: Rûyê ciwan.

Rûz: Roj.

S

Sabitkirin: Bicihkirin.

Sabit qedem: Qenc cih girtiye, pêdar.

Sabît: *e.* Westar. Neliv, neguher, xweragir.

Sacidîn: Xwe tewandin, xwe çemandin, çûn secdeyê.

Îlahî hindê talibîn, mesrûr bikî wan salimîn Elhemdu lîllah sacidîn bûn sermisarê Xeznewî (M.M.E.H)

Sacîdû: Xwe tewand.

Saçax: *t.* Sivênek, sivîng, sipande, pasar.

Sad: Çavên weke tîpa “sad”ê. Di alfabe ya erebî da tîpek *e.*

Sade: Xweşik û şayik. Xwerû.

Sade dil: Dilpak, lê bi wateyeke neyînî.

Sade fe hû: Laqê wî hat.

Sade û rewal: Xortên nûhatî, yên hîn mûyê wan şîn nehatiye.

Sadiq: 1.Rast, dilpak . 2.Dilsoz, sozdar

Sadiqul emel: *e.* Karê rast, durustbûn.

Sadîqî emîn: *e.* Mebest pêxember *e.*

Sad: Xunav.

Sa'et: *e.* Roja qiyametê. Qiyamet.

Saf: Sade û paqij.

Safî: Meya pak

Safilat: Nizm, Buhurî. Kevin. Tiştên li gor axiretê ne hêja, tiştên dinyewî.

Safîzeqen: Çenexweşik.

Sahêb ehwal: *e.* Ew kesên ku haldigirin, ji bo sofîyan tê bikaranîn.

Sahêb îradet: *e.* Xwedan biryar, wêrek.

Sahib: Xwedî, hevrê, heval.

Sahib cah: *k.s.* Xwedan meqam.

Sahibcemal: Rûbedew, xweşik.

Sahib cerî: *e.* Xwedî sexawet.

Sahibdîl: Ehlê dil, ehlê manewîyatê.

Sahib exraz: Xwedan kîn, kindar.

Sahibê xar: Xwediyê şikeftê; mebest Hz. Mihemed *e.*

Sahib hewes: Evîndar.

Sahib in'am: Xwedan qencî.

Sahibkemal: Bêkêmasî, bêqusûr.

Sahib kerem: Xwedan bexşîn, comerd.

Sahib şefequet: Dilovan û dilnêrm.

Sahib xerez: Kîndar.

Sahil: Kenar, perav, berav, qerax, kevî.

Sahilê fenayê: Perava mirinê.

Sahilê sedefwar: Wek sedefe, Sedef ali peravê dura xwe avêtîyê û tenê qalîk maye.

Sahir: Cadûkar, sêrbaz.

Sahire: Jina sêhrbaz.

Saib-sayib: Karrast.

Sa'id: *e.* 1.Zend, mil. 2. berjêr hilkişiyayî, yê bext spî.

Sa'idê sîmê: Zendên zivîn.

Sa'id: *e.* Bask.

Sail: *e.* Recûkar.

Ez dexîl im bavê Me'sûm sailê bêçare
me Sed meded pîrê terîqet kelbê
dergahê te me (M.M.E.H)

Saim: *e.* Rojîgir.

Saimiddehr: Ya/ê ku salewext rojî
digire.

Sa'iqeya teqdîrê: Dengê hêza Xweda;
biryara qederê.

Sair: Gerok.

Sa'î: Ya/ê li pey tiştêkî be.

Saîlî ew berderem: *k.s.* Pirskerê ber
derî: parsek, xwazok.

Saîmud-Dehr: Rojîgirtîyê salewext.
Bila bit Saîmud-dehr î, bila iftari carek
bit Kesê zanî ji dîlber wê xwûyabin
her, du sal ebrû (M.C)

Saîqe: Deng, bêhişî. Birûsk.

Ma qudretê def' heye wer şêr Elî bit'

Lami' ku bidit saîqeya teqdîrê (M.C)

Sakin: Aram û rawestîyayî. Niştasih,
rûniştî.

Salar: Serdar.

Salek: Diçe.

Salê hilalî: Salên li gor hesabê hîvê;
salên hicrî.

Salik: Rêwi. Rêwîyê terîqetê; yê ku
ketîye rê. Rêwîyê manewî; yê ku
rêyeke taybet digire. Kesê di rêya
terîqetê da diçe.

Salik: Salek.

Salik muceddet bêt: Saleke nû bê,
saleke nûye were.

Salim: *e.* Parastî.

Salname: Teqwîm.

Salox dan: Wesif kirin.

Salûs: Fêlbaz û xapînok.

Saman: Kel û pel, pertal.

Sa mebye: *k.s.* Bila nebihîze.

Samirî: Kesê ku axa bine firîşteyekî
bi ser golikê zêrîn da kir û golik da
orandin.

Samî': *e.* Ew kesê ku dibihîze.

Samn: Mal û milk.

Sani': Çêker.

Sanî: *e.* Duyem. Yê duyem.

Saqit şikê: *k.s.* Lingê te bişikê.

Saqî: *e.* Meyger, avdar. Kesê ku
vexwarinê digêrîne, yê ku meyê
digerîne.

Saqî xezebnak: Saqîyê hêrsbûyî.

Sara: *e.* 1. Beyaban, sehra, çol. 2.
Xalis

Sarban: Serkarwan.

Sariq: Dic, diz.

Sarîm û seyf: Şûr.

Satek: Saetekê, demekê.

Satir: Yê ku tiştan vedişêre.

Minet ji Rehman û Rehîm

Min mîrekî setar heye

Ew mîr kerîm û satir e

Xweşhakim e di bar xwe (F.T)

Satirenc: Kişik, setrenc.

Saxer: *f.* Şûşe, qedeh, peyale. Qedeha
meyê.

Saxerê bade: Pîyaleya meyê.

Saxir: Tinazkar.

Saxir-sağir: Serxwar û nekar.

Saxir û Peyman: Pîyaleya meyê.

Saya-zewalê: Sîya nîvro. Sîya ku piştî nîvro çêdibe.

Dê ji xeflet biretin saya-zewalê ey dili Rûnenê da tu emanet li siha dari hudûs (M.C)

Saye: 1. Pawandin. 2. Sih 3. Saya, pesn.

Sayenumayê xawerê: Sîya ku li rojhilat xuya dibe. Rûyê dildarê.

Sayeb: Seywan, nobedar, pawancî.

Sayeban: Sêwan, sîber, gulîyên ku rû dîkin sî.

Wer dilo! da çin temaşaya cuwananên çîmen

Wê hîlanî ser bi naz û sayeban dayê niyaz (M.C)

Sayeban: k.s. Ew kesê ku sîyê amade dike.

Sayeguster: Pir bi sî.

Zîn hat û bi qameta senewber

Bû serw-i li ser wî sayeguster (E.X)

Sayeperwer: Sîfîreh, bî sî.

Sayeperwerdê: Perwerde dîtî, di bin bandora perwerdeyê da.

Sayewer: Bi sî, sîdar.

Şimşad û çinar-i hemqedembûn

Xweş sayewer û elîhîmembûn (E.X)

Sayîl: e. Pîrsker.

Saz: Devera ku qamûş lê şîn tê.

Sazend: Tenbûrvan, sazband

Sazende: 1. Çêker. 2. Amûrjen, muzîkjen.

Sazê dilê kul bi zêr û bem bit

Sazendeyê îşqê Zîn û Mem bit (E.X)

Sazê di perdeyê de: Awaza ku amade ye da ku were strandin

Se'adet: e. Bexewarî, xweşbextî, dilşadî

Seb: e. Dijûn.

Se'b: e. Zehmet.

Seba: f. 1. Bayê sibehê. 2. Navê bajarekî li Yemenê.

Hewa weqtê sebayê ba hewa bê

Ji alê dîlbera mesken-Seba bê (Ş.M.E)

Sebaheê kubbar: Sehabîyên qedirmezîn.

Sebahulxeyr: Sibeha te bi xêr!

Sebahul xeyri xanê min

Şehê şêrin zebanê min (M.C)

Sebat: e. Bêhnfirehî, sebir, tebat. Berdewamî.

Sebb: e. Dijûn, heqaret.

Sebbax: Rengker, rengrêj.

Sebbî 'îşqî tîyabê: Dijûnên evînê di nav wê da hebe.

Seb'e: Heft.

Sebed: k.s. Zembîl, selik.

Sebel: k.s. Nexweşîyeke çavan e.

Sebeq: Ders, hînbûn, dersen evînê.

Sebeq: e. Dema bihurî, derbasbûyî.

Seb'eê seyyare: Her heft stêrkên ku her yek li asîmanekî ne.

Seb'eyê Seyyare: Heft stêrkên geroke. Her heft stêrkên gerok, yên navdar.

Seb'eê şeddad: Heftên xurt, heft felek. Heft qatên asîman.

Sebhe: 1.Tizbî. 2.Duaxwestin. 3.Nimêja nafiye.

Sebhî hisme: e. Tu ji bo Xweda tesbîhatan bike, amajeyî ayeteke Qur'anê dike.

Sebir: Dermanekî pir tahl e.

Sebiz poş: Cil û bergê kesk li xwe kirin. Seyîd/ lawên pêxember.

Sebirî: Sebir kir.

Sebî: e. Rê û dirb.

Sebî: Lawikên piçûk.

Hem wê bizane halê dehîyye û 'eqîqeta sebîyan

Cenet meskenê wî be di nêv hor û xilmanan (X.U)

Sebîke: Pereyên neqîşandî. Kabika zêr.

Sebîr: e. Çîyayê Muzdelîfê.

Sebr û temkîn: Aramî, rihetî.

Sebseb feyfa' û bedwî: Deşt.

Sebur: e. Xwedanê sebrê. Bi sebr, aram.

Seburbe: Sebir bike, lez neke.

Sebûh: e. Navê cureyeke meyê. Meya sibehan.

Seher nêz e sebûhî de tu camê

Nesîmê zulfê yarê tê me şamê (Ş.M.E)

Sebz: Kesk.

Sebze: Şîn, şinahî.

Sebzesifet: Weke şinahîyekî.

Sebzîpoş: Kesk lixwekirî, bi cilên kesk.

Seced: Secde bir.

Se'd: Sadê Şîrazî Helbestvanekî farisê navdar e.

Se'd: Stêrka bextê.

Avête durdana xwe dur

Îsand ji misbaha xwe sur

Dolabê necmê nehs û kur

Mihra sitêra se'de da (M.C)

Sed: Bendav.

Seda: Deng. Dengvedan.

Sedagîr: Nav û deng belavbûyî.

Bê xeyl û heşem, bi xwe cîhangîr

Bê tebl û elem, cîhan sedagîr (E.X)

Sedaqet: Hevaltî.

Seda û gazegaz: Deng û hêlehêl.

Sed dane: Tizbîyên sed lib.

Sed de: k.s. Sed deh, hezar.

Seddî mesamî': e. Xwe li min ker bike.

Sedh: e. Pehnahî.

Sed hezar û hem çihar û bîst-I elf: 124.000. Mebest sed û bîst û çar hezar pêxember in.

Sediy: Pûstan, bistan; ji pêştirajinan ra tê gotin.

Sedî: Ewreng, rewş.

Sedîd: *e.* Kêm, nêm, edab.

Sedîd: Xurt.

Sed let: *k.s.* Sed parçe, sed kert.

Sedmet: *e.* 1. Bejahîya li enîyê.
2. Dahfik.

Sedr: Sîng *e.*

Sed şû ker e: *k.s.* Sed mêr kiriye.

Sedyuhyul îzam: *e.* Sed hestîyan sax dike.

Sefa: *e.* Kêfxweşî. Pak, paqij. Xweşî, aramî.

Sefahan: Bajarekî li Îranê ye, Isfehan.

Sefahûn: Isfehan.

Sefalbi: Eslê xwe her tiştê ku ji ax û herîyê peyda dibe. Ji bo tiştên bênirx û kêmbiha tê bikaranîn.

Sefawe: *e.* Puxte, kurta.

Sefayih: Rûpel.

Sefer: Rêwîti. Di tesewîfê da têgeheke ji bo sofîyan.

Seffak: Xwînêj.

Hemî mehw û fena kirne wekî xak

Evê qehpa neyar a zêde seffak (Ş.M.E)

Seffar: Qilêçî, kesê ku sifir spî dike.

Dîn çû, û neket bi dest me dînar

Paşê ji neçarî bûyne seffar (E.X)

Seffeyn: Du rêz. Du sef du alî.

Sefhe: Rûpel.

Sefîd: *e.* 1. Kebab, parêv, biryan
2. Spî.

Sefîh: Kawik, rênenas.

Sefîl: Bêşens, kêmnirx. Riswa û perîşan.

Sefîne: *e.* Keştî, gemî.

Pirê mûxan ji şîşe yê, da me sefineke meyê Şukrê Xudê ku qulzemek min ji xwe ra qubale kir (M.C)

Sefk: Rêtin.

Sefk û sekb û sebb: Rêtin.

Sefra: *e.* Aveke rengzer *e.* Ji kezeba meriva derdikeve û çêja wê tahl *e.*

Sefra: Zer

Sefraûn faqî': *e.* Zereke kal, lamilnebüyî. Parçeyek ji ayeta Qur'anê ye.

Sefsete: *e.* Tiştên beradayî û pûç.

Sefşikînan: Kesên serkeftî, serdest, xurt.

Sefwan: Ber.

Sefwet: Saffitî, paqijî

Sefweta sedef: Nîvê sedefe, hinavê sedefe.

Tîra ku ji acê, berhedsf bû

Amac-i bi sefweta sedef bû

Segmerg: *k.s.* Ew kesê ku ruhê wî bi zehmet derdikeve.

Sehab: Ewr.

Sehba: *e.* Cihekî li nêzîkî Xeyberê ye.

Sehbhan: *e.* Sehbanê Waîl.

Xweşguftarekî edebîyata erebî ye.

Se'her: Spêde.

Seher: Dawîya şevê û destê sibê.

Sehergeh: Sibehê, Beyanîyê.

Sehhaf û mucellid: Kesê pirtûkan bi qab dike û pelên wan bi hev ve didirû.

Sehhar: Yê pir sêhr dike, şaş dike. Sêhrbaz, efsûnkar, cadûbaz.

Sehhe: Durust e.

Sehin û qisîy: Tîr û kevan.

Sehî: Esehî, bêguman.

Sehîh: Rast, bêguman

Sehîn: Mêzîn.

Sehîqed: Bejinzirav. Bejin rast.

Sehîreng: Rast û taze; şaxa dirêj û nû.

Sehl: Hêsan, rihet.

Sehlê we seylê: Ax û lehî.

Sehm: 1.Tirs, heybet. 2.Tîr.

Sehn: e. 1.Hewş. 2.Sênîk.

Sehna rez: Hewşa rez.

Sehnê bustan: Pehnav û hewşa bax.

Sehnê meydan: Qada şer, pehnava şer.

Sehra: Çol, beyaban, meydan.

Sehrayê xuten: Beyaban Xutenê li Çînê ye. Bi xezalên miskê navdar e.

Seht: Rû li pahneyîya dinyayê.

Sehw: Jibîrbûn. Karên bêhemdî.

Sehwa: Çewtî, şaşî.

Sehwa xameê: Şaşîya pêûsê, çewtîya qeleme.

Seîd: Kamran, bextîyar. Bextewar û dilşad.

Se'îd: Pehnav. Erd û zevî. Mebest goristan e.

Sek: Se, kuçik.

Sekara: Serxweş.

Sekerat: Jixweçûna dema mirinê, bêhişbûn.

Canê şêrîn ku ji yar ra, bi Xudan ez dikrim Ne bi yarê xwe, di weqtê sekeratê nadim (M.C)

Sekîne: e. Aramî.

Sekînet: Aramî rehetî

Sekran: Serxweşî, sermest.

Seksirîşt: Xûykuçik, weke kuçikan.

Sela: Gazî, bang.

Selab: 1.Qazox, hişk.

2.Daleqandin, çarmixkirin, kuştin.

Dêwê mel'ûn û munafiq ê Xwedê rû reş kirî

Ma bi bala hilkişîtî aqibet çêbit selab (M.C)

Selamet: Parastin; bê qeza û bela.

Selas: Sê.

Selasil: Silsile an jî zincîr. Mebest porên li ser mil tene xwarê.

Ev îşq û mehebbeta di dilda

Ev zilf û selasilê di milda (E.X)

Selat: e. Selawat, nimêj.

Selatîn: Pirjimariya sultan e.

Selb: Kaşkirin.

Selbî kir: Jê xist, jê avêt.

Selc: e. Berf.

Selef: e. Berê pêşî. Zanayên pêşîn.

Selem: Di kirînê da dema ku mirov biha pêşîn dide, tiştê ku dikire paşê distîne.

Yaqûti-firoşan di kef elmasi şikestin
Ev sefheyê elmasî ku neqqaşî reqem
da (M.C)

Selîb: Xaç.

Gulçîçek û neqşên xerîb

Nesrîn û reyhanê 'ecîb

Lê rast û çep bûyîn selîb

Cedwel keşîn zunnari xet (M.C)

Selîm bibin: Emîn bibin, bawer bibin.

Selîs: e. Rewan.

Sellî ya rebbî ya 'ela xeyrîl beşer:

e.Ya Xwedê , dilovanîya xwe li
qencîrîn merivî bibarîne. Mebest Hz.
Mihemed e.

Sellî ya rebbî 'ela xetmîr rûsûl: e.

Xwedêyo, dilovanîya xwe li
temamkerê pêxemberan bibarîne.
Mebest Hz. Mihemed e.

Selsebîl: Navê kanîyeka bihuştê.
Çemekî li bihuştê.

Selsel: Av.

Seltenet: Desthilatdarî, hukumdarî;
welatê di bin serwerîya sultan da.

Selwa: 1.Serwî. 2.Tiştê meriv pê aram
dibe. Di Qur'anê da navê teyrikekî ku
biraştî bi ser peyrewên pêxember
Mûsa da li çola Sînayê dibariya.

Selwarewan: Ya ku dema dimeşe wek
selwîyê liba dibe. Weke serwîyê pir
rind, bedew.

Sem': Bihîstin, guh.

Sem: e. Jehr

Sema: 1.Asîman. 2.Reqs.

Sema': Bihîstin.

Semaî: Bihistî.Tiştên ku bi bihîstinê
tên zanîn.

Semak: f. Asîman, jor.

Seman: Heşt.

Semawat: Asîmanan, asîmanî.

Semawî: Asîmanî.

Sem'e: e. Bihîstin.

Semed: Navekî Xwedê ye. Yê
serbixwe yê ne hewcedar. Xwedayê ku
pêdivîya wî bi tu tiştî tune ye.

Semedî: Bi xwebûn. Ew Xwedayê ku
qet ne muhtacê tu tiştî ye.

Semek: Masî.

Semen: Yasemîn.

Ahuya Deştê Xeten misken xezala ke
yî tu Nazika sîma semen qenc û delala
ke yî tu (M.B)

Semen: e. Nirx, biha , qîmet.

Semenber: Sîng spî wekî gula asmînê.

Semenbo: Bêhn yasemîn.

Semen bûyan:Bêhn yasmînan.

Semend: 1. Hespê agir. Hespê sor û
qemer. 2. Colê hespan

Semender: Ajeleke xişok e.
Marmarokê avê. Di herdu aliyên laşê
wî da du kîsikên avê hene ji ber vê
naşewite ji ber vê di tesewifê da
bekayê temsîl dike.

Baqî di germ wekî semender

Wan cîsmê di bîte canê enwer (E.X)

Semendok: *k.s.* Hatiye şîretkirin.

Semen'izar: Rûsemen, rûyê wek yasemînan.

Semenqeba: Ya ku qebayê wê ji renga yasemînê ye. Qeba jî cureyekî cilên davêjin ser milan e.

Semensa: Weke yasemînan.

Semensur: Weke yasemînê rind û şîrîn.

Sem'ê insaf: Guhê insafê.

Semer: Ber û mêwe.

Semi: *e.* Bihîstin. Bihîstker.

Semîn: *e.* 1.Rûne ajelan. 2.Qelew, şîşman, kok. 3.Giranbiha, pirbiha, binirx.

Anîye nezm ev kîtaba nazenîn

Çêtir e ez dur û yaqût û semîn (Ş.M.C)

Semmak: Masîvan.

Semmiye: Navlêkirî, navlêdanayî.

Semn: Rûn.

Semsam û husam: Şêr *e.*

Semt: Cih, war.

Semûm: *e.* 1.Bayê Sam. 2.Germahîya pir.

Rihan barîn bi deştê da

Semûmê bayekî lê da

Gula reş çû di hewzê da

Hejandin katereyhanê (F.T)

Sena: *f.* Pesin, pesindayîn.

Sena: Ronî, ronahî.

Sena berqê tecellayê: Ronahîya birûska derketî.

Senaxwan: Medihker, pesindar.

Di med'hê Mîr-i nuqsan im

Ne laiq 'hi'dreta Mîr e

Li vê neslê senaxwanîm.

Bi med'hê şekkerefşanê (W)

Senayi': Tiştê çekirî, afirandî.

Sendibê: *k.s.* Standibe.

Sencan: *k.s.* Sazî.

Sendûq: Darbest.

Sene: Sal.

Sened: *e.* Deynname, belgenameya mal û milk.

Senem: Weke pût rind.

Senema sur ji Samed: Dilbera bi qasî peykerekî rind ku cazîbe û şîrînîya wê ji terefê Xwedê ye.

Seneme: Dilberê, dîlbera wekî peykeran rind.

Senemî: Pûtî; rind, delal.

Sen'et: Kar û mijûlî, huner.

Seneweber: Dara kajê.

Seneya te kuşayem: Bi pesnê te vekim, pesnê te bidim.

Seng: *f.* Kevir.

Sengdil: Dilkevir.

Sengisar: *f.* Cihê ku tije kevir e.

Sengîn: Giran.

Seng û ber: Kevir.

Seniyye: *e.* Pîroz.

Senskirîtî (Dînê senskîtî) Senkrîstî: Dîn û mezheb û bawerîyên kevnên Aryanîyên Kurdistanî.

Sensikrîtî/Sanskrîtî: Zimanek î
dînîyê edebî yê qedîm e.

Seoluqî: Ziman rast, rastgo be.

Spêdeya sadiq: Fecra sadiq.

Spêdê: Destpêka sihebê, seher,
spîbûn, ronahî.

Fîraqa şev bi axir çû, sipêde kifşî bû
dîsa Merîxa-nehsi ava bû, xuya bû roj
di şerqê da (M.C)

Seqa: e. Avdan.

Wî milhidî şûr wisa seqa kir

Misrî ji xwera wisa bira kir (E.X)

Seqa kir: Seqakirin; Danîna hesinên
sincirî di nav avê da ji bo hesin xurt
bibe.

Seqer: Dojeh, cehenem.

Seqet: Xirab û nebaş.

Seqîl: Giran.

Seqîm: e. Nexweş, jar, nesax.

Seqîy: Avdan.

Ser': Bi ferê ketî. Kesê ku laşê wî hişk
dibe û kef bi devê wî dikeve.

Sera: Qesr.

Serab: Leylan.

Serabun: Ji serî heta binî.

Bend û wesilêd-i min serabun

Ewwel tekirin bi emrê kun kun (E.X)

Serad: Cureyekê bêjîngan e.

Seradeng: Awaz, denge stranê.

Seramest: Serxweş

Serapa: Ji serî heta pê, serdanpê. Ser
û pê. Ji serî heta binî. Ji serî heta binî.
Hemî.

Şêrîn ew kes dirêje ku şeker bit

Serapa qedd û qamet nayê ter bit
(Ş.M.E)

Seraperde: k.s. Perdeyeke mezin e,
jûran ji hev cuda dike. Konê
padişahan.

Seraperdeê lahûtî: Qesra alema îlahî.

Serasîme: Bilez û bez.

Mecmû'di wê deryayê serasîme
digerhin Heyran û perîşan dilî sermest
û xerabe (M)

Serawiyl: Derpê

Serayê 'alî: Koşka bilind.

Serayê fanî: Cîhana fanî, dinya.
Cîhana maddî.

Serayê 'uqba: Cîhana dawîn. Axiret.

Serban: Hêştirvan, hêştirajo.

Serbend: Sergirêdayî.

Ser beser: k.s. Ser ta ser, hemî.

Serbeste: k.s. Sergirêdayî.

Serbestê telx: Gotina tehl û nexweş.

Serbezêr: k.s. Serbijêr.

Ser bi'icze didirit: Şaş dibe, neçar
dimîne.

Serbistan: k.s. Warê serabê, serab,
leylan.

Sercoş û kel: Kefa ku bi ser xwarinê
dikeve û dihêla qapax bipeke.

Ser çeng: k.s. Lêdan, şimaq.

Serçeşme: Serkanî, çavkanî.

Serçeşmeê heywan: Serkanîya ava heyatê.

Serd: *f.* Sar, serma.

Ser defter: Ew kesê navê wî di serê lîsteyê da hatiye nivîsîn. Serekê dîwanê.

Ser didit: Serî didiyê, digihîyê.

Ser dit: Serê xwe bide, bibe gorî.

Serencam: Serpêhatî, dawî, encam.

Serendaz: Desmala serî.

Serenguşt: Sertilî.

Nazika min di semayê bi serenguştê 'eqîq Da me îro di serayê qedehek taze rehîq (M.C)

Serenguştê 'eqîq: Sertilîyên sor, neynûkên sor. Sertilîyên weke eqîq sor.

Serengûn: Keftî, dernîşîvkirî

Seret hat: Dora te hat.

Serewjêr: *k.s.* Serberjêr.

Serf: Morfolojî

Serf bike: Xerc bike.

Serfiraz: Serbilind, serketî.

Serfişar: Sergiran, Di binyad da hatiye.

Sergelle: Pêşenga kerîyê. Peza di pêşîya kerî da dimeşe.

Sergerdan: Serlêgeryayî.

Sergerde: Sergêj; serserî.

Sergeşt: Sergêj.

Sergeşte: Sergerdan, şaşbûyî, jixweçûyî, dîwane, sergêj, serdoj. Sergerîyayî, çewt, şaş.

Sergeşte da: Zivirand, gerand.

Sergeştegan: *f.* Pirjimariya sergerdan.

Sergiran: Kerb vebûyî, xwe mezinkir. Nêrgizên sergiran hilîn carek!

Du qirana li yek beraber ke! (M.C)

Serguzeşt: Çîrok, serpêhatî.

Serh: Koşk, seray.

Serhed: Hidûd, sînor. tuxûb

Ser helbirre: *k.s.* Serê xwe bilind bike.

Serhelqe: Serek. Yê ku di serê govendê da ye.

Serheng: Serekê leşkeran.

Mem girt û şîhande pêşê serheng

Go: Heps-i bikin di qulleya teng (E.X)

Serifraz: Serbilind, serberz.

Seriyê: Nijde, talan.

Serî': Peler, lezok.

Serî dana: *k.s.* Serê xwe danî, mir.

Serîen: *e.* Zû zû, bilez.

Serîh: *e.* Vekirî, eşkere.

Serîn: *k.s.* Balgeh.

Serîr: Text.

Serî'ul infikak: Zû ji hev dikevin. Zû ji ber hev diçin, qels in.

Serî zulfî le dem na: *k.s.* Serê zilfa wê xist devê xwe.

Serkehnî: Serkanî, çavkanî.

Serkeş: Ew kesê serê xwe natewîne.
Şenboz, serberdayî, har.

Serkiş: Şenboz, serberdayî.

Serkol: Serrût, serqot.

Pêxwas-i hinek, hinek di serkol

Kaşo ji pîyan û ser wekî hol (E.X)

Serlewhe: Destpêk, beşên destpêka
pirtûkê.

Sermalan: Sermilan.

Sermaye: Sermal, saman, sermiyan.

Sermediyyet: Daîmbûn, hertimî. Bê
destpêk û bê dawî.

Sermedî: Bê destpêk û bê dawî,
herûher, hertim, daîmî.

Masedê qutbê es'edî, çeşman di iqlîman
nedî

Ey canfidayê Sermedî da şesxwarê
Xeznewî (M.M.E.H)

Sermest: Serxweş.

Sermeşq: Nivîsa numune ku suxte ji
ber wê nivîsê hîn dibin.

Xettê te ye serniwişt û sermeşq

Sîh sale xetê xeta diket meşq (E.X)

Sername: Destpêka kitêbê.

Sernameê_name name Ellah.

Bê namê wî natemam e, wellah (E.X)

Sernigûn: Serxwar.

Bi pîra sernigûn bawer mebe qet

Dikit mehw û fena hem ser dike qet
(Ş.M.E)

Sernivîst: Çarenus, sernivîs.

Serniwişt: k.s. Çarenûs.

Sernîgûn: k.s. Serûbin. Têkçûyîn,
wendabûna di nava axê da.

Sernuşêvî: Serxwarî, lehze, kurtedem.

Sernuwuşt-sernuwişt: Sernivîs,
serhatî, teqdîra Xweda.

Sernuwişt: k.s. Çarenivîs, aqûbet.

Sernûkê mujgan: Serikên mijangan.

Serpenc: Sertebl, sertilî

Serpence: Sertilî.

Serpoş: Tiştê ku meriv dide serê xwe.
Kum, şaşik.

Serpoşdar: Xwedan poşî, yê
perdepoşkirî.

Serqedem: Ser li ber piyan. Stûxwar û
bêçare.

Peyweste di dest te, serqedem bû

Ew ger 'elem û eger qelem bû (E.X)

Serqelem kir: Te ew afirand.

Gava ku li wî te serqelem kir

Herçî te îrade kir reqem kir (E.X)

Ser qot: Ser vekirî, ji bo mêran tê
gotin.

Serrace: Sîrac, çira.

Serraf: Pûlnas. Kesê ku ji peran
dizane û wan bi hev diguhere.

Ji mîhbetê te kul kir, ateş di dîl de hil
kir Mestûre kir sicil kiri serrafe Şeyxê
Taxê (Ş.E.S)

Ser rew: k.s. Meşa bi lez.

Ser rêj: k.s. Di ser ra çûyîn. Mebest
kaseya tijî av û ava ku di ser wê ra
dirije.

Serrişte: Zanîn, şarezayî. Sereta,
destpêka çîrokê.

Serrişteyê gewhera beqa ne
Sermayeyê îlleta fena ne (E.X)

Sersam: Gêj

Sersefhe: Serpel, serê rûpelê.
Neqqaşê ezel rüyet ser neqşekî zêrin
da Berkarê di destan bû ser sefhe ku
tezyîn da (E.X)

Sersem: Sersam, dîn.

Sersebz: Ter û nazik. Dara peldayî.

Sersebze dibit ji berk û baran
Ger lê bi werit ji feyzê, baran (E.X)

Serser: e. Ba, ecac, qersok, zêde sar.
Navekî Qur'anî ye ji bayê sar ra tê
gotin.

Serserî: Ne cidî, bêterbiye.

Sersubhe: Serê sibê.

Serşar: Tijî.

Serşare: Tijî, dagirtî.

Her kase û tebsîyek yek enbar
Serşare, şebîhê nefse emmar (E.X)

Serteraş: Serbirrî, serkurkirî, serqut.

Serû sehî: k.s. Dara serû, serwî.

Serw: Serwî, navê dareke bilind e.

Serwa xeraman: Bejna nazik û zirav
wekî dara kajê.

Serwer: Serek û pêşewa.

Serwerewan: Ya weke dara serwê
tevdigere, tevgerserwî.

Serwerê etqiya: Serokê hemî
mezinan, serokê giregiran.

Serwê sehî: Dara serwê ya rast,
kajedar.

Serw-i qamet: Bejinrast, wek bejna
dara selwê.

Serwî bala: Bejinservî, bejinzirav.

Serwînazê: Weke dara serwîyê bi naz
û tevger.

Serwinazê serfirazê

Şubhê zêr remza mecazê

Dame ber çakûç û gazê

Dil ji min bir dil ji min (M.C)

Serwîqed: Bejinservî, bejindirêj.

Serwîsih: Weke dar serwê, bejinzirav.

Serwîxennac: Ya ku tevgerên wê
weke dara serwîyê ne.

Serxe sirre: Gazî.

Serxeyl: Sersiwar, serleşker.
Şahsiwar, serok.

Serzede: k.s. Ew bûyerên ku
qewimîne.

Setar: e. Yê ku eyban vedişêre, navekî
Xwedê ye.

Sethê Sufle: Rûyê dinyayê.

Miqdar û şiklê hendesî

Kêm-zêde yek pê nahesî

Teswîr dikir Iqlîdesî

Hetta bi sethê sufle da (M.C)

Seth: e. Ban, ser, jor.

Setmand: Xirab kir.

Setr: e. Dapoşîn, vepoşîn.

Settar: Xefker.

Tu settarê û xeffarê günah im

'Efû ke, setrê ke, tu yî penah im (Ş.M.E)

Settarî: *e.* Gunehpoşî.

Setwet: *e.* Şiddet. Şidandina gemê (destgîn, dizgîn). Girtina bi tundî, zexmgirtina dijwar. Berizandin, êrîş

Sewab: 1. Mikafat, padaş û xelat. Rast, çak. Xêr, mukafata qencîyê. 2. Veger.

Sewabit: Sabit, li cih mayî, bêliv û lebat.

Sewad: *e.* Reşayî. Nivîsandina cara pêşî, ji nû ve nivîsandin. Reşî, nivîs. Yani nivîsanin û xwendinê qest dike.

Sewahib: Piranîya sahib *e;* Xwedîyan.

Sewal: Ajel, heywan.

Sewaş: Şer, ceng, herb.

Sewda: Xeyal, cunûn. Derdê evînê.

Sewda: Reş

Sewdaê cebîn: *f.* Aşiqê eniyê , evîndarê eniyê.

Sewdager: Bazirgan.

Sewda nekem: Mu'amele, dan û standin.

Sewda û sews kirim: Dîwane û sergêj kirim.

Sewdazede: Evîndar.

Dil û dîn xaret û yexma ne kirî

Serê sewdazede sewda ne kirî (M.C)

Sewkenal: *f.* Sond, soza şerefê.

Sewlet: Hêrs û êrîşên bi ceger. Çûn û hatina bi mêranî di cengê da.

Dîndarî-yû dewlet û dîyanet

Serdarî-yû sewlet û siyanet (E.X)

Sewm: Sîr.

Sewme'e: *e.* Perestgeh, xelwetgeh.

Sewms: Rojî.

Sewq: *e.* Birin, veguhestin, sewqkirin.

Sewr: *e.* Ga.

Sewret: Şikl, teşe.

Sewrwîbostan: Bejinbilind.

Sewt: Deng.

Sewtê sazan: Dengê amûrên muzîkê.

Sewwirand: Çêkir, bi bişekl kir.

Sewwirîn: Bi şiklbûn, fesilîn, çêbûn.

Sewz: *k.s.* Kesk.

Sexa: Comerdî.

Sexawet: Ciwanmêrî.

Sexî: Camêr, çavfîreh.

Sexlet nedem: Eziyet nede min, min neêşîne.

Sextê dax: Dilşikestî, xemgîn.

Sextî: Zorî, zehmetî.

Sextîcan: Parçecan. Canê bi zehmet.

Sexun: Germayî, edebîyat, kelimî.

Feyyazê 'ilmê "Mîn ledûn"

Pey pey ji behra "Kan" û "Kun"

Geh geh bi ustadê sexun

Wî gewherek nasu fte da (M.C)

Se'y: Ger, cehd. Çûyinûhatina bilez di navbera Sefa û Merwayê da, bazdan.

Se'y: *e.* Xebat, hewl.

Seyd: Nêçîr.

Seydgah: Nêçîrgeh.

Seydî fîtrak: *e.* Nêçîra ku nêçîrvan li piştê xwe daniye, li ser heyê.

Sey Ehmed: Seyid Ehmedê Neqîb, helbestvanekî kurd *e.*

Se'yetî: *e.* Hewldana wî.

Seyê dere xar: Seyê xwedî şikeftîyan, esahabul kehf.

Se'yê heywan: Xwewestandina pêxemet gihîştina ava jîyanê.

Seyê şîkarê: Kuçîkê nêçîrê.

Hetta xurekê seyê şîkarê,
Hetta elefê kerd-i barê (E.X)

Seyf: Şûr

Seyf : *e.* Havîn.

Seyfê cebbar: Şûrê Xwedê, Seyfullah, leqeba Xalid kurê Welîd *e.*

Seyê tazî: Seyê nêçîrê, tajî.

Seygel: Mişt.

Seyh: Gazî.

Seyhûn û ceyhûn: Du robarên navdar in.

Seyiat : *e.* Guneh.

Seyînî: Kûçikanî.

Seyl: *e.* 1. Lehî, laser. 2. Qûm, sîlekan.

Seylave: Navekî lehîyê ye.

Seypisan: Seyê şivanan, Kurê kuçikan.

Seyqel: Alava şayikkirin û tûjkirin û sadekirina tiştên wekî şûr, kaxez û mirêkan *e.*

Ew cewher *e.* wan diket mitella

Ev seyqel *e.* wan diket micella (E.X)

Seyqel dit: Ronahî dît, bibiriqe.

Seyr: Rêveçûn, çûyin. Ger, geşt, temaşe, nêrîn.

Seyra sulûkê: Rêveçûna di terîqetê da, rêçûna manewî.

Seyrî ke çonî bom: *k.s.* Tu temaşe bike ku tu ji bo min çawa yî.

Seyr kirin: Bi rê ketin. Koç kirin.

Se'y û cehd: Kar û xebat. Ked û xebat.

Seywan: 1. Xalvedan. Ronî û tîrêjên rengîn yên li dora tiştêkî. Xeleka ronîyê ya dora hîvê, tiştê sîyê dide 2. Sîwan

Seyyad: *e.* Nêçîrvan, çavên nêçîrvan.

Se'yyah: 1. Îbadet. 2. Herikandin. 3. Gerok. turîst.

Seyyal: Herikandin. Rewan, Hankandî. Geş û gur.

Seyyar: Gerok.

Seyyare: Gerestêrk, stêrkên gerok.

Seyyat: Dengbelavker.

Seyyadê cemalê wan xezalan

Seyyatê sedayê wan delalan (E.X)

Seyyîd: Mîr.

Sezawar: *f.* Misteheq. Hêja.

Sêb: Sêv.

Sê benat: Sê keç; jîndarên ji meriv û ajelan, jîndarên weke giya û daran, û tiştên ne jîndar weke axê û kevîr.

Sêber: *k.s.* Sî.

Sê'd: Navê stêrkekî ye.

Sêgah: Meqamekê muzîkê.

Sêlab: Lehî.

Sênc: Benda ji pejikan ku derdora tiştan diparêze.

‘Elî umrê te bû pêncî

Li hesab te tu hê genc î

Ji lewre hê tu bê sênc î

Xudadarî, çi xemdarî (M.E.F)

Sêvînzeqen: Çeneya wek sêvan.

Sibeynê: k.s. Siberoj.

Sibheynan: k.s. Spêdeyan.

Sibik: Sivik.

Sicilkirin: Qeydkirin, nivîsandin, tomarkirin.

Sidaq û mihr û kabîn: Qelen, bedela ku zava ji bo bûka xwe dide.

Siddîq: e. Ebûbekirê Sidîq. Xelîfeyê yekem.

Sidq: Rastî.

Sidq û îman: Rastî û pêbawerî.

Sidre: Meqamekî li asîmanê heftan. Dara li asîmanê heftan, cihê ku zanîn lê diqede.

Sidreê munteha: Navê meqamekî li asîmanê heftan e. Cihê herî dûr.

Sidretinnihayet: Li gor pirtûkên dînî dareke kinêrê ye li rastî erşa Xwedê şîn hatiye. Sidre. Li gor sureta El Necmê pêxember şeva mîracê da Xweda li ba wê darê dîtiye.

Sidretul minteha: Cihê herî jor ê dawîn. Meqamekî li asîmanê heftan.

Ji wê ew bire Sîdret-ul Munteha,

Bi qabê du qewsan vibal xwe giha (M.X.S)

Sifat: Wesif, akar, wesfên Xweda.

Sifatê seb’e: Heft sifetên Xwedê: Heyat, ‘Ilim, Sem’, Beser, Îradet, Qudret, Kelam.

Sifatê selbîye: Sifatên ku tiştên ne pak ne layîqê Xwedê ne.

Sifet ‘erez misal e: Ciwanîya keçan hîç e ku evîn nebe.

Sifetgoyîn: Weke goyînê.

Zeif im wek hilal im ez

Sifetgoyîn dikalim ez (M.C)

Sifetkisra: Weke sultan, weke mîran.,

Sifetûr: Weke horîyên bihuştê.

Sifîd: Spî.

Sifîdî: Spîtî, karên baş.

Sifr: Mis.

Sifre: Sifir “0” tune, nîne.

Sifre kir: Sifir kir. Mebest nivîsandina sifiran li paş reqeman e.

Sifrisifet: Weke sifir mîna paxirê spî.

Sihdan: Sî, sih.

Sihhet: Bêguman, bi rastî.

Sihl: Sêl.

Sihrebend: Sêrbaz, şûrê îmamê Elî ye.

Sihre fettan: Çavên fitneker, yên sahirana û pir bedew.

Du zulfê 'enber efşanin

Du le'Iê şekerestan in
 Du çeşmê sihrê fettan in
 Dilê min wan xedeng dane (M.C)
Sihrê helal: Gotina fesîh ku guhdaran
 weke sihrê şaş dike. Gotina edebî.
 Dê bi vî endaz û terzî kî dibêt sihri
 helal ? Ger ne bala teb'i bit wek
 pehlewani çalaki rûh (M.C.)
Sihrî: Xezûr.
Sik: Nexweşik, zişt.
Sikûn û qerar: Hedar û aramî.
Sil: Yê ku ji merivan direve; ne kedî.
Silah: e. Meslihet.
Sil bû: Hêrs bû.
Silehder: Çekdar.
Silhatîn: Xeyidîn
Silk: Sire, rêz. Tertîp, tekûz. Li
 rêveçûn, pîşe. Rê, rêbaz. Li rê çûn.
 Bi minqarê belaxet suft û qul kir
 Di silkê me'ruet tenzîmê kul kir
 (Ş.M.E)
Silsile: Rêzbûyî.
 Têk û vêk dan hatine xare silsilên lek
 aliyan
 Sunbula girtin kenare sef vebestî
 ef'îyan (M)
Silsilebend: Di rêzekê da.
 Hin daîrebend û hin di dewwar
 Hin sîlsilebend û hin di seyyar (E.X)
Silsilîn: Rêz bûn, hatin girêdan.
Silûk: Mayîna di hucrê da (Bi awayê
 Tesawufî). Terîqet, rêya terîqetê.

Ji şer'ê qet mixsed fesahet nîne
 Belkî 'emel û silûka terîqa dîn e (X.U)
Sikke: Mohra li pereyan dikeve.
 Neqdê me di bû bi sîkke meskûk
 Ne'dma wehe bê rewac û meşkûk
 (E.X)
Sikke da: Mohr kir.
Sikkîn: Kêr.
Sikûn: Hêwirî û aramî û aşbûn.
Sikût: Bêdengî.
Simaê: Bihîstinê.
Simat: f. Sifre. Amanên raxistinê.
Simat: e. Nîşan, elamet.
 Sifatê kemalî hemî, Reb hene,
 Sîmatê di neqşî ne mewcûdene
 (M.X.S)
Simsim: Kuncî.
Simûm: Pîranîya sum e, yanî jehr.
Sin: e. 1.Sal 2.Temen, emir.
Sin: Diran.
Sinan: f. Rim, tîr.
Sipahî: 1.Leşker. 2.Spehî, xweşik.
 Mebnî li wî adetê mibarek
 Şehrî û sipahîyan bi carek (E.X)
Sipare: Sipart.
Sipe: Kurtîya sipah e anku leşker.
Spehr: e. 1. Asîman, rûyê asîman.
 2.Bext, talih.
Sipêde: Sîbeh, şefeq.
Sipêre: k.s. Sipartin, teslîm kirin.
 Îznî çûne çemen î weslî sipêre be reqîb

Mehwîya bimre ke mirdin buwe
mîrawî heyat (MW)

Sipîhr: I. Asîman, gerdûn, felek 2.
Bext.

Neh çerxê sipîhrê ji hewayaya te û mîhrê
Sergeşte ne ew têk vi me ra şubhê
hebabê (M.C)

Sipîdman: Zêrekî qelp û ne safî ye.
Dermanekî pê zêr durust dîkin.

Sipllem: k.s. Bêwefa

Sipûsar: Bêqîmet, erzan.

Siqlet: e. Giranî, zordayîn.

Paşê hereket ke pêşve çapik
Sîqlet ne girî li teb'ê nazik (E.X)

Sir: Cazîbe, xwînşîrînî.

Sir: Raz, veşartî, nehînî.

Sir: Bayê pir sar, serma dijwar.

Sirac: Çira. Roj.

Sirat: Rê.

Sirbal: Kiras.

Sirf: k.s. Rût, xalis, safî. Xweser.

Sirişk: Hêsir, fermesk.

Sirişt: Xûy, Xweza, sirûşt, tebîet, eslû
fesh.

Sirişta qudsê: Siruşta pîrozîyê.

Sirîşk: Hêstir.

Sirperî: Surperî, cazîbeperî; pir rind,
pir şîrîn. Weke perîyan bi cazîbe, pir
şîrîn.

Di çerxê wek nucûm dêmdur, sema
hatin qîranayek

Heyîva bedrê bû ew sirperî min dî di
reqsê da (M.C)

Sirre: Navik.

Sirrê bê zewal: Raza ku her heyê.
Raza Xwedayî.

Sirrê wehdet: Hikmeta yekbûna
Xwedê.

Sirşîrîn: Surşîrîn, şîrîncazîbe,
balkêşîyeke şîrîn.

Sirt û xef: Veşartî.

Sirur: e. Kêfxweşî.

Şahî û sefa û sirûr ew sabitin d'biharê
Çiya girîyan di me'mûr di nevwê
cûybarê Zahir bû cumle mestur d'meha
paşî Adarê (M.G)

Siruşk: k.s. Firmêsk, hêstir, rondik.

Sir û sîpal: k.s. Cil û bergên nebaş.

Sirûş: Îlham, coş û heyecan.

Sirwe ba: k.s. Nesîm, Bayê nerm û
xweş.

Star: Hewîngeh, penageh.

Bi nûnekê yaran ne dî

Nêv me û xwe staran ne dî (M.C)

Sitar: Perde.

Sitareweş: Wek stêrkan geş. 'Weş'
dikeve paşîya peyvan wateya 'wek'
dide wan.

Sitemger: f. Zalim.

Sitemkar: Zalim.

Welê zêde sitemkar e be nazî

Siyasî yarek e der 'şqibazî (Ş.M.E)

Stêra se'de: Stêrka bext û siûdê;
 Zuhre yan jî Muşterî.
Stiwa: Îstiwa, nivî, nivê asîman.
Sitem: Neheqî, zilm.
Sitî: Navê xwişka mîr e di Mem û Zîna Ehmedê Xanî da. Wateya wê jina fediyok û şermok e.
Sitîzekar: Şerxwaz.
Sittet: Şeş.
Sivlaq: Navê Mehabadê yê kevn
Siwa: Xeyrî, ji bilî.
Siwar: Bazin.
Siwer: Sûretên Qur'anê.
Siweyda: Nava dil.
Siwêda: Kûrahîya dil.
Sixar: Piçûk.
 Esnafê umem, sîxar û kubbar
 Qet'a ve nema di şehrê deyyar (E.X)
Sixnî kirdin: k.s. Tiral. Ew kesêtenbel e bes dixwe û tu karî nake.
Siya: Reş.
Siya bext: f. Bextreş.
Siya bextan: k.s. Kesên bextreş.
Siyadet: Mukemelî û serdestî.
 Mewcûde di wê, şhadet û keyb
 Meşhûde di wê, sîyadet û eyb(E.X)
Siyah û seda: Deng, sewt, awaz.
Siyahçeşm: Çavreş.
Siyahî: Reşitî, Karên xirab.
Siyahkar: Pîs û xirabkar.
 Katib qelemê diket sîyahkar
 Sazende ye, ney ji dest bi hawar (E.X)

Siyanet: Parastin.
Siyapoş: f. Reşpoş.
 Xerîbê merdomê ehlê cîhanî
 Siyapoşê xemê 'alî mekanî (Ş.M.E)
Siya rozî: k.s. Rojreşî, bextreşî.
Siyan û dîn: k.s. Sisê û du.
Siya salim: k.s. Salên hişk.
Siyebest: Bextêreş.
Siyedestî: Çavreşek.
Siyehcame: f. Kinçreş.
Siyeh mar: f. Marê reş, mexsed porê yarê.
Siyehpûş: Reşwergirtî, Reşpoş.
Siyehrû: Rûreş.
 Bi xeflet 'umri borandî heme weqt
 Siyehrû bûme û hem zêde bed bext (Ş.M.E)
Siyehsirme: Kilê reş.
Siyerûz: Roja reş.
Siza: k.s. Şayan, layiq.
Sî: Balindeya Sîmir.
Sî: Qaz
Sîb: e. 1.Hêştira qurbanê. 2.Erxa avê.
Sîb: f. Sêv.
Sîbhe: e. Tezbîh.
Sîbîrya: Herêmeke Rûsyayê ye.
Sîcaf: k.s. Qerax, rex, kenar. Perawêz, kenar.
Sîddîqe: e. Lêqeba Hz. Eyşe ye, jina pêxember e.
Sîdre: e. Dareke li alîyê rastê yê erşê Xwedê.

Sîgah: Aheng.

Sîh, Sîx (Sîhîzim): Mezhebeke reformist e ya hîndûyan.

Sîl: Seyil, lehî.

Sîlsîle: e. Zencîr.

Sîm: f. Zîv.

Sîma: e. Rû, çehre.

Sîmab: Avzîvkirî, avzîv. Ava zîv.

Sîma ku nema: Dema ku rû xuya kir.

Sîmaperî: Rûperî.

Dame ber çeşmê xezeb ew dilbera sîmaperî.

Sed meded pîrê muxan dîsa bikîtin himmetê (Ş.E.A)

Sîmber: Singzîv, gerdenzîv.

Sîmberê: Singzîv, sîngê wek zîvî spî.

Sîmê saqan: Çiqil, çîpên wek zîv.

Sîmiendamê: Bejinzîvê.

Sîmirx: Balindeyeke efsaneyî ye, Sîmir.

Sîmiten: Tenspî, tenzîv.

Er'era qamet-elîf neyşekera şox û şepal Nazika sîmîten û xusrewê zerrîn-kulehê (M.C)

Sîmînbeden: Laşzîv.

Sîmînber: Tenzîv. Sîng zîvîn.

Sîmînbera neyşekerî

Ew horîya nisbet perî

Bejna şêrîn dêmê zerî

Bu ji gulab û mawerê (M.C)

Sîmînazar: Rûzîvîn.

Sîmînsa'id û saqan: Zend û bendên ji rengê zîv.

Sîmînxebeb: Xebxeba spî weke zîv.

Sîmten: Tenspî, tenê weke zîv spî.

Sîm û mes: Zîv û paxir.

Sîm û zer: Zîv û zêr.

Sîna: Mebest Îbnî Sîna ye.

Sînan: Serê tîran, diranên birrekê.

Ev erreyâ jehrî-didan

Min jê di dil danîn sînan (M.C)

Sîne: f. Sîng.

Sîneçak: Sîng qetiyayî.

Lewra di elîl û derdenak in

Lewra di hezîn û sîneçak in (E.X)

Sînegudaz: Sînesoz, yê ku sînga wî dişewite.

Sîne helbidire: k.s. Sîngçirandin, sîngqelaştin.

Sîne sad: Sîngê safî, paqij.

Sînesaf: Dilpak.

Mem fêris û betl û sînesaf e

Xasma bi tera xwe bê xîlaf e (E.X)

Sînêsoj: Sîngsoj, Sîngê dişewitîne.

Şahlewend î leb ji qend î çeşmî bend î pur xerîb

Sînesoj î dîlfîroj î meh cemala ke yî tu (M)

Sînesoz: Sîngşewitî, dilbirîn.

Sîneserd: Dîlsarî, bêgumanî.

Sînesûz: Sîngê dişewitîne.

Sîneyê safî: Sîngê safî, dilê paqij.

Sînê û ehşa: Sîng û hinav.

Sîngê xara: Sîngê req wekî kevirê hişk.

Sînîn: *e.* Pirjimariya salê ye.

Sîpare: *k.s.* Pirtûk. Sî parçe, Mebest
Qur'an e ku ji sî cuzan pêk tê.

Sîpehr: Asîman.

Spêda: Sibeh.

Spêde: 1.Berbang. 2.Stêrka sibehê.

Firaqa şev bi axir çû, sipêde kifşî bû
dîsa Merîxa-nehsî ava bû, xuya bû roj
di şerqê da (M.C)

Spîndar: Hewr. Dareke peldar û zirav
e.

Sîqal: Pakkirin, ronîdan, biriqîn. Siqa
bike, tûj bike.

Sîqal bidin: Boyax bikin, ronî bikin.

Sîrab: Têrav, ter û taze.

Sîrac: Çîra, ronî.

Sîrat: *e.* Pira dojehê.

Sîrayet: Gihaştin, belavbûn.

‘Îşqê ji herdu çeşman ewwel di dil eser
kir Lê zerre zerre axir sotin kir û
sirayet (M.C)

Sîret: Xûy. Bizav û tevger.

Sîretê ebyed wesiwas: Weke şeytanê
wesweseker, şeytanê xapînok.

Sîretê ecdad: Secera bav û kalan.

Sîretmelek: Ya/ê ku rabûn û rûniştina
wî ya firîşteyan be.

Sîs: *k.s.* Pûç.

Sîtab: Sîtav.

Sîtê sentûr: Dengê sentûrê.

Sîwan: Perdeya ku binê xwe sî dike.
Şemsiye.

Sîwe: Bilî.

Siwênd: *k.s.* Sond, qesem.

Sîyabext: *f.* bextreş

Sîyahcerde: Rengesmer.

Sîyahkeman: Birûyên reş yên weke
kevanan.

Sîyehçerde: Reşê bi sorayî ve , esmer.

Sîyap-çerd: Rengê genim, reşê qemer.
Çehre reş.

Sîyeh: Reş

Soba: Soberîvan.

Sohtin: Sotin, şewitin.

Solîn: Kanî, avzên

Sorax: Rewş pirsîn.

Sorax: Vegerîn, lêgeryan. Qul.

Sorişîn xû: *k.s.* Hêrsok.

Sos: Gêj û sewda.

Sosen: *k.s.* Sosin.

Sotin: Şewitin.

Sotîkebed: Kezebşewitî.

Soxîte: Şewitî, suxte.

Soz: Qelandîn, şewat.

Sozan: Agirtêketî.

Su': Pîs.

Gelek xwarin û şehwet û sût û zen,
Ji xelqê û cehla 'ewamê diken (M.X.S)

Sual: *e.* Pirs.

Subbûhî û quddûsî: Firîşteyên ku
tesbîh û teqdîsa Xwedê dikin. Wî ji
tiştên nelayiq dûr dixin; mezinbûn û
pakhûna wî dipejirînin.

Subh: Sibeh.

Subhan: Dûrkirina Xwedê ji kêmasîyan

Subhan ema e'refnak: *e.* Ey Xweda! Em ne layîqî pesinandina te ne. Bi heq me tu nas nekiriye.

Subhdem: *k.s.* Dema sibehê.

Subhê kazib: Sibeha derewîn.

Subhê sadiq: Sibeha rastîn. Du sibeh hene yek a derewîn a din jî ya rastîn *e.* Ya derewîn dawiya şevê hinek zelalî li asîman xuya û diçe, piştra roj ronî dibe ev jî sibeha rastîn *e.*

Subh û şam: Spêde û êvar.

Subhey: *k.s.* Sibeh.

Subhê weda: Spêdeya xatirxwestinê.

Subulen-narî: Rêya êgir.

Subuk: Sivik; zû.

Subûh: Pîroz. pak. Xwedayê ku bêkêmasîbûna wî tê îtîrafkirin.

Wesf û kemalatên subûh

Herfên kitaba 'eql û rûh (M.C)

Sucdey ber debem: *k.s.* Ji bo wî secdeyê dikim.

Sucûd burden: Secde birin. Çûn secdeyê.

Suddetisse'adet: Dergehê kêfxweşî û şadimanîyê.

Sudûr: Ya ku derketî, eşkere bûyî, çêbûyî.

Dan dil ji ber husna bi nûr

Berqa tecella ya sudur (M.C)

Su'eda: Yên kêfxweş û bextewar. Kesên bawermend.

Sufalîn: Axa ku hatiye sotin û tiştên mîna cêra jê çêdibe.

Sufercel: Bihok.

Sufle: Kesên ji şeytan û cinên xirab. Endamên tebeqeya xirab. Çîna xirab. Berjêr, serberjêr, perîşan. Kesekî bê bayex, bê biha. Benî, kole, geda.

Suflewî: Berjêr. Li erdê.

Sufî: Nizmayî, jêrketî.

Suft: Rêtin, rijandin.

Suftiyin: Qul kirine.

Sugend: Sond.

Suheylê sema : Stêrkeke geş e ku li alîyê başûrê dinyayê xuya dike.

Suk: Şîşika zirav û kurt.

Sukanê felek: *f.* Binecihên felekan.

Sukkan: Sekin, rûniştin. Sekan, mile gemîyê yê ku berê wê rast dike.

Sukot: Sukût, bêdeng.

Sukûb: Rijandin, herikandin.

Sukûnet kem: *k.s.* Aram bikim, aram bim.

Sulaf: Bade, mey, şerab.

Su'leban: Rovî.

Sultanê beşer: Serdarê merivan, mebest Hz. Mihemed *e.*

Sultanê Ereb: Xelîfe, sultanê ereban.

Sulûk: *e.* Çûna li rê, rêveçûna tesewîfî. Rê, ji bo rêya terîqetê tê bikaranîn.

Cezbe û seyra sulûkê, bê mehebbet
nabîtin Cehdeya bê 'îşq û hub, çendî
ku kir bê feyde bû (M.C)

Suls: Cureyek xêzên erebî ye ku bi
sêyeka serê pêûsê dihate nivîsandin ji
ber vê navê wê bû “suls” yanî sêyek.

Sum: Jehr.

Sume îzheb: e. Paşê tu here.

Sumn: Heştyek.

Sun': Çêkirin, sazîkirin.

Sunbul: Sinbul; bi reng û şeklê xwe
ve dişibe porê yarê. Kezîyên weke
sunbîlan. Kulîlkeke rind e.

Sundus: Qumaşê hevrişim ê avzêrkirî.
Hevrişimê tenik yê bi tayên zêr û zîv
neqîşandî.

Sunne: e. Suneta pêxember.

Sunnet: Perestiyên ne ferz.

Sunnî: e. Ehlê sunnet û cemaat.

Suqb: Kune, meşka avê.

Suqut: e. Ketin.

Sur: Dilkêşî, şahî. Cazîbe, şîrînî. Ew
sura ku reh tê da civîyane.

Suradiq: Xîvet, xiçirk, xîçên
mozayîqê.

Surah: Surahî, Amûra mey tê da.

Surahî: Kaseya meyê.

Lebaleb kirin jê cam û surahî
Vexwarin, zêde kirne keyf û şahî
(Ş.M.E)

Surax: Şûnwar, nîşan.

Sura xûban: Cazîbe û şîrînîya
bedewan.

Surcemîl: Cazîberind, şîrîn û bedew.

Sureyya: Pêro, komeke stêrkan,
Perwîn

Surme: Kilê çavan.

Çi nar û pêtî da ser me

Evîna te qewî germ e

Du çavan pê bikim surme

Ji toza Rewzê astanê (M.B)

Suroş: Îşaret, wehiy, peyam.
Milyaket, firîşte, Cebraîl.

Surme didêrîn: Kîl dikin.

Surme keşan: k.s. Ya/ê u kîl dikişîne
çavên xwe.

Surmepoş: Çavkilkirî, çavreş.

Arifên ehlê besîret, ji neseq merdumê
çêşm Surmepoş in di beyadê û qebayê
xwe yê reş (M.C)

Surmesa: Kilkêş.

Surmuşterî: Weke stêrka Muşterîyê
delal û şîrîn, nişana siûdê.

Surna: Borîzan.

Surperî: Ya wek perîyan cazîbedar.

Dax û key min lê hezar in

Gul didest şewkên bixar in

Surperi dêw wê l'kenar in

Ehremen xatem revaye (M.C)

Surr: Sur, cazîbe, şîranî.

Surrena: Zirne

Surr şîranî: Cazîbe.

Surûd: Awaza helbestê. Bacî, dîlok.

Dizani rûd û 'ud ewwel, çi tavêtin
surûd ewwel?

Ke işq asan nimûd ewwel, welê uftadî
muşkil ha (M.C)

Surşîrîn: Cazîbeşîrîn, bedew.

Surx: *f.* Sor.

Sust: Sist, nerm.

Sutal: Tolaz, serseri.

Sutûr: Efsane. Nivîs, rêz; afirîn û
çêbûna tiştan.

Suwer: Sûret, wêne.

Suxen: Germîya helbestan, edebîyat.
Gotin, axaftin.

Suxennewaz: Gotinşîrîn, devnarm.

Suxen telx: Gotinên tahl.

Suxra: Piçûk.

Zahir te eger numaye suxra

Batin ewe neqşê xame kubra (E.X)

Suxre: *k.s.* Henekê xwe pê kirin.

Suxte: 1.Şagirt, xwendekar. 2.Zarok,
bende, kesê ji eşqê şewitî.

Suwaj: 1.Herb, şer. 2.Sosret.

Suyyah: Kesê ku pir digere, geştîyar,
gerok, seyyah.

Suzen: Soj, şewat.

Sû: *f.* Hêl, alî

Sû: Gazin û lome.

Sûbarî: Sûbarto.

Sûbaşî: Serekê pasdaran.

Sû be sû: *k.s.* Dûbera şewitin.

Sûd: Kelk, feyde, mifa. Kar.

Sûdayî: Bazirganî, ticaret.

Sûel'ezab: *e.* 'Ezabekî gelekî xirab.

Sûf: Hirî

Sûgend: Suyend, sond, yemîn.

Sûk: Bazar, çarşî.

Sûq: *e.* Bazar, çarşî.

Sûr: Sor.

Sûr: Bezma şahîyê.

Sûr: Roja qiymatê firîşte Îsrafil pifê
dike û mirî sax dibin.

Sûrax: Sotî.

Sûre: Beş.

Sûreê Nûr: Sûreta Nûr. Sûreta bîst û
çaran *e.* Behsa nûra Xwedê dike.
Mebest rûyê yarê ye.

Sûret: 1.Dirûv, şikl, rû.2. Wêneyê li
ser diravan.

Sûretê çîn: Wêneyên neqqaş Manî.

Sûretê heq: Dîmenê Xwedê.

Sûreyê ummilkîtab: Sûreta Fatîheyê
ku wek "Derê Qur'anê" tê binavkirin.

Sûrê: Sûra Îsrafil.

Sûrî: Şiklî, sereser ra.

Sûrî Îsrafil: Sûra Îsrafil.

Sûrnuma: Xweşîyê dide xuyakirin.

Sûrx: Sor.

Sûta: *k.s.* Şewitî, sotî.

Sûtin: *k.s.* Şewitin.

Sûxten: Sotin.

Sûxteper: Baskşewitî.

Sûy: Alî, hêl, teref.

Serê pir mekrî rakir sûyê 'ekkû

Vekir bendê zebanê meslîhetcû
(Ş.M.E)

Sûz: Şewat, sotin.

Sûzan: Sotîner, şewitîner.

Sûzendeter: Sojîntir, biêştir.

Sûzî nihan: Rih sot.

Ş

Şa: Şad, şadan.

Şa: Şah, paşa.

Şab: Ciwan.

Suxen tûtîsîfet şekkersuxen bin

Bi şukrê zêde şabê dilkuhen bin

(Ş.M.E)

Şabal: k.s. Baskên mezin.

Şabaş: Diyarî û bexşîş.

Şadab: Kêfxweş.

Şadan: Kêfxweş, dilxweş.

Xizan û geda, xenî û zengîn

Şadan û hezîn û şa û xemgîn (E.X)

Şademerg: f. Mirina ji kêfê, ji şadûmanîyê mirin.

Şadiman: Kêfxweş, dilşad.

Şadimanî: Kêfxweşî, dilşadî.

Heme esbabê keyf û şadîmanî

Şukur tev hazir in bêsergiranî (Ş.M.E)

Şadî: Şahî.

Gelek pur şadî bû pîra belacû

Ji hev başqe ku bûn yarî di xweş bû

(Ş.M.E)

Şadîgamî: Kêf.

Şagird: Xwendekar, şagirt.

Şagirdê şeameta wî şeytan

Şermende ji gotina wî Bohtan (E.X)

Şah: Padîşah.

Şaha: Ey şah!

Şahane: Tiştên ku sezawar û laîqê şahani ye.

Şahebeyt: Şahmalik, Di helbestê da malika herî bijare ye.

Şahê Erebi: Hz. Muhemed.

Şahê exter: Şahê stêrkan. Mebest roj e.

Şahê geda: Şahê feqîran, xwedîyê belengazan.

Şev bû dinê çeşmê me da

Hetta beşîr mizgînî da

Dê bê seher şahê geda

Feryad ji destê firqetê (M.C)

Şahê husnê qidemê: Şahê spehîbûna ezeli, yê ku her hebû û hertim hukumdar bû.

Şahê kerîm: Mebest Xweda ye.

Şahê Mecer: Roj.

Şahê Necef: Murşidê terîqetê, pîr, leqeba Îmamê Elî.

Şahê Reyyan: Sultanê temamiya Misrê ye.

Şahê wedud: Xwedayê afrîner.

Şahê xawer: Şahê rojhilat.

Zibende ji şiklê şahê xawer

Tabende ji rengê mahê enwer (E.X)

Şahê Zîbarî: Leqeba Mevlana Xalid e.

Şahibaz: Teyrê baz.

Şahid: Dilber, evîndar. Çavbîn. Xweşik.

Şahide qudsî: Hezkera pîroz, dilbera pak. Ey şahide qudsî weke bende ji nîqabê.

Ta çendi weh sergeşte bimînin di hîcabê! (M.C)

Şahide qudsînîşan: Dilberên nîşanpîroz, payebilindên pîroz.

Şahim: k.s. Şahê min.

Şahî: Jêhatin.

Şahîd: e. Hazir, şahid.

Şahî enbîya: Serokê pêxemberan.

Şahîn: Kesê şad û bextewar.

Xemgîn bi çi dê bikin tehemmil?

Şahîn bi çi dê bikin tewessil? (E.X)

Şahmar: Zîya, marê reş, şahê maran.

Şahnişîn: Eywana ku şah lê rûdinin, şaneşîn, qesr, koşk.

Şahradibe: Bi kêf û neş'e radibe (rabûna bi kêf).

Şahradibe: Wekî Şahan radibe, wekî Şahan hêz dide xwe û radibe.

Şahreh: f. Rêya sereke.

Şaibe: Guman û şubhe.

Şakir: Pesindar, spasdar.

Xanî ku nehin bi qelbê zakir

Barî! Bi de wî zimanê şakir! (E.X)

Şakissilah: Yê ku sîlehan tûj dike, tamîr dike.

Şa kurr: k.s. Kurekî baş, mêrxas.

Şam: 1.Bajarê navdar îro paytextê dewleta Surîyê ye. 2.Êvar. 3.Şîv. 4. Rojava

Şamî Yelda: Şeva yeldayê.

Şam û seher: Êvar û sibeh. Spêde.

Şan: k.s. Mil.

Şan: e. Paye.

Şane: 1.Şanik, nîşan, xal. 2.Şeh.

Şaneê: f. Şeh

Şaneşîn: Cîhê rûniştina şahan, şahnişîn

Şapûr: Şahpûr, şahzade.

Çendeki şêrîn puser derbendê dîwana te bin

Bendê şapûrê te bin ta Xusro û Şapûrî bî(M.C)

Şar: k.s. Bajar, şehr.

Şarib: e. Vexwar.

Şariq û beyda: Roj.

Şat: Pez.

Şatir: 1.Xizmetkarê û seyisê padişahan ku bi wan ra diçûn rêwîtiya dîr. 2. Çaqirkêf. Çist. Bêheya. 3.Beşdar.

Şax: Leq, çirpî, beş.

Şaxê bala: Şaxê bilind. Mebest bejna bilind.

Şaxis: Çavlêmayîn, mêzekirin û şaşbûn.

Şaxsar: Beşê jor ji dara peldayî û kesk.

Şayan: k.s. Layîq, hêja.

Şayed: f. Pêkan, mimkun.

Şayeste: Layiq, hêja.

Şeamet: Bêyomî û pîsbûn.

Şeb: Şev.

Şebab: e. 1.Xort, ciwan, ciwanî. 2.Coş û xuroş, heyecan. 3.Xweşkirin.

Şebahet: Wekhevî.

Şeban: Şevan. Şivan.

Şebdîz: Weke şevê reş. Navê hespê Xusrewê Tebrîzî ye.

Şebefrûz: Şêvê ronî dîkin.

Hin Rojeperest û hin şebefrûz

Hin xusserevîn û hin xemendûz (E.X)

Şebnem: Şevnem, xunav, ava bi şev li ser gula digire.

Were saqîyê sîmînsaqê pur dil

Birêje abigîne şebnemê gul (Ş.M.E)

Şeddad: Xurt û pêlewan.

Wî gotî: Du şehlewendê şeddad

Îro li vî xelqî bûne cellad (E.X)

Şebe': Têr.

Şebçerax: Mûma şeve, lembeya şeve.

Şebdêz: f. Weke şevê reş. Navê hespa Xusrewê Tebrîzî ye jî.

Şe'beda: e. Hîle û pile.

Şebek: Faq, Şibake, tor, dav.

Bi umîda te humayê, ne, "Melê" tûri veda Wer temaşayê cîhan bûye hemî tûr û şebek (M.C)

Şebeq: Qul, qulik.

Şebeyxwîn: Êrîşa bi şev.

Şe'beze: Xap û rîp û hîlekarî. Fêlbazî.

Şebê dac: Şeva pir tarî.

Şebê deycûr: Şeva tarî.

Şebê qedrê: Leyletulqedr. Şeva 27ê Remezanê ku di wê şevê da Qur'an daketiye. (Sûreta Welqedrê: 97/1-5.)

Şebê qedrê li me rewşen ke, tu rûhî were xweş!

Me ji nû xweş ke, li ser çehvê şehîdên xwe bimeş! (M.C)

Şebgirî: k.s. Şevgirtin. Di wextê seherê da çûna ji cihekî ji bo cihekî din.

Şebistan: Welatê şeve, cihê xewê.

Şem'a şebistanan ew e werda gulistanan ew e

Sirrê tebistanan ew e şoxa Herîrî dil geş e (E.H)

Şebizande: Yê şevê şîyar bimîne û xewa wî neyê.

Şebîh: Mîna.

Şebnîqabe: Rûpêça weke şevê reş.

Şebreng: Şevreng, reş.

Şeb û roz: Şev û roj.

Şeca'et: Dilêrî.

Şeca'et celadet: Ciwanmêrî ye.

Şecer: e. Dar.

Şed: e. Rû.

Şefa'et: Di roja qiyametê da tika û mehderîya pêxember ji bo umeta xwe.

Şefaf: e. Zelal, dîyar.

Şefeq: Ji renga şefeqê; sor.

Şefeqse'dê: Yara ku şewqa wê wekî stêrka bextê ye.

Şefequzhere: Weke stêrka Zuhreyê ronî.

Şefê besîm: *f.* Lêvên biken.

Şeffe: Lêv.

Şefî': Mehdervan, alîkar, piştgir.

Muhammed seyyide alem şefî'e roja mîzanê

Çiraxê dîdeê Adem xudanê wehy û Furqanê (M.B)

Şefîte: Belawela, vekirî.

Şefqet: *e.* Dîlovanî, dîlnermî, merhemet.

Şefqe: Mîhrîvan, dilsoz.

Şeh: Şah, melîk.

Şehadet: Cîhana tiştên xuya, ku jê ra alemul xelq jî tê gotin.

Şehane: Layiqî şahan an jî padaş û xelatkirin.

Şehbaz: Baz, şahîn.

Şehd: *e.* Hingivekî pir baş *e.* Şuhd, hingiv

Şehda wesil: Şîrînîya gihîştinê.

Şehde: Hingivîn

Şehdê nab: Hingivê safî.

Şehdirêz: Hingivînêz.

Şehenşayî: *k.s.* Padîşah.

Şehim: Bez *e.*

Şehinşah: Şahê şahan.

Şehînşahê rusul seyfê hîdayet

Kîtabê heqq û emwacê 'înayet (Ş.M.E)

Şehir: Binavûdeng, navdar.

Ey ne'tê tû ez erş heta ferşê şehîra

Ey pertewe nûra te cîhan geşte munîra (M.B)

Şehkas: Kaseya şahan, tasa şahan, Kaseya sultanî.

Şehla- Şehle: Çavên reşika wan ji şînê tarî. Çavên rind, çavên spehî. Çavên mêşînî

Şehle: Pîrejîn.

Wê şehleyê hîlekarê cazû

Go: Bîne ji bo me xateman zû (E.X)

Şehlewend: Weke şahan bedew û jêhatî. Dilêr, ciwan û nazdar.

Şehmar: Şahê maran, mîrê maran.

Du şehmarê herîrê leylê Leyla

Li me xermen veda reş da Suheyla (Ş.M.E)

Şehnaz: Meqameke muzîkê ye.

Ey badê seba pirr nehejîn turreyê dildar Ûşşaqê bi nalîne ji murxûleyê şehnaz (E.X)

Şehper: Pirtikê per ê dirêj. Serkezî. Pakê şahî, baskê zîrek. Perên balindeyan ên mezin.

Dil ji biska filfilîn bû fir dida xala sîyah Şehperê zulfa şepalê dali dayê rast û çep (M.C)

Şehr: Meh.

Şehr: Bajar, welat.

Şehreyar: Padîşah.

Şehrerwa: Diravê ji sifir ku li derveyî herêma xwe bê qîmet *e.*

Şehrê şuhret: Welatê navdarîyê.

Şehrê ten: Laşê ku mîna bajarekî ye.

Şehrî: Bajarî.

Şehsewar: *f.* Mêrxas.

Şehsuwar: Şahê siwaran, siwarê çê.

Nîgara şehsuwar a qareqaşî

Sehîserwa gelekrind û 'eyaşî (Ş.M.E)

Şeht: Seqet.

Ji bo dinyayê tu reht î, di emrê axretê
şeht î Bi qelbê xwe wekî teht î, qe
nerm nabî di we'zê da (M.E.F)

Şe'i: Ceh.

Şek: *k.s.* Bêrxê ku sala xwe temam
kiriye ketiye sala duduyan. Kavir.

Şek: *e.* Guman, şubhe.

Şeker: Keçeke Esfehnî bû. Xusrew ew
ji bo ji bîrkirina evîna Şîrînê anîbû; lê
Şîrînê ew kuştibû.

Şekerleb: Lêvşekir.

Şekeramîz: Bi şekir, şekirîn.

Şekerramiz: Şekerav, qend

Şekerxa: Zimanşîrîn, gotinşîrîn.

Can didirim, gufti bi yek bûse deh

Lê bibitin le'lê şekerxa kefil (M.C)

Şekerxend: Ya ku dibeşîşe, tebesum
dike. Keçikên kenşîrîn.

Şekerxwab: Xewa şîrîn. Xirmaş.

Şekerxwend: Şîrînpeyv.

Şekîb: *f.* Semax, tebat, sebir.

Şekkerdehen: Devşekir.

Şekkerestan: Cihê şekir lê, cihê şekir
tê da.

Şekkerê teng: Şekirê di qalik da;
diranên yarê.

Şekkeriteng: Devê şekirîn.

Şekker xende: *f.* Kenekî wekî şekir
şêrîn.

Şekl: Dirûv, teşe.

Şeklî: Bi dîtina li ber çavê, zahirî.

Şekraw: *k.s.* Şekir û av, qendav.

Şekwa xetan: Gazindeyan ji xûçan.

Şekwe: Gilî û gazîn.

Geh şekwe di kir ji bo Mem'ê jar

Kî: Ey Yûsifê bê guneh, girîftar! (E.X)

Şel: *k.s.* Felc.

Şelal: Xemrevîn. Zirav, nazik.

Me j' dest-xeta terhen şelal

Xal û xetên nûra zelal

Danî di sindoqan li bal

Malê me sed qentari xet (M.C)

Şeliyan: Ji xwe kirin.

Şeltax: Hêwirze, qelebalix.

Şem': Find, mûm. Pertew, ronahî.

Şem: Çira, mûm, find.

Şem: *e.* Bêhnkirin.

Şema: Şem, mûm, find.

Şemail: Dirûv, exlaq, sifet.

Şemaîl: *e.* Wesfên bedew.

Nezmekî bê hed letîf e, hem delal

Der şemaîl nîne hemta û mîsat
(Ş.M.C)

Şemal: *e.* Meşale. Find, mûm, çira.

Xwoş şemal î mihr û mah î

Nazika ebrû siyah î

Ger tu şah î padîşah î
 Ez xerîbê xane me (M.B)
Şemalên xasse: Mûmên taybet.
Şemalîn: Weke mûmê, weke findê.
Şemal îsayine: Mûm vexistine, ronî didin.
Şem'e: Pertew, ronahî.
Şeme: Pîçek.
Şeme' der fanûsî: Mûma di fenerê da.
Şeme'ê munîr bit: Ronahîya mûmê kete eywana me ya tarî.
Şemê: Çira, find, qendîl, ronahî.
Şemirand: Terikand, dev jê berda.
Şemîm: e. Behna xweş.
 Eqrebet ser helqe 'Mîm'e deq li xalêt filfilîn
 Xemriyên 'enber şemîm e gerdena zer rehguzer (M)
Şeml: Kinca ku meriv bi xwe da dike.
Şeml: Belavbûn, vêkkin.
Şemm: e. Bêhnkirin.
Şemmeyek: Bêhnek, parçeyek.
Şemmêkî: k.s. Hindek, hinek.
Şems: e. Roj, tav.
Şemsa felek: Roja asîman.
Şemsa semayê rabi': Roja asîmanê çaran.
Şems'a wîsalê: Ronahîya gihaştina yarê.
Şemsa xawerê: Roja rojhilat.
Şemsê afaq: Roja ku li aso xuya dibe.
Şemsidduha: Roja nîvro.

Şemsî bi şemsî: Roj bi rojbûna xwe; bi ronahîya xwe, yanî peyaleyên ku wek rojê diçirsin.
Şems-Uul melahet: Roja geş a belavbûyî.
Şemşîr: Şûr.
 Pir eser kir wan 'iyûnan lew zeîf û zer kirim
 Ma bi şemşîre fîraqe kuştîm û ker ker kirim (M)
Şe'n: e. Hal, rewş.
Şeng: Xumar. Delal, spehî, xweşik, ciwan, rind.
Şepal: 1. Ciwan, spehî, delal, şîrîn . Xweşik, bedew. Rind. 2. Şêra mê.
Şeq: Kelaştin.
Şeqa: Bedbext. Nepak.
 Ê ne dewletxwahê Hezret bit ji nîva can û dil
 Şubhetê ehlê şeqa, ber qehr û azarê te bî (M.C)
Şeqalî û beqalî: Bi tinaz û hîle.
Şeqî: e. Kêşê xerabker û talanker, rêderketî. Eşqiya, bedbext, rêbir. Reşbext.
 Xelqê ku wekî Bekir şeqî ne Fîlêd-i wî cumle naheqî ne (E.X)
Şeqîq: Bira.
Şeqqelqemer: Duqetbûna hîvê. Ew mucîzeyeke pêxember e. Di sûreta El Qemerê da behsa vê mucîzeyê dike. "Qiyamet nêzik bû hîv bû du ker."

Şeqqijn: *k.s.* Dengê bask.

Şer: Qital.

Şer’: Şerî’et û dîn.

Şerab: Rêşî û xîşrên weke meya sor.

Şeraba ‘iş: Meya jîyanê, ava jîyanê.

Şerafet: Qedr û rûmet.

Şeranî: *k.s.* Şerxwaz.

Şerare: *e.* Çirûskên agir.

Şerar û şu’le: Çirîska agir.

Şerbeta helahil: Jehra xedar.

Şerbeta merg: *f.* Şerbeta mirinê.

Şeref: Nîvê asîman, dema nîvroyê.

Şerefyab: *k.s.* Ew kesê ku serbilindî bi dest xistibe.

Şerer: Çirûsk.

Perwaneyê perr soxîteyê şem' ê
qedîmim Nîranê cehennem şererê bal
û perrimdir (E.X)

Şererbar: Çirûsk jê diçe.

Şerh: Şirove, ravekirin, îzah.

Şerha lubabê: Pirtûkeke li ser fiqha
îmamê şafîî ye.

Şerhê lubab: Navê pirtûkekê ye.

Şer’i: Qanûn.

Şerî’et: Rê, rêya Xweda û pêxember.

Şerîf: *e.* Pîroz, birûmet, rûmetdar,
bişeref.

Şerîfnusxe: Nivîs û nexşa pîroz.

Şerm: Înfî’al.

Şermende: Fedîkar, şermok.

Şermisar: Şermîn, şermok.

Ji emrê pak ê te ez şermîsar im

Liser qibh û gunahan zêdekar im
(Ş.M.E)

Şerq: Rojhilat.

Şerqedan: Şeroke, şerût.

Şert: Merc.

Şer’ û sunnet: Şerî’eta Xwedê û
sineta pêxember.

Şest: Şewka masîgiran.

Şeş cihet: Şeş alî, jor û jêr û pêş û paş
û çep û rast.

Şeşanî: Dêmên xweş. Şeraba têkilav.

Şe’she’nî: 1.Deng û qîrîn. 2.Ronîbûn.

Şeşper: Gurz, cureyekî çekeke kevn *e.*

Şe’she’e: *e.* Şewqdayî. Şule.

Şet: Çem, rûbar. Çemê mezin.

Şetet: Xerab, bê pîvan, bê wezn û
pîvan.

Şî’rê Melê ku wek rewan

Daye te canê merivan

Pur me li bergê erxewan

Dîne xezel li nik şetet (M.C)

Şetê awî: Çemê avê.

Şetê kûr: Çemê Dicleyê.

Şetr: *e.* Nîv.

Şetrencî: Lîstikvanê kişikê (setrencê).

Şetrî: Şitrî, şirdank. Rêzika morîyên
ku jin bi serê xwe ve dîkin. Kezî.

Gerdena zer rehguzar *e.* rêbuwara
xemrîyan Şetrî yû belg û guhar *e.* hem
refîqê rîşîyan (M)

Şettul Erebb: Dema Dicle û Firat li tev hevdu dibin dikevîne kendava Besrayê wisa tê binavkirin.

Şeva dac: Şeva Yeldayê, şeva herî dirêj.

Şeva êlda: Şeva Yeldayê.

Şevberat: Şeva beratê, nîvê meha Şebanê yre.

Ji neqşe but û latan me sîne butxane ye Te'yîna wan sifatan tecella d' qelbe me ye Di e'yd û şevberatan ji wan ra me sucde ye (M.C)

Şew: k.s. Şev.

Şewa': Biraştî.

Şewandin: Şewitandin, eşandin

Şewçirax: k.s. Çiraya şevê.

Şewed: f. Ew bû, bû.

Şewher: f. Laîqê şahîtiyê.

Şewişandin: Tevlihevkin, serûbinkirin.

Da me bi destê sirê, cama ji rengê durê Cezbe giha can û dil, pir şewişandin hema (M.C)

Şewîqeddîm: Serwî bejn.

Şewî qedir: Şeva Leyletul Qedrê.

Şewk: 1. Dirî, strî. 2. Şewka masîyan, çengalê hesinî.

Şewket: e. Mezinahî, heybet. Payebilind.

Şewnîm: k.s. Şebnem, xunav.

Şewq: Ronahî, evîn, hezkirin.

Şewwişî: Ahenga wê xirab bû, tevlihev bû.

Şewwişîn: Şaş bûn.

Şexeb: Birçîtî.

Şexef: Nexweşîya dil.

Şey: e. Tişt.

Şeyatîn: Şeytan, chrîmen.

Şeyb: e. Pîrî, extiyarî. Spîbûya por.

Şeyd: Fêlbazî.

Şeyda: f. Evîndar, bengî, aşiq. Gêjatî, jiheşcûyîn. Şêt, evîndar.

Şeydatir: Dîntir, ji ber xwe çûyîna ji ber evînê.

Şeyekî: Tişteki.

Şeyekî wahid in: Yek tişt in.

Şeyhe: Pojan, artemisia. Giyayekî bi kulîlk e.

Şeyn: Qusûr, kêmasî.

Şeyx: Rûspî.

Şeyxê Sanî: Şêxê duyem, Şêx Sen'an şêxê yekem e.

Şeyxûxe: Pîrî û kalbûn.

Şezza: Bêhna miskê.

Şên: Karîn, hêz, quwet.

Şêr efgên: k.s. Yê ku şêr bixe erdê.

Şêresiwar: Siwarên diler wekî şêran.

Ew şêresiwar bi perr û çengê

Xwînî kiribûn, belek pilingê (E.X)

Şêrixo: Xûyşêr, wêrek.

Şêrîn: Dildara Ferhad û jina Xusrew Perwîzê şahê Sasanîyan.

Şêrî pel beste: *k.s.* Ew şêrê ku dest û lingên wî girêdayî.

Şêt: Dîn dîwane

Şêw: *k.s.* Şîv.

Şêwe: Awa, teşe, dirûv.

Şêwe numa: Bi awayê xwe derket.

Şêwey xot bişewêne: *k.s.* Şêweya xwe xirab bike. Şiklê xwe têk bide.

Şêx: Mebest Şêxê Se'nan e.

Şêxê kamil: Di tesewifê da li gor danasîna Cunêydê Bexdadî sofîyekî mezin bû. Şêxê kamil ev e ku: Dinêre nabîne, li gel diaxive nabihîze, Di xelwetgeha da li Xwedê dinêre û pê dihêwire.

Zanî ku nebû mûradê hasil

Bê xîlwetê xassê şêxê kamil (E.X)

Şêxînî: Şêxîti.

Şî'a': Tîrêj.

Şî'ar: Nîşan.

Şîbê'ht: Teşbih.

Şîgar: Nêçîr, seyd.

Şîhab: Bîrq û ronahîya brûskê. Gurbûna agir.

Şîhne: Pasvan, kesê di kuçe û kolanan da çavderîyê dike, bekçî. Pasdar.

Şîhûd: Eşkeretî, dîyarbûn.

Şîhûdê netemam: Dîtina kêr. Têgeheke tesewifî ye. Şîhûd dîtina Xwedê li her afrîdeyî da.

Şîkar: Nêçîr.

Şîken: 1.Şikestî. 2. Badayî.

Şikestexet muselsel kit: Xetê şikestî bi hev ve zincîr kirî.

Şîkêrt: Malê jinan.

Şîkîb: Aramî, asanî.

Şîkîna: Şikand.

Şîkofe: Xunçe, gupik.

Şîkuften: Bişkivîn

Şîmal: Bakur.

Şîmar: Jimar, hejmar.

Şîmşad: Dareke bilind, şîmşîr, dara kevotê.

Şîmşad 'er'er: *e.* Darên bilind û şaxîn û rind in.

Şîmşadîxeram: Tevger û nazîyên weke dara kevotê bilind û bedew.

Şîmşîr: Şûr

Şîmşîrgah: *f.* Cihê şûran.

Şîne: *k.s.* Bayê nerm, nesîm.

Şîne: *k.s.* Şîn, mersiye.

Şînewa: *k.s.* Ew kesê ku dibihîze.

Şîng: *k.s.* Giyayekî ku biharê derdive. Tê xwarinê.

Şîraq: Li hev nekirin, dubendî, cudatî.

Lew pêkve hemîşe bê tifaq in

Daîm bi temerrid û şîraq in (E.X)

Şîraze: Dirûtina pelên pirtûka bi tayên hevirmêş û şîrêzê.

Peywend bike pêkve bisk û xalê

Şîraze ke mishefa cemale (E.X)

Şîrazî: Şaîreki faris e.

Ger lu'luê mensûrî ji nezmê tu dixwazî! Wer şî'rê Melê bîn, te bi Şîrazî çi hacet? (M.C)

Şirk: Heval û hembêş çêkirin e.

Şiştiwe: k.s. Şûştîye.

Şitab: Lez, xweşçûna stêrkan.

Şitat: Gotinên ji heddê xwe der.

Ev çi teqlid û şetât in, çi petat in tu dikî? Seri vêra dihejinî, bi dused ah û keser! (M.C)

Şî'ûn: Kar û bar.

Şî-ûnan: Rewşan.

Şiwên helgir: k.s. Şopajo. Ew kesê ku bi şopan cî û şûnên xelkê dizane.

Şî'a: Tîrêj.

Şîb: Her tiştê geş û ronî û birqoqî.

Şîba: Perîşan.

Şî'e, şe'i: Tabî' û terefdarê Hezretî Elî.

Peyrewên mezhebê Caferî ne.

Şîfetgê: Evînê.

Şîfte: Perîşan.

Şîfte hal: f. Têkçûyî, haltêkçûyî.

Şîgar: Nêçîr, xenîmet, heqşûr.

Wuha muhkem ke ev damê veşarî

Zebûn bin tê de sed şêrê şîgarî (Ş.M.E)

Şîhab: Pizotê agir.

Munqelib min di menazil vajî ew seyrê dîkin

Yek bi yek xwûn jê dibarin atêş û lem' û şîhab (M.C)

Şîhabî saqîb: e.Stêrkên ku di şevan da diherikin.

Şîkar: f. Nêçîr.

Şîkayet: Gilî.

Şîmal: Bakur.

Şîme: Rewiş, exlaq, sinc.

Şînto (shîntaw): Dînê Japonan yê resmî û qedîm e.

Şîr: Şûr.

Şî'r: e. Helbest.

Şîraq: Derketina rojê.

Roj hatiye şîraqê

Lew dimrin ji kovanan (M.C)

Şîraz: 1.Bajarekî Îranê. 2. Birûyên wek kevanên Şîrazî.

Şîraze: Şîrêza ji bo bihevvekirina pelên pirtûkan, an jî tayê ku pê ew pel didirûtin.

Şîrazî: Kevanên Şîrazî.

Şîremerdî: Şêremêr, Mêrekî weke şêran.

Şîrê cefayê: Şûrê êşê.

Şîrê cefayê lê dite

Ellah çi wê bê mirwet e (M.C)

Şîrê elmasî: Şûrê ji elmas; yê weke elmas hem hişk hem dibriqe.

Şîrê qizil: Şûrê sor.

Şîrîndehan: Devşîrîn.

Şîrînfem: Devşîrîn.

Şîrînpuser: Zarokên xweşik.

Şîrînqed: Bejînsîrîn

Şîrînsur: Şîrîncazîbe, xwînsîrîna bi heybet.

Şîrk: e. Ji bo Xwedê şîrîk peydakirin.

Şîs: Navê pêxemberekî ye.

Şîş: Bist, sîng.

Şîşê nebat: Şûşeya şekirê nebat, şûşeya qendê.

Şîta: *e.* Zivistan.

Şîtab: Lez, bazdan. Lez û bez, ecele. Rev, bez.

Xweş li min alem sîyah ma, stêr û kewkeb qet neman

Ez ji vê rojê ditirsam, axirî zû kir şîtab (M.C)

Şîwen: Şîn, zarîn, qîrîn, feryad. Şîn û girî.

Şîwenî: *k.s.* Şîn

Şodem: *f.* Ez bûm.

Şoma: *f.* Hûn, we.

Şokûh: Mezinahî, heybet, fors, kubar.

Şol: Kar, xebat

Şola mehel: *e.* Şixulê ne pêkan.

Şor: Peyv, xeber

Şor: *k.s.* Qelebalix, hêwirze.

Şor: *k.s.* 1.Arîşe, muşkîle. 2.Hawar û fixan.

Şoreçî: Yên çêkirina karê barûtê dikan.

Şorezar: *k.s.* Cihê tijû kevir ku ji bo çandinîyê ne guncan e.

Şowik: Şûştinek, careke şûştinê.

Şox: Narîn, xweşik. Yar, dilber.

Şox: *k.s.* Zorzan, fêlzan.

Şoxane: *k.s.* Bi qeşmerî.

Şox û şepal: Nazdar û bedew.

Şu'be-meqam-awaz: Berê muzîka Îranî sê beş bûn. 1. Awaze. 2.Şu'be. 3.Meqam. Awaze bi şeş, şu'be bîst û çar û meqam jî duwazdeh ahengan pêk dihat.

Şubhe: *e.* Teredud, neyeqînî, dudilî, dilxişûşî, guman.

Şubhet: Mîna, wekî.

Şubhetê Tawîsî: Mîna balindeya tawûsê.

Şubhê: Mîna, wek.

Şubhê 'uyûnan: Weke kanîyan.

Şubhê misrî: Weke şûrên misrî.

Şubih: Mîna

Şuxl: *e.* Xebat, kar.

Bê dil û şuxl û hewes, carek ku bê îz' an kirin

Zêde wê bê murwetê ev reng ku ez talan kirim (E.X)

Şuhûd: Dîtin.

Bi dilê sade nezer din,bi edeb rû bidinê Afitab e di şuhûdê,we çi hacet senedî? (M.E.Q)

Şuhûda beseran: Li ber çavan.

Şuhûr: *e.* Pirjimariya mehê ye.

Şukr: Spasî.

Şukrîyan: Tiştên ku dibin sedemê şukrê, qencî.

Şu'le: Ronahî, çirûsk,ronî, tîrêj.

Şu'leê 'îşqê: Tîrêja Evînê, ronahîya hezkirinê.

Şunas: Naskirin, zanîn.

Şu'let: Biriqîn, teyisîn

Sungruf: Şengref. Tozeke sor e ji bo nivîsandin û wênekêşîyê dihate bikaranîn.

Şunqar: Navê teyrekî ye. Balindeyekî pençetûj e.

Şahibaz er çendî perwazi bi bala bêt û ret Dê di nêv tûra te bit û seydi şunqarê te bî (M.C)

Şunqarê çerx: Balindeyê felekê, teyrê felekê.

Şurab: Pelpelok, pelik.

Şurb: Vexwarin.

Şurbek: *f.* Qurçek vexwarin.

Şurûh: *e.* Şerhan, şiroveyan.

Şust: Şûşt.

Şuûn: Rewş, hal û ehwal.

Şu'ûr: *e.* Hest.

Şu'ûrê insan: Hestên merivan.

Suwan: *k.s.* Şivan.

Şû: *k.s.* Mêr.

Şû deka: *k.s.* Mêr dike, dizewice.

Şûhûdî: Dîtî, têgehîştî, keşîfbûyî.

Şûhûd; Dîtîn, ditina derûnî, dîtina eqlî û qelbî.

Şû kirin: Mêr kirin.

Şûm: *k.s.* Ne baş. Bêxêr,

Şûmara: *f.* Ji wî ra.

Şûmî bext: *k.s.* Bextê ne baş.

Şûnwar: Hêwirgeh, wargeh, chê mayînê.

Şûr: Suyir, mebest rojên ne xweş û pir tengav in.

Şûrê henûn: Şûrê dilovan.

Şûreşerab: Şorav, Sûravk. Mebest zor û dijwarîya evînê ye.

Şûrîde: 1.Bêserûber, dernîşîvkirî, teqûleq. 2.Aşîqê dil bi tirs û dudil.

Şûr û şer: Fitne û fesadî.

Şûr û xewva kin: Şer û pevçûnê bikin.

Şûşbîn: Birazava.

Şûşeyê 'ac: Qedeha zelal, ya safî spî weke diranê filan.

Şûşeyê bilorîn: Qizêz, cam. Ji bo gustîlên erzan dibin qaş.

Şûtrî: Pelikên hîlalî yên serpoşên jinan. Şirik.

Ew turre, ya keysa ne ew, zencî ne, ya hîndû ne ew

Şutrî ne, ya şeb'bo ne ew, ya toxê Şahê Sencer e (E.X)

T

Tab: 1.Şen, birqok, çist. 2.Tav, tîrêj, çîrûsk. 3.Germbûna laş, laşsincirîn, ateş.

Tab: Kezî, porê honandî.

Tab: Şîyan, taqet.

Taban: *k.s.* Tîrêj, ronîdar.

Tabdar: Xwarkirî, vehandî.

Tabende: Geşdar, Tişt ronahî jê diçe.

Tabî: Pêre, digel.

Tabî': *e.* 1. Ew kesê li dû xelkê diçe. 2. Aîd, bi ser ... ve.

Tabîdar: *f.* Tîndar.

Tabî'în: *e.* Ew kesên ku pêxember nedîtiye, sehabeyên wî dîtine.

Tabût: Darbest, çardar.

Tacîk: Faris, kesên ne tirk û bi taybetî Îranî.

Mehkûmê Eliyye û Sea'lik

Mexlûb û mutî ê Tirk û Tacîk (E.X)

Tac û tomar: Kofî û serbenda serî.

Ta'et: Perestina Xwedê.

Tah: Hilakbûn.

Taha: Navekî pêxember *e.*

Taha û Yasîn: Du navên pêxember in.

Tahir: *e.* Pak, paqij, bijûn.

Tair: Teyr.

Tak: *k.s.* Darmêw.

Tala: Bext, talih.

Talde: Sîber, cihê lê dixê, cihe tav lê nade.

Tale: Dirêj bû, bilind bû.

Tale da: Siûd derket, bextewarî derket.

Însan ber *e.*, alem di rext

Sultan ji xelwet hate text

Pê zeyyinîn îqbal û bext

Dewlet ji bala tale da (M.C)

Ta le mal î der nekridûy: Heta ku wî tu ji male dernexistiye.

Tali': Bext, nesîb, siûd.

Talibê cemalê: Ciwanîxwaz.

Talibê heq: Xwedaxwaz. Yê di evînê da mebesta wî Xweda ye.

Talibê husnê: Kesê ku li pey xweşikîyê ye, kesê ku bi çavê dil xweşikîyê dibîne.

Tali'ê ferxende: Bextê xweş, kamranî.

Tali'ê kewkeb numaye: Stêrka bext û siûdê derketiye.

Talis: Tales, Feylesofekî yewnan *e.*

Talî: Li dû, di dereca dawî da, ne li pêşî. Avêtin derketin.

Talib: Xwestyar. Yê ku li pey arancekê diçe û dixwaze bidest bixe. Yanî evîndar.

Tali' bibitin: Xuya bibe, hilê.

Talîb: *e.* Daxwazker.

Talî' bit: Derbikeve

Talî'it: *e.* Bext.

Tamat: Peyvên bê cih. Gotinên bêwate.

Gunah û zuhd û tamat, hilnagirt xerabat Kesê bi vî derî ret, divê bikit riayet (M.C)

Tapa-tap: Serpişk baştir.

Ta perîşan neşewed kar bi saman ne resed: *f.* Heta ku tiştek ji holê ranebe, ew kar nagihêje armanca xwe. Heta ku cismê xwe nefewtînî, tu nikarî ruhê xwe azad bikî.

Taq: 1. Asîman. Banê weke qubeyê gilover. Felek, ban. Bilindahî, erş.

2.Dîwarê Koşka Kîsra ye. Nêzîkî
Bexdayê ye. 3.Yekane, bitenê.

Di vê taqê, di vê xanê, mey 'eyş û
êminî kanê?

Kesê dest dit ji dewranê, nîhalek ve
gulîstanê (M.C)

Taqe rojê: Yek roj.

Taqeta xaran nehin: Li ber strîyan
îdare nake, taqet nemaye.

Taqetî çû xoy: k.s. Taqeta wî nema.

Taqî Kîsra: Diwarê Koşka Kîsra.

Tar: 1.Tarî. 2.Ta, bend. 3.Têl, tele.

Tarac: Talan, xirabe, wêran.

Nebû qismet wîsala yar a sertac

Di hicrê 'umri bû talan û tarac (Ş.M.E)

Tare: Carek.

Tarek: Davek.

Tarê gêsû: Tayê bisk û kezîyan.

Tarîk: Tarî.

Gunehan ger nebûwa lezzet û zewqek
haşa!

Faîlê ism ne dibû, tarik û taîb me'cûr
(E.X)

Tar-i mû: Take mû, ziravik.

Tarumê çeharum: Feleka çarem, li
gor stêrknasên berê roj di vê felekê da
ye.

Tarûmar: Wêran, xirabûyî. Pirt pirt,
perîşan.

Tar û qanûn: Du amûrên muzîkê ne.

Tasîn: Sûreteke Qur'anê ye.

Ta-Sîn: Sûreteke Qur'anê ye.

Taş: t. Kevir.

Ta şirke: Tayê davê.

Ta Ta bike: Ji hev veqetîne.

Tatar: Teterî, neteweyeke turanî ye.

Tavî: Barana di demeke kurt da û bi
dijwarî dibare.

Îlahî şubhetê tavî di baran

Bibarîne liwan le'net bi baran (Ş.M.E)

Tawusxeram: Ya ku meşa wê wekî
tawis bi naz.

Horiya baxê bihiştê tûtiya tawusxeram
Xeyrî Batê padîşaha min delala kêyî
tu? (M.B)

Tayê terbûş: Tayên kofî û kuman.

Tayife: Êl, eşîr, beş.

Tazeberg: Dara ku pelên wê nû kesik
bûne.

Taze geywî to: k.s. Tu taze xort dibî.

Tazexîzê: Nûgihaştî.

Tazî: k.s. Erebi. Hespên erebî yên herî
çê ne.

Tazî: Tajîtol.

Taz û tek: k.s. Bazdan.

Te'alallah: e. Maşaallah, çi xerîb e.
Pîroz, çi xweşik e! Mezinî ji bo
Xweda.

Te'am: Xwarin, zad, çêj.

Te'aruf: Hevnasîn.

Teb: e. Heraret, germî. Ta, êşa tayê.

Teb: k.s. Rûyê ku dewsa şîmaqê sor
bûyî.

Teb': Xûy û siruşt.

Teba: Pê ra; ew jî, digel wê.

Teba bû: Li gel bû.

Teba bûn: Bûn peyrew, tev lê bûn.

Tebadûr 'ecel sur'e: Lez.

Tebah: *f.* 1. Pûç, petîyayî, rizî 2. Xerabûyî.

Tebah: Genî, nedurust.

Tebançe: Darê ku pê li daholê dixin.

Tebarek: Pîroz be. Subhan ji te ra.

Tebarekellah: Subhan ji Xwedê ra.

Tebat: Sebir.

Tebayê zulf: Bi zulfan ra.

Tebayi': Piranîya tebî'et e. Xûy û akarên her çar elementên bihurî. Yanî sar, germ, ter û ziwa.

Tebayî: Tevayî.

Tebbax: Pêjer, yê ku dipêje.

Tebbaxê herareta xerîzê

Sebbax û mimeyyizê temîzê (E.X)

Tebbet yeda ebî lehebî: *e.* Bila destê Ebî Leheb hişk bibe. (Sûreta Mesed, Ayet-1)

Tebdîl: Guherandin. Guhertin.

Tebdîl bibin: Werin guhertin.

Tebeddul: Guhertin.

Tebeq: 1.Qat. 2.Tebsî

Tebeqat: Piranîya wê tebeqe ye, yanê qat e.

Teber: Zerg, kuling. Tevir.

Xencer û tîr û teber barîn şibih berq û brûsk

Misrîyan lami" ji elmasan didayê rast û çep (M.C)

Tebere: Teber, bivir.

Teberra, 'eberrî: Dest jê kişandin, dev jê berdan

Teb-'et: Germî, sarî, ziwayî û terî.

Tebettul: Birîn.

Tebessüm: Kenîn, bişirîn.

Teb'ê eftal: Siruşt zarok

Teb'ê nazik: Xwûy û siruştê nazik.

Tebêt: Tebat, sebir.

Tebê'wî: Xûy, siruşt, sinc, exlaq.

Tebilxane: Defa mezin, dahol.

Bi tebilxaneyê şahî were text

Ku tu îro şehê Kurdistan î

Te'biye: *e.* Dagirtin, tîjîkirin.

Teb'iiyyet: Peyrewîn.

Tebîb: *e.* Bijîşk, doctor, nûjdar, hekîm.

Tebîbe: Nojdara jin, bijîjka jin.

Teb'îdêwan: Xûydêw, kesê weke dêwan xirab.

Te'bîr: Gotin, beyankirin. Tefsîr, ravekirin.

Tebît: Tebat, semax, sebir.

Tebl: Dahol.

Teblexan: Koma daholvanên li pêşîya mîran li daholan didin.

Tebşîr: *e.* Mizginî.

Tebx: Pehtin.

Teb xalle: *k.s.* Pizikên li ser lêvan.

Tecdîd: Nûkirin.

Tecdîd dîkin: Nû dîkin.

Tecdîd-i dikin ji bo me salê,
Gava wekû têne î'ûdalê (E.X)

Tecelcul: Hejîn.

Tecella: *e.* Dîyar, eşkere. Xuyabûn,
Dîyarbûn, beyanî.

Tecella bû wucûd: Hebûn pêk hat,
alem çêbû.

Tecella Samed: Xwedê rindbûna xwe
dîyar kiriye, xuya kiriye.

Tecella tu bikî: Tu xuya bikî.

Tecella ye: *e.* Mebest dîtina cemala
Xweda ye.

Tecellî: Xuyakirin, xuyabûna
mezinahîya Xwedê. Peydabûn,
eşkerebûn.

Tecellî bikirit: Xuya bike, dîyar bibe.

Tecellîgah: Xuyageh, dîyargeh.

Tecellî nadit: Dernakeve, xuya nabe.

Tecellîya celale: Dîyarbûna Xwedê û
mezintîya wî.

Tecellîya ruh: Xwenîşandana can. Li
gor tesewifê rabûna perdeyan li ber
çavên sofîyan û dîtina tiştên veşartî.

Tecellîyat: Xuyabûnên ku xwedê şanî
kesê di rêya tesewifê da dike.

Tecemmul: Xweşikkirin, xeml.

Tecennun: *e.* Xwedînkirin.

Tecessus: Pelandin û pêketin û
çavnêrîn.

Tecezzu: Parçebûn, dabeşbûn.

Techîz kirin: Amede kirin ji bo
definandinê.

Hetta weku Zîn bi resm û ayîn

Techîz-i kirin wekî dizanîn (E.X)

Te'cîl: Lez û bez.

Melek hatin bi te'cîle du şeq kir sîne
Cibrîlî 'Elem neşreh' te tenzil dikit
tewzih û tibyanî (M.B)

Te'cîl bikim: Zû bikim.

Tecrîd: Dûrxistin û rûtkirina her tiştî.

Te'dad: Hejmartin, hejmare.

Te'dad û te'eddud: Hejmar û pîrbûn.

Tedaruk: Kar û barên bûkê.

Tedaruk asan: Pêkhatina tişteki bê
zehmetî.

Tedbîrkunende: Ya/ê tedbîran peyda
dike, tebdîrger.

Tedbîra sewab: Bergirîya rast, debîra
di cih da.

Te'ddud: Pîrjimariya te'dad e yanî
hejmaran.

Tedebbur: Piştan, dûrketin.

Tedebur: *e.* Tefekul.

Tedeffuq: Verêtin.

Tedûrû: Digere.

Tedwîn: Sazkirin. Civandina
helbestan di dîwanekê da. Çêkirin,
nivîsîn.

Nebît qet' û nebîtin hesr û tedwîn

Ne ser jê re hebit ne bin ne payîn
(Ş.M.E)

Tedwîr: Ger.

Te'eb: *e.* Betilîn.

Teeddub: *e.* Bi neheqî û bi tundî girtina alîyekî.

Serwîçîmenxeramê xwesqametek nîşan da Min go "Bike teeddub! fca çavê mest û alî?" (Ş.M.E)

Te'elluq: Girêdan. Hewesdarî.

Te'emmul: Kûrnêrîn.

Te'ennî: Bêhnfirehî, sebr û aramî.

Teemmul: Fikirîn, baldayîn.

Te'essub: Girêdana korane bi tişteki ve, wek eşîretperestîyê.

Te'eşşuq: *e.* Evîndarî.

Te'eyyûn: Eşkerabûn, li ber çaveyî.

Dîyarbûn. Kifş bû, çêbû, dîyar bû.

Behra wucûdê coşî hat

Nûrek tenezzul bû ji zat

Hatin te'eyyûn têk sîfat

Eşya zuhûr 'ilmîye da (M.C)

Te'eyyûnat: Derketina ber çavan.

Tefadul: *e.* Serabûn, mezintirîn.

Bi hindî resûlan îmanê tu bîn,

Tefadul ji bo wan li nik xwe nebin (M.X.S)

Tefasîl: Hûrgilî, detay, teferuat.

Tefawut: Cudahî.

Her di medhê te û senayê, sîne û qelbê Melê

Bê tefawut qulzema pur lu'luê mensûrî bî (M.C)

Tefaxul: Xeflet, hayjênebûn, ji nişka ve.

Tefehhus: Venêrîn.

Tefekkur: Ponijîn û têmayîn.

Teferru': Şaxdayîna darê.

Teferruc: Temaşekirin.

Tefewwuq: Di ser da bûn.

Tefreqe: *e.* Belavkirin, jihevexistin.

Tefrey: Bozbilindî, quretî, xurûr.

Tefrîq: Ji hev qetandin. Cudakirin.

Kellamê tal û şêrîn ez cuda kim

Çi xweş tefrîqê kim şêrîn eda kim (Ş.M.E)

Tefrît: *e.* Kêmasî, qusûr.

Tefsîr: Ravekirin, îzahkirin

Tefşo: Gudûm.

Teftiş bike: Vekole, venêre, lê bigere.

Tefwîz: *e.* Spartin.

Teslîm-i bikim emanetê Heq

Tefwîzê te bun bi xeml ii rewneq (E.X)

Tehdîd: *e.* Gef.

Tehemten: Leqeba Rustemê Zal *e.*

Aza û wêrek. Leheng dilawer.

Tehemmul: Xwegirtina li ber tişteki zor sebir.

Teherruka tebi'î: Bizava wezayî.

Tehessur: Kerb û êş.

Serî pur fen diket ber ez tehessur

Gelek xewte dida behra tedebbur (Ş.M.E)

Tehewwul: Guhertî.

Tehewwur: Karên dilêrane û netirsî bêyî ku di encaman da were fikirandin.

Teheyur: *e.* Ecêbmayî, matmayî.

Tehisi: Zeliqî

Tehisîn: Likumîn

Tehî: *k.s.* Xalî, vala.

Tehîyyatî: Silavên min.

Tehl im: Bi min tehl e, ne xweş e.

Tehlîkêş: Zehmetkêş, çîlekêş.

Tehlîl: Şêkirin, şîkirin, ji hev qetandin.

Tehniye: *e.* Pîrozbayî.

Tehqîq: Teqez. Bêguman.

Tehqîq bikin: Bawer bikin.

Tehrîk: Livandin.

Tehrîr: *e.* 1. Nivîsîn. 2. Rastkirin, azadkirin.

Tehrîr-i kirin te bê teemmîl

Kî dê biketin ji te tehemmil ? (E.X)

Te'hrîr: Berhevkirin, azadkirin, serbestbûn.

Tehsîl dikir: Bi dest dixist.

Tehsîn: *e.* Tiştê rind û birewş. Xweşikkirin, tebrîkkirin, pîrozkirin.

Kes nîne biket ji bo te tehsîn

Goyendeyê aferîn û nefrîn! (E.X)

Te'htelerd: *e.* Binerd.

Tehtessera: *e.* Binax.

Tehte'ssera: *e.* Binerd, binê erdê.

Te'htê turab: *e.* Di binê axê da.

Tehûr: Paqij, pak. Pir paqij, ya ku paqij dike.

Tehwîl: Anîna ji rewş û haleke bal bi rewş û haleke din ve. Guherîn.

Tehwîl dikir: Diguherî.

Tehwwur: Bêtirsî û biserdeçûna bê fikirandin.

Tekâmul: Bêqusûr, bêkêmasî.

Esma tekamul rast kirin

Bala fewa'il rast kirin (M.C)

Tekbîr: Mezinandin, Gotina "Ellahuekber."

Tekelluf: Zehmetî, zehmetkêşî.

Tekellum: *e.* Axaftin, xebardan.

Tekfir: Kafirdêran.

Te'kîd: Dupatkirin û qewîtîya xurt.

Tekmîl dikir: Temam dikir.

Tekrîm: Rûmetdan, qedirdan. Qedirgirtin.

Teksirî kir: Zêde kir.

Tekwîn: *e.* Çêkirin, peydakirin. Hebûn.

Tekwînî: Çêkîrox, yê ku têkilîya wî bi çêkirinê ra heye.

Tekwnîyye: Qanûnên teb'î, qanûnên sirûştî.

Tekye: Cihê derwêşên ku girêdayî terîqeta Ebdulqadir Geylanî ne.

Tekye: Pal.

Tela: Zêr.

Zînet ji qedêd-i wan hebîban

Bexşîne zemîn telaû şîban (E.X)

Telaş: *f.* Hewldan, xîretkirin.

Bes bike, ey eşkî xwênîn im, be xemmazî telaş

Razî 'îşq û derdî dill xo herçî bû kirdûte faş(MW)

‘îşk û derdî dill xo herçî bû kirdûte faş

Telbîs: Xapandin, fesadî, fêlkin.

Tele: Xefk, kemîn.

Teleb dîkin: Dixwazin.

Telebkar: Xwazgîn, xwesyar.

Telef: Xerc kirî, serf kirî

Teles: Beredayî, kêrnehatî. Ew ê ji serxweşîyê diheje.

Heta sax im li dunya ba nefes bim

Di 'uqbayê jî wê dîse teles bim
(Ş.M.E)

Tel'et: e. 1.Rû, serçav, ruxsar. 2. Dîtin. Avêtin. Hilavêtin.

Tel'etqemer: Kesa rûyê wê wek hîvê ye.

Telettuf: Tevgerên xweş, camêrî, kubarî, nazikî.

Te'lîl: Behane dîtin, şirovekirin.

Tellab: e. Daxwaz, talep kirin. Pirsîyar.

Tellal: Xweş û şil û xunavî.

Yaqûtê mizab û la'lê seyyal

Wî durrê xweşab û xemrê tellal (E.X)

Telmût, Telmûd: Navê pirtûka pîroz a Cihuyan e.

Telqî: Zan.

Telqîn: e. Duaya ku li ser mirîyan tê xwendin.

Tel' û semer: Fêkî, mêwe.

Telx: Tehl.

Telxe/î: Tehlî.

Telxî kam: Tama tehl, bêhêvî.

Telxîs: Xulasekirin.

Telxkam: Qiriktahl, bêmîrad.

Telwîh: Telmih û îma, îşaretkirina bi şirove.

Telezzûz: Xweşî.

Tem: k.s. Mij.

Temadar: k.s. Bendewar, hêvîdar.

Te'me: Xwarin.

Teme': Çavbirçîbûn, timadarî.

Temed: Wek, qandî.

Tem'ekî: Xwestinekî, dayinekê.

Temekkun: Cihgirtina di mekan da. Niştecihbûn.

Nînin te teheyyuz û temekkun

Emma we di wan dikî tewettun (E.X)

Temenna: Hêvî, daxwaz. Xwestin, temenî. Hêvî û rica.

Temerrid: Erinîn, derketina li bin fermanê.

Temerrud: Serkeşî.

Temet'u: e. Menfiet, çêj.

Temettu': Xweşdîtin.

Temewwuc: Pêldan.

Temewwuc kir muhîte qelbê her wî

Bi der anîne jê durr û goher wî
(Ş.M.E)

Temîz: Pak.

Temkin: Şîyan, karîn, pêvehatin.

Temkîn: Bi cihkirin, bi hêzkirin, bi quwetkirin. Sebr û aramî. Hurmet.

Dibit layîqê husn û xulq û temkîn

Sezayê tac ê şahan û selatîn (Ş.M.E)

Temmet: *e.* Dawî, tamamî.

Temwuc: *e.* Şepêl, pêl.

Temrîn: Nermkirin, hînkirin, te'lîmkirin

Temsîl: Beyankirina bi mîsalan, mîsal anîn, mînak dayîn.

Temudî: Dirêj dibe, dilerize, diheje.

Temyiz: Cuda û veqetandî. Jihevnasîn.

Temyîz bikin: Ji hev derxin, ji hev veqetînin.

Ten: 1.Laş, gewde. 2.Çermê laş.

Te'n: *e.* Gotina nebaş, qerf, peyva ku kesê li hember pê piçûk tê xistin. Îtab, rexnelêgirtin, gazin.

Tenab: Werîsê stûr, kinef.

Tenah: Tenê.

Tenasux: *e.* Cilguhastin, donedon.

Bedengu hastina rih û can. Mînak:

Tenasux ji bo ruh hilûla Xweda.

Tu nînin, eya mu'minê canfida (M.X.S)

Tenbîh: Hişyarî, şîret.

Mîr gote ekabir û xewasan:

Tenbîh-i bikin nedîm û nasan (E.X)

Tenefê çadiran: Bendê çadiran.

Tenem: Çermê min.

Tenezzul: Nefspiçûktî, daketin.

Tenezzul bû: Daket, xuya bû, diyar bû.

Tenezzul kit: Daketina bi nefspiçûkî. Daketin, dakeve.

Tenezzul kir: Daket.

Teng: Bar. Teng, tengayî.

Tengna: Teng.

Tenha: *f.* Tenan, laşan.

Tenha: Bi tenê.

Tennaz: Ew kesê henekan bi delalî dike, yê yariyan bi xelkê dike.

Yareb! Me de destê xelqê nasaz

Vê şahidê dilrevayê tennaz (E.X)

Tentene: *k.s.* Dengê sazê.

Tenzîl: Qur'an, Qur'ana ji Hz. Mihemed ra hatiye daxistin. Kelama ji bal Xwedê ve daketî.

Tenzîl bikin: Daxînin Dawerivînin.

Tenzîm: Bi rêzê kirin, bi ahengkirin.

Tenwîrit: *e.* Ronahîya te.

Tenzîh: *e.* Dûrdîtina Xweda ji kêmasiyan.

Tepand: 1.Da ber tepan, lê xist. 2.Ji "tapmak" perestîş pê da kirin.

Teqada: Karûbarên gerdûnê, lazim û melzûm; rûdan.

Teqada weh fikir hikmet, ku çerx û lewleb û bab in

Huwel feaalu la texter bî esbabîn we alatî (M.C)

Teqarûb: Nêzîkhevî, hevnezikbûn. Nêz, nêzik. Nêzîkayi.

Teqbîh: *e.* Pîskirin.

Min hêvî heye ji ehlê halan

Teqbîh-i nekin evan tefalan (E.X)

Teqbîl kir: Ramûsand, maç kir.

Teqdîr: Nirxandin, pîvan û muqayese.

Teqdîrê ezel: Qedera ku Xwedê ji mêj nivîsiye.

Teqdîrê muqadder: Tişta ku Xwedê biryara wê daye, kifş kiriye. Qeder.

Teqdîs: Pîrozkirin, qîmetdayin. Pîrozî.

Teqebbul: *e.* Bexşîn.

Teqerrub: Ji hev nêzîkbûn.

Teqeyyud: Tomarkirin.

Teqiyye: Veşartina tiştên di dil da, ji bo xwe neyaran biparêze.

Teqlîd: Wekeyîti, wekîti.

Teqlîd: *e.* Lasayîkirin, teqlîd.

Teqn: Hezek, herîya nerm ya ku meriv pê da diçe xwarê.

Teqrîr: Qenc îfadekirin, rind beyankirin. Gotin, diyarkirin. Axaftina xwerû û zela.

Teqsîm: Parvekirin, dabeşkirin.

Teqsîr: Kêmasî.

Der heqq me bi şîrê xwe me ke teqsîrê
Ya bit di şuxla me (dê) bikî te'xîrê
(M.C)

Teqtîr: Dilopandin. Ji kiryarên kîmyewî ye ku av û madeyên wekî avê di şûşeyan da datînin û didin ser agir û ev made dibin dilop û kelex.

Teqwa: *e.* Tîrsa Xweda. Parêzgarî, xweparêzî, parêzgarê ya ji gunehan.

Teqwiyyet: Hêzdayîn, piştgirî.

Teqwîm: Duristkirin, xweşik çêkirin, zeman kifşkirin, salname. Şikilçêkirin, lihevanîn.

Teqwîmê insanî: Bi awayê herî bedew afirandina merivan.

Teqwîmî best: Çêbû.

Teqwîyye: *e.* Bihêzkirin.

Teqyîm: Nerxandin, behs lê dayîn.

Ter: Nazik û nûgihîştî.

Terane perdaz: Sazbend, stranvan.

Terawet: *e.* Tazeyî, terî.

Teraxî: Sistî.

Teraz: 1.Xeml, zînet. 2.Dara fistiqan.

Terazin: Mêrg û çîmen.

Terazî: Mêzîn, razîbûn.

Terbiyyet: Perwerde, fêrkirin.

Lazim ewe perwerek bi bînit
Terbiyyetê derxureş helînit (E.X)

Terdamen: Dawşil, nepak.

Terdamen û sernikûn û merdûd

Şermende bi çîne pêşê mabûd (E.X)

Terdane: Hebeke taze, nû.

Tereb: *e.* Coşbûn, kêfxweşîya şahîyê.

Tereb ken: *k.s.* Dilxweş bin, şadûman bin.

Terebnak: Xweşîbexş.

Terebbûs: Derengî.

Tereb xêz: *f.* Ew kesê ku xweşî û şadî lê peyda bibe.

Teref: Nermî.

Tereh: Xemgînî.

Zînê ku bibîstî ev tekellim

Ev mihr û wefa û ev terehhim (E.X)

Terehhum: e. Rehm lê kirin, dilovanî.

Terennum: Nehwirandin û awazbêjî.

Terf: Çav.

Terfet-ulêyn: Girtin û vekirina çavan.
Çavniqandin. Niqandina çavan,
çavgirtin.

Terfetul'eyn: Di demeke kin da
qurçkirina çav.

Terfê ikdîl: Hejandina kilîl û xêlîya li
ser rû.

Terh: Tîp, biçim. Şax.

Terhên şelal: Şaxên zirav û dirêj,
şaxên teze.

Terh û terz: Şewaz û awa.

Te'rîfu: Tu dizanî.

Terîk: k.s. Tenê bûn, dût.

Terîq: Rê,

Terîqe: e. Terîqet, rê.

Terîqet: Rê û mesleka tesewufê ya bi
taybetî.

Terîqey: e. Terîqet, rê.

Terîqê tewbe: Rêya tobeyê. Rêya
vegara gunehan û poşmanîyê.

Te'rîf: Danasîz, dazanîn.

Terîx: Dîrok, mêjû

Te'rîz: Di ber ra avêtin, îmalkirin.

Terk: Devjêberdan.

Terkeş: Tîrdank.

Terkîb: Bihevvekirin, jihevçêkirin. Di
gelhevkirin, li hev siwarkirin. Çêkirin,
nivîs.

Terkîb kirin: Bi hev xistin.

Term: Laşê mirî

Terrar: Dizîker.

Me'zûn bike turreyêd-i terrar

Da hukm-i bikin li şah û xundkar
(E.X)

Tersa: e. Ruhban, mesîhî. Îsewî,
Hristiyan. Fileh.

Tersî: Xemilandina şûran bi
gewheran.

Tesnî-i kirin wî hinde teşnî'

Bestin wî li şûrê şibhê tersî' (E.X)

Tertefil'en: Çavşikandin,
çavniqandin.

Tertefil'eynê: Bi qasî girtin û vekirina
çavan, çavniqandinî.

Tertîb: Rêz, rêzêkirin.

Tertîb kirin: Li hev anîn, Xweşik rêz
kirin.

Tertîbê Xellaq: Qanûna Xwedayê
afrîner.

Tertîf: Terbît.

Tertûbela: Belawela.

Terwende: Taze, nû, nûhatî, nazik.
Nûber, tazebişkiftî. Ter.

Nazik û neyşekerên tuhfe divên
Sosinên nazik û terwende divên (M.C)

Terz: e. Cure, cur, şewe. Wekî.

Tesbîh: Dûrêkirina Xwedê ji
kêmasîyan. Gotina "Subhanallah."

Tesbîh: e. Tizbî.

Tesdîq: Bawerî.

Tesella: Berdildan.

Teserra: Xweşaşkirin, çûyîna li pey zewq û hewesan.

Zînharî! meçe li dû teserra,

Da can neketin ji te teberra (E.X)

Teseruf: e. Dan û standin. Kar û xebitîn.

Tesewwur: Bi sûretbûyîna tiştêkî di zihn û hiş da.

Tesewwur di vê 'alemêde bike,

Bi dil-can tu xellaqê wê nas bike (M.X.S)

Tesewwira cemaîlê: Anîna dîmenên ciwanîyê li ber çavan.

Tesfiyye: Safîkirin û pak kirin.

Teshîh: Rastkirin.

Tes'îd: Yek ji çalakîyên kîmyageran e ku bi rêya wê kanzayekê dikelînin heta kelex jê radibe û kanza pak û safî dibe.

Tenzîl-i bikin ji wê xubarê

Tes'îd-i bikin ji wê buxarê (E.X)

Tes'îd bikin: Hilkişînin jor.

Tesîr: e. Bander.

Teskin: Rûniştin û bicîhbûn. Hêwirî.

Teskin dîkit: Aram dike.

Teslis: Sisê kirin, bawerîya bi sê ûqnûman (yek sisê ye, sisê yek e). Li gor bawerîya îsewîyan yekbûna Xweda, Îsa û Cebraîl.

Tesniye: Yekjimar.

Tesnî' kirin: Çêkirin.

Tesnîm: Kanîyeke avê ye li bihiştê.

Tesrîf: Guherîn.

Testîr: Nivîsandî, xêzîrî.

Mehkûmueleyhî'bûn di teqdîr

Hêj îsmê guneh ne bûyî testîr (E.X)

Teswîb: Erê kirin, rastdîtin.

Teswîl: Xweşkirina gunehan û xirabîyê li ber yekî. Her tiştên şeytan hînî merivan dike.

Teswîr: Anîna ber çavan.

Teswîr dibit: Bi reng û rû dibe.

Teswîr meke: Guman neke.

Teswûr: Sewirandin, bi sûret kirin.

Teswr dike: Şekl û sûret didê.

Teswîrî: Bi teswîr, temsîlî.

Tesxîr: Ram kirin, berdest kirin.

Teşbîh: Wekîkirin, şibandin. Weke, mîna.

Teşbîhê heban: Wek daneyên dextl.

Teşbîhê şecer: Mîna darê, mebest dara tûdîrkê ya Xwedê xwe li nîşanê Hz. Mûsa kir.

Teşebbus bem û bew: k.s. Daxwaza li xelkê ji bo encamdayîna karê xwe.

Teşerruf: Taqet û şîyan.

Teşewwuq: Bêrîkirin, hêvî û bendewarî.

Teşî: Ji gîyanewerên xwedan kêlb e, bi didan tiştî ker dike.

Teşne: f.1. Têhn, tî 2. Hewce. mehtac.

Teşneceger: Tî, kezebşewitî.

Teşneleb: Lêvên ku ji tîbûna ziwa bûne.

Teşnelebê le'lan: Tîyê lêvên sor.

Teşnî': Behsa tişteki xerabî û bi rengêki tund. Gotinên xirab.

Teşri': Rê danîn, rê vekirin, qanûn çêkirin

Teşrif: Xelatkirin û rûmetdan.

Teşrih: Bêhnfirehî.

Teşwîq: Davayînî, şewqdêran

Teşwîr: Xweşî, xeml.

Teşwîş: Sergerdanî û tevlihevî.

Teşxîs: Naskirina êşê, êşnasî.

Teşyî': Birêkirina cenaze.

Tetarî: Ji Teteristanê. Ew der ji xezalên xwe ve navdar e.

Teteq: Perde.

Tetewwur: Çûyîna ji tewr û halekî û rewşekî bal rewş û halekî din va.

Tetmîn: Dil rehetkirin, serwest kirin.

Tettebbu': Peyketin, şopajotin.

Tetwîl: e. Dirêjkirin, dirêjahî.

Tew': e. Arezû, daxwaz.

Tewabi': Pîranîya tabî' ye, peyrew û alîgir.

Tewadu: Xwe berjêr kirin.

Ji avek mehîni tekebbur meke,
Tewadu' ji xelkê Xwedêre bike
(M.X.S)

Tewaf: Zivîrîna li dora Ke'beyê, ziyaretkirin û pîrozdîtina tişteki.

Tewali': Stêrkên ku hiltên. Çar qatên sibehê.

Tewalî: Li pey hev.

Tewana: Bi hêz û tewan.

Lê sen'etê wî Hekîmê zana

Neqşê ewî Qadirê Tewana (E.X)

Tewaq: Çavê û hejêkirê gihîştinê.

Tewarî: Veşartin.

Dinya li wî têk di bûye tarî

Rojbû ku li wî fikir tewarî (E.X)

Tewatur: Li peyhev hatin.

Tewazu': Nefspîçûkî, serxwarî.

Tewbey nesuh: e. Tobeya herî baş.

Ew tobeya ku bi wê ebedî li gunehan nayê zivirandin.

Tewbîx : Lome kirin.

Tewcîh: Berê xwe dayîn

Tewd: Çîya, koh.

Tewdî': Xatirxwastin.

Teweccuh: Guhdan, rûdan.

Tewehhum: Tiştê di eslê xwe da tune ye, tiştê ji tires bi merivan ra çêdibe, weswese.

Wahid zatekî ferd e, tecella da sifatan

Bi 'eynê dil nezer de, li cumle te'yînat

Tewehhum bûye perde, bi îsmê but û latan (M.C)

Tewehhuş: e. Dirîndeyî, kuvîti.

Tewekul: e. Spartin.

Tewella: Guhdan.

Tewelluda benatan: Zayîna keçan.

Tew'em: Cêwî.

Tew'eman: Du cêwî.

Teweqquf: Rawestan.

Tewessul: Xweavêtina bext, xwestina alîkarîya.

Tewettun: *e.* Li cihekî bicîbûn, Cihekî welat kirin. Bicîhbûn, cîgirtin.

Tewf: Tewaf, ger ji dora Ke'beyê.

Tewfîq: Lihevhatin, pêkhatina xwestekan.

Wekî ku rihabûyî dilşadî be,

Li tewfîqê Barî şukurdarî be (M.X.S)

Tewhîd: Bawerîya yekîtiya Xwedê

Te'wîl: *e.* Şiroveya taybet. Tefsîr, watedayîn.

Tewîle: Cihê ku hesp û devar tê da dihêwirin. Axir.

Tewîlî xelef: Şiroveyên zananên paşîn.

Te'wîz: *e.* Nivîşt. Pêvexwandin.

Te'wîzê 'uyûnan: Bedêla çavan, di şûna çavan da.

Tewlîd: Rojbûn, wîladet. Çêbûn, zayîn.

Tewq: Gerdanî.

Me dî ku tewqê emrê kefte helq im
Çiqasa ger ji ber zêde diqelqim
(Ş.M.E)

Tewqe: Hêvî, xwestin, daxwaz.

Hêvî yû tewqe dikim ez ji xudana heşemê Wê nigar û senem û padîşeh û muhteşeme (M.C)

Tewr: Şêwaz, awa.

Mudam ba sewt û eswatê bimarî

Dirêje tewr û ehwalê veşarî (Ş.M.E)

Tewsen: *k.s.* Hespê pir ciwan û serkêş.

Tewsîye: Rastfêrî

Tewwizandin: Geş kirin, şên kirin.

Tewwîzî: Bi rengê kî kêşayî û qiyaskirî.

Tewwîzîn: Xemilîn, rengîn bûn.

Tewzî' kir: Belav kir. Dabeşkirin.

Texaful: Çavjêbirîn.

Ew kebkê xeraman ku di kozê li qeba hat Şahîne qedayê bi texaful ji xwera girt (M.C)

Texaluf: Dijayetî.

Texdîr: Tevizandin.

Texellub: Serdestbûn.

Texennî: Dengbêjî, strandin.

Texerrub: Ji hev dûrçûn.

Texeyyur: Guherîn.

Te'xîr: Derengxistin.

Texmîm: Tirs.

Texmîr dîkin: Dimeyînin. Havên dîkin.

Texsîr: Kêmasî.

Texte: Li bin.

Textegêh: Paytext.

Texteyê murad: Texteyê bextnasînê.

Textî cem: *k.s.* Textê Cemşîdê paşayê Îranê.

Tey: *e.* 1.Tew, pêçan, lef 2.Rakirin, jinavderxistin. Tewandin

Teya: Tewandin. Xewr. Jixweçûyîn.

Tey bikim: Bipêçim, hilînim.

Tey bikin: Biçin, derbas bikin.

Tey bikit: Derbas bike, li pişt xwe bihêle.

Tey bikitin: Qonaxan derbas bikin.

Tey dî: Li piştî xwe bihêlî, derbas bibî.

Teyf: Xeyal; tiştên li ber çavên meriv xuya dibin çi di xewnê da û çi jî di şiyarîyê da.

Teyhû: Balindeyeke ji kewê mezintir e, mirîşka bejî.

Şahînşehê gerden fîraz, aza kirin
Teyhûn û qaz

Terxan kirin Teyxûn û Baz, ka
Padîşahê Serhedan? (E.X)

Te'yîd kirin: Pişt da. Aligirî kir.

Te'yîn kir: Bi nav kir, hîlbijart.

Teymûs: Bavê Zuleyxayê ye.

Teyran: e. Firîn.

Teyrê dil: Heywana serjêkirî.

Ewan jî heb di damê da veşarî

Ji bo teyrê dilê xwîn xwarê yarî

Tey kir: Qat kir, li hev tewand. Pêça.

Teyrik: 1.Teyreke ku li zêr digere.

2.Navê xişrekî jinan e.

Texsîr dibit: Dikeve dest, xweşkêş dibe.

Teyxûn⁴⁵: Navê teyrekî ye.

Balindeyekî nêçîrê, baz.

Te'yîn bibûwa: Bihata nasîn û danîn.

Teyy: Li hev pêçan, kum kirin, lûr kirin.

Teyyar: Tiştê ku pir difire, lezefir.

Teyyîbat: Tiştên xweş

Teyyê menzil: Bihurîna qonaxên tesewifê.

Teyyibat: Her tiştên xweş.

Te'z: Te ez.

Tezad: Dijhevî.

Tezahum: e. Girse, îzdiha.

Tezahur: Eşkerabûn, xuyabûn.

Tezellum: Gilî û gazin.

Tezelzul: Hejîyan, zelzele

Tezerû: Balindeyekî rengîn, qerqewil, semanek.

Tezerw: Balindeyeke nêçîrê ye; qerqewil, sulun.

Te'zîm: e. Rêzgirî, qedirgirtin. Mezinkirin, nirxdayîn.

Bi te'zîm û heybet, huzûr û heya,

Tedebbur bike d'xwendin û hem dû'a (M.X.S)

Tezkiyye: Pak kirin, paqijkirin, temîz kirin. Pakbûn.

Tezkîyyeyê nefsê bû mikemmel

Tesfîyyeyê qeîbê bû mihessel (E.X)

Tezkiyeî nefs: Temîzkirina derûnî, temîzkirin û pakkirina ji qisûra û kêmasîyan.

Tezerû: Balindeyekî rengîn, qerqewil, semanek.

Tezwîc: e. Zewac.

⁴⁵ Li gor Zivingî ev peyv ji "doxan" a tirkî tehrîf bûye.

Tezwîc biwîn: Hatin zewicandin, tekel hev bûn

Tezwîc bûn: Bûne yek.

Tezwîr: e. Sexte. Sextekarî.

Tezyin: Xeml. Xemilandin.

Tezyîd: e. Zêdekirin, ziyadkirin.

Tê: Çiqil, ta.

Têdega: k.s. Tê digihêje, fam dike.

Têgeyîw: k.s. Têgihiştî.

Têhn: Tî.

Têk: Tev, hemû, digel hev.

Têkoşîn: Mucadele.

Têkra: Tevda.

Tê'ne mi'rac: Hildikişin jor.

Tête cûşê: Li ser hev ra diqulibe, difûre.

Tête heşrê: Roja qiyametê tèn civandin, tèn komkirin.

Têtin: Ev gotin di nusxeyek din da "tayin" e.

Têx: k.s. Çakû.

Têz: Têza tivingê, ew tiştê tijî yê ji çekan derdikeve û bo armancê diçe.

Tiştê xweş diçe, gulle.

Têzerewan: Zû bilezûbez, bi tevgerên li ser hev.

Têz kirin: Barût tê da hiştin.

Têzmeşreb: Dijwar, tûj.

Tib: Bêhna xweş.

Tibaqê asmanî: Felek. Qatên asîman. Manendê tibiaqê esîmanê

Yaqût û zimmerredê di kanê (E.X)

Tibihî: Dibihîsî, tu guh lê dibî.

Tibijîtin: Dibirêjit.

Tibin: Ka.

Tibî: 1.Dibî. 2.Tu bêyî.

Tibxane: Dermanxane, eczane.

Ti des: Di dest da.

Ti dînê: Di roja qiyametê da "yewmiddîn"

Tifal: Zarok.

Tifil-Tifl: Zarok

Tiflîmezheb: Weke zarokan aqilsivik.

Tiflî sawa: Zarokê pir piçûk.

Tihî: Tuhî, vala.

Tikaker: Ricaker.

Tikrar: Dubare.

Tila: Xunav

Tilawet: Xwendin.

Tilîsim, tilsim: Sîr û raz, quweta manewî, efsûn.

Şehkitêbek min divêt behsî muhebbet bi't-temam

Sed tilsim û sihr tê da pêk ve Suryanî meqam (M.B)

Tilîsim: Tiştê veşartî ku herkes nikare fam bike.

Tilîçav: Tipûtarî.

Tipûtarî: Reştarî.

Tire: k.s. Tirî.

Tire: k.s. Tarî.

Tirinc: Mêweke wekî porteqalê ye. Sindî, zîbal.

Tirincok: k.s. Mûyê ku nû dertê.

Tiro: *k.s.* Bêavrû, bêheya.

Tirs, wereq: Rûpel, pel.

Tiryak: Derman. Efyon, hişbir.

Hey 'eta keyf û kemê bê, keyf e keyfa
arif e Dê bimînit ger nebit naçari bê
tiryaki rûh (M.C)

Tis'e: Neh.

Tişne: Tehnî.

Tiya: *k.s.* Tê da, di nav da.

Tîb: *e.* Behna xweş.

Tîbq: *e.* Metn, deq.

Tîhû: Teyrê qeta. Balindeya çîl.

Tîj: *k.s.* Tûj.

Tîlke enba-un: Ew deng û behs in.

Tîmar: Sexbêkirina nexweşîyan.

Tîmsal: *e.* Mînak, wekî, numûne.

Tîn: Herî

Tînane derê: Dertanîn, derdixistin.

Xemxwarî dikir li me yetîman

Tînane derê ji dest lêman (E.X)

Tîne: *e.* Herî.

Tînet: *k.s.* Çêkirina keresteyan.

Tînû: *k.s.* Ew kesê ku tî ye.

Tîp: Taxim, grub.

Tîra: Seqîf.

Tîregîy: *k.s.* Tarîtî.

Tîsa: Teyîsandin, ronî da biriqî.

Tîsit: Diîsit, ronî dide.

Tîsî: Biriqî.

Tîşe: Birek.

Tivê: Divê, lazim e.

Twêkilî badam: *k.s.* Qalikê bihîvê.

Tîx : *f.* Şûr.

Tîxî abider: Şûrê bixwîn.

Tîx û kemer: Ser û nava çîyê.

Tîyatro: Şano.

Tîyn: Hêjîr.

Tîz: *t.* Bilez û bez, “ têt/tez”, zû.

Tîz: Tîj, tûj.

To: *k.s.* Tu.

To bîyû pîrit: *k.s.* Ji bo xatirê pîrê te.

Tofan: Lehî, karesat.

Çi tofan û bela ne her demadem

Dibarin ew livê dunya wekî sem?

(Ş.M.E)

Tomar: Defter, sicil.

Topal: *k.s.* Perçeyên hesin ên hûrik.

Dema ku hesin tê kutan, ji hesin
diweşin.

Toq: Toqa hesin ya ku dixin stûyê
gunehkaran û girtîyan û dînan.

Tor: *k.s.* ‘Acizbûn.

Tor: Tora nêçîrê.

Teyxûnê di destê te zehî dewlet û îqbal
Herçî te birî damê di tora xwe huma
girt (M.C)

Tora ‘enberê çînan: Gulîyên
bêhnxeş û honandî yên wekî davan.

Totak: Pepûk, navê balindeyekî ye.
Fatmok, qumrî.

Tow: *k.s.* Tov.

Tox: Tac. nîşan, arme, ala.

Tox û ‘ala: Nîşan û ala

Tozek: Miqdarek, hindik.

Tozreş: Rengê reş.

Tuba: *e.* 1.Dareke bihuştê ye.
2.Xwezî, mizgînî.

Emîre texte uqbaye siha wî darê
tubayê Xuzî carek li dinyayê bidîta
min tuwî anê (M.B)

Tuba lehû: *e.* Xwezî bi wê.

Tubbe’: *e.* Leqebeke şahên Yemenê
yên kevn.

Tu d’şî: Dikarî.

Tufeyl: Kesê ku bê vexwendin diçe
civatan.

Tuhfe: Xelat, tiştê hêja.

Nazik û neyşekerên tuhfe divên
Sosinên nazik û terwende divên (M.C)

Tuhmet: *e.* Tawanbarî, tomet.

Tuhûra batin: Paqijîya hindurîn,
pakhûna dil.

Tulb: Tulp, koma xelqê.

Tul’u: *e.* Rojhilat.

Tunab: Kon, çadir. Werîsê ku kon bi
singan ve girêdide.

Tundî: Tûjî, tûjbûn.

Tu pê nayê: Tişteke pê nayê.

Turab: *e.* Ax, xak, xwelî.

Turas û waris: Mîras in.

Turbe: Axa gorê, gor.

**Turb û tûrab û semad rems û rexam
û seed, 'Efr û bera û sera :** Ax, xak.,

Tureê gul: *f.* Gula ter.

Turenc: Porteqalî, Rengekî mêweyekî
ye.

Turê Mûsa: Tûrê Sîna, Çiyayê ku
Xweda xwe wek agirekî li ser dara
tûdîrkê nîşanê pêxember Mûsa dike.

Turfemêwe: Mêweya ku zû çêdibe.
Mêwaya bêhempa.

Turkê siyehbext: Tirkên bextreş.

Turkî çawî: Çavên tirkan. Di
edebîyata klasîk da ji bo çavên xweşik
tê bikaranîn.

Turkê: *k.s.* Ey tirk.

Turra: *e.* Nîşan, nivîsa li ser mohrê,
tûxre.

Turre: 1.Nexş û nivîsara li ser morê.
2.Perçem.

Kagul kiribûne turre her sû
Perçem kiribûne zîlf û gêsû (E.X)

Turre ce’d: Perçema girê girê û xelek.

Turret: *k.s.* Mûyê te, mûyê nêzî çav
ên her du alîyan.

Ey cemalit nûrî dîdey enbîya

Şam î turret subhî ‘îdî ewlîya (MW)

Turreya tabidar: Tembûrîka
gustîlokî. Kagula weke mohra padişah.
Mohr.

Turreyê dildar: Perçema dildar.

Turreyê terrar: Pêşenîka diz û
talanker.

Tuşarek: Beşdarbûn. Ortaxî

Tuxayn: Serkêşî.

Tuxin: *k.s.* Nêzîkî wî bûn.

Tuxra: Mohr. Mohra padişahan, gulîyên weke mohra padişahan.

Xeteke hunerî ye. Nîşan, îmze.

Tuxraya nihînî: Mohra veşartî

Tuxre: Mohr, muhr, dexme.

Tuxrayê humayun: Mohra mîr, mohra padişah, gulîyên yarê.

Tuxyan: e. Gunehkar.

Tirsa min ewe: Bi kîbr û kînê

Tuxyan bi katin ji paşê Zînê (E.X)

Tuyûr: Pirjimarîya teyr e yanî balinde, çûk e.

Tuzillû men teşa: Mebest ayeteke Qur'anê sûreta El E'raf e. "Her kesê ku tu bixwazî, wî ji rê dixî."

Tûb: Dara tûbayê ya li bihuştê.

Tûba: Navê dareke di bihuştê da ye.

Tûffah: Sêv.

Tûk:k.s. Mûyê heram, mûyê neresen. Mû.

Tûkê mujganê: Serê Mijangê.

Tûl: Dirêj. Dirêjahî.

Tûle: Kûçik, cewrik

Tûl î emel: e. Hêvîyên dûvdirêj ên dinyewî.

Tûlî emel beste: Ji bo te hêvîyên dinyewî û dirêj bes e.

Tûlî kêşa: k.s. Dirêj kişand, domand.

Tûr: Çiya, koh, di edebîyata klasîk da her tim ji çiyayê Sînayê ra tê gotin. Çiyayê Tûrî Sîna.

Tûr: k.s. Tivir.

Tûrekî: Çiyayê Tûrî Sîna.

Tûşe: Zadê rêwîyan. Zewade.

Tûşî nehat: k.s. Nekeve nava nexweşîyan.

Tûşne leb: k.s. Tênbûna lêvê.

Tûtak: Bûm, qumrî.

Bi şeb ta subhê tûtaka cîgerşeq

Serajêr daliqa wê d'gote, ya heq (Ş.M.E)

Tûtî: Papaxan

Tûtî sifet: Wek tûtîyan.

Tûtîya: Dermanekî çavan.

Tûzreş: Reşê birqok.

Da sîne cohtê tîrxweş e

Qewsê hîlalî tûzreş e

Yek tîri pur kuştin leş e

Xwûnê di cerhan daye kef (M.C)

U

'Ubab: 1.Destpêka tişteki, tiştê herî pêşî. 2.Lehîya bi pêl û şîp, ava mezin.

Nezera 'eynê 'inayet bi me da şahê wîlayet Ji 'inayet nezerê dîl me tijî 'ilm û 'ubab e (M.c)

'Ucb: e. Xwe mezindîtin.

'Ucw: Xurme,

'Ud: Dar, dema dişewite bêhneke xweş jê difûre.

Di nêva mecmerê wan qelbê pir nar

Bixûr û 'udê 'eksa gîsûyê yar (Ş.M.E)

'Ulema: e. Pirjimariya alim.

'Ulûw: e. Berzî, bilindî, mezinî.

'Ulwî: e. Bilind.

‘Umer: Omer-Emer xelîfeyê duyem
hevrêyê pêxember e.

‘Umman: Deryaya Ummanê. Deryaya
mezin, derya.

‘Umq: Kûranî.

‘Umre: Çûna Mekeyê ne di dema hecê
da.

‘Umr û zindeganî: Temen, sal.

‘Unsur: Ax, av, ba û agir.

‘Unuq: Stû.

‘Unwanê zekat: Bi navê zikatê.

‘Uqab: Eylo, qertel.

Netrik û berg û şitriyan

Reqse ji rengê xemrîyan

Baz û 'uqab û qumrîyan

Seyre seher tebayê zulf (M.C)

‘Uqba: e. Axiret.

‘Uqûbet: e. Ceza, siza, mehkûmiyet.

‘Uqûd: Gerdanbend, gerdenî. Girêk,
astengî.

Selwa rewan zerrîn wereq, çiçek Melê
dîn sed neseq

Yaqûtûha yehkîş-şefeq yehkî 'uqûden
kewkeba. (M.C)

‘Urf: Dad û adet, rê û şûn.

‘Urfan: Îrfan, zanîna
Xwedayî, têgihiştina manewî.

‘Urs: Dawet.

‘Urûc: e. Bilindbûn. Hilkişîn,
jorveçûn.

'Ilmek numa dîl pê nimûc

Qelbê di 'îşqê kit 'urûc (M.C)

‘Usat: Asî, serhildêr, yê ku serî li ber
Xwedê radike.

‘Usman: Osman xelîfeyê sêyem û
hevrêyê pêxember e.

‘Ushr: Zorî, zehmet.

‘Ussat: Gunehkar, yê ji rê derketî.

‘Uşaq: Pirjimariya aşiqan.

‘Uşb: Giya.

‘Uşr: Yazdeh, dehyek. Deh ayetên
Qur'anê.

‘Uşret: e. Kêfkirin.

‘Uşşaq: 1.Kesên pir aşiq, dîwaneyên
evînê. 2.Meqameke muzîkê ye.

Weh d'vê ku 'uşşaq in hebin

Dildar û muştâq in hebin

Wê şemsê afaq in hebin

Da kifş bibit d'sipîde da (M.C)

‘Uşşaq-newa iraqî- ewc-rast: Navên
hin meqamên muzîkê ne.

‘Uyun: e. Pirjimariya kanîyê ye.

‘Uyûnî: Çavên min

‘Uzumat: e. Mezin.

‘Uzlet: Xwevegirtin, dûrketina ji
xelkê.

‘Uzza û Lat: Navê du pûtên di
Ke'beyê da ne.

Ubab: Destpêka tiştan. Ava ji binê
erde. Lehî, Pêlên deryayê.

Ucac: Bablîsok, ecac.

Uftad: Bêçare, evîndar, bêgav.

Ulam: Suxre, angarya.

Ulf: 1.Hogirî. 2.Meylkin, lihevkin.
Meyl, hezkirin, evîn.

Ulfet: Hevnasî, dîdarî, hevhezkin.
Hogirî.

Ulke: *t.* Welat.

Ulûmê Ledun: Zanîna xasê bi Xwedê
ve.

Umman: Behr, derya, okyanus.

Umem: Umme, millet, netewe.

Umera: Piranîya Emîr e. Mîran.

Umêdewar: *k.s.* Hêvîdar.

Umîdwar: Hêvîdar.

Umm: Mak e.

Ummehat: Dayik, Mebest ji vê, ax û
av û ba û agir e.

Umme: Millet, netewe. Kesên bi ola
Îslâmê ra girêdayî.

Ummeta Ehmed: *e.* Ummeta
Mihemed pêxember. Misilman.

Ummetî: Bûyina yekî ji umeta
pêxember.

Ummî: *e.* Nexwendî. Dayîkî, yê wek
nû ji dayîka xwe bûye. Xeysetnavêkî
Hz. Mihemed e. Bi mana nezanibûna
xwendm - nivîsandinê û ne naskirina
tîpan e. Bo ku Pêxember ne dizaniya
binivîse û bixwîne, jêre ev nav hatiye
dayin.

Ew cahil û ummî-yû sefil in

Bê mirşid û rehber û delîl in (E.X)

Ummulfeida: Zana, alimî.

Ummul kîtab: Sûreta fatîhê ye.

Ummulqura-ummulbîlad: Ke'be.

Ummulxebaîs-xemr: Mey.

Ummunnucum: Asîman

Ummurrezaîl: Cahilî.

Ummuşşeml: Roj

Umûr: Tişt. Mebest kar û barên
dewletê ne.

Unas: Xelk.

Uns: *e.* Hevaltî, dostanî.

Unsiyyet: Hogirî, hevaltî.

Unzzur: Binêr.

Uqba: *e.* Axiret, dinyaya din, dinyaya
duyem.

Urwetê Wusqa: Werîsê saxlem, rêya
Xwedayî.

Uryan: Tazî, leqebeke Baba Tahirê
Hemedanî ye..

Urwe: Qulp.

Usat: *e.* Asî, gunehkar.

Kes nîne ji kafîr û usatan

Mezher ne bitin ji bo sîfatan (E.X)

Usbûi': Hefte.

Usir: *e.* Dijwarî, çetînayî.

Uslûb: Şêwe, tarz.

Ust: *f.* Serdar, serok, serdest, jor.

Ustad: *e.* Mamoste. Şareza.

Ustadê sexun: Hostayê gotinê, edîb.

Ustuxwan: Qerqode, hestî.

Usûl: Kok û bingeh û rehên darê.

Uştulum: Kelecane, lihevketin.

Uştur: Hêştir.

Uxt: *e.* Xweşik, rind.

Uxwan: e. Pirjimarîya bira ye.

Uyûn: Herdu çav.

Uzlîfe: Nêzîkbûyî

Uzn: Guh.

Û

‘Ûbab: 1. Pir mezin, weke lehîyê.

2.Ferhengeke weke ansîklopediyê û
pir mezin.

‘Ûd: 1.Amûreke muzîkê. 2.Darîkekî
ku dişewite bêhna xweş belav dike.

‘Ûdê Sendelûs: Dara Sendelê, texteyê
vê darê buha ye.

‘Ûr: Kore, çavwîr.

Û: f. Ew, wî/wê.

Ûd: Aleteke muzîkê ku dişibe
tembûrê.

Ûd, ney, sentûr: Amûrên muzîkê ne.

Ûmm: Dê, dayîk.

Ûns: Aşînayî.

Ûqnûm: Esas, unsûr.

Ûsîdadê mutleq: Ustadê mayînde.
Mamosteyê herî mezin. Mebest
Xweda ye.

Ûslûb: Şêwaz.

Ûrartû: Orarto, Ararto

Ûxra: Ya din, ya ku paşê tê.

Ûxrewî: Tiştên axretê, tiştên ku bi
axretê ve têkildar in.

V

V’an gah-i zemîn bibûs û berxîz: Û
wê demê erdê ramûse û rabe! Ev bi
farisî ye.

Ve: Vîn, .xwestin.

Ve: 1.Dîsa 2.Paşda, bi şunda.

Vebest: Girêda.

Vebestîn: Saz kirin, vedan. Dîsa hatin
girêdan.

Vedanta: Xatîma Vedayê (dawîya
Vedayê)

Vedayî: Wergirtî. Qurbanî.

Enber vedayî kagulan, xeddeyn ji
rengê sorgulan

Daîm di qelbê bulbulan, awurxumarê
Xeznewî (M.M.E.H)

Vedayîn: Em vedan, ji xwe dûr kirin.

Ved'ek: Rewşek.

Vedî: Bidî alî, hilinî.

Vekra: Bi hevdu ra, digel hevdu

Vekuştin: Vemirandin.

Vekuta: Vekutan. Lêdana derî.

Vemiştin: Dest û zend badan; birin
jor, lê qat kirin.

Venumayin: Kifş nabin, venaqetin.

Vere bikî: Bişîne, birê bike.

Veresand: Vekir.

Veresî: Jê xilas bibî, bifilitî.

Min go: Ji kemenda serê zulfa te
verestim Perwazê lebê le'lê me go:
Ger veresî tu (M.C)

Veris: Rizgar, Azad.

Verisand: Vekir.

Veristim: Filitîm, vebûm.

Veşar: Veşartin.

Veşirandî: Veşartî.

Vewest: Raweste.

Vewestane: sekinîne, amade ne.

Vewestayim: Hazir im, amade me.

Vewestin: Rawestin, sekinîn

Vexûnî: Wan bînî ba xwe.

Vexwandin: Dawet kirin, daxwaz kirin.

Vê: 1.Ev. 2.Xwest, kurteya vîn û viyanê ye.

Vêkevîn: Bigihin hev, bicivin.

Yare heqîqet xaliq e cin can feda da vekevin

Rast û durust e sadiq e çi reng qîş û narî kevin

Qenc û letîf û lai q e Baxê îrem da vêkevin (F.T)

Vêketin: Cîvîn, gihaştin, pêrebûn. Kombûn, gîhane hevdû. Cîviyan û kom bûn.

Vêkra: Bi hevra.

Vêl: Tiştê ne kûr.

Vê ra: Pê ra.

Vêra: f. Tev da, bi tevahî.

Vêra bigirî: Alîkarîya wî bikî.

Vi: Bi

Vibuhtî kirî: Amade kiriye.

Vixwunî: (Vexwandin).Bi ezmînî.

Vîda (Vedas): Kitêbên pîroz ên Hîndê yên herî qedîm.

Vîhalî: Vî tiştê ku te dikeve şûnekî, yanî evîna ku te dikeve nava dil.

Vûrix: Nobedar, bekçî.

W

Wabeste: k.s. Girêdayî.

Wabil û wesmiyyû midrar û meter

Tell û xeys: Baran

Wacib: Xwedê.

Wacibunnar: Misteheqê dogehê.

Wacibu-l wucûd: e. Ew kesê ku hebûna wî ferz e. Hebûna wî bi tu kesî û tu tiştî ra ne girêdayî ye. Xweda ye ku dibê hebe.

Wacid: Afrîner, peydaker.

Ey Wahidê bê şerîkê yekta!

Wey Wacidê bê nezîr û hemta! (E.X)

Wad: Newal, gelî, wadî.

Wade: e. Wext, dem.

Wa debê: k.s. Wiha dibe.

Wadem çeha dawê: k.s. Min gelek soz daye xelkê.

Wadê eyman: e. Newala çîyayê Sînayê.

Wadê eymana Tûrê: Newala li aliyê rastê yê çîyayê Tûrî Sîna ku Xweda li wir tecelîya xwe nîşanî Mûsa Pêxember dabû. Mûsa Pêxember jî ji hiş ketibû.

Wadih: Dîyar, eşkere.

Ku yanî dewr û saatê zemanî

Mu'ewwic mustewî wadih nihanî (Ş.M.E)

Wadî: e. Newal, dol

Wadiya muqeddes: Newala pîroz. Newala li çîyayê Turê Sîna li Misrê. Li vir Hz. Mûsa bi Xwedê ra axiviye.

Wadîya zelaî: Newala wendabûnê.

Wadyê Eymenê: Newala çîyayê Tûrî
Sîna ku pêxember Mûsa li wir bi
Xwedê ra axiviye.

Waeteşa: *e.* Wey ji tîbûnan, ez pir tî
me, gazîya gelên Kerbelayê.

Wafir: Pir, mişt, tijî.

Wafirul furû': Pirşax. Der pir bi çiqil.
Ev nexline wafirul-furûin
Lê zêde di nadîrul-wiqûm (E.X)

Wager na: *k.s.* Eger na.

Wahib: Xwedayê ku tiştan bê muqabil
dide. Qencîyê dike. Hibekirox.

Wahid: Yek

Wahîb: *e.* Bexşende.

Wahîm: *e.* Wehîm; tişteki xeyalî an jî
laşê wî tune be.

Wa'îz: *e.* Şîretker, nesîhetker.

Wajegûn: 1. Berevajî. Vacîkirin,
qelibandin. 2. Vajî, muxalîf, bêyom.

Wajûn: *k.s.* Serobino kirin.

Wala: Hêja, birêz. Biha, biqîmet.
Bilind, bala.

Walagewher: Cewherbilind, pir qenc.

Wale: *e.* 1. Leylan. 2. Nalîn.

Wale: Şaş, xemgîn, heyîrî, aşîq.

Walide: Dê.

Walidî: Bav.

Walih: Heyran û gêj.

Ew reng gerîyan cinûn waleh
Edî qe nebûn ji aqlê ageh (E.X)

Walih dikirin : Gêj dikirin.

Walîdeyn: *e.* Dê û bav.

Wamande: Dûrketî, paşmayî.

Wamende: *f.* Way weyla.

Wamiq: Hezkirîyê keçika navê wê
Ezra ye.

Wa nedem: *e.* Ew poşman bû.

Wanewaz: Kêfxweş.

Wapesîn: *k.s.* Qiyamet, dawî.

Waqi'at: Çîrok û bûyer.

Waqif: Şareza, pispor.

Waqifê remz: Yê ku li ji îşaretan fam
dike.

Waqî: Yê bûyî, heqîqî

Waqîfun: Sekinî ye.

Warid: Bêtirs

Waridê warid û ehwal: Kesê ji hal û
serpêhatîyan agahdar.

Wariste: Azad.

Warîs- Waris:: *e.* Miradgir. Mîratgir.

Wasil: Yê ku digihê mabesta xwe.

Wasil bi yek bin: Bigîhin hev.

Wasiq: Cîvandî, komkirî.

Wasite: 1. Sebeb, ho. 2. Navber, bend.

Wasîf: *e.* Ew kesê ku wesîf
dike. Mebest Xweda ye.

Waten: Gotin.

Wa têgeyîştuwe: Wiha têgihiştîye.

Waweyla: *e.* Şîn û hawar û fixan.

Ji waweyla û zarînê Gedayê

Me dil zêr û zeber bû şubhê bayê
(Ş.M.E)

Wa'z: *er.* Şîret, amojgarî.

Wazih bike: Zelal bike.

Wazî lê bênê: Dev jê berde.

We: Wer, wisa, wiha, bi wî rengî.

Webal: Rewşa xerab.

Wecd: Işq û mihebbet û evîndarî

Wecd: Şîyan, vîyan, kêfxweşî.

Wecdan: Piranîya wecdê ye. Janên evînê.

Wech: 1.Rewş. 2.Rû, suret, awa, teşe.

Wechê mehbûban: Rûyê dilberan.

Wec'i: Êş

We'd: Peyman, soz.

Wed': Awa, şêwe, uslûb. Dirûv, şêwaz.

Weda': Xatirxwestin.

Weda derew: Sozdana bi derew.

Wedd: Hevaltî, dostanî.

Wedîê xwudê: Emanetê Xwedê.

Wedûd: Navekî Xwedê ye, yê ku ji qûlên xwe hez dike.

We Eleyke Es-salam û Rehmetê: Û silav û dilovanî li te jî be!

We'ellem: Fêr kir, hîn kir. Ayeta ku dibêje: "Me hemî nav hînî adem kirin..." (Sûreta Beqere: 2/31.)

Wefa: e. Pêkanîn, sozdarî

Wefecrî: e. Sond bi spêdeyê. Mebest sûreteke Qur'anê ye.

Wefî: Wefadar, dilsoz.

Weger: Eger, we eger.

Weh: Gotina ecêbmayinê. Wey! Pek! Heyf û xebînet.

Wehdanîyet: Yekîtî, yekîtîya Xwedê

Wehdet: Yekbûn, yekîtîya Xwedê.

Wehdetê mutleq: wehdetulwucûd. Li gor felsefeya tesewifê bawerîya ji Xwedê pê ve tu tiştên din tune ye. Hemû tişt ji bi olana Xwedê pêk tên

Wehdetê sirf: Yekîtîya Xwedê, ya bê qeyd û şert, Wehdeta mutleq.

Wehdetsera: e. Qesra tekane, seraya tekane.

Wehdî: Bi tenê.

Wehe: Wisa, waye.

Wehhab: e. Navekî Xweda ye. Bexşende, bi wateya yê ku pir dide.

Wehhac: Durûyî.

Wehîd: e. Bi tenê, bêmînak.

Wehm: Xeyal. Guman, şubhe.

Tu yî şahê cemî'ê padîşahan
Tu yî bexşendeyê wehm û gunahan
(Ş.M.E)

Wehşet: e. Hovîtî, namoyî.

Wehşî: e. Dirînde, kuvî.

Wehşî teb'î: e. Ew kesê ku tebî'eta wî wekî ya wehşîyan e.

Weh weh: k.s. Dengê ji bo ajotina çêlekan.

Weh weh: Wiha wiha; bi wî rengî.

Wehy: Peyam, ilhama Xwedê.

We'id: e. Soza bi tehdîd, tirsandin. Qiyamet.

Wek dalê xem e: Wek tîpa dalê xwar e.

Wel'adiyat: *e.* Sond bi wan kesên ku wekî hespan baz didin, direvin. Navê sûreteke Qur'anê ye.

Weled: *e.* Zarok.

Weledzina: Piç, kurê zinayê.

Wel'esrî: *e.* Sond bi zeman. Navê sûreteke Qur'anê ye.

Welê: Lêbelê, feqet.

Welî: Dostê Xweda, kesê pir salih.

Welleylî: *e.* Sond bi şevê. Mebest sûreta Welleylî ya Qur'ana pêroz.

Wellidîn: “Zayîn” ji hev çêbûn, pêkhatin.

Welwele: *k.s.* Hawar û girî.

We mam: Weha mam, wisa mam

Wemq: Evîndarî.

Wenewşe: *k.s.* Binefş.

Wenewz: *k.s.* Ponijandin, ponijîn.

Wenewzêkim: *k.s.* Ponijandineke min, ponijîneke min.

Weng: Jar, keder.

Wenecmî: *e.* Sond bi stêrkan: Mebest sûreteke Qur'anê ye.

Weqar: Giranî.

Weqf: Terxan kirî.

Weqfe: *e.* Raman, hizir, fikir.

Weqîd: *e.* 1. Pêldana êgir. Gurîya agir, alaca agir. 2. Darşewatî.

Wer: Eger, wisa, heke, yan.

Wer': *e.* Mertebeke Xwedanîyê ye. Ew kesê ku ji Xwedayê xwe ditirse. Dîndarî û perestkarî.

Geh puxte bi afitabê şer'ê

Geh suxte bi mahîtabê wer'ê (E.X)

Werae zehr: *e.* Ji pişt ra.

Weraset: Wiraset, warisbûyînî, mîrasderî.

Werd: *e.* Gul

Werdeçerxê: *k.s.* Werdigere, vegerîn.

Zu ew şox e le ‘aşiq werdeçerxê

Legell kes, çerxe ew, naka mudara (MW)

Wer degêrrê: *k.s.* Dizivire.

Werdê al: Gula sor.

Werdên bi xar: Gulên bi strî.

Werdên di cor: Gulên Corê, yên pir sor.

Were': Zêdeparêzgarî, pir xweparastin, parastina ji hemû qedexe û neqencîyan.

Werek: Dirî, strî.

Wereq: Pel, kaxiz, xişrên weke pelan, belg.

Weres: 1. Navê kulîlkeke sor e, ku jê boyax çêdibe. 2. Şînbûyî, kesk.

Wergerand: Quliband.

Wergerandin: Qulibandin, venêrîn.

Wergirt: Li xwe kir.

Wergurbe: Kesatîya xwe biparêze.

Weri': Xwe ji gunehan dûrxistin.

Weriq: Zîv.

Emma tebeqêd-i wan hemî pir

Zêr û werîq û cewahir û dur (E.X)

Weriyan: Hatin xwarê, weşîyan.

Wer na: k.s. Eger na.

Wers: Cureyekî dara serwîyê.

Wert: e. Tehlîke, xeternak, metirsî.

Werte: Gerîneka avê.

Mayînê di werteya belayê

Min qesde ku ez bikim ruhayê (E.X)

Weryane: Weşîyan e.

Werzan: Hejand.

Wesaq: Mal û xanî.

Wesayit: Piranîya wasitê ye.

We se'alîk: Ew kesê ku rêbirî û dizîyê dike. Bêtir ji bo kesên reben û jar ra se'alîk tê gotin.

Weseb: Êş.

Wesel: Navbera du girêkan.

Wesellû 'elersûl: e. Selawatan bînin li ser pêxember.

Wesiyd: Wereng.

Wesî: Gelek.

Wesîd: Ber derî. Derîzan. . Mebest kuçikê Eshabul keyf e.

Gava ku diçîne nêv seîdê

Kelbê me bitin li ber wesîdê (E.X)

Wesîle: Sebeb û bone.

Wesîm: f. Rûxweş, rûgeş.

Wesîq: Qewî.

We sellellahû 'ela: e. Silava Xweda li ser be.

Wesl: e. Gihaştin, dîtin, dîtîna yarê. gîhan, hevgihîn.

Weslet: e. Gihaştin

Ku şem'a wesletê bê der wuha nêz

Ji wê feyzê ku bigrin quwwet û hêz (Ş.M.E)

Weslê canan: Dîtîna yarê.

Weslê nehat: Mizgînîya hevdîtîne nehat.

Weslê xûban: Gihaştina dilberên rind.

Wesl hebîn: Yê ku ji hevdîtîna yarê hez dike.

Wesme: Dermanê birûyan reş dike.

Gava fikirîn di qewsê ebrû

Bûn şibhetê wesme, jê sîyehrû (E.X)

Wessaf: Pesinkar.

Ez dê çi bibêjim? Ey Şehînşah!

Wessafê te ye kalamê Ellah (E.X)

Wessalamû 'ela tabî'-l'huda: e. Silav li ser peyrewên Xweda be.

Wessema: e. Sond bi asîmanan. Mebest sûreteke Qur'anê ye.

Westa: Sekinî.

Ber vişerqê di seherê westayin

Hindûyên roji-perest in çep û rast (M.C)

Westabû: Rawestibû, sekinîbû.

Westan: Sekinîn.

Westane: Rawestin, sekinîn.

Westayî: Sekinî.

Wes-ves: f. Wekî.

Weş: 1.Weşandin, barandin. 2.Derb, lêxistin.

Weş: k.s. Wekî, mîna.

Weşek: Weşeq, wereşeq pisîkeke kûvî û dirinde ye.

Dîlbera min seherê hatî bi tox û bi yedek Sed yedek bûn diberî têkî bi sincab û weşek (M.C)

Weşm: Xal-nîşan, deq. Deqên ku meriv ji bo spehîtiyê li ser çermê xwe çêdikin.

Herdu weşman naz û xeşman

Kê ji ber wan 'eql û hiş man?

Sa'eta min di bi çeşman

Dil ji min bir dil ji min (M.C)

Weşşemsî: *e.* Sond bi rojê. Mebest sûreta Weşşemsî ya Qur'ana pîroz.

Weted: Sîng.

Weten: *e.* Niştiman, welat.

We teb: *e.* Hişk.

Wettûnî: Sond bi hejîrê. Navê sûreteke Qur'anê ye.

Wettûrî: *e.* Sond li ser çiyayê Tûrê. Mebest sûreteke Qur'anê ye.

Wextê ecel bê muhlet e: Zemanê ruhstandinê bê moletan *e;* ku wext hat, hemen ruhê emanet tê standin.

W'ey: We ey, û ey.

Wey: Wî. Ji bo qafiyeyê wisa hatiye nivîsandin. 1.Wê, wa ye. 2.Weke, mîna.

Wey çi bê karem: *k.s.* Ez çi qasî bê sûd im.

Weyla: Xwelîser.

Nizanim dê çi bêjim wayê weyla

Ji vî halê dil ê Mecnûn û Leyla (Ş.M.E)

Weylî: *e.* Cihekî li dogehê ye.

Weyl û wela: *e.* Hawar û gazî.

We ye: Ma gelo pêkan *e?*

Weyh: Dilxurpîyan, avêtina dil, îlham, dazanîna îrfana xwezayî

Weyh û telwîh: Îşaret.

Weyha îlahî: Peyxam û îlham û xurpînîya Xwedayî, agahdarî û têgihîstandin û dazanîna ku ji teref Xwedê da ji pêxemberan ra tê.

We'z: Şîret û pend.

Wez': Danîn, rewş.

Wezan: *k.s.* Gobilandin, bahatin.

Wezîrê mutleq: Wezîrê ku her kar û bar bi wî ve girêdayî.

Wezn: *e.* Kêşan.

Weznînter: Mezintir.

Wezzariyatî: *e.* Ew kesên ku tozê li ber ba dixin. Îşaret bi sûreteke Qur'anê ye.

Wê: Wa ye, xuya ye.

W'ê: Kesê

Wêc: Şaş.

Wêli: *k.s.* Lêgerîna tiştêkî winda.

Wêrane: *k.s.* Kavilbûyî.

Wê rehmê bi mehbûban netê: Rehma feleka dewran, li yar û dildaran nayê; dilê wê bi kesekî naşewite.

Wêsal: *e.* Dîtina yarê.

Wêşî: Weşî, guşî.

Vêkra werîyan li wî per û bal

Têkda weşîyan ji wî xet û xal (E.X)

Wicûb û imkan: Herdu beşên hebûnê li gor lahûta îslamî. Wicûb têgeheke girêdayî hebûna bi serê xwe ye. Imkan jî têgeha girêdayî bi hebûna ne serê xwe ye.

Wicûd: Hebûn, laş

Wihûşistan: *k.s.* Welatê dirîndeyan.

Wila: Wilayet, derbas bû.

Wilayet: Welîtî, dostaniya Xwedê. Meqamê welayetê.

Wilayeta Muhemmed: Umeta Hz. Muhemmed. Welatê pêxember.

Wildan: Zarokên bedew ku di bihûştê da xizmeta ehle wê dike.

Wilatî bebe: Welatê mîrtiya Baban.

Wine: *k.s.* Wenda bûye.

Wiqr, bar û led: Çiwal, tûrik.

Wird: *e.* Zikr, zikrê sofîyan.

Wirda zeban: Zikrê Xwedê bi zimanî.

Wisal: *e.* Dîtin, Gihandin.

Wisaleş: Dema hevdîtîne, gihaştina yarê.

Wisaq: Jûr, ode.

Şêx go: Tu here, bi bîn wişaqan
Teftîş-i bike cî-yû wîsaqan (E.X)

Wişaq: Xort û ciwan.

Wişk: *k.s.* Hişk.

Wiştir: *k.s.* Hêştir.

Witim: *k.s.* Min got.

Witir: Fer, lib.

Witî: *k.s.* Got.

Witman: *k.s.* Me got.

Witr: Kit, fer.

Wizû: *e.* Destnimêj.

Wîdan: Qeweta me'newî ya ku tiştên qenc û xirab ji hev vediqetîne.

Hîcran di kirin ji ser hîkayet

Wîdan dikirin ji nû rivayet (E.X)

Wîdanî: Yê ku derka wan bi wijdanê, bi wê qeweta me'newî tê kirin.

Wîdayet: Parastin, xwe parastin.

Wîdan: Hizmetkarên bihûştê.

Musteheq e bê nivîsandin bi nûr

Der bihiştê ser ruxê wîdan û hûr
(Ş.M.C)

Wînem: *k.l.* Dîbînim.

Eger dil dilberû dilber kudam e?

Wer dilber dilû dil ra çi nam e?

Dil û dilber be hem amîte wînem

Nezûnem dil ke û dilber kudam e
(B.T.U)

Wîqar: Giran.

Wîqaye: *e.* Xwe parastin.

Wîqûfê dûrbînan: Dîtina kesên şareza û pispor.

Wîrd: Duayên ku her tim tê xwendin.

Wîsal: *e.* Gihaştin.

Wî'set: *e.* Fireyî.

Wî vit: Wî xwest.

Wucûd: Beden, laş. Hebûn, alem.

Wudû': Destnimêj.

Wudû best: Destnimêj girt.

Wudûh: Eşkere bibin, rave bibin.

Wuhûş: Kovî.

Wuqubit: *e.* Têkeve.

Wuqûf: Pê hisîya, jê agahdar bû.

Wuqûfa 'Erefatê: Sekna li Çîyayê Erefê.

Ger bidit dest, tewafa pê yû destan
bigirim Wê mecalê bi wuqûfa 'Erefatê
nadim(M.C)

Wurûd: Gihaştin

Wusûl: Gihaştin.

Wuşaq: Lawik, kur.

Wuzû: *e.* Destnimêj.

X

Xab: Bêhêvîbûn

Xadim: Xizmetkar, xulam.

Xafid: Berjêr. Zêr, di gramera erebi
da. Xirabker, nizimker.

Xafil: Bê ay û bê agah.

Xaib: Dûr, ne li ber çavan, wenda.

Xaib nebû ji hoşî: Hişê wî ji serê wî
neçû.

Xaif: *e.* Tirsonek, tirsok.

Xaim: Wenda.

Xaîb: *e.* Nedîyar. Wendabûyî.

Xaîb nebî: Dûr nebî.

Xaîf: Tirsonek.

Xaîf: *e.* Ya/ê ku ji Xwedê ditirse

Xak: Ax, erd

Xakê rehê: Axa rêya, axa rêya yarê.

Xakê rehê yarê: Axa rêya yarê; axa
ku yar pêlê dike.

Xaki pa: Axa bin pêyan.

Xakî: Axî, renga axê.

Xakî pa: Xwelîya pê. Axa bin pê.

Warê pîroz axa pak.

Xakîsar: Ji axê, bê rûmet.

Xakister: Xwelî.

Ger bizanim ez di heşrê da nebînim
dîlberê Cennetê dê pê çi kem? Pê wer
bi kem xakisterê! (E.X)

Xaksar: *f.* Ew kesê ku laşê wî tevî axê
bûye.

Xaksaran: *k.s.* Xwe di nava xwelîyê
da werdan.

Le fîrçey xaksaranî mehebbet bifîkre
yek yek

Be dîmen yek nefer, damen be lêwî
sed ferîq emma (MW)

Xak û gil: Ax û herî.

Xak û xes: Qirş û qal

Xal: Nîşan, nîşana rûyê yarê. Şana li
rû. Nîşana ciwanîyê ye.

Xalab: 1.Zorbir. 2.Qey.

Xaldî-Kaldî: Gelekî li herêma
Zagrosê, nêzîkê sê hezar sal berîya
mîladê xuya bûne, di sala 2649 B.z.
Berîyên kurdan.

Xalê hindo: Nîşana reş wekî pîste
hindîyan.

Xalê rûxit: Nîşana rûyê te.

Xalib: 1.Serdest, serkeftî. 2.Axleb,
pirtir, bi piranî.

Xalib geriya: Bi ser ket.

Xalid: Xalid kurê Welîd: Sehabeyekî pêxember e. Ku dema muşrîk bû di şerê Uhudê da artêşa pêxember têk bir.

Xalif: Afîrîner (yek ji bernavên Xweda ye)

Xaliq: Çêker, afrîner

Xaliqê layenam: Afîrînerê bêxew.

Xalis: Safî, zelal.

Xalî: e. Tenha, vala. Bêkes.

Xalî nehin: Ne vala ne, ne bêwate ne.

Xallî Hîndû: Xaleke wekî Hîndî reş.

Xal mişkînek: Nîşana wekî miskê.

Xam: Xav, kal, nezan, ecemî. An jî sofîyên bê tecrube. Negihîştî.

Xame: Pênûs, qelem.

Xameya giriftar: Pênûsa di nav tilîyan da mîna girtîyekî ye.

Xamis: Pêncem, pêncemîn.

Xamî: Xame, qelem, pênûs

Xam kar: k.s. Xam, Nezan, kêmaqil.

Ger ‘aşîqî le xûnî ciger qum de, dem mede

Mey xwar e xam kar e heta haw û hû deka (MW)

Xamûş: Kesê bê deng, ku napeyive.

Xan: 1. Serok, mîr, key, mezin. 2.

Xanîyê li devê rê ji bo rêwîyan, motel.

Xane: f. Xanî. Mal, malik.

Xaneê xummar: Meyxane.

Xaneqah: Cihê derwêşan.

Xanerûb: k.s. Ew kesê ku bi melkesê xanî pajî dike.

Xanezad: Xanedan, ji nejadekî pak.

Xanê mihr: Cihê rojê, mala rojê.

Xanmefendî : t. Xanima rêzdar.

Xan Şeref: Şerefxanê Mîrê Cizîrê.

Sef sef me dîn Hindî û Zeng

Cengizi hat Tîmûrîleng

Xef wan reşandin dil xedeng

Teşbîhê tîrên Xan Şeref! (M.C)

Xan û man: Mal û milk, jin û zarok.

Xanûmal.

Xaqan: Padîşah, Key. Padîşahê Tirkistanê.

Ji ber tîran û mizraqan

Çi kuştin kir li ‘uşşaqan

‘Eceb bê re’hm e ew Xaqan

Ku em hiştin di hicrê da (W)

Xar: f. Strî, xar, dirî.

Xara: Giranî, kevîrekî gelek req û hilû ye. Rengê qumaşê armûşî ye.

Xarane: Strîyane.

Xare: Kevir.

Xaret: f. Talan, xirabkirin, êrîş.

Xaretger-xaretker: Talanker.

Zahir ku dibûn ji nayê gerdan

Xaretkerê aql û dîn û îman (E.X)

Xaret kir: Wêran kir, xirab kir.

Xaric: Derve, ne hundur.

Kelamek selîse bi cih zebt bike,

Ewe yê ji wertê te xaric dike (M.X.S)

Xaricîyyet: Derketina ji qanûn û edetan. Misilmanên dijî îmam Elî derketibûn û pê ra şer dikirin ji wan ra Xewaric dihate gotin.

Xaric mebe: Dernekeve, nebe Xaricî.
Xariq: Tiştê seyr. Dirandoxê edetê, ji edetê der.
 Xaric ji teeddida hîsaban
 Xariq li teqeyyida kîtaban (E.X)
Xarîteb’: Xûyker, cahil, nezan.
Xar û xes: Gerş û gel, qirş û qal.
 Pûyiş.
Xarзад: Têşka strîyan, strîzade.
Xas: Kesên bijarte.
Xasecat: Milkê taybetî.
Xasekî: Xulamê navmalî.
Xasê nezer: Nêrîna taybet.
 Emma nezera wî zêde ame
 Lew xasê nezer ji dil neda me (E.X)
Xasîbî malî ‘îbad: e. Ew kesê ku malê xelkê dixwe, xesib dike.
Xas-î nezer: Nêrînek û guhdaneke taybet.
Xasîyyet: Taybetî.
Xasma: Nexasim, xusûsen, bi taybetî.
Xass: Taybet, taybetî.
Xasse: Xas, safî.
Xasseten: Bi taybetî.
Xassê ‘aşiqan: Taybetîyê evîndaran.
Xassê xirab: Taybet e bo kesên nebaş.
Xassiyet: Taybetmendî.
Xeste: Birîndar, jandar, kesîre.
Xaşak: k.s. Qirşikên bênirx ku ji pincarên jêkirî dimînin. Her tiştê bênirx. Pil û pûş, zibil. Gerş û gel, qirş û qal.

Xatem: e. Gustîl, mohr. Dawîpêanîn.
Xatemê Enbiya: Dawîhatina pêxemberan. Dawîyê pêxemberan.
 Mebest Hz. Mihemed e.
Xassegî: Xizmetkarên taybet.
Xatir: Hiş, bîr.
Xatîr: Dil.
 Leylê sekinî çadira xwe
 Ev reng e xiste xatîra xwe
 Ku carek biçe lay Mecnûn
 Kanê bi çi hal e ew cegerxwûn (H.B)
Xe’ta: Gunehkarî, nerast, nedurust.
 Guneh, çewtî.
Xatema Suleyman: Gustîlka pêxember Sulêman.
 Durrêd-i defaînêd-i Xaqan ü
 La'la ku di xatema Silêman (E.X)
Xawer: f. Rojhilat, roz.
Xawermîsal: Weke rojê.
Xawerperest: Yên ku îbadetê ji jorê ra dîkin, agirperest.
 Dibên: xawer perest î tû, nizanin min di keşfê da
 Numayin min di şerqê nazika gerdenşemal ebrû (M.C)
Xawî-ğawî: Yê ku tiştêkî bi kirêtî dixwaze.
 Ey haîmê wadîya dalalê!
 Wey xawîyê da'weya kemalê! (E.X)
Xawî: Vala.
Xayib: Wenda, berze. Ne hazir.
Xayle: Tirs, derd, xem.

Xayle kir: Bijale kir.

Xaz: Rengê sor.

Çu su'leb dîtî ev pennîrê taze

Hemandem rengê rûbeh bûye xaze
(Ş.M.E)

Xaze: Soravk. Soraya ku jin rûyên
xwe pê ciwan dikan.

Xazekariy: *f.* Rengkirina wek gulê

Xazî: Ew kesên welatan feth dikan.
Leheng, kevneşervan.

Xaznak: Fennek, qurnas, ji binva.

Xazze: Bixarinker, Ew xwarinên hêz
didin mîdeya merivan.

Xebaîsteb': Xûyxerab, xûypîs.

Xebbaz û Şerabdar: Hevalên Yûsif
ên zindanê ne.

Xebeb: Biriqandî.

Suftîyên pur le'l û mircanan bi
mujganan heta

Dîde rewşen bûn, bi dîna dêmduê
sîmên xebeb (M.C)

Xebel: Li hev ketî, nîvdînî.

Xeber: Hedîsên pêxember yan
serpêhatîyên wî.

Xebera mursel: Hedîsa ji devê
pêxember hatiye girtin lê ji kîjan
sehabeyê wî bihîstin nedîyar e.

Xeberbezîn: Ya/ê paşgotinîyê dike

Xeber pirsî: *k.s.* Rewş pirsîn, hal
pirsîn.

Xebînetîya Mela: Heyfa Mela
(Melayê Cizîrî), xebînetî Mela.

Xebîr: *e.* Zana, haydar, agahdar.

Ji nefsa te nêzîktirînê te ye,

Xebîrê bi efal û qewlê te ye (M.X.S)

Xebîs: *e.* Pîs, heram.

Xebîsê telbîs: Yê kirasên derewan li
tiştan dike. Sextekar.

Xebîsî: Nerindî, pîsî.

Xebîs mudebbir: Kesên ku tevdîrên
xirab dike.

Xebîyye: Tiştê veşartî, nepenî, raz.

Hun bêjine min, ku bû qezîyye?

Kengê li me xef dibit xebîyye ? (E.X)

Xebl: Perîşan, dîn.

Wuha bo xwe digo: Ey kêmdaniş

Çira mayî tu hinde xebl û bêhiş?
(Ş.M.E)

Xebr: 1.Gor, qebr. 2.Toz, xubar.

Xebra: Erd.

Xebt: Lêdan.

Xebûq: Meya ku şeva çûyî hatiye
vexwarin. Mebest evîn e.

Xebxeb: Gerden, qirik. Bin erzenîyê,
binê çenê. Gerden. Gilarê bin çene.

Xecil-Xecîl: *e.* Şermende. Şermîkar.
Fedîkirin, şaşmayin.

Xecilîm: Şaş mam.

Xecîlan: Şermkirî, fedîkirî

Xeclet: Rûzer, şermezar.

Xeda: Taştê, xwarin.

Xedar: Zordar, yê neheqîyê dike.

Xedb: Şêr.

Xedd: Dêm.

Neqîyyû-l xedd tîlaya nin, berat û emr
û ferman in

Bi tuxra û bi nîşan in, di dest ûşşaqê
delalî (E.X)

Xedda': Xapînok.

Xeddar: e. Kambaxkar, wêranker,
zordest. Sîtemkar, zulumkar.

Xeddeyn: e. Herdû hinarkên rû.

Xeddeyn_li mîsalê Qemer û Şemsê
Duha bûn

Du goşê li Perwînê guharan têne bale
(SP)

Xedeng: Tîr. Tîrên ku ji dara
narewanê çêdibin, tîrên darîn. Darek e
ku curekî tîran jê çêdibin.

Xedengê nuhtinê: Tîrên ku li hedefe
ketine, tîrên ku birîndar kirine.

Xedengên esweddoş: Tîrên birûyên
reş.

Xeder: Bêwefatî. Neheqî, stem.

Xedr: e. Zulm, xedartî. Neqencî, stem.

Xef: Ji dizî ve, veşartî. Nepenî.

Xefa: Nedişarî, Baxçeyê veşarî.

Xeffar: Nuxaftoxê gunehan, mebest
Xweda.

Xefarê zinûber: Azadkerê gunehan.

Xefî: Veşartî.

Xeffî: Sivik.

Xeflet: Nagihan, nişka ve.

Xeflet me dî: Nişka ve me dît.

Xeflet zede: Ew kesê ku giriftarî
derdê jibîrkinin û bêagahiyê bûye.

Xeftar: Navekî Xweda ye. Bexşer, ew
kesê gunehan bexş dike.

Xefûr: Yê ku gunehan jê dibe.
Xwedayê bexşdar, pir efûker.

Hem dide wan koşk û baxanew xefûr
Hefê horî û we xilman sade nûr
(F.R.H)

Xel': e. Jixwekirin.

Xel: Xelq.

Xela: Pir kêmbûna erzaq, xelayî.

Xelaîq: Pirjimariya xelqê ye. Xelq.

Xelef: e. Zanayên paşî. Kur, pis.

Xelel: e. Kêmayî, şêlû. Newekhevî.

Pîrî nufûz î kirde beden besye tenbellî
Derço le xanuwê ke xelex_geyye
tenbellî (MW)

Xelet: Çewtî, şaşî.

Xe'let: e. Xelat, dîyarî.

Xelitandibûn: Şaş kiribûn.

Xelîlî-xelîl: Leqeba Birahîm pêxember
e, wateya wê hevalê nêzik, yanê
hevalê Xwedê.

Xellaq: e. Afrîner, çêker. Afirandox,
Xweda.

Xelq: 1 Merivan. 2 Afirandin.

Xelqet: Afirîn

Xelqê nasaz: Kesên nebaş.

Xelq wel emr: Cîhana ku Xwedê
afirandîye ji du beşan pêk tê. Xelk;
Xweza û gerdûn û caniwêr. Emr;
cîhana ruhanî ye nexuya. Ruh û aqil
her tiştê ku meriv nikare bibine.

Xelûz: k.s.Agirê ku bizota wî vemiriye.

Xelwan: Xelwe: Cihê ku sofî tê da diponijin û perestîyê dîkin.

Gava dimeşîn, perî digel wan

Walih dikirin welî di xelwan (E.X)

Xelwe: 1.Tenêbûn, tenêbûna ji bo fikirînê. Cihê ku sofî lê tenê dimînin, tenhageh. 2. Quncikê tarî.

Xelwenuşîn: Kesê ku dikeve xelwetê, bi tenê dimîne, zîkr û fikir dike.

Zahidê xelwetnuşîn pabendê kirdarê xwe ye

Tacirê rehletgozîn derbendê dînarê xwe ye (E.X)

Xelwenûşîn: Mayîna çil rojan di silûkê da.

Xelwet: Tenêbûn, Tenêbûna ku tê da fikirîn, zîkr û îbadet tê kirin.

Xelweta xas: Tenêgeha taybet. Koşka yarê.

Xelwetê xas: Bi tenê li gel şêx.

Xelwetgeh: Cihê xelwetê, xalî û sergirtî.

Xelwetî: Kesê xelwet û tenêtiyê da ye.

Ew xelwetîyê di î'tîkafê

Rabû ve bi nîyyeta tewafê (E.X)

Xelwexane: Cihê ku tê da tenê dibinin, cihê xelwetê.

Gava ku gîhane xelwexanê

Dergeh vekirin li hebsîxanê (E.X)

Xem: 1.Keder, derd. Gerînek. 2.Dost.

Xemam: Xumam, mij.

Xem bû: Xwar û xûz bû.

Xemdîde: Xembîner, xemgîn.

Pêşi şema xwe me perwane kirî

Dilê xemdîdeyê ma, şa ne kirî

Xemendûz: Kesê ku xeman dipêve, dicivîne. Xemcivîn.

Xemgîr: Xemgîn.

Bike serfê wekî mera, nehêle tu ji xelkê ra Bike qencî û hem xêra, dile xemgîra pê şa kî (M.E.F)

Xem guşa: Xemxwara.

Xemguzîn: Bijartoxê xeman. Xem bijêr.

Yarebbî! Bi nazê nazenînan,

Yareb! Bi nîyazê xemguzînan (E.X)

Xemîr: Hevîr.

Xemî sûz: Agirê xemê.

Xemkede: f. Xemxane, cihê xeman.

Xeml: Zînet. Rîşî.

Xemmar: Meyxanevan. Notirvan. Meyger, meyçêker.

Xemmas: Fesad

Xemmaz: Hefsûd. fesad, peyvgêr. Tinazker, rexneker.

Xemnak: Xwedî derd û xem

Xemoş: k.s. Kîp, bêdeng.

Xemr: f. Mey, bade, şerab, araq.

Xemra al: Meya sor.

Xemretîna: Meya me.

Xemrî: Bisk û kezî yan jî guhê desmalê yê sor. Gulî û şirikê sor. Ji

rengê xemrê, sor. gulîyên sor; gulîyên desmala sor.

Xemrîyan: Gulîyên sor, guhê çara sor.

Xems: Pênc.

Xemşet'eşer: Pazdeh, ji bo ku kesê ku şî'rên Mela bi navê xwe gotine.

Xemt: Dara bê strî.

Xemûş: Bêdeng.

Xem û pîç: Girê û xelek.

Xem û tab: Honandin û pêçan.

Xemyaze: Baweşak.

Xemz: Îşaretên bi çavan. Naz

Xemzan: Kortika di bin çeneyê an jî dêman da.

Xemze: Awirên bi naz. Kortika dêm û erçenê.

Xemzede: Xemgîn.

Xemzeelmas: Xemzespî, zivînreng.

Xemz û îma: Îşaretên bi çavan.

Xenc: Naz. Cîlwe, tewr, naz, işwe.

Xence: Naz, işwe.

Xend: *f.* Ken.

Xendan: *f.* Kenîn. Biken, kêfxweş.

Xende: Bişirin, gîrnij, tebesum.

Xende da: Kenîya, kenî.

Xendezenî: Kenîya. (Kenê bi qehqehe)

Xenem: Pez.

Xenî: Maldar, dewlemend.

Xenî kirin: Têr kirin.

Xenîmet: *e.* Malên talanê.

Xenîmet hatîye ber der bi qîmet

Xebînet nîne der di ev xenîmet? (Ş.E.)

Xennac: Pir bi naz. Nazdar, bi işwe.

Şimşadi xeram û serwi xennac

Cananan dibirit bi 'işwe tarac (M.C)

Xennas: Sifeteke şeytan e.Yê ku nabe alîkar.

Xeple: *k.s.* Kulor, paste, kulîçe, poxaça.

Xer: 1.Ker. 2.Dirî

Xerab: 1.Xerb, delwa avê ya mezin. Meşk. 2.Qedeha zîv. Kûp.

Xerab: *f.* Mest. Wêran.

Xerababad: Xerabat. Xerabe; di tesewifê da bi wateya “dergeh, tekke”yê tê bikaranîn.

Xerabat: Meyxane, xirbe, wêran, cihê xirabkirî.

Xerabatest: Meyxane.

Xerabe: Kavi.

Xerabatê muxan: Meyxaneya meygeran.

Bi meyê safî bidin xerqeyê zerq

Bi xerabatê muxan er biresin! (M.C)

Xerabatî fena: Meyxaneya fena, dinya.

Xeram: *f.* 1. Meşa bi nazî û kubarî. Evîn 2.Şeref, fexir.

Xeraman: Meşa bi naz û fexr, bi naz û delalî. Ew kesên ku bi naz di rê da diçin.

Xeramîden: Çûna bi nazik.

Xeraş: Tiştên ku neynûka wî tûj be.

Û hem şebnîme û dil pur xeraş im
Ji derdê ruwê dîlber der telaş im
(Ş.M.E)

Xerayîb: *e.* Pirjimarîya xerîbîyê ye.

Xerb: Rojava.

Di dinyayê heçî rabin

Feqîr û şêx û axa bin

Ji ber mime xelas nabin

Di şerq û hem di xerbê da (M.E.F)

Xerbazî: *e.* Lîstika keran.

Xerbeste: *f.* Kergirêdan.

Xerbet: Şerbet.

Ew meywe bixut kemalê xerbet

Ew luqmeyê xweş bi bîte şerbet (E.X)

Xerc li min: Mesref li min.

Xerçeng: Kevjal, birca kevjalê.

Burceke li asîman. Birca Kevjalê ji 12
bircên rojê

Xerdel: Tovekî piçûk, gormiz.

Xered: Armanç, mebest.

Xeredwar: Xwedan xerez, bixerez.

Xerek: *k.s.* Amûreke di nav malê da
ye ku bi wê pembo pê tê ristin. Teşî.

Xereman: Meşa bi giranî û nazikî.

Xerez: 1.Rik, kîn. 2.Daxwaz. Mebest,
meram, armanç.

Xerezdar: Dilbikîn, kîndar.

Xerg – xergek: *f.* 1.Teşt. 2. Çadira
mezin.

Xergah: Konê mezin. Xîvetgeh, cihê
berfireh.

Xerge: Fetisî.

Xergeh: 1.Timî, herdem. Warga
delala. Hîva teze. Ciwan. 2.Konê
mezin.

Xergele: Pirjimarîya kerê ye.Keran.

Xergoş-xergûş: Kêvroşk.

Xerîdar: Kirîdar, mişterî, kirînox.

Xerîdaran: Bikiran, kirîdaran,
muşterîyan.

Xerîfy: Payîz.

Xerîq: *e.* Xeniqî. Nûqbûyî.

Xerîze: Remek, xîlqet, tebîet, xûy,
bingeh

Xermen: Bêder, seywana dora hîvê.

Xermuhr: *f.* Morîka keran.

Xermuhre û morîk û mirarî

Hindek di şefaf û hin di tarî (E.X)

Xermuhre: *k.s.* Gerdenbendên keran.
Morîkên erzan.

Xerq: 1.Noqbûn. 2.Dirandin.

Xerqe: Eba, sako.

Xerqe: *e.* Fetisîn. Noqbûyî.

Xerqeê behrê: Noqbûyê deryayê.

Xerqeê zerq: Ebayê rîyayê, kirasê
durûtîyê.

Xerra: Birqok, geş, ronî.

Van sinbil û laleyêd-i xerra

Reyhan û binefşeyê miterra (E.X)

Xerre: *e.* Mexrûr, qure, jixwerazî.

Mebe şubhê hebabê xerre ber av

Bi ger û bazîyan,bo bayê der av
(Ş.M.E)

Xers: Derew,

Xerteb'eb: Siruştker, xûyker, nezan.

Xertel: *t.* Balindeyek *e.* Qertel, eylo.

Xerwar: Barê hespan. Xerar.

Naqe bi qîtar û dur bi qentar

Yaqût-i bi bar û zêr bi xerwar (E.X)

Xerxere: *e.* Wextê ruhkêşanê.

Xes: *f.* Pûş, qirşik. Xar, dirî, dirik.

Xesfe da: Nixumand, veşart. Wenda kir.

Rehmeten lîl alemîn bû hat cîhanê ey
beser J'mesx û xesfê hin xilas bûn hin
bi îman bûn xenî (M.H.Q)

Xesîs: Çikûd.

Xenî bîtin ji wê cama sexî dil

Evê nefsa xesîs a kêmiaqil (Ş.M.E)

Xeslet: *e.* Rewîşt, sinc, exlaq.

Xesm: Dijmin.

Zînê bi de wan weya bikuj min

Yan ew bi terane xesm û dijmin (E.X)

Xesmane: Neyarî.

Xesse: Qiriktalî, keser.

Xeste: Westa.

Xeste me: Ne saxim.

Xesteyê bîmar: Nexweşê birîndar.

Xes û xaşok: Zibl û zal, pûş û per.

Qirş û qal. Ka gelaş.

Xeş: 1.Kewş (qirş û qal). 2.Geravî,
xapandin.

Xeşeb: Dar *e.*

Xeşim: Zordestî, torîtî.

Xeşî: *f.* Xuşû, Bi tirs û saw.

Xeşm: Heybet. Zordestî, torîtî. Hêrs, qehr.

Xeşmê li feqîran meke zû padîşehê
min Pursê bike carek li xeta û gunehê
min (M.C)

Xeşyet: *e.* Tirs, xof

Xet: 1 Cênîg. Mû. 2 Nivîsan.

Xet: Xêz. Mebest çav, birû, kezî, rû,
dev û bejna yarê ye.

Xet: Xeta, gunehkarî.

Xeta: Xeten. Li Tirkistanê warekî bi
xezalên miskê ve navdar *e.*

Xeta: Çewtî, şaşî.

Xeta û 'isyan: Şaşî û serkêşî.

Xetebend: Perwaza text.

Her texte ji ûdê sendelûsî

Textek xetebendê abenûsî (E.X)

Xetebendê Abenûs: Dara abenosê ya
xemilandî û kolayî.

Xeten: Zava.

Xeten: Xeta, li Tirkistanê warekî bi
xezalên miskê ve navdar. Bajarekî
bûye miskê xezalên wê pir hêja bûne.

Xeter: Talûke, metirsî.

Xetê xeta: Xêzên gunehan, gunehkarî.

Xetîb: Xwazgîn.

Ev renge bi bêje wan hebîban

Mecmûê mewalî-yû xetîban (E.X)

Xetm: Kutakirin, dawî.

Xetma xîtamê: Dawîya dawî.

Xetme: Morkirîye, hatîye morkirin

Xetsîyah: Keça ku biska ser cînîga wê reşe. Porreş.

Xett: Xêz.

Xettat: Nivîsvan.

Xettatê felek, ji dest qelem ket

Cellad-i fikir ku wî qelem ket (E.X)

Xettatê felek: Wesfeke gerstêrka Utaridê ye. Di stêrknasîyê da ji vê gerestêrkê ra dibêjin “nivîskarê stêrkan” e

Xettê humayun: Xetê sultanî, nivîsa bêhempa.

Xettêkî zimrût: Xeteke wekî zimrûd şîn e.

Xettê xubarî: Cureyekî nivîsê yê weke tozê zirav û tenik.

Xet’ û sewab: Xeta û rastî.

Xetwe: e. Pêngav, gav.

Xewab: f. 1.Xew. 2.Yên taybet.

Xewadim: Xulamin.

Xewarib: Çar demên berî avabûna rojê ne.

Xewas: e. Çêtir, nêzîktir. Kesên taybet, malmezin. Kesên giregir, li pêş.

Xewatîn: Piranîya xatûnê ye. Xatûnan.

Xewer: Rojhilat.

Xewerreq: Cihêkî nêzîkî bajarê Necefa Iraqê ye.

Xewf: e. Xof, Tirs.

Ji fikrê li zikrê xwe xafil meke,

Ricayê li xewfê ji wî her bike (M.X.S)

Xewf û Rica: Tirs û hêvî

Xewr: k.s. Kûr, qûl. Kurahî

Xewr: Westan û azirîn.

Neyrengê ji xewrê dil bi aheng

Sed rengê seda bidim wekî Çeng (E.X)

Xewrê dil: Kûranîya dil.

Xewt dixut: Noq dibe, dadiwerive.

Xewtî: k.s. Razaye.

Xewwas: Kesê xwe berdide binê deryayê. Noqav, kesê ku di noqbûnê da şareza ye.

Xeyalbazî: Pêketina xeyalan. Karên pûç û vala.

Xeyalê batil: Hizrên vala û nerast.

Xeyalê zill: Xeyalê sihê. Perdebazî. Ew dûmenên ku li ser perdeyeke spî û li pişt wê çirayek vêketî. Bi tirkî “golge oyunu”.

Xeyb: Winda, nedîyar, nehazir. Alema veşartî. Tişt û cîhê nexuyayî.

Xeyirrî: Hate guhertin.

Xeyl: e. Hesp. Koma hespan.

Xeylek: Gelek, pir. Hinek.

Xeylî: e. 1.Heta dibe. 2.Pir, gelek.

Xeyme: Kon.

Xeymet: Kon.

Xeyn nûn û çîm û hê: Xunçe.

Xeyr: e. Şuxla li rê.

Xeyre meqdem: Tu bi xer hatî.

Xeyre munzilîn: e. Baştirîn cih.

Xeyrez: f. Ji bilî wî

Xeyr-i me'rûf: Nenas.

Xeyrixwah: Xêrxwaz.

Xeyrî dare: Ji bilî (vê) darê.

Xeyrul beşer: Baştirîn meriv an ku Mihemed pêxember. Qenctirînê merivan

Xeyr-ul wera: Baştirîn afirandî/mexlûq an ku Mihemed pêxember.

Xeyrû 'ilmillahî subhan: *e.* Ji bilî Xwedê kes tiştêkî nizane.

Xeyrî rahîmîn: *e.* Baştirîn kesên bexşende.

Xeyşûm: Firnik.

Xeyûr: Kesê bi xîret.

Xeyvet: Xeymet, kon.

Xeyyûr: *e.* 1.Xîretkêş, xîretkar.
2.Cansivik.

Xez: Qumaşekî hevrişmîn *e.*

Xeza: Xazîtî.

Xeza: Herb, şer.

Xezaker: Kesê ku cihadê dike.

Xezal: Ahû, ask.

Xezam: Belgên daran ên zer. Pelên daran yên zerbûyî.

Xezam zer bûn ji xesarî

Sefa nakin di vî warî

Ji ber sermê û asarî

Hewayê zer kirin dar *e* (F.T)

Xezan: *e.* Payîz.

Xezayin: Pirjimariya xezîneyê *ye.*
Gencîneyan, kanzayan.

Xezel: Cureyekî helbestan *e.*

Xezelxwan: Yê ku stran û helbestên evînî dibêje. Mexmûr û sekran, serxweş û mest.

Xezenfer: Şêr.

Li ser yaranê dînban ê xezenfer

Ebûbekr û 'Umer 'Usman û Heyder (Ş.M.E)

Xezlan: *e.* Alîkarî nedan.

Xeznemende: *k.s.* Ji xezîneyê maye.

Xezra: Kesk

Xêlêk: *k.s.* Xeta cot.

Xêrexwah: Xerxwaz.

Xêrê bê mükâfat: Xêra ne ji bo padaşan. Xêra ji bo Xwedê.

Xêzan: Hejar, jar.

Me hasil kir bi xêzanî, bi muştâqî, bi heyranî

Wekî genca di wêranî, me peyda kir bi remmalî (E.X)

Xiciste pey: *k.s.* Lingbixêr.

Xidrewat: Sebzeyin

Xilaf: Li dijî, derew.

Xilafet: Xelîfetî û cîgirîya mirov ji Xwedê ra li ser erdê.

Teşrîfê xîlafetê te da me ?

Gava te emanetê xwe da me (E.X)

Xilafê xeybet: Ne li gor tirsê wî *ye* bi cegermendî.

Xilal: Kurdan, darikê diranan.

Xil'e: Dîyarî, bi taybetî eger ew dîyarî kiras be.

Xill: Yar.

Meya safî bide bê xill û bê xeş
Ku da tenwîri ke qelb û dilê reş
(Ş.M.E)

Xillî: Dosta min.

Xilman: *f.* Pirjimarîya xulam e.
Lawikên di xizmeta bihuştîyan da ne.

Xilqet: Aferin.Çêbûn. Qerekter.

Xilwa: Xelwet, tenêti

Xilwe: Bi tenê, tena serê xwe. Tenha.

Xilxal: Xişreke ku jinan bi nigê xwe
ve dikirin.

Her dema netrikê xilxal binê her tene
xuroş Her dema Turre ji ber tayî qeseb
tête sudur (E.X)

Xilzet: Stûr.

Xinapenc: Dest bi hine.

Xirabî: Nerindî, pîsî.

Xiram: *f.* Meşa bi kubarî, meşa bi naz.

Xirbal: Bêjîng, serad, moxil, qalbûr.

Bê dil û însaf û zalim fitnexîz
Sîne xirbal kir nihanî rast û çep
(Ş.N.B)

Xirqeê zerq: Ebayê rîyakarî û
durûtîyê.

Xire: Perçem.

Xired: *f.*1.Hiş, aqil, têgihiştin
2.Fedîkirin.

Bi saya şahê Şêrîna xwedansur
Teheyyur tê bikin ehlê xired pur
(Ş.M.E)

Xiredmend: Aqildar.

Xirên: Zingîn.

Xirqeê girdabim: *f.* Xeniqîyê ava
gerînek im.

Xirran: Xirîyan, xapîyan.

Xirr û xalî: Vik û vala.

Xisûsiyet: Bi taybetî. Guhdana taybet.

Xişir: Zînet.

Xişt: Bisteke ku weke rîman tê avêtin.
Bist, şîş. Sivik.

Piştê nadeyn du hezar xencer û tîr û
rim û xişt

Me serî daniye rê û bi Xwudê bestiyê
pişt (M.C)

Xişt: Libna axê.

Xitût: Xezm.

Xiza: Xwarin.

Xizam: Kulîlkek e.

Rûwêd-i wî ger çî her di terbûn

Manendê xizamê, lêkî zerbûn (E.X)

Xizanî: Feqirî.

Xizim: Kesên ji malbatê, eqreba.

Xizlan: Şermkirî.

Xizm: Merive li pêş.

Xizmetguzar: Xizmetkar

Xizr: *e.* Xoce Xizir, kesekî efsanewîye
li gor bawerîyên misilmanan dema
misilman bikevin tengasîyê da
alîkarîya wan dike. Ava jiyanê
vexwariye ji ber vê nemir e. Di
tesewifê da ew nîşaneyê rêberê pak û
îlhamê ye.

Xizyi: Riswayî.

Xîbte: *t.* Gipta, xwezî, bij.
Xîda: Bakût, debar, gida.
Xîffet: Sivikbûn.
Xîlaf: Dijîtî.
Xîlafê mu'tad: Ji edetê der.
Xîlman: Zarûken bihuştê.
Xîmenîşîn: Yên di konan da rûdinin, koçer.
Xîna: *e.* Dewlemedî, Maldarî.
 Sira xelqê gotin, derew der yemîn,
 Xînaî jî, we'da derew, ey emîn!
 (M.X.S)
Xîred: Aqil.
Xîret: Dilxirabî, zikreşî. 2. Gîrrê namûsê. Namûs û sergermî.
Xîsal: Rewistan, sincan.
Xîtam: Kutabûn, dawî.
 Dê deftera min kir xîtam
 Ez asiqê wê me medam (M.E.F)
Xîtamî mîsk: *e.* Bêhnkiria mîskê.
Xîtan: Sunnet, sunetkirina zarokan.
Xîvet: Kon.
Xîza: *e.* Nanxwarin.
Xîza': Zad.
Xîzan: Yê ku xwe hildavêje, baz, dide, feqîr.
Xo: Jixwe.
Xo dekey e pûlî narewac: *k.s.* Heyfe ku tu xwe dikî pereyekî bê qîmet.
Xodnuma: *f.* Kesê ku quretî û kubarîya xwe nîşan dide.

Xodriste: Giyayê ji xwe ber şîn tê. Merivê jêhatî.
Xokerde: Hogir.
Xokerdeye îşqê: Yên ku xwe kiribûn evînê.
 Ew hefte li wan ku bûye salif
 Xokerdeyê îşqê bûn mialif (E.X)
Xollemêş: *k.s.* Xwelî.
Xomar: Serxweş.
Xonxwar: Xwînxwar, xwînreş, xwînmêj.
Xor: Piçûk, li xwar, jêr.
Xor: *k.s.* Roj, tav, hetav.
Xorasan: Herêmeke dikeve rojhilata Îranê ye. Wateya wê 'cîhê ku roj têda hiltê' ye.
Xorşîd: Tav, hetav.
Xorşîdsifet: Wek rojê.
Xoşbû: Bêhna xweş.
Xoş gewaratir: *k.s.* Xwarina ku bi hêsanî diçe jêr.
Xoşim dewêt: *k.s.* Ez ji wî hez dikim.
Xoşî: *k.s.* Xwe jî.
Xoşî dewêm: *k.s.* Ew ji min hez dike.
Xoşî le to bulbul: Ey bilbil dilşadî ji bo te.
Xoş weqtê: *k.s.* Demeke xweş .Wexteke xweş.
Xu: Xwe.
Xuban: *f.* Bedew, rind.
Xubar: Toz, xwelî. An jî guneh û peywendîyên meriv bi dinyayê ra.

Xubanî ‘alem: Rindên cîhanê.

Xubrû: Rûxweşik

Xubs: *e.* Pîsî.

Xubz: *e.* Nan.

Xucle: Şerm

Xud: *f.* Xwe.

Xudadar î çi xemdar î: Tu ehle
Xweda yî çima tu xemgînî.

Xudan hewa: Xudan evîn, dildar.

Xudanê zulfeqar: Xwediyê şûrê
Zulfeqar ku ew Hz. Elî ye.

Xudawend: *k.s.* Xwedan, sahib.

Xudan meqamet: Welî, dostê Xwedê.

Xudannuma: Xwedê nîşan dide.
Raber dike.

Xudpersitîn: *k.s.* Kesên ku enaniyeta
wan zor e.

Xudr: Kesk. Xocê Xizir.

Xudreste: Kesê ku bê mamoste, xwe
bi xwe gîhaye.

Xudûd: Dêm. Kortik.

Xudûk: Melul, xemgîn

Xud û sedîd: *f.* Kêmxwîn.

Xudpesend: Xweperês, mexrûr.

Xufran: *e.* Efûbûn, lêborîn.

Ji Rebbê xwe xufranê telbe bike,
Bi tewbê tu paqij dibî, her bike (E.X)

Xulamane: Wekî xulaman.

Xulafey erbe'ey: *e.* Çar xelîfe.

Xuld: *e.* Bihuşt. Navekî Bihuştê ye.

Xuldê ekber: Bihiştê herî mezin.

Xul'etê faxir: *f.* Li xwe kirin xelatên
qenc.

Xulif: *e.* Dijî rastîyê.

Xuliqîn: Hatî afirandin.

Xull: Zincîrên ku bi dest û lingên
girtîyan tên girêdan.

Xwezîya ku li min xezîb kira
Mîr Manendê Memê bi xull-û zincîr
(E.X)

Xulleb: Ewrê bê baran.

Îro mecal lê hat û wext, dîsa cuwan bû
min dirext

Ew lamîa dayî ji text, ma kane berqen
xulleba (M.C)

Xullet: Evîn.

Xullux: Cilên hevrişîm ê tenik.

Lêvîa'I-û semen'îzar û gulrux
Rewneq şikenê bi tanê xullux (E.X)

Xulqinde: *k.s.* Afrîner, xaliq.

Xulûd: Zindîbûna timî.

Xulûs: *e.* Dilsozî.

Gava ku ji mekmenê xulûsê
Bi'nmêtî li textê dil cilûsê (E.X)

Xulûsî: Tenêtî.

Xulxul: Dengê xwendina çivîkan.
Bihîstina pir dengên. Dengên zêde yên
balindeyan.

Xulxulîn: Livîn, dengê livandinê.

Xulxulu: *f.* Şahîya bi îzdiham, bi
girseyî.

Xum: Kûp, cêr.

Xuma: Gêj, bêhiş.

Xumar: e. Serxoşî, bêhişîya ji ber
meyê serxweş, tişta ku liba dibe.

Xumarî: Jixweçûyî.

Xummarî: Çavên awirtûj.

Xummê ekber: Cêra mezin, kûpê
mezin. Tecrubeyên tesewifê û êş û
janên di wê rêyê da.

Xumrî: Rengê xumrî, sor.

Xumxane: Cihê ku mey lê tê çêkirin.

Xunc: Nazikî û delalî.

Xunce: Gula nebişkivî.

Xunçe: Bişkojên gulan. Gula nû
vebûyî. Gula ne pişkifî, pindik.

Xunçebaz: Gula nûvebûyî; Devê
weke xunçeyê.

Xunçedehan: f. Devbişkok.

Xunçekuşa: Weke gula nû vebûyî.

Xunçeleb: Lêvxwençe, lêvên weke
gula venebûyî.

Borî û bi xencekê Mela kuşt?

Ew xunçeleba delal û xennac (M.C)

Xunçe mesel: Mîna bişkojê gulan.

Dem ebr-i sîfet, hezîn û giryan

Geh xunçe mesel, letîf û xendan (E.X)

Xunçeweş: k.s. Wekî xunçeyê.

Xunçeya dehanê: Gupika dev.

Xunçeyê naşikufte: Gupika gulê ya
nebişkivî.

Ey xunçeyê naşikufte sorgul!

Bi'şkîn qefesê, derîne bilbil (E.X)

Xund: Xwedî, mezin.

Xundekar: Padişah, hukumdar.

Xundin: Bangkirin.

Xunmeye: e. Xenîmet , qezenc.

Mucerrred bibe ger tewekkul heye,

We ger ne, tu kesbê bike xunmeye
(M.X.S)

Xunun: Kûpê meyê yê mezin.

Xur: Şadî.

Xur: Xwarin.

Xurab: 1.Pêlên deryayê yên mezin.

2.Keştîya piçûk. Qayix.

Xurab: e. 1.Çavên weke qijika belek.

Çavên reş. 2.Porê weke qijika reş.

Xurbet: e. Xerîbî.

Xurde: Hûr, piçûk.

Xurdekar: Bi hûrgilî tê da neqîş
çêbûne.

Xurek: Xwarin.

Xurem: Taze, kêfxweş, coş û xuroş.

Pesendîde me ra ayed zi her dem

Xurem xwîna surahî ne dema xem
(Ş.M.E)

Xurfe: Bermal, jûr.

Dîtin di mehelle û zikakan

Her kuçe û xurfe û şibakan (E.X)

Xurme: Ruteb, xurme.

Xuroş: Heyecan, kêfa zêde, coş, fûrîn

Keldayin û rijîna bi ser firaqê da.

Xurrem: Xweşî, Kêfxweşî. Şad,
dilgeş. Dilşad.

Bi ayat bi tewhîde ji teşrîfe û temcîdê

Şeva xurrem di tewlîde senem hûr bûn
((M.B)

Xurrem û xendan: Dilxweş û biken.
Xursend: Standoxê xwarinê û bakût.
 Ez bende ne laîqê wîsal im
 Xursendê bi sûretê xiyal im (E.X)
Xursende: Razî, qayil.
Xurşîd: Roj, Hetav.
Xuruc: 1.Derketin. 2.Serhildana li ber
 îmam û xelîfeyan.
 Herame li xelqê xurûca li wî,
 Eger çî ku cewrê bibînin ji wî (M.X.S)
Xurûc: Derketina ji qanûn ji edetan.
Xurûş: Kêf telaş, qêrîn û hawar.
 Ey le'ele lebit 'ezme ji mîmê dike îhya
 Cûşan û xurûşan ji firaqa te ye derya
 (M.B)
Xurûşan: Bi gurregur.
Xusan: Belg, pel
Xusr: e. Zîrarî, xesar.
Xusran: e. Zîyan, zarar, xisar.
Xusrew: Xusrewê Perwîz, paşayekî
 Îranê yê qedîm e.
Xusruwê xûban: Serdarê rindan,
 serekê bedewan.
 Dîwane herê tê te di vê .silsile û bendê
 Ku musteheq e Xusrewê xûban bi ceza
 girt (M.C)
Xusse: Bê xem. Keder. Kelogirîbûn;
 êş, xem.
Xusseyek naxût ti dunya bo dile pir
 xûn kes
 Kî tibit xemgîn ji bona xatira mehzûn
 kes (P.B.H)

Xusserevîn: Revînokê xeman. Derdan
 direvînin.
Xusûf: Hîvgirtin. Girtina hîvê ku tarî
 dibe, nayê xuya, Xirabûna hîvê.
 Hîvgirtin.
 Qeydi xak û gil nebit da bê hîcab û û
 perde bî
 Mislê bedrê carinan têxit xusufê xakî
 rûh (M.C)
Xusyetan: Gun.
Xuşab: Xweşab, ciwan û ter.
Xuşik leb: k.s. Lêvhişk.
Xuşk: f. Hişk, bêmêwe.
Xuttu: Niqo bûm.
Xutût: Piranîya xet e, xêz.
Xuwar: Deng.
 Bi derket ronîyê ew jê ferehnak
 Wuha bê bak xuwarî şîrê pur pak
 (Ş.M.E)
Xuwên: k.s. Xwîn.
Xuyr-ul meqer: e. Wargeha çak.
Xuz: Bigir.
Xuzî: Xwezî.
Xuzrewat: Keskayî.
Xûb: Ciwan. Di nusxeyeke din da
 "Hûr"e. Rind, xweşik, bedew, delal
Xûban: Ciwan, delal, baş.
Xûbperest: Rindperest, abîdê
 xweşikan.
 Ehlê hal û xûbperestan
 Wan ji 'umr, ev muddea ye (M.C)
Xûbrû: Rûciwan.

Xûd: Xwe.

Xûl: Dêw. Pîrhevok.

Xûnabe: Xwînab, xwîna herikî.

Xûn allude: k.s. Di nav xwînê da mayîn.

Xûnbar: f. Pîrxwîn.

Zuşt û naşîrîn e pîr, emma çi şîrîn e eger

Çawî xûnbarî nedamet rîşî xurmayî bika (MW)

Xûnfeşan: Xwînrej.

Xûnkar: k.s. Xwînrej.

Xûnrêz: Xwînrej.

Ew çi mujgan in çi tîr in ew çi elmas in bi qal

Qatile xûnrêz û xûnxur pur qîtalê kê yî tu (M)

Xûn xor: k.s. Xwînmij.

Xûrrem: Kêfxweş, şad.

Xûşe: Weşî. Sinbilê genim.

Xwab: Xew

Xwabe mestî: Xewa jixweçûnê, mestbûna bi hişyarî.

Min dî seherê dî xwabê mestî

Bê deng tezerû we lali durrac (M.C)

Xwabige: k.s. Cihê xewê, mebest gor, mezel.

Xwace: Xoce, mamoste. Zana, kesê şareza.

Xwace: k.s. Cihû, Yehûdî.

Xwah: Xwastin.

Tu yî xwahê şefaati, siviksaz îmunacat î Hilo nûra hîdayat î îmamê mescid û minber (M.B)

Xwahan: f. Daxwazkar.

Xwahîş: f. Xwast, vîn, îrade.

Xwahûn: Mişterî, bazar.

Xwan: 1.Xwarin. 2.Sifre.

Xwanende: Stranbêj, dengbêj.

Xwanê kase: Vexwarina ji kasa meyê.

Xwanê roze: Xwarina rojîyê, fîtar.

Xwar: Kesên ne rast, xerab.

Xwar-ustuquş: Esilxerab.

Xwar û xêç: k.s. Xwar.

Xwebîn: Qurre, pozbilind.

Xwedawend: Gerdûndar, Xwedîyê gerdûnê. Xweda.

Pîr û ustadî çi hacet bi Elî-heyderî hestin Şev û rojan ji te ra pîrê xwedawendî Elî bit? (Ş.N.B)

Xwemal: Malxoyê malê, sermiyan.

Cezba tu revayî can li bal e

Sirra tu fîdayî ew xwemal e (E.X)

Xwe nas ke: Xwe bide nasîn.

Xwend: Xwendî, berbûrî. Serdar. 2.

Vexwend. Dawet kir.

Xweş ke: Saz bike.

Xweşme'de: Rengxweş.

Xweşnewa: Awazxweş.

Rameşger û xweşnewa û xweşdeng Şayeste û xweşqumaş û xweşreng (E.X)

Xweşqumaş: Xweşik, ciwan.

Xweşxeram: Meşxweş.

Xweşxîlqet: Rindaferîn.

Xwoşter: Xweştir.

Xwoy: Xwê.

Xwunem: Xwîna min.

Xwurem: Xweş. Şen, rûken. Xwezî.

Çendeki çimen xwurem bû

Lê medam ew subhedem bû

Min bihiş, baxê îrem bû

Lê seba go min: Seba ye (M.C)

Xewxa: Şemate, qîreqîr, galgal, deng, şer pevçûn.

Çi xewxa û şer û şor e di alem?

Çi keyf û şahî ye ev şîn û matem (Ş.M.E)

Xwûbrû: Rûspehî, Rûxweşik.

Xwûnfeşan: Xwînweşan.

Y

Yaban: Bîyan. Welatê dereke.

Ha ha gilû-giriyaye

Rehîma bi çol û yabana ketî (M.E.F)

Yabis: Hişk, ziha.

Ya ceseden: Ey laşê ku...

Yafet: Bûn, bûyîn.

Ya hafiz: e. Ey Xweda tu me biparêzî.

Yahû: Hawar û gazî, haho.

Yalan: Derew.

Ya Muhammed, esselam: Silav, Mihemedo.

Yane xod: Yan nexwe.

Yaqûb sifat: Mîna Yaqûb. Bavê Hz.

Yûsif e bi girîyan çavên wî kor bûn.

Yaqût: Navê xettatekî bi xweşikîya xetên xwe yên erebî ve navdar e. Dibêjin wî hezar nusxe ji Qur'anê nivîsîne. Bi eslê xwe ji Emasyayê ye li cem xelîfeyê Ebbasî Elmutasim xebitiye. Di sala 1298ê zayînê da wefat kiriye.

Yar: Dost.

Yara: k.s. Taqet.

Yara: k.s. Wêran, kavilbûn.

Yarê çerx: Yarê dinyayê, kesê ku ji dinyayê hez dike.

Yarî: k.s. Alîkarî.

Yarî: Dostanî.

Yarî kirin: Alîkarî kirin.

Yarî xar: k.s. Hevalê şikeftê, mebest Hz. Ebûbekir e.

Yasîn: e. Sûreteke Qur'ana pîroz e. Ji navên pêxember e. Sûretek jî bi vî navî heye.

Ya şefî'elmuznibîn îşfe'lena 'îndellah: Ey mehdervanê gunehkaran, şefa'et û mehderê bo me li nik Xwedê bike.

Yawer: Alîkar, nedîm.

Ya weylena: e. Erebi ye wateya wê "wax li me" ye. Wey li minê. Hawar ji bo me.

Ya xeyre xelqillah: e. Ey ew kesê ku ji hemî hebûnan baştir e.

Yazûx: Heyf.

Yecri-yecrî: Diçe, diherike.

Yed: e. Dest.

Yedek: Soxme, kurtikê jinan ku bi ser dêrîyên xwe da digirin⁴⁶.

Yedê beyda: Destê spî. Mûcîzeyeke pêxember Mûsaya. Dema Hz. Mûsa destên xwe dikire bin çengê xwe û derdixist, destên wî spî dibû, ronahî dida.

Hacet nîye cana yedê beyda bi der anîn Înkârî di dîn da nebit, î'cazi çi hacet? (M.C)

Yedî: Destê min.

Yedî beyza: e. Destê spî. Mebest destê H.z. Mûsa ye.

Yeffûko: Kuştina xedar.

Yehkî: Jê xeber dide.

Yehmûin: Dûxan, dû.

Yehmûm: Dûyê reşê ku li dojhê bilind dibe.

Rabû ve ji dil duxan û yehmûm

Reş kir li serî dîmaxê xeyşûm (E.X)

Yehûd: Cihû, yehûdî.

Yehwa: Aşiq e.

Yekbare: k.s. Bi yek care. Bi yekcar.

Yekneseq: Yekawa, bi yek teşeyî

Yek pirşingî: k.s. Yek şewq.

Yekrû: Weke hev.

Dibêjin hinde ev ehbabê yekrû

Wekî ferz e, gelek şerm e, bese zû (Ş.M.E)

Yeksan: Beranber, yekser, dûz, her zeman.

Roj û şev û weqt û sibh û êvar

Yeksan di numa li wan bi yek car (E.X)

Yekser barî kird aram: Demildest ji aramîyê reviya.

Yeksû: Weke hev.

Yekta: Yekane, Tekane.

Yelda: Dirêjtirîn şeva zivistanê ye, şeveke tarî ye.

Yelmûm: Çoleçira, şoleçira, mûma pirr û bi şû'le û şemal. Meş'ele.

Yemîn: Rast.

Yemlîxa: Yek ji eshabê kêf e.

Yenbû' û 'eyn: Kanî.

Yeng: Bajarekî bi tîrên xwe ve navdar. Birûyên mîna kevanên yengê.

Yengî: Tîrên ji yengê, cureyekî tîran.

Ye'nî: Anku, yanî.

Yequeq: Geş. Pir spî.

Dîtiye nûra yequeq me

Sed neseq lew tîn sebeq me

Pur nebi erzan li heq me

Lê Mela xweş bende ye (M.C)

Yeqîn: e. Teqez. Bawerî.

Yeqtin: Kunder

Ye'qûb: Yeqûb pêxember.

Yeqûlun-nasu: Xelq dibêje.

Yes: e. Naçarî, bêhêvîbûn. Bêhêvî.

Yesîl: Diherike.

Yesluku: Lirê diçe.

⁴⁶ Li gor Zivingî fistan yan jî sako ye.

Yesrîb: *e.* Navekî Medîneyê ye.

Yetîm: Sêwî.

Yewm: *e.* Roj

Yewme yub'esû: *e.* Ew roja ku meriv careke din radibe. Mebest roja qiyametê ye.

Yewme yuhşerûn: *e.* Roja ku xelk tên heşirkirin.

Yewmilqiyam: Roja qiyametê.

Yewmî dîn: *e.* Roja qiyametê.

Yexma: Talan.

Yexma dikit: Wêrn dike, birîndar dike.

Yexmager: *f.* Talanker.

Yexma kirin: Talan kirin.

Yexme: Talan.

Yexnax: Şahî, davet.

Yexsîr: *e.* Hêşîr, dîl, bende.

Çira hinde tu bê fikr î

Nizanî qeytu yê bîmrî

Li ser xwe bihnekê bigrî

Wekî yexsîrê hebsê da (M.C)

Yezdan: Îzîd, Îzed, Xweda, Xaliq, Allah, Ahoramezda.

Neborîne liser wî weqt û ezman

Ne ewwel axir e, ew zatê Yezdan (Ş.M.E)

Yezîd: Yezîdê kurê Mu'awiyeyê, ew ê ku Hz. Huseyn şehît xistiye.

Yêdek: Yekî din, bedel.

Yol: Rê.

Yola nelê: Şixula ne di cih da.

Yoldaş: Hevrê, hogir.

Yox: *t.* Ji “yok”a tirkî, tune.

Yuhibbuhum: Ji wan hez dike.

Yuhibbûn: Hez dîkin. Mebest sûreta Elmayide ayeta 54. *e.* “Gelî bawermendan eger hûn ji dînê xwe vegerin dê Xwedê qewmekî bîne ku ji wan hez dike û ew jî ji wî hez dîkin.

Yuhserul mere: *e.* Her kes dê bê heşirkirin.

Yumînûn: *e.* Ew bawer dîkin.

Yumn: *e.* Bereket, zêdayî, adan.

Yumna: Bereket û şefaeta Hz. Mihemed.

Yunkirû: Înkâr dike.

Yusra: Çep.

Yusur: *e.* Aramî, rihetî,

Yuşbî: Weke.

Yûbah: Helal.

Yûh: Roj, şem. Peyveke Qur'anî ye.

Yûsuf: Yûsîf Pêxember. Kurê Yeqûb pêxember e bi xweşîkbûn xwe û xewnên xwe ve navdar e.

Z

Zabe: Herikî, helîya.

Zac: Navê gencîneyekî ye.

Zad: Xwarin.

Hinik xwê di ber zad û paşê bixwe,

Heramî û tiştê bi şubhe mexwe (M.X.S)

Zaferanî: Zer mîna zaferanê.

Zahib: Çûyî.

Zahid: Di terîqetê da kesê ku dinya terk kirîye û rêya Xwedê girtiye. Dinyanexwaz.

Zahir: Dîyar, eşkere.

Zahir kirin: Dîyarkirin. Kifş û dîyar in.

Zahîre: Dîyarde, tiştê 'eyan.

Zaid: Zêde, bêtir.

Za'il: Çûyî, nemayî.

Zailkirin: Jêbirin.

Zakir: Yê ku zikir dike.

Zal: Spî.

Zal: Pîrejin.

Zala feleke: Feleka pîr.

Zala xefletê: Ji nişka ve.

Zall: e. Gumrah, rêwandayî.

Zam: k.s. Birîn.

Zanke: Çimkî, ji ber ku.

Zaqe: Tam bike.

Zar: k.s. Nearam.

Zar: k.s. Dev.

Zar: Jar, lawaz, bêçare. Perîşan, jar.

Zarava: Lehçe

Zarî: Jarî.

Zarî kirdewe: Vekirina dev.

Zarîn: Girîn.

Zar tiket: Girîn û zarezar dike.

Zar û nezar: k.s. Qels û jar, Kesê gelek lawaz.

Zat: Zatê Xwedê.

Zatê Kibriya: Kesê mezin mebest Xweda ye.

Zatê lem yezel: Xwedayê ku bêdestpêk û hertim heye.

Zatê wacib: Zatê Xwedê ku hebûna wî wacib e û divê hebe.

Îman me heye bi zatê wacib

Îmkanîyeta me bûye hacib (E.X)

Zatim niye: k.s.Wêraka min nîne. Cureta min nîne.

Zatî: Tişta ku ji pêşî ve heye. Bi xwe.

Zatî leheb: e. Xwedan pêt.

Zax: f. 1.Qijika reş, qijik. 2.Fitneker, fesad.

Ref ref nehiştin zaxi-zax

Danîn li dil min daxi-dax

Dê kî bimînit saxi-sax?

Westane leşker sef bi sef! (M.C)

Zaxelbeser: Çav dagerand. Di hedîsa Mîracê da tê gotin ku pêxember çav li Xwedê ket û nema çavên xwe jê dagerand.

Şeqqel-qemera te yek îşaret

Zaxel-besera te yek îbaret (E.X)

Zay: Car.⁴⁷

Zayi': e. Nemayî, wenda.

Zayil dikim: Radikim, tune dikim.

Zaze: Ey saz. zaz, saz.

Zebad: Madeyeke bêhnxeş.

Bêhneke xeş.

Efa û mar û ejder e, misk û zebad û 'enber e

⁴⁷ Li gor Mele Mihemedê Zivingî.

Nefxe yê rûhî perwer e, raîheyê hewayê zulf (E.X)

Zeban: *f.* Ziman.

Zebane: Zimanokê hesin ku ji hundir da li dîwarên zengil dikeve û deng derdixe.

Zebane goya: Zimanê gotinê.

Zebanê hal: Zimanê hal. Axaftina bêdendg. Tenê ji rewş û tevgerê tê famkirin.

Zebed: To. Kefîk, reşayîya erdê. Kef, tûk.

Behra du alem lê zebed

Mewc û hebab in hin cemed

Peyweste têtin cezr û med

Seywan li sehayê veda (M.C)

Zeberdest: Serdest.

Ew betlê delawerê zeberdest

Ewwel kemera tehewwirê best (E.X)

Zebî: Ask.

Zebîb: Mewîj, muyis.

Zebîh: Vekuştî.

Zebreqan: Roj û hîv/heyv.

Zebt: *e.* Ragirtin, bidestxistin.

Zebûn: *f.* Jar û bêhêz, ketî, bêbirî. Bêçare, zelîl.

Zebûr: Pirtûka ji pêxember Dawud ra hatiye.

Zecir: Dûrxistin, berîdan.

Zecr: Zor û zehmetî.

Qehra weku dijminan diket def',

Zecra weku zaliman diket ref' (E.X)

Zed: *f.* Lê xist, lê dan.

Ze'f: Jarî û lawazî.

Zefaf: Pêgihiştina bûk û zavê.

Ze'feran: Kulîlkeke zer e.

Zeh: Jih, têla sazê.

Zeheb: *e.* Zer.

Zehir: *e.* Piştewan, alîkar.

Zehirê nûş: Jehr vexwar, kesê jehr dinoşe.

Zehî: *f.* Peyva ecêbmayin û mezinkirinê, weke “maşelah” çi xweş. Çi rind! Çiqas delal. Aferîn, çi xweş.

Zehîr: *e.* Piştewan piştgirî.

Zehr: 1. Zuhre, Venus, Karwankuj, Gelawêj. 2. Pişt

Zehr: 1. Jehr. 2. Zar, ziman. Gotin, awayê axaftinê.

Zehra: *e.* Leqeba Hz. Fatîma ye, keça pêxember.

Zehra helahil: Jehra ku dikeje, jehra bêderman

Zehrê helahil: Jehra pir diwar a dikeje, jehra bêderman.

Zeîm: *e.* Serdar, serok.

Zeker: 1. Pola. 2. Kîr.

Zela: Şeqam.

Zelal: Rênasî, diyar.

Zelam: Tarî, reşahî.

Ji şewqê ebrûwan binmêt hîlal dîsa di qewseynan

Ji xawer bête xurşîdî zelam werbit di nûrê da (M.C)

Zele: Şeqam, sîle, lêdana bi destê vekirî.

Zel'eta: e. Xwedî dayîn

Zelîl: e. Berxweketin tirs û endîşe. Nizmpaye. Belengaz.

Zelîlî: Stûxwarî, milxwarî, belengazî.

Zelle: e. Şiqitîn.

Zelreşad: Xwedîyê qencî û başîyê.

Zelzele: e. Erdhej.

Zem: e. Zeliqandina bi hev ve.

Zemane: Dem û dewran.

Zemen: f. Dem, çax.

Zemîn: Erd.

Zemîr: Demîr, hiş û dil û wijdan.

Zemm: e. Zêdekirin.

Zemzem: Kanîyeke ava pîroz lê dertê. Li Mekeyê ye. Nawirandin, terennum. Zimzim, xurrînî.

Ewwel ew' kir bi sîdq-i der dema

Tecdîdê widû bi abê zemzem (E.X)

Zemzeme: e. Ziminî, dengê ku ji dûr ve tê bihîstin.

Zenan: Kirin.

Zenb: e. Guneh.

Gelek bawerqewî me dê 'efû kî

Ji rehma zêde zenb im tev mehû kî (Ş.M.E)

Zenberî: Cureyeke keştîyên mezin e

Zenbûr: e. Mozeqirtik.

Zend: Zirxê hesinî yê ji bo parastina zendên şervanan.

Zendane: Zirxê hesinî yê ji bo parastina zenden cengaweran.

Zende: Zindî.

Ku da rahet bibî şahane zende

Bikî keyfê wuha zewqê bi xende (Ş.M.E)

Zendeyê cawîd: Jîna ebedî, ya bê dawî.

Zendigî: Jîyan.

Zeneb: Dûv.

Zenexdan: f. Eçen, çene. Kortika çeneyê. Arzenî, çene.

Di wê çaba zenexdanê esîr im

Bi zulfan beste me zar û feqîr im

Zeng: Welatê çermreşan. Zencî, reşik, birûyên reş.

Zeng: Jeng, zengil.

Zeng: Sultan Mehmûdê Zengî.

Zengil: Zîl naqos, ceres.

Zengî: 1.Zencî, reşik. 2.Xala reş

Zengî: Emaddînê Zengî, paşayê Mûsilê (550-600 hicrî).

Zengûl: Meqameke muzîkê ye.

Zenî: 1.Jin. 2.Lêdan, birîn.

Ze'ni: Çûn

Zenîrê sade: Dilê pak, paqij.

Zenn: Guman.

Zen nebirî: Xeyal neke, guman neke.

Zenperest: Jinperest.

Zennûn e le bin zîndana: k.s. Yûnus pêxember di zikê masî da ye.

Zeqen: e. Çene, çenge. Erçen.

Ez ji zulfa te veristim, mi teleb kir lebi
le'l Lê di çaha zeqenê, bê ser û pa
çûme helek (M.C)

Zer: 1.Zêr. 2. Rengê zer.

Zerafet: Kêf û henek û şahî.

Hubba di dilan ji heddê der bû

Serheddê zerafetan kemer bû (E.X)

Zerb: e. Lêdan, mohrkirin û
xitimkirina diravan.

Zerbafe: Tayê zîvîn.

Zulfa sîyah 'enber bike

Xemlê ji zêre zer bike

Zerbafe û dîba ber bike

Misk û gulavê lê reşîn! (M.C)

Zerbav: Zerzerok. Rengzer. Navê
Balindeyekî ye, zerole, kenarî.

Reyhan û sunbul tê hene

Sed çiçek û gul tê hene

Zerbav û bulbul tê hene

Ew bexçeya gulzari xet (M.C)

Zerbeft: Cilên bi tayê zêr xemilandî.

Zerbenî: Milwank û gerdenîya zêr.

Zerbet: e. Bi tîr û şûr lêdan.

Zerbihe: Bihoka zer.

Zerbî ber kê kewt: k.s. Li kê da;
lêdana wî li kê ket.

Zerd: Zer.

Zerde: f. Zer.

Zerdeşt: Zerdeştê lawê Bîtiresp e, yek
ji pêxemberên Arîyan ê herî mezin û
navdar e û feylesof e. Avakarê dînê
Zerdeştîyê ye.

Mala xwe ji rengê qewmê Zerdeşt

Da agir û gazîya xwe raheşt (E.X)

Zerdewale: k.s. Mozeqirtik.

Zer'efşan: Zêrbelavker.

Zererder: Ziyandır.

Zerexêz: f. Zîrar lê peydabûn.

Zer'ê: Zîraetê, çandinîyê.

Zerf: Kûp.

Zerfeşan: Zêrkerî.

Zerf û wia': Aman, zerf.

Zerfişan: Bi zêr xemilandî, zêrkerî.
Zêrweşîn.

Îro seher tuxra nişan, îrab û herfên
zerfişan Hatîn digel bayê sibana, me
j'cambê dildari xet (M.C)

Zerg: Şîşên li xwedanê, yên evînê.

Zergan: Tîr.

Zergo: Xişra zêrîn weke gokê gilover.

Zergûn: Rengzer, zêrîn.

Zerî: Kejîn, delal, rind, xweşik.

Zerîf: Xweşkok û dilxweşker.

Zerkeş: Neqqaşê ku bi zêr dixemlîne.

Zerkêş: Zêrîn, avzêrkerî, neqîşandî.

Zernigar: Bi zêr neqîşandî.

Zerpersit: k.s. Zêrperest.

Zerq: 1.Hêşîn, şîn. 2.Durûtî, rîyakarî.

Zerr: e. Misqal, tozqal, piçûktirîn tişt.

Zerrat: Tiştên herî piçûk.

Zerre: Piçûktirîn tişt.

Zerresa: Wekî zerreye hûr û bêbiha.

Zerre tirîşqeyek: Zereya birûskê.

Zerrîn: Zêrîn.

Zerrînkemer: Kemerzêr.

Zerrînkuleh: Desmalzer. Taca zêrîn.
Er'era qamet-elîf neyşekera şox û şepal
Nazika sîmîten û xusrewê zerrînkulehê
(M.C)

Zerrînwereq: Pelzerîn, Pelzer.

Zertac: Taca zêrîn.
Ne hişyar im ji wê berqê
Ji zertacê li ser ferqê (M.C)

Zertar: Bi zêr dirûtî.
Mîr hatî bi serve, dî Memê jar
Pal dayîye balgeyêd-i zertar (E.X)

Zew: Ronahî.

Zewahir: Tiştên ku bi ronî û şewq

Zewal: Avabûn, avabûna rojê yan jî
hîvê, wendabûn.

Zewayid: Zêde, ji hed der.

Zewb: Helandin.

Zewc: Cot.

Zewcet: e. Jin.
Ne ewlad û zewcet, ne bab û ne da,
Ne hemkûf û mewt û zewala Xweda
(M.X.S)

Zewc û recûl: Jin û mêr.

Zewq: Çêj, tahm.

Zewqê dîdar: Çêja dîtina Xwedê.

Zewq û fereh: Kêf û xweşî, şahî.

Zewreq: Kelek, qeyik.

Zex: Nalîn, dengê zengil.

Zexel: Ava gerav, ne zelal.
Qelbêd-i zexel diket belorî
Pûlêd-i dexel diket filorî (E.X)

Zexm: Birîn.

Zexman: Piranîya "birîn"ê ye.

Zexmê dilan: Birîna dilan.

Zexma dilî: Birîna dilî.

Zeyd û 'emr: Du navên xeyalîne di
"Serf û Nehv" a erebî da. Du navên ku
bi piranî ji bo du rewşên ji hev cuda
tên bikaranîn, wek fail û meful/
subject û object.

Zeyn: e. Muzeyyen, xeml, pîraye

Zeyyinand: Xemiland.

Zeyyinîn: Xemilîn.

Zêrab: Ava zêr.
Ev ayetê nûrê ji Mela ra ku nivîsî
Katib ji surê nuqte bi zêrabê feşandin
(M.C)

Zêr zeber: k.s. Serobino, yek û
yeksan, serejêr.

Zêr û zeber: Talan, wêran.

Zêr û zeber kir: Serûbin kir, talan kir.

Zibat: f. 1.To. 2.Kef (Bi piranî bi
wateya toyê miskê tê bikaranîn.

Zidd: e. Dij.

Zidd û 'edû: Dijmin.

Zihî: Aferîn, maşellah. Xweşik, baş.

Zikr: Bîrewerî.

Zilêzêrd: Zilikê zer, zilezer.

Zill: e. Sih, sî.

Zille: k.s. Şîmaq, şeqam, şeq.

Zillê memdûd: Sîya dirêj, himmet û
alîkarî.

Zill û tûbbe' fey'i: Sih, sî

Zimam: Hevsar, serkêşî.

Zimihn: Galgalkirin. Ziminî, guminî.

Zimihn û zemzem e zarîn e mest im
Çi xarê bê gul e wek mari gestim
(Ş.M.E)

Zimzim: Deng, teqereq.

Zina: Têkilîya cinsî ya di navbera mêr
û jinan ya nerewa.

Zindeganî: Jîyandarî.

Zindegî: Jîyan, heyat.

Her kesê carek diye, ew zinde ma
hetta ebed
Ê nedîtî ew perî rû, zindegî lê bit
heram (M.C)

Zinde kir: Sax kir, jîn kir.

Zindiganî: Jîn, heyat.

Zinhar: Eman, nebînebî, hişyarî. Qet!
Eman! Baş bizanibe.

Zir: Sexte, neheqîqî.

Zira': Mil, pepik.

Zira'et: Çandinî.

Zirê: k.s. Kirasê hesinî, zirx.

Zirh: Zirxên hesinî ku şervan li xwe
dikin.

Zirke tal: k.s. Petîxê kal û negihîştî.

Zirre: k.s. Dengê zencîrê.

Zirrpîngî: k.s. Spîng, giyayekî li
biharê dedikeve.

Zişt: Nerind, xirab.

Ziya: e. Ronahî, şewq.

Ziyadeter: Zêdetir.

Ziyafîşan: Tîrêjweşan.

Ziyankar: Têkçûyî û xesirî.

Ziyade: Zêde.

Ziyade zar: Gelekî jar e.

Zî, kemançe, beng: Amûrên muzîkê
ne.

Zîb: Xemilandî û xweşik.

Zîba: e. Xweşik, delal.

Zîbaqeba: Fîstanrind, fîstanxweşik.

Zîbayî: Xweşikî, rindîtî.

Zîbe da: Bedew bû, xemilî.

Zîbende: Layiq û seza, ciwan.

Zîbeqê ferrar: Cîwaya ku difire,
belav dibe.

Zîbeqê ferrarî: Hilqevaztina beqê.

Ateşê işqê wucûdê hel dikit şubhetê
zêr Heye mumkin ne fîrit zîbeqê
ferrari hudûs (M.C)

Zîbê efser: Ciwanîya tacê. Ciwanîya
mîrtîyê.

Zî'b û xurab: Gûr û qijik.

Zîhad: e. Zahidî.

Zî kemalat: e. Xwedan tiştên baş,
xwedîyên qencîyan û kamilîyan.

Zîkrî zahîr: e. Qiseya devkî.

Zîlam: e. Tarîtî.

Zîlcemal: Xwedan ciwanî.

Sedqê serê zilcemaî, Zîne

Me'stîne ji destê min nigînê (E.X)

Zîl'erş: Xwedanê text. Mebest Xweda
ye.

Şehbaz-i ji qeydê merkeza ferş

Perwaz-i kir û gîhîşte Zîl'erş (E.X)

Zîllet: *e.* Perîşanî.

Zîmam: *f.* Hefsar, gem, bizmik.

Zînba: 1.Tirs. 2.Bizd, lerz, şewişandin.

Zîndegî: *f.* Jîyan.

Zîne: *e.* Ciwanî, delalî.

Zînet: Xeml.

Zînê dîn: Xemla dîn.

Zînhar: Hayadar. Nebî nebî!

Zînnûr: *e.* Xwedan nûr. Leqeba Usman kurê 'Effan *e.* Xelîfeyê sêyem *e.*

Zîr – zêr: *f.* Jêr.

Zîra': Zend, ji ber ku.

Zîr û bem: Têla stûr û ya zirav di amûra muzîkê ya Êdê da. Têlên dengên zirav û stûr derdixin.

Zîr û zeber: Ser û bin.

Zîrwe: Lûtke, pope, cihê herî bilind.

Zîwer: Zeger, xişr, xeml.

Zîwersifat: Yên weke xişr û zînetê bedew.

Zîz: Xeyidî û torebûyî.

Zor: 1.Zehf, gelek, pir. 2.Zehmet, bi êş.

Zor: Hêz, qewet.

Zorî ranegrin: *k.s.* Pir nebetilînin.

Zox: Edab. Ava zer ku di birînê da dicive.

Zubad: Bêhnxeş. Bêhneke xeş.

Zuban: *f.* Ziman.

Zuban awer: *k.s.* Kesê ku pir dipeyive.

Zubanekeş: Zimankêş.

Zubanî lal: *k.s.* Zimanê te lal *e.*

Zubde: *e.* Puxte, kurta.

Zubid: To, tomast.

Zucacî: Ji came, şûşeyî, cam. Mebest dilê zîz *e.*

Zuha: Ziwa, ne şil *e.*

Zuhd: *e.* Terkkirina çêjên cîhanê. Zahidî, çilekêşî. Terka dinyayê. Ji bo îbadetê xwedûrkirina ji dinyayê, sofitî.

Zuhha: Ziwa, ne şil.

Zuhel: Stêrka mezin ya nîşana bedbextîyê. Keywan, Saturn.

Zuhel bû muşterî: Stêrka bêyom bû stêrka xweşbextî û siûdê.

Zu heya: *e.* Xwe daye şermê.

Zuhre: Navê stêrkekê ye.

Zuhresîma: Ya ku rûyê wê mîna stêrka Zuhreyê ye. Dêmxweşik.

Zuhêl: Navê stêrkekê ye.

Zuhr: *e.* Danê nîvro.

Zuhûr: Geşî, biriqîn, xuyabûn.

Zuhûr bit: Derkeve.

Zuhurbûn: Dîyarbûn, peydabûn. Xuya bûn.

Zu intiqam: *e.* Xwedîyê tolhildanê mebest Xweda ye.

Zukûr: Piranîya zeker yanî nêr *e.*

Zulal: Ava pak û şîrîn.

Di nav hev tînin diçin enhar û kanî

Zulal û safî wek maê cenanî (Ş.M.E)

Zulam: Tarîfî.

Zulcelal: *e.* Xwedî mezinayî, xwedîyê bilindahîyê, mebest Xweda ye.

Zu lewn: *e.* Xwedî reng.

Ne cism û ne cewher ne nûr û 'erez,
Ne zû lewn û mîqdar û şîkl û merez
(M.X.S)

Zuleyxa: Jina ku dile wê ketibû Yûsif pêxember.

Zulf: Kezî. Bisk.

Zulfa çu hey: Zulfa wekî mar.

Zulfa perişan: Zulfa dav dav, ne lêk kombûyî dijî yek in.

Zulfa 'uqab: Zulfên wek eylo pencên xwe di laşe evîndar ra dikin.

Zulfa siyah: Biska reş.

Zulf bûn cema: Zulf civîyan, gihîştin hev.

Zulfesad: *e.* Xwedîyê fesadiyê.

Zulfeyn: Herdu biskên yarê

Zulfiqar: Navê şûrê xelîfe Elî ye ku du dev bû. Şûrê ku Mihemed (a.s) daye Îmamê Elî.

Zulf meşk: Zulfa wekî miske reş û bêhnxeş.

Zulf û Lehfet: Herdu jin, xulamên Leta û Rahilê ne wan ew dîyarê Yeqûb kirine.

Zulmat: Reşayî, tarîfî.

Zulmet: *e.* Tarîfî.

Zulmetistan: Tarîkistan.

Zulminen: Xwedanê minetan ku Xweda ye.

Zul-Qerneyn: *e.* Leqeba Îskenderê Makedonî ye. Îskenderê Zulqerneyn.

Zulûmat: Tarîfî.

Zumerred: Kevirekî giranbuha

Zu mezîrat: Bixwaze,

Zumre: *e.* Cema'et, komel, civat, kom.

Zunnar: *e.* Kembera filehan. Kembera xaçparêzan. Kembera ku keşe û rahib li noqa xwe girêdidin.

Zunnariperest: Xaçperest.

Zunûb: *e.* Guneh, kêmahî. Piranîya gunehan.

Tu xeffarê zunûban î

Tu settarê uyûban î

Tu keşşafê kurûban î

Kî ye yê tu efû nakî? (M.E.F)

Zurk: *f.* Xûya xerab, xûya pîs.

Zurrê wan: Li dijî wan. Ziyankarîya wan.

Zurtuha: Min dîtar kir. Ziyaret kir.

Zuşt: *k.s.* Ne xweşik, ne şîrîn.

Zuxall: *k.s.* Komira şewitî.

Zuxallistan: Reş wekî komirê tarîstan.

Zuzac: *e.* Şûşe, qedeh, cam.

Ayîneyi camî cîhan bînî Cem

Badeyî le'lî ne di caa zucac (M.C)

Zû: Xwedî, xwedan.

Zû funûn: *e.* Hunermend.

Zûhd: Devberdan û destkişandina ji
dunyayê, ji zewq û hewesên nefsanî.

Zûhzîhe: Dûrbûyî.

Zûmn: Nav, hundir

Zûmnî: Di bin ra, di nav ra, bi îma û
îşaret.

Zûx: *k.s.* Birîn.



ENCAM

Edebîyat bi dîtina nivîsê ve wir da di jîyana civakan da cihekî girîng digire. Bi rêya edebîyate zimanên eşîran ên rojane bûne zimanên neteweyî û bi saya wê civakên hemawaz hatine afirandin. Heger edebîyat nebûya me îro nikaribû behsa neteweyên yek hest û yek ziman bikira. Di jîyana neteweyan da cihê edebîyata klasîk pir girîng e berhemên neteweyan yê hunerî di destpêkê da bi piranî bi wê edebîyatê hatiye dayîn. Berhemên wê edebîyatê bi piranî helbestkî ne. Ji bo vê giranî dane ahenga peyvan. Ji bo vê neteweyên heman dîn ji zimanan hev peyv girtine. Ev jî bûye arîşe ji bo famkirina zimanên wê edebîyatê ji aliyên girseyan. Di edebîyata Rojhilatê da ji ber dînê Îslamê gelek peyvên erebî ketiye di nav zimanên din da. Dîsa di Rojhilatê da farisî jî zimanê edebîyatê bû ji ber vê gelek peyvên farisî jî derbasî zimanên gelên misilman bûne. Edebîyata kurdî ya klasîk jî ji aliyê teşê û dirûv ve di bin bandora van herdu edebîyatan da maye. Ji ber vê gelek teşê û peyvên herdu edebîyatê derbasî kurdî bûne. Ji ber vê jî zimanê metnên wê edebîyatê gelek caran nehatiye fam kirin. Dîsa ji bo famkirina zimanê Qu'ranê pêwîst bû ku zimanê erebî bihata zanîn. Ji ber vê ferhengên li Rojhilat pêşî bi piranî bi erebî û piştra jî farisî bûn. Di kurdî da jî yekem ferhenga manzûm *Nûbhara Biçûkan* bi erebî- kurdî ye. Piştra jî dîsa çend ferhengên menzûm yê bi kurdî-erebî û kurdî- farisî tê çekirin. Îro jî gelek ferhengên bi awayên zanistî û birêkûpêk hatine çekirin lê ji bo famkirina metnên klasîk tu ferhengên kurdî-kurdî nehatine çekirin. Ev tez jî dixwaze ku di wî warî da vê kêmasîyê telafî bike.

Me ji bo vê xebatê gelek berhemên klasîk lajand û peyvên bîyanî, peyvên kurdî yê kêrî kara dît û tomar kir. Piştra jî me di ferhengên kurdî yê modern û îroyîn da wateyên wan peyda kir. Dîsa ji bo şêlîbûnê çê nebe me wateyên peyvan di ferhengên Osmanî û tirkî jî lajand. Ji bo wateya peyvên kurdî yê kêrî kara me serî li ferhengên peyvên kevnar jî da. Hin peyv nivîsîna wan cuda bûn me ji bo vê nivîsîna cuda di nav kevanekê da nîşan da. Hin peyv çend wateyên wan hebûn me hemî xal bi

xal nîşan da. Di vê ferhengê da ne tenê peyvên kurmancî hene ji soranî û lorî jî peyv hene ji ber vê me peyvên bi van zaravayan bi nîşaneyê tîpa serê wan nîşandan. Dîsa hin peyven erebî û farisî jî bo safîkirina wateya wan rayekên wan hatine nîşandan.

Hêvî dikim ev xebatê jî bo famkirina edebîyata klasîk hê bibe çavkanîyeke girîng. Ji bo peywendîya rabirdû û dahatûyê pêwîst e nîşên pey tîpên paşmayên xwe fam bikin ji bo vê jî klasîk çavkanîyên bêhempa ne. Ji ber vê jî pêwîst e ku em zimanê klasîkên xwe fam bikin. Ji bo vê jî ferhengeke birêkûpêk lazim e. Ev ferheng jî dixwaze vê peywirê hilde li ser milên xwe.



ÇAVKANÎ

- Adak, Abdurrahman, Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk, Weşanên Nûbihar, İstanbul, 2014.
- Adak, Abdurrahman, Teşeyên Nezmê Di Edebîyata Kurdî ya Klasîk Da, İstanbul, Weşanên Nûbihar, 2019
- Akalın, Ş. H., “Sözcük Bilimi ve Sözlükçülük” Atatürk Kültür Ve Tarih Yüksek Kurumu Türk Dil Kurumu: Ankara, 2010.
- Akçay, Yusuf, “Manzum Sözlüklerin Modern Sözlükçülüğe Uygulanabilirliği”, Turkish Studies, Volume: 4/4, 2009.
- Akçay, Yusuf, “Osmanlı Dönemi Sözlükçülüğü Ve Karahisarî’nin Şâmilü’l-Luga İsimli Sözlüğü Üzerine Bir İnceleme”, Doktora Tezi, İstanbul, 2010,
- Arslan , Anıl, “Tuhfe-i Hüsâmî (İnceleme, Çeviri Yazılı Metin, Dizin)”, Yüksek Lisans Tezi, Eskişehir, 2016.
- Aykaç, Seyfettin, “Mela Mehmûdê Tîruwayî û Ferhenga Wî Ya Menzûm (Metn û Lêkolîn)”, Yüksek Lisans Tezi, Bingöl, 2016,
- Altûğ, Halîl, Rastnivîsa Kurdî (Kurmancî), Weşanên Sîtav, Van, 2019.
- Baskın, S., "Türkiye ve Dünyada Sözlük Bilimi: Tanımı, Kapsamı ve Diğer Bilimlerle ilişkisi/ Lexicography in turkey and throughout the world: the definition and the scope of lexicography and its relationship with other sciences". International Journal of Language Academy, 2014.
- Bozarslan, M.Emin, Baxçê Zimên, Weşanên Deng, Stenbol, 2013.
- Bozarslan, M.Emin, Mem û Zîn, Ehmedê Xanî, Gün Yayınları, İstanbul, 1968.
- Cîhanî, Perwîz, Şiroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî, Weşanên Nûbihar, İstanbul, 2013.
- Dêreşî, Seîd, Dîwana Weda’î, Weşanên Nûbihar, İstanbul, 2012.
- Develioğlu, Ferit, Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat, Aydın Kitabevi, Ankara, 2003.
- Dilovan, Selman, Dîwan, Melayê Cizîrî, Weşanên Nûbihar, İstanbul, 2012.

- Dîwan, Seyîd Elîyê Findikî, Amadekirin: Selman Dilovan-Huseyn Şemrexî, Weşanên Nûbihar, İstanbul, 2017.
- D. Îzolî, Ferheng, Kurdî -Tirkî, Tirkî-Kurdî, Weşanên Deng, Stenbol, 2013
- Doskî, Tehsîn Îbrahîm, Dîwana Perto Begê Hekkarî, Weşanên Nûbihar, İstanbul, 2014.
- Dost, Jan, Ferhenga Kurdistanî, Elî Ekber Kurdistanî, Weşanên Nûbihar, İstanbul, 2010.
- Dost, Jan, Ehmedê Xanî Mem û Zîn, Weşanên Avesta, Stenbol, 2010.
- Durmuş, İsmail, “Sözlük”, DİA, C: 37, s. 398-401; Ahmet Topaloğlu, Mustafa S. Kaçalın, “Sözlük”, DİA, C: 37, s. 402-414.
- Durre, Abdurrahman, Şerha Dîwana Ehmedê Xanî Felsefe û Jîyana Wî, Weşanên Avesta, Stenbol, 2002.
- Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Türkçesi: M.Emin Bozarslan, Gün Yayınları, Stenbol, 1968.
- Ehmedê Xanî, Nûbar, Wergera ji tîpên erebî: Z. Kaya, Weşanên Roja Nû, Stockholm, 1986.
- Ehmedê Xanî, Şerha Dîwana Ehmedê Xanî-Felsefe û Jîyana Wî, Avesta Yayınları, İstanbul, 2002.
- Ehmedê Xasî, Mewlidê Kirdî, Amadekar û Tadayîş, Roşan Lezgîn, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2013.
- Ertekin, M.Zahir-Xoşnaw, Hêmin ‘Umer, Dîwana Mehwî, Weşanên Lîs, Diyarbakır, 2018.
- Şêx Mihemed Eskerî, Iqdê Durfam, Wergera ji tîpên erebî: Zeynelabîdîn Zinar, Weşanên Apec-tryck & Förlag, Stockholm, 1989.
- Farqînî, Zana, Ferheng, Sözlük, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, 2021.
- Gewerî Ayhan, Yûsuf û Zuleyxa, Selîmîyê Hîzanî, Weşanên Nûbihar, İstanbul, 2013.
- Güler Doğan Averbek “Anadolu Sahasında Müstakil Bir Tür Olarak Manzum Sözlükler (Tuhfeler)”, Divan Edebiyatı Araştırmaları Dergisi, Sayı: 23, İstanbul, 2019, s.79(62-83).
- Işık, Ümit, Xebatek li ser ferhengên Kurdî, Teza Masterê, Muş, 2017.
- İpekten, Haluk, Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz, İstanbul, Dergah Yayınları, 1994.

- İsmail Durmuş, “Sözlük”, DİA, C: 37, s. 398-401; Ahmet Topaloğlu, Mustafa S. Kaçalın, “Sözlük”, DİA, C: 37, s. 402-414.
- Kılıç, Atabey, “Bosnevî Mehmed Necîb Sübha-i Sıbyân Şerhi Hediyyetu’l-İhvan”, Laçın Yayınları, Kayseri, 2007.
- Komxebata Kurmancîyê, Rêbera Rastnivîsînê, Weqfa Mezopotamyayê, Stenbol, 2019.
- Kurdistanî, Alî Ekber, Ferhenga Kurdistanî, Werger: Jan Dost, Weşanên Nûbihar, İstanbul, 2010.
- Levend, A. S. , Divan Edebiyatı, İstanbul, Enderun Kitabevi, 1984.
- Melayê Cizîrî Dîwan, Amedekar: Z. Kaya, M.Narozi. Weşanên Roja Nû, Stockholm, 1987.
- Mele Xelîlê Sêrtî, Nehc-ul Enam, Weşanxana Kurdistan, Stockholm, 1988.
- Muhtar, Cemal, “İki Kur’an Sözlüğü Lugat-ı Feriştioğlu ve Lugat-ı Kânûn-ı İlâhî”, Marmara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Vakfı Yayınları, İstanbul 1993.
- Nehcul Enam, Mele Xelîlê Sêrtî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, 2002.
- Newayî, Merdan, Tesrîfa Teremaxî, Weşanên Nûbihar, İstanbul, 2018.
- Onay, Ahmet Talat, Eski Türk Edebiyatında Mazmunlar ve İzahı, MEB. Yayınları, İstanbul, 2004.
- Öz, Yusuf: “Tarih Boyunca Farsça-Türkçe Sözlükler”, Doktora Tezi, Ankara, 1996
- Pala, İskender, Ansiklopedik, Divân Şiiri Sözlüğü, Kapı Yayınları, İstanbul, 2018.
- Pertew, Ramazan, Ferhenga Kerbelayî, Mîrsad’ul-Etfal/Şahrehe Kûdekan, Şêx Mihemed Kerbelayî, Weşanên Nûbihar, 2012.
- Rêbera Rastnivîsînê, Komxebata Kurmancîyê, Weqfa Mezopotamyayê, İstanbul, 2019.
- Sadîni, M.Xalid, Feqîyê Teyran, Weşanên Nûbihar, İstanbul, 2003.
- Sadîni, M.Xalid, Mela Huseynê Bateyî, Jîyan, Berhem û Helbestên Wî, Weşanên Nûbihar, İstanbul, 2010.
- Sami, Şemseddin, Kamûs-ı Türkî, Çağrı Yayınları, İstanbul, 2001.
- Serdar, Bamed, Dîwana Şêx Şemsedînê Exlatî, Weşanên Nûbihar, İstanbul, 2015.
- Sirul Mehşer, Feqe Reşîdê Koçer, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, 2002.

Siyahpûş, Çend Xezel û Helbest, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, 1999.

Şeyxbizînî, Qendîl, Hezar û Yek Peyvî, Weşanên Sitav, Van, 2018.

Şêx Evdirehmanê Axtepî, Dîwana Rûhî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, 2002.

Usta, H. İ. (2010). "Sözlükçülük ve Sözlük Araştırmaları" Modern Türklük Dergisi.cilt7. Sayı 2: 94- 95.

Yıldırım , Kadri, Baba Tahirê Uryan, Hayatı Görüşleri Dîwanı, Weşanên Avesta, İstanbul, 2013.

Yıldırım, Kadri, Ehmedê Xanî'nin Fikir Dünyası, Akyad, Ağrı, 2011.

Yûsuf, Abdulreqîb, Şairên Klasîk ên Kurd, Weşanên Jîna Nû, Uppsala, 1988.

Zinar, Zeynelabidîn, Nimûne ji Gencîneya Çanda Qedexekirî, Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Stockholm, 1991.

TEZİN TÜRKÇE ÖZETİ

Edebiyat, ulusal kültürün inşasında önemli bir rol oynar. Milliyetçiler, dil aracılığıyla edebiyat yoluyla bir ulus inşa etmek isterler. Milliyetçiler için edebi metinlerin kutsal kitaplar kadar değerli olmasının nedeni budur. Gregory Jusdanis ulusun oluşumunda edebiyatın rolünü şöyle anlatır: İmparatorluğun katı yasalarının ve kilisenin zorunlu geleneklerinin aksine, ulusal kültür, bireyleri topluluk görüşleri, deneyimleri, hikayeleri ve elbette dil aracılığıyla bir araya getirir. Üyeleri bu devlet taslağı ile birbirine bağlıdır, böylece ortak miraslarını, insanlıklarını ve kaderlerini yaşarlar. Bir bütün olarak edebiyatın kanonu, bir ulusun hikayesini, kişinin kendisini birleşik bir ulusun vatandaşları olarak görme deneyimini kolaylaştırmak için anlatan metinlerden oluşur. Ancak kanon sadece ulusal kimliğin bir temsili olmayıp, halk arasında milliyetçiliğin değerlerini de yansıtır ve bu kimliğin üretilmesinde görev alır. Kanon, ulusun tarihini - ana dilde - kaydeder; topluluk üyelerinin bilinmeyen bir nedene neden olan sorunlarla başa çıkmalarına yardımcı olan kronolojik bir süreklilik oluşturur. Modernitenin zamansal düzeninde, geçmişin ütöpik bir dininin bir yeri özlediği, bir yeri özlemediği kanondur. Kimliklerin çatırdadığı, toplumsal ilişkilerin çatırdadığı bir dönemde kanon, eski çağların nimetlerine bakar ve insanlara kültürel bir canlanma ümidi sunar.”

Ulusların kurucuları, milleti edebiyat yoluyla kurmuşlardır. Bunun için de dil en faydalı araçtır. Dil, bir milletin inşasında en önemli araçtır. Milliyetçiler edebiyat aracılığıyla ulusun üyelerini duygusal olarak birbirine bağlar. Dil ve milletin ruhu birdir. Yiannis Psikharis dili ve ulusu bir olarak görür. “Dil ve millet birdir. “İnsan ülkesi için savaşmayı sever, insan ulusal dili için savaşmayı sever.” Dil kelimelerinin nesillerinin yeni nesillere ulaşmasında sözlüklerin rolü oldukça önemlidir.

Üniversitelerde Kürt edebiyatı öğrencileri Arapça ve Farsça kelimelerden dolayı klasik eserleri anlamakta zorlanırlar. Yine klasikleri okuyanlar bu nedenlerle klasik metinleri çoğu zaman anlamamakta, bu da yeni nesilleri klasiklere

yabancılaştırmaktadır. Bu eser, klasikleri anlamak ve klasiklerin yorumlanmasından kaynaklanan zorlukları ortadan kaldırmak amacıyla hazırlanmıştır. Bu çalışmanın temeli klasik ürünlerdir. Amacımız, halkımızın kadim dilini ve dilinin gücünü bilmesini ve anlamasını sağlamaktır. Kürt dili bölgenin en eski dilidir ve canlı ve kadimdir. Bu dil binlerce yılın emeği ve ürünüdür. Bu eser, dilin bu zenginliği ve gücünün yeni nesillere ulaşması ve bu nesli bu gençlerden mahrum bırakmamak için hazırlanmıştır.

Tezimizin konusu da Klasik Edebiyat Sözlüğüdür. Bu tez klasik edebiyattaki Arapça, Farsça, Türkçe ve eski Kürtçe kelimelerin bugünkü anlam ve kullanımlarını göstermektedir. Niyetimiz, klasik edebiyatta kullanılan kelimelerin bugünkü anlamlarını izah etmektir.. Klasik edebiyat hakkında kısaca bilgi vereceğiz. Amacımız klasik edebiyatı kısaca tanımlayıp sözlükçülük hakkında bilgi vermek ve ardından sözlüğe başlamaktır

Kürt edebiyatında özellikle Kuzey'deki klasik Kürt edebiyatında hali hazır yapılmış bir Kürtçe klasik edebiyat sözlüğü sözlüğü oluşturulmamıştır. Amacımız bu sözlükle bu eksikliği gidermektir. Klasik edebiyat ve sözlükçülüğe odaklanarak başlayacağız. İlk sözlüklerin Müslüman milletlerin edebiyatında ne zaman hazırlandığını ve Kürt edebiyatında ne zaman başladığını açıklayacağız. Daha sonra kelimeleri madde madde işaretleyip açıklayacağız. Ayrıca bazı kelimelerin köklerini de tanımlayacağız. Bu çalışmamızda sadece Kurmanci Kürtçesinin kelimelerini değil ayrıca Lori ve Sorani lehçelerinin kelimelerini de gösterdik. Son olarak sonuçları ve kaynakları yerleştireceğiz. Kaynaklar çoğunlukla şairlerin şiirleri ile sözlükler ve gramer kitaplarıdır. Bu kaynağı ikiye ayırdık bunu birincil ve ikincil kaynaklar olarak sınıflandırdık. Birincil kaynaklar şunlardır:

Bu tezimizde Mem û Zîn, Dîwana Ehmedê Xanî û Nûbihara Ehmedê Xanî, Dîwana Weda'î, Dîwana Melayê Cizîrî, Iqdê Durfama Şêx Mihemed Eskerî, Dîwana Seyîd Elîyê Findikî, Diwana Pertew Begê Hekkari, Ferhenga Eli Ekber Kurdistani, Yusuf ve Zuleyxaya Selimiyê Hîzanî, Nehcul Enama Mele Xelîlê Sêrtî, Feqîyê Teyran'ın bütün eserleri, Mewlîda Mela Huseynê Bateyî ve şiirleri, Mirsad'ul-Etfala Şêx Mihemed Kerbelayî, Dîwana Mehwi, Diwana Şêx Şemsedinê Exlati, Sirrul Mehşera Feqe Reşidê Koçer, Xezel û Helbestên Siyahpuş, Diwana Şêx

EvdirehmanêAxtepî, Baba Tahir Uryan'ın Dubeytisi ve Tesrifa Teremaxî birer birer tarandı.

İkincil kaynaklar şunları içerir:

Ardından Zana Farqînîn Sözlüğüne, Ferit Develioğlu Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lugat'ı, İmla Kılavuzu (Komxebata Kurmanci), İskender Pala'nın Ansiklopedik Şiir Sözlüğü, Talat Onay'ın Eski Türk Edebiyatında Mazmunlar ve İzahı Hezar û Yek Peyva Qendîl Şeyxbizînî, Rastnivîsa Kurdî (Kurmancî) ya Halîl Altûğ, Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk û Teşeyên Nezmê Di Edebîyata Kurdî ya Klasîk Da ya Abdurahman Adak, Manzum Sözlüklerin Modern Sözlükçülüğe Uygulanabilirliği ya Yusuf Akçay, Baxçê Zimên a M. Emin Bozarslan, Ferhenga D. Îzolî ya Kurdî -Tirkî, Tirkî-Kurdî, Ferhenga Kurdistanî ya Elî Ekber Kurdistanî, Tarih Boyunca Farsça-Türkçe Sözlükler'a Yusuf Öz, Sami, Şemseddin, Kamûs-ı Türkî ya Şemseddin Sami, Ferhenga Hemîdî ya Yusuf Ziya Paşa da, Nimûne ji Gencîneya Çanda Qedexekirî ya Zeynelabidîn Zinar û Şairên Klasîk ên Kurd a Abdulreqîb Yûsuf.

Bu eser, yılların ve iki yıllık sistemli ve disiplinli çalışmanın notları ile hazırlanmıştır. Topladığı bilgileri genel olarak değerlendirdim. Kelimelerin anlamlarını doğru ve eksiksiz açıklamak için çok sayıda kaynak incelenmiş ve taranmıştır. Daha sonra alfabetik bir sırayla madde madde açıklanmış ve düzenlenmiştir. Daha sonra birçok divan taranıp kelimelerin geçtiği beyitlerden örnekler verdik.

Arap ve Fars dillerinde İslam'ın etkisi altında kalan edebiyata klasik edebiyat denir. "İslam döneminde İslam dininin, Arap dillerinin, Fars dilinin ve İran kültürünün etkisi altında öne çıkan yazılı edebiyata bazı yöntemlere göre 'Klasik Edebiyat' denir. Arapların İslamiyet ile birlikte oluşturdukları ve İslam dininin etkisi altında oluşturdukları edebiyata klasik edebiyat, eski edebiyat veya müelliflerin eserlerinin Divan adı verilen kitaplarda toplanmasından dolayı Divan edebiyatı denilmiştir. Bu edebiyat, İslam medeniyetinin estetiğine evrilmiş ve yirminci yüzyıla kadar varlığını sürdürmüştür.

Klasik edebiyatın gençliği ve estetiği, kendine has bir dili, metaforlarını ve nesnelerini, kendi imajının mitolojik unsurlarını ve kendi estetik standartlarını korumuş, geniş bir coğrafyada Müslüman milletler için bir edebi dil oluşturmuştur. İslam'ın başlamasıyla yirminci yüzyılın dördüncü çeyreğine kadar varlığını sürdüren İslam, yerini modern edebiyata bırakmış ve günümüzde modern edebiyat için eşsiz bir kaynak haline gelmiştir.

Edebiyatı olmayan milletler, mükemmel ve güçlü bir dile sahip olamaz ve gelişemezler. Dolayısıyla edebiyatsız bir toplumdan hiç kimse bir ulus inşa edemez. Edebiyatı olmayan milletler çorak topraklar gibidir. Klasik edebiyatımız da İslam dininin etkisiyle gelişmiş ve zaman içinde kendine has ürünler meydana getirmiştir. Klasik Kürt edebiyatı da İslam dininden ve islam dininin başat dilleri olan Arapça ve Farsça ve gibi dillerden ve bu milletlerin kültürlerinden etkilenmiştir. Klasik Kürt edebiyatı yazılı bir edebiyat olduğu için kaynakları yazılı ürünlerdir. Klasik Kürt edebiyatı, güç ve üretkenlik açısından Arap, Fars ve Türk edebiyatlarından aşağı değildir. İslam'ın başlangıcından yirminci yüzyıla kadar olan klasik edebiyatımız, dilimizin gücünü ve güzelliğini yansıtır. Edebiyatımız sadece İslam mitolojisine değil, İran da Kürt mitolojisine ve kültürüne dayanır. Mem û Zîn bir Kürt hikâyesidir ve sözlü edebiyatımızın en yaygın ve güçlü ürünüdür. Bu nedenle Mem û Zîn Mesnewisi Kürt milleti arasında milli bir destan olmuştur. Klasisizm, ulusların edebiyatının ruhudur ve modernizmin mayasıdır. Yazılı edebiyatımız, klasik edebiyatımızın temel direklerine dayanarak yükselmiş ve bu güne kadar gelmiştir. Dilimizin kendine has özellikleri klasikler sayesinde korunmuş ve dilimizin üzerindeki baskı ve baskılara karşı kendini savunmuş ve günümüze kadar gelmiştir. Dilimiz klasiklerimiz sayesinde bozulmamış, gücünü ve zenginliğini korumuştur.

Klasik edebiyatımız birkaç yüzyıl boyunca varlığını korumuştur.. Böylesine uzun vadeli bir edebiyatı tanımak için bu edebiyatı oluşturan milletin kültürünü tanımak gerekir. O kültür, o dönemin ürünlerini etkilemiş ve kendine göre eşsiz bir ihtişam yaratmıştır.

"İslam dininin, Arap ve Fars unsurlarının ve İran kültürünün etkisi altında" ifadesi, klasik Kürt edebiyatındaki kaynaklara da atıfta bulunur. Klasik edebî

metinlerde bu dört unsur mutlaka yer alır. Klasik Kürt edebiyatının kaynaklarını bu dört unsur altında şu şekilde sınıflandırabiliriz.

1. İslami Unsurlar
2. Dini Unsurlar
3. Allah ve Kuran-ı Kerim
4. Peygamber ve Hadisleri
5. İnanç ve Teoloji
6. Fıkıh
7. Dini ve Tarihi Karakterler
8. Tasavvufi Öğeler
9. Arapça Unsurlar
10. Pers Unsurları
11. İran'ın Kültürel Öğeleri / Asya.

Klasik edebiyatımız bu unsurları ve kaynakları desteklemiştir. Bu kavram ve unsurlar, klasik fikir edebiyatımızın kaynaklarıdır.

Klasik kelimesini duyduğunuzda, daha çok eski edebiyat insanların zihinlerinde şekillenmekte. Ancak sadece antik çağdan dolayı değil, aynı zamanda mertebesi yüksek, özel usullere, kurallara ve düzenlemelere sahip olan ve bu yol, araç ve izinlerden biri olmayan sözde klasik adı nedeniyle adlandırılmıştır. Bu adlandırmanın bir başka nedeni de, bu tür literatürün sınıflara en yüksek öğrenme ve öğretme örnekleri olarak gelip gitmesidir. Şekil bakımından klasik edebiyat iki tür olabilir: kurgulanmış klasikleri veya şiir, kutsal klasikler veya şiirler. Klasik şiir, üslup bakımından birkaç isme ayrılır. Onlardan aşağıdaki isimleri sayabiliriz:

1. Kaside.
2. Gazel.
3. Mesnevi.
4. Ruba'i /Dörtlük

5. Dubeyti.
6. Ferd.
7. Kıta
8. Mustazad.
9. Terkihi Bend.
10. Tercii Bend.
11. Musemmat.
12. Tezmin ve... Ortadoğu halklarının edebiyatında yaygın olan bu biçimlerin yanı sıra Kürtçede üçgenler ve 'hezlemesnewi' de vardır. Üçlemelerin ana kaynağı Horasan Kürt folklorudur. Xezelmesnewî de özellikle Gorani lehçesinde mevcuttur ve Mevlevî Tawegozi'nin aşk şiirleri bu formun en yüksek örneğidir.

Edebiyatın malzemesi dildir. Dil aynı zamanda kültür, toplum ve coğrafya ile güçlü bağları olan ulusal bir unsurdur. Güzel sanatlar kullandığı malzeme dolayısıyla daha beynelmileldir, ancak dil kullanımı nedeniyle edebiyat ulusal bir semboldür. Edebiyatın gelişimi bu nedenle tarihsel, sanatsal ve kültürel faktörlerle bağlantılıdır. Toplumumuzun zaman içindeki gelişim tarihine baktığımızda toplum ve edebiyatın gelişiminin paralellik arz ettiğini görebiliriz. Bu paralellik günümüzde teknolojinin ve iletişim araçlarının gelişmesiyle daha da artmıştır.

XIX. yüzyıla kadar Kürt edebiyatının yazılı metinleri yoktu. Elimizdeki verilere göre ilk Kürt edebiyatında ilk yazılı eserler Lori Kürtçesiyle yazılmış olduğunu görüyoruz. Bu eser Baba Tahirê Hemedani tarafından 10. ve 11. yüzyıllar arasında Lori lehçesi ile yazılmıştır. Elimizdeki ilk Kürtçe yazılı metinler Baba Tahirê Hemadani'nin Lorî Kürtçesiyle yazdığı Dubeytilerdir. Lori edebiyatı Loristan ve Hawreman bölgelerinde gelişti. Lori Kürtçesinin en büyük, önemli ve güçlü şairi Baba Tahirê Hemedani'dir. Bu edebiyat gücünün ve muhtevasını Yarsani mezhebinden alır. Baba Tahir bu nedenle büyük bir Yarsan büyüğü ve kutsalı olarak kabul edilir. Baba Tahir Hemedani'den önce yazılı Kürtçe metinler varsa bile şu an elimizde yoklar buyüzden Baba Tahirê Hemedani'nin "Dubeyti"leri ilk Kürtçe yazılı metin olarak kabul ediliyor. Bu tarihten önce klasik metinlerden ziyade, sözlü edebiyat türleri daha yaygındı. Halk arasında el sanatları, şiirler, şarkılar, halk

hikayeleri, hikayeler, şarkılar ve kılamlar gibi birçok sözlü edebiyat türü vardı. İster yazılı olsun ister sözlü bu ürünlerin hepsi milli bir dimağın imbiğinden süzülüp gelerek nesiller boyunca Kürt milli düşüncesinin temsili olmuş ve olgunlaşarak günümüze kadar varlığını korumuştur. Bütün sözler ve metinler milli hayattan ve düşüncelerden gelen ürünleri zamanla mükemmelleştirmiş ve somut bir hale gelmiştir.

Mirlikler döneminde eğitim için medreseler bulunmaktaydı. Bu medreselerde dini eğitimin yanında ilmi eğitim de veriliyordu ve bu eğitim Kürtçe veriliyordu. Medrese eğitiminden önce Kürt çocukları temel dini eğitimlerini - Allah'ın, peygamberlerin, Allah dostlarının, şeyhlerin ve evliyaların isimleri ile İslam'ın ve imanın şartları ile namaz dualarını-aile bireylerinden alırlardı. Daha sonra molla ya da fakihlerden Elifba öğrenilirdi. Sonra da belli bir sistematikte medrese eğitimi başlardı. Medrese eğitimi sırasında sırasıyla şu kitaplar okutulurdu: Kur'an-ı Kerim, Mela Huseynê Bateyi'nin Mevlüd'ü, daha sonra Ehmedê Xani'nin Nubihar'ı, Mele Halil el-Serti'nin Nehc-ül Enam'ı ve şer'î hükümler. Medreselerde okutulan kitapların çoğunluğu Kürtçeydi, ayrıca Farsça ve Arapça kitaplar da vardı. Ehmedê Xani'den önce Kürdistan medreselerinde Arapça hakimiyeti vardı. Ehmedê Xani, sözlüğü Nûbihara Biçûkan ve Eqîdeyên îman ile Arapçanın Kürt medreselerindeki hâkimiyetini yıkıp bu medreselerde Kürtçenin hâkimiyetini kurmuştur. Bir sözlükle Kürtçenin medreselerdeki kaderi değişti. Bu aynı zamanda sözlüklerin diller içindeki gücünün bir göstergesidir.

Bu sözlükte klasiklerdeki 12071 kelime madde madde açıklanmış ve bir çoğu beyitlerle örneklendirilip gösterilmiştir. Sözlükte sadece Kurmanci Kürtçesine ait kelimelere yer vermedik aynı zamanda Sorani ve Lorî Kürtçesine ait kelimelere de yer verdik. Divanlardan verdiğimiz beyit örnekleri arasında Kurmanci Kürtçesinin yanında Sorani, Kirmancki (Zazaki) ve Lori Kürtçesinden beyitler yer almakta. Bu çalışmada en çok Ehmedê Xani'nin Mem û Zin'inden ikinci olarak Melayê Cizîrî'nin Divan'ından kelime aldık. Daha sonra sırasıyla şu divan ve eserlerden kelimeler aldık.

1. Mem ve Zin

2. Melayê Cıziri Divanı
3. Ehmedê Xani'nin Divanı
4. Şeyh Muhammed Eskeri İqdeyî Durfam'ı
5. Melayê Bateyi'nin Mevlidi ve tüm eserleri
6. Feqiyê Teyran'ın bütün eserleri
7. Mehwi'nin Divanı
8. Selimiyê Hizani'nin Yusuf ve Züleyha'sı
9. Weda'i Divanı
10. Seyyid Aliyê Findiki'nin Divanı
11. Pertev Begê Hakkari'nin Divanı
12. Ali Ekber Kürdistani'nin Sözlüğü
13. Siirtli Molla Halil'in Nehcul Enam'ı
14. Şeyh Muhammed Kerbelâ'nin Mirsad'ul-Etfal'ı
15. Şeyh Şemseddin Exlati'nin Divanı
16. Feqe Reşîdê Koçer'in Sirul Mehşer'i
17. Siyahpuş'un Gazelleri ve Şiirleri
18. Şeyh Evdirehman Axtepi'nin Divanı
19. Baba Tahir Uryan'ın Dubeytileri
20. Teremaxi'nin Tesrifi

Edebiyat bizim gibi geç uluslaşmış uluslar için uluslaşmanın en önemli aracıdır. Yukarıda da belirttiğimiz gibi edebiyatın malzemesi dildir, milletlerinde temeli dil üzerine inşa edilir. Yazılı edebiyatımız klasik metinlerle başlar. Buda İslamın Kürtler arasında kabulünden sonraya denk gelir. Klasik edebiyatımız, İslam dini ve İran kültürünün etkisinden dolayı Arapça ve Farsçanın etkisinde kalmıştır.. Bu yüzden Kürtçe klasiklerde birçok Arapça ve Farsça kelime yer almıştır. Bundan dolayı günümüzde birçok kişi klasikleri anlayamıyor. Bundan dolayı yeni nesil geçmişinden kopmakta. Klasikler edebiyatımızın temel taşıdır, böyle bir durumda geçmişle gelecek arasındaki bağlantılar kopar ve bu büyük bir sorun yaratır.

Klasik dönemde işi edebiyat ve eğitim olan kişiler hem dil öğretimi hem de dilin sözcüklerinin korunması için menzum sözlükler oluşturmuşlardır. Kürdistan medreselerinde Kur'an dilini öğretmek için Kürtçe-Arapça sözlükler yapılmıştır. Kürtçede yapılan ilk menzum sözlük Ehmedê Xanî tarafından Kürtçe-Arapça olarak hazırlanan Nûbihara Biçûkan'dır. Bu ürün ile Kürt sözlükçülüğünün tarihi başlar ve bugün düzenli bir şekilde devam eder. Bu yazının yazıldığı sıralarda Kürtçe klasik edebiyat sözlüğü yoktu. Bu dönem insanının klasik dillerin zenginliğinden mahrum kalmaması için böyle bir çalışmaya başladık. Bu çalışmanın bu konudaki eksiklikleri gidereceğine inanıyorum.

Türkçe sözlükte sözlükçülük kavramı şu şekilde tarif ediliyor, sözlük yazma ve hazırlama, sözlük yazma işi olarak tanımlanmaktadır. Sözlük bilimi de aynı şekilde tanımlanmaktadır (TDK, 2009). “Kürtçe sözlüklerde sözlükbilim şu şekilde tanımlanır; Bir dilin kelimeleri, sizin veya başka bir dildeki kelimelerin karşılıkları ile birlikte belirli bir şekilde işaretlenir. Ancak bir dilin zenginliği kelimeler ve onların farklı anlamlarıyla sınırlı değildir. Sözlük, halkların hafıza ve inanç ve kişilik tarihinden birçok kişinin hafızasıdır. Çünkü her kelime halkın durumu yansıyor.” Batı dillerinde sözlük bilimi kelimesi için leksikografi kavramı kullanılır, bunun yerine sözlükbilim kelimesini de kullanacağız.

Klasik edebiyatta sözlükler de dahil olmak üzere birçok edebiyat türü vardır. Çünkü üslup ve biçim olarak klasik edebiyata bağlıdırlar. Ayrıca daha çok çocuklar için yazıldığı için. Menzum sözlükleri medrese derslerine kaynak olarak görülmüş ve bu derslerden bir parçası olarak kabul edilmiştir. “Manzum sözlükleri hazırlamak sanatsal bir iş olarak görülüyordu. Boyutları küçük, kullanımları pratik ve ezberlenmesi kolay eserlerdi.” Arapça öğrenmek Kuran'ı anlamak için çok önemli ve gerekiyordu bu sözlükler. Sözlükler ayrıca Arapça öğretmek için de yararlı bir araçtı. Bunun için Doğu'daki ilk sözlükler Arapça idi. Farsça aynı zamanda edebiyat dili olduğu için Arapçadan sonra Farsça sözlükler de oluşturulmuştur. Arapça-Farsça olarak hazırlanan ilk sözlük Edip Natanazzi'nin “Dustu'l Lugası'dır. (ö.1106) Ayrıca XII yüzyılın ortalarında. İranlı yazar Rashiduddin Wetwati (ö. 1182) de buna benzer bir eser hazırlamıştır. Ebu Nasr el-Farahani'nin Nisabu's-Sibyan (ö. 1221) adlı eseri İslam edebiyatının en önemli Arapça-Farsça sözlüklerinden biridir. Bu ürün, aynı

türden ürünler üzerinde büyük bir etki yarattı. Anadolu coğrafyasında menzum sözlüklerinin ilk örnekleri Arapça-Farsça olmuştur. Bilinen ilk örnek Şukrullah'ın 1242'de yazdığı Zuhret'ül-Edeb'idir. Bu konudaki ilk Arapça-Türkçe örnek Abdullatif bin Melek'in Lugat-i Ferišteoğlu'dur. O, bu eserini 1392'de yazdı. Klasik dil öğretiminde en büyük kaynaklar, ürünlerinin "küçük hacimli olması, kullanılabilirliğini artırması ve ezberlenmesinin kolay olması" nedeniyle manzum sözlüklerden oluşmaktaydı.

Bu sözlükler genellikle çocuk okullarında başka bir dil öğretmek için kullanılırdı. Bu sözlükler şiirseldi, bu yüzden onları ezberlemek kolaydı. “Ezberci eğitim için en kolay yol manzum sözlüklerdi Şunu diyebiliriz ki bu sözlükler bu sistemin düşünsel birer sonucudur. Bu manzum sözlükler, hem yeni bir kelimenin anlamını hem de kelimenin pratik kullanımını öğreterek anlamlı bir bağlam içinde verebilmektedir. Bu, kelimelerin günlük hayatta kullanımını basitleştirir ve dilin canlılığını korur. Yabancı dil öğretiminin kolaylaştırılmasında ve kültürel değerlerin öneminin anlaşılmasında önemli rol oynarlar.

Bu türün ilk Farsça-Türkçe örneği 1400'lü yıllarda Husam bin Hassan tarafından Tuhfe-i Hüsamî adıyla yazılmıştır. Farsça-Türkçe menzum sözlükleri arasında en bilineni Sunbulzade Vehbi'nin Tuhfe-i Vehbî'sidir (m.1809-10). Bu eser 1798-1909 yılları arasında 58 kez yayınlandı. Bu da bize bu tür ürünlerin önemini gösteriyor.”

Kürt edebiyatında ilk sözlük Ehmedê Xani'nin Nûbehara Biçûkan'ıdır. 1683 yılında Arapça-Kürtçe yapılmıştır. Bundan sonra Ehmedê Xani'nin öğrencisi İsmailê Bazîdî'nin Gülzar adında üç dilde bir sözlük yazdı. Bu sözlük Arapça-Farsça-Kürtçe yazılmıştır. Şêx Marûfê Nodeyî 1790 yılında Sorani lehçesinde Arapça-Kürtçe iki dilli bir sözlük olan Luxatnameyî Ehmedî adıyla bir sözlük hazırlamıştır. 1870 yılında Ali Ekber Kurdistanî, Ferhenga Kurdistanî adında bir Kürtçe-Farsça sözlük oluşturdu. Ferhenga Kurdistanî, bir Kürdün bilimsel yöntem ve nesir şeklinde diğer dillerden oluşan bir sözlük oluşturduğu ilk sözlüktür. Şeyh Muhammed Kerbelâ da çocuklar için bir sözlük hazırlamıştır. Bu sözlüğün adı Mîrsad'ul-Eftal'dir (Şahrahê Kûdekan), 1912'de Kürtçe-Farsça-Türkçe olmak üzere üç dilde yazılmıştır. Kürt dili üzerine ilk sistematik sözlük İtalyan keşiş Maurizio

Garzoni tarafından derlenmiştir. Garzoni bu sözlüğü 1787'de Grammatica e vocabolario della lingua Kurda (Kürt Dilinin Dilbilgisi ve Sözlüğü) adı altında yayınladı. Bu sözlüklerden sonra bilimsel ve modern yöntemlerle birçok Kürtçe sözlük oluşturulmuştur. Ancak bu tezin yazıldığı sırada klasik Kürt edebiyatının Kürtçe-Kürtçe sözlükleri yoktu. Umarım bu çalışma bu alandaki bir eksikliği giderir.

Yazılı edebiyatın birçok eserinin İslam dini, Arap dili, İran kültürü ve Fars dilinin etkisi altında kaleme alındığı bilinmektedir. Buna klasik edebiyat denir. Klasik edebiyatta mesnevi, siyer, mewlud, meqtel gibi konulara göre pek çok nazım türü vardır. Menzum sözlükleri de klasik edebiyattan bir edebiyat türüdür. Çünkü doku ve üslup açısından klasik edebiyat yöntemiyle ilişkilidirler. Ayrıca daha çok çocuklar için yazılıyor.

Menzum sözlükçülüğü geleneği Doğu dillerinde çok eski ve yaygındır. Çünkü medreselerin eğitim sisteminde anlama ve ezberleme, okula yeni başlayan çocukların temel eğitim yöntemleridir. Bu yöntemler özellikle Kuran dili olan Arapçanın öğretilmesinde önemlidir.

Menzum sözlükleri Tuhfe, nezm, menzum veya luxat olarak bilinir. Nazım şeklinde mesnewi üslubunda bir yabancı dili ve bir dildeki kelimelerin başka bir dilde anlamlarını öğretmeyi amaçlayan sözlüklere menzum sözlükleri denir. Manzum sözlüklerinin yabancı dil öğrenimini hem kolaylaştırdığını hem de teşvik ettiğini söyleyebiliriz. Bu sözlükler, çocuklara Kuran'ın kelimelerini, gramerini, kelimelerini, kültürünü, değerlerini, edebiyatını ve dinini tercüme ederek kolayca öğretir ve bu onların da temel amacıdır.

Menzum sözlükler genellikle aynı format ve biçimde yazılır. Mesnevi şeklinde yazılırlar ve besmele, hemdele, salvele ve sebebi telif başlangıcından oluşurlar. Ardından sözlük bölümü geliyor ve ürünün sonunda da bir sonuç var. Manzum sözlüklerinin bölümleri genellikle Kita' başlığını alır. Manzum sözlüklerinin isimleri çoğunlukla Arapça ama bazen de Farsçadır. Ancak Kürtçe menzûm sözlüklerinin adları daha çok Kürtçedir.

Bilindiği kadarıyla ilk manzum sözlük İranlı şair Raşiduddin Vatvat tarafından derlendiği bilinmektedir. Dusturu'l-Luxa ve Kitabu'l-Xalas adlı iki dilli sözlüğün ilk ve kısmi örneği Edib Natanazzi (ö. 1106) tarafından yazılmıştır. Arapça'nın Farsça konuşanlara öğretilmesi ve tercüme edilmesi kolay olması için şiirsel ve çoğunlukla gramer bilgileri verilmektedir. İlk iki dilli manzum sözlük Ebu Nasr Mesud b. Ebu Bekir el-Farahi tarafından hazırlanan Arapça-Farsça sözlük Nisabu's-Sibyan'dır. Türkçedeki ilk iki dilli sözlük ve dillerinden biri Türkçe olan Hüsam b. Hasan'ın Tuhfe-i Hüsam'dır. Türkçe-Farsça sözlükler arasında en meşhuru ve çok nushalı eser Muğlalı İbrahim Dede'nin Tuhfel Şahidi adlı manzum sözlüğüdür. Türkçe ve Bir diğer önemli sözlük ise Sümbülzade Vehbi'nin Tuhfe-l Vehbi'dir. İlk Türkçe-Arapça manzum sözlük Abdullatif b. Melek (1392) tarafından hazırlanan Lugatı Feriştioğlu adlı sözlüktür. Kürtçenin ilk manzum sözlüğü Ehmedê Xani'nin Kürtçe-Arapça iki dilli sözlüğü Nûbihara Biçûkan'dır. Bu eserin amacı; medreselerde öğrencilere kendi anadillerinde Arapça öğretmektir.

Kürtçe sözlük yazma ve yayınlama tarihi, Kürtçeyi öğrenme tarihi ile ilgilidir; aynı zamanda folklor ve edebiyat örnekleri toplama ve yayınlama tarihi ile de ilgilidir. Kürtçe sözlüklerinin tarihinin en eski örneği, 1655 yılında Kürtçe kelimelerin bir listesini derlemek için Kürtlerin yaşadığı bölgelere gelen Ewliya Çelebi'dir. (1611-1682) Sonra Ehmedê Xanî (1651-1707), 1683 yılında Nûbehara Biçûkan adlı bir manzum sözlük hazırlamıştır. Kürt dilinde Avrupa'da bilinen ilk Kürtçe sözlük İtalyan Garzoni'nin Gramatika ve sözlüğüdür. Polonyalı dilbilimci M. Auguste Jaba (1801-1894) bir Kürtçe-Fransızca sözlük hazırladı. 1879'da Petersburg'da Alman Ferdinand Justi bu sözlük üzerinde çalıştı ve yayınladı. Sözlükler üzerine en büyük çalışma Irak-İran ve Sovyetler Birliği'nde Kürt yazarlar ve bilim adamları tarafından yapılmıştır. Givi Mukriyani (1920-1986) Irak bölgesinde çok değerli bir sözlük hazırlamıştır. Daha sonra Rusya bölgesinde özellikle Qanat Kurdo, Farizov, Bakoev, Maksim Xemo, P. Lerx, M. U. Khamoian ve diğerleri. Bu eserler Kürt sözlükçülüğünün tarihinin temelini oluşturmuşlardır.

İlk Kürtçe manzum sözlük Ehmedê Xanî'nin Nûbihara Biçûkan'ıdır. Bu sözlük Kürtçe-Arapçadır. Arapça ve Kuran dilinin medreselerde öğretilmesi için Kürtçe yazılmıştır. Kürt edebiyatındaki ikinci Kürt edebiyatı sözlüğü, Ehmedê

Xani'nin öğrencisi İsmail Bazidi'nin (1655-1710) Gülzar adlı Kürtçe-Arapça-Farsça üç dilde hazırlanmış sözlüktür.. Ne yazık ki, bu ürünün bir kopyasına sahip değiliz. Şeyh Mer'uf Nodeyi'nin (1753-1837) sözlüğü 1790 yılında yazılmıştır. Luxetnamey Ehmedî aynı zamanda menzûm'un üçüncü sözlüğüdür. Bu sözlük Sorani Kürtçesi ile Kürtçe-Arapça yazılmıştır. Mirsadu'l-Etfal da 1912'de Şeyh Muhammed Kerbela tarafından Kürtçe-Farsça olarak hazırlanmıştır. Bu sözlükte 1155 Kürtçe kelimenin Farsça anlamlarını göstermektedir. Luxetnamey Ehmedî Sözlüğü, Kitêbî Ehmedê Luxetî Kurdî û Tatî (erebî) Seyîd Hüseyin Huznî el-Hüseyin Mukriyanî tarafından 1926 yılında yayımlanmıştır. 1936'ya kadar birkaç kez yayımlandı. 1350 kelimedenden oluşmakta ve halen Güney Kürdistan'da bazı yerlerde ders kitabı olarak okunmaktadır. 2014 yılında Dilbikul Cizîrî (Abdulkadir Bingöl), Nûbihara Mezinan adlı Kürt lehçesinde bir sözlük oluşturmuştur. Bu sözlük Ehmedê Xanî tarafından Nûbihara Bîçakan'a nazire olarak yazılmıştır. Bu sözlük Kürtçe-Türkçe yazılmıştır. Sözlükte 13.104 Kürtçe ve 8268 Türkçe kelime bulunmakta olup 3337 kelimedenden oluşmaktadır. 1970 yılında İran'da Mamoste Evdîlkerim Muderris tarafından Duruşteyi Mirwari başlığı altında İran'da yeniden basıldı. Ayrıca Kürtçe-Arapça yazılmış ve Kürtçe 3618 Arapça kelime anlamına gelmektedir. 2014 yılında Evdulsettar Rêkanî tarafından Kürtçe-Arapça manzum olarak hazırlanmış diğer sözlük Nûbihara Mizgefta Sîrîyê . (Gençlerin Nubiharı)1330 kelimedenden oluşmaktadır. Mela Mehmûd Tîruwayî'den Kur'an tilaveti Kur'an'da Kürtçe anlamlarını gösteren 1000 zor kelimeyi Kürtçe anlamlarıyla vermiştir. Menzum sözlüklerinin dışında kısaca tanıtacağımız başka Kürtçe sözlükler de var tanıtacağımız.

SONUÇ

Edebiyat, yazının bulunmasıyla beraber toplumların hayatında önemli bir rol oynar. Edebiyat sayesinde kabile dilleri ulusal diller haline geldi ve bu sayede

birbirinden anlayan uyumlu toplumlar yaratıldı. Edebiyat olmasaydı, bugün duyğudaş ve tek dilli milletlerden söz edemezdik.

Klasik edebiyatın milletlerin hayatındaki yeri çok önemlidir. Başlangıçta milletlerin yazılı eserleri daha çok bu edebiyatta meydana gelmiştir. Bu edebiyatın ürünleri daha çok şiirseldirler. Bu ağırlık için kelimelerin uyumuna ağırlık verilmiştir bu edebiyat ekolünde. Bunun için dindaş milletler birbirlerinden kelimeler ödünç almışlardır. Bu da bu edebiyatın sonradan gelen nesiller ve sıradan halk kitleleri için anlaşılma kılmasıdır. Doğu edebiyatında İslam dinine bağlı olarak birçok Arapça kelime diğer dillere girmiştir. Farsça aynı zamanda Doğu'da, edebiyat diliydi, bu yüzden pek çok Farsça kelime diğer Müslüman halkların diline girmiştir. Klasik Kürt edebiyatı da üslup ve biçim açısından bu iki edebiyattan etkilenmiştir. Bu nedenle her iki edebiyatta da birçok şekil ve kelime Kürtçeye geçmiştir. Bu nedenle, bu edebiyatın metinlerinin dili çoğu zaman anlaşılma değildir. Yine Kuran'ın dilini anlamak için Arapça bilmek gerekiyordu. Dolayısıyla Doğu'daki sözlükler önce çoğunlukla Arapça, sonra Farsçaydı. Nûbhara Biçûkan'ın Kürtçe'deki ilk sözlüğü Arapça-Kürtçedir. Daha sonra birkaç Kürtçe-Arapça ve Kürtçe-Farsça sözlük oluşturuldu. Günümüzde bilimsel ve sistemli bir şekilde birçok sözlük oluşturulmuştur, ancak klasik metinleri anlamak için Kürtçe-Kürtçe sözlükler oluşturulmamıştır. Bu tez de bu konudaki bu eksikliği gidermeyi amaçlamaktadır.

Bu çalışma için birçok klasik ürün ve taranıp yabancı kelimeler ve nadiren kullanılan Kürtçe kelimeleri seçip kaydettik. Sonra anlamlarını modern ve çağdaş Kürtçe sözlüklerde ile diğer dillerdeki sözlüklerde bulup kaydettik. Yine kelimeleri tam anlamıyla anlamlandırmak için Osmanlıca ve Türkçe sözlüklerden de yararlandık. Nadir Kürtçe kelimelerin anlamı için eski kelimelerin sözlüklerini de kullandık. Bazı kelimeler farklı yazılmıştı, bu farklı yazımları parantez içinde kullandık. Bazı kelimelerin birkaç anlamı vardı, hepsini madde madde gösterdik. Bu sözlük sadece Kurmanci Kürtçesine ait sözcükleri değil, Sorani ve Lori kökenli sözcükleri de içerdiğinden bu lehçelerdeki sözcükleri bu lehçelerin baş harfleriyle gösterdik. Yine bazı Arapça ve Farsça kelimelerin anlamlarını netleştirmek için kökenlerini de belirttik.

Umarım bu eser klasik edebiyatı anlamak için hala önemli bir kaynak olur. Geçmiş ve gelecek bağlantısı için, gelecek nesillerin kendi geçmişlerini anlamaları gerekir, bunun için de klasikler eşsiz kaynaklardır. Bu nedenle klasiklerimizin dilinden anlamamız gerekir. Bunun içinde uygun bir sözlük gereklidir. Bu sözlük de bu görevi üstlenmek istiyor.

